بسم الله الرحمن الرحيم

**WEŞANÊN SEROKATİYA KARÛBARÊN DİYANETÊ /**
**DİYANET İŞLERİ BAŞKANLIĞI YAYINLARI : 1108**
**BERHEMÊN ÇAVKANÎ / KAYNAK ESERLER : 84**

**KOORDİNATORÊ GİŞTÎ / GENEL KOORDİNATÖR**
PROF. DR. MEHMET EMİN ÖZAFŞAR

**SERKARÊ WEŞANÊ / YAYIN YÖNETMENİ**
DR. YÜKSEL SALMAN

**KOORDİNASYON**
YILDIRAY KAPLAN

**XET / HAT**
DR. MUHAMMED ABAY

**AMADEKARÊN MEALÊ / MEALİ HAZIRLAYANLAR**
HÜSEYİN GÜNDÜZ (ÊSÎ)
MEHMET SEYHAN

**XWENDINA DAWÎ / SON KONTROL**
HAŞİM ÖZDAŞ
LOKMAN OCAKHANOĞLU

ISBN 978-975-19-6335-2
2015-34-Y-0003-1108
JİMAREYA BAWERNAMEYÊ / SERTİFİKA NO: 12930

BIRYARA KOMİSYONA SEHKİRİNA BERHEMÊ /
ESER İNCELEME KOMİSYON KARARI : 08.01.2015/20

ÇAPA 1 / 1.BASKI

İSTANBUL 2015

**GRAFİK Û RÛPELSAZÎ / GRAFİK - TASARIM**
EMRE YILDIZ
UĞUR ALTUNTOP

**ÇAP / BASKI**
ACAR BASIM VE CİLT SAN. TİC. A.Ş.
0212 422 18 34

© SEROKATİYA KARÛBARÊN DİYANETÊ / DİYANET İŞLERİ BAŞKANLIĞI

**PÊWENDÎ / İLETİŞİM**
MİDÛRİYETA GİŞTÎ YA WEŞANÊN DÎNÎ / DİNİ YAYINLAR GENEL MÜDÜRLÜĞÜ
SEROKATİYA DAÎREYA WEŞANÊN Bİ ZARAVA Û ZİMANÊN BİYANÎ /
YABANCI DİL VE LEHÇELERDE YAYINLAR DAİRE BAŞKANLIĞI
TEL.: +90 312 295 72 81 • FAX: +90 312 284 72 88
E-MAIL / E-POSTA: YABANCIDILLER@DIYANET.GOV.TR

• KUR'AN-I KERİM KÜRTÇE MEÂLİ •

القرآن الكريم

MEALA

# QUR'ANA PÎROZ

A KURDÎ

DİYANET İŞLERİ BAŞKANLIĞI

SEROKATİYA KARÛBARÊN DÎYANETÊ

# 1. SÛREYÊ FATÎHÊ

Sûreyê Fatîheyê, li Mekkê nazil bûye. Heft ayet in.

Ev sûre ji ber ku Sûreyê Qur'anê yê yekem e û Qur'ana pîroz pê tê destpêkirin jê re "El-Fatîhe" yanî destpêk tê gotin. Herwiha, ji bilî vî navî hinek navên wî yên din jî hene: Ummulkîtab (Maka kitêbê), Şifa (derman), Esasul-Qur'an (Bingeha Qur'anê), Kenz (xezîne) û El-Hemd e.

Ez ji ber neqenciya şeytanê qewitî xwe davêjim ber penaha Xwedayê Bilind, da ku nehêle zirarê bide dîn û dinya min û nehêle ku ew min ji erk û wezîfeya min vegerîne, keysê nede wî ku ew li ser fikr û ramanên min bibe desthilatdar.

1. Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm.
2. Hemd (pesn û spasî) ji Xwedê re be ku ew perwerdegarê 'alemê ye.
3. Ew ê ku Rehman e, Rehîm e.
4. Ew ê ku xwediyê roja hesabdîtin û cizadanê ye.
5. Em bes ji bo te îbadet dikin û her ji te arîkariyê dixwazin.
6. Riya rast û durist nîşanî me bide û me li serê rasterê bike.
7. Riya wan kesên ku te qencî û dilşadî daye wan; ne ew ên ku xezeb li wan bûye û ne ew ên riya heq şaş kirine.[1]

---

1 Xwedê, kitêba xwe ya pîroz bi besmeleyê dest pê kiriye. Bi vî awayî rê nîşanî bendeyên xwe daye ku ew jî karên xwe pê vekin û dest pê bikin. Di hedîsa şerîf de hatiye ragihandin ku: "Çi qas karekî xwedî şeref hebe û bi navê Xwedê (bi besmeleyê) neyê destpêkirin, ew bêbereket e."
Naxwe maneya besmelê dibe ev; ez, bi navê Xwedayê Rehman ê Rehîm dest bi karê xwe dikim. Ez, bi ferman, arîkarî û qudreta Xwedê û bi rizaya Wî vî karî dikim; ne ji bo daxwaza nefsa xwe. Ev qudreta ku pê ev kar hatiye kirin ji Xwedê ye. Heke Wî, hêz û arîkarî nedabûya min, min dê hîç nikarîbûya tiştekî bikim. Ez, xwe ji vê yeka ku karê min, bi navê min be dûr dikim û diparêzim; ez tenê bi navê Xwedê dest pê dikim. Lewra min hêz û arîkariya xwe hemû ji Wî girtiye.
Hemd: Wesfa rind, senaya pir, spasiya kamil û salixên baş bes xasê Xwedê ne. Lewra hemû rindî lê vedigere. Her sena û pesna rind ji Xwedê tenê re ye. Lewra yê ku tevekê alemê li hev radigre û ji pêşiya wan heta bi paşiya wan, wan perwerde û xwedî dike her ew e. Ji bo rênîşandana wî hemd jê re be û ji bo hemû ni'metên wî yên xuyayî û nihênî şukir jê re be!
Rehman: Yê ku hemû ni 'metan dide, bêsînor û bêdawîn qenciyê li bende û mexlûqên xwe dike. Ev wesfê şîrîn xasê bi Xwedê ve ye û qet jê cuda nabe.
Rehîm: Yê ku wesfê rehmetê jê re sabit e.
Yewmiddîn: Yewm, roj e. Dîn, Maneya wê ya ferhengî; hesab e, ceza ye, ango xelat û celat e. Ji Roja Dîn mebest; roja qiyametê ye ku Xwedê dê hemû bende û mexlûqên xwe, li gorî kirin û karên wan ceza bike. Heke kiryarên wan qencî bin dê xelat û padaşê bide wan û heke kiryarên wan neqencî bin -ji bilî yên ku li wan bibore û tobeya wan qebûl bike- dê wan ceza û seza bike. Peyva Dîn di hedîsa şerîf de jî bi maneya hesabê bi kar hatiye. Pêxemberê Xwedê wisa ferman kiriye: "El-keyyisu men dane nefseh" aqilmend ew kes e ku hesabê nefsa xwe bide dîtin. Ev dana hesabê exlaqekî Îslamî ye ku di bara wî de 'Umer (Xwedê jê razî be) gotiye: "Beriya hesabê we bête dîtin hûn xwe bikêşin hesabê. Beriya 'emelê we bête kêşandin hûn' hûn emelê xwe bikêşin û xwe ji rapêşiya mezin a li cem wî Xwedayê ku tiştek li berê veşartî namîne, amade bikin."
Ew ên ku Te ni 'met li wa n kirî; Peyxamber, şehîd, yên rast û salih in. Ni 'meta mezin a ku Xwedê li wan kiriye ew e ku ew ji rêşaşiyê muhafeze kirine.
Ew kesên ku xezeb li wan bûyî: Ew kesên ku heqiyê nas dikin lê qebûl nakin.
Ew kesên ku jirêderketî ne: Ên ku rêya heq hîç nas nekirine, ji lew ketine rêya çewt û şaş.

# 2. SÛREYÊ BEQERE

Sûreyê Beqere, li Medînê nazil bûye, du sed û heştê û şeş (286) ayet in.

Di Qur'anê de Sûreyê herî dirêj Beqere ye. Her wekî yê kurttirîn jî Kewser e. Sûre, navê xwe ji ayetên 67-71'an girtiye ku di wan de bêjeya "Beqere" derbas bûye û bi maneya "çêlekê" ye.

Naveroka Sûreyî

Sûreyê Beqere, ji pêşgotinek, sê mijaran û dawîneyekê pêk tê.

Pêşgotin, bîst ayet e û mirovan li sê beşan parve dike: Mutteqî, Kafir û Munafiq.

Di pênc ayetên pêşîn de behsa mutteqiyan, di du ayetên li pey wan de behsa kafiran û di sêzdeh ayetên li pey wan de jî behsa munafiqan tê kirin.

Ev sûre, di nava xwe de piraniya hukmên Îslamê; eqîde, îbadet, dan û standinan, exlaq, zewac, jinberdan û hwd. vedihewîne. Sûre, behsa destpêka xulqandinê û qiseya bavê mirovan Adem (e.s.) dike.

Sûreyê Beqere, bi piranî li ser aliyê dadwerî (hiqûqî) radiweste. Kêşeya hiqûqî û risteyî çareser dike.

Sûre, pişt re behsa ehlê kitêban dike,vêca mislimanan li hemberî exlaqên wan ên nebaş hişyar dike. Paşê behsa qiseya çêlekê dike, ku di nav cihûyan de zilamek hatibû kuştin û qisasê wî nediyar bû. Vêca wan ev rewş ji Nebî Mûsa (es) erz kirin da ku mêrkujê wî ji wan re eşkere bike. Xwedê, jê re wehî kir ku ji wan re bibêje; bila çêlekekê serjê bikin û parçeyek ji goştê wê di laşê kuştî bidin, vêca bi destûra Xwedê kuştî dê sax bibe û ewê mêrkujê xwe diyar bike.

Sûre, bi dorferehî behsa hukmên rojiyê, hecê, 'umrê, cîhadê, kar û barên malbatî û herambûna mehrkirina jinên muşrik dike.

Sûre, pişt re behsa herambûna ribayê (selefê) dikê. Sûre, paşê gazî mislimanan dike ku ew tobe bikin, ji Xwedê lavelavê bikin û li hemberî kafir û heqveşêran arîkariyê jê bixwazin. Çawa ku sûre, bi wesfên bawermendan dest pê dike herwiha bi duaya muminan jî dawî dibe.Yanî serê sûre û dawiya wî bi hev re ahengsaz û pêwendîdar in!

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Elîf. Lam. Mîm! [1]

**2.** Ev a ew kitêb e, tê de guman tune (ku ew ne ji cem Xwedê ye), ji yên xwe diparêzin re rêber e.

---

1 Di destpêka hin sûreyên Qur'anê de hin herfên ku ji wan re "Hurûful Muqette'e (herfên kite kitayî)" tê gotin hene. Ev herf bi navê xwe têne xwendin û dawiya wan sekin in; bê ser, bê jêr û bê ber in.

a ) Ev herf, di serî de tên, muxatebî (berpeyvî) hişyar dikin da ku bala wî bikşînin ser wesfê Qur'anê.

b) Ev herf, î'caza Qur'anê nîşan didin û li hemberî berpeyvan delîlan tîne, balê dikşînin ser hukm û qanûnên ku di nav sûreyî de tên.

c) Ev herf, nîşan didin ku Qur'ana Pîroz ji cinsê van herfan pêk hatiye û ew herf di nav dijber û muxatabên wê de û di nav muşrikên Mekkê de jî hebûn. Qur'an, ji wan re ne carekê, pir caran dibêje: "De hûn jî kitêbeke wekî wê, deh sûreyên mîna sûreyên wê an jî sûreyekî bînin." Lê vê bangê ew bêçare hiştin û wan nikarîbû bersiva wê bidin û têk çûn.

d) Qur'an nîşan dide ku perwerdehî bi van herfan dest pê dike û dê wisa berdewam be.

**3.** Ew ên ku bi xeybê ya nelibercav baweriyê tînin û bi awayê pêdivî nimêj dikin û ji risqê ku me daye wan (di riya Xweda de) xerc dikin.

**4.** Ew ên ku bi kitêba ji te re û bi kitêbên ku ji pêxemberên beriya te re hatine şandin û bi axretê ji dil û can bawerî tînin.

**5.** Ha ew ji aliyê Xwedayê xwe ve li ser zanîn û rêyeke rast in û ha ew ên ku bi gihiştina daxwaza xwe serkeftî û serfiraz in.[1]

**6.** Bêguman ew ên ku kafir bûne (inkarî ji xwe re kirine pîş û rêbaz), çi tu wan (bi ezabê Xwedê) bitirsînî û çi tu netirsînî ji wan re wekhev e; ew îmanê nayînin.

**7.** Xwedê dil û guhên wan mor kiriye, çavên wan perdekiriye û ji bo wan ezabekî mezin heye.

**8.** Ji mirovan hin dibêjin: "Me bi Xwedê û bi roja axretê bawerî anîye". Rewş ev e; wan bawerî neaniye.

**9.** Ji wan we ye ku ew Xwedê û yên ku bawerî anîne dixapînin. Hal ev e; ew xwe dixapînin û tênagihijin jî.

**10.** Di dilên wan de nexweşî(ya nîfaqê) heye, vêca Xwedê jî nexweşiya wan zêde kir. Ji ber ku derewan dikin ji bo wan ezabekî dijwar heye.

**11.** Dema ji wan re tê gotin: "Li ser erdê fesadiyê nekin!" Dibêjin: "Em bes mirovên çaksaz û qencîker in."

**12.** Agahdar bin, birastî yên ku fesadiyê dikin her ew bi xwe ne, lê belê ew tênagihîjin.

**13.** Dema ji wan re tê gotin: "ka çawa xelkê îman aniye hûn jî îmanê bînin." Dibêjin: "Erê, ma çawa em ê mîna aqilsivikan îmanê bînin?" Nexêr; birastî aqilsivik her ew bi xwe ne, lê belê ew nizanin.

**14.** Gava leqayê bawermendan dibin, dibêjin: "Me jî bawerî aniye." Lê belê gava ew bi şeytanên xwe re bi tenê dimînin, dibêjin: "Em bi we re ne, bes em tinazên xwe bi wan dikin".

**15.** Birastî Xwedê bi ezabê xwe tinazên wan li wan vedigerîne û di kufra wan de demeke dirêj muhletê dide wan û wan dermande û heyirî dihêle.

**16.** Ha ev, ew ên ku di bedêla hîdayetê de rêşaşî kirîne, vêca vê kirîn û firotina wan kar neaniye û ew bi ser rêka rast ve jî nebûne.

**17.** Rewşa wan (munafiqan) eynî wekî rewşa wî kesî ye ku (di şeva tarî de) agir vêxistibe. Çi dema agir vêket û ronahî da hawirdora wî; ji nişka ve Xwedê (agirê wan vemirand) ronahiya wan bir û ew bi awayê ku tiştekî nabînin di tarîtiyê de hiştin.

**18.** Ew (munafiq) ker in, lal in, kor in, vêca (piştî ku heqî nas kirin jî ji pûçiya xwe) ew venagerin.

**19.** Yan jî halê wan mîna halê wan kesan e ku ew rastî tavebaranekê bên ku tê de

---

1 Xwedê, di destpêka vî sûreyî de insan li ser sê sinfan beşkiriye: Mu'min, kafir û munafiq. Ev beşkirineke rast û şer'î ye. Di her pênc ayetên ewil de salixên mu'minan daye, di ayeta şeş û heftê de bahsa kafiran kiriye û ji ayeta heştan heyanî ayeta bist û yekê salixê munafiqan daye.

tarîtî, gurmegurm û birûsk hene. Ew ji ber gurmîniya birûskan, ji tirsa mirinê tiliyên xwe dixin guhên xwe. Xwedê (bi zanîna xwe) dor li kafiran girtiye.

**20.** Di vê navê de birûsk vedide mîna ku çavên wan birijîne. Çi gava dora wan ronahî kir, ew hinekî dimeşin û çi gava li wan tarî dibe radiwestin. Eger Xwedê bixwesta, muheqeq dê çavên wan kor û guhên wan ker bikirana. Bêguman Xwedê li ser her tiştî qadir e.

**21.** Gelî mirovan! Hûn ji bo wî Xwedayê ku hûn û yên beriya we afirandin îbadetê bikin, da ku hûn xwe (ji ezabê Xwedê) biparêzin.

**22.** Ew Xwedayê ku erd ji bo we raxistiye kiriye doşek, esman jî kiriye avahî û ji bo we ji ewran av daxistiye ser erdê. Bi wê avê jî, ji bo we texlîtên fêkiyan ji erdê derxistine. Naxwe, digel ku hûn dizanin jî ji Xwedê re hevpişkan çêmekin

**23.** (Gelî mirovan!) Eger ku hûn derbarî ya ku me ji bo evdê xwe şandiye gumandar bin, vêca eger bera hûn rast dibêjin: de hûn jî sûreyekî mîna wê bînin û ji bilî Xwedê bangî piştevanên xwe jî bikin (da ku ji we re bibin piştek û arîkar).

**24.** Eger we ev nekir -jixwe hûn nikarin bikin jî- naxwe, xwe ji wî agirê ku ardûyên wî însan û kevir in biparêzin ku ew ji kafiran re hatiye amadekirin.

**25.** Mizgînê bide wan ên ku bawerî anîn û karên qenc kirin; ji bo wan bihiştên wisa hene ku di binê wan re çem diherikin. Çi gava mêweyeke wan bihiştan ji bo wan tê pêşkêşkirin, dibêjin: “Ev ji wan mêweyan in ku berî niha me xwaribû.” Her çi ku bi şeklê xwe mîna hev in jî, lê belê di tehm û xweşiya xwe de cuda ne. Ji bo wan li bihiştê hevserên pak û paqij hene û ew ê li bihiştê heta bi hetayê sax bimînin.

**26.** Bêguman Xwedê ji xwe re kêmasiyê nabîne ku meseleya heqiyê bi pêşûyekê û bi tiştekî hê ji wê piçûktir jî eşkere bike. Herçî yên ku bawerî anîn, jixwe dizanin ku bi vî awayî dayîna mînakan heq e û ji cem Xwedayê wan e. Heçî ku yên kafir in, dibêjin: “Ma Xwedê bi vê mînakê çi qesd dike?” Xwedê, bi vê (mîsaldanê) gelek însanan ji rê derdixe û gelekan jî tîne ser riya rast. Xwedê, bi vê (mînakdanê) ji fasiqan pê ve tu kesê din ji rê dernaxe.

**27.** Ew (fasiq) ên ku piştî soza vebirî bi Xwedê re dane, soza xwe dişikînin û ya ku xwedê emir kiriye ku lazim e merev xwe bigihîniyê ew wê dibirin û li ser rûyê erdê fesadiyê dikin. Ha ew in yên ku xesar kirine.[1]

**28.** (Gelî kafiran!) Hûn çawa Xwedê înkar dikin?! Hal ev e ku hûn berê mirî bûn, vêca Xwedê hûn sax kirin, paşê dê we bimirîne, paşê dîsa (roja qiyametê) dê we sax bike, piştî vê hûn ê bi balê ve vegerin (û hesabê xwe bidinê).

**29.** Ew Xwedayê ku çi tiştê li erdê heyî tev ji bo we afirandine, paşê bi awayekî xasê xwe li asîmanan vegeriya; vêca ew kir heft tebeq û sererast kir û her Ew e bi her tiştî zana.

---

1 (Xwedê bi vê ayetê berê me dide bi bal têkiliyên morivatiyê ve. Ev têkilî ji ‘ailê dest pê dike, paşê fereh dibe da ku xwedî û xizim têkevin bin, disa fereh dibe da ku tevekê bawermendan têkevin bin, dîsa fereh dibe da ku tevekê alemê têkevê bin. Ha ev ew biratiya insaniyetê ye Xwedê berê me dide bal ve da ku em rehmê lihev bikin. Ev ne tenê wezifekî insanîye belki yê ku neke bêemriya Xwedê dike û pê gunehkar dibe.)

**30.** Wê dema Xwedayê te ji melayîketan re got: Birastî ez ê li ser erdê xelîfeyekî (ku yek têkeve şûna yê din) biafirînim; (Melayîketan) got: "Ma Tu yê mexlûqên ku li erdê fesadiyê bikin û xwînê birêjin, biafirînî?" Hal ev e ku em hemdê te dikin û Te pak didêrin. (Xwedê) got: "Birastî ya ku hûn pê nizanin ez dizanim."[1]

**31.** Xwedê navê tevekî tiştan bi Adem da hînkirin. Paşê ew tişt nîşanî melayîketan dan û ji wan re got: " Eger bera hûn rast dibêjin; de navên van tiştan ji min re bibêjin."

**32.** Melayîketan got: "Xwedayê me! Em, Te ji hemû kêmasiyan pak didêrin, ji tiştê te bi me dabe zanîn pê ve tu zanîneke me nîn e. Birastî her tu yî yê zana yê karbinecih.

**33.** (Xwedê) got: "Hey Adem! De bi navên van tiştan melayîketan agahdar bike." Vêca çi gava Adem bi navên wan ew agahdar kirin, Xwedê got: "Ma qey min ji we re negotibû ku ez bi xeyba erd û asîmanan dizanim û ez bi tiştê ku hûn eşkere dikin û bi yên ku hûn vedişêrin jî dizanim?"

**34.** Wê demê me ji firîşteyan (melayîketan) re got: „Ji Adem re herin sicûdê." Ji bilî Iblîs hemû jê re çûne sicûdê. Ew neçû sicûdê, wî xwe mezin dêra û (ji ber vê yekê) ew bû ji kafiran.

**35.** Me got: "Hey Adem! Tu û hevsera xwe (Hewa), li bihiştê bicih bibin. Çawa dilê we bixwaze wisa bi noşîcan ji xweşiyên wê bixwin û xwe nêzî vê dara ha mekin, vêca (eger hûn nêzî wê bibin) hûn ê bibin ji zaliman".

**36.** Vêca Şeytên ew ji cennetê şemitandin; êdî ji nav xweşiyên ku ew tê de bûn derandin. Me got: "De dakevin ji wir, hûn ê ji hev re neyar bin. Heta hûn sax bin li erdê ji bo we niştecihbûn û pêxweşî heye.

**37.** Paşê Adem ji Xwedayê xwe hin peyv wergirtin (bi wan peyvan bi bal Xwedê ve tobe kir). Vêca Xwedê jî tobeya wî qebûl kir. Bi rastî Xwedê pir tobepejrên û dilovîn e.[2]

**38.** Me (ji wan re) got: "De hûn tev ji bihiştê dakevin! Heke ji cem min hidayetek ji we re bê, îcar kî ji we bide pey hidayeta min, ji wan re tu tirs tune ye û ew dê xemgîn jî nebin.

**39.** Ew ên ku kafir bûn û bawerî bi ayetên me neanîn, ew xelkê dojehê ne. Ew dê heta hetayê li wir bimînin.

**40.** Gelî zaroyên Îsraîl! Qenciya min a ku min li we kiriye bînin bîra xwe. Ew peymana ku we daye min bi cih bînin, ez ê jî soza ku min daye we bînim cih û her ji min tenê bitirsin.

---

1 Birastî gotina: «însan xelîfe ye», maneya wê ne eve ku; ew xelîfê Xwedê ye, belkî xelîfetiya însanî jibo însên e. Çawe ku Xwedê gotiye: «Piştre me, li dûv wan, we li sererdê kire xelîfe (şûngir)ên wan, da ku em binêrin; ka hûnê çawa tevbigerin. Yunus: 14» Xelîfetiya di zemînê de; lıgori mekan û zemani ye, xelîfe li ser erdê dem bi dem, nifş bi nifş dikevin şûna hev û dû.

2 Ew peyvên ku Adem û Hawwa ji Xwedê wergirtin û bi wan tobe kirin ev eyeta pîroz e: "(Adem û Hewwa) Gotin: Xwedayê me! Me neheqî li xwe kir, eger Tu li me neborî û rehmê li me nekî, teqez em ê bibin ji yên xesirî." (E'raf:23)

**41.** Baweriyê bi vê ya ku min şandiye bînin ku ew ya li ber destê we rast didêre. Zinhar! Nebin ji yên ku pêşîn vê Qur'anê înkar dikin! Ayetên min bi erzanî nefiroşin û bes xwe ji (ezabê) min biparêzin.

**42.** Heqiyê bi batilî kiras mekin û digel ku hûn dizanin jî heqiyê veneşêrin.

**43.** Berdewamî nimêj bikin, zekata malê xwe bidin û bi nimêjkeran re nimêj bikin.

**44.** Erê ma hûn şîreta qenciyê li xelkê dikin û hûn xwe ji bîr dikin, digel ku hûn kitêbê (Tewratê) jî dixwînin. Ma hûn aqil nagirin?

**45.** Bi sebrê û nimêjê arîkariyê (ji Xwedayê xwe) bixwazin. Muheqeq (nimêj) ji xwedêtirsan pê ve bi her kesî giran tê.

**46.** (Xwedantirs) ew ên ku yeqîn bawer dikin ku ew ê bigihîjin Xwedayê xwe û birastî ew ê lê vegerin (û hesab bidinê).

**47.** Gelî zaroyên Îsraîl! Qenciya min a ku min li we kiribû bînin bîra xwe. Birastî min hûn di ser alemê re girtibûn.[1]

**48.** Ji rojeke wisa bitirsin ku di wê rojê de kes havilê nade kesî, mehderiya (şefaeta) tu kesî nayê qebûlkirin, ji tu kesî fîdye nayê wergirtin û arîkariya wan nayê kirin.

**49.** Bênin bîra xwe; wê gava me hûn ji Firewn û ehlê wî rizgar kirin. Wan hûn li ezabê herî dijwar diçêjandin; kurên we dikuştin, keçên we (ji bo xizmetê) sax dihiştin û di vê yekê de ji cem Xwedayê we ji bo we îmtîhaneke mezin hebû.

**50.** Her wisa bênin bîra xwe gava me ji bo we derya kire du şeq, vêca; me hûn rizgarkirin û Me bereka Fir'ewn xeniqand û we jî li vê (dîmenê) temaşe dikir.

**51.** Her wisa, wexta me peymana çil şevî da Mûsa û we di pey wî re golik kire îlah (û we jê re îbadet kir) û bi vî awayî we li xwe zilim kir.

**52.** Piştî vê me hûn efû kirin da ku hûn şukrê Xwedayê xwe bikin.

**53.** Her wisa bênin bîra xwe; wê gava me kitêb û furqan (ya heq û batilî ji hev cuda dike) da Mûsa da ku hûn bêne ser riya rast.

**54.** Bêne bîra xwe; wê dema Mûsa ji gelê xwe re got: "Hey gelê min! We bi îbadetkirina ji golikê re li xwe zilim kir, vêca bi bal Xwedayê xwe ve tobe bikin. Paşê (ji bo ku toba we temam bibe) hev bikujin (bila yê bêsûc ên sucdar bikujin). Ev, ji bo we li nik afirînerê we çêtir e." Vêca (piştî we tobe kir) Xwedê jî toba we qebûl kir. Bêguman Xweda zêde tobepejrên e, dilovîn e.

**55.** Wê demê we got: "Hey Mûsa! Heya ku em bi çavên xwe Xwedê eşkere nebînin em baweriyê bi te nayînin." Vêca ji nişka ve birûskê li we da û we bi bêhişane lê temaşe dikir.

**56.** Piştî mirina we, me hûn sax kirin da ku hûn spasîya Xwedê bikin.

**57.** Me ewr li ser we kirin sî û sîwan, me gezo û goştê sûsikê ji we re daxist û (me

---

1 Di vê ayetê de meqsed ji "'alemê" insan in, ne ku tevekê mexlûqan e. Ma'na ayetê "Me hûn di ser insanên dema we re girtiye. Sûreyê Maide ayeta bistî; "Wê demê Mûsa ji gelê xwe re got: Gelî miletê min! Qenciya Xwedê li we kirî bînin bîra xwe; çaxa pêxember ji (nav) we rakirin û hûn kirin hukimdar û ya ku nedabû tu kesî dabû we" vê heqîqetê teqez dike.

ji we re got:) “De risqê pak û xweş ê ku me dayî we bixwin.” Bi rastî wan li me zilm nekir; lê belê wan her li xwe zilm kiriye.

**58.** (Gelî îsraîliyan!) Bênin bîra xwe wê dema me ji we re got: Herin vî bajarî (Qudsê), vêca ya ku hûn bivên hûn çawa dixwazin bi noşîcanî bixwin û bi sernizmî (ji Xwedayê xwe re şikandî) di derî re têkevinê û bibêjin: (Xwedayê me), li gunehên me bibûre. Em ê jî li gunehên we bibûrin û Em ê (xêrên) qencîkarên rast û durist zêde bikin.[1]

**59.** Lê belê ew ên ku zalim bûn, wan gotina ku ji wan re hatibû gotin bi yeke din guherand. Vêca Me jî bi sedema neqenciya ku dikirin, li ser ên ku zulim kirin ji asîmanan ezabek daxist.

**60.** Bênin bîra xwe; wê dema Mûsa ji bo gelê xwe av xwest. Me jî jê re got: “Gopalê xwe li kevir bide!” (Piştî Mûsa gopalê xwe li kevir da) di cih de ji wî kevirî dozdeh çaviyên avê derbûn. Her nifşî cihê avvexwarina xwe nas dikir. (Me ji wan re got): “Ji risqê ku Xwedê (daye we) bixwin, vexwin û li erdê fesadiyê mekin.”

**61.** Bênin bîra xwe; dema we got: “Ey Mûsa! Qîma me bi xwarineke tenê nayê, ji Xwedayê xwe tiştên ku erd wan hêşîn dike bixwaze; şoqilên wê, xiyarên wê, sîrên wê, nîskên wê, pîvazên wê ji me re derîne.” Mûsa ji wan re got: “Ma hûn tiştên giranbiha bi tiştên kêmbiha diguherînin?! Naxwe, dakevin herin bajêr. Muheqeq tiştên ku hûn dixwazin, ji we re lê hene.” Mora belengazî û riswatiyê li wan hate xistin û rastî xezeba Xwedê hatin. Ev a hatî serê wan ji ber ku ayetên Xweda mandele kirin, bi stemkarî pêxember dikuştin. Ev jî, ji ber ku bêemriya Xwedê dikirin û ji hedê xwe derdiketin.

**62.** Bêguman yên ku bawerî anîne û yên bûne cihû, yên fileh û yên sabiîn, vêca ji wan kî baweriyê bi Xwedê û roja axretê bîne û karê qenc bike, ji bo wan li nik Xwedayê wan xelat heye û li ser wan tirs nîn e û ew xemgîn jî nabin.[2]

**63.** Bi bîr bînin dema me sozeke saxlem ji we wergirt û me (Çiyayê) Tûr di ser we re bilind kir. (Me ji we re got:) “Ya ku me daye we zexm pê bigirin, tiştên ku tê de ne bi bîra xwe bînin (û pê emel bikin) da ku hûn xwe (ji ezabê Xwedê ) biparêzin.

---

1 Xwedê Teala, di gellek ayetan de behsa îhsanê kiriye û em pê fermanber kirine. Gelek caran pesn û medhê muhsinan daye û behsa wê xelata ku dê bide muhsinan kiriye. Muhsin, ismu fail e, mesderê wê “îhsan”e. Merev di kurdî de dikare muhsinî wiha îfade bike: Qencîkarên rast û durust. Di hedîsa şerîf de wiha hatiye ravekirin; “îhsan ew e ku her wekî Xwedê te bibînî tu îbadetê Wî bikî..” Wê demê ma‘na muhsinî; ew ê ku dema kar û barekî bike yan ibadetekî bike ew bitekûzî û bêkêmasî dike. Her wekî ku xwedê li pêşberî wî ye û li serê zêrevan e karê xwe dike.

2 Bi çêkirina Adem re baweriyeke fitrî nazil bû, aw a ku insan li serê hatiye afirandin. Paşê Xwedê dîn şiyandin ku peyrewên hinekan ji wan li ser erdê hene, mîna yehûdî, fileh û sabiîyan. Vêca Xwedê dixwaze ku tevekê van dînan ji ser erdê safî bike û ehlê wan di rîsaleta Muhemmed de kom bike. Lewra risaleta pêxember ji bo tesfiyekirina tevekê dînan e. Naxwe mana ayetê wiha ye: Ewên ku dibêjin me bawerî anîye, yên cihû, yên fileh û yen sabiî; vêca ku dev ji baweriya xwe berdin û bi baweriyeke nû bawer bikin û risaleta Muhemmed (s) qebûl bikin… ew xemgîn nabin. Ayeta 85an ji sûreyê Alî Îmran”Kî ji bilî îslamê dînekî din bixwaze ew qet jê nayê qebûlkirin… xesirîne”vê ramanê teqez dike.

**64.** Piştî vê, hûn li ser soza xwe nesekinîn. Eger kerem û merhemeta Xwedê li ser we nebûya, teqez hûn dibûn ji ziyankeran.

**65.** Bi rastî hûn dizanin ka me çi aniye serê yên ku di roja şemiyê de (bi girtina masiyan) zêdegavî dikirin. Me ji wan re got: „Bibin meymûnên rezîl û riswa."

**66.** Vêca me ev rûdan ji bo wan ên di wê demê de û ji bo wan ên ku dê piştî wan bên kire îbret û me ji bo mutteqiyan jî xiste şîret.

**67.** Bêne bîra xwe; wê dema Mûsa ji gelê xwe re got: "Bêguman Xwedê li we ferman dike ku hûn çêlekekî şerjêbikin." Gotin: "Ma tu tinazan bi me dikî?" (Mûsa) got: "Ez xwe diavêjim ber penaha Xwedê ku ez bibim ji nezanên tinazker."

**68.** Gotin: "Li ber Xwedayê xwe bigere, bila ji me re salox bide ka ew yeka çawa ye." Got: "Xwedê dibêje ku ew ne pîr e ne jî ciwan e, di navbera van herduyan de ye." Vêca ya ku li we hatiye fermankirin, pêk bînin.

**69.** Gotin: "Li ber Xwedayê xwe bigere, ka rengê wê çi ye bila eşkere bike?" Got: "Xwedê dibêje ku ew yeka rengzer e, zerekî safî ye, temaşevanê xwe dilxweş dike."

**70.** Gotin: "Ji Xwedayê xwe bixwaze, bila eşkere bike; ka ew çi ye! Bi rastî ew çêlek ji me re tevlihev hat. Xweda hez bike muheqeq em ê bi ser riya rast ve bibin."

**71.** Mûsa got: "Xwedê dibêje: Ew ne çêlekeke hînkirî ye ku cot bike û zeviyan jî av nade, bêkêmasî ye, tu rengekî din tê de tune ye." Vêca jê re gotin: "Ha niha te rast got (me rastiya te qebûl kir)." Êdî ew serjêkirin. Lê ji ber înadê hindik mabû ku şerjê nekin.

**72.** Di bîr bînin dema we mirovek kuşt û vêca der heqî wî de we xirecir dikir (we ew diavêt stûyê hev). Hal ev e ku Xwedê ya ku hûn vedişêrin, dertîne holê.

**73.** Me ji wan re got: "Hin ji goştê wê (çêleka serjêkirî) li kuştî bixin. Ha bi vî awayî Xwedê miriyan sax dike û nîşanên xwe ji we re berçav dike da ku hûn aqil bigirin.[1]

**74.** Paşê (piştî van rûdanan) dîsa dilê we hişk bû; vêca ew mîna kevir e, belkî jê jî hişktir e. Bêguman hin ji keviran hene ku ji wan rûbar derdikevin û bi rastî hin ji wan hene ku dibin du şeq, vêca av ji wan tê der û hinek ji wan hene ku ji tirsa Xwedê ji hev parçe dibin, tên xwarê. Helbet Xwedê ji ya ku hûn dikin, ne bêxeber e.

**75.** Ma hûn, hêvî dikin ku ew ê bi we bawerî bînin? Bi rastî komek ji wan hebû ku li gotina Xwedê guhdarî dikir û piştî ku rastiya wê hîn dibûn wan bi zanebûn ew diguherand.

**76.** Dema cihû rastî bawermendan dihatin; digotin: "Me bawerî anî" û dema ew xwe bi xwe diman, digotin: "Ma tiştê ku Xwedê (ji salixên Muhemmed ên

---

1 Di vê ayetê de hikmeteke mezin û derseke 'ecêb heye. Xwedê li wan ferman dike ku dewarekê serjêkin û perçeyek ji goştê wê li yê mirî xin da ku sax bibe û navê qatilî bibêje. Xwedê dikaribû bê lêdan jî wî sax bike, lê belê; dê bigotana ew ne miribû; ew jidil çûbû biserxwe ve hat. Vêca Xwedê xwest ku bi lêdana perçeyek goştê mirî merevî mirî sax bike da ku dersekê bide maddeperestên ataist da qene aqil bigrin û bawerî bînin.

di Tewratê de) hûn pê serwext kirin, hûn ê ji wan re bibêjin da ku wî tiştî li hemberî we, li cem Xwedayê we bikine delîl?" Ma hûn aqil nagirin?!

**77.** Qey ew nizanin ku bêguman Xwedê , bi ya ku ew vedişêrin û bi ya ku eşkere jî dikin, dizane?

**78.** Hinek ji wan (cihûyan) ummî ne; ji bilî heziyên pûç, tiştekî ji Kitêbê nizanin, ew her li dûv gumanê ne.

**79.** Êdî weyl li wan kesan be ku kitêbê bi destên xwe dinivîsin, paşê da ku bi nirxekî erzan bifiroşin, dibêjin: "Ev ji cem Xwedê nazil bûye!" Îcar wax li halê wan be, ji ber ya ku destên wan nivîsandiye! Wax li wan be ji ber ya ku pê qezenc kirine![1]

**80.** (Cihûyan) Got: "Ji çend rojên bihejmar (hindik) pê ve agir bi me nagire." (Ya Muhemmed! Ji wan re) Bibêje: "Ma qey we li ser vê yekê ji Xwedê sozek wergirtiye, vêca ku Xwedê wê soza xwe neşikîne. Yan jî ma di bara Xwedê de ya ku hûn nizanin dibêjin?"[2]

**81.** Nexêr; çi kesê ku gunehekî bike û gunehên wî dor lê bipêçe, ha ew kes xelkê dojehê ye û ew dê heta hetayê lê bimîne.

**82.** Herçî yên ku bawerî anîn û karên qenc kirin, ew ehlên bihiştê ne, ew heta hetayê li wir dimînin.

**83.** (Gelî cihûyan!) Bînin bîra xwe, dema me soz ji zaroyên Îsraîl wergirt ku "Hûn ê ji Xwedê pê ve ji tu kesî re îbadetê nekin û hûn ê her li dê û bavên xwe, xizmên xwe, sêwî û belengazan qenciyê bikin û ji mirovan re qenciyê bibêjin, bi awayê pêdivî nimêj bikin û zekatê bidin." Paşê, ji bilî çend kesan we berê xwe ji peymanê vegerand û jixwe halê we her tim bêsozî ye.

**84.** (Gelî zaroyên Îsraîl!) Bênin bîra xwe; wê dema we bi me re soz dabû (û me ji we re got:) "Xwîna hev nerêjin û hev ji cih û warên hev dernexin, paşê we ev qebûl kir û hûn bi xwe jî şahidiya vê dikin."

**85.** Paşê hûn; ev ên han (piştî vê soza we dayî, we soza xwe nebire serî;) hûn hev dikujin û hin ji we yên din ji mal û warên wan dertînin -digel ku deranîna wan ji mal û warên wan li we heram bû jî- ku bi gunehkarî û neheqî hûn (û hevbendên xwe) li hember wan piştgiriya hev dikin. Eger bi esîrî bi bal we ve hatin jî, hûn (ji bo rizgarkirina wan) di ber wan de gerewê (fîdyê) didin (da ku hûn fermana Tewratê bicih bînin). Erê ma vêca hûn îmanê bi hinekî ji kitêbê tînin û hinekî jî mandele dikin. Êdî ji we cezayê kesên ku wisa bikin, di jiyana vê cîhanê de her riswatî ye û roja qiyametê jî bi bal ezabê herî dijwar ve hûnê bên vegerandin. Xwedê ji tiştên ku hûn dikin qet ne bêxeber e.

**86.** Ha ew ên hatin salixdan, ew ên ku li şûna axretê jiyana dinyayê kirîne. Êdî li ser wan ezab nayê sivikkirin û arîkariya wan jî nayê kirin.[3]

---

1 Zanayên cihûyan ji xelkê xwe re digotin: Îmanê bi Muhemmed neyînin. Lewra eger em îmanê pê neyînin jî, em ji heft rojan pê ve di êgir de namînin û bi vî awayî xwe dixapandin.

2 Zanayên cihûyan ji xelkê xwe re digotin: Îmanê bi Muhemmed neyînin. Lewra eger em îmanê pê neyînin jî, em ji heft rojan pê ve di êgir de namînin û bi vî awayî xwe dixapandin.

3 Ev ayetên pîroz rewşa cihûyan a 'ecêb û xeternak dide nîşan. Berî îslamiyetê li Medînê sê qebîle cihû

**87.** Sond be; me Kitêb daye Mûsa! Me piştî wî pêxember li dû hev şandin. Me mûcîze dan Îsayê kurê Meryemê û me bi riya Canê Pak (Cebraîl) jî piştgiriya wî kir. Erê ma ev çi hal e; çi dema pêxemberek ji we re bê ku ne li gorî dilê we be, hûn li hemberî wî quretiyê dikin; vêca hûn hinekan ji wan înkar dikin û hinekan jî dikujin.

**88.** (Cihûyan ji tinazan ve) Gotin: "(Em ne hewceyî gotinên te ne;) dilê me (ji van gotinan) tijeye."Na! Belkî ji ber kufra wan Xwedê lanet li wan barandiye û kêm ji wan baweriyê tînin.

**89.** Çi dema ji cem Xwedê kitêbek ku ya di destê wan de jî rast didêra bi bal wan ve hat û berê jî wan li hemberî kafiran arîkarî dixwest (da ku bi ser bikevin), vêca çi dema ew heqîqeta ku wan pê dizanî ji wan re hat, ew mandele kirin, êdî laneta Xwedê li wan kafiran be![1]

**90.** Ew çi tiştekî pîs e ya ku xwe pê firotine; ji çavnebarî ew wehya ku Xwedê ji kerema xwe, ji bendeyên xwe yên ku divê re hinartî înkar dikin. Vêca wan xezeb li ser xezebê heq kir û teqez ji van kafiran re ezabekî riswaker heye.

**91.** Dema ji wan re tê gotin: "Bi ya ku Xwedê nazil kiriye bawerî bînin." Dibêjin: "Em bi ya ku ji me re hatiye şandin bawerî tînin." Ew ji bilî wê yên din mandele dikin. Hal ev e ku Qur'an heq e û ya ku bi wan re ye jî rast didêre. (Ya Muhemmed!) Bibêje: Eger hûn bera (bi Tewratê) bawermend bûn, naxwe çima we berî niha pêxemberên Xwedê dikuştin?!

**92.** (Gelî cihûyan!) Sond be, Mûsa bi mucîzeyên eşkere ji we re hat. Piştî hingê (ku ew çûbû civîna xwe ya Tûrê) we golik ji xwe re kire îlah û bi vî awayî we neheqî li xwe kir.

**93.** (Gelî zaroyên Îsraîl!) Bînin bîra xwe, wexta me soz ji we wergirt û me Çiyayê Tûr bi ser we de rakir. (Me got) ya me daye we bi xurtî bigirin û guh bidinê. Gotin: "Me gotina te seh kir û me bi gotina te nekir". Bi sedem kufra wan, hezkirina golikê di dilê wan de hatebicihkirin. (Ji wan re) Bibêje: "Eger birastî hûn bawermend in vêca ev a ku baweriya we li we ferman dike çiqas xerab e!"

**94.** (Ji wan re) Bibêje: "Eger axret (bihişt) li cem Xwedê ji bo we tenê be; ne ji bo mirovên din be, naxwe eger bera hûn rast dibêjin de mirinê bixwazin."

**95.** Ew ji ber gunehên ku berê bi destên xwe kirin dê hîç mirinê nexwazin. Xwedê bi zaliman dizane.

---

hebûn; Qureyzî, Qeynuqa û Nedîr bûn. Her yekî ji van, digel hevalbendên xwe yê muşrik ku ew jî Xezrec û Ews bûn bi bi yên din re şerdikirin; hevdû dikujtîn û ji welatê hev derdixistin. Deme yek bi esîrî dihate ber destê wan, vêca ew di hemberî fidyê de azad dikirin. Dema ji wan re dihate gotin ev çî ye? Hûn hev dikujin, ji welatê hev derdixin û paşê fidye didin û azad dikin. Dibêjin: Ma em çi bikin, emrê Xwedê ev e.

1 Di wê dema ku Pêxmberê me (s) hatî şandin de li Erebistanê, nexasim li dorhêla Medînê gelek cihû hebûn. Wan ji ereban re digot; di nêzîk de pêxemberek dê were şandin. Lê wan hêvî dikir ku dê ji cihûyan bê şandin. Vêca dema dîtin ku ji ereban hate şandin ji çavnebarî îman pê neanîn. Ji ber vê yekê, Qur'an di vê dabaşê de bibîr tîne ku wan pir ayetên Tewratê guherandin û soza ku bi Xwedê re dabûn, neanîne cih.

**96.** Sond be; tu (hey Muhemmed) dê bizanî ku cihû ji her kesî bêhtir li ser jiyana vê dinyayê bi rijd in û ji wan ên ku (ji Xwedê re) şerîkan çêdikin jî her yek ji wan dixwaze ku hezar salî bijî. Rewş ev e: Jîna (hezar salî) tu kesî ji ezabê Xwedê dûr nake. Xwedê, bi karên ku ew dikin bîner e.

**97.** (Ya Muhemmed!) Bibêje: Kî, dijminê Cibrîl be bila baş bizanibe ku misoger Cibrîl bi destûra Xwedê Qur'an nazil kiriye ser dilê te ku ew kitêbên beriya xwe rast didêre û ji bo bawermendan rêber û mizgîn e.

**98.** Kî dijminê Xwedê, firîşte û pêxemberên Wî be û dijminê Cîbrîl û Mîkaîl be, bêguman Xwedê jî dijminê kafiran e.

**99.** Bi rastî me ayetên eşkereker ji bo te hinartin û ji yên fasiq pê ve tu kes wan înkar nake.

**100.** Çendî ku bi misogerî soz didin, hinek ji wan wê sozê di ser guhê xwe re diavêjin, belkî pirên wan bawerî nayînin.

**101.** Çi dema ji cem Xwedê pêxemberek ji wan re dihat ku kitêba li ber destê wan jî rast didêre; komek ji yên ehlî kitab, her wekî ku nizanibin, wan kitêba Xwedê diavêt pişt guhê xwe û dev jê berdidan.[1]

**102.** Wan (cihûyan) derbarê hukimdariya Suleyman de dane dûv ya ku şeytanan digot. Hal ev e ku Suleyman kafir nebûbû lê belê şeytan kafir bûbûn ku xelk fêrî sêrbaziyê û ya ku li Babîlê ji Harût û Marûtî re hatibû, fêrî mirovan dikirin. Hal ev e ku herduyan (Harût û Marût) kes fêrî sêrbaziyê nedikirin heyanî negota: "Em bi xwe îmtîhan in;" êdî (bi fêrbûna sêrê) hûn kafir nebin".Vêca ji herduyan ya ku pê jin û mêr ji hev vediqetandin fêr dibûn. Ew sêrbaz eger ku ne bi destûra Xwedê (û teqdîra wî) be nikarin bi tu awayî zerarê bidin xelkê. Ew, ya ku ziyanê dide wan û bi kêrî wan nayê fêr dibûn. Birastî wan dizanibû kesê ku wê bikira, di axretê de jê re tu par tune ye. Eger ew zanibin; ya ku xwe pê firotine çiqas pîs e.

**103.** Eger wan (cihûyan) îman (bi Qur'anê) bianiya û wan hay ji (fermanên) Xwedê hebûya (ew ê bihatina xelatkirin). Eger bizanibin, bêguman xelata ku ji cem Xwedê ye (ji bo wan) çêtir e.

**104.** Gelî bawermendan! (Ji pêxember re) nebêjin raîna; bibêjin unzurna, bi gotina Xwedê bikin, teqez ji bo kafiran ezabekî dijwar heye.[2]

---

1 Bi qasî ku ji van ayetên pîroz tê zanîn, cihû di nava xwe de çar beş in.

Yekem: Ewên ku baweriyê bi Tewratê tînin û hukmên wê tetbîq dikin. Ew pir hindik in.
Duyem: Ewên kı li ser ehd û soza xwe nemane û neqencî kirine, mebest ji ayetê jî ew in.
Sêyem: Ewên ku nezan in û nizanin ka çi dikin.
Çarem: Ewên ku zendîq in, wekî ku bi Tewratê emel dikin xwe nîşan didin, lê bi eksa wê dikin. Yanî, dilê wan û devê wan yek tiştî nabêje.

2 Dema Pêxamber (s) we'zek li sehabiyên xwe dikir, jê re digotin: „Raîna" yanî xwe li me bigire. Lê belê ev kelîmeya „Raîna" di zimanê cihûyan de bi maneyeke kirêt bi kar dihat. Gava ku cihûyan gotina mislimanan bihîstin wan jî bi "Raîna" ya ku bi wê watê bû bi Pêxmberê me re dipeyivîn. Ji ber vê yekê Xwedê ew bêje, li bawermandan qedexe kir û ji wan re got: Di şûna 'Raîna' de hûn Ûnzûrna ya ku bi maneya lez meke, li hêviya me bisekine, bi kar bînin. Bi vê yekê cihû jî dê nikaribin li hember Pêxmber vê peyvê bikarbînin.

**105.** Ne ew kafirên xwedankitêb û ne jî yên muşrik, ew naxwazin ku hîç qenciyek ji cem Xwedayê we, bi ser we de bê. Xwedê kê bivê ji dilovaniya xwe re terxan dike. Bi rastî Xwedê xwediyê qenciya mezin e.[1]

**106.** Em tu ayetê heyanî ku em yeke ji wê çêtir yan jî yeke mîna wê neyînin, em hukmê wê ayetê ji rewacê ranakin û em wê nadine jibîrkirin. Ma tu nizanî ku bi rastî Xwedê li ser her tiştî qadir e.

**107.** Ma tu nizanî ku (hukm û îdareya) erd û asîmanan her ji Xweda re ye. Ji Xwedê pê ve ji bo we ne dost û piştevan ne jî arîkarek heye.

**108.** Yan jî, ka çawa beriya we pirs ji Mûsa dihate kirin, ma hûn jî dixwazin ji pêxemberê xwe pirsan bikin? Kî îmanê bide bi kufrê, bi rastî wî rêka rast winda kiriye.

**109.** Gelek ji yên ehlî kitab (cihû û fileh) piştî ku heq ji wan re bi temamî eşkere dibe jî, ji çavnebariya xwe dixwazin we ji baweriya we vegerînin û we bibin ser kufrê. Vêca di wan derbas bibin û çavê xwe ji wan bigirin, heyanî ku Xwedê fermana xwe bişîne. Bêguman Xwedê li ser her tiştî qadir e.

**110.** Bi rengê pêdivî nimêj bikin, zekatê bidin û hûn çi xêrê ji bo xwe li pêşiya xwe bişînin (axretê), teqez hûn ê bêkêmasî wê li nik Xwedê bibînin. Bêguman Xwedê bi karên ku hûn dikin bîner e.

**111.** (Yên ehlî kitab) Gotin: “Ji bilî kesên ku cihû yan jî fileh bin tu kes dê neçe bihiştê. Ev gotina hanê xweziyên wan e. (Ya Muhemmed! ji wan re) Bibêje: “De ka delîla xwe bînin eger bi rastî hûn rast dibêjin.”

**112.** Nexêr, ya ew dibêjin ne wisan e! Kî berê xwe bide Xwedê û ew qencîkar be, vêca muheqeq xêra wî li cem Xwedayê wî ye; ne tirs li ser wan heye ne jî ew xemgîn dibin.

**113.** Cihûyan got: “Fileh ne li ser tu dînî ne. Filehan jî got: “Cihû ne li ser tu dînî ne.” Hal ev e ku herduyan jî kitêb dixwendin. Her wiha ew ên ku zanîna wan (bi kitêbê) nebû jî mîna gotina wan digotin. Êdî Xwedê der heqê ya ku li serê li hev nedikirin de, ew ê roja qiyametê di navbera wan de ferman bike (dê wan ji hev safî bike).

**114.** Ma ji wî kesê ku nahêle di mizgeftên Xweda de navê Wî bête hildan û ew ê ku ji bo wêrankirina mizgeftan dixebite zalimtir kî heye? Ev ên hanê, heqê wan ew e ku bêtirs nikaribin bikevine mizgeftan! Ji bo wan li dinyayê riswayî û li axretê jî ezabekî mezin heye.

**115.** Rojhilat û Rojava milkê Xwedê ne. Vêca (di nimêjê de) çi cihê hûn berê xwe bidinê ew qibleya ku Xwedê emrê we pê kiriye. Bêguman Xwedê qencîfireh e, zana ye.

---

1 Nesix, di ferhengê de bi ma‘na rakirin û jêbirin tê. Ereb dibêjin:“سخت الشمس الظ” “tavê sî rakir û bir.” Her wiha bi ma‘na veguhastina ji cihekî bi bal cihekî dîtir ve ye. Wek numûne:“نسخت الكتاب“ Min ji kitêbekî tiştên tê de veguhastin kitêbeke din. Nesix, di navlêka şer‘î de rakirina hukmekî ji rewacê yan guherandina hukmekî bi yekî din. Bi kurtî mirov dikare wiha bibêje: “Rakirina hukmekî şer‘î bi delîleke şer‘î ye.” Delîla li ser nesxê ev ayeta jêrîn e.

**116.** (Cihû, fileh û mişrikan) gotin: "Xwedê ji xwe re zaro girtine." Haşa! Xweda ji wan tiştan pak û munezzeh e. Belkî çi tiştên li erd û asîmanan hene her yên Wî ne, hemû jê re li ber fermanê amade ne.

**117.** Ew e afirînerê erd û asîmanan. Dema ku Ew bivê tiştekî biafirîne, tenê jê re dibêje: "Çêbibe!" Vêca ew jî çêdibe.

**118.** Ew ên ku zanîna wan (bi kitêbê) nebû digot: "Ma çima Xwedê bi me re napeyive, yan jî mûcîzeyekê (li ser pêxemberiya te) ji me re nayîne." Her wiha yên beriya wan jî mîna peyva wan digot. Dilê wan mîna hev in. Bêguman me ji bo civateke ku bawer dike, ayetên xwe eşkere kirine.

**119.** (Ya Muhemmed!) Bêguman me tu bi dînê heq (bi delîl û mûcîze) şand ku tu mizgînber û hişyarker î. Tu yê ji rewşa dojehiyan ne berpirsiyar bî.

**120.** Ne cihû ne jî fileh heyanî tu nedî pey dînê wan ew qet ji te qayîl nabin. Bibêje: "Bêguman rêberiya rast tenê rêberiya Xwedê ye." Piştî zanîna ku ji te re hatiye; eger tu bidî pey hewesên wan, sond be; li hember Xwedê ji bo te ne xwedî û piştevanek, ne jî arîkarek heye.

**121.** Ew ên ku me kitêb daye wan û bi duristî wê dixwînin, ha ew baweriyê pê tînin. Çi kesê wê înkar bike, vêca yên di ziyanê de ew bi xwe ne.

**122.** Gelî zaroyên Îsraîl! Ew qencî û kerema ku min li we kiriye bînin bîra xwe. Bêguman min hûn di ser xelkê (dema we) re girtibûn.

**123.** Xwe ji tengezariya rojeke wisa biparêzin ku tê de kes ji ber kesî ve nayê cezakirin, ji ber tu kesî ve gerew nayê qebûlkirin, mehderî ji bo tu kesî feydê nade û ji bo tu kesî arîkarî nayê kirin.

**124.** Bênin bîra xwe; dema Xweda, Îbrahîm bi çend gotinan îmtîhan kir. Vêca Îbrahîm di cih de ew gotin bikar anî. (Xwedê ) Got: "Bêguman ez ê te ji bo mirovan bikim rêber (û pêşewa)." (Îbrahîm) got: "(Xwedayê min!) Ji zuriyeta min jî." Xwedê got: "Soza min (a rêberîyê) nagihîje mirovên stemkar.

**125.** Dema Me Ka'be ji mirovan re gerand cihê lêvegerîn û lihevkombûnê û me ew gerand êminahî û ewlegehî; Me ji mirovan re got: "Hûn jî meqamê Îbrahîm ji xwe re bikin ibadetgeh. Me ferman li Îbrahîm û Îsmaîl kir ku hûn ê mala min ji bo tewafkaran, î'tîkafkaran, rukû'karan û secdekaran paqij bikin."[1]

**126.** Wê dema Îbrahîm got: "Xwedayê min! Vê derê bike bajarekî aram û êmin û niştecihên wê, ew ên ku bi Xweda û roja axretê bawerî anîn bi texlîtên fêkiyan risqdar bike." Xweda got: "Kesê kafir bibe ez ê li dinyayê risqê wî bidimê û demeke kurt wî pê biçêjînim, paşê (bi sedem kafiriya wî) ez ê wî bikêşim azara êgir." Ew çi pîs war e!

**127.** Bênin bîra xwe; dema Îbrahîm û Îsmaîl hîmên Beytê bilind kirin (û gotin:) "Xwedayê me! Ji me qebûl bike, bêguman her Tu yî, yê bihîzer yê zana."

**128.** "Xwedayê me! Me herduyan ji bo xwe radest bike û ji zuriyeta me umeteke

1 Di ayetê de "meqamê Îbrahim" derbas bû. Meqamê Îbrahîm, çiqas cihê ku Îbrahîm lê rawestiya ye ku ew tevekê meşairan e. Mîna tewafê, sa'yê, sekna erefatê, sekna muzdelifê, cemerat, qurban û yên mîna van ji menasikên heccê.

musilman derîne, rê û nîşanên hecê nîşanî me bide û tobeya me qebûl bike. Bêguman her Tu yî yê tobepejrên yê dilovîn."

**129.** "Xwedayê me! Ji zaroyên me re pêxemberekî ji nav wan bişîne ku ayetên te ji wan re bixwîne, wan fêrî Kitêb û hîkmetê bike û wan (ji guneh û şirkê) paqij bike. Bêguman her Tu yî yê 'Ezîz ê Ḥekîm.[1]

**130 .** Ma ji yê aqilsivik pê ve kî berê xwe ji dînê Îbrahîm vedigerîne? Sond be; Me ew li cîhanê (bi pêxemberî) bijartiye û bêguman ew di axretê de jî teqez ji yên havildar û yên bikêrhatî ye.

**131.** Dema Xwedayê wî jê re got: "Misliman bibe!" Got: "Ez radestî ber fermana Xwedayê alemê bûm".

**132.** Îbrahîm wesiyeta dînê heq li zarokên xwe kir û Yaqûb jî (got;) "Ey zarokên min! bêguman Xwedê ev dîn (îslam) ji bo we hilbijartiye. Naxwe li serê bijîn û li serê bimirin."

**133.** Yan jî ma hûn di dema mirina Yaqûb, li cem wî hazir bûn, dema ji zarokên xwe re got: "Hûn ê piştî min ji kê re îbadetê bikin?" Gotin: "Em ê îbadetê ji Xwedayê te re û ji Xwedayê bav û bapîrên te Îbrahîm, Îsmaîl û Îshaq re bikin ku ew Xwedayekî bi tenê ye û em jê re berdest in.

**134.** (Gelî cihûyan!) Ew umetek bûn, hatin û çûn. Ya ku wan bi dest xistiye ji wan re ye û ya ku we bi dest xistiye ji we re ye. Hûn ji ya ku wan kiriye ne berpirsyar in.

**135.** (Cihû û filehan ji mislimanan re) got in: "Bibin cihû yan jî bibin fileh, hingê hûn ê bi ser riya rast ve bibin." Bibêje: "Nexêr, wisa nîn e, belkî em ê bidin pey dînê Îbrahîm ku ew ji baweriyên xelet parastî bû û ew ji muşrikan jî nebû."

**136.** Bibêjin: "Me bi Xwedê û bi ya ku ji me re hatî, bi ya ku ji Îbrahîm, Îsmaîl, Îshaq, Yaqûb û neviyên wî re û bi ya ku ji Mûsa û Îsa re û bi ya ku ji pêxemberên din re, ji nik Xwedayê wan hatî şandin, bawerî anî. Em tu ferqê naêxin navbera yekê ji wan û em tenê radestî ber fermana Xwedê bûne."

**137.** Eger ew jî (ehlî kitêb) mîna yê ku we bawerî pê anî baweriyê bînin, vêca bi rastî ew li ser riya rast in. Na! Eger ew berê xwe biguherînin, ew her di rêşaşiyê de ne. Êdî Xwedê li hember wan besî te ye. Her Ew e, yê bihîzer ê zana.

**138.** Xwe bi dînê Xweda birengînin (angu bi îslamê bigirin da hûn bi reng û nîşanên îslamê bên naskirin). Ma ji dînê Xweda (nîşan û rengên Xweda) çêtir û delaltir çi heye? Em her jê re îbadetê dikin.

**139.** (Ya Muhemmed!) Bibêje: "Ma hûn derbarê Xwedê de bi me re dikevin nîqaşê? Hal ev e ku Ew hem Perwerdegarê me hem jî Perwedegarê we ye. (Cezayê) ya ku em dikin ji me re ye û (cezayê) ya ku hûn dikin ji we re ye. Rewş ev e: Em bes ji bo Xweda îbadetê dikin û hevpişkan jê re çênakin.

---

1 'Ezîz: Ew ê ku tevekê wateyên serdestiyê jê re ne. Serdestiya quwetê; vêca yê wî têk bibe tune. Serdestiya nehêlanê; îcar ne hewceyê tu kesî ye. Serdestiya têkbirin û serkeftinê; naxwe bê destûra wî tu tişt xwe naleqîne. Me di ayetê de bi "serkeftî û desthelat" ma'ne kiriye.
Ḥekîm: Ew ê ku her tiştî di cihê wê de datînê û di tedbîra wî de tu kêmasî û şemitandin tune ye. Di ayetan de me bi "karbinecih"î ma'ne kiriye

**140.** (Gelî yên ehlî kitêb!) "Ma hûn bi rastî dibêjin ku Îbrahîm, Îsmaîl, Îshaq, Yaqûb û neviyên wan cihû yan jî fileh bûn? Bibêje: "Ma hûn bêhtir dizanin an jî Xwedê? Ma ji wî kesê ku rastiyê vedişêre zalimtir kî heye? Muheqeq Xwedê ji ya ku hûn dikin ne bêxeber e.

**141.** Ew umetek bûn, hatin û çûn. Ya ku wan bi dest xistiye ji wan re ye û ya ku we bi dest xistiye ji we re ye. Hûn ji ya ku wan kiriye ne berpirsyar in.

**142.** Ji mirovan ên bêaqil wê bibêjin: "Ma çi tiştî, berê wan ji qîbleya wan a ku berê li ser bûn, dagerand? Bibêje: "Rojhilat û rojava (herdu jî) milkê Xwedê ne. Ew, kî bivê berê wî dide bal riya heq ve."[1]

**143.** Her wiha me hûn kirin umeteke weset (navinc) da ku hûn li ser mirovan bibin şahid û Pêxember jî li ser we bibe şahid. Me berê te ji wê qîbleya ku tu berê li ser bûyî guherand da ku em bizanin ka kî yê bide pey pêxember û kî yê bi paş ve (li kufrê) bizivire. Çendî ku ev berguherandin (ya ji Qudsê bi bal Ke'bê ve) giran be jî, lê belê ji bo wan ên ku Xwedê riya rast nîşanî wan daye teqez ne giran e. Bi vê fermanê Xweda ne ew e ku nimêja we (ya ku we berê xwe dabû Qudsê) winda bike. Bêguman Xwedê Reûf e, Rehîm e.

**144.** (Ya Muhemmed!) Bi rastî em dibînin ku berê te ber bi esmanan ve digere (bi hêviya ku Ke'be bibe qîble). Êdî teqez em ê berê te vegerînin ser qîbleyeke ku tu pê qayîl î. Naxwe berê xwe bizivirîne aliyê mizgefta pîroz (Ke'bê). Hûn li ku dibin bibin êdî berê xwe ber bi Ke'bê ve bizivirînin. Bêguman ên xwedankitêb baş dizanin ku ev (berzivirandin) ji cem Xwedayê wan e û heq e. Xwedê ji ya ew dikin teqez ne bêagah e.

**145.** Sond be, eger tu her celebê ayetan (ku ji bo te rastdêr bin) ji yên ehlîkitab re bînî; dîsa jî ew dê berê xwe nedin qîbleya te û tu jî ne ew î ku berê xwe bidî qîbleya wan. Hin ji wan jî dê berê xwe nedin qîbleya yên din. Eger piştî wehya ku ji te re hatî, tu bidî pey hewesên wan, bêguman wê demê teqez tu ji stemkaran î.

**146.** Ew ên ku me kitêb dayî wan, çawa ku zarokên xwe nas dikin her wisa wê (guherandina qibleyê) jî nas dikin. Bêguman komek ji wan digel ku dizanin jî heqiyê vedişêrin.

**147.** (Ev guhertina qîbleyê) heq e, ji cem Xwedayê te ye. Vêca nebe ji yên bişik û biguman!

**148.** Ji bo her umetekê qîbleyek heye ku ew (di nimêjê de) berê xwe didinê, vêca di qenciyê de bi hev re pêşbaziyê bikin. Hûn li ku dibin bibin, Xwedê dê we tevan

---

1 Dema Pêxember hîcretî Medînê kir, mislimanan şanzdeh-hivdeh mehan berê xwe dane Qudsê û nimêj kirin. Lê belê ev yek bû sedem ku cihû di ser xwe ve biçin û li nav xelkê bibêjin: "Muhammed û hevalên xwe nizanin ka qibleya wan ku der e; me rê şanî wan da ye. Vêca Pêxember (s) berê xwe da asîmanan û li ber Xwedayê xwe geriya ku qibleya îslamê bi xwe nîşanî wan bide. Êdî piştî vê duaya pêxember, fermana îlahî ji wan re hat ku berê xwe ji Qudsê bi bal Ke'bê ve vegerînin. Vêca ev ayet di wê behsê de nazil bû.

bîne heşrê (da ku her yek cezayê xwe wergire). Bêguman Xweda li ser her tiştî qadir e.[1]

**149.** Çi cihê tu pê de biçî seferê (di nimêjê de) berê xwe bide aliyê Mizgefta Heramê. Bêguman ev ji cem Xwedayê te fermaneke heq e ku ji bo te hatiye. Xwedê ji ya ku hûn dikin ne bêagah e.

**150.** Kîjan cihê tu pê de herî seferê (di nimêjê de) berê xwe bide aliyê Mizgefta Heramê. (Gelî umetê) hûn jî li ku derê dibin bibin (li ser nimêjê) berê xwe bidin aliyê Mizgefta Heramê da ku hênceta mirovan (ku bikarin li hember we bi kar bînin) li ser we pêk neyê. Tenê yên ku neheqiyê dikin vê (wekî delîl) li hemberî we bi kar tînin. Naxwe hûn ji (gotinên) wan netirsin! Tenê ji min bitirsin da ku ez qenciya xwe ya li ser we temam bikim û da ku hûn riya rast bibînin.

**151.** Her wiha me pêxemberek ji nav we ji bo we şand da ku ayetên me ji we re bixwîne, we (ji qirêja şirkê) paqij bike, we hînî Qur'an û hîkmetê bike û we fêrî ya ku hûn pê nizanin bike.

**152.** Naxwe hûn (bi îbadetkirinê) min di bîr bînin da ku ez jî (bi efûkirinê) we di bîr bînim. Şêkiriya min bikin û li pêşberî min nankoriyê mekin.

**153.** Gelî yên ku bawerî anîne, pişta xwe bi sebr û nimêjê xurt bikin. Bêguman Xwedê digel sebirkêşan e.

**154.** Ji wan ên ku di riya Xwedê de hatine kuştin re nebêjin: "Ew mirî ne!" Nexêr, ew sax in, lê belê hûn pê nahisin û tê nagihîjin.

**155.** Sond be; em ê bi hinekî ji tirsê û birçîbûnê, bi kêmkirina mal û can û kêmkirina mêweyên we, we îmtîhan bikin û mizgînê bide sebirkêşan.

**156.** Ew sebirkêşên ku dema belayek tê serê wan, dibêjin: "Em hemû (bende)yên Xwedê ne û em ê li wî jî vegerin."

**157.** Ha ew ji Xwedayê wan rehmet û dilovanî li wan dibare û ew, ên ku li ser rêka heq rasterê bûne.

**158.** Bêguman Sefa û Merwe ji nîşanên Xwedê ne. Naxwe kî bi sedema Hecê yan jî bi sedema Umrê here seredana Beytê, li serê tu guneh nîn e ku di navbera herduyan de sa'yê bike (di navbera wan de here û were). Kî ji dilê xwe bixwaze qenciyekê bike, bêguman Xwedê şukirdar e, zana ye.

**159.** Bêguman ew ên ku delîl û ayetên me yên ronker ên ku me ji mirovan re hinartî piştî ku me di kitêbê de (di Tewrat û Încîlê de) eşkere kirin vedişêrin, ha ew Xwedê lanetê li wan dibarîne û yên lanetkar jî lanetê li wan dibarînin.

**160.** Tenê wan ên ku tobe kirin, xwe sererast kirin û heqî (ya veşartî) eşkere kirin, ji lenetê xelas bûne. Ha ez tobeya wan qebûl dikim û Ez im her yê tobepejrên yê dilovîn.

---

1 Ji bo her umetekê qibleyeke wê heye ku di îbadetî de berê xwe didinê. Ev qible ji şerai'ên Xwedê ne. Ew di rewş û zemanan de li gorî xelk û dînan tê guhartin. Armanc ne berêdana qiblê ye, armanc; pêşbirkiye di ta'et û qenciyê de ye, di teqwadarî û nêzikîya bal Xwedê ve ye.

**161.** Bêguman ew ên ku kafir in û li ser kufrê mirine, leneta Xwedê, ya firîşte û mirovan tev li ser wan be!

**162.** Ew ê heta bi hetayê tê de bimînin, ne ezab li ser wan tê sivikkirin ne jî (bi çavê merhemetê) li rûyê wan tê nêrîn.

**163.** (Gelî mirovan!) Xwedayê we Xwedayekî tek û tenê ye. Ji Wî pê ve tu Xweda nîn in. Ew e yê Reḥman yê Reḥîm.

**164.** Bêguman di xulqandina erd û asîmanan, di guherîna şev û rojê de, di keştiyên ku ji bo feydeya însanan li ser deryayê dikişin û di wê baranê de ya ku Xwedê ji asîmanan dibarîne -vêca bi wê baranê erda ku berê ji bêavî hişk bûbû bi hêşînahiyê vedijîne- û di her cureyên jîndaran de ku li rûyê erdê belav bûne û di tevgera ba û ewrên fermanber ên di navbera erd û asîman de, helbet ji bo qewmekî bîrewer re nîşan û delîl hene.

**165.** Hinek mirov hene ku ji bilî Xwedê jê re hevta û havalan çêdikin û mîna ku ji Xwedê hez dikin ji wan jî hez dikin. Belê ew ên ku bawerî anîn ji wan bêhtir ji Xwedê hez dikin. Eger ew ên ku zulim kirine dema ku ezabê dibînin bizanibûna, (dê yeqîn bikirina) ku hêz hemû ya Xwedê ye û ezabê Wî jî pir dijwar e.

**166.** Hingê, pêşrew xwe ji peyrewên xwe dûr dixin û hingî herdu alî jî ezabê dibînin û her wiha destê wan ji hev diqetin.

**167.** Yên dûvketî dibêjin: "Xwezî careke din em vegeriyana dinyayê, vêca wekî ku ew vêga xwe ji me dûr dikin, me yê jî xwe ji wan dûr bikira!" Ha wisa Xwedê kar û kiryarên wan dide rûyên wan, li ser wan dike derd û xem, dibe kul û poşmanî û ew qet ji êgir dernayên.[1]

**168.** Gelî mirovan! Ji tiştên helal û pak ên li ser erdê bixwin û nedin pey şopên şeytên. Bêguman şeytan ji we re neyarekî eşkere ye.

**169.** Bêguman ew (şeytan) bes neqencî û nelirêtiyê dide ber we da ku hûn wê bikin û da li ser navê Xweda ya ku hûn pê nizanin bibêjin.

**170.** Dema ji wan re tê gotin: Bidin pey ya ku Xwedê nazil kiriye, dibêjin: "Na! Em ê bidin pey tiştê ku me bav û bapîrên xwe li serê dîtiye." Erê ma ku bav û bapîrên wan bi tiştekî tênegihijin û ne li ser rêka rast bin jî?

**171.** Rewşa kafiran dişibe rewşa wî kesê ku ji gazî û qîrînê pê ve tiştekî din nabihîze û dîsa jî dizire. Ew ker in, lal in û kor in, vêca ew têngihijin.

**172.** Gelî yên ku bawerî anîne! Ji wî risqê pak û helal ê ku Me daye we bixwin, vexwin û şukrê Xweda bikin, eger birastî hûn ji bo wî tenê bendetiyê dikin.

**173.** Bêguman Xwedê bes goştê heywanên mirarbûyî, xwînê, goştê berêz û ya ku ne

---

1 Mirovên ku li dinyayê li pey şopa hin kesan diçin û qet nafikirin ku ew rêya ew tê de diçin, şaş e; ew ê bi çavên xwe bibînin ku li axretê ew rêber dê zû xwe ji wan dûr bikin û li wan dê nebin xwedî. Lê wê çaxê pêşrew û peyrew dê ezabê çetîn bibînin. Wê hingî ew ê fêm bikin. Lê belê ew neşên xwe ji êgir xilas bikin. Vêca peyrewên xapiyayî dê bipeyivin, lê peyivîna wan dê karekî nede wan. Lewra wan li cîhanê şansê xwe ji destê xwe berdaye. Êdî nema keysa wan li pêşrewan tê. Naxwe divê mirov li dinyayê şareza be û beriya ku çav bi rojeke wiha çetîn bikeve, divê binêre ka li dûv kê diçe û hevaltiya kê dike!

li ser navê Xwedê hatibe şerjêkirin, li we heram kiriye. Lê kî ji mecbûrî, ne bi niyeta heramxwarinê û ne zêdeyî hewcedariya xwe bixwe, guneh li serê tune ye. Bêguman Xweda gunehjêbir e, dilovîn e.[1]

**174.** Bêguman ew ên ku tiştê Xwedê di kitêbê de hinartî vedişêrin û bi erzanî difroşin, ha ew ji êgir pê ve tiştekî din naxwin. Roja qiyametê Xwedê bi wan re napeyive û wan paqij nake û ji wan re azareke jandar heye.

**175.** Ew ên hanê, ew kes in ku wan rasterêyî daye bi rêşaşiyê û lêborîna gunehan daye bi azarê, vêca ma çiqas ew bêhnfireh in li ser (azara) êgir?!

**176.** Ev (ezab), ji ber wê ye ku bêguman Xwedê kitêb (Qur'an) bi heqî nazil kiriye (dîsa jî ew tê de ketin gumanê û bawerî pê neanîn). Bêguman ew ên ku di der barê kitêbê (Qur'anê) de ketine îxtîlafê, helbet ew di nakokiyeke dûrî heqiyê de ne.[2]

**177.** Qencî, hema ne ew e ku hûn berê xwe bidin rojhilat an rojava. Lê belê qenciya esasî ew e ku mirov bi Xwedê, bi roja axretê, bi firîşteyan, bi kitêban û bi pêxemberan bawerî bîne û ji bo qayîliya Xweda malê xwe bide xizmên xwe, bide sêwî û xizanan, bide rêwî û parsekan û bide koleyan û paşê nimêja xwe bi tekûzî bike, zekatê bide û ew ên çaxê soz dan bi soza xwe re wefadar in û di wextê xizanî, naxweşî û cengê de bêhnfireh in. Ha ew in yên rast û durist û ew bi xwe ne yên teqwadar.

**178.** Gelî yên ku bawerî anîne! Di kuştinê de, qisas li ser we hatiye ferzkirin; mirovê azad bi yê azad e, kole bi yê kole ye û jin bi jinê ye. Lê belê her kî ku ji aliyê birayê xwe ve were efûkirin (hingî qisasiyet dikeve), êdî (xwediyên kuştî) divê li hemberî kujerî bi rindî tev bigerin û pêwîst e kujer jî bi rindî xwîna wan bide. Ev ji cem Rebbê we, ji bo we barsivikî û qenciyek e. Êdî kî (ji xwediyên kuştî) di piştî qebûlkirina xwînê de (bi ser kujerî de) êrîşê bike vêca ji bo wî azareke jandar heye.[3]

**179.** Gelî aqilmendan! Ji bo we di pêkanîna qisasê de jiyan heye, hêvî heye ku hûn wê biparêzin (û derbarî wê de xemsar nebin.)

**180.** Dema yek ji we bikeve ber mirinê, eger malekî li dûv xwe bihêle, li ser we hatiye ferzkirin ku bi awayekî ma'rûf (bi edaletî) ji dê û bavên xwe û ji xizmên xwe re wesiyet bike. Ev wesiyet di stûyê yên mutteqî de heq e.

---

1 Mecbûriyet di Îslamê de tune ye. Lê belê zerûret heye û heramiyê ji holê radike. Mirovê ku ji ber sedemekê ku ne di dest wî de ye mecbûr bimîne tiştekî heram bixwe, yan jî karekî ne helal bike, bi şertê ku ji tixûb nebihure û wî helal jî nedêre, vêca bi qasî zerûretê dikare bixwe û di vî halî de jê re guneh jî tun e.

2 Haxamên cihûyan salixên Pêxamberê me yên ku di Tewratê de hatibûn gotin veşartin û di hember vê kirina xwe de ji xwe re pere wergirtin. Van ayetan qala vê bizava wan a kirêt kiriye û nakokiya nava wan aniye zimên.

3 Qaîdeyeke bingehîn a îslamê ev e: Cizayê sûcdarî ji cinsê kirina wî lê tê birîn. Mirovê ku bi qesd yekî bikuje, eqil qebûl nake ku cizayê hepsê lê were birîn. Mirovê ku yek kuştibe, yan ew ê were kuştin yan jî dê pere bide û were sirgûnkirin. Lê nayê hepiskirin. Bi rastî di îslamê de cihê efûyê jî pir mezin û girîng e. Heke mêrkuj ji aliyê xizmên kuştî ve were efûkirin, ji kuştinê xilas dibe, lê divê xwîna kuştî bide. Di vê ayeta pîroz de behsa vî aliyî jî hatiye kirin.

**181.** Êdî çi kesê piştî ku ew bihîst wê biguherîne, gunehê wê di stûyê yê ku ew guhertî de ye. Bêguman Xwedê bihîzer e, zana ye.

**182.** Her kî ku ji meyla wesiyetkerî ya bi aliyê neheqiyê ve û ji meyla wî ya bi aliyê gunehkariyê ve endîşe bike, vêca di navbera wan (wesiyetker û mîratxweran) de sulhê bike, teqez li ser wî tu guneh nîn e. Bêguman Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

**183.** Gelî yên ku bawerî anîne! Rojîgirtin, çawa li ser umetên beriya we hatibû ferzkirin, her wiha li ser we jî hatiye ferzkirin; da ku hûn (bi rojîgirtinê) xwe (ji ezabê Xweda) biparêzin.

**184.** Li ser we hatiye ferzkirin ku hûn çend rojên bijimar rojî bigirin. Êdî kî ji we nexweş be yan jî rêwî be bila bi qasî rojên ku (di nexweşî û rêwîtiyê de xwariye), di rojên din de rojî bigire. Ew kesên ku (ji pîrîtî û nexweşiyê) nikarin rojî bigirin, divê ji ber her rojekê ve gerewê bidin; ku (ji ber her rojekê ve) xwarinê bide belengazekî. Êdî kî ku bi dilê xwe zêdetir bide vêca ew jê re çêtir e. Eger hûn (digel zehmetiyan jî) rojî bigirin, êdî ew ji we re çêtir e eger hûn bizanin.

**185.** Meha Remezanê, ya ku Qur'an tê de hatiye şandin ayetên wê ji mirovan re rêber in û ji bo veqetandina heq ji batilî delîlên eşkere ne. Êdî kî ku ji we ev meh bi ser de hat bila di vê mehê de rojî bigire. Çi kesê (ku di van rojan de) nexweş be yan jî rêwî be (rojiya xwe jî tê de negirtibe) bila bi qasî wan rojên ku di wan de rojî negirtiye, di rojên din de bigire. Xwedê (bi vî hukmî) ji bo we rihetiyê dixwaze zehmetiyê naxwaze û da ku hûn (meha Remazanê) bêkêmasî bigrin û da ku hûn Xwedê mezin bidêrin ji ber ku hûn rasterê kirin û da ku hûn Xwedê bişêkirînin.

**186.** (Ya Muhemmed!) Dema evdên min pirsa min ji te kirin; bêguman ez pir nêzîkî wan im, çi dema ew gazî min bike, muheqeq ez di hewara wî de têm. Naxwe, bila evdên min guhdariya min bikin û bila bi min bawerî bînin da ku ew bi ser rêka rast ve bibin.

**187.** Di şevên rojiyê de çûyîna nivînên jinên we li we hatiye serbestkirin. Ew ji bo we cil in (kêmasiyên we vedişêrin), hûn jî ji bo wan cil in. Xwedê bi we dizanî ku hûn xwe nagirin û (bi çûna nivînên wan) hûn ê bêbextiyê bi xwe re bikin, vêca Xwedê toba we qebûl kir û li kêmasiyên we bihurî. Êdî ji vir û pê de herin nivîna hevserên xwe û ya Xweda ji bo we nivîsî jê bixwazin. (Bi şev) heyanî ku tayê spî ji tayê reş (sibeh ji şevê) kifş bibe, bixwin û vexwin. Piştî şefeq da, rojiyê bidomînin heyanî êvarê. Dema hûn bi qesda î'tîkafê (îbadetkirinê) li mizgeftan bin, qet neçin nivînên hevserên xwe. Ev sînorên (qedexeyên) Xwedê ne, vêca ji van sînoran neborin! Her wiha Xwedê ayetên xwe ji mirovan re eşkere dike da ku ew xwe biparêzin.[1]

---

1 Di serê pêşî de gava rojî li ser misilmanan ferz bû, paşîv tune bû. Mirovê ku rojî bigirta, dema fitara xwe vedikir, nimêja eşayê dikir û heya raketa dixwar. Jê û pê de xwarin û çûna nivîna jinan heram bû. Lêbelê hin misilmanan xwe nedigirt û diçûne nivîna jinên xwe. Hinek ji wan jî piştî fitarê pir westiyayî bûn, di cih de dirazan û bêxwarin diman. Ji ber birçîbûnê ji xwe ve diçûn û ji hal diketin. Vêca Xwedayê Reḥman li ser vê yekê li misilmanan hate rehmê û ev ayeta pîroz hinart.

**188.** Malên hev di navbera xwe de bi neheqî nexwin û pê xwe negihînin fermandaran ji bo ku hûn hinekî ji malên mirovan bi gunehkarî û şadezorî bixwin, digel ku hûn dizanin guneh e jî.

**189.** (Ya Muhemmed!) Der heqê heyvê de ji te dipirsin. Bibêje: Ew ji bo mirovan û bi taybetî ji bo hecê pîvanên demî ne (meriv bi wan roj û meh û salên xwe dijimêrin). Qencî, ne ew e ku hûn ji aliyê paş ve bikevin xaniyên xwe, lê qencî ew e ku mirov hay ji (emr û nehyê) Xwedê hebe. Di derî re bikevin xaniyên xwe û hay ji ferman û qedexeyên Xwedê hebin da ku hûn rizgar bibin.[1]

**190.** (Gelî bawermendan!) Di rêka Xwedê de, li hember ên ku bi we re şer dikin, şer bikin û zinhar zêdegaviyê mekin! Bêguman Xwedê ji stemkaran hez nake.

**191.** Hûn li ku rastî wan (ên ku li hemberî we şer dikin) hatin, wan bikujin û ji cihê ku wan hûn jê derxistine, wan derbixin. Fitne ji kuştinê xerabtir e. Heta ku ew li Mizgefta Heramê şerê we nekin, hûn bi wan re şer nekin. Êdî eger ew (li wê derê) bi we re şer bikin, hûn jî şerê wan bikin. Her wiha ye cezayê kafiran.

**192.** Eger ew dev ji vê (herba bi we re) berdin, êdî bêguman Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

**193.** Heta ku fitne nemîne û heta ku dîn bi tevayî nebe ji bo Xwedê, bi wan re şer bikin. Vêca eger dev ji fitnê berdin, îcar ji bilî stemkaran dijminatî li hemberî tu kesî nîn e.

**194.** Meha heramê (ya ku birêz û hurmet e û şer tê de heram e) bi meha heramê ye (;eger ew di wan mehan de bi we re şer bikin û hurmeta wê bişikînin hûn jî bi wan re şer bikin). Di binpêkirina qedexeyan de tolvekirin heye. Êdî kî êrîşî ser we bike, bi qasî êrîşa ku aniye ser we, hûn jî êrîşê bibin ser wî. Hay ji ferman û qedexeyên Xwedê hebin û bizanin ku Xwedê bi teqwadaran re ye.

**195.** (Gelî mumînan!) Malên xwe di riya Xwedê de xerc bikin, xwe bi destên xwe navêjin xeterê û di her hal û karên xwe de qenciyê bikin, bêguman Xwedê ji qencîkaran hez dike.

**196.** Ji bo Xwedê Hec û ‘Umrê bi tekûzî pêk bînin. Eger hûn (bêyî îradeya xwe) ji wan bêne astengkirin, vêca ji wan heywanên ku dibine qurban hûn çi karibin hûnê qurbanekê bidin. Heta ku qurban negihîje cihê xwe (û neyê serjêkirin) porê xwe kur mekin (ji îhraman dernekevin). Êdî kî ji we nexweş be, yan jî di serê wî de nexweşiyek hebe (ku di îhraman de porê xwe kur bike), divê ji bedêlê ve rojî bigire yan sedeqeyekê bide yan jî qurbanekî şerjêbike. Dema hûn (ji dijminên xwe) ewle bûn, vêca ew kesê bixwaze heyanî rojên Hecê ji ‘Umrê sûdê wergire, divê qurbaneke ku jê re hêsan be, serjê bike. Kesên ku nikaribin qurbanekê serjêbikin, bila sê rojan li hecê û heft rojan jî dema vegeriyan malê,

---

1 Ji pêxemberê me hikmeta heyvê pirsî bûn; ku serê pêşî tenik dertê, dûv re her diçe mezin dibe, paşê jî dibe heyva çardehşevî û dîsan tenik dibe û winda dibe. Piştî windabûnê dîsa ji nû ve tê der. Bersiva ku di vê ayetê de hatiye dayîn; ev lebata hîvê ya di vî awayî de bi kêrî hesabkirina sala qemerî (heyvî) û bi taybetî jî bi kêrî zanîna rojên hecê tê. Dabaşeke din jî ev bû: berê dema ereban ihramên hecê li xwe dikir yan jî ji hecê dizîvirîn, ne di derî ve, lê di paş ve diçûn malên xwe û ev yek xêr dizanîn. Vêca vê ayetê ev helwesta wan eşkere kir ku şaş e.

bi tevayî deh rojan, rojî bigirin. Ev a ku hatiye gotin ji bo wan kesan e ku malbatên wan ne li dorhêla Mizgefta Heramê ye. Hay ji mafê Xwedê yê li ser xwe hebin û bizanin ku ezabê Xwedê pir dijwar e.

**197.** Hec di hin mehên melûm de ye, kî ku di wan mehan de (bi wergirtina îhramê) hecê li ser xwe ferz bike, êdî bila nêzî nivîna jina xwe nebe, ji riya Xwedê dernekeve û gengeşî û pevçûnê neke. Hûn çi xêrê bikin Xwedê pê dizane. Ji bo çûna hecê (da ku hûn hewceyî kesî nebin) qûtê rê amade bikin, vêca birastî jî qûtê herî rind teqwadarî ye (ku meriv qûtê axretê amade bikê). Gelî aqilmendan, xwe ji ezabê min biparêzin.

**198.** Li ser we tu guneh nîn e ku hûn ji Xwedayê xwe (bi rêka bazirganiyê) kerema Wî bixwazin. Êdî dema hûn ji Erefatê kişiyan vêca li Meş‘erul Heramê (Muzdelîfê) zikrê Xwedê bikin. Çawa Xwedê hûn serwext kirin her wisa Wî bi bîr bînin. Çendî ku berê hûn rêwindayî bûn (û we nedizanî hûn ê çawa hecê bikin).

**199.** Paşê, ka çawa mirov (ji Muzdelîfê) diherikin Mînayê, hûn jî (bi wan re û mîna wan) biherikin wê derê. Ji Xwedê lêborîna (gunehên) xwe bixwazin; bêguman Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

**200.** Dema we heca xwe temam kir, çawa ku hûn bav û bapîrên xwe bi bîr tînin -hê ji wê jî bêhtir- Xwedayê xwe bi bîr bînin (ango bangezarê Xwedayê xwe bin). Vêca hin mirov hene ku dibêjin: “Xwedayê me! Li dinyayê (para me) bide me.” Rewş ev e ku di axretê de ji bo wî tu par nîn e.

**201.** Hin jî hene ku dibêjin: “Xwedayê me! Li dinyayê qenciyê û li axretê jî qenciyê bide me û me ji azara êgir biparêze.

**202.** Evên ha! Ji bo wan ji tiştên ku bi dest xistine parek heye. Teqez hesabdîtina Xwedê pir bilez e.

**203.** Di çend rojên bijimar (her sê rojên piştî eydê) de Xwedê (bi tekbîr û tesbîhan) dibîr bînin. Vêca kî ku di du rojan de lez bike (da ku ji Mînayê vegerê Mekkê) tu guneh li serê nîn e û kî ku dereng jî bimîne (roj^n xwe temam bike) tu guneh li ser wî jî nîn e. Ev e, ji bo wî kesi ye ku ji Xwedê ditirse. Hay ji emr û nehyê Xwedê hebin! Agahdar bin, birastî jî hûn hemû dê bi bal Wî ve bên komkirin.

**204.** Ji mirovan hin (munafiq) hene ku gotinên wan di bara jiyana dinyayê de te ecêbmayî dihêle û li ser a di dilê xwe de Xwedê dikin şahid. Hal ev e ku ew dijwartirîn dijmin in.

**205.** Dema ew kes pişta xwe dide te, li ser erdê digere da ku tê de xerabiyê bike û da ku çandinî û neslê jî wêran bike. Xwedê ji tevlihevî û wêrankirinê hez nake.

**206.** Dema jê re bête gotin: Ji Xweda bitirse; ji ber gunehên ku kiriye xweperestî û pozbilindîya cehaletê pê digire û ew berê wî didin ser gunehkariyê. Vêca dojeh besî wî ye û ew çi pîsecih e!

**207.** Hin mirov hene ku ji bo qayîlkirina Xweda canê xwe didin. Rewş ev e; Xwedê ji bo bendeyên xwe pir dilovîn e.

**208.** Gelî yên ku bawerî anîne! Hûn hemû û tev bi hev re misliman bibin û nedine pey gavên şeytên! Bêguman ew ji bo we neyarekî eşkere ye.

**209.** Êdî, eger piştî delîlên eşkere ji we re hatin hûn ji rê derkevin, vêca bizanin ku bêguman Xwedê serdest e, hekîm e.

**210.** Ma ew (înadkarên kafir) li bendê ne ku Xwedê û firîşte di nav siyên ewran de werin û fermana Xweda (bi ezabdayîna wan) temam bibe û encama her kar û barî bi bal Xwedê ve vegere.

**211.** Ji zaroyên Îsraîl bipirse, ma me çend ayetên eşkere û ronker dane wan? Piştî ku ayetên me jê re hatin, kî ku nîmetên Xwedê (dînê heq bi kufrê) biguherîne, vêca bi rastî ezabê Xwedê pir dijwar e.

**212.** Jiyana dinyayê ji bo kafiran hatiye xemilandin û henekên xwe bi bawermendan dikin. Hal ev e ku yên teqwadar, roja qiyametê di ser wan re ne. Xwedê kê bivê bêhesab risq didiyê.

**213.** Mirov, berê (li ser baweriya tewhîdê) yek umet bûn. Vêca Xwedê pêxember bi mîzgînberî û hişyarkerî şandin û bi wan re jî kitêb bi heqî şandin da ku di navbera mirovan de, li ser a bi hev ketin, hukim bikin. Di rastiya vê heqiyê de kes neket îxtîlafê, ji bilî yên ehlê kitêb; piştî nîşanên eşkere ji wan re hatin ji çavnebarî ew ketin îxtîlafê. Li ser vê yekê, Xwedê bi destûra xwe ew heqîya ku li serê li hev nedikirin, bi bawermendan da serwextkirin. Xwedê, kî bivê berê wî dide riya rast.

**214.** Erê ma heta tiştê hatî serê xelkên beriya we neyê serê we ji we weye hûn ê herin bihiştê? Wisa xizanî û tengasî bi ser wan de hat û ew wisa rahejiyan ku Pêxember û yên ku pê re bawerî anîbûn, gotin: "Ma arîkariya Xwedê dê kengê ji bo me bê?" Agahdar bin! Bêguman arîkariya Xwedê pir nêzîk e.[1]

**215.** Ji te dipirsin; ka (di rêka Xwedê de) ew ê çi înfaq bikin? Bibêje: "Xêra ku hûn didin; ew ji bo dê û bavan, lêzim û sêwiyan, belengaz û rêwiyan e. Hûn çi xêrê bikin, bêguman Xwedê pê dizane.

**216.** Her çiqas bi we ne xweş be jî şerkirina (di rêya Xwedê de) li ser we hatiye ferzkirin. Pêkan e hûn tiştekî nevên û ew ji bo we baş be, pêkan e hûn hez ji tiştekî bikin û ew ji bo we xerab be. Xwedê dizane û hûn nizanin.

**217.** Di bara şerê di Şehru'l-Heramê de ji te dipirsin. Bibêje: Şerê di wê mehê de gunehekî mezin e. Lê belê vegerandina mirovan ji riya Xweda, mandelekirina Xweda, astengkirina (xelkê ji) serdana Ka'bê û deranîna xelkê ji Mekkê, gunehên van li cem Xweda mezintir e. Muheqeq fitne ji kuştinê mezintir e. Eger hêza wan têrê bike ew ê her şerê we bikin heta ku we ji dînê we vegerînin. Kî ji we ji dînê xwe vegere û li ser kufrê bimire; vêca ha ew kar û kiryarên wan li dinya û axretê pûç bûne. Ha ew xelkê dojehê ne û heta hetayê ew ê tê de bimînin.

1 Di vê ayeta pîroz de toreyeke bênimûne heye. Ji bo mislimanan li cîhanê û axretê rêya serkeftinê ev e: Divê îmanê bînin, bi eşq û şewq hewl bidin, bixebitin, li hemberî tengasî û nexweşiyan têbikoşin, guhên xwe nedin kêf û zewq û sistiyê û ji şeytanê lanetî xwe dûr bigirin. Yanî ji muminan re dibêje, "Gelî mislimanan! Heta ku karesat neyên serê we, heta ku hûn bedêlê nedin, hûn dê bi ser nekevin û hûn ê neçin bihiştê."

**218.** Bêguman ew ên ku bawerî anîn û yên ku koçber bûn û di rêka Xwedê de cîhad kirin; ha ew dilovaniya Xwedê hêvî dikin. Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

**219.** (Ya Muhemmed!) Di bara Mey (eraq) û qumarê de ji te dipirsin. Bibêje: Di herduyan de jî gunehekî pir mezin heye û ji bo mirovan hin feyde jî hene. Lê belê gunehê herduyan jî ji feydeya wan mezintir e. Dîsa ji te dipirsin ma (di riya Xwedê de) em çi bidin? Bibêje: Yê zêdeyî pêdiviyên xwe (bidin). Bi vî awayî Xwedê ayetên xwe ji we re eşkere dike da hûn bifikirin.[1]

**220.** Di dinya û axretê de (her çi ji bo we baş e bifikirin û li gorî wê tevbigerin). Di bara sêwiyan de ji te dipirsin. Bibêje: Sererastkirina kar û barên wan û perwerdekirina wan (ji dûrketina wan) çêtir e. Eger hûn (bi malê xwe) tevlî malê wan bibin, vêca (bizanin) ku ew birayên we ne. Xwedê dizane ka kî avaker e, kî xerabker e. Eger Xwedê bixwesta dê zor û zehmetî li we bikira. Bêguman Xwedê ‘Ezîz e, Ḥekîm e.

**221.** (Gelî mislimanan!) Jinên muşrik, heta ew îmanê neyînin bi wan re nezewicin. Qerwaşeke bawermend ji jineke muşrik çêtir e, çendîn ew li xweşa we jî biçe. Keçên xwe jî li mêrên muşrik mehr nekin heya ku ew baweriyê neyînin. Koleyekî bawermend ji muşrikekî çêtir e; çendîn ew li xweşa we jî biçe. Ew gazî bal êgir ve dikin. Xwedê jî bi destûra xwe gazî bal bihişt û lêborînê ve dike, ayetên xwe ji mirovan re eşkere dike da qene bi bîr bînin.

**222.** (Ya Muhemmed!) Di bara heyzê (bênimêjiya jinan) de ji te dipirsin. Bibêje: Ew (bênimêjiya jinan) ezyet e. Di dema heyzê de xwe ji (çûna nivîna) jinan dûr bigirin û heya ku ew jê paqij nebin nêzîkî wan mebin. Dema ew jê paqij bûn (û xwe şûştin), êdî çawa ku Xwedê li we ferman kirî herin nivîna wan. Bêguman Xwedê ji yên gelek tobekar hez dike û ji yên xwe paqij dikin jî hez dike.

**223.** Jinên we ji bo we cihê zêdebûna kinêsa we ne, vêca hûn (di cihê kinêsê de) çawa dixwazin wisa herin cem jinên xwe û ji bo pêşeroja xwe (karên baş) pêşde bixin. Bi pêkanîna fermana Xweda xwe ji ezabê wî biparêzin û bizanin ku hûn ê muheqqeq herin huzûra Xwedê. Mizgîniyê bide bawermendan (ku padaşa wan bihişt e)!

**224.** Sonda xwe ya bi Xwedê nekin hêncet û mehne ji bo ku hûn qencî û teqwadariyê nekin û xelkê li hev neyînin. Xwedê bihîzer e, zana ye.

**225.** Xwedê di sondên we yên bêhemdî (bêqesdî) de li we nagire. Lê belê ji ber sondên ku we ji dil xwariye, li we digire. Xwedê gunehjêbir e, berbihêr e.

**226.** Ji bo wan kesên sond dixwin ku ew dê neçin nivîna jinên xwe, çar meh muhlet heye. Vêca eger ew (di vî mudetî de li jinên xwe) vegerin, êdî bêguman Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

---

1 Mey/eraq, heram e. Dibe ku di dan û standina wê de ji hin kesan re hin feydên wê yên ticarî jî hebin. Lê belê hemin zerara wê ji fêdeya wê pirtir e. Wiha reng e qumar jî ji bo kesê ku qezenc kiriye feyda wê heye lê ji bo kesê ku jê çûye jî, zerara wê pir mezin e. Ji ber vê yekê qumar jî heram bûye. Birastî dema ev ayeta pîroz nazil bû, gelek mislimanan dev ji meyê berdan, lê hinekan hêjî vedixwar, lewra bi awayekî binbir nehatibû heramkirin. Lê belê dema ku ayeta “Sûreyê Maîde ya 90-91ê” hat, vêca ew bi tevahî û bi awayekî binbir heram kir, vêca misilmanan yekser dev jê berdan.

**227.** Eger biryara berdanê bidin, êdî bêguman Xwedê bihîzer e, zana ye.

**228.** Jinên ku (ji mêrê xwe) hatine berdan, pêwîst e ew sê deman xwe bigirin (ango sê bênimêjî yan jî sê paqijiyan bibînin, paşê ew dikarin bizewicin). Eger ew (jin) birastî baweriyê bi Xwedê û roja qiyametê tînin, qet ne durist e wî tiştê ku Xwedê di malzaroka wan de afirandiye veşêrin. Di vî mudetî de (berî sê bênimêjî yan sê paqijî biqedin) ji mêrên wan re bêhtir heq heye ku wan (li xwe) vegerînin, eger ku lihevhatinê bixwazin. Ka çawa mafên mêran li ser jinan heye her wisa hin mafên jinan jî bi rindî li ser mêran heye û ji mêran re di ser wan re dereceyek heye. Xwedê serdest e, karbinecih e.

**229.** Berdan (ya ku lêvegerîn pêkan e) du car in. Êdî; yan bi qencî li cem xwe hiştin e yan jî bi rindî berdan e. (Gelî mêran!) Ew malê ku we (bi mehr û xeynî wê jî) dayî wan li we ne helal e ku hûn ji wan bistînin. Lê belê ew mêr û jinên ku ji pêkneanîna tixûbên Xwedê bitirsin, ew tiştekî din e. Gelî bawermendan! Eger hûn endîşe bikin ku dê jin û mêr sînorên Xwedê pêk neyînin, vêca tu guneh li ser herduyan nîn e ku jin tiştekî bide mêrê xwe û xwe jê bide berdan. Ev tiştên ku hatine gotin tixûbên Xwedê ne. Zinhar wan binpê mekin! Kî ji tixûbên Xwedê derbas bibe, vêca ew stemkar bi xwe ne.

**230.** Vêca eger mêr, jinê berde, êdî li wî ne helal e (ku dîsa wê mehr bike) heyanî ku (ew jin) bi mêrekî din re nezewice. Eger wî (mêrê duyem jî) ew berda, êdî tu guneh li ser herduyan nîn e ku dîsa li hev vegerin, bi şertê wan bawerî anîbe ku ew ê tixûbê Xweda bicih bînin. Ev tixûbên Xweda ne, Xweda ji bo qewmekî ku dizanin û têdigihîjin, wan eşkere dike.

**231.** (Gelî mêran!) Dema we jin berdan û ew jî nêzî dawiya mudetê xwe yê çavnêriyê bûn, êdî yan bi rindî wan li cem xwe bigirin an jî bi rindî wan berdin. Ji bo ku hûn dest dirêjî mafên wan bikin bi zordestî wan li cem xwe negirin. Çi kesê wisa bike êdî bi rastî zilmê li xwe dike. Ayetên Xwedê pêlîstok nedêrin. Nîmeta Xwedê ya ku li ser we ye û kitêb û hîkmeta ku ji bo we nazil kiriye ku pê şîretan li we dike bi bîr bînin. Hay ji ferman û qedexeyên Xwedê hebin û bizanin ku bêguman Xwedê bi her tiştî dizane.

**232.** Dema ku we jin (bi kêmtirîn sê telaqan) berdan û wan jî civanê xwe temam kir, êdî dema ew û mêrên xwe di navbera xwe de bi rindî, (bi mehreke nû) li hev bizivirin, astengiyê dermexin. Ev a ha, ji we yê ku bi Xwedê û roja axretê bawerî tîne, ji bo xwe dike pend û şîret. Eger hûn vê şîretê bigirin (û nebin asteng ji bo wan) teqez ji bo we her çêtir û paqijtir e. Xwedê dizane û hûn nizanin.

**233.** Dayîkên (ku hatine berdan) bila heya du salên tekûz şîr bidin zarokên xwe, ev rewş ji bo wan dê û bavan e ku bixwazin dema şîrdayînê temam bikin. Li gorî me'rûfî (şerîet û adetan), bi qencî cil û xwarina dayîkan li ser bavê zarokan e. (Lewra) her kes tenê li gorî hêza xwe tê binbarkirin. Divê dayîk zerarê li ser zaroka xwe nebîne û bav jî ji ber zarokê zerar lê newê. Eynî wekî vê, li ser mîratxwerê bavê zarokî jî ev maf heye (piştî berdana diya wî ku bavê wî bimire divê warisên bavê zarok wê wezîfeyê bicih bînin). Eger dê û bav, herdu, bi hev bişêwirin; li hev bên û bixwazin zarok ji şîr vekin, vêca tu guneh li ser herduyan

tune ye. Eger hûn bivên (ji bilî dayîka wî) bi jineke din bidin mijandin jî, tu guneh li ser we tune ye dema ku hûn heqê wê yî diyarkirî bi qencî bidinê. Xwe ji pêkneanîna (fermanên) Xwedê biparêzin û bizanin ku bêguman Xwedê bi karên ku hûn dikin bîner e.

**234.** Ew ên ku ji we dimirin û li pey xwe jinan dihêlin, ew (jin) dê bi xwe (di mala mêrê xwe de) çar meh û deh rojan bisekinin. Çaxê dema xwe ya xwegirtinê temam kirin, li ser we (weliyê jinan) tu guneh nîn e ku hûn destûra wan bidin ku ew li gorî adetê karê xwe bikin (da bêne xwestin û bizewicin). Xwedê ji karên ku hûn dikin agahdar e.

**235.** (Gelî mêran!) Der heqê zewaca jinên jinebî de tu guneh li ser we tune ye ku hûn (beriya iddetê wan temam bibe) daxwaza xwe di ber wan re biavêjin, yan jî di dilê xwe de bihêlin. Xwedê zanî ku hûn ê ji wan re bibêjin (ku dilê we li ser wan e), lê belê ji bilî ku ji wan re gotineke biusûl bibêjin, soza hevdîtineke bi dizî nedin wan. Heta ku iddetê wan temam nebe wan mehr mekin. Bizanin ku bêguman Xwedê bi ya di dilên we de dizane. Naxwe jê bitirsin û agahdar bin ku bêguman Xwedê gunehjêbir e, berbihêr e.

**236.** Eger (piştî ku we ew mehr kirin) hîn ku we dest nedabe wan an jî we mehra wan diyar nekiribe, hûn jinan berdin, li ser we ne pêwîst e ku hûn mehrê bidin wan. Di vê rewşê de (bi tiştekî ji malê xwe) wan dilxweş bikin. Bila kesê destfireh (dewlemend) li gorî halê xwe û kesê desteng (ê xizan) jî li gorî halê xwe, dayîneke li gorî me'rûfê (Xweda pê razî), bide wan. Ev qenciya bi rindî di stûyê mirovên qenc de deynekî misoger e.

**237.** Eger beriya ku hûn biçine nivîna wan hûn wan berdin û bi rastî jî we mehra wan diyar kiribe, wê çaxê hûn ê nîvê mehra diyarkirî bidin wan. Lê belê eger jin li mehra xwe bibore, yan jî ew mêrê ku peymana mehrê di dest wî de ye lê bibore (ku tevahiyê mehrê bide jinê) ew tiştekî din e. Eger hûn lê biborin, ew bêhtir nêzî teqwayê ye. (Gelî muminan!) Di navbera xwe de qencîkariyê ji bîr mekin! Bêguman Xwedê bi ya ku hûn dikin bîner e.

**238.** (Gelî mislimanan!) Li ser kirina nimêjan û (nexasim) li ser nimêja navîn miqate bin. Bi guhdarî û bi tirs bi ber Xwedê ve rabin piyan.

**239.** Eger hûn bitirsin, peya yan jî siwar nimêj bikin. Dema hûn (ji tirsê) ewle bûn, her wekî ku Xwedê ya ku berê we nedizanî bi we daye zanîn, wisa jê re nimêj bikin.

**240.** Ji we, ew mêrên ku bimirin û li dûv xwe jinebîyan bihêlin, bila wesiyet bikin ku heta salekê ew jinên wan di malên wan de bikarin jiyana xwe bidomînin. Êdî eger ew bi xwe ji mala mêrê xwe derkevin, hingê ji ber wan tiştên ku ew bi rindî ji bo xwe bikin tu guneh ji we re nîn e. Xwedê serdest e, karbinecih e.

**241.** Ji bo jinên ku hatine berdan, heqê wan e ku bi rindî (bi cil û bergan, xwarin û pêxwarinê) bên havildarkirin. Ev yek wezîfe ye li ser wan ên ku hay ji ferman û qedexeyên Xwedê hene.

**242.** Bi vî awayî Xwedê ayetên xwe ji we re eşkere dike da ku hûn bifikirin û têbigihîjin.

**243.** Ka ji min re bêje: Ma ew ên ku ji tirsa mirinê ji welatên xwe derketin digel ku hejmara wan bi hezaran bû, te nedîtin? Xwedê ji wan re got: "Bimirin" (ew jî mirin), piştre ew sax kirin. Bêguman Xwedê li ser mirovan xwedîkerem e. Lê belê piraniya mirovan vê naşêkirînin.[1]

**244.** Di riya Xwedê de şer bikin û bizanin ku birastî Xwedê bihîzer e, zana ye.

**245.** Ma kî ye ew ê ku deynekî rind bide Xwedê (li ser feqîr û hejaran qenciyê bike), da ku Xweda jî wî deynî qat bi qat jê zêdetir lê vegerîne? Ew ê ku kêm û zêde dike Xwedê ye û hûn ê her bi bal wî ve vegerin.

**246.** Ma te giregirên zaroyên îsraîliyan piştî Mûsa nedîtin ku çi kirin?! Dema wan ji pêxemberekî xwe re gotin: "Ji me re hukimdarekî bişîne (bila bibe mezinê me) da ku em di riya Xwedê de şer bikin." Ji wan re got: "(Ez ditirsim ku) eger şer li ser we ferz bibe ku hûn dê şer nekin!" Gotin: "Wekî ku em ji welatê xwe hatine deranîn û ji zarokên xwe hatine dûrkirin, ma çi li me bûye ku em ê di riya Xwedê de şer nekin?" Lê çi dema şer li ser wan hate ferzkirin, ji kêm kesan pê ve, yên din pişta xwe dane wan û vegeriyan. Xwedê bi stemkaran dizane.[2]

**247.** Pêxemberê wan ji wan re got: "Bêguman Xwedê Talût wekî hukimdar ji we re şandiye." Gotin: Digel ku em bêhtir layiqê hukimdariyê ne û digel ku ji aliyê mal û zengîniyê ve tu derfetên fireh jî ji bo wî nehatiye dayîn, dê çawa ew li ser me bibe hukimdar?! Pêxemberê wan got: "Bêguman Xwedê ew li ser we bijartiye û Xweda zanîneke zêde û gewdeyekî mezin dayê. Xwedê kê bivê fermandariya xwe dide wî. Xwedê bi qenciya xwe berfireh e, zana ye."[3]

**248.** Pêxemberê wan ji wan re got: "Bêguman nîşana hukimdariya wî ew e ku dê sindoq (ya ku Tewrat tê de ye) ji we re bê. Ji cem Xwedayê we, ji bo we dilxweşî û bermahiyeke hêja ji binemala Mûsa û Harûn tê de ne, firîşte wê hildigrin. Bêguman di vê de, ji bo we nîşan hene, eger birastî hûn xwedanbawer bin.

**249.** Çi dema Talût leşker ji bo cîhadê beş beş kirin; (ji wan re) got: "Birastî Xwedê dê we bi çemekî biceribîne. Êdî kî ji wî çemî vexwe, ew ne hevalê min e, kî jê venexwe birastî ew hevalê min e. Lê kesê misteke jê vexwe ew xem nake." Vêca ji wan, ji bilî kêm kesan, tevekan ji wî çemî av vexwar. Çi dema Talût û yên ku pê re bawerî anîbûn ji çemî derbas bûn, piraniya wan gotin: "Îro li hemberî

---

1 Ev kesên ku ayeta pîroz behsa wan kiriye civateke Îsraîliyan e ku hukmdarê wan gaziya cîhadê li wan kiribû. Ew ji tirsa ku yê di şer de bên kuştin, revîbûn. Vêca Xwedê ew heşt rojan mirî hiştin. Pişt re bi qebûlbûna duaya Pêxamberê wan, Xwedê ew dîsa sax kirin û ew heta demekê li jiyanê man. Îbnu Kesîr gotiye: Îbretek di vê rûdanê de heye ku tedbîr nikare ji bo qederê bibe asteng û ku ne bi bal Xwedê ve be, ji ber Xwedê tu star tune ye ku mirov xwe bide berê.

2 Bi navê „Emalîqe" milletek li navbera Misr û Filistinê dijiya û wan êrîş anî ser îsraîliyan, ew perîşan kirin û ji welatên wan kirin der. Navê mezinê Emalîqe Calût bû. Pêxamberê wan, bi navê "Talût" zilamek ji nav xelkê bijart û ew kir serdarê wan. Êdî wan ev yek rexne kir. Ev ayetên ku bên bi kurtî vê qiseyê rave dikin.

3 Talût, ne ji malbateke navdar bû, mirovekî rêncber û debaxkar bû. Lêbelê ji aliyê zanîn, bedewbûn û rewişt ve ji îsraîliyan tevan zanatir, exlaqxweştir û bedewtir bû.

Calût û leşkerên wî tu hêza me tune ye." Ew ên ku bawer dikirin ku ew dê herin ber destê Xwedê ji hev re gotin: "Gelek caran civatên hindik bi destûra Xwedê zora civatên pir biriye û Xwedê digel sebirkêşan e."[1]

**250.** Çi dema li qada şer derketin pêşberî Calût û leşkerên wî, gotin: "Xwedayê me! Sebrê li ser me birijîne, lingên me mikûm bike û li hemberî gelê kafir arîkariya me bike."

**251.** Êdî bi destûra Xwedê ew şikandin. Dawid, Calût kuşt. Xwedê hukimdarî û hîkmet da Dawid û ji ilmên ku (Xwedê ) dixwest pê dan zanîn. Eger Xwedê hin mirov neparastina û hin jê neanîna rê, helbet dê pergala ser erdê xerab bibûya. Lê belê Xwedê ji bo temamê alemê xwediyê kerema pir e.

**252.** (Ya Muhemmed!) Ew ayetên Xwedê ne, Em wan bi heqî ji te re dibêjin. Bêguman tu ji pêxemberan î.

**253.** Ew pêxember ên ku me hinek ji wan di ser ên din re girtine. Hin ji wan hene ku Xwedê bi wan re peyiviye û dereceyên hinekan jî bilind kirine. Me nîşanên eşkere jî dane Îsayê kurê Meryemê û me ew bi Canê Pak (Cebraîl) daye destekkirin. Eger Xwedê bixwesta, ew ên ku piştî delîlên eşkere ji wan re hatin, dê piştî pêxemberan şerê hev nekirbûya. Lê belê ew bi hev ketin; vêca hinek ji wan îman anîn û hinek ji wan jî kafir bûn. Eger Xwedê bixwesta helbet wan şerê hev nedikir. Lê belê Xwedê her çi bivê (wê) dike.

**254.** Hey gelî yên ku bawerî anîne! Beriya ku ew roj bi ser we de bê ku tê de ne bazar ne dostanî û ne jî mehderî heye, ji risqê ku me daye we (di riya Xwedê de) xerc bikin. Yên kafir, ew stemkar bi xwe ne.

**255.** Xweda ye, (yê ku) ji Wî pê ve tu îlah tun in, her sax e, her ragirê heyînê ye. Ne xew wî digire ne jî hênijîn. Her jê re ye tiştê li asîmanan û yê li erdê. Ji bilî yê ku wî destûr dabe ew kî ye (ku bêdestûra wî) li cem wî mehderiyê bike? Tiştê ku mirov dikin û tiştê ku kirine pê dizane. Ji ya ku wî xwestiye pê ve, kes bi tiştekî ji zanîna wî nizane. Kursiyê wî erd û esman di xwe de vehewandine. Parastina wan pê giran nayê û her ew e yê raser ê mezin.

**256.** Di (têxistina) dîn de zorî nîn e! Bi rastî serwextî (ya di dîn de) ji rêşaşiyê hatiye kifşkirin. Naxwe kî ku Taxûtî înkar bike û bi Xwedê baweriyê bîne, teqez wî

---

1 Sebr, mana wê a ferhengî; navê giyayekî pir tehl e. Di îstîlaha dînî de; xweragirtina li ser îbadetan, li ser nekirina gunehan û xweeragirtina li hember karesat û tengezariyan e. Bi sedema ku xweragirtin gelekî zehmet û tehl e, jê re sabir gotine. Lewra yê ku sebrê dikêşê tahliyê diqurpênê. Vêca ji ber ku sebir, di têkoşîna li hember kufr û zulmê de û ji bo serkeftin û gihiştina armancê pir girîng û pêdivî ye, Xwedê di Qur'ana Pîroz de nêzîkî 90 (not) ayetî de behsa sebrê kiriye, pesnê sebirkêşan daye û bi sebrê emrê me kiriye.

Sebir Sê Beş e

a) Li ser kirina îbadetî ji bo Xwedê divê mirov sebrê bikêşe da ku karibe ji hemû rexan ve û bi awayekî bêqusûr taetê Rebbê xwe ji stoyê xwe bike.

b) Li hemberê wan kar û barên ku Xwedê ew heramkirine, da ku karibe nefsa xwe -ya çilek û ya ku bi neqenciyê emir dike- ji wan vekêşe û hevsarê wê bixe destê xwe û ji dest xwe hîç bernede.

c) Li hember qeder û qezaên Xwedê ne, ew ên ku cansoj û xemnak in.

xwe bi qulpa saxlem (û asê) girtiye ku qetandin jê re nîn e. Xwedê bihîzer e, zana ye.[1]

**257.** Xwedê, dost û arîkarê wanên ku bawerî anîne. Wan ji tarîtiyên kufrê derdixîne bal ronahiya îmanê ve. Ew ên ku kafir in, dostên wan jî Taxût e, wan ji ronahiyê derdixîne bal tarîtiyan ve. Ha ew xelkê êgir in û heta hetayê lê dimînin.[2]

**258.** Ma te ewê, ji bo ku Xwedê milk û fermandarî dabû Îbrahîm çawa der heqî Xwedayê wî de pê re nîqaş dikir, nedît? Wê demê Îbrahîm jê re got: "Xwedayê min ew e ku sax dike û dimirîne". Wî jî got: "Ez jî sax dikim û dimirînim (vêca du mirov anîn, yek sax hişt yek jî kuşt). Îbrahîm got: "Bêguman Xwedê rojê ji rojhilat ve tîne rojava, de heydê tu jî ji rojava bîne rojhilat". Êdî yê kafir (ji ber vê gotinê bêdelîl û) behitî ma. Xwedê stemkaran rasterê nake.

**259.** Yan jî ma te nedît ew ê ku di ber bajarekî re derbas bû ku banê wî bi ser dîwarên wî de herifîbûn û got: "Gelo Xwedê dê çawa piştî mirinê wan sax bike?!" Di cih de Xwedê ew mirand, piştî sed salî dîsa ew sax kir û jê re got: "Tu çi qasî mayî?" Wî jî got: "Ez rojekê an çend demên rojê mame." Xwedê jê re got: "Na, tu sed salî mayî." De ka li xwarin û vexwarina xwe binêre hê jî xerab nebûye û de ka li kerê xwe jî binêre. Ji bo em te ji mirovan re bikin îbret, me sed salî tu li vir mirî hişt û dîsa tu sax kirî. De ka vêga jî li hestiyan binêre çawa em wan tînin ser hev û goşt li wan dikin." Çi dema heq jê ve xuya bû, got: "Ez bi yeqînî dizanim ku bêşik Xwedê li ser her tiştî qadir e."

**260.** (Erê ma te nedît), dema Îbrahîm jî ji Xwedayê xwe re got: "Xwedayê min, ka tu çawa miriyan sax dikî nîşanî min bide". Xwedayê wî jê re got: "Ma tu bawer nakî (ku ez dikarim miriyan sax bikim)?" Got: "Belê! Ez bawer dikim. Lê belê ji bo ku dilê min bi temamî aram bibe (min xwest bibînim!)." Vêca (Xwedê) jê re got: "Naxwe çar balindeyan bigire, wan bîne cem xwe, paşê (wan bigurîne, parçe bike), her parçeyekî ji wan deyne serê çiyayekî, piştre wan gazî cem xwe bike, ew dê bi lez bêne cem te. Bizanibe ku Xwedê birastî 'Ezîz e, Ḥekîm e.[3]

---

1 Ev ayeta pîroz bingeheke girîng ji me re eşkere dike. Di nav xelkê de -musilman û nemusilman- baweriyek xelet heye. Li gorî fikr û ramana wan îslam baweriya xwe bi darê zorê bi xelkê dide qebulkirin. Xeletiyên ku li ser navê îslamê bi destên hin musilmanên nezan xuya dibe, ev jî dibe arîkarî ji bo wan. Ya ku ew di fikirin û dibêjin ne rast e. Lewra; ayet bi eşkere û zelal dibêje "Di têxistina dîn de kotekî tun e", naxwe ya ew dibêjin îftîraye. Lewra rastî; îman û heqîqet ji rêşaşî û kufrê hatiye kifşkirin; kî bixwaze bila bawerî bîne û kî jî nexwaze bila kafir bimîne.

Lêbelê xeletiyeke din jî heye, ew jî eve, dibêjin, musilman ne lazime hukmên îslamê bicih bîne, her kes bi kêfa xwe ye, lewra;"di dîn de kotekî tune". Ev baweriyeke şaşe, merivê ku bibêje ez musilmanim lazime li gorî qeweta xwe, emr û nehyên îslamê tevekan bîne cih.

2 Di ayetê de bêjeya: "Taxût" derbas bû ku ew hem şeytan e, hem pût e, hem xirabî ye, hem nefsa însên e, hem arezûyên neçê ne, hem jî ew e ku bi nezanî mirov bi ya yekî bike ku ew dijî hukmên Xwedê be, çendî ku li ser navê dîn be jî.

3 Îbrahîm (a.s.) meraq kir ka çawa Xwedê mirîyan sax bike. Vêca ji Xwedayê xwe xwest ku nîşanî wî bide. Çawa ku di ayeta pîroz de bihûriye, Xwedê bi nimûneyeke maddî bersiva wî da. Lê belê awayê saxkirinê nîşanî wî neda. Ev nimûneyên ku ji peyxamberan re hatine ji bo wan mûcîze ne. Ya girîng ev e ku me ji dil bawerî hebe ku Xwedê misoger dê hemû xwedî-rûhan vejîne -nemaze- dê însên sax bike û bikişîne ber hesabê.

**261.** Rewşa wan ên ku malên xwe di riya Xwedê da xerc dikin wekî rewşa libek tov e ku heft simbil jê hêşîn dibin, di her simbilekî de jî sed lib hene. Xwedê ji bo kesên ku bivê, qat bi qat zêde dide wan. Xwedê (bi kerema xwe) berfereh e, zana ye.

**262.** Ew ên ku malên xwe di riya Xwedê de didin û piştî dayînê jî minetê nekin û eziyetê nedin; ji bo wan (roja qiyametê) li cem Xwedayê wan xelat heye. Ji bo wan tirs nîn e û ew xemgîn jî nabin.

**263.** Gotineke xweş û lêborîn, ji dayîna xêreke ku li dûv wê êşandin hebe çêtir e. Xwedê dewlemend e, berbihêr e.

**264.** Hey gelî yên ku bawerî anîne! Xêra sedeqeyên xwe bi minet û êşandinê pûç mekin. Wekî yê ku malê xwe bi riyakarî dide, lê di rastiyê de bi Xwedê û roja axretê bêbawer e. Vêca rewşa wî dişibe rewşa tehtekî ku li serê hinek ax hebe, êdî baraneke gur lê bibare (axê ji serê bibe), wê rût û hilû bihêle. (Ev ên wisa) ji karên ku kirin nikarin tiştekî bi dest bixin. Xwedê kafiran rasterê nake.

**265.** Rewşa yên ku malên xwe ji bo rizaya Xwedê û ji riza dilê xwe didin, wekî rewşa bostanekî ye ku li serê girekî be, baraneke gur lê bibare û ew berê (fêkiyê) xwe du qat bide. Eger baraneke pir lê neyê jî xunavek lê were têrê dike. Xwedê bi karên ku hûn dikin bîner e.

**266.** Erê ma yek ji we dixwaze ku baxçeyekî wî ji darxurme û mêwan hebe, tê de rûbar bikêşin û ji her celebên mêweyan tê de hebin, (ji aliyekî ve jî) kalîtî wî lawaz bike, ji aliyê din ve jî zarokên wî yên jar hebin; vêca bahozek rabe ku tê de agir hebe, îcar (bostanê wî) bişewitîne! (Helbet tu kes vê naxwaze). Her wiha Xwedê ayetên xwe ji we re eşkere dike da ku hûn bifikirin (û ji wan ders û îbretê bigirin).[1]

**267.** Hey gelî yên ku bawerî anîne! Ji pakê tiştê ku we bi dest xistiye û ji ya ku me ji we re ji erdê deraniye înfaq bikin. Ji bo xêrê berê xwe nedin yê bêxêr, ew ê ku eger ne ji şerma be hûn bi xwe wernagirin. Bizanin, bêguman Xwedê dewlemend e, hêjayê pesindayînê ye.

**268.** Şeytan bi xizaniyê we ditirsîne û bêemriyê (li hemberî Xweda) li we ferman dike. Xwedê jî ji nik xwe soza lêborîn û zêdedanê dide we. Xwedê (bi qenciya xwe) berfireh e, zana ye.

**269.** Xwedê, kê bivê hîkmetê dide wî û ji kê re hîkmet bê dayîn, bi rastî xêreke pir jê re hatiye dayîn. Ji hişmendan pê ve tu kes jê şîretê wernagire.[2]

**270.** Çi xerckirina ku hûn xerc bikin an çi nezra ku hûn bînin cih, muheqeq Xwedê pê dizane. Ji bo stemkaran tu arîkar nîn in.

---

1 Wekî ku ayeta pîroz bi awayekî şêrîn û bedew rave kir, malê dinyayê, meqam, cih û rûmet mîna bostanekî ye, ne diyar e ka kengê dê ji dest mirovî biçe. Pêwîst e mirov vê yekê hîç ji bîra neke!

2 Hikmet, ew xebardan yan jî ew xebata di cihê xwe de ku ne kêm be ne jî zêde. Wesfek ji yê Xwedê hekîm e. Kelamê wî jî muhkem e, ji her kêmasî û zêdeyiyê bilind û dûr e. Mebest bi yên ku pêşîn ji bo wan hikmet hatiye dayîn peyxamber in, lewra ew ne ji kîsê xwe xeber didin belkî ew bi wehyeke ji cem Xwedê xeber didin. Dûv re jî ew alimên ku bi ilmê xwe emel dikin, lewra ew jî ji Qur'an û sunnetê xeber didin.

271. Eger hûn sedeqeyên xwe eşkere bidin, ew çiqas rind e û eger hûn veşêrin û bi dizî bidin xizanan, ew ji we re hîn çêtir e. (Bi vî karê rind) Xweda dê gunehên we bibexşîne û Xwedê ji karên ku hûn dikin agahdar e.

272. (Ey pêxember!) Hîdayetkirina wan ne li ser te ye; lê Xwedê, kî bivê wî hîdayet dike. Hûn her çi xêrê bidin, ew ji bo we ye (hûn ê feydeya wê bibînin) û hûn çi xêrê bidin bila bes ji bo Xweda be. Hûn bi qesta xêrê çi bidin (xelata wê) bêkêmasî dê bigihîje we û qet neheqî li we nayê kirin.[1]

273. Bila hinek ji sedeqeyên we ji bo wan xizanan bin ku xwe dane riya Xwedê û nikarin (ji bo bazirganiyê) li ser erdê bigerin. Yê ku bi rewşa wan nizane, ji ber pakdêriya (nexwestina) wan dibêje qey ew dewlemend in. Tu wan bi rûdêmê wan nas dikî ku ew hewce ne û ne pir û ne hindik ji mirovan xwestekiyê nakin. Hûn di riya Xwedê de çi xerc bikin vêca bêguman Xwedê pê dizane.

274. Ew ên ku malên xwe bi şev û roj, bi dizî û eşkere didin, ji bo wan li cem Xwedayê wan xelata wan heye û li ser wan tu tirs tun e û ew xemgîn jî nabin.

275. Ew ên ku ribayê (selefê) dixwin, eynî mîna wan ên ku ji lêdana şeytên dîn bûbin (bi kar û barê xwe) radibin. Ev halê wan ji ber wê sedemê ye ku dibêjin kirîn û firotin jî her wekî selefê ye. Hal ev e ku Xwedê kirîn û firotin helal kiriye û selef jî heram kiriye. Êdî ji vêga û pê de ji kê re, ji cem Xwedayê wî şîretek were û ew dev ji selefê berde, vêca tiştên berê bûne her jê re ne (yên berî heram bibe jê nayên standin) û karê wî spareyî Xwedê ye. Kî dîsa li selefê vegere, ha ew ehlê êgir in û heta hetayê dê tê de bimînin.

276. Xwedê selefê helak dike û sedeqeyan jî pir dike. Xwedê ji her nankorê gunehkar hez nake.

277. Bêguman ew ên ku bawerî anîn û karên rind kirin, bi awayê pêdivî nimêj kirin û zekat dane, ji wan re, li nik perwerdegarê wan xelata wan heye û ne tirs li ser wan heye, ne jî ew xemgîn dibin.

278. Hey gelî yên ku bawerî anîne! Eger birastî hûn xwedanbawer in ji Xwedê bitirsin û dev ji wê selefa mayî (ya li bal xelkê) berdin.

279. Êdî eger hûn dev ji selefê bernedin bizanin ku ji aliyê Xwedê û pêxemberê wî ve li hemberî we şerekî dijwar heye. Eger hûn poşman bibin, jê vegerin, vêca sermiyanê we her ji we re ye; ne hûn zilmê bikin û bila li we jî zilm neyê kirin.

280. Eger (deyndar) destteng be, heta destfirehiyekê bila muhlet lê bê dayîn û ku hûn (lê biborin û wî deynî) sedeqe (yan jî zekat) bihesibînin, eger hûn zanibin (ev) ji bo we çêtir e.

281. Xwe ji (riswabûna) rojeke wisa biparêzin ku hûn ê tê de bi bal Xweda ve vegerin. Paşê her kes ji bo kar û kiryarên wî dê hesab digel bê kirin û zilm li kesî nayê kirin.

---

1 Ji bo em rind maneya vê ayeta pîroz fêm bikin hêja ye ku em sebebê nizûla wê fêr bibin. Li gorî ku ji Seîdê kurê Cubeyr hatiye ragihandin, mislimanan sedeqe didan zimmiyan jî. Çi gava feqîrên mislimanan zêde bûn, vêca Pêxamberê Xwedê (s) ji wan re got: “Sedeqeyan bidin biradînên xwe bi tenê. Di vê mijarê de ev ayet “Hîdayeta wan ne li ser te ye” nazil bû. Vêca ayetê bi vî awayî sedeqe ji bo feqîrên ne misliman jî helal kir.

**282.** Hey gelî yên ku bawerî anîn! Dema we tiştek heta demeke navlêkirî bi deyn da hev, êdî wê binivîsin. Bila nivîsyarek (katibek) bi wijdan di navbera we de binivîse û bila wekî ku Xwedê pê daye zanîn xwe ji nivîsandinê nede paş û bila (her tiştî wekî ku heye) binivîse. [1]

**283.** Eger hûn rêwî bin û we tiştek deyn kir û we katibek jî nedît (ku binivîse, wê çaxê) gereweke di şûna wî de radestî xwediyê deyn bikin. Êdî eger hûn li hev ewle bin (gerew ne pêwîst e). Vêca bila ew ê ku eminî pê hatiye kirin spareya li cem xwe bide (xwediyê wî) û bila ji Xwedayê ku Perwerdegarê wî ye bitirse (ku xiyanetê neke). Şahidiyê veneşêrin. Kî ku şahidiyê veşêre, bila bizane ku dilê wî gunehkar e. Xwedê bi karên ku hûn dikin zana ye.

**284.** Çi tiştên li erd û asîmanan hene her ên Xwedê ne. Eger hûn a di dilê xwe de eşkere bikin, yan jî hûn wê veşêrin, Xweda dê we jê berpirs bigire. Vêca Xwedê kê bivê li wî dibore û kê jî bivê dide ezabê. Xwedê li ser her tiştî qadir e.

**285.** Pêxember bi wehya ku ji cem Xwedayê wî jê re hatî bawerî anî. Tevekê mumînan jî bi Xwedê û bi firîşteyên Wî û bi kitêbên Wî û bi pêxemberên Wî bawerî anîn. (Mumîn dibêjin:) Em cudahiyê naxine navbera tu yekî ji pêxemberên Wî (ku em bi hinekan bawerî bînin û hinekan jî înkar bikin). Gotin: (Xwedayê me!) Me fermana te bihîst û em ji te re berdest bûn. Xwedayê me! Em lêborîna gunehên xwe ji te dixwazin û veger her bi bal te ve ye.

**286.** Xwedê her kesî bes li gorî hêza wî, wî binbar dike, xêra ku bi dest xistiye her jê re ye û gunehên ku bi dest xwe ve anîne jî her di stûyê wî de ne. Xwedayê me! Eger em (fermanên te) ji bîr bikin an jî em (qedexeyên te) bi bêhemdî bi kar bînin, li me negire. Xwedayê me! Her wekî te barê giran li yên beriya me kirî, wisa li me bar neke. Xwedayê me! Barê ku em qet nikaribin hilgirin jî li me bar neke. Li kêmasiyên me bibore, me ji gunehan paqij bike û dilovaniya xwe li me bike. Xwediyê me her tu yî, êdî me li hember gelên kafir serdest bike.

---

1 Bila deyndar jî deynê xwe bibêje û bide nivîsandin û bila (der barê deynê xwe de) ji Xwedayê ku perwerdegarê wî ye bitirse û bila tiştekî jê kêm neke. Êdî eger deyndar aqilsivik be, yan lawaz be, yan jî ew bi xwe nikaribe bide nivîsandin, bila weliyê wî (ew ê jê berpirs) bi wijdan bide nivîsîn!

Ji nav xwe du zilamên (misliman û biwijdan) bikin şahid. Eger du zilam peyda nebin bila zilamek û du jin şahid bin ji yên ku hûn ji wan razî, eger yek ji wan ji bîr bike da ku ya din di bîra wê bîne.

Dema şahid (ji bo şahidiyê) hatin gazîkirin bila xwe nedin paş. Ji nivîsandina deyn -çi biçûk be çi mezin- bila sist nebin, heyanî bi dema wan a diyarkirî jî binivîsin. Ha ev reng li cem Xwedê biedalettir e û ji bo şahidiyê xurttir e û ji bo ku hûn nekevin gumanê saxlemtir e.

Lê belê eger bazara we dest bi dest be ku hûn di navbera xwe de bidin û bistînin, hingê tu guneh li ser we nîn e ku hûn wê nenivîsin.

Dema we bi hev re kirîn û firotan kir jî bila zerara tu nivîsyarî û tu şahidî neyê kirin. Eger hûn zerarê bidin yekî ji wan, bizanin ku ev ji we re jî xerabî ye. Hay ji hukm û fermanên Xwedê hebin. Xwedê bi we dide hînkirin. Xwedê bi her tiştî zana ye.

# 3. SÛREYÊ ALÎ ÎMRAN

Sûreyê Alî Îmran, li Medînê daketiye. 200 (du sed) ayet e.

Sûre, navê xwe ji ayeta 34-37'an girtiye ku di wan de behsa Malbata îmran hatiye kirin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Elîf, Lam, Mîm!

**2.** Xwedê ye (yê ku) ji wî pê ve tu ilah tunin, ew ê ku her sax e, lihevragirê heyînê ye.

**3.** Xwedê bi heqî ji te re kitêb hinart ku ew rastderêxa kitêbên beriya xwe ye û Tewrat û Încil jî hinartin.

**4.** Ku ew (Tewrat û Încîl) berê ji bo mirovan delîl û ronahî bûn. Xwedê furqan (kitêba cudaker ya ku heq û batilî ji hev diqetîne) jî hinart. Bêguman ew ên ku ayetên Xwedê înkar dikin; ji wan re ezabekî dijwar heye. Xwedê serdest e û tolveker e.

**5.** Bêguman ne li asîmanan ne jî li erdê tiştek ji ber Xwedê veşartî nîn e.

**6.** Xwedê ye, yê ku di malzarokan de çawa bixwaze wisa dirûv dide we. Ji Wî Xwedayê 'Ezîz ê Ḥekîm pê ve tu mabûdê birastî tun in.

**7.** Ew e yê ku kitêb ji te re hinart, hin ji ayetên wê hene ku muhkem in ku ew bingeha kitêbê ne û yên din jî muteşabih in. Vêca herçî kesê ku di dilê wan de ji rastiyê averêbûn heye, ji bo derxistina fitnê û da ku te'wîla ayetan (ji cem xwe ve) lê bînin, dikevin pey ayetên muteşabih. Hal ev e ku ji Xwedê pê ve tu kes te'wîla wan nizane. Ew ên ku pispor in û di zanînê de kok berdane dibêjin: "Me bawerî bi tevekê wê (muhkem û muteşabihê ji Qur'anê) anî. Gişt ji cem Xwedayê me ne." Tenê yên xwedanaqil ji vê ders digirin.

**8.** (Ew ên zana û pispor wiha dua dikin:) Xwedayê me! Piştî ku Te em anîn ser riya rast dilên me jê venegerîne. Ji cem xwe rehmê li me bike. Em bawer in ku yê pir dayende û bexşende her Tu yî.

**9.** Xwedayê me! Tu yî, yê ku mirovan di rojeke wisa de li hev kom dike ku der heqê wê rojê de qet guman tune ye. Bi rastî Xwedê hîç civan şaş nake û ji soza xwe danagere.

**10.** Bêguman ew ên ku kafir in, mal û zarokên wan li cem Xwedê tu feydê nadin wan. Ew bi xwe ardûyê agirê cehnemê ne.

**11.** (Riya wan) Wekî riya ehlê Firewn û kesên beriya wan e. Wan, bi ayetên me bawerî neanîn, vêca Xwedê jî, ji ber gunehên wan, ew hingaftin (û helak kirin). Xwedê, xwedanê ezabê pir dijwar e.

**12.** Ji kafiran re bibêje: Di demeke nêzîk de hûn ê bên şikandin û hûn ê bi bal dojehê ve bên ajotin. Çi pîsecih e ew der![1]

1 Dema Pêxamberê Xweda, li Bedrê qureyşî têk birin û vegeriya Medînê, cihû kom kirin û ji wan re got: Gelî civata cihûyan! Hîn belayeke mîna belaya ku Xwedê aniye serê qureyşiyan neaniye serê

**13.** Bêguman ji bo we, di du komên ku ew (roja Cenga Bedrê) hatin hemberî hev de îbreteke girîng heye; komekê, di riya Xwedê de şer dikir û ya din jî kafir bûn ku bi dîtina çavan bawermend du qatî xwe didîtin. Xwedê kê bivê bi arîkariya xwe piştgiriya wî dike. Helbet di vê de ji xweyaqilan re îbretek heye.

**14.** Hezkirina dilbijênan; jin û zarok, maldariya pir a ji zêr û zîv, hespên durûvkirî, terş (deve, dewar û pez) û çandinî di çavê mirovan de hatiye xemilandin. Ha ev kêfborandina jiyana vê dinyayê ye û dûmahîka spehî li cem Xwedê ye.

**15.** Bibêje: Ma ez yeke ji van çêtir ji we re bibêjim? Ji bo yên teqwadar, li cem Xwedayê wan, bihiştên ku di nav wan re çem diherikin hene ku ew ê heta bi hetayê lê bimînin û ji wan re di nav de jinên pak û temîz û qayîlbûna Xwedê heye. Xwedê bi bendeyên xwe agahdar e.

**16.** Ew ên ku dibêjin: Xwedayê me, bêguman me bawerî anî, vêca li gunehên me bibore û me ji ezabê êgir biparêze!

**17.** Ew ên ku sebirkêş in, rast û dirust in, bi awayê pêdivî îbadetker in, (bi malê xwe di rêka Xwedê de) bexşende ne û di wextê seherê de lêborîna gunehên xwe dixwazin.

**18.** Xwedê şahdeyî da ku bêguman ji bilî wî tu ma‘bûd nîn in. Melayîket û zana jî bi vê yekê şahdeyî didin ku ew bi edaletê hukim dike. Ji Wî Xwedayê ‘Ezîz ê Ḥekîm pê ve tu mabûdê bi heqî tun in.[1]

**19.** Bi rastî li cem Xwedê dînê heq (û meqbûl) bes îslam e. Ew ên ku kitêb ji wan re hatî, piştî ku zanîn ji wan re hat, ji çavnebariya xwe ketin îxtîlafê. Kesê bawerî bi ayetên Xwedê neyêne, vêca bêguman Xwedê hesabdîtina Wî pir lezdar e.

**20.** Eger (ew di bara dîn de) bi te re xirecirê bikin, ji wan re bibêje: Min digel wan ên ku dane pey min, me xwe ji Xwedê re berdest kir. Ji xwedankitêb û nexwendeyan (muşrikan) re bibêje: Ma hûn jî, ji Xwedê re berdest bûn? Eger wan jî xwe berdest kir, jixwe ew jî ketine ser rêka rast. Eger ew pişta xwe bidinê, vêca (wezîfeya) te tenê ragihandin e. Xwedê bi bendeyên xwe bîner e.

**21.** Bêguman ew ên ku ayetên Xwedê mandel dikin û bi neheqî pêxember û wan ên ku daxwaza qenciyê dikin dikujin, mizgîna ezabekî cansoj bide wan!

---

we, misliman bibin. Birastî jî hûn dizanin ku ez bi peyxamberî hatime şandin. Cihûyan got: Hey Muhemmed! Bila nefsa te, te nexapîne ku te ji qureyşiyan çend kesên nezan kuştine ku ji bo cengê tu zanîna wan tune bû. Vêca bi xwe bawer nebe ku tu yê karibî me jî têk bibî. Em bi Xwedê sond dixwin; eger tu şerê me bikî, tu yê bi me bizanî ka em çi mêrxas in û tu yê zanibî ku hûn rastî tu kesê mîna me nehatine. Vêca di vê mijarê de ev ayeta pîroz nazil bû.

Hem jî ev ayeta pîroz, mizgîn dida Cenabê Peyxamber (s) ku muşrik û cihû dê li hemberî mislimanan têk biçin. Bi rastî ev mucîzeya Qur‘ana Hekîm pêk hatiye. Hem muşrik hem jî cihû li hemberî mislimanan şikestine.

1 Dema Pêxamberê Xwedê li Medînê bi temamî bi cih bû, ji filehên Şamê du kesê zana qesda wî kirin. Wan, Pêxember bi salix û wesfên wî nas kirin, jê re gotin: Tu Muhemmed î? Pêxemeber got: Belê. Gotin: Tu Ehmed î? Got: Belê. Gotin: Em ê şehdebûnekê ji te bipirsin, eger tu wê ji me re bibêjî em ê baweriyê bi te bînin. Pêxamberê Xwedê ji wan re got: Kerem kin, bipirsin. Gotin: Di kitêba Xwedê de şehdeyîya herî mezin çî ye? Vêca wek bersiva pirsa her duyan Pêxember ev ayeta pîroz xwend “Xwedê şahdeyî da ku bêguman ji bilî wî tu mebûd heq tun in.. .”

**22.** Ha ew, ew kes in ku kirinên wan hem li dinyayê hem jî li axretê pûç bûne û ji wan re tu piştevan û arîkar jî nîn in.

**23.** (Resûlê min!) Ma tu li wan kesên ku parek ji kitêbê ji wan re hatiye dayîn, nanêrî?! Ew bi bal kitêba Xwedê ve têne gazîkirin da ku di navbera wan de hukim bike, pişt re birek ji wan berê xwe vedigerînin û jê bêzê dikin.

**24.** Ev helwesta wan ji ber vê ye; lewra dibêjin: "Ji çend rojên bijimar pê ve agir bi me nakeve" û ew tiştê wan bi ser dînê xwe ve zêde kir, ew ji rê xistin.

**25.** Vêca dema em, ji bo roja ku guman tê de nîn e wan li hev bicivînin û ji her kesî re tişta ku qezenc kiriye bi temamî û bêstemkarî bête dayîn, ma gelo rewşa wan dê çawan be?!

**26.** Bibêje: Xwedêyo! Tu yî xwediyê xwedaniyê. Tu kê bivê milk didî wî û kê bivê milk jê distînî. Tu kê bivê ezîz dikî, kê jî bivê perîşan dikî. Xêr û bêr her di destê te de ye. Bêguman Tu li ser her tiştî qadir î.

**27.** Tu şevê dixî (nava) rojê, rojê jî dixî (nava) şevê, Tu yê sax ji yê mirî derdixî û yê mirî jî ji yê sax derdixî û Tu kê bivê bêhesab risqê wî/wê didî.[1]

**28.** Bila bawermend ji bilî bawermendan, kafiran ji xwe re nekin dost û piştevan! Kî vê bike, bila tu hêviyê ji Xwedê meke. Lê ku hûn hefza xwe ji wan bikin ev xem nake, Xwedê we ji xwe dide tirsandin û veger bes bi bal Xwedê ve ye.[2]

**29.** Bibêje: Eger hûn a di dilê xwe de veşêrin an jî hûn wê eşkere bikin her Xwedê pê dizane. Ew bi tiştê li asîmanan û bi tiştê ku li erdê heye jî dizane. Xwedê li ser her tiştî kara ye.

**30.** Wê rojê her kes qencîya ku kirî (padaşa wê) li pêşberî xwe hazir dibîne û ji neqenciyê ya ku kirî jî dixwaze ku di navbera wî û wê de mesafeyeke dûr hebe. Xwedê, we ji hatina li hemberî xwe ditirsîne. Xwedê ji bo evdên xwe pir bişefqet e.

**31.** Bibêje: Eger hûn bi rastî ji Xwedê hez dikin, naxwe bidin pey min, Xwedê dê ji we hez bike û li gunehên we bibore. Xwedê her gunehbexş e, dilovîn e.

**32.** Bibêje: Bi gotina Xwedê û Pêxemberê Wî bikin. Vêca eger ew berê xwe jê vegerînin, êdî bêguman Xwedê ji kafiran hez nake.

**33.** Bêguman Xwedê Adem û Nûh û malbata Îbrahîm û malbata Îmran di ser alemê (ya dema wan) re girtiye.

**34.** Ev nesleke ji hev in. Xwedê jî bihîzer e, zana ye.

---

1 Ev ayeta pîroz dide nîşan ku dema şev kin dibe roj jî dirêj dibe û dema roj kin dibe şev dirêj dibe. Ev jî delîl û belge ye li ser qudreta Xwedê Teale. "Tu yê sax ji yê mirî derdixî û tu yê mirî ji yê sax derdixî " yanî: Çandiniyê ji libê derdixe, libê ji çandiniyê derdixe, xurmeyê ji sîsikê derdixe, sîsikê ji xurmeyê derdixe, hêkê ji mirîşkê derdixe, mirîşkê ji hêkê derdixe. Bi gotineke din; ji yên kafir muminan û ji yê mumin jî kafiran derdixî.

2 Ev ayeta pîroz hukmekî vebirî yê îslamiyetê rave dike ku bawermend hîç nikarin kafiran ji bo xwe bikin dost û neşên ji wan hez bikin. Lêbelê ku ji wan bitirsin ev rewş cuda ye. Di nava xelkê de ev yek bi "Teqiyê" meşhûr e. Eger musliman bitirsin ku kafir dê zerarê bidin wan wê çaxê ji wan re ruxset heye ku bi serê zimên -ne ji dil- ji wan re bibêjin, em ji we hez dikin. Lewra mirov dikare bi vî awayî xwe ji neqenciya kafiran biparêze û bela wan ji xwe veke

**35.** Di bîr bîne, dema jina Îmran got: Xwedayê min! Min a ku di zikê xwe de, tenê ji bo îbadetê Te û (xizmeta) mala Te nezir kir, vêca ji min qebûl bike. Bêguman yê bihîzer ê zana her Tu yî.

**36.** Çi dema wê hemla xwe danî, got: Xwedayê min! Min hemla xwe keç danî -Xwedê bêhtir dizanê ka çi daniye- û kur ne wekî keçê ye, min navê wê Meryem danî. Ez wê û zuriyeta wê bi Te ji şeytanê qewitî diparêzim.

**37.** Vêca Xwedayê wê, bi qebûleke rind (nezra wê) jê qebûl kir; ew spehî rakir û rind perwerde kir. Zekeriya jî lê xwedîtî kir. Çi wexta Zekeriya ji bo serlêdanê çûbe îbadetgeha wê, fêkî û xwarin li cem didîtin. Zekeriya got: "Hey Meryem! Ev ji te re ji ku tê?" Wê jî (jê re wiha) got: Ew ji cem Xwedê ye, bi rastî Xwedê kê bivê bêjimar risqê wî/wê didê.

**38.** Li wê derê Zekeriya gazî Xwedayê xwe kir: Xwedayê min! Ji cem xwe zuriyeteke pak bide min. Bêguman Tu, duawergir î.

**39.** Vêca di heman dema ku Zekeriya di îbadetgeha xwe de nimêj dikir, melayîketan lê gazî kir. Jê re gotin: Bêguman Xwedê (bi navê) Yehya mizgîna (kurekî) dide te, tesdîqa peyva Xweda (ku Îsa Pêxember e) dike, serwer û pêşrew e, ji bo ebdîniyê xweragir e û ew pêxemberekî ji salihan e.

**40.** Zekeriya got: Xwedayê min! Çawa dê kur ji min re çêbe. Birastî jî ez bûme kalemêr û jina min jî nezayok e (zarok jê re çênabin). Xwedê (jê re) got: Her wisan e, tiştê Xweda bixwaze dê bike.

**41.** Zekeriya got: Xwedayê min! Nîşanekê bide min. (Xwedê jê re) got: Nîşana te ew e ku ji îşaretê pê ve heta sê rojan tu dê bi mirovan re nepeyivî, Xwedayê xwe pir bi bîr bîne û sibeh û êvaran Wî pak bidêre.

**42.** Di bîr bîne dema melayîketan got: Ey Meryem! Xwedê (ji nava jinên alemê) tu bijartî; tu pak û paqij kirî û tu di ser hemû jinên cîhanê re girtî.

**43.** Hey Meryem! Tenê ji Xwedayê xwe re îbadetê bike; here secdeyê û digel nimêjkeran nimêj bike.

**44.** (Ya Muhemmed!) Ev ji xeberên nependî ne ku bi (riya) peyxamê (wehyê) em wan ji te re radigihînin. Dema wan, (gelo) ka xwedîkirina Meryemê dê li kîjan ji wan bikeve, qelemên xwe (ji bo pişkkêşanê) diavêtin, tu ne li cem wan bûyî û dema wan (ji bo vê meselê) xirecir dikirin jî tu ne li cem wan bûyî.[1]

**45.** Wê dema melayîketan got: Hey Meryem! Xwedê mizgîniya kurekî bi gotineke ji cem xwe (bi gotina "çêbe!") dide te. Navê wî Mesîh; Îsayê kurê Meryem e. Hem li dinyayê, hem jî li axretê (mirovekî) rûmetdar û yek ji yên nêzî Xwedê ye.

**46.** Îsa, di dergûşê de û di navseretiyê de jî bi mirovan re dê bipeyive û ew ji salihan e.

**47.** Meryemê got: Xwedayê min! Dê çawa zarok ji min re çêbe digel ku tu kesî

1 Hatiye ragihandin ku dema xwestin qur'e bikin ka ji wan kî dê bibe berpirsê perwerdeya Meryemê. Ew ên qelemên xwe yên ku pê Tewrat dinivîsîn bavêjin çem, vêca qelema kîjanî derketa ser rûyê avê, ew yê bibûya kefîlê wê. Piştî ku qelemên xwe avêtin çem, ya Nebî Zekeriya (a.s.) li ser avê sekinî û ew bû kefîlê Meryemê.

dest jî nedaye min? Xwedê jê re got: Wisan e, tiştê Xwedê bivê diafirîne. Dema hukim li karekî bike bi tenê jê re dibêje "Çêbe!" ew jî çêdibe.

**48.** (Melayîketan di bara Îsa de bi Meryemê re axaftina xwe wiha berdewam kir): Xwedê, dê wî fêrî nivîsandinê, hîkmetê, Tewrat û Încîlê bike.

**49.** (Xwedê, dê wî) ji bo îsraîliyan bi pêxemberî bişîne (û ew ê ji wan re wiha bibêje:) Min ji cem Xwedayê we ji bo we mucîzeyek aniye; ez ji bo we ji heriyê şeklê teyran çêdikim û paşê ez pif dikimê, vêca bi destûra Xwedê ew dibe teyr. Dîsa bi destûra Xwedê ez kor û kotîyan şîfa dikim û miriyan jî sax dikim. Ez, tiştê ku hûn li malên xwe dixwin û hiltînin (pê dizanim û ez ê) ji we re jê xeber bidim. Eger bi rastî hûn bawermend bin, di vê rewşê de ji bo we îbret hene.

**50.** (Îsa got: ez hatim) ji bo ku ez Tewrata li ber destê xwe rast bidêrim, hin tiştên ku ji we re heram bûbûn ji we re helal bikim û min ji nik Xwedayê we mucîze ji bo we anîn. Naxwe ji (ezabê) Xwedê bitirsin û bi gotina min bikin.

**51.** Bêguman Xwedê Rebbê min û Rebbê we ye, naxwe jê re îbadetê bikin. Ha ev rêka rast e.

**52.** Çi dema Îsa hizir kir ku ew baweriyê pê nayînin, got: Kî di rêka Xwedê de piştevan û arîkarê min e? Hewariyan got: Em in arîkarên (dînê) Xwedê, me bawerî bi Xwedê anî û tu jî şahid be ku bi rastî em misliman in.

**53.** (Hewariyan got:) Xwedayê me! Me bawerî bi ya ku te hinartiye anî û me da pey pêxemberê Te. Vêca me ji şahidan binivîse.

**54.** (Cihûyan bi dizî) dek û dolab (li ser Îsa pêxember) gerandin (da wî bikujin). Xwedê jî dek û dolab li ser wan gerand. Xwedê çêtir dek û dolaban digerîne.[1]

**55.** Di bîr bîne dema Xwedê got: Hey Îsa! Bêguman Ez ê te bi temamî ji erdê bigirim û rakim cem xwe. Ez ê te ji yên kafir biparêzim. Ew ên ku dane pey te, heta roja qiyametê ez ê wan bi ser ên kafir bixim. Piştre, vegera we bi bal min ve ye, ez ê di navbera we de; di bara ya ku hûn bi hev ketin de hukim bikim.

**56.** Vêca herçî yên ku kafir in, li dinya û li axretê ez ê ezabekî dijwar bidim wan û tu arîkarên wan jî dê nebin.

**57.** Herçî yên ku bawerî anîn û karên qenc kirin, xelata wan dê bêkêmasî ji wan re bê dayîn. Xwedê ji zaliman hez nake.

**58.** (Ya Muhemmed!) Ev qiseya (Îsa û diya wî ya) ku em ji te re dixwînin, ji ayet û bîranînên xwedanhîkmet in.

**59.** Bêguman li cem Xwedê, rewşa Îsa wekî rewşa Adem e. Xwedê ew ji axê afirand, piştre jê re got: "Çêbe!" Vêca ew jî çêbû.

**60.** Ev (gotina di bara Îsa Pêxember de) heq e, ji cem Xwedayê te ye. Naxwe tu nebe ji yên ku ketine gumanê.

**61.** (Ya Muhemmed!) Piştî vê zanîna ku ji te re hatî, kî di bara wê (mijara Îsa) de bi

---

1 Cihûyan bi dizî kemîn li ber Îsa vedan û kuştina wî sipartin mirovekî. Xwedê jî kemîna wan pûç derxist, yekî ku dişibiya Îsa kuştin û ji wan weye ku bi rastî wan Îsa kuştiye. Hal ev e ku Xwedê Îsa rakiriye asîmanan.

te re nîqaşê bike (ji wan re) bibêje: De werin, em gazî zarokên xwe û zarokên we, gazî jinên xwe û jinên we û gazî xwe û we bikin; piştre em bi hev re nifiran bikin û laneta Xwedê li derewînan bibarînin.

62. Bêguman eva ha mîsoger qiseyeke rasteqîne ye. Ji Xwedê pê ve tu îlah tun in. Bêguman Xwedê, her ew e yê serdest yê karbinecih.

63. Eger dîsa berê xwe ji îmanê biguherînin, bêguman Xweda zanayê bi mifsidan e.

64. Bibêje: Hey gelî xelkên ehlî kitêb! Werin bêjeyekê qebûl bikin ku em û hûn tê de wekhev in; "Em ji Xwedê pê ve îbadetê tu kesê din nekin, em tiştekî jê re nekin şerîk û bila ji bilî Xwedê hin ji me yên din, ji xwe re neke Xweda." Eger dîsa ew berê xwe ji (banga te) vegerînin, wê gavê ji wan re bibêjin: „Hûn şahid bin ku bi rastî em misliman in."

65. Gelî yên ehlîkitêb! Çima hûn di bara Îbrahîm de nîqaşê dikin? Hal ev e ku Tewrat û Încîl piştî wî hatine şandin, ma qet hûn nahizirin?

66. Gelî yên ehlîkitêb! Ha hûn ev in ku di heqê tiştê (hûn) zanin de (ne rast dibêjin û) nîqaşê dikin? Êdî çima di heqê ya ku zanîna we pê nîn e, hûn nîqaşê dikin. Xwedê dizane û hûn nizanin.[1]

67. Îbrahîm, ne cihû bû û ne jî fileh bû, lê belê ew dînpakê misliman bû û ne ji muşrikan jî bû.

68. Bêguman mirovên ku herî nêzî Îbrahîm in, ew ên ku dane pey şopa wî û ev Pêxember û yên ku pê bawerî anîne. Xweda, xwedî û arîkarê bawermendan e.

69. (Gelî mumînan!) Civateke ji ehlîkitêb çiqas ji dil dixwest ku we ji rê derîne. Hal ev e ku ew ji xwe pê ve tu kesî ji rê dernayînin û ew bi vê jî nizanin.

70. Gelî yên ehlîkitêb! Çima hûn ayetên Xwedê inkar dikin? Hal ev e ku hûn jî dizanin ku ew heq in.

71. Gelî yên ehlî kitêb! Ji bo çi hûn heqiyê bi batilî cil dikin û digel ku hûn dizanin heq çi ye, çima hûn heqiyê vedişêrin?

72. Civateke ji yên ehlî kitêb got: Bi ya ku ji bo bawermendan hatiye hinartin serê rojê baweriyê bînin û dawiya rojê jî wê înkar bikin. Da (bi vî awayî) ew (ji dînê xwe) vegerin.

73. (Cihûyan ji hev re gotin:) Hûn bes ji yê ku li ser dînê we be bawerî pê bînin -(Ji wan re) bibêje: rêka rast û durist encax rêka Xwedê ye- da ku ya ji bo we hatî dayîn ji kesekî din re neyê dayîn û da ku li cem Xwedê we şermezar û bêdelîl neêxin. Bibêje: Dayîn û kerem bi destê Xwedê ye, Ew kê bivê dide wî. Teqez Xwedê (bi kerem û dayîna xwe) destfireh û zana ye.

74. Xwedê, kê bivê ji dilovaniya xwe re terxan dike (wî dike pêxember). Xwedê xwediyê kerema mezin e.

75. Ji yên ehlîkitêb hin hene ku tu bi baran pertal bispêrî wan dê bidin te û hinek

---

1 Cihû û filehan di navbera xwe de guftûgo kir. Cihûyan got: Îbrahîm cihû bû, filehan jî got: Na, Îbrahîm fileh bû. Hal ev e ku îdîayên her du rexan jî bêdelîl bûn. Lewra ev ayet eşkere dike ku Tewrat û Încîl piştî Îbrahîm hatine nazilkirin, vêca diyare ku îdîaya her duyan jî betal e. Lewra Îbrahîm ne cihû bû; ne jî fileh bûye.

jî hene ku tu dînarekî bispêrî wan, eger tu li ser wan ne çavdêr bî, ew wî nadin te. Lewra ew dibêjin: Di xwarina malên naxwendeyan de (mexsed pê ereb in) ji me re guneh nîn e. Ew li ser (navê) Xwedê derewan dikin, digel ku dizanin ew ne rast in jî.

**76.** Na (ya ku ew dibêjin, ne rast e), kî soza xwe bîne cih û xwe ji heramiyê biparêze, bila bizanibe ku Xwedê ji teqwadaran hez dike.[1]

**77.** Bêguman ew ên ku soza bi Xwedê re dane û sondên xwe bi pertalekî hindik difiroşin; ev ên ha, ji bo wan li axretê tu par û pişk tune ye. Xwedê, roja qiyametê berê xwe nade wan, bi wan re napeyive, wan (ji gunehan) paqij nake û ji bo wan her ezabekî dijwar heye!

**78.** Ji wan civatek, dema kitêbê dixwînin zimanê xwe lê xwar dikin da ku hûn wê ji kitêbê bizanin. Hal ev e ku ew ne ji kitêbê ye. Dibêjin: Ew ji cem Xwedê ye. Hal ev e ku ew ne ji cem Xwedê ye. Ew li ser (navê) Xwedê derewan dibêjin û dizanin ku ew derewin jî.

**79.** Ji tu mirovî re - piştî ku Xwedê kitêb, hîkmet û pêxemberî dayê- ne pêkan e ji mirovan re bibêje: “Dev ji Xwedê berdin û ji min re bibin bend e!” Lê belê (ji wan re dê wisa bibêje:) di fêrkirina kitêb û xwendina wê de bibin mirovên rebbanî.[2]

**80.** Ew fermanê li we nake ku hûn „firîşte û pêxemberan ji xwe re bikin Xweda.“ Ma qey piştî ku hûn misliman bûn ew ê berê we bide kufrê?!

**81.** Di bîr bîne dema Xwedê peyman ji pêxemberan wergirt û got: “Dema min kitêb û hîkmet da we, paşê qasidek ji we re bê û ya ku bi we re ye jî rast bidêre, teqez divê hûn baweriyê bi wî bînin û piştevaniya wî bikin.” (Xwedê) got: Ma we qebûl kir û we li ser vê yekê ji min peyman wergirt? (Wan jî) Got: “Belê, me qebûl kir. (Xwedê) Got: Naxwe li ser vê yekê şahid bin û ez jî digel we ji şahidan im.

**82.** Êdî piştî vê (peymanê) kî (ji soza xwe) vegere. Ha ew fasiq bi xwe ne.

**83.** Qey ji bilî dînê Xwedê dînekî din dixwazin? Hal ev e yên ku li erd û asîman hene gişt bivên nevên ji Wî re berdest bûne û ew ê bi bal Wî ve vegerin.

**84.** Bibêje: Me bi Xwedê, bi ya ku ji me re hatî şandin, bi ya ku ji Îbrahîm, Îsmaîl, Îshaq, Yaqûb û neviyên (Yaqûb) re hatiye hinartin û bi ya ku ji Mûsa, Îsa û pêxemberên (din) re ji cem Xwedayê wan hatiye dayîn, bawerî anî û em qet ferqê naêxin nava yekî ji wan û em ji Xwedê re berdest bûne.

**85.** Kî ji bilî îslamê li dînekî din bigere, (bila bizanibe ku) ew (dîn) ji wî qet nayê qebûlkirin û ew li axretê ji wan ên ku xesirîne.

---

1 Eş‘es kurê Qeys ragihihîne ku “di navbera min û zilamekî cihû de erdek hebû. Min jê xwest, wî jî inkar kir. Êdî min ew bire bal pêxamber ji bo ku me ji hev safî bike. Pêxamber ji min re got: Delîleke te heye ku ev erd yê te ye? Min got: Na! Vêca ji yê cihû re got: Sond bixwe ku ev erd yê te ye? Vêca min got: Naxwe ew ê sond bixwe û malê min wê ji xwe re bibe? Ji bo vê yekê ev ayet nazil bû: Qurtûbî 4/120

2 Rebbanî: Tiştekî ku bi bal Xwedê ve were nisbetkirin. Ma‘na ayetê ku dibêje “bibin rebbanî” yanî çiqas tişta hûn bêjin û ya hûn bikin bila bi gora fermana Xwedê be; hûn çu tiştî ji kîsê xwe nebêjin û bi gorî daxwazên xwe tu kar û barî nekin.

**86.** Vêca ma Xwedê, civateke ku piştî bawerî anî û şahdeyî dan ku pêxember heq e û delîlên eşkere ji wan re hatin, dîsa kafir bibin, Xwedê dê çawa wan bîne ser riya rast?!

**87.** Ha ev ên ha, cezayê wan ev e: Laneta Xwedê, ya melayîket û hemû mirovan dê li ser wan be!

**88.** Ew heta hetayê dê di (agirê) vê lanetê de bimînin, ezab li ser wan nayê sivikkirin û (roja qiyametê) muhlet ji wan re nayê dayîn.

**89.** Ji bilî yên ku piştî vê bêemriya ha poşman bûne û li ser rastbûna xwe xebitîne, vêca bêguman Xwedê her gunehveşêr e, dilovîn e.

**90.** Bêguman ew ên ku piştî bawerî anîn kafir bûbin, paşê di kafiriya xwe de bi pêş ve çûbin, (li ber mirinê) tobeya wan her nayê qebûlkirin û ew ên rêşaş bi xwe ne.

**91.** Bêguman ew ên ku kafir bûn û li ser kufra xwe mirin, vêca eger ew bi qasî dagirtina zemînê zêr ji bo xwe gorî bikin jî, ji wan nayê pejirandin. Ha ew, ji bo wan azareke êşdar heye û ji wan re tu arîkar jî nîn in.

**92.** (Gelî bawermendan!) Heta ku hûn ji ya ku jê hez dikin (di rêka Xwedê de) xerc nekin hûn ê negihên (xelata) xêra herî qenc. Hûn çi xerc bikin jî Xwedê her pê dizane.

**93.** Berî Tewrat dakeve, her texlîtê xwarinê ji zaroyên îsraîliyan re helal bûn, ji ya ku Îsraîl (Yaqûb) li xwe heram kiribû pê ve. Bibêje: eger birastî hûn rastbêj in de ka Tewratê bînin û wê bixwînin.

**94.** Êdî piştî vê, kî li ser (navê) Xwedê derewan bike ha ew zalim bi xwe ne.

**95.** Bibêje: Xwedê rast gotiye. Naxwe bidin pey dînê Îbrahîm ku ew ne pûç û xwar e. Îbrahîm jî ne ji muşrikan bû.

**96.** Bêguman mala pêşîn a ku (ji bo îbadetê) ji mirovan re hatiye avakirin a li Mekkê (Ke'be) ye, cihekî pîroz e û ji bo xelkê cihê hîdayetê ye.

**97.** Tê de nîşanên aşkera; meqamê Îbrahîm heye. Çi kesê bikevê ewle dibe. Çûna hecê li ser însanê ku bikaribe here, ferzeke Xwedê ye. Her kî jî wê mandele bike, vêca birastî Xwedê ne hewcedarê alemê ye.

**98.** (Ya Muhemmed! Ji wan re) Bibêje: Gelî yên ehlîkitêb! Çima hûn ayetên Xwedê înkar dikin. Hal ev e ku Xwedê ya ku hûn dikin dibîne.

**99.** Bibêje: Gelî yên xwedankitêb! Çima hûn mirovan ji riya Xwedê dadigerînin? Çima kesê ku bawerî bîne, hûn li şaşkirina wî digerin, hal ev e ku hûn jî dizanin (ku dînê heq îslam e). Xwedê ji ya ku hûn dikin qet ne bêagah e.[1]

---

1 Li gorî hatiye ragihandin: Çend kes ji qebîla ews û xezreciyan li dîwanekê sohbet dikirin. Şa's kurê Qeys ê cihû di ber wan re buhurî. Ev hevdostî, hevhezî û lihevhatina wan a ku bi çavê xwe dîtî pir li zora wî çûbû. Lewra beriya îslamê di navbera wan de neyartî hebû. Şa's wiha got: Gava ew ji bo biryarê li hev bicivin ma ji bo me çi li cem wan heye? Pişt re şîret li xortekî cihû kir ku biçe cem wan û roja "Bu'asê" di bîra wan bîne û derheqê wê de stranên ku hatine gotin bibêjee. Bu'as rojeke cengê bû ku ews û xezrecî tê de şer kiribûn û di şerê wê rojê de ewsî bi ser ketibûn. Wî ciwanî bi ya wî kir û li wê derê ews û xezrecî bi hev ketin, ketin pêşbaziya quretiyê û ji hev hêrs bûn û gotin: Hey bibezin çekên

**100.** Gelî yên ku bawerî anîne! Eger hûn bi gotina berekê ji wan ên ku kitêb ji wan re hatiye dayîn, bikin; piştî ku we bawerî anîye dê we kafir bikin.

**101.** Çawa hûn ê kafir bibin?! Hal ev e ku ayetên Xwedê ji we re tên xwendin û pêxemberê wî jî di nav we de ye. Kî, xwe bi (dînê) Xwedê bigire teqez ew bi ser rêka rast ve bûye.

**102.** Gelî yên ku bawerî anîne! Bi rast û duristî teqwadariya Xwedê bikin û zinhar hûn her misliman bimirin.

**103.** Hûn gişt xwe bi benê Xwedê (îslamê) bigirin û ji hev parçe mebin. Qenciya Xwedê ya li ser we di bîr bînin; dema hûn ji hev re dijmin bûn vêca hogirî xiste navbera dilê we, îcar hûn bi qenciya wî ji hev re bûn bira. Hûn li ser keviya dojehê bûn, Xwedê hûn jê xelas kirin. Her wiha Xwedê ayetên xwe ji we re diyar dike da ku hûn hîdayet bibin.[1]

**104.** Bila ji we umetek (civatek) pêk were ku doza xêrê (îslamê) bike, bi qenciyê ferman bike û ji neqenciyê vekêşe. Ha ew in ên rizgarbûyî.

**105.** Hûn mebin wekî yên ku piştî delîlên aşkera ji wan re hatin, parçe bûn û bi hev ketin. Ha ji wan re ezabekî mezin heye.

**106.** Roja (qiyametê ya ku tê de) hin ser û çav spî dibin, hin jî reş dibin. Herçî ew ên ku rûyê wan reş bûye (ji wan re tê gotin) "Ma piştî we îman anî, hûn kafir bûn? De ji ber kafiriya xwe ezab biçêjin!"

**107.** Herçî ew ên ku ser û çavên wan spî ne, ew di nav dilovaniya Xwedê de ne. Ew dê li wê heta bi hetayê bimînin.

**108.** Ha ev ayetên Xwedê ne, em bi heqiyê wan ji te re dixwînin. Xwedê qet naxwaze zilmê li bendeyên xwe bike.

**109.** Çi tiştên li erd û asîmanan hene her ew milkê Xwedê ne û her kar û bar, dê bi bal Wî ve vegere.

**110.** (Gelî umeta Muhemmed!) Hûn umeta herî qenc in ku ji bo mirovan derketine; hûn bi qenciyê ferman dikin, ji neqenciyê vedikişînin û bi Xwedê baweriyê tînin. Eger ên xwedankitêb jî bawerî bianiyana helbet ev ji wan re çêtir dibû. Hin ji wan bawermend in û pirê wan jî fasiq in.

---

xwe! Hey bibezin çekên xwe! Ev xeber giha peyxamber. Ew digel muhacir û ensariyan derket nava wan û ji wan re got: Piştî ku Xwedê bi Îslamê rûmet da we û bi wê karê cahiliyetê ji we birî û hûn li hev anîn, ez jî hê li nava we, qey hûn bi doza cahiliyetê bi hev ketine?! Millet fêm kir ku ev wesweseyek ji şeytên û planek ji dijminê wan bûye. Êdî çekên xwe avêtin, giriyan û hev hemêz kirin. Pişt re digel peyxamber vegeriyan, bi ya wî kirin û li wî guhdarî kirin. Vêca derheqê vê rûdanê de Xwedê ev ayeta pîroz nazil kir.

1 Hidayet û muhtedî: Xwedê Teala, di gellek ayetan de behsa hîdayetê kiriye û pesnê muhtediyan daye Ji me re ragihandiye ku hîdayet bes di destê wî de ye û bi wî ye. Her wiha emr li me kiriye ku em hîdayetê jê bixwazin û li navgînên ku me bigihînin hidayetê bigerin.

Lewra hidayet du beş in: yekem, hidayeta îlmî ye: Pêşî xwedê bendeyê xwe agahdar dike; pêxemberan dişîne û bi wan re kitêban dişîne bi vê rewşê riya haq nişan dide. Duyem, hidayeta tewfîqî ye: Pişti naskirina riya heq; eger bende berê xwe dayê, vêcarê Xwedê hidayeta tewfîqî digihîniyê; tewfîqa wî dide û arîkariya wî dike.

Muhtedî: Ew ê ku piştî naskirina heqiyê û meyla heqiyê Xwedê ew li serê rasterê kiriye.

**111.** Ew ji gotina pûç pê ve nikarin tu zerarê bidin we. Eger şerê we bikin jî, ew dê pişta xwe bidin we û birevin, piştre arîkariya wan jî dê neyê kirin.

**112.** Cihû, ji bilî ku ew xwe bi werîsê Xwedê û werîsê mirovan (mislimanan) bigirin li ku dibin bila bibin bêrûmetî li ser wan hatiye vegirtin (nikarin serbest bijîn). Vêca ew bi hêrseke ji cem Xwedê vegeriyan û şermezarî li ser wan hate xistin. Ev yek ji ber vê ye ku wan ayetên Xwedê mandel dikirin û bi neheqî pêxember dikuştin. Ha ev jî bi sedema ku gunehkarî dikirin û ji ser xwe ve diçûn.

**113.** Xwedankitêb (cihû, fileh) tev ne wekhev in, ji wan hin hene ku bi şev ayetên Xwedê dixwînin û diçin sicûdê.

**114.** Ew bi Xwedê û bi roja axretê bawerîyê tînin, fermana bi qenciyê dikin û ji ya neqenc vedikişînin û ber bi xêran ve dibezin (û di xêran de pêşbaziyê dikin). Ha ew ji qencîkaran in.

**115.** Ew çi qenciyê bikin dê bêxelat nemînin. Xwedê bi mutteqiyan rind dizane.

**116.** Bêguman ên kafir bûne, malên wan û zarokên wan li pêşberî (ezabê) Xwedê tu feydeyekê nade wan. Ew, ehlê êgir in, ew ê tê de heta bi hetayê bimînin.

**117.** Rewşa malê yê kafir ku di vê dinyayê de (bi hêviya xêrê) xerc dike wekî rewşa bayekî biseqem e ku li çandiniya miletekî bide ku (bi kirina gunehan) li xwe zilm kirine, vêca ew ba wê kambax bike. Xwedê zilm li wan nekiriye, lê belê wan bi xwe li xwe zilm kiriye.

**118.** Gelî yên ku bawerî anîne! Ji xwe pê ve (ji bilî misilmanan) ji xwe re hemrazan (hevsiran) negirin. Lewra ew di êşandina we de xwe nadin paş; ew ji dil û can rencdariya we dixwazin. Kîn û dijminahî ji devê wan aşkera dibe, ya ku di dilê xwe de vedişêrin hê jî mezintir e. Birastî Me ayetên xwe ji we re aşkera kirine eger bi rastî hûn hişmend bin.

**119.** Ha hûn ev ên ha ji wan hez dikin û ew ji we hez nakin, hûn bi tevahî kitêban bawer dikin (û ew ne wiha ne). Dema rastî we tên dibêjin: Me jî bawerî aniye û dema bi pişt we dikevin jî, ji kîna xwe ya li hemberî we tiliyên xwe gez dikin. (Ya Muhemmed! Ji wan re) Bibêje: Bi kîna xwe bimirin! Teqez Xwedê zanayê bi ya di dilan de ye.

**120.** Eger qenciyek li we bibe, ew wan xemgîn dike û eger belayek were serê we, ew pê dilşad dibin. Eger hûn xwe ragirin û ji Xwedê bitirsin hîleya wan tu ziyanê nade we. Teqez Xwedê, bi ya ku ew dikin agahdar û zana ye.

**121.** (Hey Muhemmed!) Di bîra xwe bîne, dema sibeha zû, tu ji nav ehlê xwe derketî da ku bawermendan di çeperên cengê de bi cih bikî û wan ji bo cengê amade bikî. Xwedê bihîzer e, zana ye.

**122.** Wê dema du celeb ji we hindik mabû ku sist bibin (û ji we biqetin). Hal ev e ku Xwedê arîkar û piştevanê wan bû. Naxwe bawermend bila xwe bispêrin Xwedê tenê.

**123.** Bêguman Xwedê li Bedrê arîkariya we kir, digel ku hûn bêhêz bûn jî. Naxwe xwe ji (ezabê) Xwedê biparêzin da ku hûn spasiya (qencî û kerema) Wî bikin.

**124.** Di bîr bîne dema te ji bawermendan re digot: „Ma ew sê hezar melayîketên ku Xwedê ji bo piştgiriya we şandin ne besî we ye?“

**125.** Belê, eger hûn xwe ragirin û xwe bi sînorê Xwedê biparêzin û eger ew (dijminên we) jî ji nişka ve bi ser we de bigirin, Xwedayê we dê bi pênc hezar firîşteyên binîşan, piştgiriya we bike.[1]

**126.** Ev tişta Xwedê ji we re kirbes da ji we re bibe mizgîn (a serkeftinê) û dilaramiya ji tirsê. Serkeftin, her ji cem Xwedayê ‘Ezîz ê Ḥekîm e.

**127.** Xweda ew qencî bi we kir da ku destekekê ji gawiran ji nav bibe yan jî dilê wan bi kul û kovan bike. Vêca ew ê wisa şermezar û şikestî vegerin mala xwe.

**128.** Tiştek di destê te de tune ye. An dê tobeya wan qebûl bike an jî dê wan bide ezabê. Lewra ew stemkar in.

**129.** Çi tiştê li erd û asîmanan heye her milkê Xwedê ye, kî bivê dibexşîne, kî jî bivê dide azarkirin. Xwedê gunehbexş e, dilovîn e.

**130.** Gelî yên bawerî anîne! Ribayê (selefê) tu carî mexwin ku hûn bi vê sermayeya xwe qat bi qat zêde bikin. Ji Xwedê bitirsin da ku hûn bi ser bikevin.

**131.** Xwe ji wî agirê ku ji kafiran re hatiye amadekirin, biparêzin!

**132.** Bi gotina Xwedê û bi gotina pêxemberê Wî bikin da ku dilovanî li we bête kirin.

**133.** (Gelî bawermendan!) Ber bi lêborîna Xwedayê xwe ve û ber bi bihiştekê ve bibezin ku firehiya wê bi qandî erd û asîmanan e ku ew bihişt ji teqwadaran re hatiye amadekirin.

**134.** Ew ên ku malên xwe di firehî û tengasiyê de (di rêka Xwedê de) xerc dikin; hêrsa xwe diqurtînin û li mirovan diborin. Xwedê ji qencîkarên rast û durist hez dike.

**135.** Ew ên ku dema gunehekî mezin î kirêt dikin an jî (ji bilî yên kirêt bi gunehên din) li xwe zilmê dikin, Xwedê di bîra xwe tînin, vêca ji Xwedê lêborîna gunehên xwe dixwazin -Ma ji Xwedê pê ve qey kî dikare li gunehan bibore!- û li ser kirinên xwe yên nerind jî rikdarîyê nakin (li serê berdewam nabin) û dizanin (ku ew heram e.)

**136.** Ha xelata wan li nik Rebbê wan lêborîn e û bihiştên ku di binê wan de çem diherikin û ew heta hetayê tê de dimînin. Çiqas rind e xelata xebatkaran!

**137.** Bêguman adetên (Rebbê te) di bara umetên beriya we de bihurîne. Ji ber vê yekê, de heydê li ser erdê bigerin û binêrin ka encama wan ên ku ayetên Xwedê mandel kirin (bawerî pê neanîn) çawa bûye?

**138.** Ev (Qur‘an) ji mirovan re daxuyaniyek e û ji mutteqiyan re jî şîret û rêber e.

---

1 Xwedê di vê ayeta pîroz de mercên serkeftinê û yên arîkariya xwe ji bo bawermendan radigihîne. Dide zanîn ku ji bo ku misliman di cengê de bi ser bikevin divê li hemberî dijminê Xwedê xwe ragirin, zehmetiyê bikêşin, xwe ji gunehan vedin, li ber mezinê xwe ranebin û ji Rebbê xwe serkeftinê bixwazin. Lewra di hemû deman de sabit e ku gava mislimanan ev merc neanîne cih, têk çûne û gunehkariyê pişta wan şikandiye.

**139.** (Gelî bawermendan! Ji cîhadê) Sist nebin û xemgîn jî nebin; eger bi rastî hûn bawermend bin teqez ên serkeftî hûn in.

**140.** Eger hûn (li Uhudê) birîndar bûbin, bêguman birîndarî bi ser wan de jî hatibû. Em wan rojan (ên şikestin û serkeftinê) di navbera mirovan de bi dor digerînin, da ku Xwedê wan ên ku (ji dil û can) bawerî anîye derîne rastê û da ku ji nav we hinekan bi şehadetê xelat bike. Helbet Xwedê ji zaliman hez nake.

**141.** Da ku Xwedê (bi vî awayî) wan ên ku bawerî aniye (ji gunehên wan) paqij bike û kafiran jî ji holê rake.

**142.** Heta Xwedê ji we yên ku cîhad kirin kifş neke û yên (li pêşberî zorê) xwe ragirtin dernexe holê, ma ji we weye hûn ê herin bihiştê?

**143.** Bêguman beriya ku hûn rastî cengê bên, we daxwaza mirinê dikir (da ku hûn şehîd bibin), vêca birastî va ye we mirin li ber çavan dît.

**144.** Muhemmed, her pêxember e! Bêguman beriya wî jî pêxember hatine û çûne. Ma qey dema ew bimire yan jî bê kuştin, hûn ê bi ser pehniya xwe de vegerin (ser dînê xwe yê berê)? Kî bi ser pehniya xwe ve vegere kufrê, ew nikare tu ziyanê bide Xwedê. (Ew kesê li ser îmanê bimîne û şêkiriya qenciyên Xwedê bike) Xwedê şikurdaran dê xelat bike.

**145.** Ne mimkun e ku bêyî destûra Xwedê kes bimire, (roja mirinê) demeke diyarkirî ye, hatiye nivîsîn. Kî (bi emelê xwe) dinyayê bixwaze em ê wê bidinê, kî jî axretê bixwaze em ê wê bidinê û em ê şikurdaran xelat bikin.

**146.** Gelek ji pêxemberan hebûn ku (ji hevalên wan) komên pir digel wan ceng kirine. Vêca ji ber a ku di rêka Xwedê de hatiye serê wan qels nebûne, lawaz nebûne û reben jî nebûne. (Belkî li ser ya hatî serê wan sebir kirine) Xwedê jî, ji sebirkêşan hez dike.

**147.** Her gotina wan jî ev bû: Xwedayê me! Gunehên me û zêdegaviya me ya di her kar û barî de bibexşîne û lingên me (di rêka xwe de) bi cih bike û li hember civata kafir me bi ser bixe.

**148.** Xwedê nîmeta vê dinyayê û ya hê jê xweştir jî; xelata axretê da wan. Helbet Xwedê ji qencîkarên rast û durist hez dike.

**149.** Gelî yên bawerî anîne! Eger hûn bi gotina kafiran bikin dê we bi ser pehniya we ve vegerînin (şirkê) û hûn ê xesirî vegerin.

**150.** Na, (bi ya kafiran mekin) Xwedê dost û arîkarê we ye, her ew e çêtirînê arîkaran.

**151.** Bi sedema ku bêyî delîleke ku Xwedê daxistibe, ji Xwedê re hevpişk çêkirin, em ê tirsê biavêjin dilê yên kafir û vehewîngeha wan jî agir e, ji zaliman re çi pîs war e ew!

**152.** Bêguman, Xwedê peymana xwe bicih anî; wê dema we neyarên xwe bi destûra Wî şikandin û hûn bi ser ketin. (Serkeftina we berdewam kir) heyanî dema hûn ji ber hev ketin û di bara fermana (Pêxember de) we hev rakişand û piştî ku Xwedê tiştê we jê hez dikir nîşanî we da, we guhdarî (ya serdarê xwe) nekir. Hinan ji we dinya xwest (ji bo destkeftiyan cihê xwe berdan) û hinekan jî axret

xwest (li cihê xwe man û şehîd bûn). Paşê, da ku we biceribînê Xwedê berê we ji ser wan da paş (û hûn têk birin). Bêguman (piştî hûn poşman bûn) Xwedê li we bihurî û Xwedê li ser bawermendan xwedîkerem e.

**153.** Bînin bîra xwe, dema we (ji qada şer) bazdida û (ji tirs û dehşeta şer) we li pişt xwe nedimêzand. Hal ev e ku Pêxember jî ji pişt we ve gazî we dikir, (û we lê nedimêzand û we dengê wî jî dibihîst). Me jî derd li ser derdan da we, da ku hûn ji bo ya ku ji destê we çûye û bi ya ku hatiye serê we, xemgîn nebin. Xwedê ji ya ku hûn dikin, agahdar e.

**154.** Paşê, (Xwedê) piştî kederê ewleyî bi ser we de şand. Hinekan ji we hênijîn ew girtin û hinek jî ketibûn derdê canê xwe, di bara Xwedê de fikarên ne di rê de dikirin mîna fikarên xelkê cahiliyetê. Digotin: Qey rast e ku ji bo me arîkarî heye? (Ji wan re) Bibêje: Ferman tev a Xwedê ye, ew tiştê ku nikarin ji te re aşkera bikin, di dilên xwe de vedişêrin. Dibêjin: Eger (serkeftinek) ji me re hebûya, em ê li vê derê nehatina kuştin. (Ji wan re) Bibêje: Eger hûn li mala xwe bimana jî yê ku kuştin jê re hatibû nivîsîn, dê bihata cihê ecelê xwe (û ew ê dîsa bihata kuştin). Xwedê (wisa kir) da ku ya di dilê we de biceribîne û ya ku di dilê we de ye, paqij bike. Xwedê, bi ya di dilê we de dizane.

**155.** Bêguman, roja ku herdu kom (di cenga Uhudê de) rastî hev hatin, ji we ew ên pişta xwe dane şer û revîn, bes bi sedema hinek tiştên ku kiribûn şeytên ew ji rê şeqitandibûn. Lê Xwedê li wan borî û ew efû kirin. Bêguman Xwedê her gunehbexş e, berbihêr e.

**156.** Gelî yên ku bawerî anîne! Hûn nebin mîna wan ên ku kafir bûne; dema birayên wan derketin seferê (û tê de mirin) yan jî derketin cengê (û tê de hatin kuştin) digotin: "Eger ew li nik me bimana nedimirin û nedihatin kuştin. Xwedê dê vê xerabiya ha di dilê wan de bike derd û kovan. Xweda sax dike û dimirîne. Helbet Xwedê bi ya ku hûn dikin bîner e.

**157.** Eger hûn di riya Xwedê de bên kuştin an jî bimirin, (teqez ji bo we) li cem Xwedê lêborîn û dilovanî heye ku ew ji ya ku (ehlên dinyayê) li hev kom dikin, çêtir e.

**158.** Sond be; eger hûn bimirin an jî bên kuştin, hûn ê bi bal Xwedê ve bên komkirin.

**159.** Bi sebeba rehma Xwedê tu di biwara wan de nerm bûyî! Eger tu yekî xeberteḥl û dilhişk bûyayî, bêguman ew ê ji hawîrdora te belav bibûna û biçûna. Naxwe li wan bibore, lêborîna gunehên wan ji Xwedê bixwaze û di bara karên (gelemperî) de bi wan bişêwire. Vêca dema te biryar da, xwe bispêre Xwedê. Bêguman Xwedê ji yê ku xwe bispêrê, hez dike.

**160.** Eger Xwedê arî we bike tiştek dê zora we nebe. Eger ew dest ji arîkariya we berde, êdî piştî wî, kî ye yê ku arî we bike? Bila bawermend tenê xwe bispêrin Xwedê.

**161.** Ne babetê pêxemberekî ye ku (li malê xenîmetê) xiyanetê bike. Kî xiyanetê bike,

roja qiyametê tevlî tiştê ku diziye wê bi bal Xwedê ve bê. Piştre kê çi qezenc kiribe ew ê bêkêmasî jê re bê dayîn û dê qet neheqî li wan nebe.

**162.** Ma qey wekhev in; ewê ku dabe pey rizaya Xwedê û ew ê ku bikeve bin qehra ji Xwedê ku cihê wî dojeh e û ew der çi pîs war e?

**163.** Ew li cem Xwedê mertebe bi mertebe ne (mertebeya her kesî cihê ye) û Xwedê bi ya ku ew dikin, agahdar e.

**164.** Misoger Xwedê nîmeta xwe li bawermendan kiriye ku ji wan re, di nav wan de pêxemberek şandiye ku ew ji wan re ayetên Xwedê dixwîne, wan (ji şirk û neqenciyê) paqij dike û wan hînî Qur'an û hîkmetê dike. Çendî ew, berî Pêxember di rêşaşiyeke aşkera de bûn jî.

**165.** (Gelî bawermendan!) Çi dema (li Uhudê) felaketek hate serê we û we (li Bedrê) du qatî wê anîbû serê wan, we got: Ma ev a ha ji ku hat serê me?! (Ya Muhemmed! ji wan re) Bibêje: Ew, (ji texsîratiya) ji cem we ye. Bêguman Xwedê li ser her tiştî xwedanşiyan e.

**166.** Di wê roja ku du kom (misliman û kafir) di ceng (a Uhûd)ê da rastî hev hatin, a hatî serê we, ew bi destûra Xwedê bû û da ku bawermend (bi rewşa xwe ya resen) aşkera bibin.

**167.** Da ku yên munafiq jî aşkera bibin. Ji wan re hate gotin: Werin di rêka Xwedê de şer bikin an jî berevaniya mislimanan bikin. Gotin: Eger me bizaniya şer heye em ê digel we bihatina şer. Ew wê rojê ji baweriyê bêhtir nêzîkî kafiriyê bûn; a ku bi devê xwe digotin ne ya di dilê wan de bû. Xwedê jî bi ya ku di dilê xwe de vedişêrin bêhtir dizane.

**168.** (Ya Muhemmed!) Wan ên ku neketibûn cengê, ji birayên xwe re digotin: "Eger bi ya me bikirina nedihatine kuştin". Bibêje: "Eger bi rastî hûn rastbêj in de mirinê ji ser xwe bidin alî."

**169.** Zinhar tu wan kesên ku di riya Xwedê de hatine kuştin, mirî guman meke! Belkî ew sax in; ji cem Perwerdegarê wan risqê wan tê dayîn.

**170.** Bi ya ku Xwedê daye wan kêfxweş in û mizgîn didine wan ên ku hîn negihîştine wan; ne tirs li ser wan heye ne jî ew xemgîn dibin.

**171.** Ew, bi nîmeta ku ji Xwedê tê û bi kerema Wî dilşad dibin û mizgîn didin ku Xwedê xelata bawermendan winda nake.

**172.** Ew ên ku piştî (li Uhudê) birîndar bûn bersiva banga Xwedê û Pêxemberê Wî dan, -ji wan- ew ên ku qencî kirin û xwe bi sînorê Xwedê parastin, ji wan re xelateke mezin heye.

**173.** Ew ên ku mirovan ji wan re got: "Xelk ji bo êrîşa li ser we li hev kom bûne, Naxwe ji wan bitirsin!" Îcar vê gotinê, baweriya wan zêdetir kir û gotin: Xwedê her besî me ye, ew xweş wekîl e.

**174.** Vêca ew li xweşdayîn û qenciya Xwedê vegeriyan, tu nerindiyê ew nehingaftin û bûne peyrewên pêxweşbûna Xwedê. Xweda xwediyê qenciya mezin e.

**175.** Birastî ew şeytan bû, bes wî dostên xwe ditirsandin. Naxwe ji wan netirsin; her ji min bitirsin eger hûn bi rastî bawermend in.

**176.** (Ya Muhemmed!) Ew ên ku di (arîkariya) kufrê de lez û bez dikin bila (ew rewşa wan) te xemgîn meke. Bêguman ew ê qet neşin tu zerarê bidin Xwedê. Xwedê dixwaze ji wan re di axretê de tu parê nehêle. Ji bo wan jî (wê rojê) her azareke mezin heye.

**177.** Bêguman ew ên ku di şûna îmanê de kafirî kirin, ew bi tu awayî nikarin ziyanê bidin Xwedê û ji bo wan her ezabekî dijwar heye.

**178.** Bila ew ên ku kafir bûne, zen mekin ku muhleta me daye wan ji bo wan çêtir e. Bes me fersend da wan da ku gunehên xwe zêde bikin û paşê ji wan re ezabekî riswaker heye.

**179.** (Gelî mirovan!) Xwedê bawermendan di rewşeke wekî rewşa hûn tê de (wiha tevlihev) qet nahêle heyanî ku mirovê pak û kirêt ji hev veneqetîne. Xwedê qet we bi ser xeybê ve jî nake, lê belê ji qasidên xwe kê bivê (wî) hildibijêre. Naxwe bi Xwedê û pêxemberên Wî bawerî bînin. Eger hûn bawerîyê bînin û xwe (ji gunehan) biparêzin, ji bo we xelateke mezin heye.

**180.** Ew ên ku Xwedê -ji comerdiya xwe- daye wan ku tê de çikûsiyê dikin bila guman nekin ku ew ji wan re xêr e; belkî ew ji wan re şer e. Ew a ku çikûsî tê de kirin roja qiyametê dê li stûyê wan bê pêçandin. Mîrateya asîmanan û erdê jî her ji bo Xwedê ye û Xweda bi ya ku hûn dikin agahdar e.

**181.** Sond be, Xwedê peyva wan kesên ku gotin: „Xwedê xizan e û em dewlemend in" bihîstiye. Em ê vê gotina wan û kuştina pêxemberan a bi neheqî binivîsin û em ê (ji wan re) bibêjin: De êdî ezabê bişewat biçêjin!

**182.** Ha ew (ezab) ji ber ya ku we li dinyayê kiriye. Xwedê tu car zilmê li bendeyê xwe nake.

**183.** Ew (cihûy)ên ku gotin: "Xwedê (di Tewratê de) qewêtî li me kiriye ku heya qurbaneke ku agir wê bixwe ji me re neyîne em bi tu pêxemberî bawerî neyînin. (Ji wan re) bibêje: Beriya min pêxember bi delîl û bi ya ku we digot hatine bal we ve. Vêca eger birastî hûn rast dibêjin çima we ew kuştin?[1]

**184.** (Ya Muhemmed!) Eger ew bi te bawerî neyînin, veca birastî gelek pêxemberên beriya te jî bawerî bi wan nehatibû kirin, digel ku ew bi delîl, suhûf û kitêbên ronker jî hatibûn.

**185.** Her candar dê mirinê biçêje. Bêguman roja qiyametê hûn ê cezayê xwe wergirin. Vêca kî ji êgir were dûrkirin û biçe bihiştê, bêguman ew rizgar bûye. Jiyana vê dinyayê ji pertalê xapandinê pê ve ne tiştekî dî ye.

**186.** Sond be, hûn ê der heqê mal û kesên xwe de bêne ceribandin û misoger hûn ê

1 Ji Îbnu Ebbas hatiye ragihandin, gotiye: Civatek ji cihûyan hat bal Peyxamber (s) ku di nav wan de Ke'b kurê Eşref û Malik kurê Sayif û Fenehas kurê 'Azûra' û dîgerên wan jî hebûn û gotinê: Ya Muhemmed! Tu dibêjî ku ez peyxamberê Xwedê me û Xwedê kitêbek ji min re şandiye. Hal eve ku Xwedê di Tewratê de şîret li me kiriye ku em baweriyê bi tu peyxamberî neyînin hettanî ku qurbanekî ji me re neyîne û agir jî newe û wê Naxwe. Vêca heke tu vê ji me re bînî emê te rast bidêrin. Vêca ev ayeta ha di vê mijarê de daket:

ji wan ên ku beriya we kitêb ji wan re hatiye dayîn û ji wan ên ku ji Xwedê re şirîkan çêdikin, eziyeteke pir bibînin. Eger hûn sebir bikin û hay ji (fermanên) Xwedê hebin, vêca ha ew bi rastî ji karên mikûm e ku divê mirov bike.

**187.** Wê dema Xwedê ji wan ên ku kitêb ji wan re hatiye dayîn peyman wergirt ku "hûn ê wê (kitêbê) ji xelkê re aşkera bikin û wê (ji xelkê) veneşêrin." Lê wan peyman avête pişt guhê xwe û ew bi bihayekî hindik firotin. Vêca ya ku kirin çiqas pîs e!

**188.** (Hey Muhemmed!) Tu guman meke ew (cihû)yên ku bi kar û kiryarên xwe dilxweş dibin û hez dikin ku bi ya nekirine bêne pesindan -erê tu guman meke- ku ew ê ji ezab xelas bibin. Ji bo wan her ezabekî dijwar heye.

**189.** Xwedanî û hukimraniya erd û asîmanan her ji Xweda re ye. Xwedê li ser her tiştî qadir e.

**190.** Bêguman di afirandina asîmanan û zemînê de, di kurtkirin û dirêjkirina şev û rojê de ji bo hişmendan teqez nî¬şan hene.

**191.** Ew ên ku ji piyan û rûniştî û li ser teniştên xwe dirêjbûyî zikrê Xwedê dikin (Xweda di bîr tînin) û derbarê afirandina asîmanan û zemînê de difikirin, (ew wiha dibêjin): Perwerdegarê me! Te ev (kaînata ha) pûç neafirandiye, tu ji her kêmasiyê pak û paqij î, vêca me ji azara êgir bipa¬rêze!

**192.** Perwerdegarê me! Bêguman Tu kê bixî êgir vêca bêguman Te ew riswa kiriye û ji bo stemkaran qet tu arîkar tun in.

**193.** Perwerdegarê me! Bêguman me seh kir ku gazîkerek her kesî vedixwîne bawe¬riyê, ango dibêje: Bi Xwedê û pêxemberê wî bawerîyê bînin, vêca me bawerî anî. Perwerdegarê me! Naxwe li gunehên me bibore, xerabiyên me veşêre û me digel qencan bimirîne.

**194.** Perwerdegarê me! Ya ku Te li ser zimanê pêxemberên xwe bi me re soz daye, bide me û me roja qiyametê riswa meke. Bêguman Tu ji soza xwe venagerî.

**195.** Vêca Xwedayê wan bersiva (duaya) wan da (û got:) Ez kirina kiryarekî ji we -çi mêr be çi jin- qet winda nakim, (lewra) hûn ji hev in. Ew kes ên ku hicret kirine, ji welatên xwe hatine deranîn, di riya min de hatine êşandin, şer kirine û hatine kuştin, sond be; ez ê li gunehên wan bibûrim û ez ê wan bixim bihiştên wisan ku di binê wan re çem diherikin. Ev xelat ji nik Xwedê ye û mukafata herî xweş her li cem Xwedê ye.

**196.** Bila ger û fera wan ên ku kafir bûne ya di welatan de te nexapîne

**197.** Ew pêxweşbûneke hindik e, paşê vehewîngeha wan dojeh e û ew der çi pîs hedangeh e!

**198.** Lê belê ew ên ku hay (ji ferman û qedexeyên) Xwedayê xwe hene, ji wan re bihiştên wisa hene ku di binê wan re çem diherikin, ew heta bi hetayê dê lê bimînin, ev mêvandariyeke ji cem Xwedê û ji bo qencîkaran ya li cem Xwedê muheqqeq çêtir e.

**199.** Bêguman, ji yên xwedankitêb hin kes hene ku bi Xwedê û bi ya ku ji we re hatiye hinartin û bi ya ku ji wan re hatiye hinartin bawerî tînin, ji Xwedê ditirsin

û ayatên Xwedê bi pereyekî hindik nafiroşin. Ji bo wan, li cem Perwerdegarê wan xelatek heye. Bêguman berpirsgirtina Xwedê, pir bilez e.

**200.** Gelî yên ku bawerî anîne! Sebrê bikêşin, tewsiya sebrê bikin û nobetê li sînorên xwe bigirin û hay ji mafê Xwedê hebin da ku hûn bi ser bikevin.

## 4. SÛREYÊ NÎSA

Sûreyê Nîsa, 176 (sed û heftê û şeş) ayet e. Piştî hicretê li Medînê nazil bûye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Gelî mirovan! Xwe ji (bêemriya) Xwedayê xwe biparêzin, ew Xwedayê ku hûn ji yek nefsê afirandine û ji wê hevjîna wê afirandiye û ji herduyan jî gelek mêr û jin zêde kirin. Hay ji (emr û nehyên) Xweda hebin, ew ê ku hûn bi xatirê Wî ji hev dixwazin û hay ji pêkanîna mafê lêziman (eqrebeyan) jî hebin. Bêguman Xwedê teqez li ser we zêrevan e.

**2.** Malê sêwiyan (piştî ku balix bûn) bidin wan û malê (xwe yê) nepak bi yên (wan ê) pak neguherînin, malên xwe tevî malên wan nekin û nexwin; bêguman ev gunehekî mezin e.

**3.** Eger derbarê sêwiyan de hûn ji bêedaletiyê bitirsin, vêca ji jinên ku li xweşa we diçin, dudu, sisê û çaran li xwe mehr bikin. Eger hûn ji bêʿedaletiyê bitirsin, vêca yekê (li xwe mehr bikin) yan jî bi cariyên ku di bin destê we de ne iktîfa bikin. Ev, da ku hûn pêrgî tengasiyê nebin ya herî munasib e.

**4.** (Gelî mêran!) Mehra jinan bi ciwanmêrî bidin wan. Eger ew bi (rizaya) dilê xwe hinekî ji wê mehra xwe bidin we, wê çaxê bi noşîcanî bixwin.

**5.** (Gelî weliyan!) Malê kesên kêmhiş, ên ku Xwedê hûn ji wan re kirine berpirsyar, nedine wan; bi wî malî wan xwedî bikin û bi cil û berg bikin û ji wan re gotina xweş bibêjin.

**6.** Sêwiyan, heta çaxa zewacê biceribînin; eger hûn hişmendiya (ruşîdbûna) wan bibînin, vêca malên wan bispêrine wan. (Gelî weliyan!) Bi destbelavî û ji tirsa ku sêwî zû mezin bibin û ewên malên xwe ji we bistînin, malên wan nexwin! Bila, ê ku zengîn be xwe ji malên wan dûr bigire, yê ku xizan be jî, bila bi qasî pêdiviya xwe jê bixwe. Dema we malên wan dan wan, li serê du şahidan rakin. Xwedê ji aliyê hesabpirsînê ve besî we ye.

**7.** Ji mîrateya ku dê û bav û lêziman li pey xwe hiştine, ji mêran re parek heye û ji bo jinan jî, ji mîrateya ku dê û bav û lêziman li pey xwe hiştine parek heye. Ji malê mîratê çi hindik be çi pir pareke misogerkirî heye.

**8.** Dema nêz û lêzim, yên sêwî û belengaz (ew ên ku ne waris in) li ser parvekirina

mîrateyê hazir bibin, vêca ji vî malî hinekî jê bidine wan û ji wan re peyveke xweş bibêjin.[1]

**9.** Ew ê ku li dûv xwe zarokine jar û bêçare bihêlin û li ser wan bitirsbin, bila derbarê sêwiyan de jî bitirsin û bila xwe ji Xwedê biparêzin û rast û durist biaxivin.

**10.** Bêguman ew ên ku bi neheqî malên sêwiyan dixwin, bes ew zikê xwe ji êgir tije dikin û paşê ew ê bikevin agirê sincirî.

**11.** Xwedê, der barê zarokên we de li we ferman dike ku ji mîratê, ji kuran re bi qasî para du keçan heye. Eger mîratxwer tev keç bin, (du keç yan) di ser duyan re bin, vêca ji sisêyan didu yê mîratê ji wan re ye. Eger keçek be nîvê mîratê jê re ye. Ji dê û bavê mirî re jî, eger zarokên wî hebin ji bo her yekî ji dê û bavê wî re şeşyek heye. Êdî eger zarokên wî nebin û dê û bavê wî bibine mîratxwerê wî vêca ji bo dayîka wî sêyek heye û eger xwişk û birayên wî hebin îcar ji bo dayîka wî şeşyek heye. (Ev parvekirin tev) piştî pêkanîna wesiyeta kesê mirî û piştî dana deynên wî ye. Dê û bavên we û zaroyên we, hûn nizanin kîjan ji we re bifeydetir in. (Ev parvekirin) ji aliyê Xwedê ve wiha hatiye ferzkirin. Bêguman Xwedê zanayê bi mexlûqê xwe ye û karbinecihê di karê xwe de ye.[2]

**12.** (Gelî mêran!) Piştî pêkanîna wesiyeta wan û dayîna deynên wan, ji mîrateya ku ji jinên we maye, eger zarokên wan tune bin nîvî ya we ye. Eger zarokên wan hebin vêca çaryeka mîrateya ku li pey xwe hiştine ji we re ye. Ji bo jinên we jî, eger ku zarokên we nebin çaryeka mîrateya ku we li pey xwe hiştiye heye. Vêca eger zaroyên we hebin naxwe ji bo wan heştyeka mîrateya ku we li pey xwe hiştiye heye, ev jî piştî pêkanîna qewîtiya we û piştî dayîna deynê we ye. Eger mêrek bi kelaletî (bêdundan) mîrateyê li pey xwe bihêle yan jinek bi vî awayî mîrateyê li pey xwe bihêle û ji bo her yekî ji wan birayek yan jî xwişkek hebe, vêca piştî pêkanîna wesiyeta wan û piştî dayîna deynekî bêzerar, ji bo her yekî ji wan şeşyek heye. Êdî eger xwişk û bira ji yekî pirtir bin vêca ew di sêyekê de pişkdar in. Ev fermana Xwedê ye li ser we. Xwedê zana ye, berbihêr e.

**13.** Ew sînorên Xwedê ne, kî ku bi ya Xwedê û pêxemberê Wî bike, dê wî bixe bihiştên ku çem di bin wan re diherikin ku dê heta hetayê tê de bimînin. Ha ev e serfiraziya mezin.

**14.** Kî jî ku bêemriya Xwedê û pêxemberê Wî bike û ji sînorên Wî derbas bibe, dê wî têxe agirekî ku tê de seraqetî bimîne û muheqeq jê re ezabekî riswaker heye.

**15.** Ji jinên we yên ku zinayê dikin, çar şahidan ji xwe (ji mêrên misliman) li ser

---

1 Îslamiyetê, ji bo palpiştî û dada civakî pêk bîne û biratiya însanî û hevdostiyê misoger bike; parek daye xizm, sêwî û belengazên dûr da ku çavnebariyê ji xizmên xwe nekin û ji bo ku hest û hisên bi kîn bikuje û dilê wan jî razî bike.

2 Îslamê, di hiqûqa parvekirina mîrasê de li gorî binbarî û pêşniyaran pişka mêr û jinê daye wan û di neqeba wan de ahengsazî pêk aniye; pir daye yê ku pêwîst e zehf xerc bike û hindik daye yê ku dê kêm xerc bike. Li gorî hiqûqê îslamê ya malbatî, kesê ku dema bixwaze bizewice divê mesrefa dawetê mêr bide û mehra jinê jî ew bide. Piştî jinanînê jî, mêr dîsa divê ew li xizmên xwe yên muhtac û jin û zarokên xwe binêre; xwarina wan, cilên wan, xaniyê wan û dermanên wan temîn bike. Ji ber van sedeman îslamê bi qasî para du jinan pay daye mêran.

wan rakin, vêca eger wan li ser wan şahdeyî da; heta ku mirina wan bê yan jî heta Xwedê ji wan re riyeke çareseriyê veke, wan di malên wan de girtî bihêlin.

**16.** Ji nav we ew jin û mêrên ku zinayê dikin, (bi gotinan) ezyetê bidin wan; eger poşman bibin û xwe rast bikin, êdî dest ji ezyeta wan berdin. Bêguman Xwedê tobepejrên e, dilovîn e.[1]

**17.** Bêguman ew tobeya ku tê wergirtin û pejirandin, bes tobeya wan ên ku ji nezanîn ve gunehan dikin û piştre jî di demeke nêzîk de (poşman dibin û) tobe dikin; ha Xwedê tobeya wan qebul dike. Xwedê zana ye, karbinecih e.

**18.** Pejirandina tobeyê ne ji bo wan ên ku xerabî û gunehan dikin (û li serê berdewam in) heyanî yek ji wan dikeve ber mirinê, êdî (ji nû ve) dibêje: "Min vêga tobe kir" û ne ji bo wan ên ku li ser kufrê jî dimirin. Ev ên wisa, me ji bo wan ezabekî cansoj amade kiriye.

**19.** Gelî yên ku bawerî anîne! Ji we re ne helal e ku hûn bi kotekî bibin mîratxwerê jinan û ji bo we ne helal e ku hûn wan tengezar bikin da ku mehra we daye wan hûn ji wan bistînin. Lê ku tolaziyeke aşkera bikin ew tiştekî din e. Bi wan re xweş bibuhêrin. Vêca eger hûn ji wan bêzar bin; (sebrê bikêşin û wê bernedin), êdî dibe ku hûn tiştekî nevên, Xwedê ji bo we xêr û bêreke pir têxê.[2]

**20.** Eger we dil hebe ku jinekê berdin û di şûna wê de jineke din bînin û we malekî pir (bi navê mehrê) dabiyê, vêca ji wî malî tiştekî nestînin. Hûn ê çawa wî malî bi bêbextî û gunehkariyeke aşkera jê bistînin?!

**21.** Ma çawa hûn ê (mehrê) ji wan bistînin, digel ku hûn têkilî hev bûne û wan ji we peymaneke qewîn jî wergirtiye.

**22.** Hûn wan jinên ku bavên we ew mehr kiribin mehr nekin (bi wan re nezewicin), ji bilî ya ku berê hatibe kirin (ew tê efûkirin). Bêguman ev karekî zêde kirêt, hêrslêbûyî û çi pîserê ye.

---

1 Ev her du ayetên pîroz di bara zinayê de ne. Ayeta yekem cizayê zinaya yên zewicî û ayeta duyem jî cizayê zinaya nezewiciyan ku beriya îslamê dihat tetbîqkirin, eşkere dike.

Pişt re bi daketina ayeta sûreyê „en-Nûr" ya duyem û bi suneta Peyxamber (s) a pratikî ev ayet nesix bûne. Vêca cizayê zinaya aziban sed çov e û cizayê zinaya zewiciyan jî recm e. Li gorî hin tefsîrzanan jî ev ayet nesix nebûne. Ayeta yekem xasê xirabiya jinan a bi jinan re ye. Ayeta duyem xasê xirabiya mêran a bi mêran re ye. Cizayê van her du xirabiyan eynî fena di ayetan de hatiye diyarkirin, berdewam e. Heçî ku zinaya mêr û jinan bi hev re; cizayê wê di Sûreyê en-Nûr de hatiye eşkere kirin.

2 Gava mêr bizewice lazime nikaha xwe li ser hinek mal bibire, navê wî malê ku li ber nikahê bi navkirine mehr tê gotin. Miqdarê mehrê li gorî urf û adetê tê teyînkirin. Mehr, heqê jinê ye. Malê wê yê taybetî ye. Heke mehra jinê pêşîn nehatibe dayîn, gava mêrê wê mir derhal divê bê dayîn. Hîç ne helal e û mafê mêran tune ku bi hîle û saxtekarî tevekê mehrê yan hinekî jê ji jinê bistînin. Di ayetê de qintar derbas bûye ku mebest jê malekî pir e. Di dema Xelîfetiya Îmam Umer de mehra jinê pir zêde bûye. Vêca Umer li ser minberê wiha got: Gelî mirovan! Mehra jinan pir zêde nekin. Heke pir mehrdayîn li dinyayê camêrî bûya yan jî li cem Xwedê teqwa bûya ji we bêhtir diviyabû Peyxamberê Xwedê ew zêde bikira û bidaya. Lêbelê em dizanin ku wî zêdeyî diwanzdeh ûqiye mehra yekê ji xanimên xwe û keçên xwe nebirriye. Li ser vê yekê ji nav cemaetê jinek rabû ser xwe û got: Hey Umer! Xweda dide me lê tu ji me re heram dikî. Ew dibêje: "Heke we qentarek mal dabe yekê ji wan.. ." Vêca em dê li pey gotina te herin yan jî li pey gotina Xwedê herin? Vêca Umer got: Jinikê rast got û Umerî şaş kir! Her kes ji Umer zanatir e. Hûn bi kêfa xwe ne. Hûn mehra jinan çiqasî bixwazin wisa bidin wan û bizewicin.

**23.** Dayîkên we, keçên we û xwişkên we, metên we û xaltîkên we, keçên bira û keçên xwişkên we, dayîkên we yên şîr û xwişkên we yên ji şîr, dayîkên jinên we û keçhiliyên we yên di malên we de ku hûn çûne nivînên dayîkên wan -êdî eger hûn neçûbin nivînên dayîkên wan tu guneh li ser we nîn e ku hûn wan li xwe mehr bikin- û jinên kurên we yên ji pişta we û ku hûn ji xwe re bi jinanî du xwişkan bînin cem hev, li we hatine qedexekirin. Lê tiştê ku beriya vê fermanê borî ew li we nayê girtin. Bêguman Xwedê teqez bexşînerê gunehan e, dilovîn e.

**24.** (Nîkaha) jinên bimêr jî (li we hatiye heramkirin), ji bilî wan cariyeyên ku bi cihadê we bi dest xistin (ew ê ku mêrên wan kafirin, piştî ku iddeyê wan xilas bû helal dibin). Ev fermana Xwedê ye li ser we hatiye nivîsîn. Ji bilî van a ên din, bi şertê ku hûn bi namûs bin û ne zinaker bin, ji we re hatine helalkirin ku hûn bi malê xwe wan bixwazin. Vêca, heçî ya ku hûn bi çûna nivîna wan xweş bûne, mehra wan a ku li ser we ferz e bidine wan. Piştî mehra ku hatî kifşkirin, eger hûn (di nav xwe de) li hev bên û hinekî jê kêm bikin (di vê de) li ser we tu guneh tune ye. Bêguman Xwedê ‘Elîm e, Ḥekîm e.

**25.** Ji we, ew kesê ku ji desttengî nikare jineke binamûs a bawermend mehr bike, bila qerwaşekê ji wan keçên we yên bawermend ku di bin destê we de ne ji xwe re bîne. Xwedê bêhtir bi baweriya we dizane. Hûn tev (di dîn de) wekhev in. Naxwe qerwaşan bi destûra xwediyên wan mehr bikin, bi rindî mehra wan bidin wan, (bi şertê) ku bi namûs bin, ne zinaker bin û ne jî dostik ji xwe re girtibin. Êdî piştî zewacê eger zinayê bikin nîvê cezayê jina azad li wan tê xistin. Ev (destûr), ji bo wî kesî ye ku ji kirina zinayê bitirse. Eger hûn xwe ragirin (û cariyan mehr nekin) ji we re çêtir e. Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.[1]

**26.** Xwedê dixwaze (helal û heraman) ji we re aşkera bike, riya wan (pêxember û qenc)ên beriya we nîşanî we bide û tobeya we qebûl bike. Xwedê ‘Elîm e, Ḥekîm e.

**27.** Xwedê dixwaze tobeya we bipejirîne û ew ên ku didin pey hewesên xwe jî dixwazin hûn ji heqiyê bi bal pûçiyê ve vegerin.

**28.** Xwedê dixwaze (barên) we sivik bike; lewra însan qels hatiye afirandin.

**29.** Gelî yên ku bawerî anîne! Ji bazirganiyeke ku we bi dilê hev kiribe pê ve, di navbera xwe de, malên hev bi neheqî (bi rêkên heram) nexwin û (bi kirina gunehan) xwe nekujin. Bêguman Xwedê teqez ji bo we pir birehm e.

**30.** Kî bi êrîşkarî û bi neheqî vê bike, vêca em ê wî bixin nav êgir. Ev li cem Xwedê hêsan e.

---

**1** Zina, hemin heram e. Ne rewa ye ku mirovek miqdarek dirav bide jinekê da ku heta demeke mueyyen pê re bimîne. Eger zilamek bi yarîtî yan jî bi peran bi jinekê re bijî ew jî zina ye. Mislimanek eger pêdiviya wî bi zewacê hebe, vêca derfetên wî jî hebin divê jineke bawermend û azad mehr bike; lê destûr heye ku jineke azad ji xristiyan û cihûyan jî mehr bike. Eger nikaribe bi jineke azad re bizewice, bila bi cariyeyeke bawermend re bizewice, eger ew jî nebe bi cariyeyeke ehlê kitêb re bizewice. Lêbelê eger ku cariye ya yekî din be, hin xeterên wê hene. Ji loma heke bi cariyeyê re nezewice, sebrê bikêşe, heta ku derfetên wî çêbibin û pişt re bi jineke azad û mumîne re bizewice jê re çêtir e.

**31.** Eger hûn xwe ji gunehên mezin ên ku li we hatine qedexekirin biparêzin, em ê li gunehên we biborin û em ê we bixin cihekî (bihiştekе) birûmet.[1]

**32.** (Gelî mumînan!) Dilê xwe nebijînin wan tiştên ku Xwedê we pê di ser hev re girtiye. Ji mêran re ji ya ku bi dest xistine parek heye û ji jinan re jî ji ya ku bi dest xwe ve anîne parek heye û ji Xwedê kerema wî bixwazin. Bêguman Xwedê bi her tiştî zana ye.

**33.** Me, ji her yekî ji we re mîratgir gerandine, ji terîketa ku dê û bav û lêziman û ewên ku we bi wan re peyman daniye para wan (mîratgiran) bidine wan. Bêguman Xwedê li ser her tiştî çavdêr e.[2]

**34.** Bi sedema ku Xwedê hin kes di ser hin kesan re girtine û ji ber ku mêr malên xwe li jinan xerc dikin, mêr nîgahdar û rêvebirê jinan in. Jinên qenc, îtaetkar in, bi sedem ku Xwedê ew parastine di nepeniyê de xwe diparêzin. (Gelî mêran!) Ew jinên ku hûn ji xeyd û bêîfetiya wan endîşe dikin, vêca şîretan li wan bikin, (eger neyêne rê) xwe ji nivînên wan dûr bikin, (eger bi vê jî neyên rê) li wan bidin. Eger wan bi ya we kir, êdî li hemberî wan li tu riyên din negerin; bêguman Xwedê bilindşan e, mezinhêz e.[3]

**35.** Eger hûn ji xerabûna navbera jin û mêr endîşe bikin, hekemekî ji lêzimên mêr û hekemekî ji lêzimên jinê bişînin cem wan. Eger ev hekem lihevhatina wan bixwazin û pêk bînin Xwedê dê navbera wan çêke. Bêguman Xwedê zana ye, agahdar e.

**36.** (Gelî mirovan!) Îbadetê Xwedê bikin û qet tiştekî jê re nekine şirîk. Li dê û bav û lêzimên xwe, li sêwî û belengazan, li cîranên nêzîk û li cîranên xwe yên dûr, li hevalên xwe (yên seferê û kar) û li rêwî û li koleyên ku di bin destê we de ne qenciyê bikin. Bêguman Xwedê ji yê xwedbîn û ji yê qure hez nake.

---

1 Însan, bi xulqiyeta xwe ne wek melayîketan e. Qabil e ku ew gunehan û xêran jî bikin. Lewra pêwendiya vê bi vîna wan û têkoşîna wan a bi xwe re heye. Heke evd, tişta ku jê were bike, Xwedê Teala gunehên biçûk nade rûyê wî.

Ji Mucahid hatiye ragihandin ku çi gava dayîka muminan Ummu-Seleme (Xweda jê razî be) got: Xwezî em jî zilam bûna, me jî cîhad bikiraya da ku xêra ji mêran re heyî ji me re jî bihata. Êdî ev ayeta pîroz daket.

2 Mebest bi wan kesên ku sonda we li ser wan hatiye girêdan ew hevpeyman in ku di berî Îslamê de bûn. Dema yekî jinek dianî xizmên jinê pê re bazar dikirin ku piştî mirina xwe wan ji xwe re bike mîratgi. Wî jî qebûl dikir. Yan jî yekî ew ji xwe re dikir kur û soza mîratgirî û arîkariyê dida wan. Pişt re hukmê vê ayetê bi ayeta Sûretê el-Enfal, ya 75-ê ji rewacê hate rakirin.

3 Bi rastî dijminê Îslamê ev yek pir sûîstimal kirine û ji bo xwe kirine navgîn da ku êrîşî Îslamê bikin û bi vê behaneyê îddîa dikin ku îslamê rûmet nedaye jinê û şerefa wê neparastiye. Lewra destûr daye mêr ku lê bide!! Dibêjin ku Qur'an çawa destûra mêr daye ku li jinê bide? Em dikarin wiha bersiva wan bidin: Belê, rast e. Xwedê destûra mêr daye ku li jinê bide. Lêbelê mêr dê kengî li jinê bide? Lêdan, dê ji bo çî ye? Weke ku di Hedîsa Şerîf de jî hatiye diyarkirin; lêdaneke ku şûna wê li bedenê çênebe. Bes ji bo edebgirtinê dê lêxe Belê, gava jin bi mêrê xwe re xweş derbas neke, jiyana jin û mêrîtiyê bike zindan, di vê rewşê de mêr dê çi bike? Mêr, ya ku Xwedê di Qur'anê de gotiye dê bike. Bi rastî Qur'anê rêya çareseriyê nîşan daye; pêşî ferman li mêr kiriye ku sebrê bikêşe û bi jinê re xweş derbas bike, lê şîret bike. Pişt re wê di nivînê de bi tenê bihêle, heke ev navgîn fêde nedin, vêca awayekî din lazim e ku ew jî lêdan e. Ji bo ku eks û rika şeytanî bişkîne. Zerara lêdanê ji bo jinê ji zerara berdanê hindiktir e. Gava zerara biçûk û ya mezin bêne kêleka hev, wê çaxê zerara biçûk dibe qencî.

**37.** Ew ên ku çikûsî dikin û çikûsiyê ber xelkê dixin û ya ku Xwedê ji kerema xwe pir daye wan vedişêrin. Me jî ji bo nankoran ezabekî riswaker amade kiriye.

**38.** Ew ên ku bi riyakarî malên xwe xerc dikin, ne bi Xwedê û ne jî bi roja axretê bawerî tînin. Ew kesê şeytan jê re heval be, vêca ew çi pîs heval e!

**39.** Qey çi zerar li wan dibû ku wan bi Xwedê û roja axretê bawerî bianiya û risqê ku Xwedê dabû wan (di riya Wî de) xerc bikira? Xwedê, her zanayê bi helwesta wan e.

**40.** Bêguman Xwedê bi qasî giraniya zereyekî jî li tu kesî neheqiyê nake. Eger (bi qandî giraniya) zereyekî jî qenciya mirovekî hebe, Xwedê qat bi qat wê zêde dike û ji nik xwe xelateke mezin dide wî.

**41.** (Ya Muhemmed!) Ma (roja qiyametê) rewşa mirovan dê çawa bibe, dema em her umetekê digel şahidekî bînin (mexsed pê pêxember in) û te jî li ser umeta te bikin şahid?!

**42.** Wê rojê, ew ên ku kafir bûn û bêemriya pêxember kirin, ji dil dixwazin ku erd li wan bê hev û ew nikarin peyvekê jî ji Xwedê veşêrin.

**43.** Gelî yên ku bawerî anîne! Dema hûn serxweş bin heta hûn bizanin ka hûn çi dibêjin û dema hûn bi cenabet bin -ji bilî yê rêwî- heta hûn xwe neşon, zinhar (!) xwe nêzî nimêjê mekin. Eger hûn nexweş bin, yan rêwî bin yan yek ji we ji (avrêjê) hatibe, yan jî we dest li jinan dabe û we av bi dest nexistibe, wê çaxê bi axeke paqij teyemum bigirin; pê rû û destên xwe vemalin (mesih bikin). Bêguman Xwedê efûkar e, bexşende ye.

**44.** De ka li wan ên ku (Xwedê) parek ji kitêbê daye wan binêre! Wan di şûna hîdayetê de rêşaşî dikirî û wan dixwest ku hûn jî (wekî wan) riya rast û durist winda bikin.[1]

**45.** Xwedê (ji we) bêhtir bi neyarên we dizane. Xwedê, bi dost û piştevanî besî we ye û bi arîkarî jî besî we ye.

**46.** Qismek ji cihûyan bêjeyan tehrîf dikin (wan diguherînin) û dibêjin: semi‘na we ‘esayna, wesme‘ xeyre musme‘în û ra‘îna. Zimanê xwe lê diherbilînin û pê dev diavêjin dîn. Hal ev e ku eger bigotina, semi‘na we ete‘na (me bihîst û me fermana te pêk anî), unzurna (li me guhdarî bike û li me binêre), dê ji wan re çêtir û rasttir bûya. Lê belê bi sedem kafiriya wan Xwedê lanet li wan barand. Vêca ji bilî hinekan ew bawerî nayînin.[2]

---

1 Hatiye ragihandin ku Ebû Sufyan ji Ke‘b kurê Eşref -Haxamê cihûyan re got: Tu, mirovek î ku kitêbê dixwînî û dizanî. Em jî mirovne nexwende ne, em nizanin ka ji me û ji Muhemmed rêya kê ji me rasttir e? Vêca ji wan re got: De ka dînê xwe ji min re eşkere bikin. Ebû Sufyan got: Em ji heciyan re kom bi kom tiştan amade dikin, em avê li wan digerînin, em mêvanan xwedî dikin û em mala Xwedayê xwe avasaz dikin. Muhemmed jî ji dînê bav û bapîran veqetiyaye û pismametî ji hev qetandiye!! Vêca Ke‘b got: Dînê we ji dînê Wî çêtir e. Ez bi Xwedê kim; rêya we jî ji rêya ku ew li serê ye rasttir e. Ji loma Xwedê di bara wî de ew ayeta ku buhurî nazil kir.

2 Di ayetê de hevoka: “Wesme‘ xeyre musme‘in” derbas bû ku me jî ew bi “seh bike, tu nesehker bî ” wergerand. Ev hevok mumkin bû ku ji bo qencî û neqenciyê her duyan jî bi kar were. Ji bo qenciyê maneya wê ev bû: “seh bike, tu dê gotina nebaş seh nekî!” Ji bo neqenciyê jî maneya wê ev bû: “Bila tu nesehker bî”, yanî Xwedê te kerr bike, bikuje. Daxwaza cihûyan jî ev bû. Herwiha di ayetê de li

**47.** Hey gelî yên ku kitêb ji wan re hatiye dayîn! Berî ku em hinek rûyan misêwayî hev bikin, vêca em wan pêşpaşkî bizîvirînin, yan jî wekî ku me xwediyên (nêçîra) roja şemiyê (sebtê) mesix kirin, em wan jî mesix bikin, bi wehya ku me hinartiye bawerî bînin ku ew rastdêr e ji bo wehya (Tewrata) digel we, muheqeq fermana Xwedê her dê bête cih.

**48.** Bêguman Xwedê li yê ku ji Xwedê re hevparan çêdike nabore û ji bilî vê ji bo kesê ku bivê, li wî dibore. Çi kesê ji Xwedê re hevpar çêkiribe, wî bêbextiyeke giran û gunehekî mezin kiriye.

**49.** Ma tu li wan ên ku nefsa xwe pak didêrin, nanêrî? Na! Belkî Xwedê kesê ku bivê pak didêre û bi qasî derzika (di dendika) xurmê de neheqî li tu kesî nabe.

**50.** (Ya Muhemmed!) De binêre, çawa li ser (navê) Xwedê bi derewî bêbextiyan dikin û ev gunehkariya aşkera besî wan e.

**51.** Ma tu li wan ên ku parek ji kitêbê ji wan re hatiye dayîn nanêrî ku bi cipt û taxûtî (çi qas kesên serxweveçûyî) baweriyê tînin û ji yên kafir re dibêjin: Ha (hûn) ev ên ha ji wan ên ku bawerî anîne rasterêtir in!

**52.** Ha ev in, ew ên ku Xwedê lanet li wan barandî. Xwedê lanetê li kê bibarîne, vêca tu dê ji wî re tu arîkarekî nebînî.

**53.** Erê, ma ji seltenetê parek ji wan re heye, vêca ku hebana jî dê bi qasî derzika dendikê jî tiştek nedabûna mirovan.

**54.** Yan jî, ma ew ji mirovan (Pêxember û hevalên wî) -ji ber qenciya ku Xwedê ji kerema xwe daye wan- çevnebariyê dikin? Vêca bêguman me, kitêb û hikmet dabû malbata Îbrahîm û me selteneteke mezin jî dabû wan.

**55.** Hin ji wan bawerî (bi Muhemmed) anî. Hin ji wan jî berê xwe jê vegerandin. Dojeh, bi şewata xwe ve besî wan e.

**56.** Bêguman ew ên ku ayetên me înkar dikin, em ê wan bixin nav êgir, çi qas çermê wan bipije (ku êdî neêşe), em ê çermên wan bi çermekî din (nû) biguherînin da ku jana ezabê biçêjin. Bêguman Xwedê ‘Ezîz e, Ḥekîm e.

**57.** Ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirin, em ê wan bixin bihiştên ku ji bin wan çem diherikin û her û her ew ê lê bimînin. Di wan (cenetan) de ji wan re jinên pak û paqij hene û emê wan bixin bin siyeke seraqetî.

**58.** Bêguman Xwedê emr li we dike ku hûn emanetan (spareyan) bidin xwediyên wan û dema we di navbera mirovan de hukim kir bi dadî (edaletî) hukim bikin. Bêguman ev çi xweş şîret e ku (Xwedê) li we dike! Bêguman Xwedê bihîzer e, bîner e.

**59.** Gelî yên ku bawerî anîne! Bi gotina Xwedê, bi gotina Pêxember û bi gotina fermandarên ji xwe bikin. Êdî eger we der heqê tiştekî (lêqewmîneke) de hev rakişand -vêca eger bi rastî hûn bi Xwedê û bi roja axretê bawer in- wê bibine

---

muminan peyva: “Ra‘îna” jî hatiye qedexekirin. Lewra “Ra’îna” di zimanê erebî de çendî bi daxwaza “li benda me be” ye jî. Lêbelê di zimanê cihûyan de ji ber ku bi daxwaza “tu şivan bê” tê û wan bi wê mebestê ji peyxamberî re bi kar dianî, vêca Xwedê ji mislimanan re got: Di şûna “Ra‘îna” de „Unzurna“ bi kar bînin ku êdî cihû bi saxtekarî nikarbin gotina kirêt ji Peyxamberî re bibêjin.

ber (hukmê) Xwedê û Pêxember. Ev a ha (ji we re) çêtir e û dûmahîka wê rindtir e.

**60.** (Ya Muhemmed!) Ma tu wan ên ku qaşo dibêjin: Wan bi ya ku ji te re hatî şandin û bi kitêbên ku ji (pêxember)ên beriya te re jî hatine şandin bawerî aniye, nanihêrî; ew dixwazin li ber hukmê Taxûtî mehkeme bibin? Hal ev e ku ferman li wan hatibû kirin ku ew Taxûtî înkar bikin. Şeytan jî dixwaze wan bi şaşiyeke mezin ji heqiyê dûr bixe.

**61.** Dema ji wan re tê gotin: De werin ber ya ku Xwedê hinartiye û werin ber hukmê Pêxemberê Wî (da ku di nav we de hukm bikin); tu wan dibînî ku ew berê xwe ji te vedigerînin.

**62.** Êdî ma çawa tu li wan şaş namînî? Dema musîbetek bi sedema kirinên wan tê serê wan, di cih de têne cem te û (ji te re) bi Xwedê sond dixwin û dibêjin ku me her qencî û lihevhatin xwestiye!

**63.** Ha ew, ên ku Xwedê bi ya di dilê wan de dizane, êdî guhê xwe nede wan, li wan şîret bike û ji wan re di kûrahiya nefsa wan de gotineke bi tesîr bibêje.

**64.** Çi pêxemberê ku me şandiye her ji bo ku bi destûra Xwedê bi gotina wî bê kirin me şandiye. Eger dema wan (bi kirina gunehan) neheqî li xwe kir, bihatina cem te û bexşandina xwe ji Xwedê bixwestina û Pêxember jî bexşandina (gunehên) wan (ji Xwedê) bixwesta, dê wan bidîta ku Xwedê gelek tobepejrên e, dilovîn e.

**65.** Na, sond bi Xwedayê te, ew, heta ku di lecên nav xwe de te nekin hekem û paşê ji hukmê te dayî re tu tengezariyekê jî di dilê xwe de nebînin û ji bo wê biryara te dayî heta ji dil xwe berdest nekin, wan bawerî neaniye.[1]

**66.** Eger me li wan ferman bikira; nefsa xwe bikujin an jî ji welatê xwe derkevin, ji bilî çend kesan ji wan dê ev pêk neaniya. Eger wan şîreta ku li wan dihate kirin pêk bianiya dê ji wan re çêtir bûya û baweriya wan dê bêhtir misoger bibûya.

**67.** Wê çaxê ji cem xwe me dê xelateke mezin bidaya wan.

**68.** Me dê berê wan bidaya riyeke rast û durist.

**69.** Kî, bi gotina Xwedê û Pêxemberê wî bike, ha ew digel yên ku Xwedê qenciya xwe li wan kiriye ku ew pêxember, seddîq, şehîd û salih in, ha ew xweşheval in!

**70.** Ev qencî û kerem ji cem Xwedê ye, ji aliyê zanînê ve Xweda bes e.

**71.** Gelî yên ku bawerî anîne! Li hemberî neyarê xwe tedbîra xwe bigirin, vêca bir bi bir yan jî tev bi hev re derkevin hemberî wan.[2]

**72.** Bêguman di nav we de hin kes hene ku dixwazin mucahîdan ji şer bi paş ve

---

1 Bawerî, bi ziman tenê nîn e, divê mirov bi dil bawer bike û kirinên mirovî jî wê yekê rast bidêrin. Eger wisa nebe, bes mirov bibêje: Min bawerî anî û bi hukmê Xwedê û peyxamberê Wî razî nebe, ew tam zendîqî û nîfaq e!

2 Ev ayeta pîroz, bangeke girîng e li mislimanan ku divê ew li hemberî mêtînger, êrîşkar û koledaran li xwe miqate bin ji bo parastina canê xwe, malê xwe, namûsa xwe, welatê xwe, serbestî û serxwebûna xwe tedbîra xwe bigrin; xwe ji bo şer perwerde bikin û roja ku li wan biqewime jî lek bi lek û tev bi hev re herin cîhadê. Bi vî awayî bes dişên bi aştî û azade bijîn.

bihêlin, êdî eger karesatek were serê we, ew dibêje: Xwedê qencî li min kir ku ez ne bi wan re bûm.

**73.** Sond be, eger ji Xwedê qenciyek li we bibe, wekî ku di nav we û wî de qet dostanî tune be, ew dibêje: Xwezî ez jî bi wan re bûma da ku min jî serkeftineke mezin bi dest bixista.

**74.** Naxwe, ew ên ku jiyana axretê bi jiyana vê dinyayê kirîne, bila di riya Xwedê de şer bikin. Kî di riya Xwedê de şer bike; vêca bê kuştin an jî bi ser bikeve, em ê perûyeke (xelateke) mezin bidinê.

**75.** (Gelî bawermendan!) Ma çi ji we bûye ku hûn di riya Xwedê de û ji bo rizgarkirina mêr û jin û zarokên muztezaf ên bindest şer nakin? Ew muste‘zefên ku dibêjin: Xwedayê me! Me ji vî welatê ku gelê wî zordar in derîne, xwediyekî ji cem xwe ji me re bişîne û ji cem xwe ji me re arîkarekî bişîne.[1]

**76.** Ew ên ku bawerî anîne di riya Xwedê de şer dikin û yên ku bawerî neanîne di riya Taxûtî (Şeytên û dozên pûç) de şer dikin. (Gelî dostên Xwedê!) Naxwe li hemberî dostên şeytên şer bikin; bêguman kemîn û hîleya şeytên qels e.

**77.** Ma te ew nedîtin, ew ên ku (li Mekkê) ji wan re hate gotin: Destên xwe ji şer bigirin, bi tekûzî nimêj bikin û zekata malê xwe bidin“?! Çi dema (li Medînê) şer li ser wan hate ferzkirin, heman celebek ji wan çawa ku ji Xwedê bitirse yan jî hê bêhtirî wê ji mirovan ditirsiyan. Gotin: Xwedêyo! Çima te şer li ser me ferz kir?! Çira te heta demeke nêzîk (fermana cîhadê) bi paş neêxist? (Ya Muhemmed! Ji wan re) Bibêje: Xweşî û pertalê dinyayê hindik e. Ewê ku xwe ji xezeba Xwedê biparêze axret jê re çêtir e û bi qasî derzika sîsika xurmê jî neheqî li we nayê kirin.

**78.** Hûn li ku dibin bibin mirin her dê bigihîje we, çendî hûn di kelên asê û saxlem de bin jî! Eger qenciyek li wan bibe, dibêjin “Ev ji cem Xwedê ye.” Eger belayek bê serê wan, dibêjin: “Ev ji cem te (Muhemmed) bûye. Bibêje: Tev ji cem Xwedê ne. Erê ma çi li vî xelkî qewimiye ku ji gotinê fehm nakin!

**79.** Çi qenciya ku bigihê te ew ji Xwedê ye. Neqenciya ku hatiye serê te ew ji te bi xwe ye. (Ya Muhemmed!) Me tu, ji mirovan re bi pêxemberî şand û (li ser vê rewşê) şahdeyiya Xwedê bes e.

**80.** Kî, bi gotina Pêxember bike, teqez wî bi gotina Xwedê kiriye û kî berê xwe jê vegerîne, vêca me tu li ser wan bi nîgahdarî neşandiye!

**81.** (Munafiq) Dibêjin: Em ê bi gotina te bikin. Vêca dema ji cem te radibin, celebek ji wan tiştekî ji bilî ya ku ji te re dibêjin, di dilê xwe de tevdîr dikin. Helbet Xwedê bêhtir bi ya ku di dilê xwe de tevdîr dikin dizane. Êdî ji wan bigere, xwe bispêre Xwedê . Helbet bi wekîlî û piştevanî Xwedê besî te ye.

---

1 Berî Mekke were fetihkirin, li wê derê hin mislimanên bêçare hebûn ku nikarîbûn herin Medînê. Îbnu Ebbas gotiye: Ez û dayîka xwe ji wan mustezefan bûn. Vêca muşrikan zulm û zor li wan dikirin, wan jî ew duaya ku di ayetê de buhurî ji Xwedê dikirin. Digel ku ayet ev rûdan îşaret kiriye jî, lêbelê li kû dera cîhanê dibe bila bibe, heke neheqî li bawermendan bibe, divê misliman bi hewara wan ve herin û heke rizgarkirina wan bêşer ne pêkan be, divê ji bo rizgarkirina wan şer jî were kirin.

**82.** Ma ew (munafiq) hê jî li Qur'anê nafikirin? Eger ew, ne ji cem Xwedê bûya, ew ê tê de rastî pir nakokiyan bihatina!

**83.** Dema ji wan (munafiqan) re (der heqê xezaya Pêxember de) ji serkeftin an jî şikestinê xeberek dihat, di cih de wan ew belav dikir. Eger ku wan ew (xeber) ji Pêxember re yan jî ji karbidestan re, ewên ku ji wan in (misliman in) bibirina -ku ew dikarin rastiya wê derînin- wan dê rastiya wê nas bikira. (Gelî bawermendan!) Eger kerem û rehma Xwedê li ser we nebûya, ji bilî hin kesan we dê bidaya pey şûngavên şeytên.

**84.** Êdî di riya Xwedê de şer bike. Tu ji xwe tenê têyî berpirsgirtin. Bawermendan, li ser şer dilgerm bike. Xwedê dê hêza wan ên ku kafir in, ji ser we vekişîne. Hêza Xwedê (ji ya wan) xurttir e û cezayê Wî jî dijwartir e.

**85.** Kî (di navbera mirovan de) mehderkariyeke rind bike, ji ber wê pareke xêrê jê re heye. Kî mehderkariyeke nebaş jî bike, ji ber wê pareke guneh jê re heye. Xwedê li ser her tiştî desthilatdar e.[1]

**86.** Dema silav li we hate kirin, vêca hûn jî ji wê rindtir an jî wekî ya li we hate kirin, silavê vegerînin. Bêguman Xwedê ji her tiştî re hesabdar e.

**87.** Xweda ye, yê ku ji wî pê ve tu îlah tun in. Bêguman dê we hemûyan di wê roja ku şik tê de tun e li hev kom bike. Ma gotina kê ji ya Xwedê rastir e?!

**88.** Çi ji we bûye ku hûn di bara munafiqan de bûne du celeb? Hal ev e ku Xwedê bi sedema gunehên ku kirin ew serdageriyayî û rêwindayî kirine. Qey hûn dixwazin yê ku Xwedê ew ji rê xistibe bînin ser riya rast? Xwedê kê ji rê bixe tu dê qet jê re riya rast nebînî![2]

**89.** Ji dil xwestin ku hûn jî wekî wan kafir bibin da ku hûn û ew wekhev bibin. Naxwe heta ku ew di riya Xwedê de hicret nekin, wan ji xwe re dost û piştevan negirin. Eger wan berê xwe (ji tewhîdê) dagerand, hûn li ku derê wan bibînin wan bigirin û bikujin û ji bo xwe tu kesî ji wan nekin dost û arîkar.

**90.** Ji bilî wan (kafir û munafiq)ên ku xwe biavêjin ber bextê qewmekî ku di navbera we û wan de peyman heye, yan jî werin xwe li we bigirin û nexwazin ne bi we re ne jî (li kêleka we) bi qewmê xwe re şer bikin (destê xwe nedine wan û wan nekujin.) Eger Xwedê biva dê destûra wan li we bidaya vêca dê bi we re şer bikirina. Êdî eger ew dev ji we berdin, xwe vekişînin aliyekî; şerê we nekin û destê aştiyê dirêjî we bikin, di vê rewşê de Xwedê li hemberê wan tu rê nedaye we (ku hûn şerê wan bikin).

**91.** Hûn ê rastî hinên din jî bên ku ew dixwazin hem ji şerê li hemberî we hem ji şerê li hemberî gelê xwe jî ewle bibin. Her ku berê wan bi bal gelaciyê ve tê

---

1 Di jiyana civatê de ji bo pir tiştan mehderî û navcîtî pêwîst e. Mirovê ku navcîtiyê bike divê li xwe miqate be, lewra ji wê navcîtiyê pareke wî jî heye. Ew yan xêrê, yan jî gunehî qezenc dike û kar û zerar li wî jî dibe.

2 Ji Zeyd kurê Sabit hatiye ragihandin; dema ku Peyxamberê Xwedê derketiye Uhudê, ji wanên ku pê re bûn hin kes (ên munafiq) ji cenga Uhudê vegeriyan. Vêca hevalên Peyxamber di heqê wan de bûn du celeb; hinekan got: Em wan bikujin, hinekan jî got: Em wan nekujin. Êdî Xwedê di heqê vê mijarê de ev ayet daxist.

zivirandin serserkî tê werdibin. Êdî eger dev ji (şerê) we bernedin, destê aştiyê dirêjî we nekin û destên xwe ji şerê we venekêşin, vêca wan bigirin (dîl bikin) û hûn li ku rastî wan hatin, wan bikujin. Ha evên ha, Me, hênceteke aşkera daye we li ser (kujtin û dîlkirina) wan.

**92.** Tu car ji bo bawermendekî ne rewa ye ku bawermendekî bikuje. Lê ku bi şaşî be, ew tiştekî din e. Kesê ku bi şaşî mislimanekî bikuje divê koleyekî bawermend azad bike û xwînekê bide xwediyên kuştî. Lê ku ew di xwînê biborin ew tiştekî din e! Eger ew kuştî ji qewmekî dijmin be (ku di nava we û wan de şer heye) û bawermend be, vêca azadkirina koleyekî bawermend pêwîst e. Eger ew (kuştî) ji qewmekî be ku di navbera we û wan de peyman heye, vêca xwîneke ku ji malbata wî re bê dayîn û azadkirina koleyekî bawermend pêwîst e. Kesê ku (koleyekî bawermend) bi dest nexe, divê du mehan li pey hev rojî bigire, (ev kefaretê ha) ji cem Xwedê tobe û rehmet e li ser bendeyên Wî. Xwedê teqez bi kirinên bendeyên xwe dizane û di karê xwe de karbinecih e.

**93.** Kî ku bi qesd mumînekî (ji bo ku mumîn e) bikuje, vêca cezayê wî cehenem e ku ew ê heta bi hetayê tê de bimîne û xezeba Xwedê li serê ye, Xwedê ew ji rehma xwe dûr kiriye û ezabekî mezin jê re amade kiriye.

**94.** Gelî yên ku bawerî anîne! Dema hûn di riya Xwedê de derketin cîhadê, vêca teftêş bikin (da ku hûn mîsliman û kafiran ji hev nas bikin). Ji wî kesê ku li we silav (a mislimantiyê) bike, nebêjinê tu ne misliman î ku hûn pê pertalên jiyana vê dinyayê bixwazin. Lewra li cem Xwedê qezencên pir hene. Her wiha hûn jî berê wekî wan bûn. Xwedê li we qencî kir (hûn misliman bûn), vêca di vê de lêgerînê bikin (heya hûn bi teqez nizanibin ku kafir in ziyanê nedine wan). Bêguman Xwedê bi ya ku hûn dikin agahdar e.[1]

**95.** Mislimanên (ji cîhadê) rûniştî û yên ku bi mal û canê xwe di riya Xwedê de xebat dikin ne wekhev in, ji bilî yên ku xwedanhêncet bin. Xwedê, ew ên ku bi mal û canê xwe cîhadê dikin, bi mertebeyekê di ser yên rûniştî re girtine. Xwedê peymana rindiyê (cenetê) daye her yekî ji wan. Xwedê yên cîhadker bi xelateke mezin di ser yên rûniştî re girtine.

**96.** Ev mertebe, lêborîn û dilovaniyeke ji cem Xwedê ye. Xwedê gunehbexş e, dilovîn e.

**97.** Bêguman ew ên ku zilm li xwe kirin (;hicret nekirin û di nav gawiran de man) melayîket canê wan distînin û dibêjine wan: Hûn (di bara dînê xwe de) di çi karî de bûn? Dibêjin: Em li erdê bêçare û bindest bûn. Melayîket dibêjin: Qey

1 Li gorî rîwayeteke din; Meredas kurê Neheyk misliman bû lê ji wî pê ve ji êla wî tu kesî din misliman nebûn. Nijdeyeke Peyxamberê Xwedê çû şerê wan. Êl hemû ji ber wan reviyan. Lêbelê ji ber ku Meredas bi mislimanbûna xwe bawer bû, ew nereviya. Çi gava wî nijde dît pezê xwe hilgerand ber çiyayî û ew jî hilgeriya. Çi gava misliman gihanê û tekbîr anîn wî jî tekbîr anî û dageriya xwarê û got: Ez bi devê xwe dibêjim û bi dilê xwe bawer dikim ku ji Ellah Teala pê ve tu Xweda tun in û Muhemmed jî peyxamberê Wî ye, silav li we be! Pişt re Usame kurê Zeyd ew kuşt û pezê wî da ber xwe û anî. Hevalên wî ev yek ji Peyxamberê Xwedê re gotin. Peyxamber bi vê yekê pir pir êşiya û ji wan re wiha got: We, ji bo pezê wî ew kuşt ne wisa! Pişt re ji Usameyî re ev ayet xwend: “Da ku hûn pê pertalên jiyana cîhanê bixwazin.

erda Xwedê ne fireh bû ku hûn tê de bigeriyana?! Vêca ev ên ha êwirgeha wan dojeh e û ew çi pîs vehewîngeh e!

**98.** Lê belê mêr û jin û zarokên belengaz, ew ên ku bi rastî tu çareya wan tune bû û wan riya xwe nedidît (ku hicretê bikin) ew cuda ne!

**99.** Vêca ha ev ên ha, hêvî heye ku Xwedê li wan bibore. Xwedê têbihûr e, bexşîner e.

**100.** Kesê ku di riya Xwedê de hicret bike, ew ê li ser erdê gelek war û destfirehiyê bibîne. Ew kesê ku bi qesda Xwedê û Pêxemberê Wî, bi koçberî, ji mala xwe derkeve, paşê (di rê de) bimre, êdî xelata wî dikeve aliyê Xwedê. Xwedê bexşîner e, dilovîn e.

**101.** Dema we li ser erdê seferek kir û hûn endîşe bikin ku kafir dê zerarê bidin we (wê çaxê) tu guneh ji bo we tune e ku hûn hinek nimêjan bi kurtî bikin. Bêguman ên kafir ji bo we neyarên aşkera ne.

**102.** (Ya Muhemmed!) Dema tu digel wan bî, vêca te li pêşiya wan nimêj kir, êdî bila komek ji wan digel te nimêj bike û bila çekên xwe hilgirin. Êdî piştî ku çûn sicûdê bila biçine paş û bila koma din jî ya ku nimêj nekiribû, bên bi te re (qamek) nimêj bikin (qama din jî xweser bikin) û bila ew jî rahêjin çekên xwe û tedbîra xwe bistînin. Yên kafir ji dil dixwazin ku haya we ji çek û pertalên we nemîne da ku bi carekê êrîşî ser we bikin. Eger ji baranê eziyet li we bibe yan jî hûn nexweş bin tu guneh ji we re tun e ku hûn çekên xwe deynin, dîsa jî tedbîra xwe bistînin. Bêguman Xwedê ji kafiran re ezabekî riswaker amade kiriye.[1]

**103.** Vêca dema we nimêja xwe kir îcar li ser piyan, rûniştî û li ser teniştên xwe zikrê Xwedê bikin. Dema hûn (ji tirsê) ewle bûn, nimêja xwe bi tekûzî (ne bi kurtasî) bikin. Bêguman nimêj li ser bawermendan ferzeke xwedan dem e.

**104.** (Gelî bawermendan!) Hûn bi dûvketina pey (dijminê xwe) sist û bêzar nebin. Eger hûn diêşin ew jî wekî we diêşin û ya hûn ji Xwedê hêvî dikin ew hêvî nakin. Xwedê zana ye, karbinecih e.

**105.** (Ya Muhemmed!) Bêguman me kitêb bi heqî ji te re hinart da ku tu di navbera mirovan de, bi tiştê ku Xwedê nîşanî te daye hukim bikî. Zinhar ji xayînan re nebe berevan/alîgir!

**106.** Ji Xwedê lêborîna xwe jî bixwaze, bêguman Xwedê gunehbexş e, dilovîn e.

**107.** Berevaniya wan ên ku li nefsa xwe jî bêbextiyê dikin, meke. Bêguman Xwedê ji kesê xayîn ê gunehkar hez nake.

**108.** (Xayîntiya xwe) Ji mirovan vedişêrin û ji Xwedê venaşêrin. Hal ev e ku Xwedê

---

1 Van her sê ayetan jî awayê kirina nimêjê ya li rêwîtî û di rewşên xeternak de rave kir. Li gorî ji sunnetê û tetbîqata wê hatiye zanîn ku li rêwîtiyê nimêjên çar rik'etî tên kurtkirin û bi du rik'etî tên kirin; ji bo vê yekê tirs û xeter jî ne şert e. Her mislimanê rêwî ku (80) heştê - not (90) kilometre mesafe rêwingî bike dikare ji vê ruxsetê îstîfade bike. Di ayetê de sebebê ku bi du rik'etî behsa nimêja tirsê hatiye kirin, dîsa rêwîtî ye. Lewra wê çaxê artêş jî rêwî tê jimartin. Di vî haletî de jî nimêja cemaetî bi vî awayî tê kirin: Îmam dê wan bike du grup. Grûba pêşîn dê bi îmam re du rik'etan bikin, îmam dê di rabûna rik'eta duyem de bisekine, ew dê nimêja xwe timam bikin û biçin nobeta xwe, grûba din dê were, bi îmamî re rik'etekê bike. Îmam dê di rûniştina dawî de li benda wan raweste, ew jî dê rabin rik'eteke din bikin û bi îmamî re silav bidin.

(bi zanîna xwe) dema ew ya ku Xweda jê ne xweş e, di dilê xwe da tevdîr dikin digel wan e. Xwedê dor li ya ku ew dikin girtiye.

**109.** Ha hûn ev in, di jiyana dinyayê de hûn bûne alîgirên wan û we ew parastin. Vêca ma roja qiyametê li hemberî Xwedê kî dê berevaniya wan bike, yan jî ma kî yê bibe karsipêr li ser kiryarên wan?

**110.** Kî neqenciyekê bike yan jî li xwe zilmê bike, piştre jî lêborîna (gunehên) xwe ji Xwedê bixwaze, ew dê bibîne ku Xwedê bexşîner e, dilovîn e.

**111.** Kî gunehekî bike ew ziyanê li xwe dike. Xwedê ʻElîm e, Ḥekîm e.

**112.** Kî gunehekî biçûk an jî mezin bike piştre biavêje stûyê yekî bêguneh, bêguman wî bêbextî û gunehekî aşkera li xwe bar kiriye.

**113.** (Ya Muhemmed!) Eger kerem û rehma Xwedê li ser te nebûya, komekê ji wan hewl dida ku te ji rê derînin. Hal ev e ku ew bes xwe ji rê dertînin. Ew nikarin bi tu tiştî zerarê bidin te. Xwedê kitêb û hikmet ji te re şand û ya ku te nizanîbû (ew) fêrî te kir. Bêguman qenciya Xwedê li ser te pir mezin e.

**114.** Di pirê pistepista wan de tu xêrek tune, lê belê pistepista kesê ku sedeqeyekê yan qenciyekê bike yan jî navbera mirovan rast bike (wan li hev bîne), ne wisa ye. Kî ji bo rizaya Xwedê vê bike, em ê perûyeke mezin bidinê.

**115.** Piştî ku riya rast jê re aşkera bû, kî dijraberiya Pêxember bike û ne di riya mislimanan de here, em ê berê wî bidin riya ku berê xwe dayê û em ê wî bixin dojehê û çi pîsewar e ew dojeh!

**116.** Bêguman Xwedê (gunehê) şirîk û hevpişkiya ku jê re bê kirin, nabexşîne; lê belê ji wê pê ve kesê ku Xweda bivê, li gunehên wî dibore. Kî jî ji Xwedê re hevpişkan çêke, vêca bi rastî ew bi şaşiyeke dûr ji rê ketiye.[1]

**117.** Ew ji bilî Xwedê gazî û îbadetê ji hinek mabûdên mê re dikin (mîna Lat, Uzza û Menat) û ew her hawarê digihînin şeytanê rikdar (ê fermanşikên).

**118.** Xwedê şeytan ji rehma xwe dûr kiriye. Şeytên got: “Sond be ez ê teqez ji nav bendeyên te pişkekê bigirim ji xwe re bikim heval.”

**119.** (Şeytên got:) Teqez ez ê wan ji rê derînim, muheqeq ez ê xweziyan di dilê wan de bi kar bînim û muheqeq ez ê fermanê li wan bikim, vêca ew ê jî guhên terşan (deve, dewar û pezan) biqelêşin (da ku wan ji pûtan re bikin qurban). Sond be, ez ê li wan ferman bikim, vêca ew ê afirandina Xwedê biguherînin. Kî ku ji bilî Xwedê şeytên ji xwe re bike dost û arîkar, bi rastî wî bi awayekî aşkera zerar kiriye.

**120.** Şeytan peyman û hêvîyê dide wan; hal ev e ku peymana ku şeytan dide wan ji xapandinê pê ve ne tiştekî din e.

**121.** Ev ên ha, (roja qiyametê) vehewîngeha wan dojeh e û tu riyên ku jê derkevin felatê, nabînin.

---

1 Heke mirov vê ayeta hanê û yên mîna wê û hedîsên pêxember bi hev re binirxîne ev tê fêmkirin; ew kesê ku bi qasî giraniya zerreyekî jî baweriya wî hebe û bi îman here bal Xwedê, dê li wî bibore yan jî piştî wî ciza bike dîsa dê wî bişîne bihiştê. Lê wekî ku ji vê ayetê jî tê zanîn; ew kesê ku li ser şirk û kafiriyê bimre Xwedê qet lê nabore û wî efu nake!

**122.** Ew ên ku bawerî anîn û karên rind kirine, em ê wan bixin bihiştên ku di binê wan de çem diherikin û heta bi hetayê ew ê tê de bimînin. Xwedê li ser vê yekê soza rast daye. Ka gotina kê ji ya Xwedê rasttir e?

**123.** (Gelî bawermendan! Ceza û xelata Xwedê) Ne bi xweziyên we û ne jî bi xweziyên yên ehlîkitêb ve ye. Kî nebaşiyekê bike dê cezayê wê bibîne û dê ji bilî Xwedê ji bo xwe tu dost û tu arîkarekî jî nebîne.

**124.** Çi mêr be çi jin, kî karekî qenc bike û ew bawermend be, vêca ha ew dê here bihiştê û bi qasî derzika sîsikê jî dê neheqî lê nebe.

**125.** Ma ji yê ku bi duristî ji Xwedê re teslîm bibe û qencîkar be û bide dû dînê Îbrahîm -ku ew ji her pûçiyê pak e- kî baştirîn dîndar e. Xwedê Îbrahîm jî ji bo xwe xoşewîst girtiye.[1]

**126.** Çi tiştên li erd û asîmanan hene her yên Xwedê ne û Xwedê li ser her tiştî bi temamî agahdar e.

**127.** (Ya Muhemmed!) Di bara jinan de daxuyaniyê ji te dixwazin. Bibêje: Xwedê ji we re, di bara wan de daxuyanî dide û ew ayetên ku di kitêbê de ji we re tên xwendin, di bara jinên sêwî de ye ku hûn para (mîrateya) ku ji wan re hatiye veqetandin nadin wan û we dil heye ku wan mehr bikin û (daxuyanî) di bara zarokên bêçare û sêwî de ye ku hûn edaletê bi cih bînin. Hûn çi xêrê bikin muheqeq Xwedê pê dizane.

**128.** Eger jinek ji mêrê xwe bi endîşe be ku dê xweş pê re derbas neke yan jî dê berê xwe jê vegerîne (wê çaxê) ji wan re tu guneh tune ye ku ew di navbera xwe de sulhekê bikin. Sulh (her tim ji berdanê) çêtir e. Jixwe di nefsan de kumreşî li kar e (hazir) e. (Gelî mêran!) Eger hûn bi wan re xweş derbas bikin û hûn xwe (ji neheqiya li wan) biparêzin; vêca Xwedê ji ya ku hûn dikin teqez agahdar e.[2]

**129.** (Gelî mêran!) Hûn çi qasî bixwazin jî dîsa nikarin di navbera jinan (hewiyan) de dadmendane tevbigerin; naxwe bi temamî meyla xwe nedin yekê û ya din jî, wek girêdayî be (ne bi mêr û ne jî berdayî) nehêlin. Eger hûn navbera wan rast bikin û xwe (ji zilmê) biparêzin, teqez Xwedê gunehbexş e, dilovîn e.

**130.** Eger jin û mêr hev berdin, Xwedê ji nîmetên xwe yên pir dê herduyan jî dewlemend bike. Xwedê comerd e, karbinecih e.[3]

**131.** Li erd û asîmanan çi tişt hebin, ew tev yên Xwedê ne. Bêguman me li wan ên ku di beriya we de kitêb ji wan re hatine û li we jî ferman kiriye, ango „Hûn

---

1 Digel ku peyxamber tev di qasidîtîya Xwedê de wekhev in, lêbelê bi taybetmendiyên xwe hin ferqên wan ji hev hene. Ji vê babetê ye ku ji Mûsa re „Kelîmûllah", ji Îsa re: „Ruhullah". Ji Muhemmed re „Hebîbullah" û ji Îbrahîm re jî "Xelîlullah" hatiye gotin. Ev ayeta ku li jor buhurî bûye jêdera vê wesifdayînê.

2 Di zewacê de bi hev re xweşderbaskirin bi te'wîz û cangoriyên hevbeş dibe û dimeşe. Lêbelê ji ber ku di her kesî de awayekî siruştî, ezperestî, çavnebarî û zexelî heye, her kes ji hevalê xwe fedakariyê hêvî dike. Sulh jî, bi te'wîzdayîn û fedakariya herdu rexan, ji hin mafan çêdibe. Ev rewş, ji pevçûn û hevberdanê çêtir e.

3 Heke digel hemû tedbîran jî zewac nemeşe û endîşeya xizanî û rebeniyê hebe wê çaxê jin û mêr ne mecbûr in ku derd û mereza hev bikişînin û di nêv cehennema manewî de bijîn, bila hev berdin û Xwedê dê gelek deriyên xêrê li wan veke.

hay ji (sînorê) Xwedê hebin!" Eger hûn înkar bikin jî, bêguman çi tiştên li erd û asîmanan hene, ew tev yên Xwedê ne. Xwedê dewlemend e, hêjayî pesinandinê ye.

**132.** Çi tiştên li erd û asîmanan hene, ew tev yên Xwedê ne. (Ji bo kar û emelê bendeyên xwe) bi wekîlî Xwedê bes e.

**133.** Gelî mirovan! Eger Xwedê bixwaze, dê we ji holê rake û hinekên din bîne şûna we. Bêguman Xwedê li ser vê yekê qadir e.

**134.** Kî xelata dinyayê bixwaze (bila bizane ku) xelata dinya û axretê herdu li cem Xwedê ne. Xwedê bihîzer e, bîner e.

**135.** Gelî yên ku bawerî anîne! Bi dadperweriyê rabin û ji bo Xwedê şahdeyiyê bidin, çendîn ew li dijî we bi xwe, li dijî dê û bavên we û xizmên we be jî. Eger ew (mafdar û mafjêgir) dewlemend an xizan bin, vêca Xwedê ji herduyan pêşdetir e (ji we). Nedin pey arezûyên xwe û ji edaletê şaş nebin. Eger hûn zimanê xwe li şahidiyê xwar bikin (rastiyê biguherînin), yan jî berê xwe ji şahidiyê vegerînin (rastiyê veşêrin), bêguman ji ya ku hûn dikin Xwedê agahdar e.

**136.** Gelî yên ku bawerî anîne! Li ser baweriya bi Xwedê û Pêxemberê Wî, li ser baweriya bi kitêba ku ji pêxemberê xwe re şandîye û bi wan kitêbên ku berê şandine berdewam bin. Kî bi Xweda, melaîketên Wî, kitêbên Wî, pêxemberên Wî û roja dawiyê (qiyametê) baweriyê neyîne û kafir bibe; vêca bi rastî ew bi şaşiyeke şaş ji rê ketiye.

**137.** Bêguman ew ên ku pêşî îman anîn paşê kafir bûne, piştre dîsa îman anîne paşê dîsa kafir bûne, piştre kufra xwe zêde kirine; Xwedê ne li gunehên wan dibore ne jî li ser riya rast wan rasterê dike.

**138.** (Ya Muhemmed!) Mizgînê bide munafiqan ku ji wan re ezabekî dijwar heye!

**139.** Ew ên ku ji dêvla bawermendan ve kafiran ji xwe re dikin xwedî û arîkar. Erê, ma gelo ew îzetê û rûmetê ji wan hêvî dikin?! Bêguman rûmet û serfirazî her ya Xwedê ye.

**140.** (Gelî mumînan!) Di kitêbê de ji we re hatiye şandin; dema we seh kir ku ayetên Xwedê tên mandelkirin, yan jî bi wan tinaz tê kirin, hingê digel wan (kafiran û munafiqan) rûnenin, heta ku ew xwe noqî peyveke din nekin. (Dema hûn civatê terk nekin) hûn ê jî bibin wekî wan. Bêguman Xwedê dê temamê kafir û munafiqan di cehnemê de li hev kom bike.[1]

**141.** Ew ên ku çavnêriya nerindiyê ji bo we dikin; vêca eger ji cem Xwedê fethek (serkeftin û xenîme) bibe nesîbê we (ji we re) dibêjin: Ma em jî ne digel we bûn (de ka para me jî bidin me)? Eger serkeftin bibe nesîbê kafiran (vê carê ji wan re) dibêjin: Ma me dest li ser we dananî? Ma me hûn ji bawermendan

---

1 Çi têkiliyên nav neteweyî bin, çi têkiliyên ferdî bin, divê bawermend li cem bawermendan cihê xwe bigirin û di vê bihevrebûnê de dê li hêz, rûmet û îzzetê bigerin. Milletê ku ji bo xurt bibe hawara xwe bigihîne kafiran ew her dê qels bibe û ferdên ku murace'etî wan bikin, kesayetiya xwe ji dest didin. Heke bihevrebûna misliman û kafiran bibe mecbûrî, gava kafir di eleyhê dîn de bipeyivin bila bawermend ji meclisa wan derkeve û wan şermezar bike.

neparastin? Êdî Xwedê dê roja qiyametê di navbera we û wan de hukim bike. Xwedê li hember bawermendan tu riyekê nade kafiran.

**142.** Bêguman munafiq hewl didin ku Xwedê bixapînin. Hal ev e ku Xwedê xapandina wan (bi ezabê xwe) dê li wan vegerîne. Dema (bi mumînan re) radibine nimêjê, bi kasûlî û sistî radibin, li pêşberî mirovan riyakarî dikin û ew pir hindik zikrê Xwedê dikin.

**143.** Ew (munafiq) di navbera kufr û îmanê de diçin û tên; ne ji wan (kafiran) ne jî ji van (mumînan) tên hesêbê. Xwedê, kê ji rê bixe vêca tu, ji bo wî rastî çareseriyekê nayê.

**144.** Gelî yên ku bawerî anîne! Di şûna bawermendan de kafiran ji xwe re nekin dost û piştevan. Ma hûn dixwazin ku li dijberî xwe delîleke aşkera bidin Xwedê (da ku ji bo wê ceza bide we)?!

**145.** Bêguman munafiq, di cehenemê de di qata herî jêr de ne, êdî tu dê ji wan re qet arîkarekî jî nebînî.[1]

**146.** Lê belê ewên ku poşman bûne, xwe sererast kirine, xwe ji dil bi Xweda ve girtine û tenê ji Xwedê re îbadetên xwe kirine, vêca ha ew (roja qiyametê) digel bawermendan in û Xwedê dê xelateke mezin bide bawermendan.

**147.** (Gelî mirovan!) Eger hûn baweriyê bînin û şikrê Xwedê bikin, Xwedê dê çima we bide ezabê! Xwedê şukirdar e, zana ye.

**148.** Xwedê ji aşkerakirina gotina nebaş hez nake, lê belê kesê ku neheqî lê bûbe ew cuda ye. Xwedê bihîzer e, zana ye.

**149.** (Gelî mirovan!) Eger hûn qenciyekê aşkera bikin an hûn wê bi dizî bikin, an jî li neqenciya (ku li we hatiye kirin) biborin, vêca bêguman Xweda têbihur e, xwedanşiyan e.

**150.** Bêguman ew ên ku Xwedê û pêxemberên Wî mandel dikin û dixwazin ku cudahiyê bixin navbera Wî û pêxemberên Wî û dibêjin: Em baweriyê bi hinek (ji pêxemberan) tînin û em hinekan jî mandel dikin û ew dixwazin ku di nava îslam û kufrê de riyeke din bigirin…

**151.** Ha ew kafir bi xwe ne. Me, ji bo kafiran ezabekî riswaker amade kiriye.

**152.** Ew ên ku bawerî bi Xwedê û pêxemberên Wî anîn û cudahî nexistin nav yekî ji wan; ev ên ha Xwedê dê paşê xelata wan bide wan. Xwedê gunehbexş e, dilovîn e.

**153.** (Ya Muhemmed!) Ehlîkitêb ji te dixwazin ku tu ji asîmanan kitêbekê ji wan re daxî xwarê. Bêguman wan ji Mûsa tiştekî hê ji vê mezintir xwestibûn. Vêca gotin: "Xwedê aşkera nîşanî me bide." Vêca bi sedema zilma wan di cih de birûskê ew hingaftin. Dûvre piştî ku delîlên aşkera ji wan re hatin, golik ji xwe re kirin îlah. Êdî em der heqê wê de li wan borîn û me selahiyeteke aşkera da Mûsa.

---

1 Di her çaxê de li kêleka muminên heqîqî hin kesên ku ji bo berjewendiyên xwe yan jî ji bo xelasiya xwe -çendan zahirî be jî- xwe mumin dane nîşan hene. Ji wan re munafiq tê gotin. Çendî li dinyayê nebe jî lê Xwedê li axretê dê rûpûşa wan ji ber rûyê wan rake û ji ber ku ew kafirne nemerd in dê wan bixe qata cehennemê ya jêrîn û di heqê wan de tu şefaetê jî qebûl nake

**154.** Me (çiyayê) Tûr di ser wan re rakir da ku peymana xwe bi cih bînin û me li wan ferman kir ku di dergeh re sertewandî û xweşikandî têkevin bajêr. Me li wan ferman kir ku di roja şemiyê de (bi nêçîrkirina masiyan) zêdegaviyê nekin (û nedin ser biryara Xwedê) û me ji wan peymaneke asê stand.

**155.** Vêca ji ber ku soza xwe şikandin û ayetên Xwedê înkar kirin û bi zilmî pêxember kuştin û ji ber ku digotin: Dilê me tijeye. (Nexêr,) belkî ji ber kufra wan, Xwedê mohr li ser dilê wan daye, vêca hindik ji wan bawerî tînin.

**156.** Dîsa bi sebeb înkara wan (ya der heqê Îsa de) û ji ber bêbextiyeke mezin ku avêtin stûyê Meryemê.

**157.** Hem jî bi sedema ku digotin: "Bêguman me pêxemberê Xwedê, Îsayê kurê Meryemê Mesîh kuşt." Hal ev e ku wan ew nekuştiye, ne jî wan ew li çarmixê daye. Lê belê ji wan re hat şibandin. Bêguman ew ên ku ketine îxtîlafê, der barê (kuştina) wî de bi biguman in. Ji gumanê pêştir qet zanîna wan bi tiştekî nîn e û birastî jî wan, ew nekuştiye.

**158.** Nexêr, wan Îsa nekuştiye, belkî Xwedê ew hildaye cem xwe. Xwedê serdest e, karbinecih e.

**159.** Ji yên ehlîkitêb, tu kes nîn e ku berî mirina xwe baweriyê pê neyine û roja qiyametê dê li ser wan jî bibe şahid.

**160.** Bi sedema zilma ku cihûyan kiribû û bi sedema ku wan pir kes ji riya Xwedê vegerandibûn, me hin nîmetên pak ên ku (pêşî) ji wan re hatibûn helalkirin, li wan heram kirin.

**161.** Dîsa bi sedema ku selef (riba) dixwarin, digel ku (di Tewratê de) jî nehya wan jê hatibû kirin û bi sedema ku malên mirovan bi nerewayî û stemkarî dixwarin (tiştên ku ji bo wan helal bûn li ser wan hate heramkirin). Me, ji bo kafiran ezabekî bijan amade kiriye.

**162.** Lê belê ji wan, ew ên ku di zanînê de kok berdane û yên bawermend, bi ya ku ji te re hatiye şandin û bi ya ku ji pêxemberên beriya te re jî hatiye şandin baweriyê tînin û ew ên ku nimêjê dikin, zekatê didin û baweriyê bi Xwedê û roja axretê tînin, ha em ê xelateke mezin bidin wan.

**163.** Bêguman çawa me peyxam (wehî) ji Nuh û pêxemberên piştî wî re şand, her wiha me peyxam ji te re jî şand. Me peyxam ji Îbrahîm, Îsmaîl, Îshaq, Yaqûb û neviyan (ên Yaqûb) û me peyxam ji Îsa, Eyûb, Yûnus, Harûn û Suleyman re jî şand. Me Zebûr jî daye Dawid.

**164.** (Ya Muhemmed!) Me, hin pêxemberên din (şandin) ku me behsa wan ji te re kiriye û hin pêxember jî me behsa wan ji te re nekiriye. Bêguman Xwedê bi Mûsa re peyiviye.

**165.** Ew pêxemberên mizgînber û hişyarker bûn da ku piştî pêxemberan, li hemberî Xwedê, ji mirovan re tu behane çênebe! Xwedê serdest e, karbinecih e.

**166.** Lê belê, Xwedê li ser ya ku ji bo te hinartiye şahidiyê dide, Xwedê ew bi zanîna xwe hinartiye. Melayîket jî ji vê re şahidiyê didin. Bi şahidî Xwedê besî te ye.

**167.** Bêguman ew ên ku kafir bûne û (xelkê) ji riya Xwedê vedigerînin, ew di rêşaşiyeke dûr û kûr de ne.

**168.** Bêguman ew ên kafir bûne û (bi berdewamiya li ser kufrê) zilm kirine, Xwedê hîç li wan nabore û tu rêyê bi ber wan naxe…

**169.** Ji bilî riya dojehê (cehnemê) ku ew dê heta bi hetayê tê de bimînin. Ev kar li ber Xwedê pir hêsan e.

**170.** Gelî mirovan! Bêguman pêxember ji nik Xwedayê we rastî ji we re aniye. Nexwe baweriyê pê bînin ku ew ji bo we çêtir e. Eger hûn înkar bikin, teqez çi tiştên li erd û asîmanan hene, tev yên Xwedê ne. Xwedê ‘Elîm e, Ḥekîm e.

**171.** Gelî yên ehlîkitêb! Xwe li dînê xwe bêendaz bernedin û ji rastiyê pê ve li ser navê Xwedê tiştekî din nebêjin. Bêguman Mesîh; Îsayê kurê Meryemê bes pêxemberê Xwedê û (misogerbûna) gotina Wî ye ku bi bal Meryemê ve hatiye gotin (ango; Xwedê gotiye: “Çêbe!” Ew jî çêbû) û (Îsa) xwedancanekî (xwedanruhekî) ji cem Wî ye. Nexwe baweriyê bi Xwedê û bi qasidên Wî bînin û nebêjin: “Xweda sisê ne.” Xwe ji vê gotinê bidin paş ku ev danepaşî ji bo we çêtir e. Bêguman Xweda bes xwedayekî bi tenê ye, ew ji ya ku zarok jê re hebin, pakdêrayî ye. Çi tiştê li erd û asîmanan heye her milkê Wî ye, Xwedê (di milkê xwe de) ji rêvebirî û lihevragirî ve kafî ye.

**172.** Ne Mesîh (Îsayê kurê Meryemê) û ne jî firîşteyên nêzîkî Xwedê, tu carî ji perestina bo Xwedê dilsar nebûne. Kî ji îbadetê Xwedê dilsar bibe û xwe mezin bidêre (jê re îbadetê neke), vêca Xwedê dê wan hemûyan bi bal xwe ve kom bike.

**173.** Herçî ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirine, vêca (Xwedê) dê xelata wan bi tekûzî bide wan û dê ji kerema xwe ji wan re zêde bike. Herçî ew ên ku berê xwe ji îbadetên Wî vegerandin û (bi neîbadetkirinê) xwe mezin dêrane, (Xwedê) dê ezabekî dijwar bide wan û ew ê ji bilî Xwedê ji bo xwe tu dost û arîkarekî jî nebînin.

**174.** Gelî mirovan! Bêguman ji cem Xwedayê we, ji we re delîleke aşkera hatiye û me ji we re ronahiyeke zelal aniye xwarê.

**175.** Her çî ew ên ku bawerî bi Xwedê anîn û xwe bi (dînê) Wî girtine, vêca (Xwedê) dê wan bixe nava xweşdayîn û merhemeteke ku ji cem Wî ye û ew ê wan ber bi riyeke rast û durist ve serwext bike.

**176.** (Ya Muhemmed! Ji te (di bara bêwêrtan de) çareseriyê dipirsin. Bibêje: Xwedê di bara kelalê de (mîrateya kesê ku bav û zarokên wî tune bin) çareserîyê beyan dike; eger yekî bêzarok bimire û xwişkeke wî hebe; nîvê mîrateyê ji wê re ye. Eger xwişk bimire û ji wê tu zarok tune bin, birayê wê jî dibe mîratxwerê wê. Eger ji bira du xwişk bimînin, ji mîrateyê ji sisêyan didu ya wan e. Eger mîratxwer hem mêr hebin hem jî jin, para mêr bi qasî du parên jinê ye. Ji bo hûn şaş nebin Xwedê ji we re (hukmên dînê we) aşkera dike. Xwedê bi her tiştî zana ye.

# 5. SÛREYÊ MAÎDE

Sûreyê Maîdê ji ayeta sêyem pê ve tev li Medînê di sala şeşem a hicrî de dahatiye û 120 (sed û bîst) ayet e. Ayeta "Îro, min dînê we ji we re kamil kir" li Medîneyê, roja înê, êvara Erefê di Heca Xatirxwestinê de nazil bûye.

Maîdê bi daxwaza "sifre" ye. Di heyama Îsa de hewarî/hevalên wî jê xwestibûn ku li ber Xwedayê xwe bigere û jê bixwaze ku sifreyekê ji asîmanî ji wan re daxe xwarê. Ji ber ku sûretî di ayeta 112em û 114em de behsa vê sifreyê kiriye ev navê "sifre"yê "el-Maîde" lê hatiye danîn.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Gelî bawermendan! Soz û peymanên xwe bi cih bînin. Ji bilî yên (li ser ḥeramiya wan) ji we re bên xwendin û ji bilî yên ku we di îḥraman de nêçîr kirine, (xwarina goştê) terşan (deve, dewar û pezan) ji bo we hatiye helalkirin. Bêguman Xwedê, tiştê bivê biryarê pê dide.

2. Gelî bawermendan! Nedin ser nîşanên dînê Xwedê û rûmeta meha heramkirî ya birûmet. Heywanên ji bo Qurbanê û terşên stûristikkirî (ku dîyarî ne ji bo Kabê) û kesên ku ji bo daxwazkirina berjewendiyeke bazirganî û rizaya Xwedayê xwe serdana mala pîroz dikin, li hember wan bêrêziyê mekin. Vêca dema hûn ji îhraman derketin bi serbestî nêçîrê bikin. Bila kîna we, ya ji qewmekî bi sedema rêka Kabê li we girtibûn, we neajo ser zêdegaviyê! Li ser qencî û teqwayê arîkariya hev bikin û li ser gunehkarî û zêdegaviyê arîkariya hev mekin. Hay ji (emr û nehyê) Xwedê hebin, bêguman cezakirina Xwedê pir dijwar e.

3. (Gelî bawermendan!) Xwarina goştê (heywana) mirarbûyî û xwîn, goştê beraz û heywana ku ne li ser navê Xwedê hatiye şerjêkirin, goştê heywana fetisandî û ya bi lêxistinê hatibe kuştin, ya ku ji jor de werbûyî û ya ku bi poşlêketinê miribe, ya ku canewaran ew xwaribe -lê ya ku bi saxî we ew şerjêkiribe ew cuda ye- û ya ku li ber pûtan hatiye şerjêkirin, ya ku hûn bi zilan falan vedikin û li nesîbê xwe bigerin, (ev tev) li ser we hatine heramkirin. Ev ên ha fisq e (derketina ji rêka Xwedê ye). Îro ew ên ku kafir in, wan hêviya xwe ji (tunekirina) dînê we qut kiriye. Êdî ji wan netirsin; ji min bitirsin. Îro, min dînê we ji bo we kemiland (tekûz kir). Min qenciya xwe li ser we temam kir û min ji we re bi olîtî îslam pejirand. Vêca kî ku ji neçarî; ne bi gunehkarî tûşî birçîbûneke awarte bibe û ji van ên me gotî bixwe, vêca bêguman Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

4. (Ya Muhemmed!) Ji te pirs dikin; ka çi ji wan re hatiye helalkirin? Bibêje: Çi tiştê ku xweş û pak be û nêçîra heywanên ceribandî ew ên xwedînab û xwedîkulab, bi şertê ku ji wê zanîna Xwedê dayî we hûn wan perwerde bikin, (ev ên ha) ji bo we hatine helalkirin, vêca ji nêçîra ku wan ji we re girtibe bixwin. Dema we heywana nêçîrvan şand nêçîrê; navê Xwedê li serê bînin û xwe bi sînorê Xwedê biparêzin. Bêguman hesabdîtina Xwedê pir bilez e.

5. (Gelî bawermendan!) Îro, ji bo we tiştên xweş û pak hatine helalkirin. Xwarinên (destkujiyên) ehlî kitêban ji we re helal in û xwarinên we jî, ji bo wan helal in.

Zewaca bi pîrekên bawermend ên bi namûs û pîrekên bi namûs ên ku beriya we, Me kitêb daye wan, ji we re helal in; bi şertê ku hûn mehra wan bidin wan, bi namûs bin, ji zinayê dûr bin û ji xwe re bi dizî dostikan negirin. Kî ku îmanê (ahkamên îslamê) înkar bike, bêguman kirinên wî pûç dibin; ew li axretê dibe ji yên ku xesirî ne.

**6.** Gelî yên ku bawerî anîne! Dema we xwest nimêj bikin, rûyê xwe û destên xwe digel herdu enîşkan bişon, serê xwe mesih bikin (vemalin), herdu lingên xwe digel gwîzekan bişon. Eger hûn bi cenabet bin xwe ji cenabetiyê paqij bikin. Eger hûn nexweş bin, yan rêwî bin yan yek ji we ji avrêjê were, yan jî hûn hinguftbin jinan û we di van halan de avek nedîtibe, wê çaxê bi axeke paqij teyemmûmê bigrin; rûyê xwe û destên xwe bi axê mesih bikin. Xwedê naxwaze ji we re zehmetiyê derêxe; lê belê dixwaze we paqij bike û li ser we qenciya xwe temam bike da ku hûn Wî bişêkirînin.[1]

**7.** (Gelî bawermendan!) Qenciya Xwedê ya li ser xwe û peymana ku ji we wergirtî; dema we got: “Me (fermana te) bihîst û em ji pêkanîna wê re amade ne” bi bîr bînin. Hay ji (sînorê) Xwedê hebin. Bêguman Xwedê bi ya di dilan de dizane.

**8.** Gelî yên ku bawerî anîne! Ji bo Xwedê bi heqiyê rabin û bi rastî şahdehiyê bidin. Bila kîna we ya li hemberî civatekê we neajo bêedaletiyê. Bi dadî tev bigerin. Ev tevger bêhtir nêzîkî teqwayê ye. Ji Xwedê bitirsin. Bêguman Xwedê bi ya ku hûn dikin agahdar e.

**9.** Xwedê soz daye wan ên ku bawerî anîn û karên qenc kirine ku ji bo wan lêborîn û xelateke mezin heye.

**10.** Lê ewên ku kafir bûne û bi ayetên me bawerî neanîne, ha ew xelkê dojehê ne.

**11.** Gelî yên ku bawerî anîne! Qenciya Xwedê ya li ser xwe bi bîr bînin, dema civatekê qesd kir ku destên xwe (bi neqencî) dirêjî we bike, Xwedê nehişt destên wan bigihîje we. Ji Xwedê bitirsin û bila yên bawermend tenê xwe bispêrin Xwedê.[2]

**12.** Sond be, Xwedê ji zaroyên Îsraîlîyan peymaneke mikûm wergirt û dozdeh nûner (temsîlkar) ji wan navdar kirin (da li ser navê wan peyman bistînin). Xwedê ji wan re got: Ez bi we re me. Eger bi rastî hûn nimêj bikin, zekatê

---

1 Nimêj, bi qesda îbadetê ew e ku mirov biçe ber hizûra Xwedê û bi awayekî mueyen teetê wî bike. Nimêj ew e ku Xwedê evdê xwe qebûlî hizûra xwe dike. Ha ji bo vê qebûlê û eşkerekirina evdîtiyê hin amadehî lazim e hebe. Divê evdê ku li hizûra Xwedê raweste li hişê xwe be, zahir û batinê wî paqij be. Vêca desmêj û serşûştin ji paqijiya zahirî û batinî re navgîn û amadehiyek e. Heke av nebe yan jî mezeretek hebe, hingî dê bi axê teyemmûm bigre. Çendî teyemmûm paqijîya maddî pêk neyêne jî lê ji bo haziriya îbadetê pêhisa paqijiyê dide. Di ayetê de: “Yan jî we hinguftbin jinan” derbasbû ku mebest ji wê bi qestî destdana jinana. Li gorî hin mufessiran munasebeta cinsî ye. Mirovê ku çûbe nivîna jina xwe û av bi dest wî nekeve ew kare di şûna serşûştinê de teyemum bigre û nimêja xwe bike.

2 Li gorî rîwayetekê hatiye ragihandin ku muşrik û munafiqan nav li zilamekî çekdar dan ku Peyxamberî bikuje. Her çiqas wî qesda kuştina Peyxamber kir jî lê bi înayet û nîgaha Xwedê ew negihaşt armanca xwe. Li gorî rîwayeteke din jî, Benî Nedir hewl dane ku kevirê destar bavêjin ser serê Peyxamberê Xwedê û bi xayîntî wî û hevalên wî bikujin. Di vir de digel ku qesda kuştina Peyxamber bi tenê kirine jî, lêbelê ji ber ku ew weke can û jiyana hemû bawermendan e, Xwedê gotiye: “Dema civatekê qesd kir ku destên xwe dirêjî we bike” ku bi geljimarî îfade kiriye.

bidin, baweriyê bi pêxemberên min bînin, arîkariya wan bikin û (bi bexşandina li ser feqîran) bi awayekî spehî deyn bidin Xwedê, sond be, ez ê gunehên we efû bikim û ez ê we bixim bihiştên ku di bin wan re çem diherikin. Êdî piştî vê (peymanê) kî ji we kafir bibe, vêca bêguman ew ji rêka rast şaş bûye.

**13.** Bi sedema peymanşikandina wan me ew ji rehma xwe dûr kirin, me dilê wan hişk û hola kir. Ew, peyvan ji cihê wan diguherînin û wan pareke (girîng) ji ya ku pê hatibûn fermankirin ji bîr kir. (Ya Muhemmed!) Ji bilî kêm kesan pê ve, tu dê tim ji wan xiyanetê bibînî. Dîsa jî, li wan bibore û guhê xwe nede wan. Bêguman Xwedê ji qencîkarên rast û durist hez dike.[1]

**14.** Me ji wan ên ku digotin: "birastî em arîkarê Îsa ne" jî peyman wergirt. Lê belê wan jî pareke (girîng) ji şîretên ku li wan hatibûn kirin, ji bîr kirin. Ji ber vê yekê, heta roja qiyametê, me neyartî û kîn xist navbera wan. Xwedê dê wan bi tiştên ku dikirin agahdar bike.[2]

**15.** Gelî yên ehlîkitêb! Pêxemberê me hatiye nik we da ku ji we re gelek (hukm)ên ku we ji kitêbê vedişartin, aşkera bike û ji gelekan jî dibûre. Bêguman ji bo we, ji cem Xwedê ronahiyek û kitêbeke ronker hatiye.

**16.** Xwedê, kesê ku li rizaya Wî bigere bi wê kitêbê dibe riya xelasiyê, bi vîna xwe wan ji tarîtiyan derdixe ronahiyê û riya rast û durist nîşanî wan dide.

**17.** Sond be, ew ên gotin: "Mesîhê kurê Meryemê Xwedê bi xwe ye" ew kafir bûne. (Ya Muhemmed! Ji wan re) Bibêje: Eger Xwedê bixwaze Mesîhê kurê Meryemê, dayika wî û yên ku li ser rûyê erdê hene jî, tevan helak bike, Ma êdî kî dikare li hemberî Wî tevgerekê bike? Rêveberiya erd û asîmanan û ya di navbera wan de her ji Xwedê re ye. Ew çi bivê diafirîne û Xwedê helbet li ser her tiştî qadir e.

**18.** Cihû û filehan digotin: Em kurên Xwedê û hezkiriyên Wî ne. (Ji wan re) Bibêje: Nexwe çima bi sebeba gunehên we, ezab dide we? Nexêr, belkî hûn jî beşer in ji yên ku Xwedê afirandine. Kesê ku bivê wî efû dike û kesê bivê wî dide ezabê. Xwedîtiya erd û asîmanan û ya di navbera wan de heye her ji Xwedê re ye. Vegera dawiyê jî her bi bal Wî ve ye.

---

1 Tewrat, nusxeyeke wê bi tenê hebû. Tu kesî ew tev ji ber jî nekiribû. Dema îsraîlî dîl ketin destê Babîliyan, ew nusxeya Tewratê winda bû. Dema îsraîlî, piştî ku sal û zeman tê de buhurîn -ji yexsîriyê xilas bûn, hin beşên Tewratê yên ku li bîra wan mabûn ji nû ve nivîsîn. Di Tewratê de ya ku îro mewcûd e, ew beşên kêm in û hin ji pêxemberiya Mûsa nivîsayî ye. Di ayetê de hevoka: "Ew bêjeyan ji cihê wan diguherînin" derbas bû. Aliman ew bi vî awayî rave kiriye: Tewîlên wisa lê anîbûn ku tu pêwendiya wan bi armanca nizûla wê re tune bû. Maneya ku ne mirad bû jê dertanîn û ya ku Xwedê negotibû li ser navê Wî bi vir û derew digotin.

2 Filehên pêşîn jî ji ber şkence û teqîba cihûyan a bêeman, ji hev bela-wela jiyane. Wan jî ew Încîla ku Xwedê bi rêya wehyê ji Îsa re şandiye muhafeze nekirine û winda kirine. Lêbelê di serê sedsala sêyema mîladî de, dema Împeretorê Romayê Kostantîn filehtî xistiye dilê xwe, ji nû piçekî fileh rehet jiyane, dest bi nivîsîna pirtûka xwe ya pîroz kirine, di encama vê pêngava wan de bi sedan Încîl derketine rastê. Yek ne mîna yekê bû û hev negirtine. Vêca filehên ku ji rêya Îsa derketin li ser peymana ku dane Xwedê nemane. Bi vî awayî ixtîlaf ketiye nav wan û bi sedsalan ketine hemberê hev û pev çûne. Her grûbek ji wan tekfîra grûba din dike û nahêle ku li dêra wê îbadetê xwe bike. Bi rastî em dibînin ku dewletên rojavayî digel ku biradînên hev in jî, ji bo qelandina hev teknolojiya çekan bi pêş ve dibin; hinekan ji wan bombeya navokî (atomî) îcad kirine, hinekan ji wan jî bombeya hîdrojenî îcad kirine ku eqil nikare texrîbatî û rûxênkariya van bombeyan teswîr bike.

**19.** Gelî yên xweykitêb! Bêguman pêxemberê me -di navbereke ku (şandina) pêxemberan ji hev qut bûbû- ji bo we hat ku rastiyan ji bo we aşkera bike, da ku (li qiyametê) hûn nebêjin ji bo me tu mizgînber û tu hişyarker nehatibûn. Vêca bêguman ji bo we mizgînberek û hişyarkerek hat. Xwedê helbet li ser her tiştî kara ye.

**20.** Wê demê Mûsa ji gelê xwe re got: Gelî miletê min! Qenciya Xwedê li we kirî bînin bîra xwe; çaxa pêxember ji (nav) we rakirin û hûn kirin hukimdar û ya ku nedabû tu kesî dabû we.

**21.** Ey gelê min! Herin, têkevin axa pîroz (bajarê Qudsê), ew a ku Xwedê (ketina wê) li we ferman kiriye û (ji tirsa dijmin) li paş xwe nezivirin, nexwe hûn ê bi ziyan (destevala) vegerin.

**22.** Gotin: Ey Mûsa! Bêguman li wir qewmekî zordar heye, heta ku ew ji wê derê dernekevin, em ê neçin wir. Lê belê eger ew ji wir derkevin, vêca em ê herinê.

**23.** Du mêrên ji Xwedêtirs ên ku Xwedê qencî li wan kiriye, gotin: Di dergeh re têkevin ser wan (sitemkaran), dema hûn di dergeh re ketinê, êdî hûn bi ser ketine. Nexwe eger bi rastî hûn bawermend in xwe bispêrin Xwedê.[1]

**24.** Gotin: Ey Mûsa! Heta ku ew (sitemkar) li wî bajarî bin, em ê qet neçinê. Nexwe de tu û Xwedayê xwe herin bi wan re şer bikin, bêguman em ê li vê derê rûniştî bin.

**25.** Mûsa got: Xwedayê min! Ez ji xwe û birayê xwe pê ve bi tu kesî (din) nikarim, êdî tu me û civata ku ji rê derketiye, ji hev cuda bike.

**26.** Xwedê (ji Mûsa re) got: Êdî ew bajar heta çil salî li wan hate heramkirin. Di cihê xwe de ew ê li hev biherbilin. Nexwe tu, ji bo civata jirêderketî xemgîn mebe.

**27.** (Ya Muhemmed!) Ji wan re xebera rastîn a herdu kurên Adem bixwîne, dema herduyan qurbanên xwe (ji Xwedê re) pêşkêş kirin, îcar ji yekî ji wan qurban hate qebûlkirin û ji yê din jî nehate qebûlkirin. (Birayê ku qurbana wî nehatibû qebûlkirin ji çavnebarî) Got: Sond be, ez ê te bikujim. Yê din got: Bêguman Xwedê, tenê ji teqwadaran qebûl dike.

**28.** Sond be! Eger tu destê xwe dirêjî min bikî da ku tu min bikujî, ez bi xwe ji bo kuştina te qet destên xwe dirêjî te nakim. Bêguman ez ji Xwedayê alemê ditirsim.

**29.** (Bi berdewamî got:) Bêguman ez dixwazim, tu bi gunehê (kuştina) min û bi gunehê xwe (yê berê) vegerî da ku tu bibî ji xelkê êgir û ev e cezayê zaliman.

---

1 Ev ayet giş ji ber ku pêwendiya wan bi zaroyên Îsraîl yên çaxê Mûsa re heye „qenciyên ku Xwedê ji cîhaniyan nedane tu kesî dane wan û axa ku ji wan re hatiye misogerkirin jî xasê wê çaxê ye. Temamê ayet û hedîsan didin nîşan ku Muhammed (s) ji mirovên ku borîne û yên ku hê werin re qenciyeke Xwedê ye. Misogerkirina parçeyekî erdê ji milletekî re bi welatî bi şert û merc e. Divê ew millet qencîkar be û birastî û durustî di rêya Xwedê de here. Wan bi ayeta 13an û yên mîna wê ew wesfê xwe winda kirine. Ayeta Sûretê el-Enbiya ya 105an eşkere dike ka erda pîroz dê ji kê re bimîne: “Sond be, piştî Tewratê me di Zebûrê de jî nivîsiye ku hemin evdên min ên qencîkar dê bibin mîratgirên erdê.” Xala ku divê li ber çavan were girtin jî ev e.

**30.** Vêca nefsa wî kuştina birayê wî lê xweş anî û birayê xwe kuşt, êdî ew bû ji yên ku xisar kirin.

**31.** Xwedê qijikek şand ku wê bi nikil û lingên xwe ax dikola (û diavêt ser qijikeke mirî) da ku nîşanî wî bide ku ew dê termê (cesedê) birayê xwe çawa veşêre. (Birayê kujer) got: Wax li min be! Min nekarî ez bibim wekî vê qijika hanê vêca ku ez cendekê birayê xwe veşêrim, êdî ew bû ji poşmanbûyan!

**32.** Ha ji ber vê rûdanê ye ku me li ser zaroyên Îsraîl hukim danî; kî mirovekî bikuje bê yî ku wî yek kujtibe yan di erdê de fesadiyek kirirbe, her wekî wî tevahiya mirovan kuştibe. Kî jî ku bibe sebebê xelasiya mirovekî, her wekî wî mirov tev xelas kiribin. Bêguman pêxemberên me delîlên ronker ji bo wan anîne, lê belê piştî vê jî dîsa pirê wan li ser erdê xwînrêj in.

**33.** Bêguman ew ên ku li hember Xwedê û Pêxemberê Wî şer dikin û fesadiyê li ser erdê derdixin, bes cezayê wan ew e ku bên kuştin an li çarmixê bêne xistin an dest û lingên wan çeperast bêne jêkirin an ji devera ku lê niştecih in bêne sirgûnkirin. Ha ev li vê dinyayê ji bo wan riswayî ye û li axretê jî ji bo wan ezabekî mezin heye.

**34.** Lê belê ew ên ku berî hûn wan bigirin tobe kiribin (ew cuda ne), vêca bizanin birastî jî Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.[1]

**35.** Hey gelî yên ku bawerî anîne! Hay ji fermanên Xwedê hebin, li wesîleya (navgîna) ku we nêzî Wî bike bigerin û di rêka Wî de cîhadê bikin da ku hûn (li dinya û axretê) serfiraz bibin.

**36.** Bêguman ew ên kafir bûne, eger çi qas tiştên li ser erdê hene û bi qasî wan jî ew yên wan bin, ji bo ku bikin gerewa xwe di ber ezabê roja qiyametê de (da ku jê rizgar bibin), dê ev ji wan neyê qebûlkirin; ji bo wan her ezabekî bijan heye.

**37.** (Ew kafir) Dixwazin ku ji agir derkevin, lê belê ew dê nikaribin jê derên û ji wan re ezabekî seraqetî û her likar heye.

**38.** Ew mêr û jinên dizîker, vêca bi sebeb ku dizî kirine destên wan jê bikin. Ev cezakirin ji cem Xwedê ve bo vekişandinê ye (da tu kes diziyê neke). Xwedê ʻEzîz e, Ḥekîm e.

**39.** Vêca kî piştî (vê) neheqiya li xwe kirî, poşman bibe û hal û tevgerên xwe rast bike, bêguman Xwedê dê tobeya wî qebûl bike. Bêguman Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

**40.** Ma tu nizanî (ey pêxember) ku bêguman ji Xwedê re ye selteneta erd û

---

1 Dînê Îslamê „Kuştin", li hemberî mirovatiyê sûc jimartiye û daye zanîn ku kesê bi neheqî mirovekî bikuje wekî ku wî mirovatî tev kuştibe. Ew bi qasî sûcê wî mezin e! Herwiha sûcê ku li hemberî kesên bêguneh û mehsûm were kirin, aramî û asayîşa mirovan xirab bike jî, sûcekî mezin dibîne û li hemberî Xwedê Teala û Peyxamberê Wî wek îlana şer dinirxîne û li hemberî çete û talankeran cizane pir giran danîne. Heke çeteyên ku serî hildane û rahiştine çekan, sûcê wan kuştina mirovan tenê be, cizayê wan îdam e. Heke hem mirov kuştibin, hem jî xelk şelandibin, cizayê wan hem kuştin e, hem jî daleqandin e. Heke xelk şelandibin û tirs jî dabin wan lê tu kes nekuştibin, çep û rast destek û piyekî wan dê were jêkirin. Heke tenê xelk şelandibin dê bên koçberkirin. Heke çete bi xwe teslîm bibe û poşman bibe, ciza lê nayê xistin, lê mecbûr e ku zerar dabe kê, tezmînata wan bide.

asîmanan; ew kê bivê dide ezabê û kê jî bivê lê dibore. Xwedê li ser her tiştî qadir e.

**41.** Ey Pêxember! Bila ew ên ku di kafiriyê de bi hev re pêşbirkê dikin, ji wan ên ku bi serê ziman dibêjin: Me bawerî anî, hal ev e dilê wan bawerî neaniye û ji wan ên ku bûne cihû ku ew tev ya ku derewe qebûl dikin û gotina wanên ku (ji pozbilindiya xwe) nehatine cem te pir dipejirînin, te xemgîn nekin. Ew bêjeyan ji cihên wan diguherînin. (Ji hevalên xwe re) Dibêjin: Eger ev li gorî we be, vêca wê ji xwe re wergirin û eger ne li gorî we be, vêca xwe jê biparêzin. Kesê ku Xwedê, berzebûnê jê re bixwaze tu dê nikaribî li hemberî Xwedê tiştekî jê re bikî. Ev ên ha ew in ku Xwedê nexwestiye dilê wan (ji kufrê) paqij bike. Ji wan re li dinyayê riswatî û li axretê jî ezabekî mezin heye.[1]

**42.** Ew pir guhdariya derewan dikin, pir heramxwer in. (Ya Muhemmed!) Eger ew (ji bo çareserkirina gengeşeyekê) bên cem te, tu dixwazî di navbera wan de hukim bike, yan jî dev ji wan berde. Eger tu dev ji wan berdî jî ew neşên tu zerarê bidin te. Eger tu di navbera wan de hukim bikî vêca bi edaletî hukim bike. Bêguman Xwedê ji mirovên adil hez dike.

**43.** Çawa ew qesda te dikin da ku tu di navbera wan de hukim bikî, hal ev e ku Tewrat li cem wan e û hukmê Xwedê (ka hukmê zinakarî çî ye) tê de ye, paşî pişta xwe didine hukmê te dayî. Ev ên ha, ne bawermend in.

**44.** Bêguman Me Tewrat nazil kiriye ku tê de serwextî û ronahî heye. Pêxemberên ku xwe spartibûn Xwedê, ji bo cihûyan bi hukmê Tewratê hukim dikirin. Ji ber ku parastina kitêba Xwedê ji wan hatibû xwestin zana û zahidan jî (bi wê hukim dikir). Tev li ser (heqbûna) wê şahid bûn. (Gelî cihûyan!) Ji xelkê netirsin; ji min bitirsin. Ayetên min bi nirxekî hindik nefiroşin. Kî ku bi ya Xwedê nazil kiriye hukim neke vêca ew her kafir bi xwe ne.

**45.** Me di Tewratê de li ser îsraîliyan ferz kir ku (cezayê) can bi can e, çav bi çav e, poz bi poz e, guh bi guh e, diran bi diran e û di birînan de jî qisasiyet heye. Êdî kesê li (qisasiyetê) bibore vêca ew jê re kefaret e (hem ji kujer re hem ji xwedan mafî re jî kefaret e). Kî ku bi hukmê Xwedê nazil kiriye hukim neke, vêca ew her zalim bi xwe ne.[2]

**46.** Me Îsayê kurê Meryemê li ser şopa pêxemberan şand ku ew Tewrata li ber destê xwe rast didêre. Me Încîl jî dayê ku tê de hîdayet û ronahî heye û Tewrata li ber destê xwe rast didêre û ji teqwadaran re jî rêber û şîret e.

---

1 Digel ku şîret û hukmê vê ayeta pîroz gelemperî ye jî, lêbelê sedemeke daketina wê ya nemazeyî heye: Li Medîna Munewwer li nava cihûyan rûdaneke zinayê qewimî. Cihûyan di nava xwe de li ser rûdanê munaqeşe kirin û hinan ji wan got: Herin cem Muhemmed (s) heke ew ji bilî cizayê recmê cizayekî din bide, di cih de qebûl bikin û li cem Xwedê ew ji we re dê bibe delîl û behane. Gava hatin cem peyxamberî derhal hukm nekir, ew di bin zexteke manewî de hiştin, heta ku bi wan da îtîrafkirin ku li gorî Tewratê cizayê zinayê recm e û bi vî awayê hekîmane hîleya wan pûç kir.

2 Di sê hêlan de li kesên ku bi qanûna ku Xwedê şandiye hukm nekin, hatiye meyizandin: Ji ber ku maneya wê inkar kirine, ji wan re „Kafir" hatiye gotin. Ji ber ku hukmê Xwedê edalet e, dijî wê jî zulm e, ji wan re „zalim" hatiye gotin. Di ayeta 47an de ji ber ku ji hukmê Xwedê derketine ji wan re „fasiq" hatiye gotin.

47. Bila xwediyên Încîlê (fileh) bi ya ku Xwedê tê de aniye (ser wan) hukim bikin. Kî bi hukmê ku Xwedê nazil kiriye hukim neke, vêca ew her fasiq bi xwe ne.

48. Me kitêb bi bal te ve bi heqî hinart ku ew ji bo kitêbên beriya xwe rastdêr e û li ser wan çavdêr e. Êdî li gorî wehya ku Xwedê ji bo te hinartî di navbera wan de hukim bike û li şûna heqiya ku ji te re hatî nede dûv hewesên wan. Me, ji bo her yekî ji we şerî'et û rêbazek daniye. Eger Xwedê bixwesta dê hûn tev yek umet çêbikira. Lê belê (me hûn kirine umetên cur bi cur) da ku we der heqê rêç û rêbaza ku dayî de we biceribîne. Nexwe di qenciyê de pêşbirkê bikin. (Gelî mirovan!) Vegera we hemûyan bi bal Xwedê ve ye. Êdî bi ya ku hûn tê de bi hev ketine, ew dê we agahdar bike.[1]

49. (Ya Muhemmed! Tu jî di navbera wan de bi ya ku Xwedê hinartî hukim bike û nede pey hewesên wan. Hay ji wan hebe da ew ji hinekî wehya ku Xwedê daxistiye te jê nedin paş. Eger ew berê xwe ji (hukmê) te biguherînin, vêca bizane ku Xwedê dixwaze bi sedema hin gunehên ku kirine wan ceza bike. Bêguman pir ji mirovan hene ku her ji rê derketine.

50. Erê ma ew hukmê cahiliyetê dixwazin? Ma qey ji bo civateke ku baş têbigihîje, hukmê kê ji yê Xwedê spehîtir e?!

51. Hey gelî yên bawerî anîne! Cihû û filehan ji xwe re nekin dost û piştevan. Ew xwe bi xwe ji hev re dost û piştek in. Kî ji we, wan ji xwe re bike dost û arîkar, vêca ew jî ji wan e. Bêguman Xwedê civata sitemkar serwext nake.

52. Vêca tu wan kesên ku di dilê wan de nexweşîn heye dibînî ku li hevalbendiya wan (ên cihû û fileh) lez dikin. Dibêjin (eger misliman têk herin, vêca) em ditirsin ku karesateke mezin bi ser me de bê. Vêca hêvî heye ku Xwedê rizgarî yan jî serkeftinekê ji cem xwe ji bo mislimanan bîne; êdî li ser a ku wan di dilê xwe de veşartibû dê poşman bibin.

53. Ew ên ku bawerî anîn dê bibêjin: "Ma ev ê han in, ew ên ku sondên asê dixwarin ku ew bi tevekî hêza xwe bi we re ne?" Kirinên wan tev pûç bûne û ew bûne ji yên ku ziyan kirine.

54. Hey gelî yên ku bawerî anîne! Ji we kî ji dînê xwe vegere (bila bizane ku) Xwedê, dê civateke wisa (di şûna wan de) bîne ku Xwedê ji wan hez dike ew jî ji Wî hez dikin, der barê mumînan de dilnerm (û bişefqet) in û der barê kafiran de jî xurt û serbilind in, di rêka Xwedê de cîhadê dikin û ji gazindên gazindkeran jî natirsin. Ev pirdayîna Xwedê ye, ew kê bivê dide wî. Xwedê (bi kerema xwe) destfireh e, zana ye.

55. Bêguman dost û arîkarê we tenê Xwedê ye, Pêxemberê Wî ye û yên ku bawerî anîne; ew ên ku bi berdewamî nimêj dikin, zekata malê xwe didin û ew her (li ber fermana Xwedê) xwe ditewînin.

---

1 Umet û milletên ku bi Xwedê bawerî anîne û bûne umetên peyxamberan di şûna ku ji bo ramanên cuda, siyaset û berjewendiyan de bi hev bikevin, serê hev bixwin, bila di qenciya ku peyxamberan ji wan re ragihandine de bi hev re pêşbaziyê bikin, cîhanê ava bikin, di hedefên xêrê de arî hev bikin.

56. Kî ku Xwedê, Pêxemberê Wî û yên ku bawerî anîn ji xwe re bike dost û arîkar (ew benda Xwedê ne); birastî jî benda Xwedê desthilatdar ew bi xwe ne.

57. Hey gelî yên ku bawerî anîne! Hûn, ji ehlê kitêbên beriya xwe û ji wan kafirên ku wan dînê we ji xwe re kirine tinaz û pêlîstok ji bo xwe nekin dost û piştevan. Ji Xwedê bitirsin eger bi rastî hûn bawermend in.

58. Dema hûn ji bo nimêjê bang didin ew tinaz û yariyê xwe pê dikin. Ev a ku dikin, ji ber ku ew bi xwe civateke bîrnebir û bêhiş in.

59. Bibêje: Gelî yên ehlî kitêb! Qey bi sedema ku me bi Xwedê, bi ya ku ji me re hatiye û bi ya ku ji umetên berê re hatiye hinartin, bawerî aniye, hûn ji me hez nakin? Bi rastî pirê we ji rêka heq derketî ne.

60. (Ya Muhemmed!) Bibêje: Erê, ma ez ji we re bibêjim ka li cem Xwedê ji van (fasiqan) xerabtir û riswatir kî ye? Ew, yê ku Xwedê lanet lê kiriye û yê ku lê hêrsbûye; ew ên ku hin ji wan xistine meymûn û beraz û ew ebdîniya taxûtî dikin. Ha ew, pîstirîn cih ji bo wan e û ji rêka rast bêhtir şaşbûyî ne.

61. Dema ew (munafiq) tên cem we, dibêjin: Me bawerî aniye. Hal ev e ku ew dilkafir hatine cem we û dilkafir jî ji cem we derketine. Xwedê bi ya ku wan vedişart bêhtir dizane.

62. Tu pirê wan dibînî ku ew di guneh, dijminahî û heramxweriyê de pêşbaziyê dikin, bi rastî ya ku ew dikin çi qas pîs e!

63. De bila xwedênas û haxamên wan ji gotina biguneh û heramxweriyê ew bidana paş! Bi rastî ya ku ew dikin çi qas pîs e!

64. Cihûyan got: Xwedê destgirtî ye (cikûs e) -destên wan şeht bibe û ji ber vê gotina wan lanet li wan bibare-. Nexêr, ne wisan e, belkî destên Xwedê (bi dayîna xwe) vekirî ne, ew çawa bivê wisa dide. (Ya Muhemmed!) Sond be, ya ku ji cem Xwedayê te, ji te re hatiye hinartin dê kufr û çavsoriya piraniya wan zêde bike. Me kîn û neyartiyeke wisa xistiye nav wan ku heta roja qiyametê berdewam e. Çi dema wan ji bo cengê agirek vêxistibe, Xweda her ew agir vemirandiye. Ew li ser erdê ji bo tevdanê dibezin, Xwedê jî ji tevdankeran hez nake.

65. Eger ên ehlîkitêb bawerî (bi Muhemmed) bianiya û xwe (ji kufr û neqenciyê) biparastina, teqez me dê gunehên wan (yên borî) veşartina û misoger me dê ew bixistina bihiştên têrxweşî.

66. Eger wan Tewrat, Încîl û wehya ku ji cem Xwedayê wan ji wan re hatiye şandin ragirtibûya û bi kar anîbûya, teqez wan dê ji raserî xwe û ji bin xwe ve bixwarana (riziq ji bo wan dê hêsan bûya). Ji wan civatek heye mutedil in (navincî ne) û gelek ji wan jî çi pîs e ya ku dikin!

67. Ey Pêxember! Wehya ku ji cem Xwedayê te, ji te re hatiye şandin rabigihîne. Eger tu bi tekûzî pêk neyînî, vêca te peyxama Xweda ranegihandiye. Xwedê dê te ji (neqenciya) mirovan biparêze. Bêguman Xwedê civata kafir serwext nake.

68. Bibêje: Gelî yên xweykitêb! Heta ku hûn bi rastî û duristî Tewratê, Încîlê û ya ku ji cem Xwedayê we ji we re hatiye hinartin (di jiyanê de) bi kar neyînin, hûn

ne li ser tu tiştî ne. Sond be, Qur'ana ku ji cem Rebê te ji te re hatiye şandin dê kufr û çavsoriya pirên wan zêde bike. Nexwe tu ji bo wan xemgîn mebe.

**69.** Bêguman yên ku bawerî anîne û yên bûne cihû, yên bûne fileh û yên bûne sabiîn, vêca ji wan kî baweriyê bi Xwedê û roja axretê bîne û karê qenc bike, ji bo wan li nik Xwedayê wan xelat heye û li ser wan tirs nîn e û ew xemgîn jî nabin.[1]

**70.** Bêguman me ji zarokên Îsraîl peymana mikûmkirî wergirt û me ji wan re qasid şandin. Çi dema pêxemberek ya ne bi dilê wan ji bo wan dianî, hin ji wan (pêxemberan) mandel kirin û hin ji wan jî dikuştin.

**71.** Ji wan we ye ku tu bela dê bi serê wan de neyê, êdî ew ker û kor bûn. Paşî (tobe kirin) Xwedê tobeya wan qebûl kir, dûvre dîsa ji wan pir kes kor û ker bûn. Xwedê bi ya ku ew dikin bîner e.

**72.** Sond be, ew ên gotin: Xweda, Mesîhê kurê Meryemê ye, (ew bi vê gotina xwe) kafir bûne. Hal ev e ku Mesîh ji wan re gotibû: Gelî zaroyên Îsraîl! Ji Xwedê re îbadetê bikin ku ew hem Xwedayê min hem jî Xwedayê we ye. Bizanin ku kî ji Xwedê re hevparan çêke, teqez Xwedê dê cenetê li wî heram bike, êdî cihê wî agir e û ji sitemkaran re tu arîkar jî tune ne.

**73.** Sond be, ew ên gotin: "Xwedê, yek ji sisêyan e" jî kafir bûne. Hal ev e ku ji yek Xwedayî pê ve tu Xweda nîn in. Eger ew dev ji gotina xwe (a sê xwedayîtiyê) bernedin, bi rastî dê ezabekî dijwar bihingive wan ên ku kafir bûne.

**74.** Ma ew ê bi bal Xwedê ve tobe nekin û lêborîna (gunehên) xwe jê nexwazin?! Hal ev e ku Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

**75.** Mesîhê kurê Meryemê tenê pêxemberek e! Di beriya wî de pir pêxember hatine û çûne. Dayîka wî jî jineke rast û durist e. Herdukan jî xwarin dixwarin (û vedixwarin). De ka li wan binêre, ka çawa em ji bo wan delîlan aşkera dikin. Dîsa, de ka li wan meyzîne, bê çawa ew berê xwe (ji heqîqetê) diguherînin.

**76.** (Ji wan re) Bibêje: Ma hûn çawa di şûna Xwedê de îbadetê ji wî re dikin ku ew ne dikare zerarê bide we ne jî dikare feydeyê bide?! Hal ev e ku yê bihîzer, yê zana Xweda ye.

**77.** Bibêje: Gelî yên ehlîkitêb! Di dînê xwe de bi neheqî sînor derbas nekin û nedin pey arezûyên civatekê ku ew hê ji berê de ji rê ketine, pir kes ji rê deranîne û ji riya rast dûr bûne.

---

1 Bi çêkirina Adem re baweriyeke fitrî nazil bû awa ku insan li serê hatibû afirandin. Paşê Xwedê dîn şandin. Peyrewên hinekan ji wan li ser erdê hene, mîna yehûdî, fileh û sabiîyan. Vêca Xwedê dixwaze ku tevekê ehlê dînan ji ser erdê safî bike û di rîsaleta Muhemmed de kom bike. Lewra risaleta pêxember ji bo tesfiyekirina tevekê dînan e. Xwedê dixwaze ji wan re bêje; dewra we xelas bû.Vêca divê hûn bi rîsaleta Muhemmed îmanê bînin. Naxwe mana ayetê wiha ye: Ew ên ku li ser baweriya fitretê ne, yên cihû, yên fileh û yen sabiî, eger ku dev ji baweriya xwe ya berê berdin û bi baweriyeke nû û bi risaleta Muhemmed (s) bawerî bînin, ha hingî ji bo wan xelat heye … û xemgîn jî nabin.

Kesê ku baweriyê bi peyxamberê dawî Muhammed bîne, li gorî hoy û mercên baweriyê tevbigere, dînê wî yê berê çi dibe bila bibe, çi qasî guneh kiribin bila kiribe, li cîhan û axretê tiştekî ku ew jê saw bigire tune ye. Lewra Xwedê dê li gunehên wî yê berê bibore.

**78.** Ji Îsraîliyan ew ên ku kafir bûne, li ser zimanê Dawid û Îsayê kurê Meryemê lanet li wan hatiye barandin. Ev jî bi sedema ku li ber fermana Xwedê serî hildan û zêdegavî dikirin.

**79.** Wan, ji neqenciya ku dikirin hev nedidan paş. Çi qas pîs e ya ku wan dikir!

**80.** Tu yê pirên wan bibînî ku ew kafiran ji xwe re dikin dost û piştevan. Çi pîs kar e ya ku wan daye pêşiya xwe. Rewş ev e ku Xwedê li wan hatiye xezebê û heta bi hetayê ew dê di ezab de bimînin.

**81.** Eger wan bawerî bi Xwedê, bi pêxember û bi ya ku jê re hatiye hinartin bianiya, wan dê kafir ji xwe re nekirina dost û piştevan; lê belê zehfên wan jirêderketî ne.

**82.** Sond be, li hemberî yên ku bawerî bi te anîn, tu yê bibînî ku ji mirovan ên herî dijmin û bixişm cihû ne û paşê ew ên ku ji Xwedê re hevpişk çêkirine. Û tu yê bibînî li hemberî yên ku bi te bawerî anîn, yê ji hezjêkirin ve nêzîktir, ew ên ku dibêjin em nesara ne (arîkarên Îsa pêxember in). Ev jî, bi sedema wê ye ku ji wan keşîş (zanayên dînê xwe) û rahib (abid) hene û ew xwe mezin nadêrin.[1]

**83.** Dema wan (keşîş û rahiban) ayetên ku bi bal Pêxember ve nazilbuyîn dibihîstin, ji ber ku wan zanîn ew ji cem Xwedê ye, tu dibînî ku çavên wan tije rondik dibûn. Digotin: Xwedayê me! Me bawerî anî, vêca me ji şahidan binivîse.

**84.** Ma çima em baweriyê bi Xwedê û bi heqiya ku ji me re hatiye neyînin? Digel ku em dixwazin ku Xwedayê me, me jî bixe nav mirovên qenc û çak.

**85.** Vêca bi sedema vê gotina wan, Xwedê ew bi bihiştên ku rubar di bin wan re dikişin xelat kirin, ew heta bi hetayê dê lê bimînin. Ha ev e perûya qencîkarên rast û durist.

**86.** Ewên ku kafir bûne û bi ayetên me bawerî neanîne, ha ew xelkê dojehê ne.

**87.** Gelî yên ku bawerî anîne! Tiştên xweş û pak ên ku Xwedê ji we re helal kirine, hûn li xwe heram nekin û zêdegavîyê jî nekin. Bêguman Xwedê ji tixûbbihêran hez nake.

**88.** Ji risqê xweş û helal ew ê ku Xwedê dayî we bixwin û vexwin. Ji Xwedayê ku we bawerî pê aniye bitirsin.

**89.** (Gelî bawermendan!) Xwedê li ser sondên we yên bêhemdî (yên bêqesdî) li we nagire, lê belê ew sondên ku we bi hemdê xwe xwarin, li we digire. Vêca (eger we sond xwar û we sonda xwe şikand an jî we xwest bişikînin) cezayê wê sondê, xwarindayîna deh feqîran e, ji xwarina navinc ya ku rojane dide malbata xwe,

1 Ev rastiyeke bê nîqaş e ku ji cihû û filehan, fileh bêhtir nêzîkî mislimanan e. Her çiqas di mêjûya îslamê de hatiye dîtin ku „filehên fanatîk û serhişk hêza xwe anîne ser hev û bi navê „Seferên Xaçperestî“ êrîşên talankerî û hovane anîne ser cîhana îslamî, vêca welatên mislimanan kavil û wêran kirine, bi sed hezaran kesên mumin kuştine jî lê dîsa ew ji cihû û muşrikan dilteniktirin. Heta em dikarin bibêjin: ew ên ku êrîş kirin jî ji zanîn û ibadetê bêparin û ew ketine dereceya muşrikan. Heta dibe ku bi sedem hin listikên hêzên tarî yên nevnetewî jî ev êriş kiribin. Lewra gelek caran ew hatine listika cihûyan û bi desîseyên pir kûr ew di berjewendiyên xwe de xebitandine. Lêbelê digel vê yekê jî, ji xrîstiyanan hin keşîş û rahibên wan destên xwe ji dinyayê kêşane. Ev û yên ku di binê tesîra van de mane hinekî nêzî îslamê sekinîne. Pir keşîş û rahiban bi siyanet hatine, Peyxamber pêşwazî kirine û îtîraf kirine ku ew peyxamberê çavlirê, yê dawiya demê ye.

yan bicilkirina wan e, yan jî azadkirina koleyekî ye. Ew kesê ku nikaribe yekê ji van bike, bila sê rojan rojî bigire. Ev e rakirina gunehê sondên we dema we sond xwar. Sondên xwe bi cih bînin. Xwedê ayetên xwe ji we re aşkera dike da ku hûn Wî bişêkirînin.[1]

**90.** Gelî bawermendan! Bêguman mey (şerab), qumar, peykerên (pûtên) çikandî, falên bi zaran û (lîstikên) siûdê pîs in, ji karê şeytên in. Nexwe xwe ji wan dûr bigirin da ku hûn (li dinya û axretê) serfiraz bibin.

**91.** Bêguman şeytan bes dixwaze di mey û qumarê de kîn û dijminahiyê bixe navbera we û we ji zikrê Xwedê û kirina nimêjê bide paş, êdî ma hûn dev jê bernadin?

**92.** Guhdariya Xwedê û pêxemberê Wî bikin û xwe (ji gunehan) biparêzin. Eger hûn berê xwe (ji biryara Xwedê û pêxember) vegerînin, bizanin ku wezîfeya Pêxemberê me, bes ragihandina (vê peymana) aşkeraker e.

**93.** Li ser ên ku bawerî anîn û karên qenc kirin di tiştên ku berê kirine tu guneh nîn e, bi şertê ku ew (ji vê gavê û pê de) xwe (ji heramiyê) biparêzin, bawerî bînin û karê qenc bikin. Paşê dîsa xwe biparêzin û karê qenc bikin, paşî xwe biparêzin û qenciyê bikin. Xwedê teqez ji qencîkaran hez dike.

**94.** Gelî bawermendan! Sond be Xwedê (dema hûn di îhraman de bin) bi wê nêçîra ku hûn bi dest û rimên xwe dikin, we diceribîne, da Xwedê aşkera bike ka kî di nependiyê de jê ditirse. Piştî vê kî ji tixûbê (helaliyê) derbas bibe, ji wî re ezabekî dijwar heye.

**95.** Gelî bawermendan! Dema hûn di îhraman de bin (heywanên) nêçîrê nekujin. Kî ji we, bi qesd (heywana) nêçîrê bikuje, cezayê wî, dana heywaneke wekî ya kuştî ye. Du kesên biwijdan dê biryarê bidin (dê bibêjin; ev heywan hemkufî heywana kuştî ye). (Ev qurban) diyariyek e dê bigihîje Kabê (yê li Mekkê bê qurbankirin). Yan jî şûna qurbanê (bi qasî bihayê wê) xwarinê bide belengazan, an jî beramberî wê, rojiyê bigire da ku cezayê xwe ta'm bike. Xwedê ya berê hatî kirin efû kiriye. Kî ku careke din li vî sûcî vegere, Xwedê dê tolê lê veke. Xwedê desthilat e, tolveker e.

**96.** (Gelî mirovan!) Nêçîra deryayê û xwarina wê ji bo we helal bû, da ji bo we û ji bo yê rêwingî bibe xwarin. Heta ku hûn di îhraman de bin ji bo we nêçîra bejahiyê jî hatiye heramkirin. Ji Xwedê bitirsin, ew Xwedayê ku hûn ê bi bal wî ve bên komkirin.

**97.** Xwedê, ji mirovan re Kabeya bi navê Beytul-Heramê (Mala birêz û birûmet) kiriye wargeha serûberkirina kar û barên dîn û dinyayê, mehên rûmetdar, qurbanên nîşankirî û yên nenîşankirî jî (kirine egera berdewamiya ewlehî û jiyanê.) Ev jî da hûn bizanin ku bêguman Xwedê bi ya li erd û asîmanan dizane û bêguman Xwedê bi her tiştî zana ye.

1 Kesê ku -bi qesd- bi navê Xwedê sonda tiştekî bixwe, divê sonda xwe bîne cih. Heke sond xwaribe ku ew tiştekî heram yan jî xirab bike, hingê divê wî tiştê xirab neke, sonda xwe bişkîne û kefaretê wê bide. Kefaret, mirovî ji sondê vedigerîne û dibe navgîna lêborînê. Di ayetê de pêşî qala sê tiştan kir ku ew dibin cizayê (kefaretê) sondê. Ew kesê ku nikaribe yekî ji van her sê tiştan bike bila sê rojan rojî bigire.

**98.** (Gelî mirovan!) Bizanin ku bêguman ezabê Xwedê pir dijwar e û bêşik Xwedê gunehjêbir e dilovîn e.

**99.** Wezîfa Pêxember tenê ragihandina peyama Xwedê ye. Xwedê, bi ya ku hûn aşkera dikin û ya ku hûn vedişêrin dizane.

**100.** (Ya Muhemmed! Ji wan re) Bibêje: Pak û pîs ne wekhev in, çendî pirbûna ya nepak te ecêbmayî jî bihêle. Nexwe gelî aqilmendan! (Ji xeşma) Xwedê bitirsin da ku hûn serfiraz bibin.

**101.** Gelî bawermendan! Pirsa hin tiştan (ji Pêxember) nekin, eger ew ji we re aşkera bibin hûn ê pê nexweşhal bibin. Eger hûn di dema hatina Qur'anê de pirsa wan bikin, dê ji we re aşkera bibin. Xwedê li wan boriye (behsa wan nekiriye.) Xwedê gunehjêbir e, berbihêr e.

**102.** Bêguman beriya we qewmekî ev pirs (ji pêxemberê xwe) kir, paşê pê kafir bûn.

**103.** Xwedê, "behîre", "saîbe", "wesîle" û "ḥam" durist nedêraye û ferman pê nedaye. Lê belê ew ên kafir bûne li ser (navê) Xwedê derewan dikin û piraniya wan jî tênegihijin.[1]

**104.** Dema ji wan re dihate gotin werin bal wehya (Qur'ana) ku Xwedê ew aniye xwarê û werin cem Pêxember. Dibêjin: Ev a ku me bav û bapîrên xwe li ser dîtî besî me ye. Erê, ma eger bav û bapîrên wan bi tiştekî nizanibin û ne li ser rêka rast bin jî?!

**105.** Gelî bawermendan! Hay ji xwe hebin, eger hûn di rêka rast de bin, kesê rêşaşbûyî nikare zerarê bide we. Vegera we tevan her bi bal Xwedê ve ye. Êdî Ew bi ya we kirî dê we agahdar bike.

**106.** Gelî bawermendan! Dema yek ji we kete ber mirinê, di dema wesiyetkirinê de bila ji we du kesên dadmend di navbera xwe de wek şahid bigirin. Eger hûn rêwî bin û hûn ketin ber mirinê (û misliman bi dest we neketin), bila du kesên din; ne ji we, ji xwe re bigirin (bikin şahid). Eger hûn bikevin gumanê (ku ew rast nebêjin), piştî nimêjê wan herdu şahidan bînin huzurê, vêca bila bi Xwedê sond bixwin, (bibêjin): em bi sonda derew tu pertalî nagirin, çendî ew li (menfîeta) lêziman be jî û em ê şahidiya xwe veneşêrin (eger em şahidiya xwe veşêrin) teqez em dibin ji gunehkaran.

**107.** (Paşê) Eger bête zanîn ku herdu şahidan guneh kirine (şahidiya xwe durist nekirine), bila (ji mîratxweran) du kesên bêhtir nêzîkî mirî bikevin şûna wan, bila bi Xwedê sond bixwin û bibêjin: Sond be ku şahidiya me ji ya wan rasttir e û em (bi sonda xwe) ji rastiyê dûr neketine. Eger me (ji bêbextî) şahdeyî li ser wan da hingê em dê bibin ji zaliman.

---

1 Beḥîre: deveha ku pênc ber bizaya û berê wê yê pêncan mê bûya jê re "beḥîre" digotin. Guhên wê diqelaştin, lê siwar nedibûn, ew nedidotin û şîrê wê ji pûtan re dihiştin.

Saîbe: Deveha ku ji bo pûtan serbest berdidan, bes mêvanan ji şîrê wê istîfade dikir.

Wesîle: Deveh yan jî peza ku berê cêwî bûya, yek nêr û yek mê bûya jê re digotin Wesîle. Yê nêr ji pûtan re dikirin qurban.

Ḥam: Ji lokên nêr ê ku deh dondilên mê jê gohm bixwara jê re digotin Ḥam. Ew jî mîna saibê serbet diberdan.

**108.** Ev şahdehiya bi vî rengî ji bo we çêtir e ku şahid mercê şahidiya xwe bînin cih û (çêtir e ku) ji sondeke piştî sonda xwe bitirsin ku ew a wan red bike (û hetîketiya wan derîne rastê). Hay ji (ferman û qedexeyên) Xwedê hebin û li fermanên wî guhdar bin. Xwedê mirovê jirêderketî rasterê nake.

**109.** (Gelî mirovan! Hişyar bin.) Roja Xwedê pêxemberan kom dike, vêca ji wan re dibêje: Bersiva we (ji aliyê miletê we ve) çawa hate dayîn? Dibêjin: Em nizanin, bêguman her Tu yî zanayê bi nependiyan.

**110.** Wê demê Xwedê got: Ey Îsayê kurê Meryemê! Ew qencî û kerema ku min li te û dayîka te kiribû bîne bîra xwe; dema min bi Canê Pak (Cibraîl) piştgiriya te kir ku tu di dergûşê de digel mirovan peyivî û piştî tu mezin bûyî jî, (û) dema min tu fêrî nivîsîn û hîkmetê, Tewrat û Încîlê kir û dema te bi destûra min ji heriyê peykerê teyran çêdikir û te pif dikirê û bi destûra min dibû teyrek, (û) dema te bi destûra min korê ji zikmakî û nexweşê çermbelekî sax dikir û dema bi destûra min te mirî zindî dikirin, (û) dema me eziyeta zaroyên îsraîl li ser te da paş, dema te delîlên (mûcîzeyên) aşkera ji wan re anîn êdî ew ên ku kafir bûbûn, gotin: "Ev ji sêrbaziyeke aşkera pê ve ne tiştekî din e."[1]

**111.** Di bîra wan bîne, wê dema me sirûş (îlham) dabû Hewariyan (Me îlham xiste dilê arîkarên Îsa) ku baweriyê bi min û Pêxemberê min bînin, gotin: Me bawerî anî, Tu şahid be ku bêguman em misliman in.[2]

**112.** Di bîra wan bîne, wê dema hewariyan gotin: Ey Îsayê kurê Meryemê! Ma Xwedayê te dikare sifreyeke hazir ji esmên ji me re daxe xwarê? (Îsa jî ji wan re) got: Ji Xwedê bitirsin eger bi rastî hûn bawermend in.

**113.** (Hewariyan) Gotin: Em dixwazin ji wê (sifreyê) bixwin û dilê me jî ewle bibe û em bizanin ku te ji me re rast gotiye û da ku em li ser (hatina) wê bibin şahid.

**114.** Îsayê kurê Meryemê got: Xweda; perwerdigarê me! Ji me re ji esmên sifreyekê daxe xwarê da ku ji bo me û ji bo yên berî me û yên piştî me re bibe cejn (îd) û bila bibe mûcîzeyek ji te. Risqê me bide Tu her çêtirînê risiqdaran î.

**115.** Xwedê got: Bêguman ez ê ji bo we (xwarinê) bînim xwarê. Vêca kî ji we piştî vê kafir bibe, ez ê ezabekî wisa bidimê ku li dinyayê tu kesê din pê nedim ezabê.

**116.** Di bîra wan bîne dema Xwedê got: Ey Îsayê kurê Meryemê! Ma te ji mirovan re got ku min û dayîka min ji bilî Xwedê, du îlah (mabûd) wergirin. (Îsayê kurê Meryemê) got: Haşa! Ez te ji hemû kêmasiyan pak didêrim, ya ji min re ne durist be, ne heqê min e ku ez bibêjim. Eger min ew gotibe, bêguman Tu pê dizanî. Tu ya di dilê min de dizanî û ez ji nihêniyên te tu tiştî nizanim. Bêguman her tu yî zanayê bi ya nediyar û nihênî.

**117.** Tenê tiştê ku Te emrê min pê kirî, min ew ji wan re got: Ku tenê Xwedê bihebînin, ew Xwedayê min û Xwedayê we ye û ez li ser wan zêrevan bûm heta

1 Di vê ayetê û yên pey wê de, ew tiştên adetqetên û awarte tev mucîze ne. Mûcîze ew e ku li gorî qanûnên xwedayî (tebi'î) mirov nikare wan bîne cih û ew zêdeyî hêza însên in. Lêbelê Xwedê hin rewşên adetqetên û naçerehêl dane peyxamberan da ku bi xêra wan mirov îmanê bînin û bêne ser rêya rast. Ev mûcîze tenê bi destûr û qudreta Xwedê têne holê.

2 Hewarî, hevalên Nebî Îsa yên dînpak û dilsade ne ku di jiyana wî de pê bawerî anîne û bûne peyrewên wî.

ku ez di nava wan de bûm. Vêca çi dema te ez mirandim, êdî tenê her Tu yî li ser wan çavdêr û her Tu yî li ser her tiştî bîner.

**118.** Eger Tu ezab bidî wan, jixwe ew evdên te ne. Eger tu li (gunehên) wan biborî, vêca birastî her tu yî yê 'Ezîz, yê Ḥekîm.

**119.** Xwedê wiha got: Ev, ew roj e ku tê de rastiya rastgoyan dê feydê bide wan. Ji wan re bihiştên wisa hene ku di binê wan re çem diherikin. Her û her, heta bi hetayê ew ê lê bimînin. Xwedê ji wan razî bûye, ew jî ji Xwedê razî bûne. Ha serkeftina mezin ev e.

**120.** Milk û desthilatiya erd û asîmanan û çi tiştên ku di navbera wan de hene, her yên Xwedê ne. Ew li ser her tiştî qadir e.

## 6. SÛREYÊ EN'AM

Sûreyê En'am 165 (sed û şêst û pênc) ayet e. Ji 6 ayetan pê ve li Mekkê daketiye. Ev sûret, ji ber ku hin ayetên wî, adetên ereban ên ku li hemberî terş (deve, dewar û pez) tetbîq dikirin, rexne û şermezar dike, jê re Sûreyê En'am hatiye gotin ku ew bi maneya "terş" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Pesn û spasî her ji bo Xwedê ye, Ew Xwedayê ku erd û asîman afirandin, tarîtî û ronahî jî çêkirin. Paşê, ew ên kafir bûne ji Xwedayê xwe re hevtayan çêdikin.

**2.** Ew Xwedayê ku hûn ji heriyê afirandin, paşê ji we re (ji bo mirinê) civanek danî û li cem Wî jî (ji bo qiyametê) civanekî binavkirî heye. Paşî hûn guman dikin?!

**3.** Her Xwedê ye yê ku li erd û esmanan babetê Xwedatiyê ye, nehênî û aşkerahiyên we dizane û tiştên ku hûn bi dest dixin jî dizane.

**4.** Her çiqas ayetek ji ayetên Xwedayê wan, ji wan re hatibe, her wan berê xwe jê vegerandiye.

**5.** Vêca dema heqî ji wan re hat, wan bawerî pê neanî. Lê paşê xebera cezayê ya ku pê tinaz kirin, dê ji wan re bê.

**6.** Ma ew nanêrin ka me beriya wan çend nifş mirov helak kirine? Me hêz û derfeta ku li erdê daye wan, nedaye we. Me (ji ewran) baran li ser wan barand, me çem di bin wan re herikandin. Vêca ji ber gunehên wan me ew helak kirin û piştî wan me nifşinên din afirandin.

**7.** (Resûlê min!) Eger me kitêbek li kaxizê nivîsandî ji te re bianiya, vêca wan bi destên xwe rahiştayê, dê yên kafir bigotina: „Ev, bes sêhrebendiyeke aşkera ye."

**8.** Dîsa gotin: De bila melayîketek digel wî bihata. Eger me melek aşkera bihinarta (vêca wan bawerî pê neaniya) dê fermana me bi helaka wan misoger bibûya, paşê ew nedihate paşdexistin jî.

**9.** Eger me pêxember ji melayîketan bihinarta, me dê ew di sûretê zilamekî de bişanda û dîsa me dê ew muşrik bixistina wê gumana ku ew vê demê tê de ne.

**10.** (Resûlê min!) Bêguman bi pêxemberên beriya te jî tinaz hatibû kirin.Vêca ew ezabê ku wan pê tinaz dikir û bawerî pê nedianî, ji wan re hat û ew helak kirin.

**11.** Bibêje: De li ser rûyê erdê bigerin, paşê binêrin ka dûmahîka bêbaweran bû çi?

**12.** Ji wan bipirse: Çiqas tiştên ku li erd û asîmanan hene yên kê ne? Bibêje: Ew ên Xwedê ne. Wî li ser zatê xwe dilovanî misoger kiriye. Bêguman roja qiyametê ya ku tê de guman nîn e, dê we li hev bicivîne. Ew ên ku (bi kirina gunehan) xwe xesirandine, vêca ew bawerî nayînin.

**13.** Çi tiştê ku di şev û rojê de diqewime her ê Xwedê ye. Ew e yê bihîzer, yê zana.

**14.** Bibêje: Ma ez ê ji bilî Xwedê, ji bo xwe dost û arîkarekî bigirim, digel ku Xwedê afirînerê erd û asmanan e û ku ew risq dide û nayê riziqdan? Bibêje: Bêguman ferman li min hatiye kirin ku ez bibim ji mislimanên pêşî û zinhar (!) tu nebe ji wan ên ku ji bo Xwedê hevpişkan çêdikin.

**15.** Bibêje: Bêguman ez ji ezabê rojeke mezin ditirsim ku ez bêemriya Xwedayê xwe bikim.

**16.** Ew kesê ku wê rojê azar ji serê bê dagerandin, vêca bêguman Xwedê dilovanî lê kiriye û ew e xelasiya aşkera.

**17.** Eger Xwedê zerarê bide te vêca ji Wî pê ve tu kes nikare ji ser te bide alî û eger ew qenciyekê li te bike, vêca Ew li ser her tiştî qadir e.

**18.** Ew e yê li ser evdên xwe desthilatdar û her ew e yê Ḥekîm ê Xebîr.

**19.** Bibêje: Ma şehdeyiya kê herî mezin e? Bibêje: Xwedê bi şahidî herî mezin e, ew di navbera min û we de şahid e û ev Qur'ana hanê ji min re hatiye wehîkirin da ku ez we û kesê ku deng bigihîjê ji azara Xwedê bitirsînim. Bibêje: Ma ji dil hûn şahdeyiyê didin ku digel Xwedê îlahên din hene? Bibêje: Ez li ser vî çendî nabim şahid. Bibêje: Ew bes Xwedayekî bi tenê ye û bêguman ez ji hevpişkiya ku hûn ji bo Wî çêdikin bêrî me.

**20.** Ew ên ku me kitêb daye wan, wekî ku ew kurên xwe nas dikin, eynî wisa jî wê nas dikin. Ewên ku li nefsa xwe xisaret kirin, vêca ew baweriyê nayînin.

**21.** Ma ji wî kesî ku li ser (navê) Xwedê derewan bike, yan jî bi ayetên Wî bawerî neyine, kî stemkartir e?! Bêguman rewş ew e, sitemkar bi ser nakevin.

**22.** (Resûlê min! Bîne bîra wan) Wê roja ku em hemûyan li hev kom bikin, paşê em ê ji yên ku (ji Xwedê re) hevpişk çêkirin re bibêjin: Ma ew pûtên we yên ku we digot ew Xweda ne li kû ne?

**23.** Piştî vê, tu çare û bersiva wan nemaye ji bilî ku bibêjin: Em bi Xwedê, Perwerdegarê xwe sond dixwin ku em ne muşrik bûn'!

**24.** De li wan binêre. Çawa derewan li xwe dikin û çawa ew pûtên ku bi neweyî ji Xwedê re dikirin hemkûf, ji ber wan winda dibin.

**25.** (Resûlê min!) Hin ji wan (dema tu Qur'anê dixwînî) li te guhdarî dikin. Me li ser dilê wan perde û di guhên wan de jî giranî danî da ku ew tênegihîjin. Çendî ew tevekê mucîzeyan bibînin jî dîsa ew ê bawer nekin. Çi dema têne cem te, bi te re nîqaşê dikin û dibêjin: "Ev ji çîrokên pêşiyan pê ve ne tiştekî din e."

**26.** Ew, mirovan jê vedikişînin û ew bi xwe jî jê dûr diçin. Ew her tenê nefsa xwe dibin helakê û pê jî nahisin.

**27.** (Resûlê min!) xwezî te rewşa wan bidîta, dema li ber agir têne rawestandin û dibêjin: Ax, xwezîka em li dinyayê bihatina vegerandin û me bi ayetên Xwedayê xwe bawerî bianiya û em bibûna ji bawermendan.

**28.** Nexêr; belkî ji wan re ya ku wan berê vedişart xuya bû, eger ew dîsa li dinyayê bên vegerandin, ew ê li ya ku ji wan re hatibû qedexekirin, dîsa vegeriyana. Bêguman ew her derewîn in.

**29.** Gotin: Jiyan bes jiyana me ya vê dinyayê ye û em ê piştî mirinê neyên vejandin.

**30.** (Resûlê min!) Xwezî te ew bidîtina! Dema ew li ber Xwedayê xwe tên rawestandin. (Xwedê) dibêje: Qey ev (vejîna we) ne heq e? Dibêjin: Belê em bi Xwedayê xwe sond dixwin ku rast e. Xwedê dibêje: De vêca ji ber kufra xwe ezab tehm bikin!

**31.** Bêguman ew ên ku bi çûyîna ber destê Xwedê bawerî neanîn, wan ziyan kir. Heya ku ji nişka ve qiyamet li wan rabe, ew ê gunehên xwe deynin ser pişta xwe û dê bibêjin: Hey wax li me, li ser vê texsîriyê ku me di îbadetê de sistayî kir. Agahdar bin; ew barê ku ew hildigirin çi pîs bar e!

**32.** Jiyana vê dinyayê bes lîstik û mijûlbûn e û ji bo wan ên ku (ji gunehan) xwe diparêzin jî, bêguman mala axretê çêtir e. Erê, ma hê jî hûn aqil nagirin?

**33.** (Resûlê min!) Bêguman em dizanin ku gotina wan te xemgîn dike. Vêca bi rastî ne ku ew bi te bawerî nayînin; lê belê yên sitemkar ayetên Xwedê mandel dikin.

**34.** Bêguman gelek pêxemberên beriya te jî bawerî bi wan neanîne, vêca li hember vê nebawerîyê û tehdedîtinê xwe ragirtin û sebir kêşan, heta ku arîkariya me ji wan re hat. Tu guherîn ji bo fermanên Xwedê nîn e (ku arîkariya Xwedê ji bo bawermendan dê her bê). Bêguman serpêhatiyên pêxemberan ji te re hatin.

**35.** Eger danapaşa wan (ji vî dînî û neguhdariya wan li te) li ser te giran tê, vêca eger tu dikarî di têbihurekê (nefeqekê) de xwe berdî erdê yan jî bi sêlmekê ber bi asîmanan ve hilkişî, vêca tu ji wan re jî nîşanan (ji erd û esmanan) bînî (da ku bi te bawerî bînin, de bike! Belê tu nikarî bikî, nexwe heta ku fermana Xwedê bê, sebir bike). Eger Xwedê bivaya dê ew li ser hîdayetê bicivandina, vêca tu nebe ji nezanan.

**36.** Bes, ewên kû ji dil û can gohdarî dikin bi erênî bersiva te didin. Yên mirî jî, Xwedê dê wan (roja qiyametê) vejîne û paşê ew ê bi bal Xwedê ve bêne vegerandin.

**37.** Gotin: Ma çima mucîzeyek ji cem Perwerdegarê wî jê re nehatiye hinartin? Bibêje: Teqez Xwedê li ser şandina mucîzeyekê qadir e, lê belê pirên wan nizanin.

**38.** Çi heywanekî ku li erdê bimeşe û çi teyrekî ku bi herdu perên xwe bifire, her ew jî weke we umet in (rewşa wan, risq û ecelê wan jî hatine nivîsandin). Me tiştek di kitêbê (Lewh'ul-Mahfûzê) de kêm nehiştiye. Paşê ew ê bi bal Perwerdegarê xwe ve li hev bêne civandin.

**39.** Ew ên ku bi ayetên me bawerî nayînin, di nav tarîtiyên (kufrê) de ker û lal in. Xwedê, kî (rêşaşîyê) bivê wî ji rê dixe û kî jî (hîdayetê) bivê wî tîne ser riyeke rast.

**40.** (Resûlê min! Ji kafiran re) Bibêje: Ka ji min re bibêjin; eger bi rastî hûn (di doza xwe de) rastgo ne, eger ezabê Xwedê bi ser we de bê yan jî qiyamet li we rabe, ma hûn ê gazî xeyrî Xwedê bikin?.

**41.** (Na, hûn gazî wan nakin!) Belkî hûn ê tenê li ber wî bigerin, vêca eger Xwedê bixwaze, ya ku hûn dixwazin ji ser we rabe, dê wê ji ser we rake û ew ên ku we jê re dikirin hemkûf jî hûn ê wan ji bîr bikin.

**42.** (Resûlê min!) Bêguman Me ji bo umetên beriya te pêxember şandin, vêca Me bi hejarî û nexweşiyan ew hingaftin da ku bi zarezar û lakelak li ber me bigerin.

**43.** Vêca dema ezabê me bi ser wan de hat, de bila wan bi bal me ve bikira zarezar. Lê belê dilên wan hişk bû û şeytên jî ya ku wan dikir ji wan re dixemiland û li ber çavê wan xweş dikir.

**44.** Êdî çi dema ew şîretên ku li wan hatibûn kirin ji bîr kirin, Me jî ji bo wan dergehên hemû tiştî vekirin. Heta bi ya ku ji wan re hatiye dilxweş bûn, îcar ji nişka ve me ew hingaftin (û helak kirin), vêca ji nû ve ew (ji xêrê) bêhêvî bûn.

**45.** Vêca (piştî vê rewşê), koka civata sitemkar hate birîn û pesn û spasî ji Xwedayê alemê re be.

**46.** Bibêje: De ka ji min re bibêjin eger Xwedê guhên we ker bike, çavên we kor bike û ser dilên we mor bike, ma ji bilî Xwedê ew kîjan xweda ye ku wan li we vegerîne? De tu binêre, ka çawa em nîşanên (yekîtiya) xwe aşkera dikin, lê belê ew dîsa berê xwe jê vedigerînin (û îmanê nayînin).

**47.** Bibêje: De heydê ji min re bibêjin: Eger ezabê Xwedê ji nişka ve yan aşkera bi ser we de bê, ma ji bilî civata sitemkar kî dê bête rûxandin?

**48.** Em pêxemberan, tenê wek mizgînber û hişyarker dişînin. Êdî kesê ku baweriyê bi wan bîne û xwe rast û durist bike, ji wan re tu tirs tune ye û ew xemgîn jî nabin.

**49.** Herçî ew ên ku bi ayetên me bawerî neanîn, ji ber ku ji rê derketin, ezab dê wan bihingive.

**50.** Bibêje: Ez ji we re nabêjim ku xezîneyên Xwedê li cem min in û ez bi xeybê nizanim û ez ji we re nabêjim ku ez melayîket im jî. Bes ez didime pey a ku ji min re tête wehîkirin. Bibêje: Erê ma yê kor û yê biçav wekhev in? Ma qey hûn nafikirin?[1]

**51.** (Resûlê min!) Wan muminên ku ji civandina li ber destê Xwedayê xwe ditirsin tu wan bi Qur'anê hişyar bike ku ji bo wan, ji Xwedayê wan pê ve ne dost û piştevanek û ne jî mehdervanek heye. (Wan agahdar bike) da ku ew xwe biparêzin.

1 Di ayeta pîroz de „Yê kor" buhûrî, mebest jê, yê kafir e. Lewra ew e yê ku ber xwe nabîne û xwe di êgir wer dike. „Yê bi çav" jî buhûrî, daxwaz jê, yê bawermend e. Lewra ew e yê ku ber xwe dibîne û xwe ji ezabê çetîn diparêze.

**52.** (Resûlê min!) Tu wan ên ku sibeh û êvarê li ber Xwedayê xwe digerin û rizaya Wî dixwazin, neqewirîne! Ji berpirsgirtina wan qet tiştek li ser te nîn e. Ji berpirsgirtina te jî qet tiştek li ser wan nîn e. Êdî eger tu wan biqewirînî, (wê çaxê) tu dê bibî ji sitemkaran.

**53.** Bi vî awayî me hin ji wan (dewlemendan) bi hin (xizan)an îmtîhan kir, da ku (giregir) bibêjin; ma ji nav me ev in ên ku Xwedê nîmeta hîdayetê daye wan? Erê ma yê ku bi şikurdaran bêhtir dizane ne Xweda ye?

**54.** Dema ew ên ku bawerî bi ayetên me tînin bên cem te, ji wan re bibêje: Silav li ser we be, Xwedayê we li ser xwe merhemet misoger kiriye; bêguman ji we ew kesê bi nezanî nerindiyekê bike, piştî wê tobe bike û xwe rast û durist bike, bêguman Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

**55.** Ha bi vî awayî em ayetan ji we re ji hev vediqetînin da ku rêk û boçûnên sûcdaran eşkera bibe.

**56.** Bibêje: Nehya min hatiye kirin ku ji bilî Xwedê, ez îbadetê ji wan ên ku hûn li ber wan digerin re, bikim. Bibêje: Ez nadim pey daxwazên we, (eger ez bidim dûv daxwazên we) wê çaxê teqez ez ji rê dikevim û ez ê nebim ji wan kesên ku hatine rasterêkirin.

**57.** Bibêje: Bêguman ez ji cem Perwerdegarê xwe ve li ser rêkeke aşkera me û we bawerî pê neanî. Ew ezabê ku hûn divên bi lez bi ser we de bê, ne li ba min e. Ferman tenê ya Xwedê ye. Ew rastiyê tîne zimên û ew çêtirînê heqvebiran e (ku heqan ji hev diqetîne).[1]

**58.** (Resûlê min!) Bibêje: Eger ew (ezab)ê ku hûn dixwazin bi lez bi ser we de bê, li cem min bûya, dê rûdan di nava min û we de muheqeq pêk bihata. Xwedê bi sitemkaran bêhtir dizane.

**59.** Kilîtên cîhana nependî her li cem Xwedê ne, ji Wî pê ve kes bi wan nizane û li bejahiyê û deryayê çi hebin Ew bi tevan dizane. Çi peleke ku ji darê bikeve ew her pê dizane û çi liba di tarîtiyên zemînê de û çi tiştê ter û çi yê hişk her di kitêbeke diyar (Lewhul Mahfûzê) de ne.

**60.** Her Ew e yê ku bi şevê we di xew re dibe û bi rojê we çi kiribe pê dizane. Paşê we di rojê de hişyar dike da ku civanê mirina we ya diyarkirî bête temamkirin. Dûvre vegera we her bi bal Wî ve ye, paşê dê we bi ya ku we dikir, agahdar bike.

**61.** Her Ew e desthilatdarê li ser bendeyên xwe û melayîketên parêzger dişîne ser we, heta yek ji we bikeve ber mirinê, hingî qasidên me (melayîketên rihstên) bêkêmasî wî dimirînin.

**62.** Paşê dê bi bal Xwedê, serwerê xwe yî rasteqîn ve bêne zivirandin. Agahdar bin! Ferman her jê re ye û Ew zûtirînê hesabpirsan e.

**63.** (Resûlê min!) Bibêje: Ma kî ye ew ê ku we ji tarîtiya bejê û behrê reha bike?

1 Muşrikan, ji Peyxamber dixwestin ku wek mucîze ji jor ve kevir li wan bibarin, yan jî ezabekî xemnak bihingive wan. Hal ev e ku doza îslamê nû dest pê kiribû û ji bo ku cîhanê bi delîlên ilmî û eqlî ronî bike û li çar aliyên gerdûnê belav bibe Peyxamber ji Rebbê xwe nexwest ku ew ezab bide wan û Xwedê jî ezab bi ser wan de neşand.

Dema hûn aşkera û bi dizî li ber digerin, dibêjin: Sond be, eger Tu me ji vê (xeterê) xelas bikî em ê bibin ji şukirdaran!

**64.** Bibêje: Xwedê we ji wê (karesatê) û ji her derdî jî xelas dike. (Lê belê) paşê hûn jê re hevpişkan çêdikin.

**65.** Bibêje: Xwedê dikare ji raserî we ve yan ji bin lingên we ve, ji bo we ezabekî bişîne, yan jî we bike civatên ji hev cuda û we bi hev bide êşandin. De binêre, ji bo ew hûr û kûr têbigihîjin em çawa ayetên xwe (ji wan re) aşkera dikin.

**66.** (Resûlê min!) Qewmê te bawerî pê neanî, rewş ev e ku (ev Qur'an) rastbêjeke rasteqînî ye. Bibêje: Ez ji we ne berpirs im (ku bi zorê we bînim ser riya rast).

**67.** Ji bo her xeberekê (ku Qur'anê jê xeber daye) dema misogerbûna wê heye, hûn ê piştî demekê jê agahdar bibin.

**68.** Dema te ew dîtin, ên ku der barê ayetên me de bi neqencî xwe noqî mijûliyê dikin, vêca berê xwe ji wan vegerîne (û li cem wan rûnenê) heya ku nekevin nav dabaşeke din. Eger şeytan bi te da jibîrkirin, vêca piştî ku hat bîra te li nav cıvata sitemkaran rûnene.

**69.** Ji hesabê (gunehê) wan ên ku xwe noqî (mijûliyê) dikin ji bo wan ên ku hay ji ferman û qedexeyên Xwedê hebin re tu guneh nîn e (wextê digel wan rûnenin). Lê bele da ku ew xwe biparêzin şîret lazim e.

**70.** (Resûlê min!) Dev ji wan ên ku dînê xwe ji xwe re kirine lîstik û mijûlayî û jiyana vê dinyayê ew ji rê xistine berde. Bi Qur'anê şîret bike da ku tu kes bi sedema gunehê ku qezenc kirî di helakê wernebe. Ji bilî Xwedê, ji bo wî ne dost û arîkarek ne jî mehdervanek heye. Eger ew çiqas (mal) di ber xwe de bide jî (da ku ji ezab rizgar bibe) jê nayê qebûlkirin. Ha ew in ên ku ji ber kar û kiryarên kirin ketine ber ezab. Ji ber ku wan bawerî neaniye, ji wan re vexwarineke keliyayî û ezabekî dijwar heye.

**71.** Bibêje: Ma em ê ji bilî Xwedê ji wan ên ku ne dikarin feydê bidin me û ne jî dikarin zerarê bidin re îbadetê bikin?! Piştî ku Xwedê em hîdayet kirin, ma em ê bi ser pehniya xwe ve vegerin bal kufrê, (ev rewş dibe) mîna timtêla wî kesê ku şeytanan ew ji rê xistibe û sergeşte li erdê mabe, jê re hevalin hebin, wî gazî bal rastiyê bikin, (bibêjin) were bi bal me ve (vêca ew jî guh nede wan). Bibêje: Bêguman hîdayet (riya rast) her rasteriya Xwedê ye û ferman li me hatiye kirin ku em radestî fermana Perwerdegarê alemê bibin.

**72.** (Dîsa ferman li me hatiye kirin) ku bi berdewamî û duristî nimêj bikin û em hay ji (ferman û qedexeyên) Xwedê hebin! Her Ew e yê ku (roja qiyametê) hûn ê bi bal ve bêne komkirin.

**73.** Ew e, yê ku erd û asîman bi heqî afirandin. Roja ku ew bibêje "Çêbe" vêca çêdibe. Gotina Wî her rast e. Roja ku di sûrê (boriyê) de bête pifkirin jî, Xwedanî her jê re ye. Zanayê bi ya nependî û bi ya aşkera ye. Her ew e yê Ḥekîm yê Xebîr.

**74.** Dibîr bîne dema Îbrahîm ji bavê xwe Azer re got: Ma qey tu pûtan ji xwe re dikî îlah? Rewş ev e ku ez te û gelê te birastî di rêşaşiyeke aşkera de dibînim.

**75.** Bi vî awayî me melekûtiya (xwedaniya) erd û asîmanan nîşanî Îbrahîm da, da ku ew bibe ji yên bi bîr û bawer.

**76.** Çi dema tarîtiya şevê ser Îbrahîm nixumand, wî stêrek dît û got: Rebbê min ev e. Çi dema stêr çû ava, got: Ez ji yê diçe ava hez nakim.

**77.** Çi dema Îbrahîm dît ku heyv derhat, got: Rebbê min ev e. Vêca çi dema ew jî çû ava got: Eger Xwedayê min riya rast nîşanî min nede, teqez ez ê bibim ji qewmê rêwindabûyî.

**78.** Çi dema Îbrahîm dît ku roj hilat got: Rebê min ev e, lewra ev mezintir e. Êdî çi dema ew jî çû ava got: "Hey gelê min! Ez ji wan tiştên ku hûn ji Xwedê re dikin hemkûf dûr û bêrî me.[1]

**79.** Bêguman, min berê xwe ji dil; bêfetl û vîç da wî Xwedayê ku erd û asîman ji tuneyî afirandine û ez ne ji muşrikan im.

**80.** Gelê Îbrahîm pê re kete nîqaşê. (Îbrahîm) got: Ma hûn der barê Xwedê de bi min re dikevin nîqaşê? Hal ev e, bêşik Wî ez (li ser riya rast) rasterê kirime. Ez, ji yên ku hûn jê re dikin hemkûf qet natirsim (ku ew ziyanekê bidine min), ji bilî ya ku Perwerdegarê min bivê (ew cuda ye). Xwedayê min bi zanîna xwe dor li her tiştî girtiye, ma hê jî hûn ders û îbret nagirin?

**81.** Erê ma ez ê çawa ji wan (pût)ên ku hûn ji Xwedê re dikin hevpişk bitirsim?! Hal ev e; hûn natirsin ku bêbelge û delîl hûn ji Xwedê re hevpişkan çêdikin. Eger bi rastî hûn dizanin vêca ma kîjan ji herdu celeban (em an hûn) bêhtir hêjayî ewlehiyê ne?

**82.** Ew ên ku bawerî anîn û tu neheqî (şirk) têkilî baweriya xwe nekirin, ha ewlehî (û aramî) ji wan re ye û ew (li ser riya heq) hatine rasterêkirin.

**83.** Ha ev delîl û belgeyên me ne, Me ew li hember gelê wî dane Îbrahîm. Kesê ku em bivên, em mertebeyên wî bilind dikin. Bêguman Xwedayê te Ḥekîm e, 'Elîm e.

**84.** Me Îshaq û (bi nevîtî jî) Yaqûb ji Îbrahîm re diyarî kirin. Me, tev (li ser heqiyê) serwext û rasterê kirin. Berî Îbrahîm me Nuh jî serwext û rasterê kir. Me ji zuriyeta Îbrahîm Dawid, Suleyman, Eyûb, Yûsuf, Mûsa û Harûn jî rasterê kirin û her wisa em padaşê didin qencîkaran.

**85.** Zekeriya, Yehya, Îsa û Îlyas ev hemû ji qencîkaran bûn.

**86.** Îsmaîl, El-Yese', Yûnus û Lût jî Me tev (bi pêxemberî) di ser alemê re girtin.

**87.** Me, bi bavên wan, zarokên wan û birayên wan jî qencî kir, me ew vebijartin û me ew rasterêyî riya rast kirin.

---

1 Ma gelo qesda Îbarhîm ew bû ku li Xwedayê xwe bigere yan mebesta wî ew bû ku stêrperest û rojperestan şermezar bike, vêca wan agahdar bike ku rêya wan rêyeke çewt û şaş e. Li gorî qenaeta giregirê tefsîrzanan şeqê diduyan e. Lewra di ayeta 75ê de ji ber ku bavê wî û gelê wî pût dihebandin, ew şermezar kiribûn û Îbrahîm li ser bîr û baweriya yekdêrînê (tewhîdê) bû, hem ayeta 78ê jî vê rastiyê xurt dike. Bi rastî di mijarê de fikra giregirên tefsîrzan; ên wekî Qurtûbî, Zemexşerî, Ebû Suûd, Îbnî Kesîr ew e ku ev gotina Îbrahîm di cihê munaqeşê de bûye; ev lêkolîn kiriye da ku delîlên wan ên derheqa hebandina stêr, roj û heyvê de pûç û betal bike, ne ku wî bi rastî îbadetê van mexlûqên Xwedê dikir. Xwedê bêhtir rastiya vê dizane.

**88.** Ha ev hîdayeta Xwedê ye. Ew, ji evdê xwe kê bivê nîşanî wî dide. Eger wan (pêxemberan) jî tiştek ji Xwedê re bikiraya hevpişk, helbet kirinên wan tev dê pûç bibûna.

**89.** Ha ew in, ew pêxemberên ku me kitêb, hikmet û pêxemberî daye wan. Vêca eger ev ên ha (xelkê Mekkeyê) baweriyê pê neyînin, jixwe me ew sipartibû qewmekî ku ew hîç înkara wê nakin.

**90.** Ha ew pêxember in, ew ên ku Xwedê ew li ser heqiyê rasterê kirine, nexwe tu jî bide ser riya wan. Bibêje: Ez ji bo (ragihandina Qur'anê) tiştekî ji we naxwazim. Ew ji alemê re bes şîret û pend e.

**91.** Dema cihûyan got: Xwedê (ji wehyê) tiştek ji bo tu mirovan nehinartiye, (bi vê gotina xwe) wan bi duristî rêz li Xwedê negirtiye. Bibêje: Nexwe ew kitêba ku Mûsa ew ji mirovan re wek ronahî û rêber aniye û hûn jî wê parçe parçe li ser kaxizan dinivîsin û (ya bi dilê we hûn wê) diyar dikin û hûn pirê wê jî (ji xelkê) vedişêrin û hûn bi ya ku we nedizanî, bav û bapîrên we jî pê nedizanî hatin fêrkirin, (ma gelo) kê ew hinartiye? Bibêje: (yê ku ew hinartiye) Xwedê ye. Paşê dev ji wan berde, bila ew di teqana (gawiriya) xwe de bigevizin.

**92.** Ev (Qur'an) kitêbek e, me ew hinartiye, pîroz e, ji bo ya li ber deste xwe rastdêr e. Hem jî da ku tu pê xelkê Ummul-Qura (ehlê Mekkeyê) û yên li dorhêlên wê (her kesî li her derê) hişyar bikî. Ew ên ku bi roja axretê baweriyê tînin, bi wê (Qur'anê) jî baweriyê tînin û ew li ser kirina nimêja xwe jî miqate ne.[1]

**93.** Ma ji wî kesê ku li ser (navê) Xwedê bi derewan neweyî dibêje, yan jî bibêje: Peyxam, ji min re ji cem Xwedê hatiye -digel ku jê re peyxam nehatiye- sitemkartir kî heye û ji wî kesê ku dibêje: "Ez ê jî ayetan bişînim çawa ku Xwedê ayet şandine?! (Resûlê min!) Xwezî te (halê) wan sitemkaran bidîta, dema ew bikevin ber serxweşiyên mirinê û melayîketên (rihstên) penceyên xwe dirêjî wan bikin (û ji wan re bibêjin) "De heydê canê (rihê) xwe derînin." Îro bi sedema ku we îftira li Xwedê dikir û we xwe li hember ayetên Wî mezin dikir, hûn ê bi ezabê riswatiyê bêne cezakirin.

**94.** Sond be! Ka çawa Me, cara pêşîn hûn afirandin, dîsa hûn ê wisa bi tenê bi bal me ve bên û hûn ê malê ku me li cîhanê dabû we li dûv xwe bihêlin. Ka ew mehdervanên we li ku ne, ew ên ku we guman dikir ku ew hevtayên Xwedê ne?! Sond be, pêwendiya di navbera we û wan de qut bû û ew ên ku we digot "ew Xweda ne" ji ber we winda bûn.

**95.** Bêguman Xwedê parçekerê tov û dendikan e, yê zindî ji yê mirî dertîne û yê mirî jî ji yê zindî dertîne. Yê ku vê dike Xwedê ye, êdî çawa hûn berê xwe ji heqiyê dizivirînin?

**96.** (Xwedê,) parçekerê spêdê ye, şev kiriye bêhnvedan û aramgeh, roj û heyv jî gerandine demjimêr. Ha ev hemû teqdîra Xwedayê desthilat ê zana ye.

1 Bajarê Mekkê, ji hêla manewî ve navenda Cîhana Îslamî ye. Dorhêlên wê jî, gerdûn tev e. Qasidê Xwedê wek peyxamber ji mirovatiyê hemûyî re hatiye şandin. Herwiha Qur'an jî bi mirovatiyê gişî re dipeyive. Ji ber vê yekê, di ayeta pîroz de ji Bajarê Mekkê re „Umulqura“ yanî maka welatan hatiye gotin.

**97.** Ew Xwedayê ku stêr ji bo we (li asîmanan) danîn da ku hûn riya xwe di tarîtiya bejahiyê û deryayê de bi wan bibînin. Bêguman ji bo civateke ku bifikirin me bi berfirehî nîşanên (qudreta) xwe aşkera kirine.

**98.** Ew e, yê ku hûn ji nefsekê peyda kirine. Vêca ji we re cihekî ku hûn lê rawestin û cihekî ku berwext lê bimînin heye. Bêguman me ji bo civateke ku hûr û kûr fêr bibin ayetên xwe bi berfirehî ji hev veqetandine.[1]

**99.** Her Ew e yê ku ji ewran baran barandiye, vêca me bi avê ji her rengî hêşînayî deraniye, êdî me ji wê şînahiyê giyayê hêşîn deraniye ku em ji wê jî teneyên lihevsiwarbûyî dertînin. Ji bûtikên darên xurmeyan jî goşiyên nêzî hev dertîne holê. (Em bi wê avê) Rezên tirî, zeytûn û hinaran jî, mîna hev û rengorengo dertînin. (Gelî mirovan!) Dema dar ber bigire û bigihîje, li berê wan binêrin! Bêguman di wan de ji bo civateke ku baweriyê bîne, îbret û nîşan hene.

**100.** (Wan muşrikan) Ji Xwedê re cin kirine hevta. Hal ev e ku Xwedê ew jî afirandine. Bi nezanî ji cem xwe, jê re kur û keç lêanîne. Haşa! Ew, ji wan wesfên ku ew jê re lêtînin pak û bilind e.

**101.** Her ew e afirînerê erd û asîmanan. Ew dê çawa jê re zarok hebin digel ku hevala Wî jî tune ye? Wî her tişt afirandiye û Ew bi her tiştî zana ye.

**102.** Ha xwedanê van saloxan Xwedê ye ku ew perwedegarê we ye. Ji Wî pêştir tu Xweda nîn in. Ew afirîndoxê (xaliqê) her tiştî ye. Vêca ji bo Wî îbadetê bikin û Ew li ser her tiştî çavdêr e.

**103.** Çav tênagihîjin (ku Xwedê bibînin). Ew bi xwe çavan (û her tiştî) dibîne. Helbet yê hûrbîn û kûrbîn û bi her tiştî agahdar her Ew e.

**104.** (Resûlê min! Bibêje) Bêguman ji cem Xwedayê we, ji bo we belge û delîlên berbiçav hatine. Êdî kesê ku heqiyê bibîne û bawer bike, feydeya wî ji wî re ye. Kesê ku çavê xwe li heqiyê bigire û kor bibe, zerara wî jî jê re ye û ez li ser (kirinên) we ne çavdêr im.

**105.** Ha bi vî rengî em ayetên xwe ji hev vediqetînin, paşî kafir dê bibêjin: Te (ji ehlîkitêban) ders stendiye û da ku em ji bo civateke ku dizanin re Qur'anê rind aşkera bikin.

**106.** (Resûlê min!) Bide pey peyama ku ji Xwedayê te ji te re hatiye. Ji Wî pê ve tu Xweda nîn in û berê xwe ji muşrikan vegerîne.

**107.** Eger Xwedê bixwesta ew ê nebûna muşrik. Me, tu jî li ser wan nekiriyî zêrevan û tu ne berpirsê kirinên wan î jî.

**108.** (Gelî bawermendan!) Dev navêjin wan ên ku ji bilî Xwedê dihebînin, êdî ew jî dê ji nezanî û sitemkarî devbavêjin Xwedê. Bi vî awayî Me kar û kiryarên her miletekî di çavên wan de xemilandiye. Paşê vegera wan her bi bal Perwerdegarê wan ve ye. Vêca dê wan bi ya ku dikirin agahdar bike.

**109.** (Muşrikên Mekkê) Bi Xwedê sonda xwe ya herî asê sond xwarin; eger mucîzeyek

1 Di vê ayeta pîroz de: „Ji we re cihekî ku hûn lê rawestin û cihekî ku berwext lê bimênin heye" buhûrî. Cihê berwext; pişta bavê û malzaroka dê û ev dinya ye, ya ku em jiyana xwe tê de derbas dikin. Cihê sekn û rawestandina ebedî, mala axretê ye ku ji wê pê ve tu malên din tun in.

ji wan re bê, ew ê baweriyê pê bînin. Bibêje: Mucîze bes ji cem Xwedê ne. Ma hûn çi dizanin (gelî mumînan), eger mucîze ji bo wan were jî dîsa ew ê bawerî neyînin…

**110.** Em ê dilên wan û çavên wan (ji naskirina heqiyê) berevajî bikin; çawa ku wan berê jî bawerî pê neanîbûn û em ê wan di serxweveçûna wan de matmayî û sergeşte bihêlin.

**111.** Bêguman eger me ji wan re melayîket bişanda û mirî bi wan re bidana xeberdan û me her tişt li pêşberî wan bicivanda, ji bilî ya ku Xwedê bivaya dîsa wan bawerî nedianî; lê belê pirên wan jî nezan in.[1]

**112.** Her wiha me ji her pêxemberekî re şeytanên îns û cinî kirine neyar, di guhên hev de peyvên xemilandî dibêjin da ku xelkê bixapînin. Eger Xwedayê te bivaya wisa nedikirin, vêca dev ji wan û derewên wan berde.

**113.** (Şeytan gotina xweş ber bi guhê wan dixin) Da ku dilê yên ku bawerî bi axretê nayînin bibijê wan peyvan û ew peyv li wan xweş bê û da ku ew her wê bikin ya ku ew dikin.

**114.** (Resûlê min! Bibêje): Ma vêca ez ê ji bilî Xwedê li dadwerekî (ku di navbera min û wan de hukim bike) bigerim. Hal ev e ku her Ew e yê ku kitêb ji bo we bi berfirehî hinartiye. Ew ên ku me kitêb ji bo wan hinartî, dizanin ku ew bi rastî ji cem Xwedayê wan e, êdî tu nebe ji yên gumandar.

**115.** Gotina Xwedayê te, ji hêla rastî û edaletê ve pêkhatiye. Tu kes nikare gotinên Wî biguherîne. Ew e her yê bihîzer, yê zana.

**116.** Eger tu bi gotina piraniya yên li ser erdê bikî, ew ê te ji riya Xweda derxin. Ew her didine pey gumanê û ew her derewan dikin.

**117.** Bêguman Xwedayê te bêhtir dizane ka kî ji riya Wî şaş bûye û bêhtir dizane ka kî li ser riya wî rasterê bûye.

**118.** Vêca eger bi rastî hûn bi ayetên Wî bawerdar bin, ji wê ya ku di dema şerjêkirinê de navê Xwedê li serê hatiye gotin bixwin.

**119.** Çima hûn ji heywanên ku di dema şerjêkirinê de navê Xwedê li ser wan hatî gotin, naxwin? Bêguman ji bilî xwarina ji neçarî, Xwedê ya qedexekirî ji we re ji hev veqetandiye. Bêguman pir kes ji nezanî bi hewesên xwe mirovan ji rê derdixin. Teqez Xwedayê te bi wan ên ku sînorê (helaliyê) derbas dikin xweş dizane.[2]

**120.** Dev ji gunehên aşkera û yên bi dizî berdin! Bêguman ew ên ku gunehan dikin dê bi gunehkariyên xwe bêne cezakirin.

---

1 Rêşaşan, ne ji ber tunetî û hindikiya delîlan rêya xwe şaş kirine. Eger wekî ku ew dibêjin, "mirî sax bibin û bi wan re bipeyivin, eger temamê zerreyên kaînatê biaxivin û banga îmanê li wan bikin" dîsa jî ew ê îmanê neyênin. Lewra di dilên wan de fesadî heye, vêca ew kor bûne; heqîqetê nabînin. Ji ber ku ew berê xwe nadin rêya rast, Xwedê jî wan li ser rêya rast rasterê nake.

2 Xwedê Teala, di wan ayetên ku buhurîne de heywanên ku xwarina goştê wan heram e, eşkere kirine. Lêbelê mirov ji neçarî; ji nêza yan jî ji ber tehlûkeya mirinê dikare hinekî ji goştê wan heywanên ku heram e bixwe. Ji bilî heywanên ku goştê wan heram e, ewên din; eger navê Xwedê di dema serjêkirinê de li ser wan bê gotin, goştê wan helel e.

**121.** Hûn ji heywanên ku (hatibin şerjêkirin û) navê Xwedê li ser wan nehatibe gotin, nexwin! Bêguman ew (xwarina bi vî awayî) derketina ji riya Xwedê ye. Bêguman şeytan di guhê dostên xwe de pistepistê dike da ku li hemberî we tê bikoşin. Eger hûn bi gotina wan bikin, bêguman hûn ê bibin ji muşrikan.

**122.** Ma rewşa kesê ku berê (bi sedem kafiriya xwe) mirîbû vêca me ew (bi îslamê) sax kiribe û me ronahiyeke wisa dabê ku bi wê bikare li nav mirovan bigere, dibe weke rewşa wî kesî ku di nava tarîtiyên (kufrê) de mabe û hîç nikaribe ji wan bi der were? (Helbet na!) Her wisa ji kafiran re kar û kiryarên ku dikin hatiye xemilandin.

**123.** Her wiha me gunehkarên her gundekî (û her bajarekî) kiriye mezinên wê derê, da ku tê de hîlekariyê bikin. Hal ev e ku ew bi tenê li ser xwe hîlekariyê dikin û pê nahisin.

**124.** Dema ayetek ji wan re dihat, digotin: Heta mîna ayetên ku ji pêxemberên Xwedê re tê dayîn ji me re jî neyê dayîn em qet bawerî nayînin. Xwedê bêhtir dizane ka rîsaleta (pêxembertiya) xwe dide kê? Dê ji cem Xwedê riswayiyeke giran û azareke dijwar bi ser wan ên ku sûc kirin de bê, bi sedema ku dek û dolaban digerînin.

**125.** Vêca kesê ku Xwedê bivê wî serwext bike, sînga wî ji îslamê re vedike û kesê ku Xwedê wî ji rê bixe, sînga wî teng û bêhnçikandî dike, her wekî ku bi asîman ve hevraz biçe. Bi vî awayî Xwedê çepelî û ezab diavêje ser wan ên ku bawerî nayînin.[1]

**126.** (Resûlê min!) Ev a (me diyarkirî) riya Xwedayê te ye. Bêguman ji bo civateke ku şîretê wergirin me ayetên xwe bi berfirehî aşkera kirine.

**127.** Ji wan re li cem Xwedayê wan darus'selam (cihê ewlehiyê) heye. Xwedê ji ber (qencî) ya ku ew dikin, dost û arîkarê wan e.

**128.** Wê roja ku Xwedê wan tevan li hev bicivîne (û ji wan re bibêje): Gelî civata cinan! Bêguman we gelek ji mirovan dane ber xwe (û we ew ji rê şeqitandine). Dostên wan ên insî jî dibêjin: "Xwedayê me! Me ji hev feyde dît û em gihîştin wê dema ku te ji me re diyar kiribû. Xwedê jî (li ser devê melayîketan) dibêje: Ji bilî ya ku Xwedê bivê, cihê we agir e, heta bi hetayê hûn ê di nav de bimînin. Bêguman Xwedayê te Ḥekîm e, 'Elîm e.

**129.** Bi vî awayî, bi sebûnet bedkariya ku dikin em ji sitemkaran hinan museletî ser hinan dikin.

**130.** (Roja qiyametê tê gotin:) Gelî civata cin û mirovan! Ma ji nav we, pêxemberin ji bo we nehatin ku ayetên min ji we re bibêjin û we ji pêrgîhatina vê rojê hişyar bikin? Dibêjin: Em li ser nefsa xwe dibin şahid (ku pêxemberên te hatin). Bi vî awayî jiyana cîhanê ew xapandin û dîsa ew li ser nefsa xwe guvah (şahid) in ku bêguman ew bi xwe kafir in.

---

1 Xwedê Teala, di vê ayeta pîroz de qanûneke suriştî destnîşan kiriye. Mirov çi qasî hilkişe jor ji ber ku oksijan kêm dibe bêhnstandin jî zor û zehmet dibe. Gava mirov, bêyî alavên taybetî 20.000 metre û zêde hilkişe jorê, mirov neşêt nefesê bistîne û mirov dimire.

**131.** Ev ji ber vê ye ku Xwedayê te ne ew e ku bi neheqî bajaran wêran bike û ku xelkê wan jî (ji ferman û qedexeyên Wî) bêhay bin.

**132.** Ji her kesî re, li gorî karên ku kiriye mertebe hene. Helbet Xwedayê te, ji tiştê ku ew dikin ne bêxeber e.

**133.** Xwedayê te dewlemend e, xwedanrehmet e. Eger ew bivê dê we ji holê rake û piştî we, kê bivê wê di şûna we de bîne, çawa hûn jî ji dola qewmekî din afirandine.

**134.** Bêguman ya ku ji we re hatiye sozdan muheqeq dê bê û hûn ê Xwedê jî neçar nehêlin.

**135.** (Resûlê min!) Bibêje: Ey gelê min! De haydê hûn li gorî derfetên xwe kar bikin. Bêguman ez ê jî li gorî derfetên xwe kar bikim! Vêca hûn ê bizanin ka encama mala lêmayinê ji kê re ye. Bêguman sitemkar tu carî serfiraz nabin.

**136.** (muşrikan) Ji çandinî û terşên ku Xwedê ew xuliqandibûn parek ji Xwedê re veqetandin, vêca ji ber xwe ve gotin: Ev ji Xwedê re û ev jî ji pûtên me re ye. Êdî pişka pûtên wan nagihîje Xwedê û pişka Xwedê digihîje pûtên wan, çiqas pîs e hukimdayîna wan![1]

**137.** Bi vî awayî, şeytanên wan kuştina zarokên wan ji wan re dixemilandin. Da ku kinêsa wan qir bikin û da ku dînê wan li ber wan tevlihev bikin. Eger Xwedê bivaya wiha nedikirin, vêca dev ji wan û derewên wan berde.

**138.** (Muşrikan) gotin: Ev çandinî û terşên hanê parastî ne, qedexekirî ne, ji bilî yên ku destûra wan hatiye dayîn pê ve tu kes nikare wan bixwe. Terşin hene ku siwarbûna wan (û barkirina wan) hatiye qedexekirin û terşin jî hene ku navê Xwedê (di dema şerjêkirinê de) li ser wan nabêjin (bes wan ji pût û senemên xwe re qurban dikin), bi derew û îftîra vê yekê li ser navê Xwedê dikin. Xwedê cezayê îftiraya ku dikin dê bide wan.

**139.** Gotin: Tiştê di zikê van terşan de tenê ji bo zilamên me terxan in û ji jinên me re heram in. Eger tiştê di zikê terşan de mirî be, wê çaxê jin û mêr tev tê de beşdar in. Xwedê, bi vê neweyiya li ser navê Xwedê (bi sebunet helalkirin û heramkirina bê delîl) dê wan bide cezakirin. Bêguman Xwedayê te Ḥekîm e, ‘Elîm e.

**140.** Ew ên ku ji nezanî û serserîtiya xwe zarokên xwe kuştin û tiştê ku Xwedê bi rizqînî dayî wan bi neweyî li ser navê Xwedê heram dêrane, (ha) ew bêguman di ziyanê de ne. Bêguman ew şaş bûne û ew qet rasterê jî nebûne.

**141.** (Gelî mirovan!) Ewê ku bostanên holikkirî û neholikkirî, darxurme û çandiniyên

1 Beriya Îslamê ereban hin ji çandinî û terşê xwe di navbera Xwedê Teala û pûtên xwe de par vedikirin û digotin: „Ev para Xwedê ye, ev jî para pûtên me ye." Para ku ji Xwedê re diveqetandin li mêvan û belengazan mesref dikirin û para ku ji pûtên xwe re jî diveqetandin li merasîmên ku li ber wan dihatin tertîbkirin û li xizmeta wan mesref dikirin. Vêca eger ji para ku ji Xwedê re veqetandibûn tiştek biçûya ser para ku ji pûtên xwe re veqetandibûn, dev jê ber didan. Heke ji para pûtan tiştek biçûya ser para Xwedê, dîsa radihiştinê û dianîn ser para pûtan didanîn û digotin: „Xwedê Zengîn e, lê ev xizan in." Ji ber ku para ji pûtan re dîsa ji wan re dima, guhê wan lê bû, nedihêlan ku tiştek jê here ser ya ku ji Xwedê re vediqetandin. Vêca Xwedê Teala vê rewşa wan aşkera dike û wan şermezar dike.

ku berên wan rengereng in, zeytûn û hinarên ku hin wekhev in û hin jî ji hev cuda ne, ji tuneyî afirandin, her Xwedê ye. Dema ber bigirin ji berê wan bixwin û roja çinîna wan zekata wan bidin û destbelaviyê (îsrafê) mekin, bêguman Xwedê ji musrifan hez nake.

**142.** Ji terşan jî hin barhilgir û hin jî ji bo raxistina nav malê afirandine. Ji risqê ku Xwedê daye we bixwin û nedin pey gavên şeytên. Bêguman ew ji bo we neyarekî aşkera ye.[1]

**143.** Ji bo we heşt cot afirandine; ji yên mêşinî du (nêr û mê) û ji yên bizinî jî du. Bibêje: Ma Wî herdu nêr (yê mêşinî û bizinî) yan herdu mê, yan jî ew ên ku di malzarokên herdu mêyan de ne (li we) qedexe kirine? Eger bi rastî hûn rast dibêjin de bi zanîn ji min re bibêjin.[2]

**144.** Ji deveyan jî du cot (nêr û mê) û ji dewaran jî du cot afirandine. Bibêje: Ma Wî herdu nêr (ên deve û dewarî) yan herdu mê, yan jî ma Wî ew ên ku di malzarokên herdu mêyan de ne, li we qedexe kirine? Yan ma hûn şahid bûn dema Xwedê bi vê qewîtî li we dikir? Êdî ma kî ji wî kesî sitemkartir e ku li ser navê Xwedê bi neweyî bibêje da ku mirovan ji riya Xwedê derxe? Bêguman Xwedê civata sitemkar, serwext û rasterê nake.

**145.** (Resûlê min!) Bibêje: Ez di ya ku ji min re hatiye agahkirin de, ji nanxwerekî re, rastî tiştekî heramkirî nayêm, ji bilî ku mirar be yan xwîna diherike be yan goştê berêz be, vêca bêguman ew çepel û pîs in. Yan jî bi fermanşikênî ku ne ji bo Xwedê bête şerjêkirin (ew jî çepel û pîs in). Êdî çi kesê ku neçar be (ji birçîtî goştên van ên borî bixwe), bêyî ku dil li ser hebe û zêdegavî jî neke, vêca birastî Perwerdegarê te gunehveşêr e, dilovîn e.

**146.** Me, li ser ên ku bûne cihû tevekî heywanên xwedî neynok heram kirin. Ji dewar û pez jî ji bilî bezê pişta wan û yê li dora roviyên wan û ji bilî yên di nav hestiyan de bezê wan heram kir. Ha ev, ji ber zilma wan (me ew) ceza kirin, bêguman em her rastbêj in. [3]

**147.** Eger ew bi te bawerî neyînin, bibêje: Xwedayê we xwediyê rehmeteke berfireh e û ezabê Wî li ser civata gunehkar nayê zivirandin.

**148.** Ew ên ku ji Xwedê re heval û şirîk çêkirine, dê bibêjin: Eger Xwedê bixwesta ne me û ne jî bavên me ji Xwedê re şirîk çênedikirin û me tiştek (ji cem xwe ve) heram nedikir. Her wiha yên beriya wan jî bi pêxemberên xwe bawerî neanîn, heta ku azara me tehm kirin. "Bibêje: Ma di vî warî de qet zanînek li cem we heye ku hûn wê derînin holê. Hûn bes didine dûv gumanê û hûn derewan dikin."

---

1 Ereban; geh heywanên nêr qedexe dikirin û geh yên mê, geh kar û geh jî berxik, geh golik û geh jî golikên devehan qedexe dikirin. Vêca Xwedê ev helwesta wan, bi vê ayetê şermezar dike.

2 Ev heramkirin, ji kû derê hatiye? Eger ji nêrîtiyê were, naxwe divê hemû nêr heram bin, heke ji mêyîtiyê were, naxwe divê hemû mê heram bin. Heke ji malcêliyê were, naxwe divê nêr û mê giş heram bin, ev texsîskirin ji kû derê tê?!

3 Ji ber ku cihûyan, hin pêxamber kuştibûn, selef xwaribûn û hin tiştên ku Xwedê ew heram dêrabû, wan helal kiribû, Xwedê jî bi daxwaza cizakirinê bezê pez li wan heram kiribû.

**149.** Bibêje: Vêca delîla herî tekûz a Xwedê ye. Eger Xwedê bixwesta dê hûn hemû serwext bikirina. [1]

**150.** Bibêje: De haydê şahidên xwe bînin; ew ên ku şahdehiyê didin ku Xwedê ev tiştên han heram kirine. Êdî eger li ser vê yekê bibine şahid vêca tu digel wan nebe şahid. Nede dûv hewesên wan kesên ku ayetên me înkar dikin û wan kesên ku bi axretê bawerî nayînin û ew ji Rebê xwe re şirîkan çêdikin.

**151.** Bibêje: Werin, a ku Xwedayê we li we heram kiriye ez ji we re bixwînim: Qet tiştekî ji Wî re nekin hevpişk, qenciyê li dê û bavên xwe bikin, ji tirsa xizaniyê zarokên xwe nekujin. Lewra em risqê we û wan jî didin. Xwe nêzî tolaziyan nekin; çi yên aşkera, çi jî yên veşarî. Ew canê ku Xwedê kuştina wî li we qedexe kiriye bi nerewayî nekujin. Ha ev e ya ku Xwedê fermana we pê kirî da ku hûn bifikirin û tê bigihîjin.

**152.** Heta sêwî kamil nebe, tenê bi mebesta herî rind nêzî malê wî bibin, pîvan û mêzînê bi dadmendî pêk bînin. Em li her kesî tenê bi qasî hêza wî bar lê dikin. Dema hûn peyivîn jî vêca bi heqî bipeyivin, çendî (yê ku jê re yan li serê tê peyivîn) lêzimekî we yê pir nêz be jî. Peymana ku we daye Xwedê, bi cih bînin. Ev a hatî gotin, qewîtiya Xwedê ye li we, da ku hûn bi bîr bînin.

**153.** Bêguman ev riya min e, riya rast û durist e, bidin pey wê û nedin dûv rêçikên din, vêca ew ê we ji riya Xwedê biqetînin. Ev a (hatî gotin), Xwedê bi wê ferman li we kiriye da ku hûn xwe biparêzin.[2]

**154.** Paşê me kitêb, bi tekûzî, li ser şeklê herî rind û ji her tiştî re tefsîlatker, bi rêberî û dilovanî ji Mûsa re şand. Hêvî heye ku ew bi çûna ber destê Perwerdegarê xwe baweriyê bînin.

**155.** Ev (Qur'an) kitêbeke pîroz e ku me ew hinartiye. Vêca bidin pey wê û xwe biparêzin, da ku rehmet li we bê kirin.

**156.** (Me Qur'an ji we re hinart da ku) Hûn nebêjin: Kitêb, tenê ji du taîfeyên beriya me re hatine hinartin û bi rastî jî em ji xwendin û fêrbûna wan bêagah in.[3]

**157.** Yan jî da ku hûn nebêjin: Eger ji me re kitêb bihata şandin em ê ji wan bêhtir têgihiştî bûna. Êdî bêguman daxuyaniyek e ji nik Perwerdegarê we, rêberiyeke hêja û dilovaniyeke pir ji we re hatiye. Vêca ma yê ku bi ayetên Xwedê bawerî neyîne û berê xwe ji wan biguherîne, sitemkartir kî heye? Em ê wan kesên ku

---

1 Xwedê Teala, „Îrade" daye we tevan û hîdayeta xwe jî bi îradeya we ve girêdaye. Divê hûn bixwazin bêne rêya rast heta ku Xwed jî we bîne rêya rast. Eger Xwed rêya heq şanî we bide jî û hûnê neyên riya heq, Xwedê dê bi zorê we neyêne rêya heq; we ji encama îradeya we re serbest dihêle. Êdî divê hûn berpirsiya bizava xwe qebûl bikin. Eger Xwedê bi zorê xelkekî bîne rê qey kî dikare li ber vîna Wî rabe? Lê belê sunetullah ev e; ki hîdayetê bixwaze Xwedê didiyê.

2 Lewra em naxwazin ku hûn bibêjin, "kitêb tenê ji bo du celeban ji yên beriya me re hatiye hinartin." Ji ayeta 151ê û heta bi vir, ji wan fermanên ku buhurîn re "Deh ferman yan jî deh wesiyet" tê gotin. Ev di şerî'eta hemû pêxamberan de hebûne.

3 Ji ber ku Tewrat û İncîl ne bi zimanên erebî hatibûn şandin, ereban dikarîbû vê yekê ji xwe re bikin behane û bibêjin: Em zimanê wan fêm nakin, haya me ji fermanên ku di wan de ne, tune ye. Vêca Xwedê ji bo vê behaneyê ji holê rake Qur'an bi zimanê erebî hinart û tu hêncet ji wan re nehişt.

berê xwe ji ayetên me biguherînin, ji ber berguherîna wan, bi ezabê herî pîs ceza bikin.

**158.** (Ji bo bawerî bînin) Ma hê jî li bendê ne ku melayîket ji bo wan bên yan (ezabê) Xwedayê te li wan rabe, yan jî hinek ji nîşanên Rebbê te bi ser wan de bên?! Roja ku hin nîşanên Xwedayê te bên (vêca wan mecbûrî îmanê bikin), wê rojê îman feydê nade tu kesî bi şertê ku berê bawerî neanîbe yan jî di baweriya xwe de xêrek bidestnexistibe. Bibêje: De çavnêriya (yekî ji van) bikin, bêguman em jî çavnêriyê dikin.

**159.** Bêguman ew ên ku dînê xwe parçe parçe kirin û ew jî bûn firqe firqe, tiştekî te bi wan re tun e. Tenê karê wan bes spareyî Xwedê ye. Paşê bi ya ku kirin dê wan agahdar bike.

**160.** Her kî xêrekê bike vêca jê re deh qatî wê heye. Kî jî neqenciyekê bike, vêca bes ew bi wê tenê tête cezakirin û li wan sitemkarî nayê kirin.

**161.** (Resûlê min!) Bibêje: Bêguman Xwedayê min ez bi bal riyeke rast ve rasterê kirime ku riya rast û bêçewtî ye; dînê pak ê Îbrahîm e ku ji xwariyê veder e. Ew bi xwe jî ne ji muşrikan bû.

**162.** Bibêje: Bêguman nimêja min, îbadetên min, saxiya min û mirina min tev ji bo Xwedê ye ku ew perwerdegarê alemê ye.

**163.** Ji Xwedê re, tu hemkûf nîn in û ez bi vê hatime fermankirin û ez pêşîkê mislimanan im.

**164.** Bibêje: Ma digel ku ew perwerdegarê her tiştî ye ez ê ji bilî Xweda li perwerdegarekî dî bigerim? Qezenca her kesî jê re ye. Tu kes, gunehê tu kesî hilnagire. Paşê vegera we bi bal Xwedayê we ve ye. Vêca dê we bi ya ku hûn tê de li dijî hev diçûn, agahdar bike.

**165.** Xwedê ye, yê ku hûn li ser erdê kirine şûngirên hev û mertebe bi mertebe hûn di ser hev re girtin da ku der barê qenciya ku daye we de, we îmtîhan bike. Bêguman Xwedayê te cezadana Wî bi lez e û birastî Ew her gunehjêbir e, dilovîn e.

## 7. SÛREYÊ E‘RAF

Sûreyê E‘raf, li Mekkê daketiye. 206 (du sed û şeş) ayet e. Ji ber ku di ayeta 46’em û ya 48’em de behsa erafê kiriye, ji vî sûreyî re “el-E‘raf” yanî sûrên navbera dojeh û bihiştê hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Elîf, Lam, Mîm, Sad.

**2.** (Resûlê min!) Ev (Qur’an) kitêbek e ku ji te re hatiye şandin, vêca bila tengasiyek di sînga te de çênebe, (me ev kitêb şand) da ku tu pê mirovan (ji ezabê Xwedê) bitirsînî û da ku ji bawermendan re bibe şîret û bîranîn.

3. (Gelî mirovan!) Bidin pey kitêba ku ji cem Xwedayê we ji we re hatiye û ji bilî Xwedê nedin pey tu dost û arîkaran. (Bi rastî) hûn pir kêm şîretan werdigirin.

4. Me pir gund û bajar wêran kirin, vêca ezabê me bi şev an jî di xewa nîvro de bi ser wan de hat.

5. Dema ezabê me bi ser wan de hat, bes ev digotin: Bêguman em sitemkar bûn.

6. Sond be, em ê wan ên ku pêxember ji wan re hatine şandin berpirs bigirin. Sond be ku em ê pêxemberan jî berpirs bigirin.

7. Sond be, êdî ya ku di navbera wan de qewimiye em ê bi zanîn ji wan re bibêjin û em ji wan ne bêhay û xafil bûn.

8. Roja qiyametê kêşan rast û heq e. Vêca kî ku kêşana (xêrên) wî giran be, êdî ha ew, yên serkeftî bi xwe ne.

9. Çi kesê ku kêşana wî sivik be (û kêşana gunehên wî giran be), vêca ha ew in ên ku bi sebunet li ayetên me sitemkarî kirin xwe xistine ziyanê.

10. Sond be, Me hûn li ser erdê bi cih kirin û me li wê derê derfet û navgînên jiyanborandinê ji we re bi kar anîn, (digel vê jî) hûn pir hindik (Xwedayê xwe) dişêkirînin.

11. Sond be, me (Ademê bavê) we afirand, paşê me şekil û awa dayê. Paşê me ji melayîketan re got: Ji Adem re herin sicûdê. Ji bilî Îblîs tev çûne sicûdê; ew nebû ji yên ku çûne sicûdê.

12. Xwedê ji (şeytên) re got: Dema min fermana sicûdê li te kir, ew çi bû ku nehişt tu biçî sicûdê? (Îblîs) Got: Ez ji wî çêtir im, (lewra) Te ez ji êgir afirandime û te ew ji heriyê afirandiye.

13. (Xwedê) got: Nexwe ji wê dakeve, vêca mafê te nîn e ku tu xwe li wê derê mezin bidêrî, de derkeve, bêguman tu ji rezîl û riswayay î!

14. (Îblîs) Got: Heta roja ku mirî ji tirban radibin keysê (muhletê) bide min.

15. (Xwedê) Got: Bêguman tu ji wan ên ku muhlet ji wan re hatiye dayîn.

16. (Îblîs) Got: Ji ber ku Te ez rêwinda kirim, ez sond dixwim ku ez ê li ser riya Te ya rast rûnim û ez ê li ber mirovan kemînê deynim da ku wan ji rê bixim.

17. Piştre ez ê ji pêş wan û ji pişt wan ve, ji rastê wan û ji çepê wan ve teqez dê bême wan û Tu dê pirên wan jî şêkirdar nebînî!

18. Xwedê (ji şeytên re) got: De haydê bi riswayî û qeşitî ji wir derkeve! Sond be, ez ê ji ademiyên ku bidin dûv te û ji we hemûyan cehenemê dagirim.

19. (Xwedê got:) Ey Adem! Tu û kebaniya xwe (Hewwa) li bihiştê bi cih bibin, hûn çawa divên wisa jê bixwin. Lê belê, nêzî vê dara hanê nebin, (eger hûn jê bixwin) êdî hûn ê bibin ji sitemkaran.

20. Şeytên, ji bo ku ji dara qedexekirî bixwin ji herduyan re tasawas çêkir û da ku şermegeha (ewretê) wan a veşartî nîşanî wan bide. (Ji wan re) got: Bes ji bo ku hûn nebin melek an jî hûn heta bi hetayê lê nemînin, Xwedayê we hûn ji (xwarina) vê darê dane paş.

21. Ji wan re sond xwar (û got): Bi rastî ez her ji bo we şîretkar im.

22. Êdî bi hîle û pîle dar raveyî wan kir. Çi dema ji mêweyên wê xwarin, şermegeha wan, ji wan ve diyar bû û hema dest avêtin pelên darên bihiştê û xwe pê nixumandin. Xwedayê wan gazî wan kir: Ma min ev dar li we qedexe nekiribû? Ma min ji we re negotibû şeytan ji we re neyarekî aşkera ye?!

23. (Adem û Hewwa) Gotin: Xwedayê me! Me neheqî li xwe kir, eger Tu li me neborî û rehmê li me nekî, teqez em ê bibin ji yên xesaretkirin.

24. (Xwedê) got: De dakevin xwarê hûn ê ji hev re bi dijminahî bin û heta demeke diyarkirî (heta mirinê) li erdê ji bo we wargeh û jiyanborandin heye.

25. (Xwedê) got: Hûn ê li ser erdê bijîn û hûn ê lê bimirin û (ji bo hesabdayînê) hûn ê jê bên deranîn.

26. Gelî zaroyên Adem! Me ji we re cileke wisa daxistiye ku hûn pê ewretê xwe binixumînin û cilek jî ji bo xemilandinê. Lê cila teqwayê (hayjêmayîna ferman û qedexeyên Xwedê) hê jî çêtir e. Ha ev ji ayetên Xwedê ne da ku ew bifikirin û şîretan jê wergirin.

27. Gelî zaroyên Adem! Bila şeytan we jî nexapîne ka çawa dê û bavên we (Adem û Hewwa) ji bihiştê derxistin û cilên wan ji wan kirin da ku ewretên wan nîşanî wan bide. Bêguman şeytan û êla xwe we dibînin û hûn wan nabînin. Bêguman me şeytan ji bo wan kesên ku baweriyê nayînin kiriye dost û arîkar.

28. Dema ew (muşrik) neqenciyekê bikin, dibêjin: “Me bav û kalên xwe li ser vê riyê dîtine û Xwedê jî pê ferman li me kiriye”. (Resûlê min!) “Bibêje: Bêguman Xwedê bi neqenciyê ferman nake. Ma hûn li ser (navê) Xwedê tiştê ku hûn nizanin, dibêjin”?

29. Bibêje: “Xwedayê min bi edaletê ferman kiriye. Li nik çûna her mizgeftê berê xwe bidine Xwedê û ji dil û can îbadetê Wî bikin. Çawa ku Wî hûn cara pêşîn afirandin dê piştî mirinê dîsa we vejîne”.

30. Celebek hatiye ser riya rast û celebek jî rêşaşî li serê misoger bûye. Bêguman wan ji bilî Xwedê şeytan ji bo xwe kirine dost û piştevan û ji wan we ye ku ew li ser riya rast rasterêbûyî ne.

31. Ey zaroyên Adem! Li cem kirina her nimêjê, cila xwe ya xemlê ya ku hûn xwe pê dinixumînin wergirin. Bixwin, vexwin û îsrafê mekin, bêguman Xwedê ji yên destbelav hez nake.

32. (Resûlê min!) Bibêje: Ew xemla ku Xwedê ji evdên xwe re deranî û ew risqên pak û xweş ma kê heram kiriye? Bibêje: Ew li jiyana dinyayê (mîna her kesî) ji bo bawermendan e û bi taybetî jî roja qiyametê mafê wan e. Her wiha em ayetên xwe ji civateke têgihişt re bi dorfirehî aşkera dikin.

33. (Resûlê min!) Bibêje: Bêguman Xwedayê min, bes neqenciyên aşkera û yên veşarî, gunehkarî û destdirêjiya mafê dîgeran, bêyî ku delîleke we hebe ku hûn ji Xwedê re şirîkan çêkin û der barê Xwedê de ku hûn bi nezanî xeber bidin qedexe kiriye.

**34.** Ji her umetekî re civanekî wê heye. Êdî dema civanê wan bê, ew nikarin wê saetekê bidin paş û beriya civanê wan bê jî ew nikarin bidin pêş.

**35.** Gelî zaroyên Adem! Eger ji nav we pêxemberên min ji we re bên û ayetên min ji we re bibêjin, êdî kî xwe biparêze û xwe rast û durist bike, vêca ne li ser wan tirs heye ne jî ew xemgîn dibin.

**36.** Ew ên ku bi ayetên me bawerî nayînin û li hember wê li xwe nenihane (ku pê bawerî bînin), ew xelkê êgir in, ew heta bi hetayê dê tê de bimînin.

**37.** Vêca ma ji wî kesê ku li ser (navê) Xwedê neweyî biaxive yan jî bi ayetên Wî bawerî neyîne, zalimtir kî heye? Ev ên ha, para wan (ji ezab) a ku di kitêbê de nivisî dê bigihîje wan; heta dema qasidên me (yên canstên) ku canê wan bistînin têne cem wan, dibêjin: Ma kanê ew ên ku we di şûna Xwedê de ew dihebandin? Dibêjin: Ji ber me winda bûn û (wê hingê) li ser nefsa xwe şahdeyî didin ku bi rastî wan (li dinyayê) bawerî neanîbû.

**38.** (Xwedê roja qiyametê ji wan re dibêje): Hûn ê jî di nav wan umetên ji cin û însanan de yên ku beriya we bihurîne, bikevin êgir. Her ku umetek bikeve êgir, lenetê li rêhevala xwe tîne. Heta ku ew hemû li pey hev di êgir de kom dibin; yên paşî (dûvketî) ji yên pêşî (serokên xwe) re dibêjin: Xwedayê me! Ha van em ji rê xistin! Vêca ji êgir ezabekî zêde bide wan. Xwedê (ji wan re) dibêje: Ji her yekî ji we û ji wan re ezabekî zêde heye, lê belê hûn nizanin.[1]

**39.** Pêşengên wan ji dûvketiyên xwe re dibêjin: Êdî hûn ji me ne çêtir in (em û hûn di kufr û rêşaşiyê de wekhev in). (Xwedê dibêje:) Nexwe hûn jî bi sedema gunehên ku we kirine, ezabê biçêjin!

**40.** Bêguman ew ên ku bi ayetên me bawerî neanîn û xwe mezin dîtin, heta ku deve di qulika derziyê re derbas nebe, deriyên asîmanan li wan venabin û ew nakevin bihiştê. Her wisa em gunehkaran ceza dikin.

**41.** Ji kafiran re ji agirê cehenemê doşek û li ser wan jî lihêf hene û bi vî rengî em zaliman ceza dikin!

**42.** Ew ên ku bawerî anîn û karên rind kirin -em tu kesî zêdeyî hêza wî binbar nakin- ew xelkê bihiştê ne û ew ê heta bi hetayê tê de bimînin.

**43.** Me kîn û hesûdî ya di dilê wan (cennetîyan) de ji wan bir ku di bin wan re çem diherikin û gotin: Pesn û spasî her ji Xwedê re bin ku em bi vê yekê serwext kirin. Eger Xwedê em pê serwext nekirina, em qet tê nedigihîştin. Sond be, qasidên Xwedayê me digel heqiyê hatine. Gazî li wan hate kirin, ev ceneta ku hûn tê de ne, we bi kar û kiryarên xwe bi dest xwe ve aniye.

**44.** Xelkê cenetê, gazî xelkê cehenemê dikin, birastî em gihîştine wê peymana ku Xwedayê me ji bo me dabû, ma hûn jî rastî wê soza ku Xwedayê we ji we re dabû hatin? Ew jî dibêjin: Erê, em rastî wê hatin. Veca di navbera wan de

1 Ew rêberên ku berê civatan didin rêya şaş, ji ber ku ew bi xwe kafir in, hem ji ber ku berê xelkê didin rêya çewt û şaş ji wan re du qet ezab heye. Ew civat û elêlatên ku li pey rêberên jirêderketî diçin, ji wan re jî du qet ezab heye, ji ber ku hem ew bi xwe kafir in, hem ji ber ku di rêya rêberên rêşaş de çûne.

banghildêrekî bang kir: Leneta Xwedê (dûrbûna ji dilovaniya wî) li ser zaliman be!...

**45.** Ew ên ku ji riya Xwedê (mirovan) dadigerînin û dixwazin riya Xwedê çewt û xwar nîşan bidin û ew bi axretê bawerî nayînin.

**46.** Di navbera herduyan de (bihiştî û cehemiyan de) perdeyek heye. Li ser e‘rafê mirovinên ku (bihiştî û cehnemiyan) bi nîşanên wan nas dikin hene. Gazî ehlê cenetê dikin: Silav (ewleyî û aramî) li ser we be! Ew hê jî neçûne bihiştê lê bi hêvî ne ku ew dê biçinê.

**47.** Dema berê wan bi hêla ehlê êgir ve tê vegerandin, dibêjin: Xwedayê me! Me negerîne digel qewmê sitemkar.

**48.** Xelkê erafê gazî hinek zilaman dikin ku ew ji rûdêmên wan, wan nas dikin (ku ew bêbawer in), dibêjin: Ne piraniya we ne jî xwemezindêriya we tu feyde neda we.

**49.** (Xwedê ji ehlê êgir re dibêje:) Ma evê ha bûn, ew ên ku we sond dixwar ku Xwedê dilovaniyê li wan nake (û naçine cenetê)? (Paşê ji wan re tê gotin:) De têkevin cenetê, ne tirs ji bo we heye ne jî hûn xemgîn dibin.

**50.** Xelkê cehenemê gazî xelkê cenetê dikin (dibêjin): De ka hinekî ji ava xwe yan jî hinekî ji risqê ku Xwedê daye we bi ser me de birêjin! (Xelkê cenetê) dibêjin: Bêguman Xwedê ev (av û xwarin) li ser kafiran heram kiriye.

**51.** Ew ên ku dînê xwe ji xwe re kirine kêf û lîstik û jiyana gerdûnê ew xapandine. Êdî çawa wan pêrgîhatina vê rojê ji bîr kir û ayetên me mandel kirin, îro em ê jî wan ji bîr bikin û wan di ezab de bihêlin.

**52.** Bêguman me kitêbek (ku Quran e) ji wan re anî, me bi zanîn hukmên wê bi dorfirehî ji hev veqetandin. Ew ji bo miletekî ku bawerî bînin, serwextî û dilovanî ye.

**53.** (Lê belê ew îmanê nayînin) Ew her li benda hatina wî cezayî ne ku Quranê ew pê xeberdar kirine. Roja ku ew ceza bi ser wan de bê, ew ên ku berê di paş guhê xwe re avêtibûn, dê bibêjin: Bêguman qasidên Xwedayê me bi gotina heq hatibûn. Ma gelo ji me re mehdervanin hene ku êdî mehderiya me bikin? Yan jî em (dîsa li dinyayê) bên vegerandin, vêca ji bilî ya ku me kirî, da ku em karekî (rindtir) bikin. Bêguman wan zerar li xwe kiriye û ew a lêanîne jî, ji ber wan winda bûye.

**54.** Bêguman perwerdegarê we Xweda ye, ew ê ku erd û asîman di şeş rojan de afirandin, paşê (bi awayekî layîqê xwe) li ser ‘Erş raser bû; şev û rojê bi hev dinixumîne ku herdu bi lez, li pey hev digerin. Roj, heyv û stêr li ber fermana xwe berdestbûyî afirandin. Agahdar bin! Afirandin û fermandayîn, her jê re ye. Xwedê (bi zatê xwe) pîrozdêrayî ye, bi xêr û bêr e û (ji her kêmasiyê) munezzeh e, ew perwerdegarê alemê ye.

**55.** Bi dizî, bi zarezar û lakelak li ber Xwedayê xwe bigerin. Bêguman Xwedê ji sînorbihêran hez nake.

56. Piştî çakkirina erdê xerabî û tevdanê li ser erdê mekin. Bi tirs û bi hêvî li ber Xwedayê xwe bigerin, bêguman rehma Xwedê nêzîkî qencîxwazan e.

57. Ew Xweda ye yê ku "Ba"yê bi mizgînberî li pêşiya rehma xwe (baranê) dişîne. Gava ku ba wan ewrên (bi avê) bargiran hildigre, em berê wan didine welatekî hişk, vêca em ji ewran baranê dibarînin û em bi wê avê mêweyên cur bi cur dertînin. Çawa em erda hişk bi avê hêşîn dikin her wisa em ê miriyan jî ji gorên wan sax derînin. (Em vê ji we re dibêjin;) da ku hûn ji vê rewşê şîret bigirin.

58. Welatê ku axa wî rind û pak e, bi destûra Xwedayê xwe giyayê xwe baş derdixe, yê ku axa wî pîs e, ji giyayê bêfeyde pê ve tiştekî din dernaxe. Bi vî awayî em ayetên xwe ji bo civateke ku şêkiriya Xwada dikin, ji hev diqetînin.

59. Sond be, Me Nûh ji qewmê wî re şand, got: Ey gelê min! Xwedê bihebînin. Ji Wî pê ve ji bo we tu îlah nîn in. Bêguman ez ji ezabê rojeke mezin ditirsim ku bi ser we de bê.

60. Giregirên gelê wî gotin: Bêguman em te di nava rêşaşiyeke aşkera de dibînin!

61. Nûh got: Ey gelê min! Tu rêşaşî li dor min nîn e, lê belê ez qasidê Xwedayê alêmê me.

62. Ez wehya Xwedayê xwe ji we re radigihînim, ez şîret li we dikim û ya ku ez ji cem Xwedê dizanim hûn nizanin.

63. Ma hûn şaş dimînin ku ji cem Xwedayê we li ser (zimanê) yekî ji we kitêbek ji bo we bê, da ku we (ji ezabê Xwedê) bitirsîne û da ku hûn xwe biparêzin û da ku hûn bikevin ber dilovaniya Xwedê.

64. Vêca wan bi Nûh bawerî neanî, êdî me ew û yên ku di keştiyê de digel wî bûn xelas kirin û yên ku bawerî bi ayetên me neanîn, me ew binav kirin! Bêguman ew qewmekî dilkor bûn (rastî nedidîtin).

65. Me, ji gelê Ad re jî, birayê wan Hûd (bi pêxemberî) şand, (Hûd) got: Ey gelê min! Xwedê bihebînin. Ji Wî pê ve ji bo we tu îlah nîn in. Ma hê jî hûn ê xwe (ji ezabê wî) neparêzin?!

66. Ji gelê wî giregirên kafir gotin: Em te aqilsivik dibînin û bêguman em guman dikin ku teqez tu ji derewkeran î.

67. (Hûd) Got: Ey gelê min! Ez ne aqilsivik im. Lê belê ji aliyê Xwedayê alemê ve ez pêxemberek im ku hatime şandin.

68. Ez peyama ku Xwedayê min ez pê şandime ji bo we radigihînim û ez ji bo we şîretkarekî pêbawer im.

69. Ma hûn şaş dimînin ku ji cem Xwedayê we, li ser (zimanê) yekî ji we, pend û şîret ji we re bên da ku we ji ezabê Xweda bitirsîne?! Bi bîr bînin, piştî helaka gelê Nûh ku hûn kirin şûngirên wan û hêz û quweta we zêde kir. Nexwe qenciya Xwedê bi bîr bînin da ku hûn serfiraz bibin.

70. Gotin: (Ey Hûd!) Erê ma tu ji bo me hatî ku em her ji Xwedê re îbadetê bikin û em dev ji yên ku bav û kalên me ji wan re îbadet kirin, berdin?! Vêca eger bera tu ji rastbêjan bî, de haydê ew ezabê ku tu me pê ditirsînî bi ser me de bîne.

71. (Hûd ji wan re) Got: Êdî ji Xwedayê we, ji we re ezab û xeşmek misoger bûye. Ma hûn der heqê hin navên ku we û bav û kalên we bi (ilah) ew navkirine bi min re nîqaşê dikin. Li ser vê yekê Xwedê tu belge jî danexistiye. Nexwe (li hatina ezabê) çavnêriyê bikin, bêguman ez jî bi we re çavnêriyê dikim!

72. Me bi dilovaniyeke ji cem xwe, Hûd û yên ku pê re bûn xelas kirin û me koka wan ên ku bi ayetên me bawerî neanîbûn ji binî ve birî.

73. Me ji (qewmê) Semûd re, birayê wan Salih (şand). Got: Ey gelê min! Xwedê bihebînin. Ji Wî pê ve ji bo we tu îlah nîn in. Ji cem Xwedayê we, ji we re nîşaneke (mucîzeyeke) aşkera hatiye ku ev deveya Xwedê ye, ji we re mucîzeyeke mezin e, dev jê berdin bila ji (çêra) erda Xwedê bixwe (û vexwe), zinhar azarê nedinê! Nexwe dê ezabekî bijan we bigire.

74. Bi bîr bînin dema piştî (helaka qewmê) Ad, me hûn kirin şûngirên wan û me li ser rûyê erdê hûn bi cih kirin ku we li deştên wê koşk lêdikirin û we çiya dikolan dikirine xanî. Êdî gencîneyên Xwedê bînin hişê xwe û li ser erdê fesadiyê dernexin.

75. Ji gelê wî giregirên ku xwe mezin didêran, ji bawermendên bindest re digotin: Ma hûn teqez dizanin ku Salih ji cem Xwedayê xwe ve (bi pêxemberî) hatiye şandin? Wan jî digot: (Erê), bêguman em bi peyxama ku ew pê hatiye şandin bawer in.

76. Ew ên ku xwe mezin didêran digotin: Bêguman ew peyxama ku we pê bawerî aniye, em pê nebawer in.

77. Vêca deve şerjê kirin û ji fermana Xwedayê xwe derketin û gotin: Ey Salih! Eger bi rastî tu pêxember î, de ka wî ezabê ku te em pê ditirsandin bi ser me de bîne!

78. Vêca wê erdheja dijwar ew hingaftin, êdî ew di xaniyên xwe de li ser çok û rûyên xwe kumişî man.

79. Vêca wî pişta xwe da wan û got: Ey gelê min! Sond be ku min peyama Xwedayê xwe ji we re ragihand û min şîret li we kir, lê belê hûn ji şîretkeran hez nakin.

80. Wê dema Lût ji gelê xwe re got: Ma çawa ew fehşîtiya ku beriya we tu gelan nekiribû, hûn dikin?

81. Hûn jinan dihêlin û bi dilbijênî bi mêran re radizin. (Ev bizaveke kirêt e) belkî hûn civateke serxweveçûyî ne.[1]

82. Bersiva gelê wî her ev bû; ji hev re gotin: Wan (Lût û peyrewên wî) ji welatê xwe derînin. Bêguman ew mirovine ku xwe pak didêrin.

83. Vêca me Lût û malbata wî rizgar kirin, ji bilî jina wî, lewra ew ji yên helakbûyî bû.

1 Lût Pêxember, neviyê birayê Îbrahîm e. Li Humusê bi navê Sedom bajarek hebû, ji xelkê wê re bi pêxamberî hatibû hinartin. Xelkê Sedomê tiştekî wisa dilxelên dikir ku tu milletan ew fêla kirêt nedikir. Wan têkiliya hevzayendî (homoseksuelî) dikir. Hîç guhên xwe nedan pend û şîretên Lût û fêla xwe ya dilxelên û rûqermiçên berdewam kirin. Dawiyê Lût û mirovên ku bi wî îman anîbûn, bi şev ji Sedomê derketin û li ser gelê wî, ji jor ve kevir bariyan û bi zelzeleyeke dijwar helak bûn û çûn. Bi vî awayê xemnak encam li fuhûşê, nankoriyê, kufrê û çavsoriyan hat.

**84.** Me kevir (ên sincirî) bi ser wan de barandin, vêca de binêre ka encama gunehkaran çawa bû!

**85.** Me ji (gelê) Medyenê re jî, birayê wan Şu‘eyb şand. (Ji wan re) got: Ey gelê min! Xwedê bihebînin. Ji Wî pê ve ji bo we tu îlah nîn in. Bêguman ji cem Xwedayê we ji bo we delîleke (mucîzeyeke) aşkera hatiye. Êdî heqê kêşan û pîvanê bidinê û tiştên mirovan bi kêmasî nedin wan. Piştî çaksaziya erdê tê de xerabiyê nekin. eger bi rastî hûn bawermend in ev ji we re çêtir e.

**86.** Li ser her riyê rûnenin ku hûn mirovan bitirsînin û hûn yê ku berê bawerî bi Xwedê anî wî ji riya (dînê) Wî vegerînin û ku hûn bixwazin riya Xwedê çewt û xwar nîşan bidin. Wê demê hûn hindik bûn, vêca Xwedê hûn pir kirin. De binêrin ka encama fesadan çawa bûye!

**87.** Eger hin ji we, bi wehya ku ez bi pêxemberî pê hatime şandin îmanê bînin û hin ji we neyînin, vêca xwe ragirin heta ku Xwedê di navbera me de ferman bike (ku mumînan serkeftî û kafiran helak bike). Bêguman Xwedê çêtirînê hukimdaran e.

**88.** Ji gelê wî giregirên ku xwe ji baweriya bi Xwedê mezin didêran, gotin: Ey Şu‘eyb! Sond be em ê te û ên ku wan digel te bawerî anî ji welatê xwe derînin an jî hûn ê vegerin ser dînê me. (Şu‘eyb bi sosretmayî) Got: Ma eger em ji dînê we bêzar bin jî?

**89.** (Sond be!) Eger em dîsa vegerin ser dînê we, piştî ku Xwedê em ji dînê we rizgar kirin, wê demê teqez li ser (navê) Xwedê me neweyî kiriye. Ji bilî ku Xwedayê me bivê -ew cuda ye- ji me re ne rewa ye ku em vegerin ser dînê we. Xwedayê me bi zanîna xwe dor li her tiştî girtiye. Me xwe her spartiye Xwedê. Xwedêyo, di navbera me û gelê me de (di wî tiştê ku em tê de têkoşînê bi hev re dikin) bi edaletî hukim bike. Teqez Tu çêtirînê hukimdaran î.

**90.** Ji qewmê wî giregirên ku kafir bûn (wiha) digotin: Sond be, (ey gelê me) eger hûn bibine peyrewê Şu‘eyb bêguman hûn ê zerar bikin.

**91.** Êdî (piştî van şîretan) wê erdheja dijwar ew hingaftin, vêca ew di malên xwe de li ser qelevîskan kumişîn û helak bûn.

**92.** Ew ên ku bi Şu‘eyb pêxember bawerî neanîbûn, (wisa koka wan hatibû birîn) her wekî ew di vî gundî de nebûn û tê de nejiyabûn. Ew ên ku wan bi Şu‘eyb bawerî neanîbûn, yên ku zerar kiribûn her ew bi xwe bûn.

**93.** Vêca Şu‘eyb pişta xwe da wan û got: Ey gelê min! Min peyamên Xwedayê xwe ji we re ragihandin û min pend û şîret li we kirin, êdî ez ê çawa ji bo qewmekî kafir xemgîn bibim.

**94.** Me her çiqas ji welatekî re pêxemberek şandibe, Me her xelqê wî rûbirûyî tengasî û nexweşiyan kirin, da ku bi zarezar li ber me bigerin.

**95.** Paşê Me di şûna tengasî û nexweşiyan de qencî da wan, heyanî ku zaro û malê wan zêde bû. Vêca gotin: Bêguman ev tengasî û firehî wisa hatibû serê bav û kalên me jî. Êdî di demeke ku bêhaybûn, me ew ji nişka ve (bi ezabê) hingaftin.

**96.** Bêguman eger xelkê bajaran îman bianiya û hay ji ferman û qedexeyên Xwedê hebûna, helbet me dê ji wan re (deriyên) xêrê ji erd û asîmanan vekirina. Lê

belê wan (bi pêxemberên me) bawerî neanî, vêca bi sedema neqenciya ku bi dest xwe ve anîbûn, me jî bi ezab ew dan cezakirin.

**97.** Êdî ma gelo xelkên wan bajaran ji xwe ewle ne, dema ew bi şev raketî bin ku ezabê me bi ser wan de neyê?

**98.** Yan ma xelkê wan bajaran, di perê tavê de ku bi karê bêhavil dadikevin, ji xwe ewle ne ku ezabê me ji wan re neyê?

**99.** Ma ew ji dehfika Xwedê piştrast bûne? Vêca ji civata yên xesirîn pê ve, ji dehfika Xwedê tu kes xwe piştrast (ewle) nabîne.

**100.** Qey hê jî ji bo wan ên ku bûne wêrtê erdê piştî helakbûna xelkê wê ku eger em bivên, em dikarin bi sedema gunehên wan, wan ceza bikin û ser dilê wan mor bikin, êdî ew dê (rastiyê) nebihîzin.

**101.** (Resûlê min!) Ew gundên ku em ji te re hin rûdanên wan radigihînin, bêguman pêxemberên wan bi mucîze û nîşanên aşkera bi bal wan ve hatibûn. Lê belê ew ne hin kesên wisa bûn ku bi wan rastiyên ku berê înkar kiribûn, bawerî bînin. Ha bi vî rengî Xwedê dilê kafiran mor dike.

**102.** Me ji pirên wantu soz û peyman nedit digel ku me pirên wan jî dît ku her jirêderketî bûn.

**103.** Piştî wan (pêxemberan), Me Mûsa bi mucîze û ayetên xwe bi bal Firewn û civata wî ve şand, vêca wan bawerî pê neanî, de êdî binêre ka dûmahîka xerabkeran bû çi?!

**104.** Mûsa got: Ey Firewn! Bêguman ez qasidê perwerdegarê alemê me (ku bi bal we ve hatime şandin).

**105.** Heqe ku li ser navê Xwedê ji rastîyê pê ve ez tiştekî din nebêjim. Bêguman min ji cem Xwedayê we mucîze û nîşanên aşkera ji we re anîne, vêca îsraîliyan digel min bişîne.

**106.** (Firewnî ji Mûsa re) Got: Eger tu bi mucîzeyekê hatibî, ger tu ji rastbêjan bî de ka bîne.

**107.** Vêca Mûsa darê xwe avêt, di wê demê de darê wî li ber çavan bû zehayekî maran.

**108.** Destê xwe jî (ji paxila xwe) derxist, ji nişka ve ew jî ji temaşekeran re spî û nûranî bû.

**109.** Giregirên qewmê Firewn gotin: Bêguman ev sêrbazekî pir zana ye.

**110.** Ew dixwaze (bi sêrbaziya xwe) we ji welatê we derînê, vêca ka hûn çi dibêjin?

**111.** (Civata Firewn jê re) Gotin: Mûsa û birayê wî bide mijûlkirin û civînkaran bişîne welatan...

**112.** Bila hemû sêrbazên zana ji te re bînin.

**113.** Vêca dema sêrbaz hatin cem Firewn, wan got: Eger em serkeftî bibin, ma ji me re xelateke vebirî heye?

**114.** (Firewn) Got: Belê, bêguman hûn ê bibin ji yên nêzîkê min.

**115.** (Sêrbazan) Gotin: Ey Mûsa! Ma tu dê biavêjî, yan em ê pêşî biavêjin?

**116.** (Mûsa ji wan re) Got: Hûn biavêjin. Çi dema wan (hunerên xwe) avêtin, sêr li çavên xelkê kirin û ew tirsandin û sêrbaziyeke mezin anîne meydanê (xelkê hizir kir ku ew mar ên bera ne, ne ku sêrbazî ye).[1]

**117.** Me jî peyxam ji Mûsa re şand (me jê re got:) gopalê xwe biavêje! (Vêca dema Mûsa gopalê xwe avêt), darê Mûsa, werîs û darên wan bi yek carê dabelandin.

**118.** Vêca rastî derkete holê û karê (sêrbaziya) ku wan kir, pûç bû.

**119.** Li wê derê (sêrbaz) şikestin û (Firewn û bereka xwe) rezîl û riswa vegeriyan.

**120.** Sêrbaz jî ser rû ketin, ji Xwedê re secde birin.

**121.** Gotin: Me bawerî bi perwerdegarê alemê anî…

**122.** Ew Perwerdegarê Mûsa û Harûn e.

**123.** Firewn, (ji wan re) got: Ma beriya ku ez destûra we bidim we bawerî pê anî? Bêguman ev fendek e we li welatê (Misrê) çêkiriye da ku hûn xelkê wê (qibtiyan) jê derxin. Lê belê hûn ê paşê bizanin (ka ez ê çi bînim serê we).

**124.** Sond be bi rastî ku ez ê dest û piyên we ji çeprast ve jê bikim, piştre jî ez ê we hemûyan daleqînim.

**125.** (Sêrbazan) Gotin: Bêguman em ê bi bal Xwedayê xwe ve vegerin.

**126.** Bes ji ber ku dema ayetên Xwedayê me ji me re hatin û me bawerî pê aniye lewma tu me azar û seza dikî. Xwedêyo, sebrê bi ser me de birijîne, me ragire û me misliman bimirîne.

**127.** Giregirên qewmê Firewn jê re gotin: Ma tu yê Mûsa û gelê wî (serbest) bihêlî da ku li ser erdê tevdanê bikin û pişta xwe bidin te û xwedayên te? (Firewn) got: Em ê kurên (zilamên) wan bikujin û keçên wan jî (ji bo xizmetê) sax bihêlin û bêguman em ji wan re serdest in.

**128.** Mûsa ji gelê xwe re got: Pişta xwe bi Xwedê girêbidin, arîkariyê jê bixwazin, bêhna xwe fireh bikin û sebrê bikêşin. Bêguman erd tev a Xwedê ye. Ji evdên xwe ew kê bivê wî dike mîratgirê erdê. Dûmahîk ji teqwadaran re ye.

**129.** (Gelê Mûsa jê re) Gotin: Beriya ku tu (bi pêxemberî) ji me re werî, em dihatin êşandin û piştî ku tu hatî jî em tên êşandin. (Mûsa ji wan re) Got: Hêvî heye ku Xwedayê we dijminê we ji holê rake; wan helak bikê û we li ser erdê (li şûna wan) bike desthilat. Vêca dê binêrê ka hûn ê çi bikin?

**130.** Sond be, Me Firewn û malbata wî bi xelayê û kêmkirina fêkî ceza kir da ku ji xwe re ders bigirin.

**131.** Dema qenciyek bi ser wan de bihata, digotin: Ev a hatî ji ber me ye, eger nerindiyek bi ser wan de bihata, nebî Mûsa û yên pê re dikirin sebebê bêoxiriya li ser xwe. Agahdar bin! Bêguman çi tiştê ji xweşî û nexweşiyê ku bigihîje wan ew ji cem Xwedê ye, lê belê pirên wan nizanin.

**132.** Dîsa (ji Mûsa re) Gotin: Tu çi mûcizeyê bînî da ku tu pê sêrê li me bikî, de bîne, vêca em ne ew in ku bawerî bi te bînin.

---

1 Cadûyan werîs û parçeyên daran avêtin meydanê. Lêbelê ji ber ku sêhr li çavên xelkê kiribûn ji wan re wekî ku mar bin, dihatin dîtin.

**133.** Vêca Me jî baraneke dijwar, kulî, sipih, beq û xwîn bi ser wan de anîn ku ev nîşanên pir texlît in. Êdî dîsa jî wan xwe mezin dêran (û wan bawerî neanî) û ew her miletekî gunehkar bûn.[1]

**134.** Çi dema ezab bi ser wan de hat, gotin: Ya Mûsa! Tu bi xatirê wê peymana ku Xwedê dayî te, ji bo me li ber Xwedayê xwe bigere (da vî ezabî ji ser me rake), eger tu ezab ji ser me rakî, bi sond, em ê bawerî bi te bînin û em ê îsraîliyan jî digel te bişînin!

**135.** Vêca çi dema Me ezab ji ser wan rakir heta civanekî diyarkirî ku ewê bighîjinê…, di cih de soza xwe şikandin (û ji gotina xwe vegeriyan).

**136.** Êdî bi sedema ku wan bi ayetên me bawerî neanî û jê bêagah bûn, me ji wan heyf sitend, vêca Me ew di deryayê de xeniqandin.

**137.** Me ew qewmê ku hatibûn belengazkirin kirin mîratxwarê rojava û rojhilata erda bi xêr û bêr û bi sebûnet sebra wan, gotina Xwedê ya herî qenc hate cih. Me, ya ku Firewn û qewmê wî ava dikirin û baxçeyên ku çêdikirin herifand.

**138.** Me zaroyên îsraîl di deryayê re derbas kirin, êdî gihîştine cem miletekî ku ew bi îbadetên pûtên xwe ve mijûl bûn. (Îsraîliyan) gotin: Ey Mûsa! Ka çawa ji van re îlah hene, tu jî ji me re îlahekî çêke. (Mûsa) Got: Birastî hûn miletekî nezan in.

**139.** Bêguman ev ên ku ji pûtan re îbadet dikin, rewşa ew tê de ne helak û xesaret e û karê ku ew dikin jî pûç û betal e.

**140.** Mûsa got: Erê ma ez ê çawa ji bilî Xwedê ji bo we li ilahekî din bigerim, hal ev e ku Xwedê hûn di ser xelkê re girtine?![2]

**141.** (Gelî îsraîliyan!) Di bîr bînin, wê dema ku Me hûn ji malbata firewn rizgar kirin; wan jan û azara herî dijwar digihandin we; kurên we dikuştin û keçên we sax dihiştin. Ha di vê (jan û azarê) de, ji aliyê Xwedayê we ve, ji bo we îmtîhaneke mezin bû.

**142.** Me sî şev peyman (civan) da Mûsa û me deh şevên din jî lê zêde kirin, vêca mudetê bi perwerdegarê wî re bû çil şevên tekûz. Mûsa ji birayê xwe Harûn re got: Di nav gelê min de bibe şûngirê min, wan rast bike û nede pey riya mufsidan.

**143.** Çi dema Mûsa ji bo civanê me hat û Xwedayê wî pê re peyivî. (Mûsa) got: Xwedayê min! Xwe nîşanî min bide da ez te bibînim. (Xwedê) got: Bêguman tu yê min nebînî. Belê berê xwe bide çiyê, êdî eger li cihê xwe rawestiya hingî tu

1 Çi dema xelkê Misrê îman neanîn Xwedê, bi lehî û baranê ew ciza kiririn. Piştre bi dorê; kulî, sipih û beq şand ser wan bi awayekî wisa ew ajal berdane wan da ku bikevin dev û çavên wan. Piştî vê ji jor ve xwîn li ser wan barand, heta ku ava wan giş bû xwîn. Vêca hatin cem Mûsa Peyxamber, jê re gotin: Ji Xwedê hêvî û lava bike da ku van musîbetan ji ser me rake. Mûsa jî ji Xwedê hêvî û rica kir ku ji ser wan rake. Êdî Xwedê ji ser wan rakir. Lêbelê dîsa jê re gotin: Hey Mûsa! Bi rastî tu sihrbazekî mezin î û dîsa jî bawerî neanîn.

2 Xwedê Teala, Îsraîli ji zordestî û hovîtiya Firewn reha kirin, ew di deryayê re derbas kirin û li çola sînayê pir ni'met û qencî li wan kir. Digel wan hemû qenciyan jî gava îsraîlî rastî 'Emalîqan hatin ku wa ye îbadetê golikê dikin, wan jî çav li 'Emalîqan kirin, îbadetê Xwedê hiştin û xwestin ku ew jî îbadetê golikan bikin. Vêca Xwedê Teala wan qenciyên ku li wan kiriye di bîra wan tîne û wiha ferman dike.

yê min bibînî! Vêca çi dema Xwedayê wî ji çiyê re diyar bû (bi diyariyeke layiqî xwe), êdî çiya bû parçe parçe û bi erdê re misêwa bû. Mûsa jî bêhiş ket ser erdê û hay ji xwe nema. Çi dema bi hişê xwe ve hat, got: Ez Te ji hemû kêmasiyan pak didêrim, ez li ber te tobe dikim û ez pêşîkê bawermendan im.

**144.** (Xwedê) got: Ey Mûsa, bi pêxemberiya ji cem xwe û bi axaftina xwe ya digel te, Min tu li ser mirovan re girtiye. Vêca ev a min dayî te bigire û bibe ji şukirdaran.

**145.** Me ji bo Mûsa li ser lewhan ji şîret û hukman hemû tişt bi berfirehî nivîsîn. Vêca (Xwedê jê re got:) bihêz û ji dil wan bigire û li gelê xwe ferman bike ku ew bi ya herî spehî bigirin. (Eger hûn ji rê derkevin) ez ê di nêz de cih û warên jirêderketiyan nîşanî we bidim.[1]

**146.** Ez ê berê wan ên ku li erdê ji neheqî û bêbextî xwe mezin dikin ji ayetên xwe dagerînim. Eger ew hemû nîşan û ayetan bibînin jî dîsa dê bawerî bi wan neyînin. Eger ew riya hîdayetê û rastiyê bibînin jî ew ji xwe re nakin rê (û pê de naçin). Eger ew riya şaşî û xerabiyê bibînin dê ji xwe re bikin rêk. Lewra wan bi ayetên me bawerî neanî û ew jê xafil bûn.

**147.** Ew ên ku bi ayetên me û bi dîtina axretê bawerî neanîbû, kirinên wan pûç bûne, ew bes li gorî kirinên ku (li dinyayê) dikin têne xelat û celatkirin.

**148.** Piştî Mûsa çû (çiyayê Tûrê ji bo munacatê), gelê Mûsa ji xişr (û zînet)ên xwe peykerê golikekî çêkir ku jê re orîn hebû û wan ew ji xwe re kir îlah. Ma wan nedidît ku ew (golik) ne bi wan re dipeyive ne jî riyekê nîşanî wan dide? Wan golik ji xwe re kir îlah û wan li xwe sitemkarî kir.[2]

**149.** Çi dema li ser kirinên xwe poşman bûn û dîtin ku wa ye ew ji rê derketine, vêca gotin: Eger Xwedayê me li me neyê rehmê û li gunehên me nebihure teqez em ê bibin ji yên xesirî.

**150.** Dema Mûsa (ji civanê Xwedayê xwe) bi hêrs û xemgînî bi bal miletê xwe ve vegeriya (û ji wan re) got: Ev tiştê we li dûv min kiriye (ku we golik ji xwe re kiriye îlah) çi tiştekî pîs e. Erê, ma we lez li fermana Xwedê kir? Mûsa lewhe avêtin û bi serê birayê xwe (Harûn) girt û bi ber xwe ve kişand. (Harûn) Got: Ey kurê diya min! Bêguman vî gelî ez bêzar kirim û hindik mabû ku min bikujin, vêca kêfa neyaran li min neyîne û min ji vî gelê sitemkar nehesibîne!

**151.** (Mûsa) Got: Xwedayê min! Li min û birayê min bibore û me têxe ber dilovaniya xwe. Her tu yî dilovîntirê ji hemû dilovanan!

**152.** Bêguman ew ên ku golik hebandin ji nêz ve dê ji cem Xwedayê wan xezeb li wan bibare û li dinyayê jî dê riswatî bigire ser wan. Ha bi vî awayî em bêbextan ceza dikin.

---

1 Ev ayeta pîroz dide zanîn ku Tewrat di lewheyan de yanî rûpelan de nivîsayî bû û Xwedê Tewrat wisa daye Mûsa. Lêbelê di bara wan lewheyan de me çu zanîneke binbir tune e. Lê di naveroka wan rûpelan de ji aliyê dînî û îslahî ve îhtiyaca îsraîliyan bi çi tiştî hebûye ew di wan de hebûn.

2 Dema Mûsa deh rojan zêde li çiyayê Tûr ma, ji îsraîliyan yekî sen'etkar ku navê wî Samirî bû, ji xişrên wan, heykelê golikekî ji wan re çêkir û got: Xwedayê we û Mûsa jî ev e. Lê Xwedayê Mûsa hate jibîrakirin. Heykelê golikê bi hostayiyeke wisa çêkiribû; gava ku ba diket nava wê wekî ku tê de rûh hebe wisa diorîya.

**153.** Herçî wan kesên ku kiryarên nebaş kirin û paşê tobe kirin û bawerî anîn, bêguman Xwedayê te piştî wê (tobe û baweriyê) gunehveşêr e, dilovîn e.

**154.** Dema hêrsa Mûsa danî, lewhe (ji erdê) rakir, ji bo wan kesên ku ji Xwedayê xwe ditirsin tê de riya rasterêyî û dilovaniyê nivîsandî bû.

**155.** Ji bo civanê me, Mûsa ji gelê xwe heftê zilam bijartin (û anîn hizûra me). Çi dema wê erdheja dijwar ew girtin, Mûsa got: Xwedayê min! Eger te bixwesta berî vêga te yê ew û ez helak bikira. Ma ji ber kiryarên aqilsivikên me Tu yê me tevan helak bikî? Ev kar, ji ceribandin û îmtîhana te pê ve ne tiştekî din e. Bi wê, tu kê bivê ji rê dixî û kê jî bivê tînî ser riya rast. Tu yî xwedî û arîkarê me, vêca li me bibore, li me were rehmê û Tu yî çêtirînê bexşîneran.[1]

**156.** (Xwedêyo!) Tu di vê dinyayê de qenciyê û li axretê jî ji bo me rindiyê binivîse. Bi rastî me bi bal Te ve tobe kir. (Xwedê) Got: Ez kê bivêm ez ê ezabê xwe lê raselitînim û merhemeta min jî dor li her tiştî girtiye. Vêca ez ê wê (dilovaniyê) ji bo wan ên ku xwe (ji kufr û gunehan) diparêzin û zekata xwe didin û ew ên ku bawerî bi ayetên me tînin, misoger bikim.

**157.** Ew ên ku dane pey Pêxemberê Ûmmî. Ew pêxemberê ku salox û nîşanên wî li cem xwe di Tewrat û Încîlê de nivîsandî dibînin, fermana wan bi qenciyê dike û ji xerabiyê wan dide paş, tiştê pak û paqij ji bo wan helal dike û ya pîs û nebaş li ser wan heram dike, bargiranî û qeyda ji ser wan radike. Vêca ew ên ku bawerî pê anîn, xatirê wî girtin, arîkariya wî li ser neyaran kirin û digel wî dane pey ronahiya (Qur'ana) ku jê re hatî, ha ew in yên ku (li dinya û axretê) serfiraz bûne.[2]

**158.** (Ey Pêxember!) Bibêje: Gelî mirovan! Bêguman ez qasidê Xwedê me ku bi bal we hemûyan ve hatime şandin. Ew Xwedayê ku her jê re ye xwedaniya erd û asîmanan, ji Wî pê ve tu xweda nîn in, ew sax dike û dimirîne, nexwe bi Xwedê û pêxemberê wî yê ummî, ew ê ku bi Xwedê û peyvên wî (Qur'anê) bawerî tîne, hun jî bawerî bînin û bidin pey (şopa) wî (pêxemberî) da ku hûn bi ser riya rast ve bibin.

**159.** Civatek ji gelê Mûsa heye ku riya heq û rast bi ber xelkê dixin û pê hukim û fermandariyê dikin.[3]

**160.** Me gelê Mûsa gerand donzdeh êl. Dema gelê wî av jê xwest, me jê re wehî şand:

1 Ew ên ku Mûsa wan ji nêv gelê xwe bijartbû û ji bo tobê wan biribû hizûra Xwedê Teala, çi dema axaftina Mûsa ya bi Xwedê re bihîstin, jê re gotin: "Hetta ku em bi aşkere Xwedê nebînin, em ê qet baweriyê bi te neyênin." Vêca li wirê erdhejeke dijwar çêbû, ew jî ji hişê xwe çûn û ketin erdê. Mûsa ji Xwedê dua kir, êdî ew afat ji ser wan rakir.

2 Di ayeta pîroz de bêjeya „Ummî" buhurî ku ew bi daxwaza yê ku nizane binivîse û bixwîne tê û me jî bi nexwenda mane kir. Ew pesnekî peyxamberê me ye. Digel ku ew mirovekî nexwenda bû jî, lêbelê; xwediyê kemala zanînê bû ku ev ji wî re mûcîzeyek e. Ji ber ku qasidiya wî bi bal Xwedê ve tê alîdan, ew qasidê Xwedê ye û ji ber ku bi bal mirovan ve tê alîdan, ew pêxember e. Yanî ji hêla ku ew qasidê Xwedê ye, ew resûl e û ji hêla ku ew fermanên Xwedê ji mirovan re rabighîne û bibêje, ew Nebî ye, peyxamber e.

3 Mebest ji wê umetê ew cihû ne ku baweriyê bi Muhemmed (s) anîne, yan jî ew kes in ku di çaxê Mûsa de şîreta qenciyê li xelkê kirine û ew anîne rêya rast û durust.

Gopalê xwe li kevir bixe! Vêca (piştî Mûsa gopalê xwe li kevir da) ji kêvir dozdeh kanî zan û derbûn. Her êlê serkaniya xwe zanî û nas kir. Paşê Me ewr li ser wan kire sî û sîwan, me gezo û sûsik bi ser wan de barandin. (Û me ji wan re got:) Ji wî risqê xweş û pak ê ku me daye we bixwin. (Ji ber ku ew li ber fermana min rabûn) wan ne li me zilm kir, belê wan her li xwe zilm kir.

**161.** Wê demê (ji aliyê Xwedê ve) ji îsraîliyan re hate gotin: Li vî bajarî bi cih bibin û bi dorfirehî li cihê hûn bivên ji nîmetên wê bixwin û bibêjin: (Xwedêyo) Gunehên me ji ser me rake û xweşikandî, xweçemandî di derî re têkevin hundir(ê bajêr), vêca Em ê li gunehên we biborin û em ê (xêra) qencîkaran bêhtir bikin.

**162.** Vêca (piştî van fermanên me li wan kirin) ew ên ku zilm û zordarî kirin, ew fermana Xwedê ya ku li wan kirî bi tiştekî din guhartin. Êdî bi sedema zilma ku kirin Me ji asîmanan ezabek bi ser wan de şand.

**163.** (Resûlê min!) Ji (wî) gundê ku li ber kersaxa deryayê bû, dema wan di roja şemiyê de (bi girtina masiyan) destdirêjî kirin, ji îsraîliyan pirs bike. Lewra roja şemiyê (ku masîgirtin ji wan re qedexe bû) masiyên wan dihatin (û serav dibûn) û ku ne roja şemiyê bû masî ji wan re nedihatin. Her wiha bi sedem jirêderketina wan me ew bi vê belayê îmtîhan kirin.[1]

**164.** Civatekê ji wan got: (Gelî civata şîretkaran!) ji bo çi hûn li qewmekî wisa şîret dikin ku Xwedê dê wan helak bike; wan ji holê radike yan jî ew ê ezabekî pir dijwar bide wan? (Şîretkaran) Gotin: (em şîretan dikin) da ku li cem Xwedayê we ji me re bibe hêncet û belkî ew xwe biparêzin.

**165.** Vêca dema gelê Mûsa ew şîretên ku li wan dihate kirin ji bîr kirin, me ew ên ku hewl didan da ku xerabî neyê kirin rizgar kirin û ew ên ku sitemkarî dikirin Me bi sebunet jirêderketina wan, bi ezabekî dijwar ew hingaftin.

**166.** Êdî dema li ser ya ku nehya wan jê hatî kirin xwe mezin kirin (ji qedexeyên Xwedê xwe dûr nekirin), me ji wan re got: Bibin meymûnên riswa û rezîl.

**167.** (Resûlê min! Di bîr bîne) Dema Xwedayê te (pêşiyên îsraîliyan) agahdar kirin ku heta roja qiyametê teqez ew ê hin mirovên wisa bi ser wan de bişîne ku wan li îşkenceya herî dijwar biçêjînin (û ezabê tund bidin wan). Bêguman Xwedayê te cezabilez e û bêguman Xwedayê te gunehveşêr e, dilovîn e.

**168.** Me ew (gelê Mûsa) li ser erdê kom bi kom ji hev parçe kirin. Hin ji wan qenc û çaksaz bûn û hin ji wan ne wisan bûn û me ew bi xweşî û nexweşiyan ceribandin da ku li xwe bizivirin (ji xerabiyê vegerin).

**169.** Vêca di pey wan re hin hatin bûne wêrtê kitabê, lezê li ya nêzîk û nehêja dikin (ku bi dinyayê digirin û axretê berdidin). Ew dibêjin: Jixwe (çawa be jî) Xwedê dê li gunehên me bibore. Eger pertalekî wekî wê ji wan re bê dîsa dê wî bigirin. Erê, ma di kitêbê de peyman ji wan nehatibû standin ku ew li ser (navê) Xwedê

1 Xwedê Teala, roja şemiyê ji zaroyên îsraîl re kiribû roja bêhnberdanê û li wan ferman kiribû ku siyanet û hurmeta wê rojê bigrin; di wê de neçin girtina masiyan. Vêca roja ku wan kiribûna betlane masî diderketin ser riwê avê û di rojên din de jî dernediketin. Ev rewşa ha ji îsraîliyan re imtihaneke Xwedê bû. Lêbelê wan imtihan qezenc nekir. Rêza roja şemiyê negirtin û tê de çûn masîgirtinê.

ji rastiyê pê ve tiştekî din nebêjin, wan ew jî xwendibû (ka çi tê de ye). Teqez ji bo wan ên ku xwe (ji gunehan) diparêzin axret çêtir e. Ma hê jî hûn aqil nagirin?

**170.** Ew ên ku xwe bi kitêbê digirin û bi duristî nimêjê dikin, bêguman em xêra qencîkaran winda nakin.

**171.** Di bîr bîne, wê dema me Çiyayê Tûr di ser gelê Mûsa re mîna banekî/sîwanekê bilind kir û guman dikirin ku ew ê bi ser wan de bikeve. (Me ji wan re got) Ev a me daye we ji dil û bi hêz bigirin, ya ku di nav de ye bînin bîra xwe da qene hûn (ji ezabê min) xwe biparêzin.

**172.** (Resûlê min!) Dema Xwedayê te ji pişta ademiyan zuriyeta wan girt û ew xwe bi xwe li ser hev kirine şahid (û ji wan re got) ma ez ne Xwedayê we me? Hemûyan got: Belê, em şahdeyiyê didin (ku Tu Xwedayê me yî). Ev şahdeyî ji bo vê ye, da ku roja qiyametê hûn nebêjin em ji vê bêhay bûn.[1]

**173.** Yan jî da hûn nebêjin: Hê berê, bavên me jî ji Xwedê re hevpişk çêkiribûn û em jî nifşekî ku di pey wan re hatin. Ma êdî ji ber kiryara rêşaşan Tu yê me helak bikî?

**174.** Ha bi vî awayî em ayetên xwe bi berfirehî aşkera dikin da ku ew vegerin.

**175.** Ji cihûyan re serpêhatiya wî mirovî bibêje, ew ê ku me ayetên xwe danê vêca ji zanîna wan ayetan derket û xwe jê vekêşa. Êdî şeytan bi dorê ket û xwe gihandê û di dawiyê de bû ji rêşaşan.

**176.** Eger me viyabûya me yê bi ayetên xwe qedir bidayê û merteba wî bilind kiribûya, lê belê wî bi dinyayê girt û li pey daxwaza xwe çû. Vêca meseleya wî wekî meseleya kûçik e; eger tu bi ser de biçî dê zimanê xwe derêxe û bike helkehelk, eger tu bi ser de neçî dîsa dê zimanê xwe derêxe û bike helkehelk. Ha ev e rewşa wê civata ku bi ayetên me bawerî nayîne. Vê qiseyê bibêje da ku ew jê îbret bigirin.

**177.** Rewşa wan kesên ku bi ayetên me bawerî nayînin çi rewşeke xerab e. û ew her li xwe neheqiyê dikin.

**178.** Xwedê, kê bîne ser rê vêca ew e yê ku rasterêbûyî, kê jî ji rê derêxe vêca yên ku ziyan kirin her ew in.

**179.** Sond be, me ji cin û însanan gelek kes ji bo dojehê afirandin. Dilê wan heye tê nagihin û çavê wan heye pê nabînin û guhê wan heye pê nabihîzin. Ha ew, mîna heywanan e, belkî hê jî rêşaştir in. Ew, her yên bêhay bi xwe ne.

**180.** Ji bo Xwedê (Esmau'l-Husna) navên herî spehî hene. Nexwe bi wan navan ji Xwedê daxwazê bikin û ew ên ku der barê navên Xwedê de xwar diçin wan bihêlin (ji Xwedê re); ew ê bigihin cezayê kar û kiryarên ku dikin.

**181.** Ji mexlûqên me civatek heye ku ew bi xwe bi heqiyê digirin û pê jî hukim dikin.

1 Di heqê tefsîra vê ayetê de ji sehabiyan wiha hatiye ragihandin: Xwedê, çi dema Adem xuliqand, zuriyeta wî wekî zerreyan ji pişta wî deranî û peyman ji wan sitand ku ew Xwedayê wan e. Wan jî ev yek qebûl kirin û ew li ser vê bûne şahid.

**182.** Ew ên ku bi ayetên me bawerî nayînin, em ê wan bêyî ku pê bihesin, hêdî hêdî ber bi ezabê (helakê) ve bibin.

**183.** Ez (bi paşdexistina ceza) muhletê didime wan, bêguman kemîn (û hingaftin û azar)a min pir dijwar e.

**184.** Erê, ma ew nafikrin ku tu dînîtî li cem hevalê wan (Muhemmed) tune ye? Ew, her hişyarkerekî aşkera ye.

**185.** Ma ew li mezinahiya erd û asîmanan, li çiqas tiştê ku Xwedê ew afirandiye û li ecelê wan ê ku dibe nêzîk bûbe nanêrin? Nexwe, ma ew ê piştî Qur'anê bi çi gotinê bawerî bînin?

**186.** Kî ku Xwedê wî gumrah bike (ji rê derxe) êdî jê re tu rêber nîn e û Xwedê wan di xerabiya wan de her sergêjane dihêle.

**187.** (Resûlê min!) Ji te pirsa roja qiyametê dikin; ka kengê ye û dê kengê biqewime? (Ji wan re) Bibêje: Bêguman zanîna wê bes li cem Xwedayê min e. Ji Xwedê pê ve tu kes nikare dema hatina wê aşkera bike. Ew roj li ser erd û asîmanan giran tê. Ew ê ji nişka ve bi ser we de bê. Ew (qiyametê) ji te dipirsin her wekî ku tu wê zanibî. (Ji wan re) Bibêje: Zanîna wê bes li nik Xwedê ye, lê belê pirên mirovan (vê) nizanin.

**188.** Bibêje: Ji ya Xwedê xwestibe pê ve ez nikarim tu feydê bidim xwe û nikarim tu zerarê ji ser xwe jî bidim alî. Eger min bi ya nependî zanîbûya min ê hê bêhtir qencî bikira û ji ya bizerar û ziyan jî min ê xwe bidaya paş. Bes ji bo miletekî ku bawerî bînin, ez her hişyarker û mîzgînber im.

**189.** Ew Xweda ye, yê ku hûn ji yek nefsê çêkirine û ji wê jî hevjîna wê çêkiriye da ku bi bal ve vehewe. Vêca çi dema çû nivîna wê, bi hemleke sivik bihemil bû û di vî halî de demekê ma. Vêca çi dema barê wê giran bû (zaroka wê di zikê wê de mezin bû) her duyan ji Xwedayê xwe daxwaz kir (gotin): Sond be eger tu zarokekî salih bidî me teqez em ê bibin ji şukirdaran.

**190.** Vêca dema Xwedê zarokekî salih da wan, der barê dayîna Xweda de ji Xwedê re şerîk çêkirin. Xwedê ji şirka ku ew dikin pak û bilind e.

**191.** Erê ma ew, wan ên ku nikarin tiştekî biafirînin û ew bi xwe hatine afirandin ji Xwedê re dikin hevpişk?!

**192.** Ew (pût) nikarin arîkariya wan (perestiyên xwe) bikin û nikarin arîkariya xwe jî bikin.

**193.** Eger hûn gazî wan (pûtan) bikin bal riya rast ve, ew li dûv we nayên. Çi hûn gazî wan bikin çi jî hûn dengê xwe nekin wekhev e (ew li pey we nayên).

**194.** (Gelî kafiran!) Bêguman ew pûtên ku hûn ji bilî Xwedê wan dihebînin, ew jî mîna we mexlûqên Xwedê ne. Eger hûn (di doza xwe de) rastbêj in, vêca gazî wan bikin, bila ew jî bersiva we bidin.

**195.** Ma qey lingên wan hene ku bi wan bi rê ve biçin, an destên wan hene ku bi wan bigirin, an çavên wan hene ku bi wan bibînin an jî ji wan re guh hene ku bi wan bibihîzin? (ji wan re) Bibêje: Hûn gazî hevpişkên xwe bikin, paşê (hûn

û ew pêk ve) dek û dolabên xwe bigerînin û (eger ji dest we bê) tu derfetê jî nedine min.

**196.** Bêguman piştevan û arîkarê min Xwedê ye, ew Xwedayê ku kitêb (ji bo min) hinartiye û yê ku arîkarî û xwedîtiya qencîkaran dike, her ew e.

**197.** Ew (pût) ên ku ji bilî Xwedê hûn wan dihebînin, ew nikarin arîkariya we bikin û nikarin arîkariya xwe jî bikin.

**198.** Eger hûn wan (pûtan) gazî bal riya rast ve bikin, we nabihîsin. Tu dibînî ku berê wan li te ye, lê belê ew nabînin.

**199.** (Resûlê min!) Tu bexşîner be, fermana qenciyê bike û guh nede nezanan.

**200.** Çi dema ji şeytên tasewasek bigihîje te, vêca xwe bi Xwedê biparêze. Bêguman Xwedê bihîzer e, zana ye.

**201.** Bêguman ew ên ku xwe diparêzin, dema ji şeytên tasewasek gihîşte wan, ew (ferman û qedexeyên Xwedê) di bîra xwe tînin, vêca ew riya rast dibînin.

**202.** Birayên xirabkaran (ên şeytanî) arîkariya wan dikin û paşê ew qet kêmasiyê jî nakin (her wan diajon ser gunehkariyê).

**203.** (Resûlê min!) Dema te ji bo wan tu mucîze neanî dê bibêjin: De bila te mucîzeyek ji cem xwe baniya. (Ji wan re) Bibêje: Ez tenê didim pey wehya ku ji cem Xwedayê min ji min re hatiye. Ev (ayetên Qur'anê) delîlên zelal in ji Xwedayê we û ji bo qewmekî ku bawerî tînin, riya hîdayet û dilovaniyê ye.

**204.** Dema Qur'an bê xwendin, guhê xwe bidinê û bêdeng bimînin da ku rehmet li we bête kirin.

**205.** Di dilê xwe de, bi zarezar û bi tirs û bi dengekî navincî (di navbera nizmî û bilindiyê de), sibeh û êvarê Xwedayê xwe dibîr bîne û nebe ji yên xafil.

**206.** Bêguman ew ên li cem Xwedayê te (ku melayîket in) li ser kirina îbadetê wî xwe qure nakin û Xwedê (ji hemû kêmasiyan) pak didêrin û her jê re secde dibin.

## 8. SÛREYÊ ENFAL

Sûreyê Enfal 75 (heftê û pênc) ayet e. Ayeta 30'em û 36'em li Mekkê, ayetên din jî li Medînê nazilbûne. Enfal bi daxwaza pirtir e, geljimareya Nefl e. Gava misliman têkoşiyane ji bo ku dînê îslamê belav bikin û xelkê ji rêka şaş vegerînin rêya rast. Ji xêra vê cîhada pîroz zêdetir, ji wî malê ku ji kafiran wergirtine û ji destxistine re Enfal û xenîme tê gotin. Ji ber ku di ayeta yekem a vî Sûreyî de Ellah Teala dibêje: "Ew xenîmeya ku ji kafiran hatiye sitandin bes ji bo Xwedê û Peyxamberê wî ye" ji vî Sûreyî re „el-Enfal" yanî xenîme û destkeftiyên şer hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** (Resûlê min!) Pirsa enfalan (destkeftiyên xenîmetê) ji te dikin (ka çawa ew ê bêne parvekirin). Bibêje: enfal (xenîmet) ji Xwedê û Pêxemberê wî re ye. Nexwe

eger bi rastî hûn bawermend in ji Xwedê bitirsin, navbera xwe xweş bikin û bi gotina Xwedê û peyxemnberê Wi bikin.

2. Bêguman ên bawermend, bes ew ên ku dema navê Xwedê tê gotin dilê wan ji tirsan dilerize û dema ku ayetên Xwedê li ser wan tên xwendin, baweriya wan (pê) zêde dibe û her xwe dispêrin Xwedayê xwe,

3. Ew ên ku bi awayê pêdivî nimêj dikin û ji risqê ku me dayî wan (di riya Xwedê de) xerc dikin.

4. Ha xwediyên van salixan, bawermendên rasteqîn bi xwe ne. Ji bo wan li cem Xwedayê wan mertebe (yên bilind), lêborîn û risqekî berfireh heye.

5. Resûlê min! (Çawa ku parvekirina xenimê (pêşî) bi wan xweş nebû) Xwedayê te ku bi heqî te ji mala te derxistiye her wisa ew jî bi birek bawermend nexweş bû.

6. Piştî aşkera bû (ku tu ji bo cengê derdikeve) her wekî ku ew bi çavên xwe li mirinê temaşe dikin û bi balê ve têne ajotin (der barê cîhadê de) bi te re nîqaş dikin.

7. (Gelî hevalên Pêxember!) Di bîr bînin dema ku Xwedê, ji du tiştan peymana yekê ji wan (bidestxistina bazirganê Qureyşiyan an jî serkeftina leşkerî) dabû we, we ya hêsan (bidestxistina bazirgên) ji xwe re dixwest, lê belê Xwedê dixwaze ku bi gotinên xwe heqiyê misoger bike û dawiyê li kafiran bîne.

8. Da ku Xwedê (bi fermana xwe) heqiyê misoger bike û batilî ji holê rake, her çiqas sitemkar û muşrîk vê nexwazin jî.

9. (Gelî bawermendan!) Bînin bîra xwe, dema ku we (di Cenga Bedrê de) hawara xwe digihande Xwedê ku arîkariya we bike, vêca Xwedê bersiva we da (û got:) Ez ê hezar melayîketî li pey hev li hawara we bişînim.

10. Xwedê (melayîket li hawara wan şand) da ku bibe mizgîniya serkeftina we û da ku dilê we pê aram û germ bibe. Ev serkeftin her ji cem Xwedê ve ye, ne ku bi hêz û qeweta we ye. Bêguman Xwedê ‘Ezîz e, Ḥekîm e.

11. Wê demê (Xwedê) xeweke sivik danî ser çavên we ku ew ewlehiyek bû ji cem Xwedê û ji esmanan baranek bi ser we de barand da ku we pê paqij bike û tasawasa şeytên ji we bibe û da ku dilê we bi hev ve girê bide û lingên we bi cih bike.[1]

12. Wê dema Xwedayê te peyam ji melayîketan re hinart, (ji wan re got): Bêguman ez bi we re me, vêca wan ên ku bawerî anîn wan piştgerm bikin, ez ê jî tirsê biavêjim dilê yên ku kafir bûne, êdî li stûyê wan û li sertiliyên wan bixin.

13. Ev, bi sedema ku wan dijatiya Xwedê û pêxemberê wî dikir. Kî ku dijatiya Xwedê û pêxemberê wî bike, teqez Xwedê ezabdijwar e.

---

1 Çekdarên qureyşiyan hê berê hatibûn li ser „bîra bedrê“ bi cih bûbûn. Mucahidên Îslamê jî tî bûbûn, hem jî cihê ku vegirtibûn pir qûm û sêleh lê hebû, nikarîbûn bi serbestî lê hereket bikin, vêca barana ku bariya hem tase-was ji dilên wan bir, hem moralê wan xurt û bilind kir, hem têr têr av vexwarin, hem jî qada şer hişk bû da ku lingên wan neşemite.

14. (Gelî kafiran!) Ha ev ezab ji bo we ye, de vêca wî tehm bikin (û bizanin) bêguman (roja qiyametê) ezabê êgir her ji kafiran re ye.

15. Gelî bawermendan! Dema hûn (di şer de) bi sîng rastî kafiran hatin, pişta xwe nedin wan (û ji wan nerevin).

16. Ew kesê ku wê rojê ji kafiran bireve –ji bilî ku ji bo fendeki cengê xwe vekişîne yan ji bo xwe bigihîne refekî din (da ku hêza wan zêde bike)- vêca teqez ew musteheqê xezeba Xwedê bûye, cihê wî dojeh e û ew çi cihekî pîs e!

17. Vêca (di cenga Bedrê de) ne we ew dikuştin, lê belê Xwedê (bi arîkariya xwe) ew dikuştin û dema ku te xîz avêt ser çavên wan, ne ku te ew êxiste çav û firnikê wan; belê Xwedê ew gihande ser û çavên wan, da ku Xwedê bi vê (arîkirin û biserxistinê) qencî û dayîneke baş bi bawermendan bike. Bêguman Xwedê bihîzer e, zana ye.

18. Ev (rûdan ji Xwedê ye), bêguman Xwedê lawazkerê hîleyên kafiran e.

19. (Gelî kafiran!) Eger hûn (ji bo yên rast û durist) serkeftinê dixwazin, vêca bêguman serkeftin li dûv daxwaza we hat! Eger hûn (ji kafiriyê û ji cenga li hemberî Pêxember û mislimana) vegerin ji we re çêtir e. (Na) eger dîsa hûn (li dijminahiya Pêxember û mislimanan) vegerin, em ê jî vegerin (bal arîkariya wan ve). Bêguman kom û hejmara we tu feydeyê nagihîne we, çiqas hûn gelek bin jî. Bêguman Xwedê digel bawermendan e.

20. Gelî bawermendan! Guhdariya Xwedê û Pêxemberê wî bikin, berê xwe jê neguherînin û bi duristî guhê xwe bidinê ka çi dibêjê.

21. Nebin wekî wan ên ku gotin: Me (gotina te) bihîst, digel ku wan (di heqîqeta xwe de) nedibihîst.

22. Bêguman li cem Xwedê candarên herî xerab ên ker û lal in, ew ên ku tênagihîjin (ka çi di xêra wan de ye).

23. Eger di wan de xêrek hebûya, teqez Xwedê dê heqî bi guhê wan bixista, eger bi guhê wan bixista jî teqez dê pişta xwe bidanê û dê berê xwe ji baweriyê biguhertina.

24. Gelî bawermendan! Dema Xwedê û peyxember ji bo ya ku we pê sax bike gazî we kirin bersiva wan bidin. Bizanibin ku Xwedê dikeve navbera meriv û dilê wî; (dilê wî dimirîne yan jî diguherine). Bêguman hûn ê bi bal wî ve bêne komkirin.

25. Xwe ji bela û îmtîhaneke wisa biparêzin ku ji we ne bes digihîje yê sitemkar tenê û agahdar bin; bêguman ezabê Xwedê ezabekî pir dijwar e.

26. (Gelî muminan!) Bînin bîra xwe; dema ku hûn li erdê (li Mekkê) bindest û kêm bûn, hûn ditirsiyan ku xelk (muşrikê Mekkê) bi lez we bigirin û birevînin. Vêca (Xwedê) hûn (li Medînê) hewandin û bi arîkariya xwe (roja Bedrê) piştgiriya we kir û risqê pak û paqij da we da qene hûn şêkiriyê bikin.

27. Gelî bawermendan! Bi Xwedê û Pêxember re xiyanetê nekin û digel ku hûn dizanin xiyanetê li emanetê li cem xwe jî nekin.

28. Agahdar bin, bêguman malê we û zarokên we ji bo we bes îmtîhan û ceribandin in. Bêguman xelata mezin her li cem Xwedê ye.

29. Gelî bawermendan! Eger hûn hay ji (fermanên) Xwedê hebin; (Xwedê) dê fehmeke wisa bide we ku hûn ê pê qencî û neqenciyê ji hev veqetînin, dê gunehên we veşêre û li we jî bibore. Xwediyê kerema mezin Bes Xwedê ye.

30. (Resûlê min!) Di bîr bîne dema yên kafir hîle û fend li te dikirin da ku te bigirin, girêdin, an te bikujin, an jî te (ji Mekkê) derînin. Dema wan fend û hîle li te kirin Xwedê jî hîle û fendên wan pûç kirin û Xwedê ji her kesî bêhtir hîle û fendan pûç dike.

31. Dema ku ayetên me ji wan (kafiran) re dihat xwendin, gotin: (Erê ya te xwendî) me bihîst, eger me viyabûya teqez em jî dikarin weke van ayetan bibêjin û ev ji çîrokên pêşiyan pê ve ne tiştekî din e.

32. Wê demê kafiran got: Xwedayê me! Eger ev Qur'an heq be û ji cem te hatibe, ji esmên keviran li ser me bibarîne yan jî ezabekî dijwar ji bo me bîne!

33. (Resûlê min!) Heta tu li nav wan bî, Xwedê dê ezab nede wan. Her wiha heta ku ew lêborîna gunehên xwe bixwazin, Xwedê ezab nade wan.

34. Erê ma ji bo wan çi tişt heye wê bibe asteng da ku Xwedê wan nede ezabdan, digel ku ew riya mescîd'ul-Heramê li ber xelkê digirin (nahêlin ku bawermend wê tewaf bikin). Ew bi xwe jî ne arîkar û xwediyê Ka'bê ne. Xwedî û arîkarê wê bes muteqî ne, lê belê pirê wan (vê) nizanin.

35. Nimêja wan (pûtperestan) li cem Mala Xwedê (Kebê) ji fîkandin û çepikan pê ve ne tiştekî din bû. Vêca (gelî kafiran!) ji ber vê kufra xwe de ezab tehm bikin!

36. Bêguman ew ên ku kafir bûne, malên xwe xerc dikin da ku riya (dînê) Xwedê li ber xelkê bigirin û ew ê hê jî xerc bikin. Paşê ev ê ji wan re bibe jan (û hesret)a dil, di dawiyê de jî ew ê têk herin û bêne şikandin. Ew ên ku kafir bûne bi bal dojehê (cehenemê) ve dê bêne komkirin.

37. Da ku Xwedê baş û xeraban (misliman û kafiran) ji hev veqetîne û hin xeraban jî deyne ser hinan, vêca tevan bi ser hev de kom bike û paşê di cehenemê de werke. Yên zerar kirin ha ew bi xwe ne.

38. (Resûlê min!) Ji yên kafir bûne re bibêje: Eger ew dev (ji neyartiya Xwedê û Pêxember) berdin (û bawerî bînin), tiştê borî li wan nayê girtin. Na, eger dîsa ew vegerin (şerê Pêxember û dijmintiya wî), vêca sond be, adetê Xwedê der barê yên beriya wan de derbas bûye, (ka çawa Xwedê yên berê ji holê rakirin her wisa dê van jî ji holê rake).

39. Hûn bi wan (kafiran) re şer bikin heta ku fitne ji holê rabe û dîn bi tevahî bibe ji Xwedê re, vêca eger ew dev jê (kufrê) berdin, Bêguman Xwedê bi ya ku ew dikin, bîner e.

40. Eger wan (dest ji kirinên xwe bernedan û) pişta xwe dane we, êdî hûn bizanin ku Xwedê arîkar û piştevanê we ye û Ew çi xweş piştevan û çi xweş arîkar e!

41. Agahdar bin, bêguman çi destkeftiyeke xenîmetê we bi dest xistibe, eger bi rastî

we bi Xwedê û bi ya ku me roja furqanê ji bo bendeyê xwe aniye xwarê, -roja ku du celeb (li Bedrê) hatin hemberî hev- we bawerî anîbe, vêca birastî pêncyeka wê xenîmetê ji bo Xwedê, ji bo Pêxember û malbata wî, ji bo sêwî, belengaz û rêwiyan e. Xwedê teqez li ser her tiştî qadir e.

**42.** Di bîr bînin dema (roja Cenga Bedrê) hûn li kenara newala nêzik û ew (qureyşî) jî li rexê dûr bûn. Karwan(ê qureyşiyan) jî di biniya we re bû. Eger we (û wan ji bo şerekî bi vî awayî) civan dabûna hev, hûn ê di civanê de ketibûna îxtilafê (bi vî awayî hûn nedihatin hemberî hev. Lê belê, ji bo ku Xwedê (bi serkeftina mislimanan û têkçûna kafiran) rewşeke pêwîstbûyî bîne cih, (bêcivan, li vî cihî hûn anîn hemberî hev), da ku bi belge û nîşan ê kafirbûyî helak bibe û da ku bi belge û nîşân ê bawerî anî bawerî bîne. Bêguman Xwedê bihîzer e, zana ye.

**43.** Wê demê Xwedê di xewnê de ew (kafir) ji te re kêm nîşan dan, eger ew bi piranî nîşanî te dabûna, teqez hûn ê bitirs û neçar bimana û hûn ê der barê karê (şer) de ketibûna îxtilafê, lê belê Xwedê hûn (ji vê yekê) reha kirin. Bêguman Xwedê bi ya di sîngan de veşartî agahdar e.

**44.** Wê dema (di qada şer de) hûn hatin hemberî hev, ji bo Xwedê ya ku (li cem Wî) misoger e bîne cih, ew li ber çavên we kêm nîşan dan û hûn jî li ber çavên wan kêm nîşan dan. Hemû kar û bar, her bi bal Xwedê ve dizivirin.

**45.** Hey gelî yên ku bawerî anîne! Dema hûn (di qada şer de) hatin hemberî celebekî kafir, xwe ragirin û Xwedê pir di bîr bînin da ku hûn bi ser kevin.[1]

**46.** (Gelî bawermendan!) Bi gotina Xwedê û pêxemberê wî bikin û bi hev re miqersiyê mekin, vêca hûn ê sist bibin, hêza we jî dê here. Sabrê bikêşin, bêguman Xwedê digel sebirkêşan e.[2]

**47.** Nebin wekî wan (kafir)ên ku ji çavsorî û ji bo nav û dengê xwe ji mala xwe derdikevin û riya (dînê) Xwedê li ber xelkê digirin. Bêguman Xwedê bi ya ku ew dikin bi zanîna xwe dorpêç girtiye.

**48.** Dema şeytên kirinên wan ji wan re xemilandin û (ji wan re) got: Îro ji mirovan, tu kes zora we nabe û bêguman ez piştevan û arîkarê we me. Lê belê çi dema ku her du celeb (bawermend û kafir) hatin hemberî hev, (şeytan) bi ser paşpehniya xwe ve zivirî û got: Ez ji we dûr im, bêguman ya ku ez dibînim hûn nabînin, bêguman ez ji Xweda ditirsim, lewra Xweda cezadijwar e.

**49.** Wê demê munafiqan û ew ên ku di dilê wan de nexweşî heye (der barê we de) digotin: Ew ên ha, dînê wan ew xapandine. Kî ku xwe bispêre Xwedê, vêca bêguman Xwedê ‘Ezîz e, Ḥekîm e.

---

1 Di dema cengê de li ber Xwedê bigerin, ji wî hawar û arîkariyê bixwazin û bila çavên we li rêya arîkariya wî be. Tu sedem tune ye ku nehêle mirovek Xwedê di bîra xwe bîne. Nexasim gava şer, karesat, musîbet û bela biqewimin, yekser divê mirov xwe bavêje ber dergehê Xwedê û arîkariyê jê bixwaze.

2 Di ayeta pîroz de bêjeya „Rîh“ derbas bû, maneya wê ya bingehîn ba ye. Lêbelê di maneya xwe ya mecazî de bi daxwaza hêz, arîkarî û dewlet jî tê. Me jî, maneya yekem tercîh kir. Rast e, milletekî bawermend ku bixwaze bibe dewlet, bibe hukimran û di nav netewan de bibe xwedî deng divê di nêv xwe de tifaqa xwe pêk bînin, rê li berberî û çavnebariyê bigrin, ji hev hez bikin û xêra xwe bixwazin. Heke van mercan bicih bîne, wê çaxê mimkune Xwedê jê re bibe arîkar!

**50.** (Resûlê min!) Xweziya dema melayîket rihê yên ku kafir in distînin û li rû û pişta wan dixin û (ji wan re dibêjin) de ezabê dojehê biçêjin, te bidîta!

**51.** Ha ev, bi sedema ku destê we kiriye û bêguman Xwedê li bendeyê xwe tu zilmê nake.

**52.** Wan jî, wekî malbata Firewn û yên beriya wan nîşan û ayetên Xwedê înkar kirin, vêca Xwedê bi sebeb gunehên wan ew hingaftin. Bêguman Xwedê xwedanhêz e, azardijwar e.

**53.** Ev ceza ji ber vê ye, lewra; heta qewmek qencî û kerema ku Xwedê bi wan re kirî ew bi xwe neguherînin Xwedê jî qenciya li ser wan naguherîne. Bêguman Xwedê bihîzer e, zana ye.

**54.** Wan jî wekî malbata Firewn û yên beriya wan, bi ayetên Xwedayê xwe bawerî neanîn. Me jî, ji ber gunehên wan, ew jî helak kirin û Me malbata Firewn (di deryayê de) xeniqand. Bêguman ew hemî zalim bûn.

**55.** Bêguman li cem Xwedê candarên herî xerab ew ên ku kafir in, vêca ew baweriyê (bi Xwedê) nayînin.

**56.** (Resûlê min) Ew ên ku te soz û peyman ji wan standiye, paşê di her carê de soza xwe dişkînin û ew ji encama vê sozşikandinê natirsin...

**57.** Eger di cengê de tu serdestî wan bibî, vêca derbeke wisan li wan bixe da ku yên di pey wan re ji vê derbê ders bigirin.

**58.** Çi dema tu ji xiyaneta miletekî (ku te bi wan re peyman çêkiriye) bitirsî, wan agahdar bike; (ji wan re bibêje) peyman di navbera me de nema. Bêguman Xwedê ji xayînan hez nake.

**59.** Bila ew ên kafirbûne guman nekin ku ew ji ezabê Xwedê xelas bûne. Bêguman ew nikarin me naçar bihêlin.

**60.** (gelî bawermendan) Hûn jî çiqas ku ji we bê, ji hêz û hespên girêdayî li hember wan (dijminên xwe) xwe amade bikin. Ku hûn bi wê dijminê Xwedê û dijminê xwe û hin dijminên din jî ku hûn bi wan nizanin, lê belê Xwedê bi wan dizane, çavtirsandî bikin. Çi tiştê ku hûn di riya Xwedê de xerc bikin, (bêkêmasî) xêra wê dê ji we re bê dayîn û qet neheqî li we nayê kirin.

**61.** Eger ew (dijmin) ber bi aştiyê ve hatin, vêca tu jî ber bi wê ve here û xwe bispêre Xwedê. Bêguman Xwedê, her ew e yê bihîzer, yê zana.

**62.** Eger ew (bi aştiyê) bixwazin te bixapînin, vêca bêguman Xwedê her besî te ye. Yê ku bi arîkariya xwe û bi piştevaniya mumînan tu bi hêz kirî ew e.

**63.** (Xwedê) hogirî xist navbera dilê wan, eger te çi tiştê li ser erdê heye, tev (di vê rê de) xerc bikira jî, te yê nikarîbûya dilên wan bigihanda hev. Lê belê Xwedê ew gihandine hev. Bêguman Xwedê serkeftî û karbinecih e.[1]

1 Li Medîna Munewwer di neqeba famila Ews û Xezrec iyan de dijminahiyeke tûj û berberiyeke tûnd hebû. Di nêv wan de şerên giran qewimîbûn û ji giregirên wan pir insan hatibûn kuştin. Demeke dirêj ve li pey hev digeriyan da ku ji hev tol û heyfê hilînin. Vêca dema Xwedê bi Îslamê ew birûmet kirin, ji dilûcan li hev hatin; kîn û dijminahî ji dilê xwe avêtin û mîna birayê ji dê bav hevûdu hemêz kirin.

**64.** Ey Pêxember! Xwedê besî te û bawermendên bi te re ye.

**65.** Ey Pêxember! Li hember (kafiran) nav di bawermendan bide, wan li ser şer germ bike. Eger ji we bîst kesên sebirkêş hebin ew ê zora du sed kesên (kafir) bibin, eger ji we sed kes hebin ew ê zora hezar kesê kafir bibin. Lewra ew birastî qewmekî tênegihêj in.

**66.** Aniha, Xwedê barê we sivik kir û dizanibû ku di we de (li hemberî şer) qelsiyek heye. Nexwe, eger ji we sed kesên sebirkêş hebin, ew yê zora du sed kesên (kafir) bibin. Eger ji we hezar kes hebin, ew -bi destûra Xwedê- dê zora du hezar kesên (kafir) bibin. Xwedê teqez digel sebirkêşan e.

**67.** Heta ku di qada şer de desthilatiyê bi dest nexe, mafê tu pêxemberekî tune ye ku (di şer de) esîran bigire. Hûn pertalê dinyayê divên û Xwedê jî ya piştî wê (izzeta dînê xwe û biserketina mominan) dixwaze. Xwedê ‘Ezîz e, Ḥekîm e.

**68.** Eger ne ji fermana Xwedê ya derbasbûyî bûya bi sedema esîrgirtina we dê ezabekî mezin we bihingafta.

**69.** Êdî ji wê xenîmeta ku we bi dest xistiye bi helalî û pakî bixwin. Ji Xwedê bitirsin, bêguman Xwedê gunehveşêr e, dilovîn e.

**70.** Ey Pêxember! Ji esîrên ku di bin destê we de ne re bibêje: Eger Xwedê bizane ku di dilên we de xêr heye, wê ji fidya ku ji we hatiye standin hêj çêtirê wê bide we û wê li gunehên we bibihûre. Xwedê gunehveşêr e, dilovîn e.

**71.** (Resûlê min!) Eger ew bixwazin li te xayîntiyê bikin (xemgîn nebe, lewra) wan berê bi Xwedê re ixanet kiribû. (Lê belê) Xwedê li hemberî wan derfet û hêz da te (ku li Bedrê te zora wan bir û te ew dîl girtin). Xwedê teqez (di karê xwe de) zana û xwedanhîkmet e.

**72.** Bêguman ew ên ku bawerî anîn û (ji bo Xwedê ji welatê xwe) hicret kirin û di riya Xwedê de bi malê xwe û canê xwe cîhad kirin û ew ên ku (muhacir) hewandin û arîkariya wan kirin, ha ew serkar û arîkarên hev in. Herçî ew ên ku bawerî anîn, lê belê hicret nekirin; heta ku ew hicret nekin ji xwedîtiya wan tiştek ji we re tune ye. (Digel vê jî) eger ew der barê dîn de arîkariyê ji we bixwazin, bi şertê ku ne li hember milletekî be ku di navbera we û wan de peyman heye, hingê li ser we ferz e ku hûn arîkariya wan bikin. Xwedê bi karê ku hûn dikin bîner e.

**73.** Ew ên ku kafir in hin ji wan arîkarên hinan in. Eger hûn (arîkarî û dostaniyê di nav xwe de) neyînin cih, dê li ser erdê bela û fesadiyeke mezin derkeve holê.

**74.** Ew ên ku bawerî anîn û (ji warê xwe) hicret kirin û di riya (dînê) Xwedê de cîhad kirin û ew ên ku (muhacir) vehewandin û arîkariya wan kirin, ha ew bawermendên rasteqîn in. Ji bo wan lêborîn û risqekî fireh û xweş heye.

**75.** Ew ên ku paşê bawerî anîn û hicret kirin û bi we re cîhad kirin, vêca ha ew jî ji we ne û ew ên ku xwedî û eqreba ne, di kitêba Xwedê de, ew ji hev re pêşdetir in (ku ew dost û arîkarê hev bin), birastî jî Xwedê bi her tiştî agahdar e.

# 9. SÛREYÊ TEWBE

Sûreyê Tewbe 129 (sed û bîst û neh) ayet e. Ayeta 128'em û 129'em li Mekkeyê daketine. Ayetên din jî li Medîneyê daketine.

Sûreyê Tewbe navê xwe ji ayeta 104em girtiye, lewra pêwendiya wê bi tobeyê re heye ku di zimanê erebî de tewbe bi maneya poşmanî ye. Ji bilî Tewbe hinek navên wî yên din jî hene. Navê wî yê herî meşhûr Beraet e.

1. Ev ji aliyê Xwedê û qasidê wî ve bêrîbûneke ji bo wan muşrikên ku we bi wan re peyman daniye.
2. Vêca çar mehan (bêtirs) di erdê de bigerin. Agahdar bin, bêguman hûn nikarin Xwedê neçar bihêlin û bêguman Xwedê riswakerê kafiran e.
3. Ev agahdariyek e ji Xwedê û qasidê wî, di cejna mezin (cejna heciyan) de, bi bal tevekî xelkê ve ku Xwedê û Pêxemberê wî ji muşrikan (ew ên ku wan peymana xwe şikand) bêrî ne. Eger hûn tobe bikin vêca ew ji we re çêtir e. (Na) eger hûn (ji îman û heqiyê) berê xwe dagerînin, bizanin ku hûn ê Xwedê bêçare nehêlin. (Resûlê min!) Mizgîniya ezabekî dijwar bide wan ên ku kafir bûne!
4. Ji bilî wan muşrikên ku we bi wan re peyman danî, paşê wan ji peymana xwe tiştek kêm nekir û li hemberî we di ser tu kesî re nehatin, vêca peymana wan bihêlin heta wextê diyarkirî. Bêguman Xwedê ji yên ku hay ji peymana xwe dimînin hez dike.
5. Vêca eger mehên birûmet derbas bûn, êdî li ku derê hûn rastî wan muşrikan bên, wan bikujin, (bi dîlî) wan bigirin, her riyê li ber wan bigirin û li hemû zêrevangehan li wan çavdêrîyê bikin. Vêca eger wan tobe kir, bi rengê pêdivî nimêj kir û zekata malê xwe dan êdî riya wan vekin. Bêguman Xwedê gunehveşêr e, dilovîn e.
6. Eger yekî ji muşrikan xwe avête bextê te (ewleyî ji te xwest), ewlehiyê bidê da ku gotina Xwedê bibihîze, piştre wî bigihîne ewlegeha wî. Ev (ewledayîn) ji ber ku ew miletekî nezan in.
7. Erê ma çawa ji bo muşrikan li cem Xwedê û Pêxemberê wî dê peyman hebe? Ji bilî yên ku li cem Mizgefta Heramê we peyman daye wan (ew cuda ne), vêca heta ew der heqê we de rast bin, hûn jî ji wan re rast bin. Bêguman Xwedê ji yên ku soza xwe diparêzin hez dike.[1]
8. Erê (ma çawa dê ji bo wan li cem Xwedê peyman hebe), eger ew bi ser we bikevin, eqrebatî û peymanê berçav nagirin. Ew bi devê xwe we razî dikin û dilê wan we naxwaze. Bêguman pirên wan fasiq in.

1 Ji bo muşrikan li cem Xwedê û pêxemberê wî dê çawa peyman çêbibe? Qey wan pêdiviyên peymanê anîne cih? Qey wan destê xwe ji êşandina pêxember û bawermendan vekişandine? Qey wan dev ji fesadiyê berdane? Na. Naxwe; wan heq kiriye ku Xwedê xwe ji wan dûr bike û heq e ku ji bo wan li cem Xwedê û pêxemberê wî tu peyman nebe. Di ayeta pîroz de ew ên ku hukmê wan ji yê muşrikan hatiye cuda kirin, Benî Xuzeyme û Mudlîc in ku ew jî ketine ber peymana Hudeybiyê.

9. Wan, ayetên Xwedê bi bihayekî arzan firotin, vêca wan riya Xwedê li ber xelkê girt. Bêguman a ku ew dikin çiqas pîs e.

10. Ew, der barê tu mislimanekî de eqrebatî û peymanê berçav nagirin û ha ew in yên ji hedê xwe der û ew in yên tehdeyî dikin.

11. (Digel vê jî) eger ew tobe bikin û bi rengê pêdivî nimêj bikin û zikata malê xwe bidin, vêca ew di dîn de birayên we ne û em bi awayekî vekirî ayetên xwe ji bo miletekî ku dizanin aşkera dikin.

12. Eger piştî peymandayîna xwe wan sonda xwe şikand û derbarê dînê we de zimandirêjî kir, hingê bi pêşeng û serokên kufrê re têbikoşin. Bêguman ji wan re sond û peyman nîn e, (bi wan re tê bikoşin) da ku dev ji kufr û dijminahiyê berdin.

13. (Gelî mislimanan!) Ma hûn ê şerê qewmekî nekin ku wan peymana xwe şikand û hewl dan ku Pêxember (ji warê wî) derxin û di serê pêşîn de jî wan dest bi şerê we kiribû? Ma hûn ji wan ditirsin? Eger bi rastî hûn bawermend in, Xwedê hêjatir e ku hûn jê bitirsin.

14. Şerê wan bikin, Xwedê dê bi destên we wan bide ezabdan û wan riswa bike, li ser wan we serkeftî bike û dê dilê civateke bawermend şad bike,

15. Dê ji dilên wan (bawermendan) kînê bibe û Xwedê kê bivê tobeya wî dipejirîne. Xwedê zana û karbinecih e.[1]

16. Erê ma hûn guman dikin ku dê dev ji we bê berdan (û hûn neyên ceribandin) heyanî Xwedê (bi zanîneke berçav) nizanibe ka kî ji we cîhad kiriye û ka kî ji we, ji bilî Xwedê, pêxemberê wî û mislimanan tu kes ji xwe re nekiribe dost û arîkar? Xweda ji ya ku hûn dikin teqez agahdar e.

17. Ji muşrikan re nabe ku ew mizgeftên Xwedê ava bikin digel ku ew bi xwe jî şahdehiya bi kufrê li ser xwe didin. Ev ên ha kar û kiryarên wan pûç bûne û her ew ê di êgir de bimînin.

18. Bêguman yê ku mizigeftên Xwedê ava dike bes ew ê ku bi Xwedê û roja axretê bawerî aniye û bi rengê pêdivî nimêj dike û zekata malê xwe dide û ji Xwedê pêştir ji tu kesî din natirse. Vêca hêvî heye ku ew bibin ji yên li ser riya rast.

19. Ma hûn (karê) avdayîna heciyan û avakirina Beytullahê (digel ku ew muşrik in) mîna (karê) wî kesê ku bi Xwedê û roja axretê bawerî aniye û di riya Xwedê de cîhad kiriye, wekhev digrin? (Ev) li cem Xwedê ne wekhev in. Xwedê qewmê zalim li ser riya rast rasterê nake.

20. Ew ên ku bawerî anîne, hîcret kirine û di riya Xwedê de bi malê xwe û canê xwe cîhad kirine li cem Xwedê mertebeya wan mezintir e. Ha ew ên rizgarbûyî ne.

21. Xwedayê wan, bi dilovaniyeke ji cem xwe, bi razîbûnekê û bi bihiştên ku di wan de ji wan re nîmetên seraqetî hene, mizgîniyê dide wan.

---

1 Ew xelkên ku ji dorhêla welatên nêzîk dihatin Medînê, bawerî tanîn û vedigeriyan welatên xwe ji hevwelatiyên xwe zulm û neheqî didîtin, li hemberê wan dilên wan tijî kîn û nefret bûbû. Vêca ev ayeta pîroz wan bawermendên sitembar destnîşan dike. Digel vê jî ayet dide zanîn; eger ew zalim tobe bikin û baweri bînin, Xwedê yê tobeya wan jî qebûl bike. Lewra Xwedê gunehveşêr û dilovîn e.

22. Ew ê her û her di wan (bihiştan) de bimînin. Bêguman li cem Xwedê (ji bo wan) xelateke mezin heye.

23. Hey gelî yên ku bawerî anîne! Bavên xwe û birayên xwe, eger ew kufrê di ser îmanê re bigirin, ji xwe re nekin xwedî û arîkar. Êdî kî wan ji xwe re bike xwedî û arîkar, vêca ew sitemkar bi xwe ne.

24. (Resûlê min!) Bibêje: Eger bavên we, kurên we, birayên we, jinên we, eşîra we, malê ku we bi dest xistiye, ticareta ku hûn ji zerarkirina wê ditirsin û xaniyên ku hûn ji wan xweş in, li cem we, ji Xwedê, ji Pêxemberê wî û ji cîhada di riya Wî de şîrîntir û xweştir bin, vêca çavlirê bin heta Xwedê fermana xwe (bi ezabê ji we re) bîne. Xwedê teqez qewmê jirêderketî nayîne ser riya rast.[1]

25. Sond be, Xwedê di gelek cihan de arîkariya we kir. Roja Huneynê jî (arîkariya we kir); wê dema piraniya we hûn germ kirin, vêca piraniya we tu feyde negihande we û tu tişt ji we neda paş. Erd digel firehiya xwe jî li we teng bû û paşê we pişta xwe da şer û hûn revîyan.

26. Piştî reva we, Xwedê aramî û dilxweşiya xwe bi ser Pêxember û bawermendan de anî û leşkerekî ku ji we ve nexuya (ji bo arîkariya we) hinart û ew ên kafir bûne ceza kirin. Ha ev e cezayê kafiran.

27. Paşê Xwedê, tobeya kesê ku Ew bivê qebûl dike û Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

28. Hey gelî yên ku bawerî anîne! Bêguman herçî ku muşrik in bes ew pîs in, vêca piştî vê salê (sala nehê hicretê) bila nêzî Beytullahê (Mizgefta Heramê) nebin. Eger hûn (ji nehatina wan ji bo hecê) ji xizaniyê bitirsin, vêca eger Xwedê bivê ji kerema xwe dê we dewlemend bike. Bêguman Xwedê ‘Elîm e, Ḥekîm e.

29. (Gelî bawermendan!) Ji cihû û filehan ew ên ku bi Xwedê û roja qiyametê bawerî nayînin û tiştê ku Xwedê û Pêxemberê wî heram kirî, heram nadêrin û dînê heq (dînê îslamê) ji xwe re nakin dîn, heta ku ew bi destê xwe, perşikestî ciziya xwe nedin, şerê wan bikin.

30. Cihûyan got: Uzeyr kurê Xwedê ye! Filehan jî got: Mesîh kurê Xwedê ye! Ev gotin a devên wan e, gotina xwe dişibînin gotina wan kafirên berê. Xwedê wan bikuje (û lanetê li wan bibarîne), çawa berê xwe ji heqiyê vedigerînin bal pûçiyê ve!

31. Wan (cihû û filehan) ji bilî Xwedê, zana û abidên xwe û Îsayê kurê Meryemê ji bo xwe îlah girtin. Hal ev e ku ew her hatine fermankirin ku yek Xwedayî bihebînin ku ji Wî pê ve tu îlah nîn in û ew ji ya ku jê re dikin hemkûf, pak û dûr e.[2]

---

1 Resûlê Ekrem, piştî fetha Mekkê bi diwazdeh hezar (12 000) leşkerên xwe ve berê xwe da Taîfê û çû şerê-Hewazen û seqîfiyan. Hin mislimanan li pirraniya leşkerên Îslamê nêrîn û gotin:“ Êdî tu kes nikare vî leşkerî bişkîne“. Lêbelê çi dema li newala Huneynê ew û leşkerên muşrikan, yên ku bi hejmara xwe gelekî ji wan hindiktir bûn hatin hemberê hev. Misliman digel piraniya wan têkçûn û bezîyan. Lewra wan arîkariya Xwedê jibîr kiri û bi piraniya xwe pasinîn.

2 Wan (cihû û filehan) ji bilî Xwedê rahib û ahbar (zana û abid) ên xwe ji xwe re kirin îlah?! Erê ma van ji wan re got hûn îlahên me ne? Na, lê belê muameleta wan mîna muameleta ebd ku bi Rebbê xwe re ye. Lewra; yê ku helal û heram dike Xwedê ye. Yê ku ji ebdê xwe re dibêje “bike û neke” Xwedê ye. Vêca tu binêre; dema yek ji van rahiban yan ahbaran tiştekî helal bikin ku Xwedê ew heram kiriye yan

**32.** Ew dixwazin ku nûra Xwedê bi devên xwe vemirînin. Xwedê jî ji bilî ku nûra xwe temam bike tiştekî navê, çendî kafir vê nexwazin jî.

**33.** Ew e yê ku pêxemberê xwe bi riya rast û dînê heq şandiye da ku wî bi ser hemû dînan bixe, her çiqas muşrik nexwazin jî.

**34.** Hey gelî yên ku bawerî anîne! Bêguman gelek ji rahib û ehbaran (ji îbadetkar û zanayan), malên xelkê bi sitemkarî dixwin, riya Xwedê li ber xelkê digirin. Ew ên ku zêr û zîv kom dikin û di riya Xwedê de xerc nakin, vêca mizgîniya ezabekî dijwar bide wan![1]

**35.** Roja ku (diravên wan) di agirê dojehê de têne sorkirin û eniya wan, teniştên wan û pişta wan bi wan têne daxkirin (û ji wan re tê gotin): Ha ev, ew serwet e ku we ji bo xwe dabû hev. Êdî cezayê ya ku we ew dabû hev tehm bikin!

**36.** Bêguman ji roja ku Xwedê erd û esman çêkirin, li cem Xwedê hejmara mehan di kitêba Xwedê de dozdeh in. Ji wan mehan çar jê birûmet in (zîl-qade, zîl-hîcce, muherrem û receb in ku di wan de şer û kuştin heram e). Ha ev, dînê rast û durist e. Di wan mehan de zilmê li xwe nekin. (Gelî mislimanan!) Çawa ku muşrik hemû bi hev re şerê we dikin, hûn jî wisa hemû bi hev re şerê wan bikin û bizanin ku Xwedê bi mutteqiyan re ye.

**37.** Bêguman paşêxistin (a mehên birûmet) zêdenoqbûna di kafiriyê de ye. Ew ên ku kafir bûne pê gumrah dibin. Salekê helal dikin û sala din jî heram dikin da ku hejmara wan bibe hevdengeyî hejmara (mehên) ku Xwedê ew heram kirin. Vêca ew bi vê kiryara xwe heramê Xwedê helal dikin. Karên wan ên xerab ji wan re hatine xemilandin. Xwedê teqez civata kafiran bi ser riya rast ve nake.[2]

**38.** Gelî yên ku bawerî anîne! Ma çi li we qewimîbû, dema ji we re hate gotin: Hûn

---

tiştekî herem bikin ku Xwedê ew helal kiriye, wê demê; ew wesfê îlahtiyê werdigrin. Çimkî helalkirin û heramkirin karê Xwedê ye. Ji ber vê yekê bû; dema Adiy kurê Hatem ku ew fileh bû hate cem Pêxember (s), Pêxember jê re got: Hûn zana û abidên xwe ji xwe re dikin îlah. Adiy got: Em ji wan re ibadet nakin. Pêxember got: Ma hûn bi gotina wan nakin dema ew tiştekî helel yan jî heram bikin. Got: Belê. Pêxember got: Ha ew îbadet e.

1 Haxamên cihûyan û keşîşên filehan, ayetên pîroz yên ku di kitêbên wan de, li gorî daxwaza hukimdar û maldaran diguhartin û bi vê guhartininê ji xwe re malê dinyayê disitandin. Gelek caran hukmên wan li gorî berjewendiyên xwe şîrove dikirin. Bi taybetî jî ayetên ku di bara pêxemberiya Muhemmed (s)de bûn diguhertin. Vêca ev ayeta ku li jor buhûrî vê rewşê diyar dike û vî karê nerewa ji bo me dike mînak. Lewra di nav musilmanan de jî gelek insan li ser navê alimtiyê fetwê şaş û xelet didin da ku bikevin çavê zilamê dewletê û ji xwe re pê qîmetekî hindik qazanc bikin.

2 Çi dema Resûlê Xwedê ji xezwa Taîf û Huneynê vegeriya, pêhesiya ku “Împeretoriya Bîzansê 40 hezar leşker amade kiriye da ku were şerê mislimanan bike û wan ji navê bibe. Ev bûyer di sala nehem ya Hicretê de rûdabû. Vêca Pêxember (s) jî li hemberê Bîzansê cîhad îlan kir ku di demeke ku tengezarî pir bû, li welêt dilaxêvî bû, germî pir dijwar bû û di çaxê xurmegihaştinê de bû. Vêca li ser xelkê zor û giran hat ku biçin şerê Romê. Wan dixwest li ber sihê bêhna xwe berdin, li nava cih û malê xwe bimînin û ji wan re pir zor hat ku derkevin cengê. Di vê navê de munafiq jî li dijê pêxember axivîn û li nav xelkê belav kirin ku îlana şer li hemberî Bîzansê întîhar e. Ji loma hin musliman bi vê axaftina munafiqan xapiyan û nexwestin beşdarî cihadê bibin. Lêbelê bi hewldana pêxember û hevalên wî 30 hezar leşker hate amade kirin û hatin heta Tebûkê. Vêca çi dema Bîzansiyan bihîstin ku wa ye misliman hatine şerê wan di cih de bi paş ve vegeriyan. Vêca ji vê û pêde, ev ayetên ku tên di vê seferê de di bara rewş û helwesta misliman û munafiqan de nazil bûne.

hemû di riya Xwedê de derkevin cîhadê. We xwe berda erdê (û hûn derneketin cîhadê). Erê ma we jiyana axretê bi jiyana dinyayê da. Vêca (bizanin) xweşiya jiyana dinyayê li ber ya axretê kêm û bêqîmet e.

**39.** Eger hûn pêk ve dernekevin cîhadê, Xwedê dê bi ezabekî dijwar we bide ezabdan û wê qewmekî din têxe şûna we û hûn ê nikaribin tu ziyanê jî bidin Xwedê. Xweda li ser her tiştî teqez kara ye.

**40.** Eger hûn arîkariya Pêxember nekin, vêca birastî Xwedê arîkariya wî kiriye. Wê dema kafiran ew (ji Mekkê) derxistin ku ew yek ji diduyan bû (ew û Ebûbekir bi hev re bûn). Wê dema ew her du di şekeftê de bûn, ji hevalê xwe re got: Xemgîn mebe, bêguman Xwedê bi me re ye. Êdî Xwedê aramiya xwe bi ser de anî û piştevaniya wî bi leşkerekî kir ku we ew nedidîtin. Daxwaza kafiran bi bin xist. Daxwaza Xwedê ya herî bilind e. Xwedê muheqeq 'Ezîz e, Ḥekîm e.

**41.** (Gelî mislimanan!) Bi barsivikî û bargiranî ve derkevin cengê, bi malê xwe û bi canê xwe di riya Xwedê de cihadê bikin, eger bi rastî hûn dizanin ha ev ji bo we çêtir e.[1]

**42.** (Resûlê min!) Eger (gaziya te ne ji bo cengê bûya, lê) ji bo bi destxistineke hêsan an jî sefereke navinc (ne kurt û dirêj) bûya, bêguman dê wan bidana dûv te. Lê belê riya zehmet ji wan re dûr hat û laşgiran bûn. Ew ê bi navê Xwedê sond bixwin; eger me karîbûya teqez em ê jî digel we derketibûna. Ew (bi sondên derew) xwe dibin helakê. Xwedê teqez dizane ku ew bêguman derewkar in.[2]

**43.** Xwedê te bibexşîne, heyanî yên rastbêj ji te re diyar nebin û yên derewker jî tu nas nekî, erê ma ji bo çi te destûra wan da?

**44.** Ew ên ku bi Xwedê û roja axretê bawerî tînin, ne ew in ku destûrê ji te bixwazin da ku xwe ji cîhada bi mal û can di riya Xwedê de xwe bi paş de bihêlin. Xwedê jî teqez bi yên teqwadar dizane.

**45.** Lê belê, ew ên ku bi Xwedê û roja axretê bawerî nayînin û der barê dîn de dilên wan ketiye gumanê û her ew di nav gumanan de bi sergêjane diçin û tên, ji te destûrê dixwazin (da ku neçine şer).

**46.** Eger wan bivêya bi we re derkevin şer, teqez ji bo vê amadahiyek dê bikirina. Lê belê Xwedê derketina wan bi we re nexwest, vêca li ber wan giran kir û (ji wan re) hate gotin: Hûn jî digel ên rûniştî rûnin!

**47.** Eger ew digel we derketibûna ji zerara we pê ve tu tiştek li we zêde nedikirin û di navbera we de bi mebesta fitnê dê ji we biqetiyana û di nav we de jî yên ku guh didin wan hene. Xwedê bi stemkaran dizane.

**48.** (Resûlê min!) Bêguman berî vêga (di cenga Tebûkê de) jî ji bo we xerabî

1 Di ayeta pîroz de mebest ji „bi barsivik û bargiranî ve" ev e: Şertên şer çi dibin bila bibin, çi şer rehet be çi zor be, çi hûn siwar bin çi hûn peya bin, çi hûn xurt û çi lawaz bin, çi hûn kal bin çi hûn ciwan bin derkevin şerê kafiran, da ku bi vî awayî hûn serbestiya xwe bistînin û azadane ibadetê Rebbê xwe bikin.

2 Dema Pêxember xwe amade dikir da ku derkeve xezweya Tebûkê, munafiq hatin balê, jê re uzrê xwe gotin û nexwestin derkevin şer. Ji ber ku Pêxember zanîbû ji wan ên ku bêyî dilê xwe bêne şer xêr jê nayê, destûr da wan. Vêca ev ayeta ku hê tê derheqa vê mijarê de daket.

dixwestin, fetl û dekan ji bo te digerandin, heta ku heq (arîkariya Xwedê û piştevaniya wî ji bo te) hat û dînê Xwedê bi ser ket, digel ku wan ev nediviya jî.

49. Hin ji wan (munafiqan) dibêjin: Destûra min bide (ku ez neyême şerê Rûmê) û min nexe gunehkariyê. Bizanibin guneh ew e ya ku ew bi xwe tê de ne û bêguman dojehê dor li kafiran girtiye.[1]

50. Eger qenciyek bigihîje te li xweşa wan naçe û eger xerabiyek bigihîje te, dibêjin: Me, ji berê ve tedbîra xwe girtibû û bi kêfxweşî berê xwe didin malên xwe.

51. Bibêje: Ji ya ku Xwedê ji bo me nivîsî pê ve qet tiştek nagihîje me. Xwedê arîkar û piştevanê me ye, vêca bila bawermend tenê xwe bispêrin Xwedê.

52. Bibêje: Ma hûn çavnêriya yekê ji du qenciyên ku bighîje me, dikin? Em jî ji bo we li hêviyê ne ku Xwedê ji cem xwe, yan jî bi destên me ezabekî bighîne we. De haydê çavlirê bin, em jî bi we re çavlirê ne.

53. Bibêje: Hûn çi bi dilê xwe û çi bêyî dilê xwe malê xwe bidin her ji we nayê qebûlkirin. Bêguman hûn civateke jirêderketî ne.

54. Bêguman ew tiştê ku nahêle sedeqe û xêrên wan qebûl bibe, ji bilî ku wan bawerî bi Xwedê û Peyxemberê wî neanîn û nimêj her bi tiralî û sistayî kirin û ku ji neçarî malê xwe xerc kirin pê ve ne tiştekî din bû.

55. Bila malên wan û zarokên wan te ecêbmayî nehêlin. Bêguman Xwedê di jiyana cîhanê de bes dixwaze wan pê bide ezabdayîn û wan li ser kufrê bimirîne.

56. Munafiq bi Xwedê sond dixwin ku bêguman ew ji we ne. Hal ev e, ew ne ji we ne. Lê belê ew civatek e bizdonek in.

57. Eger wan ewlegehek an şikeftek (ku tê de xwe veşartina) yan jî sitargehek dîtibûna, wê bi bez berê xwe bidanayê.

58. Hin ji wan der barê (parvekirina) sedeqan de te eybdar dikin, vêca eger ji sedeqa (parek) bigihije wan qayîl dibin û eger negihije wan jî dixeyidin.

59. Eger ew bi ya ku Xwedê û Pêxemberê wî daye wan qayîl bibûna û bigotina: Xwedê besî me ye. Xwedê dê ji kerema xwe bide me û Pêxemberê wî jî (dê bide me) û em bêguman ji Xwedayê xwe bihêvî ne (dê ji bo wan bixêrtirbaya).

60. Bêguman zekat, bes ji bo feqîr û belengazan, ji bo karmendên zikatê û yên ku dilên wan bi îslamê xweş bibe, ji bo koleyên ku dixwazin azad bibin û deyndarên ku nikarin deynên xwe bidin, ji bo yên di riya Xwedê de û ji bo rêwiyan e. (Ev dabeşkirin) ferzeke ji cem Xwedê ye. Xwedê zana ye, karbinecih e.[2]

---

1 Ev ayeta 49an di heqê Ced kurê Qeys de nazil bûye ku ew mirovekî munafiq bû. Çi dema Pêxemberê Xwedê xwest derkeve xezweya Tebûkê ji Ced kurê Qeys re got: Ya Ebûweheb! Ma tu têyî şerê Celadê kurê Esferê romî ku tu ji xwe re ji wan xort û qîzên ciwan wergirî? Ced got: Ya Resûlê Xwedê! Bi rastî milletê min dizanê ku ez pêwendê jina me û ez hîç nikarim bêyî wan bijîm. Ez ditirsim ku gava zaroyên Esferî bibînim ez xwe ranegirim. Vêca min neyêxe nava tevdanê û destûrê bide min ku ez li malê rûnim. Lê ez ê bi malê xwe arîkariya te bikim. Vêca Pêxemberê Xwedê Teala dev jê berda û jê re got: Min destûra te da! Ji loma Xwedê ew ayeta ku li jorê buhurî di bara wî û yên wekî de şand û rastiya wî eşkere kir.

2 Di vê ayeta pîroz de qala heşt beş mirov hatiye kirin ku zekat li wan diçe. Hem jî daye zanîn ku zekat ferz e. Bi rastî ev heşt sinif di koka xwe de du sinif in: Yekem, ji bo ku hewce ye da ku jê feydê bibîne,

**61.** Ji munafiqan hin hene ku eziyetê didine Pêxember û dibêjin: Ew guhê xwe dide her tiştî û ji her gotinê bawer dike. Bibêje: Ew guhdariya her tiştî dike lê ew ji bo xêra we ye. Ew baweriyê bi Xwedê tîne û bi gotinên bawermendan jî bawer e. Ew ji bo bawermendan rehmetek e. Ew ên ku Pêxemberê Xwedê diêşînin ji bo wan ezabekî dijwar heye.

**62.** Ew, ji we re bi navê Xwedê sond dixwin da ku dilên we xweş bikin. Eger birastî ew bawermend in, qayîlbûna Xwedê û Pêxemberê wî pêdivîtir e.

**63.** Erê, ma ew nizanin kî dijminatiya Xwedê û Pêxemberê wî bike, bêguman ji wî re agirê dojehê heye, wê her û her tê de bimîne. Ha ev e, riswatî û şermezariya mezin.

**64.** Munafiq ditirsin ku li ser rewşa wan sûreyek bê şandin ku nîfaqa di dilên wan de heye (ji bo mumînan) ragihîne. (Ji wan re) bibêje: Hûn tinazên xwe bikin, bêguman Xwedê ya ku hûn jê ditirsin dê derîne rastê.

**65.** Eger tu ji wan bipirsî (we tinazên xwe bi Pêxember û hevalê wî dikir), teqez dê bibêjin: Bêguman her em ketibûn nav xeberdanê û me xwe pê mijûl dikir. Bibêje: Erê ma we tinazên xwe bi Xwedê, ayetên wî û Pêxemberê wî dikir?

**66.** (Ji munafiqan re bibêje:) qet uzir mexwazin. Birastî piştî we bawerî anî dîsa hûn kafir bûn. Eger em li civatekê ji we biborin jî, em ê bi sedem gunehkariya wan komekê bidine ezabê.

**67.** Mêr û jinên munafiq ji hev in bi ya nelê (munkerî) ferman dikin û rê li ber a baş (marûfî) digirin, destên xwe (ji dana zekatê û sedeqeyan) digirin. Wan Xwedê ji bîr kir, vêca Xwedê jî dev ji wan berda (hidayet neda wan), bêguman munafiq fasiq bi xwe ne.

**68.** Xwedê, ji munafiqên mêr û jin û ji kafiran re jî bi agirê dojehê peyman daye ku her û her ew ê tê de bimînin, ew besî wan e. Xwedê lanet li wan barandiye û ji wan re ezabekî seraqetî heye.

**69.** Hûn jî wekî wan ên beriya xwe ku ew ji we bihêztir û xurttir bûn û ji hêla mal û zarokan ve jî ji we pirtir bûn, vêca wan bi para xwe pêxweşî kiribûn. Êdî we jî bi para xwe kêfxweşî û pêxweşî kir her wekî yên beriya we bi para xwe kêfxweşî kiribûn. Hûn ketin nav pûçatî û rêşaşiyê çawa ku yên beriya we ketibûnê. Evên ha, kar û kiryarên wan li dinya û axretê pûç bûn e û her ew in yên di ziyanê de.

**70.** Ma ji bo wan (munafiqan) xebera qewmên beriya wan nehatiye; qewmê Nûh, Ad, Semûd, qewmê Îbrahîm, xelkên Medyenê (ku ew gelê Şû'eyb e) û gundên hatin serûbinkirin (ku ew qewmê Lût e). Pêxemberên wan ji bo wan delîl û mucîzeyên zelal anîbûn (bawerî neanîn; helak bûn). Vêca Xwedê ne ew e ku neheqiyê li wan bike, lê belê wan bi xwe neheqî li xwe kiriye.

**71.** Mêr û jinên bawermend piştevan û arîkarên hev in, bi qencî û başiyê (li hev) ferman dikin û rê li ber xerabiyê digirin û bi rengê pêdivî nimêj dikin û zekatê

---

zekat jê re tê dayîn. Mîna; xizan û belengazan, kole û deyndaran, rêwî û .. . Duyem, ji bo ku ihtiyac bi wî heye, da ku fêdeya wî bighîje îslamê û mislimanan, zikat jê re tê dayîn. Xwedê ev para zekatê di malê dewlemendan de ferz kiriye da ku pê hewceyiyên îslamê û mislimanan ên xusûsî û gelemperî bêne temînkirin.

didin, guhdariya Xweda û Pêxemberê wî dikin. Ev ên ha, Xwedê dê rehmê li wan bike, bêguman Xwedê ‘Ezîz e, Ḥekîm e.

**72.** Xwedê, ji mêr û jinên bawermend re peymana bihiştên wisa daye ku di bin wan de çem diherikin, her û her ew dê li wan bimînin û (peymana) wargehên xweş li bihiştên ‘Ednê jî (daye wan) û ya ji hemû (nîmetan) mezintir jî qayîliya Xwedê ye. Serfiraziya mezin ha ev e.[1]

**73.** Ey Pêxember! Li hemberî kafir û munafiqan cîhadê bike û li hemberî wan dijwar be. Vehewîngeha wan dojeh e û cihê wan çi pîsecih e!

**74.** Ew bi Xwedê sond dixwin ku wan (gotina nexweş) negotiye. Bêguman wan gotina kafirî got û piştî mislimanbûna xwe kafir bûn û qesda ya ku bi dest wan ve nehatî kirin. Ji bilî ku Xwedê û Pêxemberê wî, ji kerem û qenciya xwe ew (munafiq) dewlemend kirin pê ve ew nikarin pêxemberî eybdar û kêm bikin. Eger ew tobe bikin dê ji bo wan çêtir be û eger ew berê xwe (ji heqiyê) vegerînin, Xwedê li dinya û axretê dê ezabekî dijwar bide wan û ji bo wan li ser erdê ne dost û piştevanek ne jî arîkarek heye.[2]

**75.** Ji munafiqan hin hene ku peyman bi Xwedê re dan (û gotin): Eger Xwedê, ji xweşdayîn û kerema xwe (mal) bide me, teqez em ê sedeqa (heqê Xwedê) bidin û bi sond em ê bibin ji yên qencîkar!

**76.** Vêca çi dema Xwedê ji xweşbexşiya xwe (mal) da wan, nemerdî û çikûsî kirin,

**77.** Êdî ji ber ku peymana xwe bi cih neanîn û ji ber ku derew kirin, Xwedê heta roja ku ew bêne huzûra wî, nifaq (durûtî) xiste dilên wan.

**78.** Ma hê jî ew (munafiq) nizanin ku Xwedê nehênî û pistepista wan jî dizane û bêguman Xwedê zanayê nependiyan e.

**79.** Ew ên ku bawermendên ku ji dilê xwe sedeqeyan didin eybdar dikin û ew ên ku ji bilî keda xwe tiştekî din nabînin ku bidin bi wan jî tinazan dikin; Xwedê jî li ser tinazkeriya wan, wan ceza dike û ji bo wan ezabekî dijwar heye.[3]

---

1 Di ayeta pîroz de bêjeya “Merûf” buhurî ku me jî bi “Qencî” wergerand. Lêbelê divê em bizanin ku Merûf navlêkekî ewqas fereh e ku di bin xwe de hemû bîr û baweriyên sipehî û kirinên baş û exlaqên pak digire. Peyva “Munker” a ku me bi “Neqencî” wergerand tam dijê wê ye ku hemû eqîdeyên pûç, kirinên nebaş û exlaqên riswa dikevine binê.

Xwedê piştî di ayeta 67an de da zanîn ku “Mêr û jinên munafiq ji hev in (di temtêl û durûtiyê de wekhev in)”, li pey wê di ayeta 71ê de ragihand ku “Mêr û jinên misliman piştevan û arîkarên hev in..” Herwiha behsa wesfên wan muminan kir ku wan rehma wî heq kirine û ew wesf jî wiha rêz kirine:

* Mumin di hejêkirin û dostanî û hevkariyê de xwediyê hev in.

* Şîreta qenciyê li hev dikin.

* Ji neqenciyê hev didin paş.

* Bi gotina Xwedê û pêxemberê wî dikin.

2 Berî ku pêxember hicretî bal Medînê ve bikê piraniya gelê wê xizan bûn. Piştî ku Pêxember hate Medînê, vêca Xwedê bereketa xwe dayê û xelkê wê zengîn bûn. Piştre hinek ji xelkê wê yên munafiq nankorî û şîrheramî kirin û hewl dan ku Pêxember bikujin.

3 Gava serdarê munafiqan Ebdullah kurê Ubey kurê Selûl bi nexweşiya mirinê ket, kurê wî Ebdullah hat cem Pêxember û jê xwest ku ji bo bavê wî dua bike da ku Xwedê wî efu bike. Ji ber ku ew mislimanekî

**80.** (Resûlê min!) Çi tu lêborîna gunehên wan bixwazê çi jî nexwazî, eger tu heftê carî lêborîna gunehên wan daxwaz bikî jî, vêca Xwedê qet li gunehên wan nabihure. Ev, ji ber ku bi rastî wan bawerî bi Xwedê û Pêxemberê wî neanîn. Xwedê jî teqez civata jirêderketiyan nayîne ser riya rast.

**81.** Ew ên ku ji bo dijraberiya Pêxemberê Xwedê ji şer mane, bi rûniştina xwe (ya li malê) kêfxweş bûn û nexwestin ku bi malê xwe û canê xwe di riya Xwedê de cîhadê bikin, digotin: Di vê germê de dernekevin cîhadê. (Ji wan munafiqan re) bibêje: Agirê dojehê hê germtir e. Eger ew vê bizanibin (ew ê ji şer xwe nedin paş).

**82.** Êdî bi sedema kar û kiryarên ku kirin, bila hindik bikenin û pir bigirîn.

**83.** (Resûlê min!) Vêca eger Xwedê tu vegerandî bal refekî ji wan(ên ku ji sefera Tebûkê mane), vêca wan jî ji bo derketina (şerekî dî) destûr ji te xwest, ji wan re bibêje: Ji vir û pê de hûn ê bi min re qet dernekevin û hûn ê digel min bi tu dijminî re şer nekin! Bêguman hûn cara pêşîn bi rûniştinê qayîl bûn, nexwe hûn jî digel wan ên (ji şer mane) rûniştî bimînin.

**84.** (Resûlê min!) Tu, li ser tu kesî ji wan -ku bimire- nimêj neke û li ser gora wî jî raneweste. Lewra wan bi Xwedê û Pêxemberê wî bawerî neaniye û li ser kufrê mirine.

**85.** Bila malên wan û zarokên wan te ecêbmayî nehêlin. Bêguman Xwedê bes li dinyayê dixwaze wan pê bide ezabdayîn û wan li ser kufrê bimirîne.

**86.** Dema ji Pêxember re sûreyek bihata (ku tê de bigota): Baweriyê bi Xwedê bînin û digel Pêxemberê wî cîhadê bikin, ew ên ku xwedî serwet bûn wan ji te destûra neçûnê dixwest û wan wisa digot: Dev ji me berde, em ê digel yên rûniştî rûn in.

**87.** Ew razî bûn ku digel paşmayiyan (jin, nexweş û kalan) li mal bimînin û mor li ser dilên wan hat xistin, vêca ew tênagihîjin.

**88.** Lê belê Pêxember û ew ên ku pê re bawerî anîn, bi malê xwe û canê xwe cîhad kirin. Tevekî qenciyan ji bo wan in û her ew in ên (bi dayîna Xwedê) serfiraz.

**89.** Xwedê, ji wan re bihiştên wisa amade kirine ku di bin wan de çem diherikin û her û her ew ê li wan bimînin. Ha ew e xelasiya mezin.

**90.** Bedewiyên ereb hatin (ji bo neçin şer) uzrê xwe xwestin da ku destûra wan bê dayîn. Wan ên ku bawerî bi Xwedê û Pêxemberê wî neanî jî (li mala xwe) rûniştin (û nehatin uzrê xwe nexwestin). Ew ên ku ji wan kafir bûne dê ezabekî dijwar wan bigire.

**91.** Li ser lawaz û nexweşan, li ser ew ên ku tu tiştî nabînin ku ji bo cîhadê xerc bikin tu guneh nîn e, bi şertê ku bi Xwedê û pêxember Wî re rast bin. Li ser ên xwedanhêncet tu guneh nîn e û gazin jî ji wan nayê kirin. Xwedê bi xwe gunehjêbir e, dilovîn e.

**92.** Li ser wan kesan jî (berpirsî û guneh nîn e) ew ên ku dema hatin cem te da ku

baş bû Pêxember nexwest dilê wî bihêle û ji bo efwa bavê wî dua ji Xwedê kir. Vêca ev ayeta 80yî di bara vê mijarê de nazil bû.

tu wan siwar bikî (û wan bişînî şer), te ji wan re got: Tiştekî ku ez we lê siwar bikim tune ye, bi paş ve vegeriyan û ji xemgîniya ku wan tiştek nedît ku pê derkevin cîhadê çavên wan tijî hêstir bûn.[1]

**93.** Bêguman gunehkarî û riya cezadanê bes li ser wan e yên ku ji te destûrê dixwazin (ji bo neyên cîhadê) digel ku ew dewlemend in. Ew qayîl bûn ku digel rûniştiyan (jin û zarok û pîrekalan) bimînin. Xwedê jî mor li ser dilên wan xist, vêca ew (encama paşmayîna ji şer) nizanin (ka dê bibe çi!).

**94.** Dema hûn (ji cîhadê) li wan vegeriyan, dê ji bo we hênceta xwe aşkera bikin. (Ji wan re) Bibêje: Qet mehneyan nekin, em hîç ji we bawer nakin. Bêguman Xwedê salixên we ji me re aşkera kirin. Xwedê û Pêxemberê wî dê karên we bibînin. Paşê hûn ê li alimê xeybê û ya li ber çavan bêne vegerandin, vêca ew ê we agahdar bike bi ya ku we kirî.

**95.** Dema hûn li wan vegeriyan, ji bo hûn li (guneh û sûcên) wan bibihurin, dê ji we re bi (navê) Xwedê sond bixwin (ku hênceta wan hebûye). Hûn jî berê xwe ji wan vegerînin. Bêguman ew dilpîs in û bi sebûnet a ku kirin cihê wan dojeh e.[2]

**96.** Ew ji we re dê sond bixwin da ku hûn ji wan razî bibin. Eger hûn ji wan razî bibin jî vêca birastî Xwedê ji civata fasiqan qet razî nabe.

**97.** Bedewiyên ereb ji aliyê kafirî û munafiqî ve dijwartir in û bi hukmê ku Xwedê ji Pêxemberê xwe re hinartiye bêhtir babet in ku ew nizanibin. Xwedê ‘Elîm e, Ḥekîm e.

**98.** Ji bedewiyên ereb hinek wisa hene ku (di riya dînê Xwedê de) ya xerc dike wê zirar dizane û ji bo we jî çavnêriya belayê dike. Ew belaya pîs (ya ku ji we re çavnêrî dikin) dê were serê wan. Xwedê Bihîzer e, Zana ye.

**99.** Ji bedewiyên ereb hin jî hene ku bi Xwedê û roja axretê bawerî tînin û (di xêrê de) ya ku xerc bike wê dike wek navgîna nêzîkbûnê li cem Xwedê û dike wesîle ji bo bidestxistina duayên Pêxember. Agahdar bin! Bêguman ev karê wan ji bo wan (li cem Xwedê) navgîna nêzîkbûnê ye. Xwedê dê wan bixe nav rehma xwe. Bêguman Xwedê gunehveşêr e, dilovîn e.

**100.** Ji muhacir û ensariyan ew ên ku pêşî misliman bûne û ew ên ku bi rindî dane pey wan, Xwedê ji wan razî bûye û ew jî ji Xwedê razî bûne. Xwedê ji bo wan bihiştên wisa amade kirine ku di bin wan re çem diherikin û heta bi hetayê ew ê li wan bimînin. Serkeftin û rizgariya mezin ha ev e.

**101.** Ji bedewiyên li hawirdora we û ji xelkê Medînê jî hinek munafiqên wisan hene ku di munafiqtiyê de pêşketî ne û li serê bi rik in! (Ji ber ku bi konetî tevdigerin)

---

1 Gelek hevalên pêxember yên xizan, xwestin ku beşdarî Sefera Tebûkê bibin. Lêbelê xwarin, cil û heywaneke ku lê siwar bibin bi dest wan neket. Ji bo vê daxwazê li pêxember vegeriyan. Pêxember ji wan re got: Di dest min de tu heywanek tune ye ku ez we lê siwar bikim û we bişînim şer. Vêca ji xemgînî girîn û vegeriyan. Ha ev ayeta ku buhurî vê yekê destnîşan dike.

2 Eger ew, we bixapînin jî nikarin Xwedê bixapînin. Xwedê baş zanê ku ew çi ne, ew, hîç ji civata fasiqan razî nabe. Naxwe razîbûna we ji wan tu fêdeyê nade wan. Lewra Xwedê ji wan xeyîdiye.

tu wan nizanî (lê belê) em baş wan dizanin. Em ê (li dinyayê) ezab li dûv ezab bidin wan û (roja qiyametê) ew ê li ezabekî mezin bêne vegerandin.[1]

**102.** Civateke din jî heye ku gunehên xwe îtîraf kirine, wan karekî qenc têkilî karekî neqenc kiriye (beşdarî şerên din bûne lê beşdarî vî nebûne û bi derewkarî hênceta xwe aşkera nekirine); nêzîk e ku Xwedê tobeya wan qebûl bike, birastî jî Xwedê gunehveşêr e, dilovîn e.

**103.** Ji malên wan zekatê wergire, wan pê (ji gunehan) pak û paqij bike û ji bo wan dua bike. Bêguman duayên te ji wan re dilrihetî ye. Xwedê bihîzer e, zana ye.

**104.** Ma hê jî ew nizanin ku Xwedê her ew e yê ku ji bendeyê xwe tobê dipejirîne û sedeqeyan qebûl dike. Bêguman Xwedê her ew e yê tobepejrên, yê dilovîn.

**105.** (Ji wan ên ku tobe kirin re) Bibêje: Hûn bixebitin, vêca Xwedê, Pêxemberê Wî û bawermend dê xebata we bibînin. Piştre hûn ê li alimê bi ya li ber çav û nependî bên vegerandin. Vêca Ew bi kar û kiryarên ku we kirine dê we agahdar bike.

**106.** (Ji wan ên ku neçûne sefera Tebûkê) hinekên din jî hene ku ew li hêviya fermana Xwedê hatine hiştin. Xwedê, yan wê ezab bide wan an jî dê tobeya wan qebûl bike. Xwedê zana ye karbinecih e.

**107.** Ew (munafiq) ên ku wan mizgeftek ava kir da ku pê zerarê bidin (bawermendan), kafiriyê bihêz bikin û dubendiyê têxin nav bawermendan û çavnêriya wî mirovî dikin ku hê berî vêga şerê Xwedê û Pêxemberê wî kiriye. Ew sond dixwin (û dibêjin ku) me bi vê ji qenciyê pê ve tiştekî din nexwestiye. Hal ev e ku Xwedayê pak û bilind, şahdeyiyê dide ku bêguman ew derewkar in.

**108.** Tu car lê raneweste û tê de nimêj meke! Mizgefteke ku ji roja pêşî ve li ser bingeha teqwayê hatiye avakirin, teqez rasttir e ku tu tê de nimêj bikî. Di wê de hin zilamên welê hene ku hez dikin xwe (ji gunehan) paqij bikin. Xwedê jî, ji yê xwe paqij dike, hez dike.

**109.** Erê ma ew kesê ku riknê avahiya (dînê) xwe li ser teqwadarî û razîbûna ji Xwedê ava kiriye çêtir e yan ew ê ku avahiya xwe li ser keviya kendalekî ava kiriye ku li ber hilweşandinê be? Vêca bi wê re ew jî dike hilweşe û bikeve agirê dojehê. Xwedê civata sitemkar rasterê nake.

**110.** Ew avahiya ku wan lêkiribû heta (bimirin) û dilê wan parçe bibe jî, ew ê her di dilê wan de bibe tirs û guman. Xwedê ‘Elîm e, Ḥekîm e.

**111.** Bêguman Xweda, ji bawermendan malê wan û canê wan kirîye ku li beranberî wê teqez bihişt ji wan re ye. Ew di riya Xweda de şer dikin, dikujin û têne kuştin. (Ev) li ser Xweda peymaneke rastîn e ku di Tewrat, Încîl û Quranê de (daye bawermendan). Ma ji Xweda pê ve kî heye ku bêhtir peymana xwe bi cih

1 Komek ji wan ên ku neçûbûn sefera Tebûkê, şaşiya xwe fêmkirin. Piştî poşmaniya xwe, xwe bi stûnên mizgeftê ve girêdan û sond xwarin ku heta Pêxember wan veneke ew bi xwe dê xwe venekin. Gava Pêxember ji seferê vegeriya û rewşa wan hîn bû, got: Di bara wan de heta ferman neyê ez jî sond dixwim ku wan venekim. Piştî ev ayet nazil bû Pêxember ew vekirin.

bîne? Nexwe ji bo vê danûstandina ku we bi Xweda re kirî, kêfxweş bibin. Ha ev e, serfirazî û rizgariya mezin.[1]

**112.** Ew ên ku tobedar in, îbadetkar in, spasdar in, rojîgir in, rukû‘ker û sucûdker (û nimêjker in), bi qenciyan fermandar in û li ber nebaşiyan rêgir in û li sînorên Xweda parêzker û haydar in, cennet ji wan re ye. Mizgînê bide bawermendan!

**113.** Ji bo Pêxember û ew ên ku wan bawerî anî, ne durist e ku ji bo muşrikan lêborînê bixwazin -çendî ew lêzimên wan bin jî- piştî ku ji wan re diyar bû ku ew xelkê dojehê ne.

**114.** Daxwaza gunehjêbirina Îbrahîm ji bo bavê xwe bes ji ber peymanekê bû ku dabû bavê xwe. Lê belê çi dema ji Îbrahîmî re aşkera bû ku bavê wî dijminê Xweda ye, (jê re lêborîn daxwaz nekir û ) xwe jê dûr kir. Bêguman Îbrahîm miroveki (li ber Xwedê) zêde bi lavelav, berbihêr û sebirkêş bû.

**115.** Xwedê, tu qewmekî -piştî ku ew rasterê kirin- heta ya ku xwe jê biparêzin ji bo wan aşkera neke, wan naxe delaletê. Bêguman Xweda bi her tiştî dizane.

**116.** Bêguman mulkê erd û asîmanan her ê Xwedê ye. Ew sax dike û dimirîne. Ji bo we, ji bilî Xwedê ne dost û piştevanek ne jî arîkarek heye.

**117.** Sond be, Xwedê li Pêxember, muhacir û ensariyan bihûriye, ew ên ku di çaxê zor de -piştî hindik mabû ku dilê celebekî ji wan meyl bide ku ji cîhadê xwe bidin paş, dana pey Pêxember. Piştre Xwedê tobeya wan qebûl kir. Bêguman Xwedê, ji bo wan bişefqet e, dilovîn e.

**118.** Her wisa tobeya wan her sê kesên ku (ji sefera Tebukê) li paş mabûn jî qebûl kir. Bi rewşeke wisa ku erd digel firehiya xwe li wan teng bû û bêhn li wan çikiya. Wan yeqîn kir ku ji ber (ezabê) Xwedê çi penah û parêzer tun e, ji bilî ku xwe biavêjine ber penaha Xwedê. Paşê, Xwedê ew li ser tobê muweffeq kirin da ku li ser tobeya xwe rawestin. Bêguman Xwedê, her ew e yê tobepejrên ê dilovîn.

**119.** Gelî yên ku bawerî anîne! Xwe ji (ezabê) Xwedê biparêzin û digel rast û duristan bin.

**120.** Ne durist e ji bo xelkê Medînê û bedewiyên ereb ên li hawirdora wan ku ji Qasidê Xwedayê xwe bi paş de bimînin û canê xwe ji canê Pêxember xweştir bivên. Lewra di riya Xwedê de çi têhnatî, çi westanî û çi birçîtî ku bigihîje wan û biçine her cihê ku hêrsa kafiran bîne û çi li hemberê dijminekî serkeftinekê bi dest bixin, her ji bo wan karekî qenc pê tê nivîsîn. Bêguman Xwedê xelata qencîkarên rast û durist winda nake.

**121.** Ew (Di riya Xwedê de), çi hindik çi jî pir bidin û çi newala ku ew tê re

1 Di peymana Eqebê de dema Medîniyan ku ew heftê kes bûn peyman dane Pêxember, ji nav wan Ebdullah kurê Rewahe got: Hey Qasidê Xwedê! Şertên te û Xwedayê te çi ne? Pêxember jê re got: “Şertê min ji bo Xwedayê min ev e: Hûn ê jê re îbadetê bikin û tiştekî jê re nekin hevpişk. Şertê min jî di bara min de ev e: Hûn çawa canê xwe û malê xwe biparêzin eynî wisa min jî biparêzin.“ Dîsa pirsa xwe dubare kir: Eger em vê bikin ji me re çi heye. Pêxember got: „Bihişt heye.“ Wan jî got: Ev danûstandineke çiqas bi kar e! Em, ne jê vedigerin ne jî dixwazin jê vegerin. Vêca ev ayeta ku buhurî di vê derbarê de nazil bû.

bibihurin, her ji wan re xêr tê nivîsandin, da ku Xwedê ji ya ku dikirin, bi ya xweştirîn wan xelat bike.

**122.** Ne rewaye ku bawermend hemû pêk ve derkevin cîhadê. Vêca bila ji her komekê ji wan civatek derkeve (cîhadê) da ku (yên mayîn) di emrê dîn de zana bibin û dema gelê wan (yên çûne cîhadê) li wan vegeriyan wan agahdar bikin, ji bo ku ew jî (ji gunehan) xwe biparêzin.[1]

**123.** Gelî yên ku bawerî anîne! Şerê wan kafirên ku nêzîkî we ne bikin û bila ew di we de hêz û mêrxasiyê bibînin, bizanin ku bêguman Xweda digel teqwadaran e.

**124.** Çi dema (ji Quranê) sûreyek bête xwarê, vêca hinek ji wan (munafiqan) dibêjin: Vî (sûreyî) baweriya kê ji we zêde kir? (bibêje: Erê) Heçî ew ên ku bawerî anîn, vêca baweriya wan zêde kir û ew pê dilşad û kêfxweş dibin.

**125.** Heçî ew ên ku di dilên wan de nexweşî heye, (vî sûreyî) kufr û nîfaq li wan zêde kirin û ew ê li ser kafiriyê bimirin.

**126.** Qey ew (munafiq) nabînin ku her salê carekê yan jî du caran (bi belayên cur bi cur) têne îmtihankirin? Piştre jî ne tobe dikin ne jî ji xwe re îbret digirin.

**127.** Dema (der barê munafiqan de) sûreyek (ji Quranê) bê xwarê, hin ji wan li hinan dinêrin (û dibêjin): Ma kesek (ji mislimanan) we dibîne; paşê dertên û diçin. Xwedê dilê wan (ji rastiyê) vegerand, lewra ew miletekî bêfehm in.

**128.** Sond be, pêxemberek ji nav we, ji bo we hatiye ku zehmetkêşiya we li ser wî giran e, li ser rasterêkirina we rijd e û ji bo bawermendan dilnerm û dilovîn e.

**129.** (Resûlê min!) Eger ew berê xwe (ji baweriya bi te) vegerînin, bibêje: Xweda besî min e, ji wî pê ve tu Xweda nîn in, min pişta xwe pê mikûm û germ kir, Ew e, xwediyê erşê mezin.[2]

---

1 Li gorî ku ev ayeta pîroz dide zanîn; ne mimkun e ku xelkek bi hemû kesên xwe ve derkeve şer. Di haletê şer de, ji milletekî ew ên ku perwerdeya şer û çekan dîtibin bila dest bavêjin çekan û biberizin dijmin. Mirovên din jî xebatên zanînî û çalakiyên çandî bidin dewamkirin. Nexasim jî ilmên dînî û fiqhî yên ku berê civatê bidin ser rêya rast. Divê milletek zanayan perwerde bike da ku ew jî ferman û qedexeyên Xwedê hînî mirovan bikin. Mumkin e ku demeke dirêj şer dewam bike; di vê rewşa awarte de ji bo milletek karibe xwe li ser piyê xwe bigre divê, zana û pisporan -nexasim yên dînî- perwerde bike da ku hêzên xwe yên çekdar û şervanên xwe pê xwedî bike û nehêle bêne şikandin. Heke mecbûr nebe ne rast e ku milletek mamoste û zanayên xwe, nemaze fiqihzanên xwe derxe qada şer. Lewra cîhada bingehîn xebata îlmî ye. Hîç guman nîn e ku milletek di qada zanîn û teknîkê de ku li paş mabe dê zû bihelişe, çendî ew di qada leşkerî de xurt be jî. Lêbelê milletê ku di warê zanîn û teknîkê de li pêş be di demeke kurt de dikare kêmasiyên xwe temam bike. Ji ber vê yekê cîhada îlmî ji cîhada çekan girîngtir e.

2 Di ayetê de Xwedê ji Pêxemberê xwe re dibêje: .. bibêje Xwedê besî min e û min tewekkula xwe berda ser Xwedê (min pişta xwe pê germ kir). Li ser vê rewşê me ma'na du navên Xwedê yê şîrin li jêr anî da ku em baş xwe bisipêrin Xwedê.

El-Wekîl: Ew ê ku kefiliya alemê dike û afirandin û rêveberiya wan girtiye ser xwe. Naxwe; yê ku ji hêla çêkirin û berdewamkirin ve ji mexluqan berpirs her ew e. Ew berpirsê bawermenda ne; ew bawermendên ku beriya xebatê rewşa xwe disipêrin wî, dema di dixebitin jê arîkariyê dixwazin, piştî arikariya Xwedê pesn û spasiya wî dikin û piştî bi belaê hatin ceribandin bi ya hatî serê wan qayil in.

El-Hesîb: Ew ê ku ji bo bendeyên xwe ji rewşa dîn û dinya wan ya ku ji bo wan giring e besî wan e

# 10. SÛREYÊ YÛNUS

Sûreyê Yûnus 109 (sed û neh) ayet e. Ayeta 40an, 94an, 95an û 96an li Medînê û ayetên din jî li Mekkê daketine. Ji ber ku di ayeta 98an de dabaşa gelê Yûnus hatiye kirin, ji vî sûreyî re Sûreyê Yûnus hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Elîf. Lam. Ra. Ev, ayetên kitêba muhkem in.

**2.** Erê ma bi mirovan ecêb tê ku me ji bo zilamekî ji nav wan peyam hinart; (Me jê re got) mirovan hişyar bike û mizgînê bide yên ku bawerî anî ku ji bo wan li cem Xwedayê wan meqamekî bilind heye. Kafiran got: Bêguman ev sêrbazekî aşkera ye!

**3.** Bêguman perwerdigarê we Xwedê ye, ew ê ku di şeş rojan de erd û asîman afirandin, paşê li ser 'Erşê hukimraniyê raser bû (raserbûneke babetî xwe); tevdîra kar û baran dike, bêyî ku destûra wî hebe qet tu kes nikare bibe mehdervan. Ha, ew perwerdegarê we Xwedê ye. Nexwe jê re îbadetê bikin. Erê ma qey hê jî hûn nafikirin?!

**4.** (Gelî mirovan! Roja qiyametê) Vegera we tevan bes bi bal Xwedê ve ye. Ev veger, bêguman sozek e ji cem Xwedê ye û rast e. Lewra Xwedê pêşî mirovan diafirîne, piştre dê wan li xwe vegerîne da ku wan ên ku bawerî anîn û karên qenc kirin xelat bike û ew ên ku kafir bûne jî, bi sedema kafiriya ku kirin ji bo wan vexwarineke ji ava kelî û ezabekî cansoj heye.

**5.** Xwedê ye, ew ê ku roj kiriye çira, heyv jî kiriye ronahî û kiriye qonax bi qonax da ku hûn hejmara salan û hesêb bizanin. Xwedê ev, bes li ser rastî (û hîkmetekê) afirandin. Xwedê, ji bo civateke bîrewer ayetên xwe aşkera dike.

**6.** Bêguman di li pey hev hatina şev û rojê de (û di kurtbûn û dirêjbûna wan de) û di tiştê ku Xwedê di erd û asîmanan de afirandine, ji bo civatekê ku xwe biparêzê belge û nîşan hene.

**7.** Bêguman ew ên ku pêrgîhatina Me hêvî nakin û bi jiyana dinyayê qayîl bûne û bi xweşiyên wê piştrast bûne û ew ên ku haya wan ji ayetên me nemane…

**8.** Ha ew, ji ber gunehên ku kirine, cihê wan agir e.

**9.** Herçî ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirine, Xwedayê wan bi sedema îmana wan, dê wan bigihîne bihiştên pêxweşbûn û dilxweşbûnê ku di bin wan re çem diherikin.

**10.** Dua û gaziya wan di bihiştê de ev e: Xwedayê me, em te ji hemû kêmasiyan pak didêrin! Pêşwazîkirina wan (ji hev re) bes 'silav' e. Duaya wan a paşî jî ev e: Hemd, ji Xwedayê ku perwerdegarê alemê ye re be.

**11.** Eger Xwedê, ka çawa ji bo mirovan lezê li başiyê dike wisa jî lezê li xerabîya ku

---

û ji yên ku bawerî pê anîne paya mezin ji bo wan e û ewê ku li dinyayê li ser kirinên bendeyên xwe hesabgêr e.

ew lezê lê dikin kiribûya, teqez dê civanê mirina wan bianiya (û helak bikirina). Vêca; ew ên ku hatina ber destê me hêvî nakin em ê wan di xerabiya wan de sergêjane û heyirî bihêlin.[1]

12. Çi dema tengezariyek bigihîje mirovî, li ser kêleka xwe yan rûniştî yan jî li piyan her hawara xwe digihîne me. Lê belê çi dema me tengezarî ji ser rakir her wekî ji bo (rakirina) wê tengezariyê qet hawara xwe negihandibe me, li ser gunehan îsrar dike. Ha wisa ji bo tixûbihêran kar û kiryarên wan hatine xemilandin.

13. Sond be, xelkê qirnên beriya we dema li xwe zilm kirin, Me ew ji navê birin, pêxemberên wan ji wan re mucîze anîn lê dîsa ew nebûn ku bawerî bînin (vêca ew bûn musteheqê helakê). Ha, wisa em civata gunehkar ceza dikin.

14. Paşê me, li dûv wan hûn li ser erdê kirin şûngirên wan da ku em binêrin ka hûn ê çawa kar bikin.

15. Dema ayetên me ên aşkera ji wan re dihatin xwendin, ew ên ku (li axretê) dîtina me hêvî nakin, digotin: Ya Quraneke ji bilî vê bîne yan jî vê biguherîne! (Resûlê min! Ji wan re) Bibêje: Ji min re ne mimkun e ku ez wê ji ber xwe ve biguherînim. Ez bes didim pey a ku ji min re tê wehîkirin. Bi sedema ku ez, birastî jî ji ezabê rojeke mezin ditirsim ku ez bêemriya Xwedayê xwe bikim.

16. (Resûlê min! Ji wan re) Bibêje: Eger Xwedê bixwesta, min ew ji we re nedixwend, Xwedê jî dê ew ji we re nedabûya zanîn. Beriya vê, min temenek di nav we de bihurand (û min dozeke wiha li we nekir). Ma hê jî hûn tênagihîjin (ku ev Quran ji cem Xwedê ye)?

17. Ma ji wî kesê ku li ser navê Xwedê derewê lêbîne yan jî bi ayetên wî bawerî neyîne, zalimtir kî heye? Bêguman rewş ev e, gunehkar bi ser nakevin!

18. Ew, di şûna Xwedê de yên ku ne dikarin xerabiyê bidin wan û ne jî dikarin feydê bidin wan dihebînin û dibêjin: Ev, li cem Xwedê mehdervanên me ne. (Ji wan muşrikan re) Bibêje: Erê ma hûn a ku li erd û asîmanan Xwedê pê nizane, vêca hûn wî pê agahdar dikin?! Xwedê, ji wê şirka ku ew dikin pak û bilind e.

19. Mirov, di destpêkê de yek milet bûn, paşê ketin îxtilafê û ji hev cuda bûn. Eger ji ber fermana Xwedê nebûya di ya ku tê de bi hev ketin dê di navbera wan de hukim bihata dayin.

20. (Xelkê Mekkê) Dibêjin: De bila mucîzeyek ji cem Xwedayê wî jê re hatibûya? (Ji wan re) Bibêje: Xeyb, bes karê Xwedê ye; vêca çavlirê bin, ez jî digel we çavlirê me.[2]

---

1 Li gorî rîwayetan, muşrikên mîna Nedr kurê Hers, pêxemberiya Muhemmed mandel kiribûn û gotibûn: „Xwedêyo, heke doza Muhemmed a pêxemberiyê rast be, di cih de ji asîman li ser me keviran bibarîne yan jî ezabekî xemnak bide me!“ Vêca di bara vê rewşê de ev ayeta borî daket. Bi rastî ev ayeta pîroz dide zanîn ku dema evd gunehan bikin, di cih de Xwedê wan ceza nake, belkî muhletê dide wan ku poşman bibin, vegerin heqiyê. Lêbelê ew ên ku poşman nabin jî heyanî demeke diyar keysê dide wan, paşê, wan li dinyayê yan jî li axretê ceza dike.

2 Kafir, mucizeyeke ezabî dixwazin. Weke ku di ayeta sî û duyem (32) a sûretê „Enfal“ de jî hat wiha dua kirine: „Xwedêyo, heke bi rastî ev Qur’an heq be, ji cem te hatibe, ji ezmên li ser me keviran bibarîne! Hal ev e ku ezab ji cem Xwedê ye. Ger ew bivê, di cih de ezab dadixe û civata serhildêran ji holê radike, heke bivê jî dereng dihêle. Bila kafir li ezab lezê nekin û li hêviya encamê bimînin.

**21.** Çi dema li pey tengasiyeke ku ew hingaft bûn, me berfirehiyek da ser wan, tu dibînî ku der barê ayetên me de fend û fetl çêkirin. (Ji wan re) Bibêje: Xwedê di cezadana xwe de bileztir e (vêca guman nekin ku bersiva we dê neyê dayîn). Bêguman melayîketên me hemû fend û fetlên we dinivîsin.

**22.** Ew Xwedayê ku di bej û deryayê de we digerîne, heta dema hûn di keştiyê de bin, bayekî nerm û xweş keştiyê bikişînê (û rêwî jî) bi vê kêfxweş bibin; vêca ji nişka ve bayekî dijwar werê, li keştiyê bide û ji her alî ve pêl bêne ser wan û fehm bikin ku dor li wan hate girtin; êdî ji dil gazî Xwedê dikin: Sond be, eger tu me ji vê tengasiyê xelas bikî, teqez em ê bibin ji spasdaran!

**23.** Çi dema Xweda ew rizgar kirin, (tu dibînî ku dîsa) ew, bêyî ku heqê wan hebe li ser erdê sitemkarî dikin! Gelî mirovan! Zilma we, tenê li we ye û (bi vê) bes hûn pertalên jiyana dinyayê bi dest dixin, paşê, dîsa vegera we bi bal me ve ye. Vêca em ê bi kar û kiryarên ku we dikirin, we agahdar bikin.

**24.** Bêguman rewşa jiyana dinyayê bes weke baranekê ye ku me ji esmên barandiye. Vêca bi wê avê giyayên ser erdê (rengereng) ji yên ku mirov û heywan ji wan dixwin têkilî nav hev bûn. Heta dema ku erd xişrê xwe digire (û reng bi reng) dixemile. Xwediyên wê jî hizir dikin ku ew dikarin berên xwe biçinin û sûdê jê wergirin. (Hingê) fermana me bi şev yan jî bi roj bi ser de hat, vêca me wekî zeviya dirûtî (çinandî) lêkir, her wekî ku duh ew şînkatî tune bû. Ha bi vî rengî ji bo yên ku difikirin em ayetên xwe bi berfirehî tînin.[1]

**25.** Xwedê, (bendeyên xwe) gazî mala selametiyê (bihiştê) dike û kî bivê berê wî dide riya rast.

**26.** Ji bo wan ên ku karên qenc kirin xelata herî rind û ji wê hê zêdetir jî heye. Ser û çavên wan ne bi toz dibin ne jî perîşanî digire ser. Ha ew bihiştî ne, her û her ew tê de dimînin.

**27.** Ew ên ku karên xerab kirin, cezayê wan bi qasî gunehên wan e. Rûreşî û riswayî wan digire û ji bo wan tu parêzker nîn in ku wan ji (ezabê) Xwedê biparêzin. Ser û çavên wan, her wekî parçeyek ji şeva reştarî ew girtibin. Ha ew dojehî ne, ew her û her tê de dimînin.

**28.** Roja ku em hemûyan li hev kom bikin, paşê ji wan ên ku ji bo Xwedê hevpişk çêkirin re, Em ê bibêjin: “Hûn û ew ên ku we ji Xwedê re kirine hevpişk li cihê xwe rawestin (heyanî ku der barê we de biryar bê dayîn)”. Êdî me ew ji hev qetandin û perestiyên wan ji wan re gotin: We îbadetê me nekiribû.

**29.** Vêca ev bes e ku Xwedê di navbera me û we de şahid be, ku em ji perestina we bêxeber bûn.

**30.** Ha wê rojê, her kes dê kar û kiryarên xwe bibîne, hemû dê bi bal xwediyê wan î heq ve ku Xweda ye bên vegerandin û ew derewa ku wan lê dianî dê ji ber wan winda û berze bibe.

---

1 Ev numûneyeke çi rind û bedew e û bi rewşa cîhanê re ahengsaz e! Lewra cîhan, xeml, lezzet û rûmeta wê, demeke kin ji bo xwediyê xwe hêşîn dibe. Gava têkûz û temam bû, berhewa dibe yan jî xwediyê wê hê tu te‘m jê nedîtî jê vediqete diçe. Destevala dimîne û ji hesret, derd û kula wê dilê wî tije xem dibe. Xweşikiya dinyayê jî jê re dibe kul û keder.

**31.** (Ji muşrikan re) Bibêje: Ma kî ji erd û asîmanan rizqê we dide yan ma kî dikare guh û çavan biafirîne, kî dikare yê sax ji yê mirî û yê mirî ji yê sax derêxe û kî karên afirandinê bi rê ve dibe? Vêca ew ê bibêjin: Xwedê ye. Nexwe (ji wan re) bibêje: Eger wisa ye, êdî çima hûn xwe (ji ezabê) Xwedê naparêzin?

**32.** (Ev ê ku van hemûyan dike) Xwedê ye, ew perwerdegarê we yî rast û heq e. Êdî ma piştî heqiyê ji rêşaşiyê pê ve çi heye?! Vêca çawa hûn berê xwe ji îmanê vedigerînin?

**33.** Ha bi vî awayî fermana Xwedayê te (bi ezabê) li ser jirêderketiyan pêwîst bû, lewra ew baweriyê nayînin.

**34.** Bibêje: Ma ji wan ên ku hûn ji Xwedê re dikin hevpişk yek heye ku dest bi afirandinê bike, paşê (piştî mirinê) dîsa wî vegerîne? Bibêje: Xwedê ji tunehiyê (her kesî û her tiştî) diafirîne, piştî ku (dimirîne dîsa vedijîne) û vedigerîne. Nexwe hûn çawa berê xwe (ji heqiyê) vedigerînin?!

**35.** Bibêje: Ma ji wan ên ku hûn ji bo Xwedê dikin hevpişk yek heye ku bi bal heqiyê ve rasterê bike? Bibêje: Xwedê, bi bal heqiyê rasterê dike. Vêca ma qey yê ku bi bal heqiyê ve rasterê bike layîq e ku mirov bide pey wî, yan ew ê ku heyanî ew neyê rasterêkirin ew nikare xwe rasterê bike layîq e?! Vêca we xêr e, çawa hûn bi vî awayî biryar didin?!

**36.** Pirên wan ji gumanê pê ve nadin pey tiştekî din, bi rastî guman mirov ji heqiyê bêminet nake. Bêguman Xwedê, bi ya ku ew dikin baş dizane.

**37.** Ev Qur'an ne lêanîna hin kesan e ku bi bal Xwedê ve tê spartin. Lê belê ew, ya ku li ber destê xwe ye rast didêre û bi berfirehî ronîkirina hukmên Xwedê ye, tê de tu guman tune ye, ew ji cem perwerdegarê alemê ye.

**38.** Yan jî ma ew dibêjin: Wî Quran lêaniye? Bibêje: Eger bi rastî hûn (di doza xwe de) rastbêj in, de haydê hûn jî sûreyekî wekî wê bînin holê û ji bilî Xwedê yên ku hûn karibin gazî wan bikin, gazî wan jî bikin.

**39.** Naxêr, belkî ji ber ku zanîna wan tênegihîştiye û hê jî şîroveya wê ji wan re nehatiye, wan bawerî pê neanî. Yên beriya wan jî, wekî wan (bi pêxemberên xwe) bawerî neanîbûn. De binêre ka encama zaliman çawa bûye!

**40.** Hin ji wan hene ku bawerî bi wê tînin û hin ji wan hene ku bawerî pê nayînin. Xwedayê te, bi xerabkaran bêhtir dizane.

**41.** Eger wan bawerî bi te neanî, bibêje: Karê min ji min re ye, karê we jî ji we re ye. Hûn ji ya ku ez dikim bêrî ne, ez jî ji ya ku hûn dikin bêrî me.

**42.** (Resûlê min!) Hin ji wan guhên xwe didine te (dema tu Quranê dixwînî). Erê ma digel ku ew tênegihîjin jî tu yê bi keran bidî bihîstin?

**43.** Hin ji wan hene ku li te dinihêrin, erê ma digel ku ew nabînin jî tu yê koran rasterê bikî?

**44.** Bêguman Xwedê tu neheqiyê li mirovan nake, lê belê ew bi xwe neheqiyê li xwe dikin.

**45.** Roja Xwedê wan li hev kom dike, her wekî ew ji saeteke rojê pê ve li dinyayê

nemabin hev nas dikin. Bêguman ew ên ku bi çûna ber destê Xwedê bawerî neanîne xesar kirine û ew rasterê nebûne.

**46.** Çi hinek ji ya ku Me peymana wê daye wan, Em nîşanî te bidin, çi jî em te bimirînin (tu nebînî) vêca her vegere wan bi bal Me ve ye. Xwedê li ser ya ku ew dikin, çavdêr e.

**47.** Ji her umetekê re pêxemberekî wê heye (da ku wan rasterê bike). Vêca dema pêxemberê wan (roja qiyametê) hat, di navbera wan de bi dadmendî hukm tê kirin û neheqî li wan nayê kirin.

**48.** Ew (bi tinaz) dibêjin: Eger bi rastî hûn rastgo ne, ka ew peyman(a bi ezab a ku tu me pê ditirsînî) kengê ye?

**49.** Bibêje: Ji ya ku Xwedê bivê pê ve ez nikarim zerarekê ji ser xwe rakim û ez nikarim feydeyekê jî bidim xwe. Ji her umetekê re civanekî wê heye ku jê re hatiye diyarkirin. Dema civanê wan bê, ew nikarin wê saetekê bidin paş û beriya civanê wan bê jî ew nikarin bidin pêş.

**50.** Bibêje: De ka ji min re bibêjin, eger ezabê Xwedê bi şev yan jî bi roj bi ser we de bê (hûn ê çi bikin?) Erê ma gunehkar li hatina çi lezê dikin?

**51.** (Gelî muşrikan!) Ma piştî ku ezab bê rastê hûn ê îmanê bînin? (Wê hingê dê ji we re wiha bê gotin:) Erê ma vêga we bawerî anî? Hal ev e ku we bi lez ev ezab dixwest.

**52.** Piştre ji bo wan ên ku neheqî li xwe kirin dê bê gotin: De ezabê ebedî tehm bikin! Ji bilî ya hûn dikin pê ve hûn nayêne cezakirin.

**53.** Ew ji te dipirsin û dibêjin: Ma ew (ezabê ku tu pê gefan li me dikî) rast e? Bibêje: Erê, ez bi Xwedayê xwe sond dixwim ku teqez ew rast e û hûn ê Xwedê neçar jî nekin.

**54.** Eger ji bo her kesê ku li xwe zilm kirî tiştê li erdê heye tev yê wî be, teqez dê di ber xwe de bide (da ku ji ezab xilas bibe). Dema ew ezab dibînin ji kezeba şewitî poşman dibin. Di nav wan de bi dadperwerî tê hukimkirin û neheqî li wan nayê kirin.

**55.** Agahdar bin, bêguman li erd û asîmanan çi hebe ew ê Xwedê ye. Hişyar bin, bêguman peymana Xweda heq e. Lê belê pirên wan vê nizanin.

**56.** Xwedê ye yê ku sax dike û yê ku dimirîne û hûn ê lê bêne vegerandin.

**57.** Gelî mirovan! Ji cem Xwedayê we, ji bo we şîretek, ji dilan re şîfayek û ji bo bawermendan jî rêberek û rehmetek hatiye.[1]

**58.** Bibêje: Bi kerem û dilovaniya Xweda ye, vêca bila bi vê kêfxweş û dilşad bibin. Ev, ji malê ku ew dicivînin, çêtir e.

**59.** Bibêje: De ka ji min re bibêjin, ji wî risqê ku Xwedê ji bo we afirandî hûn hinekî

1 Ev ayeta pîroz çar taybetmendiyên Qur'ana Mecîd rave dike. Qur'an, hemû bêhnpakî û riswayiyan ji mirovan re eşkere dike, we'zeke rind û bitîn e ku berê mirovan dide exlaqên rind. Şîfayeke wisa ye ku dilê wan ji nexweşiya kufr û nîfaqê derman dike. Rêbereke wisa ye ku berê xelkê dide rêya dilşadî û aramiyê û rehmeteke wilo ye ku xelkê ji tarîtî û teqana kufrê dertîne bextewariya ebedî.

heram û hinekî jî helal didêrin? (Resûlê min! Ji wan re) Bibêje: Ma di vê de Xwedê destûr daye we? Yan jî ma hûn li Xwedê bêbextiyê dikin?

**60.** Ma ew ên ku li hemberî Xwedê derewê lêtînin, gumana wan di heqê roja qiyametê de çi ye? Bêguman Xwedê li hemberî mirovan xwedî kerem e, lê belê pirên wan spasiya (vî nîmetî) nakin.

**61.** (Resûlê min!) Tu di çi karî de bibî, tu çi ji Quranê bixwînî û hûn çi karî bikin, dema hûn xwe noqî wî karî bikin her em li ser we çavdêr in. Ne li erdê ne jî li asîmên bi qasî giraniya zereyekê tiştek ji ber Xwedayê te winda nabe. Ji vê hê biçûktir û mezintir jî çi hebe, her ew di nivîseke aşkera (di Lewh'ul-Mehfûzê) de tomarkirî ye.

**62.** Agahdar bin, bêguman dostên Xwedê, ne tirs ji bo wan heye ne jî ew xemgîn dibin.

**63.** Ew ên ku bawerî anîn û xwe diparêzin.

**64.** Di jiyana dinyayê de û di jiyana axretê de ji bo wan mizgînî heye. Di gotinên Xwedê de qet guhartin nîn e. Ha ev, serfiraziya mezin bi xwe ye.

**65.** Bila gotina wan te xemgîn neke! Bêguman îzet (desthilatî û serkeftin) hemû ya Xwedê ye. Her Ew e, yê bihîzer, yê zana.

**66.** Agahdar bin, li erd û asîmanan çi hebe her ew ên Xwedê ne. (Nexwe) ew ên ku ji bilî Xwedê hevpişkan dihebînin, ew didin pey çi? (Bi rastî) ew ji gumaneke pûç pê ve li pey tiştekî din naçin û ew her derewan dikin.

**67.** (Gelî mirovan!) Xwedê ye, yê ku ji bo we şev afirandiye da ku hûn tê de bêhna xwe berdin û roj kiriye ronahî (da ku hûn tê de bixebitin). Bêguman di van de ji bo civateke ku guhdarî bikin, nîşan hene.

**68.** (Muşrikan) Gotin: Zarokên Xwedê hene. Haşa! Ew ji vê pak û dûr e. Ew dewlemend e. Her jê re ye ya li erd û asîmanan. Di vê mijarê de li cem we tu pêbawerî (delîl) tune ye. Erê ma ya ku hûn der barê Xwedê de nizanin hûn dibêjin?

**69.** Bibêje: Bêguman ew ên ku li hemberî Xwedê derewan lêtînin qet bi ser nakevin.

**70.** (Ji bo wan) li dinyayê pertalekî hindik heye. (Lê belê) piştre vegera wan bi bal me ve ye. Paşê, ji ber bêbawerî û kafirbûna wan em ê ezabê herî dijwar bi wan bidin tehmkirin.

**71.** Ji bo wan peyama Nûh bixwîne ku wî ji gelê xwe re gotibû: Ey gelê min! Eger mayîna min di nav we de û şîreta min a bi ayetên Xwedê bi we giran be, vêca bes min xwe sparte Xwedê. Hûn û hevpişkên xwe bicivin û biryara karê xwe bidin, paşê bila karê we ji bo we nebe derd û kovan. Piştre hukmê xwe der barê min de bidin û keysê (muhletê) jî nedin min.

**72.** Eger hûn berê xwe (ji şîretê min) dagerînin, vêca min tu heqdestek ji we nexwestiye. Bes heqê min ji cem Xweda ye û ferman li min hatiye kirin ku ez bibim ji mislimanan.

**73.** Vêca wan bi Nûh bawerî neanî. Me jî Nûh û ew ên ku di keştiyê de pê re

bûn xilas kirin û me (li ser erdê) ew kirin şûngir. Me ew ên ku bi ayetên me bawerî neanîn jî (di tofanê de) binav kirin. De binêre ka encama wan ên hatine hişyarkirin (û bawerî neanî) çawa bû!

**74.** Piştre, li pey wî, me gelek pêxember ji gelên wan re şandin û pêxemberan ji bo wan mucîze anîn. Lê belê (ji ber tebîetê kufra ku di wan de heye) ew nebûn ku baweriyê bînin, bi ya ku wan berê bawerî pê neanîbû. Ha bi vî awayî em, morê li dilên tixûbbihêran dixin.

**75.** Paşê, piştî wan me Mûsa û Harûn digel mucîzeyên xwe ji bo Firewn û giregirên wî şandin. Lê belê wan xwe qure kir û ew miletekî gunehkar bûn.

**76.** Çi dema ji cem me heqî ji wan re hat, gotin: Ev, teqez sêrbaziyeke aşkera ye.

**77.** Mûsa got: Erê ma çi dema heqî ji bo we bê hûn ê her jê re bibêjin: Ev sêr e? Hal ev e ku sêrbaz tu carî bi ser nakevin.

**78.** Wan got: Ma tu ji bo me hatî da ku me ji wê (ola) ku me bav û kalên xwe li serê dîtin vegerînî û li ser erdê mezinahî bikeve destê we? Hal ev e, em ne ew in ku bi we baweriyê bînin.

**79.** Firewnî got: Her çiqas sêrbazên zana û kone hebin, ji min re bînin.

**80.** Vêca çi dema sêrbaz hatin, Mûsa ji wan re got: De bavêjin ya ku hûn ê biavêjin.

**81.** Çi dema wan (werîsên xwe) avêtin, Mûsa got: Ya ku we aniye sêhr e. Bêguman Xwedê dê pûçîtiya wê derîne rastê. Bêguman Xwedê karên mufsidan li hev rast nayîne.[1]

**82.** Xwedê, bi fermanên xwe dê heqiyê derîne rastê, çendî li xweşa gunehkaran neçe jî.

**83.** Vêca (digel dîtina van mucîze û ayetan jî) ji ber tirsa Firewn û giregirên wî ku dê wan bidin ezabê, ji çend kesên qewmê wî pê ve tu kesî bawerî bi Mûsa neanî. Bêguman Firewn li erdê desthilatekî zordest bû û bêguman ew ji tixûbbihêran bû.

**84.** Mûsa got: Ey gelê min! Eger bi rastî we bawerî bi Xwedê aniye, de xwe bispêrinê eger bi rastî hûn misliman in.

**85.** Vêca gotin: Me xwe her sparte Xwedê. Xwedayê me! Me bi destê kafir û sitemkaran neceribîne!

**86.** (Xwedayê me!) Me bi dilovaniya xwe ji wê civata kafir rizgar bike!

**87.** Me ji Mûsa û birayê wî re peyxam şand; li Misrê, ji gelê xwe re hin malan amade bikin û malên xwe bikin nimêjgeh û nimêj bikin. (Ey Mûsa!) Mizgînê bide bawermendan!

**88.** Mûsa got: Xwedayê me! Te di jiyana dinyayê de xişr û malekî pir da Firewn û giregirên wî. Xwedayê me! Paşê wan mirov ji riya te vegerandin ser kufrê! Xwedayê me! Malê wan ji navê bibe, dilê wan qenc bişidîne, vêca bila imanê neyinin heyanî ew ezabê dijwar bibînin.

**89.** Xwedê got: Nifira we qebûl bû, vêca li ser riya rast û durist bimînin û zinhar hûn nedin pey riya wan ên ku nezan in!

---

1 Weke ayetê jî daye zanîn: sêhrbazî, bes xapandin, sextekarî û gellacî ye. Lewra Mûsa pêxmberekî mezin e, rind dizaniye ku ew pûçî ye û yên ku ew anîne rastê jî fesadker û xerabkar in.

**90.** Me zaroyên îsraîl di deryayê re derbas kirin, vêca Firewn û leşkerên xwe bi neheqî û bi êrîşkarî dane pey wan, heyanî kete wê rewşa ku binav bibe, (Firewn) got: Bêguman min bawerî anî ku ji bilî wî Xwedayê ku zaroyên îsraîl pê bawerî aniye tu îlah tun in û ez ji mislimanan im!“

**91.** Erê ma vêga (te bawerî anî)? Hal ev e ku te berê pir îsyanî dikir û tu ji xeraban bû.

**92.** Îro, em ê termê te xelas bikin da ku tu ji yên pey xwe re bibî îbret. Bêguman gelek ji mirovan ji ayetên me xafil in.[1]

**93.** Bêguman me zaroyên îsraîl li welatekî rind bi cih kirin û me risqekî paqij da wan. Vêca heta zanîn (Qur'an) ji bo wan nehat ew her yek bûn, neketin îxtilafê. Bêguman Xwedayê te, dê roja qiyametê di navbera wan de, di wan mijarên ku tê de ketine îxtilafê, hukim bike.

**94.** (Resûlê min!) Eger tu ji van (rûdan)ên ku me ji te re hinartine bi guman bî, ji wan ên ku beriya te kitêbê (Tewrat û Încîlê) dixwînin, bipirse. Bêguman ji bo te ji Xwedayê te heqî hatiye, vêca tu qet nebe ji şuphekaran!

**95.** Tu nebe ji wan ên ku bi ayetên Xwedê bawerî nayînin; vêca tu dê bibî ji yên xesirî.

**96.** Bêguman ew ên ku fermana Xwedayê te (bi ezab) li ser wan misoger bûye, ew îmanê nayînin.

**97.** Çendî temamê mucîzeyan ji wan re bên jî (ew bawerî nayînin) heyanî ezabê xemnak nebînin.

**98.** Tu bajarekî (ji wan bajarên me helakirin) bawerî neanîn vêca ku baweriya wan feyde bidaya wan, ji bilî qewmê Yûnis (wan bawerî anî); çi dema wan bawerî anî, me ezabê riswaker li dinyayê ji ser wan rakir û heta demekê jî me (parmendiya ji nîmetên) jiyanê da wan.[2]

**99.** (Resûlê min!) Eger Xwedayê te bivaya, çiqas kesên li ser erdê hene dê hemûyan bawerî bianiya. Erê ma tu li mirovan kotekiyê dikî da ku baweriyê bînin?

**100.** Bêyî destûra Xwedê tu kes nikare baweriyê bîne. Ew, ezabê xwe dide wan ên ku eqilê xwe bi kar nayînin.

**101.** Bibêje: De berê xwe bidine erd û asîmanan ka çi di wan de heye? Belge û ayetên Xweda û hişyariya ji ezab tu feydê nadin qewmekî ku bawerî nayînin.

**102.** Ew (muşrik) ji bilî ku çavnêriya rojên xwedanezab bikin pê ve, mîna rojên ku bi ser wan muşrikên beriya wan de borîn, ew çavnêriya tiştekî din nakin. Bibêje: De haydê çavnêriya ezab bikin, bêguman ez ê jî digel we çavnêriyê (li ezabê we) bikim.

---

1 Belê xwedê got :"Îro, em ê termê te (ji deryayê) derxin da ku tu ji yên pey xwe re bibî îbret". Eger ku Xwedê termê wî ji deryayê ne avête bejayiyê, mimkun bû ku yên di pey wî re bigota; ew îlah bû, nexeniqiye, ew ê rojekê werê. Vêca Xwedê piştî ew di avê de xeniqand, emrî avê kir ku termê wî bavêje qeraxê çawa ku termê heywana mirarbûyî davêje qeraxê da ku yeqîn bikin birastî ew xeniqiye û da ku bizanin ew ne îlah bû, belkî ew mirovekî sitemkar, musrif û jihedêder bû.

2 Çi dema gelê Yûnus înkara wî kirin, ew hêrs bû û ji nava wan derket. Xelkê wî fehm kirin ku ezab dê bi ser wan de bê. Ji nû ve poşman bûn û ji bo ku ezab bi ser wan de neyê ji Xwedê lavelav kirin. Vêca Xwedê jî tobeya wan qebûl kir û ezab ji ser wan rakir.

**103.** Piştre, (dema ezab bê) em ê pêxemberên xwe û wan ên ku pê re bawerî anîne (ji ezab) rizgar bikin. Ev wek deynekî ye li me ku em ê bawermendan rizgar bikin.

**104.** Bibêje: Gelî mirovan! Eger hûn di heqê dînê min de gumandar bin, vêca ew ê ku ji bilî Xwedê hûn dihebînin ez wî nahebînim. Lê belê, bes ez ê wî Xwedayê ku we dimirîne bihebînim û ferman li min hatiye kirin ku ez bibim ji mislimanan…

**105.** Berê xwe bide dînê rast û durist, ew ê ji xwariyê dûr û zinhar tu nebe ji muşrikan!...

**106.** Ji bilî Xwedê gazî û hawarê negihîne yê ku ne feydê digihîne te, ne jî ziyanê. Êdî eger te ev kir, wê gavê teqez tu ji zaliman î.

**107.** Eger Xwedê zerarekê bîne serê te, ji Wî pê ve kes nîn e wê ji ser te rake. Eger Xwedê ji bo te qenciyek xwest, kes nîn e rê li ber qenciya Wî bigire. Ew ji bendeyên xwe kê bivê xêrê digihîjîne wî. Her Xwedê ye, yê gunehveşêr, yê dilovîn.

**108.** Bibêje: Gelî mirovan! Ji bo we ji cem Xwedayê we rastî (Quran) hat. Êdî kî bê ser riya rast, bes ew ji bo xwe tê. Kî ji rê bikeve, ew jî li dijî xwe ji rê dikeve û ez li ser we ne berpirs im.

**109.** Bide pey ya ku ji bo te tê hinartin û heyanî Xwedê (di navbera te û miletê te de) hukim bike xwe ragire. Xwedê çêtirînê hakiman e.

## 11. SÛREYÊ HÛD

Sûreyê Hûd 123 (sed û bîst û sê) ayet e. Ayeta 12an, 17an û 114an li Medîneyê û yên din jî li Mekkeyê daketine. Sûre, navê xwe ji ayetên 50an û 60an girtiye ku di wan de behsa jiyana Hûd Pêxember hatiye kirin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Elîf. Lam. Ra. Ev kitêbeke wisa ye ku ayetên wê muhkem in, paşê ji aliyê Xwedayê Hekîm ê Xebîr ve ji hev hatiye veqetandin…

**2.** Da ku hûn ji bilî Xwedê îbadetê çi tiştî nekin. Bêguman ez ji aliyê Xwedê ve ji bo we mizgînber û hişyarker im,

**3.** Û da ku hûn ji Xwedayê xwe daxwaza lêborîna (gunehên) xwe bikin, paşê bi bal wî ve tobe bikin; (êdî) Xwedê dê heta demeke diyarkirî jiyana we bi rindî xweş bike û dê kerema xwe bide çi kesê ku xwedanqencî be. Eger hûn berê xwe (ji îmanê) vegerînin, bêguman ez li ser we ji ezabê rojeke mezin ditirsim.

**4.** (Gelî mirovan!) Vegera we her bi bal Xwedê ve ye û Ew li ser her tiştî qadir e.

**5.** Agahdar bin! Ew (munafiq), sînga xwe didin hev da ku xwe ji Xwedê veşêrin. Hişyar bin, dema ew cilên xwe li xwe dipêçin, bi ya ku ew vedişêrin û bi ya ku didin der jî Ew dizane. Bêguman Xwedê, bi ya ku di dil û sîngan de ye agahdar e.

6. Çi rêveherekî (çi insan û çi ne insan) li ser erdê heye her risqê wî li ser Xwedê ye, Xwedê cihê ew lê dijî û cihê ew lê bimire jî dizane. Ev tev di kitêbeke aşkera de (di Lewh'ul Mehfûzê de) nivîsandî ne.

7. Xwedê ye, ew ê ku erd û asîman di şeş rojan de çêkirin û (berî çêkirina wan) erşê Wî li ser avê bû. (Xwedê erd û asîman çêkirin ) da ku we biceribîne; ka ji we karê kê rindtir e. Eger tu (ji wan re) bibêjî: Bêguman piştî mirinê hûn ê bên saxkirin û şandin, teqez ên kafirbûne dê bibêjin: Ev (Qur'an) ji sêrbaziyeke aşkera pê ve ne tiştekî din e.[1]

8. Sond be, eger em heya demeke bijimar ezab ji ser wan bidin paş, teqez dê bibêjin: Ka çi yê nahêle ku ew (ezab) were? Agahdar bin! Roja ew ezab bi ser wan de tê, ji ser wan nayê vegerandin. Ew ezabê ku wan pê tinaz dikir dor li wan girtiye.

9. Sond be, eger em ji aliyê xwe ve dilovanî (û qenciyekê) bi mirov bidin çêjandin paşê jê bistînin, bêguman ew (ji rehma me) zû bêhêvî dibe û qenciyên berê jibîr dike.

10. Sond be, eger piştî tengasiyeke ku ew hingaftî em qenciyekê pê bikin, dê teqez bibêje: Tengî û nexweşî ji min çûn (û şukrê Xwedê nake). Bêguman ew mirovekî bitr û qure ye.

11. Ji bilî wan ên ku (li hemberî karesatan) xwe ragirtin û karên qenc kirin, ha ew ji bo wan lêborîn û xelateke mezin heye.

12. Ma qey ji wê wehya ku ji te re hatî tu yê hinekî jê terk biki û singa te jî pê teng dibe ji ber ku dibêjin: "De bila gencineyek jê re daketiye yan jî digel wî ferişteyek bihatiye". Bêguman tu bes hişyarker î û Xweda li ser her tiştî wekîl e.

13. Yan jî ew dibêjin: Wî ji kîsî xwe lêaniye? Bibêje: De haydê hûn jî deh sûreyên weke wê bînin. Eger bi rastî hûn (di doza xwe de) rastgo ne; de ji bilî Xwedê hûn karibin gazî kê dikin bikin.

14. Eger ew bersiva we nedin, nexwe bizanin ku bes ev Quran bi zanîna Xwedê hatiye hinartin û ji Wî pê ve tu Xweda nîn in. Erê ma vêca hûn radestî ber fermana Xwedê nabin?!

15. Çi kesê jiyana dinyayê û xemla wê bixwaze, em ê bêkêmasî, beranberî karên wan li dinyayê bidin wan û li dinyayê tiştek li wan nayê kêmkirin,

16. Ha ew in yên ku ji bo wan li axretê ji êgir pê ve tiştekî din nîn e û ya ku wan (li dinyayê) kir berhewa çû û karê ku wan dikir pûç û betal bû.

17. Erê, ma ew ê ku ji cem Xwedayê xwe li ser delîleke aşkera be û digel vê jî ji teref Xwedê ve şahidek (jê re) hebe û beriya wê jî, kitêba Mûsa ya ku rêber û rehmet bû jê re şahid be, (ma mîna yê ku bêdelîl be?) Ev ên ha bi wê baweriyê tînin (ji wan re bihişt heye). Ji bend û hizban çi kesê bi pêxember û Quranê bawerî

1 'Erş, cismekî wisa ye ku dor li hemû cismên ku li kaînatê hene girtiye, ji ber bilindiya xwe navê "Erş" yanî "ban" girtiye. Li gorî raveya tefsîrzanan a vê ayetê, Xwedê pêşî 'erş, piştre av, piştre asîman û ferş aferandine. Maneya "Erşê wî li ser avê bû" ne ev e ku, bi avê ve bû. Çawa ku tê gotin: Asîman, li ser erdê ye, lêbelê tu kes dê neşêt bibêje: Asîman bi erdê ve ye.

neyîne vêca cihê wî agirê dojehê ye. Nexwe der barê wê de bila ji te re gumanek çênebe. Bêguman ev rastiyeke ku ji cem Xwedayê te ye, lê belê pirên mirovan pê bawerî nayînin.

**18.** Erê ma ji wî kesê ku li ser (navê) Xwedê derewê lêbîne, zalimtir kî heye? Ha ew, ji Xwedayê xwe re dê bêne rapêşkirin û ferîşteyên şahid jî dê bibêjin: Ha ev in ên ku li ser (navê) Xwedayê xwe derew lêdianîn. Agahdar bin, laneta Xwedê li ser zaliman be!

**19.** Ew ên ku riya Xwedê li ber mirovan digirin û ji dil û can dixwazin ku xwar nîşan bidin (da ku xelkê jê bidine paş). Ew bi xwe jî, bi axretê ne bawer in.

**20.** Ev (zalim) nikarin Xwedê li ser erdê bêçare bihêlin da ku wan nede cezadan û ji bilî Xwedê ji bo wan çi dost û arîkarek nîn e ku ezabê li ser wan bide paş. Ezabê wan dê qat bi qat zêde bibe. Wan nekariye (dengê heqiyê) bibihîzin û wan heqî jî nedidîtin.

**21.** Ha ev in, ew ên ku (li dinya û axretê) zerar li xwe kirin û ew ên ku bi neweyî ji Xwedê re dikirin hevpişk, li ber wan winda bûn.

**22.** Bê şik û şubhe yên li axretê herî xesirîne her ew in.

**23.** Bêguman ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirin û bi tirs bi bal Xwedayê xwe zivirîne ha ew xelkên bihiştê ne û ew ê her û her lê bimînin.

**24.** Rewşa van herdu destekan mîna rewşa yê ker û kor e û mîna rewşa yê biçav û biguh e. Erê ma rewşa herduyan qet dibe wekî hev? Ma hê jî hûn ji xwe re îbretê nagirin?

**25.** Sond be, me Nûh ji gelê wî re şand. (Ji qewmê xwe re got): Bêguman ez ji bo we hişyarkerekî aşkera me.

**26.** (Ez li we ferman dikim ku) Bes hûn ji Xwedê re îbadetê bikin! Bêguman ez li ser we ji ezabê rojeke dijwar ditirsim.

**27.** Vêca ji gelê wî giregirên ku kafir bûne, gotin: Em te jî bes mirovekî mîna xwe dibînin û ji hejarên me yên bêfikir pê ve em tu kesî din li pey te nabînin û em tu çêtiriyeke we jî li ser xwe nabînin heta ji bilî vê, em we derewîn dizanin.

**28.** (Nûh) Got: Gelî miletê min! De ka ji min re bibêjin? Eger ez ji cem Xwedayê xwe li ser nîşanekê bim û Xwedê ji cem xwe pêxemberî dabe min, vêca ev jî ji ber we hatibe veşartin; erê ku hûn wê nexwazin ma ez ê bi kotekî bi we bidim qebûlkirin?

**29.** Gelî miletê min! Ez li ser ragihandina fermanên Xwedê tu malî ji we naxwazim. Bes xelata min ji cem Xwedê ye. Ez bawermendan (ji civata xwe) naqewirînim. Bêguman ew dê bigihine Xwedayê xwe. Lê belê ez dibînim ku hûn miletekî nezan in.

**30.** Gelî miletê min! Eger ez wan biqewirînim, kî ye ku min ji ezabê Xwedê biparêze? Ma hûn (vê yekê) nafikirin?

**31.** Ez ji we re nabêjim; gencîneyên Xwedê li cem min in, ez bi nepeniyê jî nizanim, ez nabêjim ez ferîşte me jî û ji bo wan ên ku di çavên we de bênirx in ez nabêjim

ku Xwedê dê qenciyê digel wan neke. Xwedê, bi ya di dilên wan de bêhtir dizane. Eger min ev kir bêguman hingê ez ji sitemkaran im.

32. (Gelê wî) Gotin: Ey Nûh! Te bi me re têkoşîn kir, hem jî di têkoşîna digel me de te zêde dirêj kir. Eger bi rastî tu rast dibêjî, vêca de ka wî ezabê tu me pê ditirsînî ji bo me bîne.

33. (Nûh) Got: Eger Xwedê bixwaze dê bi ser we de bîne û hûn ê Xwedê neçar jî nehêlin.

34. Eger ez bivêm li we şîret bikim jî şîreta min wê tu feydê nede we eger ku Xwedê jirêketina we vîyabe. Ew perwerdegarê we ye û (paşê) hûn ê lê bêne vegerandin.

35. Yan jî ew dibêjin: Wî ew ji cem xwe lê aniye? (Ji wan re) Bibêje: Eger min lê anîbe gunehê wê ji min re ye û ez ji gunehên hûn dikin, bêrî me.

36. Ji Nûh re hate wehiykirin; bêguman ji wan ên ku bawerî anîn pê ve êdî tu kes bi te baweriyê nayîne. Vêca ji ber neqenciyên ku ew dikin xemgîn nebe.

37. (Ey Nûh!) Di bin çavdêriya me de û bi fermana me keştiyê saz bike û der heqê wan ên ku zilm kirine mehdervaniyê ji min neke, bêguman ew ê her bixeniqin.

38. Wî keştî çêdikir. Çi dema giregirên qewmê wî di ber re diborîn tinazên xwe pê dikirin. (Nûh ji wan re) Got: Eger hûn tinazên xwe bi me bikin, vêca em ê jî tinazên xwe bi we bikin, çawa ku hûn bi me tinazan dikin.

39. Di nêzîk de hûn ê bizanin ka ezabê riswaker dê ji kê re bê û ezabê daîmî dê bi ser kê de bixurice.

40. Heta fermana me (bi helaka wan) hat û av ji tenûrê fûriya, Me ji Nûh re got: Ji her texlîtên heywanan cotekî (yekî nêr û yeke mê) û -ji bilî yê ku der barê wî de fermana me (bi ezab) heq bûbe- malbata xwe û wan ên ku bi te bawerî anîn jî li keştiyê siwar bike. Jixwe ji hejmareke hindik pê ve tu kesî bawerî pê neanîbû.

41. Nûh got: Li keştiyê siwar bibin, gera wê jî û rawestina wê jî bi navê Xwedê ye. Bêguman Xwedayê min gunehjêbir e, dilovîn e.

42. Keştî, di nava pêlên mîna çiyan de ew digerandin. Nûh, gazî kurê xwe kir ku ew ji keştiyê dûr bû: Hey kurê min! Tu jî bi me re siwar be û digel kafiran nebe!

43. Kurê wî gotê: Ez ê hilkişim serê çiyayekî ku ew min ji avê (tofanê) biparêze. (Nûh jê re) Got: Îro, ji bilî mirovê ku Xwedê lê hatibe rehmê li hemberî fermana Xwedê tu parêzkarek nîn e. Pêl kete navbera wan, vêca ew jî bû ji yên binavbûyî.

44. (Piştî ku kafir binav bûn ji erd û asîman re) hate gotin: Hey erdê! Ava xwe daqurtîne. Ya esmano! Tu jî vekişe. Av kêm bû û çikiya, ferman bi cih hat, keştî jî li ser Cûdî rawestiya û hate gotin: Bila dûrbûna ji dilovaniya Xweda ji civata zalim re be!

45. Nûh, li ber Xwedayê xwe geriya û (wiha) got: Xwedayê min! Kurê min ji xelkê min e û peymana te jî teqez heq e. Tu, dadperwertirê dadweran î.

46. Xwedê (jê re) got: Ya Nûh! Nexêr, ew ne ji xelkê te ye. Karê wî karekî ne qenc

e. Nexwe tiştê tu pê nizanî ji min nexwaze. Bêguman ez li te şîret dikim da ku tu nebî ji nezanan![1]

47. (Nûh) got: Xwedayê min! Ez xwe bi te diparêzim ji ya ku zanîna min pê tune ku ez ji te bipirsim. Eger tu li min neborî û li min rehmê nekî ez ê bibim ji yên xesirî.

48. Jê re hat gotin: Ey Nûh! (Ji keştiyê) dakeve, silav û bereketa me li te û wan umetên digel te be! Hin umet hene ku em ê (li dinyayê) bi xweşiyan wan biçêjînin, paşê ji cem me dê ezabekî dijwar bigihîje wan.

49. Ha ev (qise) ji saloxdayînên nehênî ne ku em ji te re peyam dikin. Beriya vê (Quranê) ne te pê zanîbû ne jî gelê te. Nexwe tu jî (mîna Nûh) sebrê bikêşe; bêguman encama xêrê bes ji mutteqiyan re ye.

50. Me ji gelê Ad re jî birayê wan Hûd (şand), got: Ey gelê min! Xwedê bihebînin. Ji Wî pê ve ji bo we tu îlah nîn in, hûn her derewkar in.

51. Ey gelê min! Ez ji we tu heqdestekî naxwazim. Bes heqê min li ser Xwedê ye; ew ê ku ez afirandime. Ma hê jî hûn aqilê xwe bi kar nayînin.

52. Ey gelê min! Ji Xwedayê xwe lêborîna (gunehên) xwe bixwazin, paşê bi bal ve tobe bikin, ew ê ji asîmanan li ser we baranê bibarîne û ew ê hêzê li ser hêza we zêde bike. Hûn bi gunehkarî berê xwe (ji ya heq) nezivirînin.

53. Jê re gotin: Ey Hûd! Te mucîzeyeke aşkera ji me re neaniye, em jî ne ew in ku ji bo gotina te dev ji îlahên xwe berdin û em ne ew in ku bi te bawerî jî bînin.

54. Bes em dibêjin ku ji îlahên me hinan bi te vedane! Hûd, (ji wan re) got: Ez Xwedê dikim şahid û hûn jî şahid bin ku bi rastî ez ji wan ên ku hûn (ji Xwedê re) dikin hevpişk, dûr û bêrî me.

55. Vêca ji bilî Xwedê, hûn tev li hemberî min fen û fûtên xwe bikin, paşê qet muhletê jî nedin min.

56. Min, xwe sparte wî Xwedayê ku hem Xwedayê min hem jî Xwedayê we ye. Tu rêveherek tune ye ku emrê wî di destê Xweda de nebe. Bêguman Xwedayê min li ser riyeke rast e.

57. Eger hûn berê xwe (ji baweriyê) vegerînin, bêguman ew a ez pê hatim, min gihande we û Xwedayê min dê qewmekî din têxe şûna we û hûn qet nikarin zerarekê jî bidin Wî. Bêguman Xwedayê min li ser her tiştî çavdêr e.

58. Çi dema fermana me (bi tunekirina kafiran) hat, me bi rehmetekê ji cem xwe Hûd û ew ên ku ligel wî ku wan pê bawerî anîbû rizgar kirin û me ew ji ezabekî dijwar û giran xelas kirin.

59. Ha ew (qiseya) Ad e; ayetên Xwedayê xwe mandel kirin, li ber pêxemberên Wî rabûn û dane pey fermana her zordarekî rikdar.

---

1 Ev ayet dide zanîn ku di navbera mirovan de pêwendiya rasteqîne, dîn e. Mirovên ku bi dînê Xwedê bawer bikin û pêxemberên wî rast bidêrin ew dost û birayên hev in. Çendan ku pêwendiya nijadê di nav wan de tune be jî. Eger ku bav û birayên hev bin, lê yek ji wan ne liser baweriya heq be li cem Xwedê ew ne tiştekî hev in.

**60.** Hem li vê dinyayê hem jî roja qiyametê lanet li wan dibare. Agahdar bin, gelê Ad Xwedayê xwe mandel kir. Agahdar bin, dûrbûn û helak ji bo Ad be ku ew ji qewmê Hûd e.

**61.** Me, ji gelê Semûd re jî birayê wan Salih (bi pêxemberî şand) got: Ey gelê min! Xwedê bihebînin. Ji Wî pê ve ji bo we tu îlah nîn in. Hûn (bi şerîk çêkirinê) her derewkar in. Xwedê hûn ji axê afirandin û hûn li wê kirine avaker û niştecih. Nexwe ji Xwedê lêborîna (gunehên) xwe bixwazin, paşê bi bal ve tobe bikin. Bêguman Xwedayê min nêzîk e, bersivdar e.

**62.** Jê re gotin: Ey Salih! Beriya vê (gotina te) di nav me de hêviya me tu bûyî. Ma vêga tu nahêlî ku em wan (pût)ên ku bav û kalên me ew dihebandin, bihebînin? Bêguman em ji wê yekdêrîna (tewhîda) ku tu me vedixwênî balê ji dilûcan biguman in.

**63.** Salih got: Ey gelê min! Ma hûn dê ji vê re çi bêjin eger ez ji Xwedayê xwe li ser mucîzeyeke aşkera bim û Wî ji nik xwe rehmetek (pêxemberî) dabe min? Di vê rewşê de eger ez li ber Xwedê rabim, kî wê min ji (ezabê) Wî biparêze? Hûn bi vê (şîreta xwe) ji zerarê pê ve (tu feydê) nadin min.

**64.** Ey gelê min! Ha va ye deveya Xwedê ji bo we mucîzeyek e! Wê serbest bihêlin, bila li erda Xwedê bixwe, (vexwe) û bi tu awayî wê neêşînin, vêca (eger hûn wê biêşînin) ezabekî nêzîk dê we bigire.

**65.** Vêca deve şerjê kirin. Salih got: Sê rojan di malên xwe de bi dilxweşî bijîn, (piştre hûn ê helak bibin), ev civan peymaneke rast e û bêderew e.

**66.** Çi dema fermana me hat, me bi dilovaniyeke ji cem xwe Salih û yên digel wî, wan ên ku bawerî anîbû ji ezab û riswahiya wê rojê rizgar kirin. Bêguman Xwedayê te, her Ew e yê hêzdar, yê desthelatdar.

**67.** Ew ên ku zilm kirin, dengekî dijwar ew hingaftin, vêca di malên xwe de li ser çok û ruyên xwe de kumişîn.

**68.** (Wisa li wan hat) her wekî ew qet li wê akincî nebûbûn, ji xaniyên wan çi tişt li şûnê nemabû. Agahdar bin, gelê Semûd Xwedayê xwe mandel kir. Agahdar bin, helak û dûrketina ji dilovaniya Xwedê ji bo gelê Semûd be.

**69.** Sond be, qasidên me ji Îbrahîm re mizgînî anîn û gotin: Silav li te be. Îbrahîm jî got: Silav li we be jî. Vêca di demeke pir kin de ji wan re golikekî biraştî anî.

**70.** Çi dema dît ku wa ye destên wan dirêjî xwarinê nabe, ev yek lê xweş nehat û ji wan saw girt. (Vêca jê re) gotin: Netirse! Bêguman em (ferîşte ne) ji bo qewmê Lût hatine şandin (da ku em wan helak bikin).

**71.** Di wê demê de jina Îbrahîm li piyan bû, vêca keniya. Êdî me, bi çêbûna Îshaq û di pey Îshaq re jî bi çêbûna Yaqûb mizgîn dayê.

**72.** (Sara) Got: Wey li vê hetîketiyê! Ezê bi vê pîrejinîtiya xwe, çawa bibim xwedanzarok û ha ev malxweyê min jî kalemêrek e. Bêguman ev (çêbûna zarokan ji du kalan) tiştekî ecêb e!

**73.** (Ferîşteyan) gotin: Ma tu ji fermana Xwedê şaşwaz dibî? Gelî xelkê mala

Îbrahîm! Rehmet û bereketa Xwedê li ser we be. Bêguman Xwedê hêjayê pesindayînê ye, qencîpir e.

**74.** Vêca dema tirs ji Îbrahîm çû û mizgînî jê re hat, der barê (helaka gelê) Lût de bi (qasidên) me re dest bi nîqaşî kir.

**75.** Bêguman Îbrahîm ji dil, mirovekî sernerm ê dilşewat ê tobedar bû.

**76.** (Ferîşteyan got:) Ey Îbrahîm! Dev ji vê (nîqaşê) berde. Bêguman fermana Rebbê te (bi ezabdayînê) hat û ezabekî bêveger teqez dê bi ser wan de bê.

**77.** Dema qasidên me hatin cem Lût, ji ber wan xemgîn bû û bêhna wî teng bû û got: Ev, rojeke dijwar e.

**78.** (Dema ferîşte di dirûvê xortên ciwan de dîtin) bi lez hatin cem Lût, hê berê jî wan karên kirêt dikirin. (Lût ji wan re) Got: Ey gelê min! Ha va ne keçên min (bi wan re bizewicin), ew ji bo we paqijtir in. Ji Xwedê bitirsin û li pêşberî mêvanên min, min fedîkar nekin! Ma di nav we de zilamekî aqilmend tune ye?

**79.** (Jê re) Gotin: (Ey Lût!) Tu dizanî ku tu hewcehiya me bi keçên te tune ye û tu dizanî ku em çi jî dixwazin.

**80.** (Lût ji wan re) Got: Xweziya li hember we min hêzek hebûya yan jî min xwe biavêta ber keleheke asê û xurt.

**81.** (Melaiketan) Gotin: Ya Lût! Em qasidên Xwedayê te ne. Ew qet neşên destên xwe li te bidin. Di demeke şevê de digel malbata xwe derkeve rê. Bila tu kes ji we bi paş xwe ve jî nemêzînê, ji bilî pîreka te. Bêguman ew ezabê ku dê bê serê wan, teqez dê bê serê wê jî. Bêguman civanê helaka wan spêde ye, erê ma spêde ne nêzîk e?

**82.** Vêca çi dema fermana me (bi cezadana wan) hat, me gundê wan serûbinî hev kir û me kevirên ji heriya pehtî bi ser wan de barandin…

**83.** (Ew kevir) ji cem Xwedayê te ve nîşankirî bûn û ew ji sitemkaran ne dûr in.

**84.** Me, ji gelê Medyenê re jî, birayê wan Şueyb şand. (Şueyb ji wan re) Got: Ey gelê min! Xwedê bihebînin. Ji Wî pê ve ji bo we tu îlah nîn in. Kêşan û pîvanê kêm nekin. Bêguman ez we di xweşiyê de dibînim û bêguman ez ji bo we ji ezabê rojeke dorgir, ditirsim.

**85.** Gelî miletê min! Kêşan û pîvanê bi edaletî temam bikin, ji mafên mirovan tiştekî kêm nedin wan û li ser erdê gelacî û tevdanê mekin.

**86.** Eger hûn bi rastî bawermend in a ku ji helalê Xwedê ji we re dimîne, ji bo we çêtir e û ez li ser we ne çavdêr im.

**87.** (Tinazên xwe pê kirin û jê re) Gotin: Ey Şueyb! Ma nimêja te li te ferman dike ku em dev ji perestina wan (pûtan) berdin, ew ên ku bav û kalên me ew diperestin, an jî em bi kêfa xwe teserufatiyê di malê xwe de nekin? Bêguman tu mirovekî bêhnfireh û aqilmend î.

**88.** (Şueyb ji wan re) Got: Gelî miletê min! Ma hûn dê ji vê re çi bêjin, eger ez ji Xwedayê xwe li ser mucîzeyeke aşkera bim û Wî ji aliyê xwe risqekî fireh û helal dabe min! Ez navêm bi vê ya ez we jê didim alî ku li dijî we herim. Ez bes bi

qasî ji min bê çêkirinê dixwazim. Serkeftina min bes bi arîkariya Xwedê ye. Bes min xwe spartiye Wî û ez ê lê vegerim.

**89.** Gelî miletê min! Zinhar bila dijminiya we ya li hemberî min, karesateke weke ya ku hatiye serê gelê Nûh û gelê Hûd û gelê Salih, neyîne serê we jî! Gelê Lût, ji we ne dûr e.

**90.** (Gelî miletê min!) Ji Xwedayê xwe lêborîna (gunehên) xwe bixwazin, piştre poşman bibin û li Xwedê vegerin. Bêguman Xwedayê min (ji bendeyên xwe re) dilovîn e, hezjêker e.

**91.** Gotin: Ey Şueyb! Em ji gotinên ku tu dibêjî pir fehm nakin, birastî jî em te di nav xwe de lawaz û bêhêz dibînin! Eger ne ji xatirê eşîra te bûya teqez me yê tu bi keviran bikuştaya û tu ji me re neserdest î (ku em nikaribin te bikujin).

**92.** (Şueyb) Got: Gelî miletê min! Ma li gorî we eşîra min ji Xwedê bi rûmettir e (ku ji bo xatirê wê hûn min nakujin), rewş ev e hûn (fermanên) Xwedê diavêjin pişt (guhê) xwe (û hûn wan bêrûmet digirin). Bêguman Xwedayê min bi ya ku hûn dikin dizane, (tiştek ji ber winda nabe.)

**93.** Gelî miletê min! Çi ji we tê bikin, bi rastî ez ê jî (wezîfa xwe) bikim. Di nêz de hûn ê bizanin ka ezab ji bo kê tê ku wî riswa bike û ka kî ye yê derewîn. De haydê çavnêriyê (li encama karê xwe) bikin, ez jî di digel we çavnêriyê dikim.

**94.** Dema fermana me hat, me bi dilovaniyeke ji cem xwe Şueyb û ew ên ku digel wî bawerî anîbûn xelas kirin. Ew ên ku zalim bûn, qîreke dijwar ew girtin vêca di xaniyên xwe de li ser çokên xwe kumişî man.

**95.** Her wekî ku ew li wê derê akincî nemabin û xanî li wê derê ava nebûbin. Agahdar bin! Ka çawa gelê Semûd ji dilovaniya Xwedê dûr bûye, her wisa gelê Medyenê jî, jê dûr bû.

**96.** Sond be, me Mûsa jî bi mucîzeyên xwe û bi nîşanên aşkera şand…

**97.** ji Firewn û giregirên wî re. Lê belê wan bi gotina Firewn kir. Hal ev e ku karê Firewn ne rast bû.

**98.** Ew (Firewn) dê roja qiyametê bide pêşiya gelê xwe û wan bibe dojehê. Cihê ku ew herinê çi cihekî pîs e!

**99.** Ew hem li vê dinyayê hem jî roja qiyametê ji dilovaniya Xwedê hatine dûrxistin. Xelata ku ji wan re hatiye dayîn, çi pîs xelat e!

**100.** (Resûlê min!) Ha ev, ji salix û xeberên bajaran in ku em ji bo te dibêjin. Hin ji wan hene ku (heta îro jî şûnwarên wan) li ser piyan mane û hinek jî hene ku her wekî zadê dirûtî (çinandî) bêser û bêşûn in.

**101.** Me, li wan zilm nekir, belê wan bi xwe li xwe zilm kir. Çi dema fermana Xwedayê te (bi ezab) hat, ew ên ku ji bilî Xwedê ew dihebandin, tiştek ji ser wan nedane paş, ji zerarê pê ve tiştek din li wan zêde nekir.

**102.** Xwedayê te xelkê bajaran –dema ew zalim bin– ha bi vî awayî dide cezadan. Bêguman ezabê Xwedê dijwar û çetîn e.

**103.** Bêguman di van (qiseyan) de, ji bo wan ên ku ji ezabê axretê ditirsin ders û

îbret hene. Ew roj, rojeke wisa ye ku tê de hemû mexlûq, ji bo wê tên civandin û hemû (mexlûq) wê dibînin.

**104.** Me ew (roj) tenê ji bo temambûna demeke bijimar daye paş.

**105.** Dema ew roj bê, bêyî destûra Xwedê tu kes nikare bipeyive (û mehderiyê bike), vêca hin ji wan bedbext in, hin ji wan jî bextiyar in.

**106.** Herçî ew ên ku bedbext in, ew di nav êgir de ne, tê de ji bo wan nefesdayîn û nefestandineke bikul û bikovan heye.

**107.** Ji bilî yê Xwedayê te bivê, heta erd û asîman hebin ew ê her û her di êgir de bin, bêguman Xwedayê te ya ku bivê wê dike.

**108.** Herçî ew ên ku bextewar in, vêca ew seraqetî di bihiştê de ne heta ku erd û asîman (ên axretê) hebin, ji bilî ya Xwedayê te bivê. Ev dayîneke wisa ye ku bêxelasî û bêqutbûn e.

**109.** (Resûlê min!) Nexwe, der barê perestina wan de nekeve gumanê. Ji bilî ya ku bav û bapîrên wan berê dihebandin, ew tiştekî din nahebînin.

**110.** Sond be, Me kitêb da Mûsa, vêca tê de bi hev ketin (hinekan bawerî pê anî û hinekan jî ew mandel kir). Eger ne ji ber biryara Xwedayê te bûya, teqez dê di nav wan de hukim bihatina kirin. Bêguman ew di bara wê (Quranê) de gumandar in.

**111.** Bêguman Xwedayê te dê hemberê (berdêla) karên her yekî ji wan (bawermend û kafiran) bêkêmasî bide wan. Bêguman Xwedayê te ji ya ku ew dikin agahdar e.

**112.** Nexwe tu û ewên ku digel te tobe kirine; çawa li we ferman hatiye kirin wisa xwe rast û durust bikin û ji endazê neborin. Bêguman Xwedê bi ya ku hûn dikin bîner e.[1]

**113.** (Gelî bawermendan!) Bi tu rengî meyla sitemkaran nekin, vêca (eger hûn bikin) agir dê we bihingêve. Ji bilî Xwedê tu dost û piştevanên we tune ne. paşê arîkariya we jî dê neyê kirin.

**114.** Di herdu rexên rojê de, ji şevê jî di demên nêzî rojê de nimêj bike, bêguman qencî gunehan dibin, ev bîranîneke ji bo yê ku dibîra xwe bîne.

**115.** Sebrê bikişîne, bêguman Xwedê xelata qencîkarên rast û durist winda nake.

**116.** De bila di dewrên beriya we de zanayên xwedanbîr û bawer hebûna da ku li ser erdê xerabî bidana paş, lê belê ji hindikên ku me (ew ji kufrê) reha kirin pê ve (kesî ew nekir). Ew ên sitemkar jî li dûv xweşiya xwe çûn û ew her gunehkar bûn.

**117.** Xwedayê te ne ew e ku bajaran bi neheqî ji holê rake digel ku xelkê wan çaksaz bin.

---

1 Li gorî ji sehabiyan hatiye ragihandin, di Qur'anê de ayeteke bi qasî vê zor û bi jan ji Pêxember re daneketiye. Pêxember (s) wisa ferman kiriye: „Sûreyê Hûd ez pîr kirim!" Lewra di vî sûretî de ji wî re hatibû gotin: "Wekî ku emir li te hatiye kirin xwe rast û durist bike!" Belê ev ne karekî hêsan bû. Xwedê ne li Pêxember bi tenê, digel wî emrê xwerastkirinê li bawermendan jî dike.

**118.** Eger Xwedayê te bixwesta dê mirov tev bikirina yek umet, (lê) ew ê her di îxtilafê de bin…

**119.** Ji bilî ew ê ku Xwedayê te lê hatibe rehmê. Jixwe Xwedayê te ji bo vê (ixtîlafê) ew afirandine. Fermana Xwedayê te hate cih; bêguman ez ê dojehê ji mirov û cinan dagirim!

**120.** (Resûlê min!) Em ji hewadîsên pêxemberan ji te re dibêjin da ku em pê dilê te rihet bikin. Di van (qiseyan) de ji te re heqî hat û ji bawermendan re jî şîret û bîranîn e.

**121.** Ji wan ên ku bawerî nayînin re bibêje: Çi ji destên we bê bikin! Çi pêwîst be, em ê jî wê bikin!

**122.** Çavnêriyê (li encama karên xwe) bikin! Bêguman em jî dê çavnêriyê bikin.

**123.** Zanîna nependiya erd û asîmanan bes li cem Xwedê ye. Her kar û bar dê lê vegerin. Nexwe îbadetê Wî bike û xwe bispêre Wî. Bêguman Xwedayê te ji kar û kiryarên ku hûn dikin ne bêagah e.

## 12. SÛREYÊ YÛSUF

Sûreyê Yûsuf 111 (sed û yanzdeh) ayet e. Ayeta 1ê, ya 2ê û ya 3ê li Medînê, yên din jî li Mekkê nazil bûne. Sûre ji ber ku behsa Yûsuf Pêxember dike, jê re “Sûreyê Yûsuf” hatiye gotin.

*Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm*

**1.** Elîf, Lam, Ra. Ev ayetên kitêba (ku hukmê wê) ronak in.

**2.** Me ev Quran bi zimanê erebî hinartiye da ku hûn têbigihîjin.

**3.** (Resûlê min!) Em bi peyamkirina vê Quranê bi bal te ve (serpêhatiyên miletên berê) bi spehîtirîn awayî ji bo te dibêjin. Hal ev e ku beriya ev (Quran ji bo te) bê, bi rastî tu (ji van serpêhatiyan) ji bêagahan bûyî.

**4.** Dema Yûsuf ji bavê xwe re got: Bavê mino! Min (di xew de) dît ku yazdeh stêr, roj û heyv ji bo min diçûn sicûdê.

**5.** (Bavê wî) Got: Kurikê mino! Zinhar xewna xwe ji birayên xwe re nebêje, vêca ew ê li te dek û fendan bikin! Bêguman şeytan ji bo mirovan dijminekî aşkera ye.

**6.** Her wiha Xwedayê te dê te (ji bo pêxemberiyê) hilbijêre, dê ravekirina xewnan hînî te bike û wekî ku hê berê qenciya xwe li ser kalên te Îbrahîm û Îshaq temam kirî, dê nîmetê xwe li ser te û li ser kinêsa (zuriyeta) Yaqûb jî temam bike. Bêguman Xwedayê te zana ye, karbinecih e.

**7.** Sond be, di (qiseya) Yûsuf û birayên wî de ji bo pirsyarkeran pir nîşan hene.[1]

**8.** Wê demê (birayên Yûsuf) gotin: Yûsuf û birayê xwe li cem bavê me, ji me

1 Zanayên cihûyan, ji bo ku Pêxember bêçare bihêlin ji giregirên muşrikên Mekkê re gotin: Ji Muhemmed bipirsin ka ji bo çi Îsraîlî çûne Misrê û binêrin dê çi bersivê bide? Wan jî ev yek ji

xwoşevîstir in. Hal ev e ku em desteke xurt û hêzdar in. Bavê me (bi vê yekê) di şaşiyeke aşkera de ye.

**9.** (Biran di navbera xwe de gotin:) Yûsuf bikujin an jî wî bavêjin erdeke dûr, bavê we dê tenê ji bo we bimîne! Piştî wî hûn ê bibin civateke çak.

**10.** Yekî ji wan got: Yûsuf mekujin, eger hûn divên tiştekî pê bikin wî biavêjin binê bîrekê ku ji karwanan hin wî ji xwe re bigirin.

**11.** (Piştî ku planên xwe girêdan hatin cem bavê xwe) Gotin: Bavo! Ji bo çi li ser Yûsuf baweriya te bi me nayê, digel ku bi rastî jî em jê re xêrxwaz in!

**12.** Sibehê wî digel me bişîne (çolê) da bixwe, vexwe û bileyîze, bêguman em ê wî biparêzin.

**13.** (Bavê wan) Got: Bi rastî ev min xemgîn dike ku hûn wî bi xwe re bibin. Ez ditirsim ku demekê haya we jê nemîne vêca gur wî bixwin.

**14.** (Jê re) Gotin: Sond be, eger gur wî bixwe û em jî (li hawirdora wî) desteke xurt û bihêz bin, nexwe hingê bi rastî me xesar kiriye.

**15.** Dema ew birin, bi tifaq biryar dan ku wî biavêjin binê bîrê. Me peyam jê re şand (û me jê re got:) Sond be ku tu dê vê kirina wan (rojekê) ji wan re bibêjî û (wê çaxê) ew nizanin (ku tu Yûsuf î).

**16.** Di dema eşayê de hatin cem bavê xwe, digirîyan.

**17.** Gotin: Bavo! Em çûbûn çolê me bi hev re pêşbazî dikir. Me Yûsuf jî li cem tiştên xwe hiştibû, (mixabin) guran ew xwar! Lê belê çiqas em rastgo bin jî tu ji me bawer nakî.

**18.** Wan xwîneke ji derewan li kirasê (gomlekê) Yûsuf dan û wan ew anî cem bavê xwe. (Yaqûb ji wan re) Got: Nexêr, ne wisan e, belkî nefsa we karekî xerab ji bo we xemilandiye. Vêca sebirkêşiya min dê sebireke rind be û li ser vê ya hûn dibêjin jî bes ez arîkariyê ji Xweda dixwazim.

**19.** Karwanek hat, vêca wan avkêşê xwe şand ser bîrê, wî jî dewla xwe berda bîrê (gava dewla xwe kişand û Yûsuf di dewlê de dît) Got: Wey li vê mizgîniyê, va ye lawikek! Wan Yûsuf wek pertalekî bazirganiyê veşart (da ku bi koletî bifiroşin). Hal ev e ku Xwedê bi ya ku wan dikir baş dizane.

**20.** (Dema karwan gihişt Misrê) Wan Yûsuf bi nirxekî hindik, bi çend dirheman firot û dilê wan li serê jî nebû.

**21.** Ew ê ku Yûsuf li Misrê kirî (ku ew ezîzê Misrê bû) ji pîreka xwe re got: Qedrê wî bigire, rind lê binêre belkî feydeya wî li me bibe, yan jî em wî ji xwe re bi kurînî bigirin. Bi vî awayî me Yûsuf li erda (Misrê) niştecih kir da ku em wî hînî ravekirina xewnan bikin. Xwedê li ser her karê xwe desthilatdar e, lê belê pirên mirovan (vê) nizanin.

**22.** Dema Yûsuf (ji aqil û hêzê ve) giha kemala xwe, me pêxemberî û zanîn dayê û her bi vî rengî em qencîkarên rast û durist xelat dikin.

---

Pêxember pirs kir, vêca Xwedê ev sûreyê Yûsuf jê re nazil kir. Lewra aktorê vê qissetê Yûsuf pêxember e. Di qisseta wî de gelek ders û ibret ji pirsyarker û me musilmanan re hene.

**23.** Ew pîreka ku Yûsuf di mala wê de, daxwaz ji Yûsuf kir da dest biavêjê. Derî hemû lê girtin û jê re got: “De haydê were!” Yûsuf, jê re got: “Ez xwe bi Xwedê diparêzim. Bêguman malxweyê te xwendê (sergêrê) min e, qedrê min rind girtiye (ez nikarim di bara namûsa wî de xayîntiyê pê re bikim). Bi rastî sitemkar bi ser nakevin.

**24.** Pîrekê ew kire dilê xwe û qesda wî kir, ji ber ku Yusuf nişana perwerdegarê xwe dît, wî ew nekire dilê xwe û qesta wê nekir. Me ayet nîşanî wî dan; da ku em wî ji xerabî û dawpîsiyê dûr bigirin. Bêguman ew ji bendeyên me yên bijare ye.

**25.** Herdu ber bi derî ve beziyan. Pîrekê ji paş ve kirasê wî kêşa û dirand, li cem derî rastî mêrê pîrekê hatin. Pîrekê ji mêrê xwe re got: Ma cezayê ew ê ku bixwaze neqenciyê bi ehlê te bike, ji bilî avêtina zîndanê yan jî îşkenceyeke bijan pê ve çi ye?

**26.** (Yûsuf) Got: Naxêr, wê ez daxwaz kirim bal xwe ve. Yekî ji lêzimên pîrekê wiha şahidî da; eger kirasê wî ji pêş ve hatibe dirandin, pîrekê rast gotiye; ew ji derewînan e.

**27.** Na, eger kirasê wî ji paş ve hatibe dirandin, pîrekê derew kiriye; ew ji rastgoyan e.

**28.** Vêca çi dema (mêrê wê) dît ku wa ye kirasê wî ji paş ve hatiye dirandin. (Ji pîreka xwe re) Got: Bi rastî ev fend û fûtên we ne. Bêguman fend û fûtên we jinan mezin in.

**29.** (Zilamê pîrekê got:) Ey Yûsuf! Dev ji vê (meseleyê) berde (û ji tu kesî re nebêje. (Ji pîreka xwe re jî got:) Tu jî lêborîna gunehên xwe bixwaze, bêguman tu ji gunehkaran î.

**30.** Hin pîrekên li bajêr gotin: Jina serwerî xizmetkarê xwe bi bal xwe ve daxwaz dike, bi rastî jî evîna wî perda dilê wê qetandiye! Bêguman em wê di rêşaşiyeke aşkera de dibînin.

**31.** Vêca çi dema (pîreka Ezîzî) bihîst ku seba wê dikin, ji wan re (qasidek) şand, ji wan re balgeh amade kirin. Her yekê ji wan jî kêrek da destê wan, got: De derkeve pêşberî wan. Êdî gava çavên wan bi Yûsuf ket, (di çavê xwe de ew) mezin û bênumûne dêran, (hay ji xwe neman û) destên xwe birîn û gotin: Haşa ji Xwedê, ev ne beşer e, hebe nebe ev ferîşteyekî birûmet e!

**32.** (Dema pîreka Ezîz ev rewşa jinikan dît, ji wan re) Got: Ha ev e, ya ku der barê wî de we gazind ji min dikir. Belê min ew bi bal xwe ve daxwaz kir, lê wî xwe da paş (û qebûl nekir). Sond be, eger ew a ez jê dixwazim neke, teqez ew ê bê zîndankirin û ew ê rezîl û riswa bibe.

**33.** (Yûsufî) Got: Xwedayê min! Zîndan ji min re ji gaziya ku ew li min dikin çêtir e. Eger tu hîlebaziyên wan ji min venegerînî, dilê min dê xwe bide rexê wan û ez ê bibim ji nezanên gunehkar.

**34.** Xwedayê wî, duaya wî qebûl kir û hîlebaziya wan ji ser wî da alî. Bêguman Xweda, her ew e yê bihîzer ê zana.

**35.** Paşê ji bo wan (karbidestan) diyar bû –piştî nîşanên vebirî dîtin- ku Yûsuf

bêguneh û bêrî ye, (ya baş ew e) heta demekê bê zîndankirin (ji bo rê li ber gotinên xelkê bigirin û şerma xwe jî pê veşêrin).

**36.** Digel wî du xortên din jî ketine zîndanê. Yekî ji wan got: Min di xewna xwe de dît ku min tirî diguvaşt û şerab çêdikir. Yê din jî got: Min jî dît nan li ser serê min bû û teyran jê dixwar. De ka şîroveya wê ji me re bibêje, bi rastî em te baş û xweşmirov dizanin.

**37.** (Yûsuf) Got: Beriya xwarina ku hûn dixwin ji bo we bê, teqez ez ê şîroveya wê ji we re bibêjim. Ev şîrovekirin ji wê zanîna ku Xwedayê min hînî min kiriye. Bêguman min dev ji ola miletekî berdaye ku bawerî bi Xweda nayînin û ew bi xwe bi axretê jî bêbawer in.[1]

**38.** Min daye pey dînê bavên xwe, Îbrahîm, Îshaq û Yaqûb. Ji bo me ne mimkun e em tiştekî ji Xwedê re bikin hemkûf. Ev li ser me û li ser mirovan kerema Xwedê ye. Lê belê pirên mirovan şukrê Xwedê nakin…

**39.** (Yûsuf got:) Gelî hevalên min ên zîndanê! Erê, ma ew îlahên ji hev belav û cuda çêtir in yan ew Xwedayê yek û tek, ew ê ku her tişt ji bo mezinatiya xwe tewandiye?

**40.** Ew ên ku hûn di şûna Xwedê de wan dihebînin, bes hin nav in ku (ji nezanîn ve) we û bavên we ew bi nav kirine (û ji bo xwe we ew kirine îlah). Xwedê jî der barê wan de tu delîl danexistiye. Desthilatî, bes a Xwedê ye, ferman li we kiriye ku hûn îbadetê Wî tenê bikin. Ev e, dînê rast û durist. Lê belê pirên mirovan (vê) nizanin.

**41.** Hevalên min yên zîndanê! (Herçî xewnên we ne), yek ji we (her wekî berê, dîsa) dê bibe meygerê xwendê xwe. Herçî yê din e, ew jî dê bi darê ve bê daleqandin û teyr dê ji (mêjiyê) serê wî bixwin. Ew xewna ku der barê wê de we şîrove ji min dixwest bi dawî hat (û weke min gotî ew ê were cih).

**42.** (Yûsuf,) ji herduyan, ji yê ku yeqîn zanîbû dê (ji zîndanê) bê berdan re got: Li cem xwendê xwe min di bîr bîne, (jê re bibêje: Ciwanek bi neheqî ketiye zîndanê. Belkî min ji zîndanê serbest berde). Lê belê şeytên, ji bîra wî bir ku ew behsa Yûsuf li cem xwendê xwe bike. Ji ber vê yekê (Yûsuf) çend salên din jî di zindanê de ma.

**43.** Melikê Misrê got: Min (di xewna xwe de) heft çêlekên qelew dîtin ku heft çêlekên qels ew dixwarin û min heft sinbilên hêşîn û heft sinbilên hişk dîtin. Gelî giregiran! Eger hûn xewnan şîrove dikin de ka xewna min jî ji min re şîrove bikin.

**44.** (Şîrovekaran) Gotin: Ev (xewna te), xewnerojk in (xewnên bêwate ne). Em şîroveya xewnên welê nizanin.

**45.** Ji herdukan ew ê ku (ji zîndanê) xelas bûyî, piştî demeke dirêj (Yûsuf) di bîra

1 Yûsuf xwest ji rewşa xortan îstîfade bike û dînê heq ji wan re bide zanîn. Beriya ku tabîra xewna wan bibêje ji wan re ragihand ku ew li ser dînê heq e, zanîna wî, ji cem Xwedayê wî jê re hatiye. Xelkê Misrê jî di rêya şaş de ne, yanî pêşgotinek amade kir û dînê heq ji wan re got. Ha ev ayet û her sê ayetên li dûvê di bara vê yekê de ne.

xwe anî û got: Ez ê şîroveya wê (xewnê) ji bo we bibêjim, vêca min bişînin (zîndanê).

**46.** (Meyger, hate cem Yûsuf û jê re got:) Ey Yûsuf! Hey mirovê rastgo! De ka di bara heft çêlekên qelew de ku heft çêlekên qels wan dixwarin û di bara heft sinbilên hêşîn û heft sinbilên hişk de (vê xewnê) ji me re şîrove bike. Ez hêvîdar im (bi şîroveya te ya rast) li mirovan vegerim da ku ew jî hînî rastiyê bibin.

**47.** (Yûsuf) Got: Wekî adetên xwe, heft salan li pey hev dexlê biçînin piştre -ji bilî hinekî ku hûn dê bixwin - ya ku we çinî di sinbilên wê de bihêlin.

**48.** Piştre, li dûv van (heft salên firehiyê) dê heft salên dijwar û tengî bên, ji bilî hindikê ya ku ji bo tov we hilaniye, hûn dê ya ku we ji bo wan (salên xelayê) dayî hev bixwin.

**49.** Piştre, li dûv van (heft salên bi tengasî) saleke wisa dê bê ku arîkariya mirovan (bi baranê) dê bê kirin û ew di wê salê de (mêweyan ji piranî) dê biguvêşin (û ji bo xwe şerbet û şîleyê wergirin).

**50.** (Dema meyger, ji wan re ev şîrove anî) Melik got: Ka Yûsuf ji min re bînin. Çi dema qasid(ê Melik) hat cem Yûsuf, (Yûsufî, jê re wiha) got: Li xwendê xwe vegere û jê bipirse: Rewşa wan pîrekên ku destên xwe birîbûn çi bû? Bêguman Xwedayê min hîle û pîleyên wan dizane.

**51.** (Vêca Melik, gazî wan jinan kir û ji wan re) Got: Rewşa we çi bû, dema we Yûsuf bi bal xwe ve daxwaz kir? (Ma we xerabiyek jê dîtibû?) Jinan got: Ji bo Xwedê ew ji vê bêrî ye! Me tu xerabî jê nedîtiye. Pîreka Ezîz got: Ha vêga rastî derket meydanê; min ew daxwaz kiribû û ew bêrî ye û bi rastî ew ji rastgoyan e.

**52.** (Yûsuf got:) Ev (daxwaza min a beraetê) ji bo vê ye da ku serwer bizane ku min li pişt wî xayîntî lê nekiriye. Bêguman Xwedê hîleya xayînan bi ser naxe.

**53.** (Pîreka Ezîz got:) Ez nefsa xwe bêrî nakim, birastî nefs zêde xerabîxwaz e, belê yê ku Xwedayê min lê hatibe rehmê û ew parastibe, ew cuda ye. Bêguman Xwedayê min gunehjêbir e, dilovîn e.

**54.** Melik got: Yûsuf ji min re bînin da ku ez wî ji xwe re bikim (şêwirmendekî) taybet. Vêca dema Melik bi Yûsuf re peyivî, jê re got: Îro, tu li bal me xwediyê cihekî bilind î û tu mirovekî pêbawer î.[1]

**55.** (Yûsuf jê re) Got: Min deyne ser gencîneyên Misrê, bi rastî ez mirovekî emîn û parêzkar im.

**56.** Bi vî awayî me, Yûsuf li axa Misrê, li cihê ku wî xwest bi cih kir, em kê bivên rehma xwe digihînin û em qet jî perûya qencîkarên rast û durist winda nakin.

**57.** Ji bo yên ku bawerî bînin û ji Xwedê bitirsin, perûya axretê hê çêtir e.

1 Melik xwest, ew bi xwe şîroveya xewna xwe ji Yûsuf bibihîze, wî jî tabîra xewna wî jê re got. Melik ji Yûsuf pirsî; divê em çawa tedbîra xwe bistînin. Yûsuf got: Di salên ku rehm dibare de dexlê pir biçîne û berê wê stok bike, hilîne. Her wiha di salên xelayê de tê hem xwe xwedî bikî hem jî tê bifiroşî welatên din û xezîneya xwe tije dirav bikî. Melik jê re got: Erê baş e, lêbelê dê kî vî karî bike? Bersiva vê pirsê ayeta tê ye.

**58.** Birayên Yûsuf hatin û çûne balê, vêca wî ew nas kirin. Lê belê wan ew nas nedikir.

**59.** Dema Yûsuf barê wan dagirt, (ji wan re) got: Eger hûn careke din bên birayê xwe yê ji bavê jî ji min re bînin, ma hûn nabînin ku ez pîvanê tam tije dikim û ez çêtirîn mêvanhewîn im.

**60.** Eger hûn wî neyînin cem min, êdî ji bo we li cem min pîvanek tune û nêzî min nebin!

**61.** Jê re gotin: Em ê wî ji bavê wî bixwazin, bêguman em ê vê bikin.

**62.** (Yûsuf) ji xizmetkarên xwe re got: Sermiyanên wan jî bixin nav barên wan, dibe ku dema vegerin bal malbata xwe wê nas bikin û careke din jî dîsa wê vegerin.

**63.** Dema li bavê xwe vegeriyan jê re gotin: Bavo! Em (ji îro pê ve) ji pîvanê hatine bêparkirin, vêca birayê me jî digel me bişîne da ku em bi xêra wî heqê xwe bipîvin û bistînin. Bêguman em ê wî biparêzin.

**64.** (Yaqûbî ji wan re) Got: Hê berê, der barê birayê wî (Yûsuf) de çi qas li we ewle bûbim, der barê vî de jî bes ew qas ez ê li we ewle bibim! Ji ber vê yekê (ez wî dispêrim Xwedê û bes). Vêca Xweda çêtirîn parêzkar e û dilovantirînê dilovanan e.

**65.** Dema pertalên xwe vekirin, dîtin ku wa ye sermiyanê wan li wan hatiye vegerandin, gotin: Bavê meyo! Ma em ji vê bêhtir êdî çi dixwazin! Va ye sermiyanê me jî li me hatiye vegerandin. (Bi wî sermiyanî dîsa) em ê ji xelkê xwe re xwarinê bînin, em ê birayê xwe biparêzin û em ê barê deveyekê li xwe zêde bikin, bînin. Ev bar (li cem Melik) pîvaneke hêsan e.

**66.** (Yaqûb) Got: Ez wî (Bunyamîn) digel we naşînim heta ku hûn li ser navê Xwedê peymaneke saxlem û asê nedin min ku teqez hûn ê wî ji min re bînin. Ji bilî ku dor li we bê girtin (hûn bêçare bimînin) ew rewş cuda ye. Gava ew peymana ku ji wan xwestibû wan dayê, (Yaqûbî) got: Xwedê li ser ya ku em dibêjin agahdar û wekîl e.

**67.** Piştre wiha got: Gelî kurên min! Hûn tev di deriyekî de nekevin (Misrê), di deriyên ji hev cuda re têkevinê. Lê belê ez nikarim a ku Xwedê ji bo we nivîsiye ji ser we bidim alî. Lewra hukm û ferman tenê yê Xwedê ye. Ji ber vê yekê min tenê xwe spartiye Wî û vêca bila xwespêr her xwe bispêrin Wî.

**68.** Her wekî bavê wan li wan şîret kirîye ketin hundir -ev tedbîr nebû ku tiştekî ji teqdîra Xwedê ji ser wan bide alî- bes daxwazek bû di dilê Yaqûb de ji dilê xwe deranî. Bêguman Yaqûb, xwediyê zanîneke (dorfireh) bû ji wê zanîna me dayê, lê belê pirên mirovan vê nizanin.

**69.** Dema çûne cem Yûsuf, wî birayê xwe (Bunyamîn) anî cem xwe û jê re got: Ez birayê te me (ez Yûsuf im), ji ber ya ku (bi me) kirin, xemgîn mebe.

**70.** (Yûsuf) gava barên wan dagirtin û amade kirin, tasa xwe ya avê xiste nav barê birayên xwe! Piştî (karwanî hereket kir) bangdêrekî gazî kir û got: Gelî karwaniyan! (Rawestin) bi rastî we dizî kiriye.

**71.** (Birayên Yûsuf) Berê xwe dane wan û ji wan re gotin: Ma we çi tiştê xwe winda kiriye?

**72.** (Mirovên Melikî) Gotin: Me tasa Melikî ya avê winda kiriye, ji bo kesê ku wê bîne barê deveyekî (bexşîş) heye, ez jî kefîlê vê me.

**73.** Gotin: Em sond dixwin bi Xwedê ku hûn jî dizanin em nehatine vê derê ku li ser axa (Misrê) tevdanê derxin û em ne dizek in jî.

**74.** (Mirovên Melikî) Gotin: Baş e ku hûn derewîn bin (û we ew dizî be), cezayê wê (kirina we) çi ye?

**75.** (Birayên wî) gotin: Cezayê wê, li wî tê birîn ew ê ku tiştê winda di barê wî de bê dîtin. Ha cezayê wî, ew e ku dest li ser wî bê danîn, her wisa em ceza li zaliman dibirin.[1]

**76.** Vêca Yûsuf, beriya barê birayê xwe, dest bi teftîşa barên wan kir, piştre jî tas ji barê birayê xwe deranî. Bi vî awayî me ev kar hînî Yûsufî kir (da bigihîşta ya ku wî dixwest). Wî nedikarî li gorî qanûna Melik birayê xwe li cem xwe ragirta ji bilî ya ku Xwedê bivê. Em kê bivên, mertebeya wî bilind dikin. Bi rastî di ser her zanayekî re yekî jê zanatir heye.

**77.** (Birayên wî) Gotin: Eger wî dizî kiribe, bi rastî birayekî wî jî hê berê dizî kiribû. Yûsuf ev (bêbextiya wan) di dilê xwe de veşart, ji wan re aşkera nekir, got: Kes ji we xerabtir nîn e! Xwedê bi ya ku hûn dibêjin bêhtir dizane.

**78.** Gotin: Ey Ezîz! Bi rastî bavekî wî yê kal û mezin heye (hedana xwe bi wî tîne). De di şûna wî de yekî ji me bigire. Bi rastî em te ji qencîkarên rast û durist dibînin.

**79.** Got: Ez bi Xwedê xwe diparêzim, di şûna yê ku me tasa xwe di barê wî de dîtî ku yekî din em bigirin; bi rastî em wê çaxê dibin ji sitemkaran.

**80.** Dema ji Yûsufî hêviya xwe birîn, bi pistepist xwe kişandin kêlekekê (û şêwra xwe kirin) mezinê wan got: Ma hûn nizanin ku bavê we bi Xwedê ji we peymaneke saxlem wergirt (ku hûn ê kurê wî lê vegerînin) û hê berê jî der barê Yûsuf de kêmasiya ku we kirî (hê ji bîra wî neçûye). Vêca ez bi xwe, dê ji vê erdê neyême der heyanî ku bavê min destûrê nede min, an jî Xwedê ji bo min (bi rehabûna birayê min) biryar nede û Xwedê çêtirînê hukimdaran e.

**81.** Hûn vegerin cem bavê xwe û jê re bibêjin: Bavo! Kurê te dizî kiriye. Bes tişta me bi çavê xwe dîtiye em ji te re dibêjin. Em ya di pişt perdê de jî nizanin.

**82.** (Eger tu bawer nekî) Ji wî welatê ku em lê bûn û ji wî karwanê ku em pê re hatin, bipirse. Bi rastî jî em rast dibêjin.

**83.** (Bavê wan) Got: Na! Nefsa we ji we re karekî wiha xweşik nîşan da û we jî kir. Dîsa ya qenc sebreke bi rindî ye. Hêvî heye ku Xwedê wan bi hev re ji min re bîne. Bêguman her ew e, yê zana, yê karbinecih.[2]

---

1 Li gorî Şerî'eta Yaqûb, mirovê ku dizî bikira cezayê wî ew bû ku dihat girtin û ji ber malê diziyê salekê ji xwediyê mal re koletî dikir. Li gorî qanûnên Misrê jî dar li diz dihatxistin û du caran bi qasî malê ku diziye jê dihat standin. Yûsuf xwest li gorî şerî'eta bavê wan, ceza bide wan.

2 Birayên Yûsuf ji ber ku berê ji bavê xwe re derew kiribûn, bavê wan nexwest vê carê ji rastiya wan

**84.** (Yaqûb) berê xwe ji wan vegerand, keserek kişand û got: Ax ji bo kul û kovanên Yûsuf! Ji ber xema (Yûsuf) spîkê avête ser herdu çavên wî (êdî pê nedidît), vêca kerba xwe di dile xwe de hişt.

**85.** (Zarokên wî jê re) Gotin: Sond bi Xwedê, tu her Yûsuf bibîr tînî, heta ber bi helakê ve biçî yan jî tu dê (ji kerba Yûsuf) bimirî.

**86.** (Yaqûb) Got: Bi rastî ez derd û kovanên xwe tenê hewaleyî Xwedê dikim. Tiştê ez ji Xwedê dizanim hûn nizanin.

**87.** Kurên mino! Herin rind li Yûsuf û birayê wî bigerin. Hêviya xwe ji rehma Xwedê qut nekin, bêguman ji desteka kafir pê ve tu kes ji rehma Xwedê bêhêvî nabe.

**88.** (Vêca li ser vê şîreta bavê xwe vegeriyan Misrê) gava çûne bal Yûsuf, jê re gotin: Ey serwer! Birçîbûnê dest daniye ser me û xelkê me, me sermiyanekî nehêja ji te re anî (û em hatine), êdî (bi vî sermiyanî) bi qasî ku têrî me bike, bi ya temam ji bo me bipîve û qenciyekê bi me bike (birayê me bide me), bêguman Xwedê dê xelata xêrkeran bide wan.

**89.** (Yûsuf, ji wan re) Got: Ma qey wextê hûn nezan bûn, hûn dizanin we çi bi serê Yûsuf û birayê wî kir?

**90.** (Birayan jê re) Gotin: Erê, ma bi rastî tu Yûsuf î? Got: (Belê), ez Yûsuf im û ev jî birayê min e. Xwedê kerem bi me re kir (ku em gihandin cem hev). Bêguman rewş ev e, kî (ji Xwedê) bitirse û sebrê bikêşe, vêca Xwedê teqez perûya qencîkaran winda nake.

**91.** (Birayên wî jê re) Gotin: Em bi Xwedê sond dixwin ku Xwedê tu di ser me re girtiye û bi rastî me der barê te de xeletî kiriye.

**92.** (Yûsuf, ji wan re) Got: Îro ez li we nagirim, Xwedê dê li gunehên we bibore, bêguman ew dilovantirê dilovanan e.

**93.** Vî kirasê min bibin bavêjin ser rûyê bavê min, çavên wî dê ronî bibin û malbata xwe tevî bînin cem min.

**94.** Dema karwan (ji Misrê) derhat, bavê wan (ji yên li cem xwe re) got: Eger hûn ji min re nebêjin, te ji pîrîtî aqilê xwe winda kiriye û tu nizanî çi dibêjî, bawer bikin ku bêhna Yûsuf tê min.

**95.** (Wan jî, jê re) Got: Em bi Xwedê sond dixwin ku tu hê jî di wê şaşiya xwe ya berê de yî.

**96.** Dema mizgînber hat, kirasê Yûsuf avêt ser rûyê Yaqûb, çavên wî ronî bûn. (Yaqûb ji wan re) got: Ma, min ji we re negotibû ez (bi wehya) ji cem Xwedê tiştê hûn nizanin ez pê dizanim?

**97.** (Zarokên wî, jê re) Gotin: Hey bavê me! Lêborîna gunehên me ji Xwedê bixwaze! Bi rastî em di şaşiyê de bûn.

---

bawer bike û ji wan re wiha got: Na, nefsa we ji we re karekî wiha spehî nîşan daye, heke ne wiha be, ezîz ji ku dizane ku li gorî şerî'eta me cezayê diz ev e ku wek dîl were girtin?

98. (Yaqûb, ji wan re) Got: Ez ê lêborîna gunehên we ji Xwedayê xwe bixwazim. Bêguman Xweda gunehjêbir e, dilovîn e.

99. Gava (tev bi hev re) çûne cem Yûsuf, wî dê û bavê xwe hembêz kirin û got: Bi destûra Xwedê, bi ewlehî têkevin (Misrê).

100. Dê û bavê xwe deranîn ser text, (li tenişta xwe) ew rûnandin. Tevekan jê re xwe nizim kir. (Yûsufî) got: Ey bavê mino! Ha ev e, şîroveya wê xewna ku berê min dîtibû. Xwedayê min ew anî cih. Bêguman Xwedayê min qencî li min kir ku ez ji zîndanê deranîm, piştî ku şeytên navbera min û birayên min xera kir, hûn ji çolê anîn cem min. Bêguman Xwedayê min kê bivê keremê lê dike. Bêguman Xwedê, her ew e yê zana, yê karbinecih.

101. Xwedayê min! Te mulk (serwerî) da min, te şîroveya rûdanên ku (di xewê de têne dîtin) hînî min kir. Ey afirînerê erd û asîmanan! Li dinya û axretê her Tu yî xwedî û piştevanê min. Min li ser dînê îslamê bimirîne û min bigihîne xweşmirovan.

102. (Resûlê min!) Ha ev qiseya Yûsuf ji serpêhatiyên xeybî ne ku em wê ji te re wehî dikin. Bêguman dema wan biryara karên xwe didan û planên xwe dikirin tu ne li cem wan bûyî (heta ku tu vê bizanî).

103. Çendî tu bivê dîsa pirên mirovan baweriyê nayînin.

104. Hal ev e ku tu ji ber ragihandina vê (Quranê) tu heqekî ji wan naxwazî. Ev Quran ji temamî xelkê re bes şîret û dibîranîn e.

105. Li erd û asîmanan çiqas nîşanên Xwedê hene ku ew di ber wan re diborin, wan dibînin û berê xwe ji wan vedigerînin.

106. Piraniya wan, bes bi awayê ku ji Xwedê re hevpişkan çêkin bawerî pê tînin.

107. Ma ew ji hatina ezabê Xweda ku wan tevan bide ber xwe, yan jî ji rabûna qiyametê ji nişka ve -bêyî ku haya wan jê çêbe- ewle bûne?

108. (Resûlê min! Ji wan re) Bibêje: Ha va ye riya min, ez (xelkê) vedixwînim dînê Xwedê, ez û ew ên ku li pey min tên, li ser riyeke ronak in, em Xwedê (ji hevpişkan) pak didêrin û ez ne ji muşrikan im.

109. Me berî te ji xelkên bajaran, bes ji mêran re wehî şandiye. Ma (kafir) hîç li erdê nagerin ku bibînin encama wan (înkarkerên) beriya wan çawa bûye? Mala axretê teqez ji bo wan ên ku xwe (ji gunehan) diparêzin çêtir e. Ma hûn hê jî aqilê xwe bi kar nayînin (ku êdî hûn bawerî bînin)?!

110. Dema pêxember ji bawerîanîna gelê xwe bêhêvî bûn û hizir kirin ku ew ji berê gelê xwe ve hatine derewandin, hingê arîkariya me ji wan re tê. Vêca em kê bivên wî (ji belayê) rizgar dikin. Bêguman ezabê me ji ser desteka gunehkar nayê zivirandin.

111. Sond be, di qiseyên wan (pêxemberên ku borîn û umetên wan de û di serpêhatiya Yûsuf û birayên wî) de ji xwedanhişan re pir ders û îbret hene. (Ev Quran) nîn e ku axaftineke lêanînî be; belê ew kitêbên beriya xwe rast didêre, ji her tiştî re diyarker û ronîker e û ji bo yên bawerî tînin re, rêber û rehmet e.

# 13. SÛREYÊ RE‘D

Sûreyê Re’d 43 (çil û sê) ayet e. Li Medînê daketiye. Ji ber ku di ayeta 13an de bêjeya Re‘d boriye ku ew bi mehneya teqereqa birûskê tê, jê re Sûreyê Re’d hatiye gotin.

*Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm*

1. Elîf, Lam, Mîm, Ra. Ev ayetên kitêbê ne û ya ku ji Xwedayê te ji bo te hatiye hinartin heq e, lêbelê pirên mirovan îmanê nayînin.

2. Ew ê ku asîman bêsitûn (bi awayê) ku hûn dibînin bilind kirin Xwedê ye, paşê li ser Erşê hukimraniyê raser bû; roj û heyv (ji vîna xwe re) stûxwar kirin ku her yek ji wan heyanî demeke diyarkirî di çerxa xwe de digere. Xwedê, kar û barê xwe, milk û desthelatiya xwe bi rê ve dibe, nîşanên yekîtî û qudreta xwe berfireh ronî dike, da ku hûn bi çûyina hizûra Xawedayê xwe ji dil bawerî bînin.

3. Ew Xwedayê ku erd raxistiye û çiyayên asê, robarên herikbar û ji her texlîtê mêweyan du cot tê de afirandine, şevê diavêjê ser rojê û rojê pê dinixumîne. Bêguman di van de ji bo civateke ku bifikirin, nîşan hene.

4. Li erdê parzemînên hevcîran, rezên tirî, çandinî, xurmeyên yekkok û kokcuda hene, ev tev bi yek avê têne avdan, di xwarina wan de em hinekan ji hinan çêtir digirin. Ha di van de jî ji bo civateke ku bifikire, nîşan û ders hene.

5. Eger tu (ji bêbaweriya wan) bimînî ecêbmayî, vêca ecêba mezin ev gotina wan e; ma gelo rast e piştî ku em dibine ax em ê ji nû ve bêne afirandin? Ha ew in ên ku Xwedayê xwe mandel dikin û ew in ên ku (roja qiyametê) zincîr di stûyên wan de ne û ew xelkên êgir in, ewê her û her tê de bimînin!

6. (Ya Muhemmed!) Ew, beriya xweşiyê leza ezab li te dikin. Hal ev e ku beriya wan, gelek ezabên ku ji wan îbret bêne girtin hatine û derbas bûne. Bêguman digel ku mirov zilmê li xwe dikin jî, Xwedayê te ji bo wan bexşîner e û bêguman Xwedayê te ezabê wî pir dijwar e.[1]

7. Ew ên ku kafir bûne dibêjin: De bila ji Xwedayê wî mucîzeyek jê re bihata xwarê! (Ey Muhemmed) Bêguman tu bes hişyarkerî û ji bo her miletekî vexwînerê hidayetê heye.

8. Her mê ka çi berî hildigire û her malzarok ka çi berî diavêje û çi jî diwelidîne her Xweda pê dizane û li cem wî her tişt bi endaz e.

9. (Ew Xweda) Zanayê ya nependî û darîçav e, ew ê şanmezinê şanbilind e.

10. (Naxwe li cem Xwedê) wekhev e, kî ji we di dilê xwe de gotina xwe veşêre û kî jî aşkera bike û kî ji we xwe bi şev veşêre û kî jî bi roj di riya xwe de here (her Xwedê pê dizane).

11. Ji însên re li pêşiya wî hin ferîşte hene ku wî dişopînin û bi fermana Xwedê wî

1 Muşrikên Mekkê wiha gotin: Xwedêyo! Heke ev Qur’an heq be û ji nik te hatibe, ji banî ve keviran li me bibarîne yan jî ezabekî jandar bide me. Vêca ayet jî işaretî vê gotina wan dike û wiha îfade dike “di şûna ku ew hîdayet û xweşiyê bixwazin, ew ezabê ji te dixwazin.”

(ji belayê) diparêzin. Bêguman Xwedê rewşa (ser û berê) tu miletî naguhêre, qencî û kerema xwe ji ser wan nabire, heta ew ji cem xwe neguhêrin. Dema Xwedê ji bo miletekî ezabek an belayek xwest, êdî jê re tu veger tune ye û ji bo wan ji bilî Xwedê tu dost û arîkarek jî tune ye.

**12.** Ew ê ku di nav tirs û hêviyê de birûskê nîşanî we dide û ewrên giran (yên tije baran) diafirîne Xwedê ye.

**13.** Birûsk, digel pesindayînê Xwedê pak didêrin û ferîşte jî ji tirsa Xwedê Wî pak didêrin. Ew birûskan dişîne, vêca kê bivê bi birûskan li wan dide. Hal ev e ku ew (kafir), der barê (heyîn û qudreta) Xwedê de têdikoşin. Bêguman hêza Xwedê pir dijwar e.

**14.** Duaya rast û heq her ji Xwedê re ye. Ewên ku dua ji bilî Xwedê dikin duaya wan bi tu awayî nayê qebûlkirin, bes rewşa wan mîna rewşa wî kesî ye ku herdu destên xwe ber bi avê ve veke da ku av bigihîje devê wî û av wê negihîje devê wî. Bergerîna kafiran (ji pûtên wan) jî her wisa di ziyanê de ye.

**15.** Çi tiştê li erd û asîmanan heyî û siha wan jî, sibeh û êvaran, bivên nevên di bin biryar û fermanên Xwedê de ne.

**16.** (Ji muşrikan re) Bibêje: Ma kî ye perwerdegarê erd û asîmanan? Bibêje: Xwedê ye. Naxwe ma hûn ji bilî Wî (ji xwe re) dost û arîkaran digirin ku ew nikarin feydeyekê yan zerarekê bigihînin xwe? Bibêje: Ma yê kor û yê bi çav wekhev in? Ma tarîtî û ronahî wekhev in? Erê ma wan ji Xwedê re hin hevpişk gerandine ku wan hevpişkan wekî çêkirîyên Xwedê hin çêkirî afirandine, vêca ew çêkirî ji wan re bi hev şibiyane. Bibêje: Xwedê afirînerê her tiştî ye û ew e yê tek, yê desthilatdar.

**17.** (Meseleya heq û pûçîyê, meseleya hebandina Xwedê û hebandina pûtan wekî vê meseleyê ye;) Xwedê ji ewran baranek barand, vêca best û newal bi qasî tijîbûna xwe herikîn, êdî lehî çû û kefeke bilind digel xwe rakir û bir. (Meseleya din;) wekî wî tiştê ku hûn agir li ser dikin da ku hûn ji xwe re bikin gewher û zînet, an jî pertalinên din, ew jî dibin kefeke wekî ya ser avê. Ha bi vî awayî Xwedê, numûneya heq (rastî) û batilî (pûçiyê) aşkera dike. Herçî ku kef e, tê avêtin (û badilhewa) diçe. Herçî ku ew tiştê feydeyê dide însên, ew li ser erdê dimîne. Ha bi vî awayî Xwedê derb û meselan tîne, numûneyan aşkera dike!

**18.** Ew ên ku bi gotina Xwedayê xwe kirin ji bo wan bihişt heye. Ew ên ku bi gotina Xwedayê xwe nekirine; eger ku tevekê tiştên li ser erdê yên wan be, ew qasê din jî li rex be, teqez dê wî gorî bikin (da ku xwe ji êgir rizgar bikin). Ha ev ên ha, hesabê herî xerab ji bo wan e, cihê wan jî dojeh e û ew çi pîsecih e!

**19.** (Ya Muhemmed!) Erê ma ew ê ku yeqîn dizane ev a ku ji cem Xwedayê te ji te re hatiye heq e (vêca bawerî pê bîne) dibe wekî yê kor (ew ê ku pê bawerî nayîne)? Bêguman bes ên xwedanhiş vê fehm dikin.

**20.** Ew (xwedanhiş)ên ku peymana bi Xwedê re dane bi cih tînin û peymanên xwe qet naşikênin.

**21.** Ew ên ku xwe digihînin a ku Xwedê bi gihandina wê ferman kiriye (mîna

seredana lêziman û hwd.), ji Xwedayê xwe ditirsin û ji hesabdîtineke xerab saw digirin.

**22.** Ew ên ku ji bo riza Xwedayê xwe sebrê dikêşin, bi duristî nimêj dikin, ji wî risqê ku me daye wan bi dizî û aşkera (di riya Xwedê de) xerc dikin û bi xêran gunehan ji ser xwe radikin. Ha ev ên ha bes encama xêrê ji wan re ye…

**23.** Bihiştên 'Ednê (cenetên lêmayînê) ne ku ew dikevine wan û ji dê û bavên wan, ji jin û kinêsa wan ên qenc jî diçinê. Ferîşte jî ji her dergehî ve diçin ser wan …

**24.** Silav li we be! We bi sebra xwe ev xelat heq kiriye, vêca çi xweş encam e (ev mala cenetê)!

**25.** Ew ên ku piştî peymana asê dane Xwedê peymana xwe dişkînin, pêwendiya ku Xwedê bi gihandina wê ferman kirî dibirin û li ser erdê tevdanê dertînin, ha ew ên hanê lanet ji bo wan e û dumahîka xerab her ji wan re ye.

**26.** Xwedê kê bivê risqê wî fireh dike û kê jî bivê risqê wî teng dike. Ew (muşrik) bi jiyana dinyayê kêfxweş bûn. Jiyana dinyayê, li kêleka (jiyana) axretê ji parepertalekî pê ve ne tiştekî din e.

**27.** Ew ên ku kafir bûne dibêjin: De bila ji cem Xwedayê wî mucîzeyek jê re bihata hinartin? Bibêje: Bêguman Xwedê, kî ku delaletê bivê ew wî ji rê dixe (mûcize jî tu feydeyê nadin wî) û kesê (bi tobê) bi bal ve vegere ew wî rasterê dike.

**28.** Wan (rasterêbûy)ên ku bawerî bi Xwedê anîn û dilên wan bi bîranîna (zikrê) Xwedê rihet û aram in. Agahdar bin, dil bes bi zikr û bîranîna Xwedê rihet û aram dibe.

**29.** Ew ên ku wan bawerî anî û karên qenc kirin, ji bo wan bextewarî û (bi bal bihiştê ve) lêvegera herî spehî heye.

**30.** (Ya Muhemmed!) Her wisa me tu jî ji umeteke wisa re şandî ku beriya wê gelek umet hatine û çûne, da ku ya me ji te re wehî kirî tu ji wan re bixwînî. Ew Xwedayê ku rehman e mandel dikin (bawerî pê nayînin). Bibêje: Ew Xwedayê min e, ji wî pê ve tu xweda nîn in, min tenê xwe spartiye Wî û bes veger bi bal Wî ve ye.

**31.** Eger Quraneke wisa ku çiya pê bihatina meşandin, yan pê erd bihatina qelişandin an jî pê bi miriyan re bihatina axaftin (ew Quran dîsa dê ev kitêb bûya û dîsa wan dê bawerî pê neaniya). Lê belê her kar û bar ê Xwedê ye. Ma ew ên ku bawerî anîne hê jî nizanin ku eger Xwedê bixwesta dê mirov tev bianîna ser riya rast? Ew ên ku kafir bûne, bi sebunet kirinên wan, belayeke mezin ji nişka ve her dê bihingive wan an jî ew bela dê dakeve nêzîkî malên wan, hetanî ku civanê Xwedê bê. Bêguman Xwedê qet civan şaş nake.

**32.** (Ya Muhemmed!) Sond be, tinaz li wan pêxemberên beriya te jî hatine kirin û min muhlet da wan ên ku kafir bûne. Paşê (bi ezêb) min ew hingaftin, vêca (xwezî te bidîta) ka ezabê min çawa bû!

**33.** Ma Xwedayê ku çavdêr be li ser a ku her kes dike (dibe mîna wan pûtên ku ne çavdêr in?) Ew ji Xwedê re hevpişkan çêdikin. Bibêje: De ka navan li wan deynin (ew çi ne)? Ma li erdê ya ku Xweda nizane hûn jê re dibêjin? Yan jî hûn

ji kelevajî ve dibêjin? Lê belê ji wan ên ku kafir bûne re fiêl û fendên wan hatine xemilandin û ji riya heq hatine bipaşdexistin. Xweda kê ji rê bixe êdî tu kes nîn e wî bîne riya rast.

**34.** Ji wan re di jiyana dinyayê de ezabek heye, ezabê axretê jî hê jê dijwartir e û ji bo wan yekî ku wan ji (ezabê) Xwedê biparêze jî tune ye.

**35.** Rewşa wê bihişta ku ji bo mutteqiyan peyman pê hatiye dayîn ev e: Di bin (dar û koşkên) wê de rûbar diherikin, xwarin û siyên wê daîmî ne. Ev e, dumahîka yên ku xwe parastine û dumahîka kafiran jî agir e.

**36.** (Ya Muhemmed!) Ew ên ku me kitêb dane wan (ew cihû û filehên ku misliman bûne) bi Qurana ku ji te re hatiye hinartin dilxweş dibin (û pê bawerî tînin). Lê belê hin ji wan destekan hene ku hinekî jê mandel dikin. Bibêje: Bêguman ferman li min hatiye kirin ku ez bes îbadetê Xwedê bikim û tiştekî jê re nekim hevpişk. Ez bes (mirovan) vedixwînim bal dînê Wî ve û vegera min bes bi bal Wî ve ye.

**37.** Her wisa me Quran bi zimanê erebî hinart da ku tu (di navbera mirovan de) pê hukim bikî. Eger piştî vê zanîna ku ji te re hatî tu bidî pey hewesên wan, ha wê çaxê ji aliyê Xwedê ve ne dostekî te ne jî nîgahdarekî te heye.

**38.** Sond be, Me beriya te jî pêxember şandine û me jin û zarok dane wan. Bêyî destûra Xwedê qet ji pêxemberekî re derfet tune ye ku mucîzeyekê bîne, ji her ecelekî re nivîsek heye.

**39.** Xwedê, ya ku bixwaze (ji kitêbê) dibe û ya ku bixwaze jî (tê de) dihêle û maka kitêban (Lewhul Mehfûz) li cem Wî ye.

**40.** Eger em, hinekî ji wî ezabê ku me civan û peyman pê daye wan, bînin serê wan û nîşanî te bidin (jixwe ew cezayê wan e). Yan jî (hêj me nîşanî te nedaye) em te bimirînin bes wezîfeya te ragihandin e. Hesab û ceza (yê wan) jî karê me ye.

**41.** Erê ma ew (kafir) nabînin ku em ji hawirdor ve erdê (li wan) teng dikin? Her Xwedê ye yê ku hukim dike, tu kes nikare hukmekî di ser hukmê wî re bike û ew, hesabdîtina wî bilez e.

**42.** Bêguman kafirên beriya wan jî (li ber pêxemberên xwe) fen û fût gerandibûn. Hal ev e ku (pûçkirina) hemû fen û fûtan karê Xwedê ye. Ew dizane ka kî çi dike û di nêz de kafir jî dê bizanin ka (li axretê) dûmahîka qenc ya kê ye!

**43.** Ew ên ku kafir bûne ji te re dibêjin: Tu ne pêxember î. (Ji wan re) Bibêje: Di navbera min û we de Xwedê û ew ê ku ji kitêbê zanîn bi wan re heye, bi şahidî bes in.

# 14. SÛREYÊ ÎBRAHÎM

Sûreyê Îbrahîm 52 (pêncî û du) ayet e. Ayeta 28an û 29an li Medînê û yên din jî li Mekkê daketine. Ji ber ku di ayeta 35an û 41an de behsa bergerîna Îbrahîm kiriye jê re Sûreyê Îbrahîm hatiye gotin.

Sûre, di nava xwe de bahsa mijara eqîdê dike ku bingeha wê ya herî mezin: "Baweriya bi Xwedê û pêxemberan e, baweriya bi saxbûna piştî mirinê û bi padaş û sezayê ye."

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Elîf, Lam, Ra. Ev kitêbek e, me ji bo te hinart da ku tu mirovan bi destûra perwerdegarê wan ji tarîtiyan derînî ber ronahiya riya Xwedayê serdest ê hêjayê pesindayinê.

2. Ew Xwedayê ku ya li erd û asîmanan heye her jê re ye. Ji ber ezabekî dijwar û giran wax li kafiran be!

3. Ew (kafir)ên ku jiyana dinyayê di ser ya axretê re digirin, mirovan ji riya Xwedê didin paş û riya Xwedê xwar divên. Ha ew, di nav rêşaşiyeke dûr de ne.

4. Me her pêxemberek bes bi zimanê gelê wî şand da ku ji wan re (bi zimanê wan fermanên Xwedê) aşkera bike. Vêca Xwedê, kî bivê ji rê derdixe û kî jî bivê tîne riya rast, ew e yê 'Ezîz, yê Ḥekîm e.

5. Sond be, Me Mûsa bi mucîzeyên xwe hinart (ku ew neh mucîze bûn), me jê re got: Gelê xwe ji tarîtiyên kufr û şirkê derîne bi bal ronahiya baweriyê ve. Ew qewimînên ku di rojên Xwedê de rû dane di bîra wan bîne. Bêguman di vê (bîranînê) de ji bo kesê zêde sebirkêş û spasdar, îbret û ders hene.

6. Dibîr bîne dema Mûsa ji gelê xwe re got: Qenciya Xwedê ya li ser xwe di bîr bînin, wê dema ku Xwedê hûn ji Firewn û ehlê wî rizgar kirin. Wan, hûn li ezabê herî dijwar diçêjandin, kurên we dikuştin, keçên we sax dihiştin û di vê yekê de ji nik Xwedayê we, ji bo we îmtihaneke mezin hebû.

7. Dibîr bîne dema Xwedayê we ji we re ragihand; eger hûn şukrê min bikin teqez ez ê (nîmetên xwe) li we zêde bikim û eger hûn înkara (nîmetên) min bikin, bi rastî ezabê min pir dijwar e.

8. Mûsa jî got: Eger hûn û yên ku li erdê hene tev kafir bibin jî (dîsa hûn ê nikaribin tu zerarekê bidin Xwedê). Vêca bêguman Xwedê Ğenîyy e, Ḥemîd e.[1]

9. Erê ma xeberên wan (umet)ên beriya we ji bo we nehatine; gelê Nûh, gelê Ad û Semûd û wan (umet) ên ku li pey wan (hatin û çûne) ku ji Xwedê pê ve kes bi (hejmara) wan nizane. Pêxemberên wan ji wan re mucîze anîn û wan destên xwe

---

1 El-Ğenî: Ew ê ku qet ne hewceyî tu yekî ji mexlûqê xwe ye, ji bo ku ew bi xwe bêkêmasî ye û xwedanê salixên kemalê ye. Hemî mexlûq mihtacê wî ne û hewcedarê bal qencî û arîkariya wî ve ne.

El-Hemîd: Ew ê ku li ser zat, nav, sîfat û kar û barên xwe layîq û babetê hemd û sena ye. Ew ê ku di ferehî û tengezariyê, di tundî û xweşiyê de hemdê wî tê kirin. Ew ê ku bê sedem û sebeb babet e ji bo hemd û senayê. Lewra; yê ku bi kemal û tekûzî hatiye salixdayin her ew e.

ji kerban gez dikirin û digotin: Em bi wê ya ku hûn pê hatine şandin bawerî nayînin û em ji ya ku hûn me vedixwînînê gumandar in.

**10.** Pêxemberên wan (ji wan re) gotin: Erê ma qey di (heyîna) Xwedê de jî gumana we heye, digel ku ew Xaliqê erd û asîmanan e? Ew, we vedixwîne dînê heq da ku gunehên we bibexşîne û heya demeke nîşankirî we li jiyanê bihêle. Wan jî got: Hûn bes mirovinên wekî me ne. Hûn dixwazin berê me ji perestina van perestiyan bidine paş, ew ên ku bav û bapîrên me ew diperestin. Nexwe (eger rast e hûn pêxember in) de ka delîleke aşkera ji bo me bînin?!

**11.** Pêxemberên wan, ji wan re gotin: (Rast e), em bes mirovinên wekî we ne, lê belê Xwedê ji bendeyên xwe kê bivê pêxemberiyê dide wî. (Heçî delîlxwestina we ye, vêca) bi rastî bêyî destûra Xwedê em nikarin çi delîlekê ji we re bînin, nexwe bila bawermend her xwe bispêrin Xwedê.

**12.** Ma çi li me qewimiye ku em xwe nespêrin Xwedê, rewş ev e ku Wî em li ser riya ku em wî pê binasin rasterê kirine. Sond be, li ser jana we dayî me teqez em ê sebrê bikêşin, vêca ew ên ku dixwazin pişta xwe qayîm bikin bila tenê bi Xwedê qayîm bikin.

**13.** Ew ên ku kafir bûne ji pêxemberên xwe re gotin: Bi sond, an em ê we ji welatê xwe derînin an jî hûn ê vegerin ser ola me! Vêca Xwedayê wan ji wan re peyam hinart, (û got): Em ê teqez sitemkaran ji holê rakin!

**14.** Em ê teqez piştî (helaka) wan we li warê wan bi cih bikin. Ha ev (serkeftin û cîwarbûn) bes ji bo wî kesî ye ku ji rawestina li hemberî min û ji ezabê roja qiyametê ditirse.

**15.** (Pêxemberan) serkeftin xwestin, (Xwedê jî ew da wan) û her zordarê rikdar jî xisar kirin.

**16.** Li pêşiya wî (zordarê rikdar) dojeh heye û ew ji ava edabê tê avdan.

**17.** Hewl dide da ku wê daqurtîne lê belê ew nikare wê daqurtîne. Ji her cihî ve mirin tê ser wî, lê ew ê nemire. Piştî vê jî jê re ezabekî giran heye.

**18.** Rewşa qenciya wan ên ku bi Xwedayê xwe bawerî nayînin wekî rewşa xweliyekê ye ku di rojeke bahozî de bi dijwarî ba lê bide û tiştekî jê nehêle, (her wisa yên kafir) nikarin ji kar û kiryarên xwe sûdê wergirin. Ha ev rêşaşiya dûr û kûr bi xwe ye.[1]

**19.** Erê ma tu nizanî ku Xwedê erd û asîman bi hikmet û zanayî afirandine?! (Gelî mirovan!) Eger Xweda, bivê dê we ji navê bibe (û di şûna we de) dê mexlûqekî nû bîne.

**20.** Ev, li ber Xweda ne zehmet e.

**21.** Hemû mexlûq (roja qiyametê, bi hemû kar û kiryarên xwe ve) dê derkevin

1 Xwedê, di vê ayeta pîroz de, karên kafiran ên qenc dişibîne wê xweliya ku di rojeke bagerî de ba lêbide û wê bike tozeke bela-wela. Yanî karên wan çi qasî rind be û çi qasî pir be jî li axretê tu feydê nade wan. Lewra Xwedê mirovan ji baweriya bi xwe û hemû pêxemberên ku şandine berpirs digire û piştî vê, xêr û xelatê dide wan. Naxwe mirovên kafir feyda qenciyên xwe li cîhanê dibînin û li axretê tu para wan a xêrê tune ye.

pêşberî Xwedê. Vêca ew ên ku (di dinyayê de) bindest bûn, dê ji yên ku xwe mezin didêran re bibêjin: Bi rastî em dûvketiyên we bûn, erê ma vêga hûn dikarin hinekî ji ezabê Xwedê ji ser me bidin alî? Dê bibêjin: (Em çi bikin), eger Xwedê em anîbûna ser riya rast, me jî dê hûn bianiyana ser riya rast. Êdî ji me re wekhev e; çi em nalenalê bikin çi jî em xwe ragirin û bîna xwe fireh kin, ji bo me tu stare û ji ezabê Xwedê jî tu mefer tune ye.

**22.** Piştî ku her tişt bi dawî bû şeytan dibêje: Bêguman Xwedê bi duristî peyman dabû we, min jî peyman dabû we. Vêca min derew li we kir û li hemberî we tu zoreke min jî tune bû (ku bi zorê we bînim ser riya xwe), ji bilî ku min hûn gazî (înkara heqiyê) kirin, vêca we jî gaziya min pejirand. Naxwe gazindê ji min nekin, gazindê ji xwe bikin. Ne ez dikarim we (ji ezabê Xwedê) rizgar bikim ne jî hûn dikarin min rizgar bikin! Bi rastî berî niha dema we li dinyayê ez ji Xwedê re dikirim şerîk min qebûl nedikir. Bêguman heçî sitemkar in ji bo wan ezabekî jandar heye.

**23.** Ew ên ku bawerî anî û karên qenc kirin, bi destûra Xwedayê xwe, ew ê bikevin bihiştên ku di bin wan re robar diherikin, her û her ew ê lê bimînin. Silavkirin û pêşwazîkirina wan (ji hev re) “bes selam e”![1]

**24.** Ma te nezaniye ka çawa Xwedê meseleyek anî û ronî kir; peyveke pak û paqij (ku peyva Laîlaheîllellah e) wekî dareke paqij e ku koka wê di erdê de binecih e û çiqlên wê li ber asîmana ye.

**25.** (Ew dar), bi destûra Xwedayê xwe her gav mêweyên xwe dide. Xwedê mîsalan ji mirovan re tîne, ronî dike da ku îbretê bigirin.[2]

**26.** Mînaka peyva pîs (ya kufrê) wekî wê dara pîs e ku ji ser erdê hatiye hilkirin, jê re tu binecihî û mikûmî tun e.

**27.** Xwedê, bi peyva mikûm (a tewhîdê) wan ên ku bawerî anîn, li jiyana dinya û axretê radigire û Xwedê sitemkaran jî ji rê dixe û Xwedê ya ku bixwaze dike.

**28.** Ma tu li wan ên ku li hemberî kerema Xwedê (di şûna spasiyê de) nankoriyê dikin û di dawiyê de qewmê xwe di mala helakê werdikin, nabînî?!

**29.** Ew dê biçine dojehê û ew çi pîs wargeh e!

**30.** Wan ji Xwedê re hevpişk çêkirin, da ku (xelkê) ji riya Wî bixin. (Ji wan re) Bibêje: bi pêxweşiyên xwe bijîn, bi rastî dûmahîka we her agir e.

**31.** Ji bendeyên min ên bawermend re bibêje: Beriya rojek bê ku tê de ne danûstandin ne jî hevdostiyek heye, bila bi berdewamî û duristî nimêj bikin û ji wî risqê ku me daye wan, bi dizî û aşkera (di riya Xwedê de) xerc bikin.

---

1 Selam: Wateya wê rizgarbûna ji êş û derdan e, ji zehmetî û tengasiyan e û êminiya ji tirs û endîşeyan e. Jixwe li dinyayê jî musliman vê duaya xêrê ji hev re dikin, xêr û xweşiya hev dixwazin.

2 Di yeta 24an de Xwedê gotina xweşik şibandiye dara xweşik. Lewra gotina xweşik fêkiyê wê karê xweşik e û dara xweşik jî berê wê fêkiyê bifêde ye. Li gorî ravekirina mufessiran; meqsed ji peyva xweşik Kelîma Tewhîdê ye. Kelîma Tewhîdê dixwaze ku insan kar û barê baş bike û xwe ji neqenciyê dûr bigre. Çiqas kar û barekî ku Xwedê jê razîbe her bi sedema vê kelîmê ye. Heçî ku gotina pîs e a ku di ayeta 26an de derbas dibe ew jî inkara Xwedê ye. Tevekê fesadî û xerabiyan, felaket û musîbetan ji bin vê peyvê derdikevin. Ji ber vê yekê Xwedê peyva pîs şibandiya dara pîs ku ji zerarê pê ve ty feydê nade mirovan.

**32.** Ew ê ku erd û asîman afirandin Xwedê ye, ji ewran av aniye xwarê, vêca bi wê avê mêweyên rengereng bi risqînî ji we re deranîn. Ji bo we keştî stûxwar kirin da ku bi destûra Wî di deryayê de avjeniyê bike (û barên giran bikêşe) û ji bo we çem jî berdest kirine.

**33.** Xwedê roj û heyv bi berdewamî xistine ber xizmeta we, şev û roj ji bo we misixur kirin.

**34.** Xwedê ji her tiştê we jê xwestî, daye we. Eger hûn qenciyên Xwedê yên li ser xwe bijimêrin, hûn nikarin wan bijimêrin! Bêguman însan pir zalim e, zêde nankor e!

**35.** Dibîr bîne dema Îbrahîm got: Xwedayê min! Vî bajarê ha (Mekkê) bike bajarekî ewle, min û zarokên min ji perestina pûtan biparêze!

**36.** Xwedayê min! Bi rastî van pûtan ji mirovan pir kes ji rê xistine. Êdî kî li pey min bê, ew ji (xelkên) min e. Kî jî li ber min rabe, vêca bêguman tu gunehveşêr î, dilovîn î.[1]

**37.** Xwedayê me! Min hinek ji zarokên xwe li newaleke bêçandinî, li cem mala te ya pîroz bi cih kirin. Xwedayê me, da ku bi berdewamî û duristî nimêj bikin, êdî tu jî meyla dilên hin mirovan bide aliyê wan û ji mêweyan wan bide risqdan da ku ew şêkiriya te bikin.

**38.** Xwedayê me! Bêguman tu bi ya ku em veşêrin û ya ku em aşkera bikin jî dizanî. Bêguman ne li erdê ne jî li asîman tiştek li ber Xwedê veşartî namîne.

**39.** Pesn û spasî ji Xwedê re be, ew ê ku di kalîtiya min de Îsmaîl û Îshaq dane min! Bêguman Xwedayê min bergerê dibihîze (û qebûl dike).

**40.** Xwedayê min! Min û kinêsa min bike ji nimêjkaran. Xwedayê me! Duaya min qebûl bike.

**41.** Xwedayê me! Di roja hesabdîtinê de, li gunehên min, li yên dê û bavên min û li yên mislimanan bibore!

**42.** Zinhar tu hizir neke ku Xwedê ji ya ku zalim dikin bêageh e! Bêguman ew bes (cezayê) wan dihêle rojekê ku tê de çav zeloq dibin.

**43.** (Wê rojê) Ew bi lez in, serê wan berbijor in, çavên wan zîqmayî ne, li wan venagerin. (Ji tirsa ezabê) dilê wan jî vala ye.

**44.** Tu, mirovan ji wê roja ku ezab bi ser wan de bê hişyar bike. Vêca ew ên ku zilm kirin dibêjin: Xwedayê me! Heya demeke nêzîk muhletê bide me, êdî em ê bersiva doza te bidin (û îmanê bînin) û em ê bidin pey pêxemberan. (Ji wan re tê gotin:) Erê ma qey berê (li dinyayê) we sond nexwaribû ku ji bo we zewal tune ye?

**45.** Hûn, li cihên wan ên ku li xwe zilm kirin (piştî ku me ew helak kirin) niştecih bûn, ji bo we jî xuya bû ka me çawa ezab bi serê wan de anîye. Me, ji bo we (di Quranê de) gelek mîsal anîn û aşkera kirin (belê we ji wan ders negirt).

1 Îbrahim (eleyhisselam) ji ber kû hêja nizanibû ku Xwedê muşrikan nabexşînê, ji ber vê yekê ji wan re ji Xwedê bexşandina wan xwest. Piştî fehm kir ku Xwedê muşrikan nabexşînê vêca jibo lêborîna wan du‘a nekir.

46. Bi rastî wan (muşrikan) fetl û fendên xwe (li Pêxember û bawermendan) bi cih kirin, pûçkirina planên wan li cem Xwedê ye. Çendî ku ji ber xurtiya dek û dolabên wan, çiyan dikir ku ji cihê xwe hilbibin û hilweşin jî.
47. Nexwe, zinhar hizir meke ku Xwedê ji peymana ku daye pêxemberên xwe (ku dê biserkevin), vegeriyaye! Bêguman Xwedê serdest û tolveker e.
48. Wê roja ku erd bi erdeke din, asîman jî bi hin asîmanên din bêne guherandin û (mirov tev) derkevin pêşberî Xweda, ew Xwedayê ku her yek û desthilatdar e.
49. Wê rojê tu dê bibînî ku gunehkar, dest û piyên wan di qeydan de şidandî ne.
50. Kirasên wan ji qetranê ne, agir bi ser û çavên wan ve bilind dibe û pê digire.
51. Da ku Xwedê cezayê her mirovekî ka çi kar û kiryar kiriye bidê û bêguman Xwedê (di hesabdîtinê de) destsivik e.
52. Ev Quran, ji bo mirovan ragihandinek e da ku (mirov) pê bêne hişyarkirin û bizanin ku Xwedê Xwedayekî yek e û da ku xwedaneqil tam bifikrin û îbret bigirin.

## 15. SÛREYÊ HICR

Sûreyê Hicr not û neh (99) ayet e. Ayeta 78'an li Medînê, yên din jî li Mekkê daketine. Hicr navê cihekî ye ku dikeve newala navbera Şam û Medînê ku Semûd -gelê Salih- li wê deverê bi cih bûbû. Ji ber ku ayeta 80'an û ya 84'an behsa gelê Hicrê kiriye, ji vî sûreyî re Sûreyê Hicr hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Elîf, Lam, Ra. Ha ev, ayetên kitêbê û Qurana ronker in.
2. Ew ên kafir bûne gelek caran dixwazin ku ew jî misliman bûna.
3. Dev ji wan berde, bila bixwin (û vexwin), pê xweş bibin, hêvî û umîd wan mijûl bike, vêca ew ê bizanin (ka encama wan bû çi).
4. Me kîjan war wêran kiribe her jê re civanekî pêzan hebûye.
5. Hîç tu milet nakeve pêşiya ecelê xwe û ji wextê xwe nayê bipaşdexistin.
6. (Kafîran) Gotin: Hey ew ê ku jê re Quran hatiye hinartin! Bêguman tu dîn î!
7. (Dîsa gotin:) Bila te firîşte ji bo me bianîna (ku wan te rast bidêra) eger bi rastî tu ji rastgoyan î?
8. Em firîşteyan her bi heqî dişînin, (eger me firîşte bişandana) wê çaxê ji bo wan muhlet nedihate dayîn.
9. Bêguman ê Quran hinartî her em in û teqez em bi xwe jî dê wê biparêzin.
10. Sond be, me pêxember ji miletên beriya te re jî şandin.
11. Çi dema pêxemberek ji wan re dihat, wan her tinazên xwe pê dikirin.
12. Ha wisa, em batilî dixin dilên gunehkaran.

13. Ew bi wê bawerî nayînin. Rê û rêbazên pêşiyan jî wiha bû.
14. Eger em ji wan re ji asîman deriyekî vekin û ew tê re hilkişin jorê jî (dîsa dê bawerî neyînin)…
15. Dê bigotana: çavên me hatine girtin, belkî sêr li me hatiye kirin.
16. Sond be, me di asîman de hin rêgeh afirandine û me asîman ji bo temaşekeran xemilandiye.
17. Me asîman ji her şeytanê qewirandî parastiye.
18. Lê belê, ew ê ku bi dizîka guhê xwe bide xeberê û bireve ew cuda ye, êdî pêteke ronak bi pey wî dikeve.
19. Me erd jî raxistiye û tê de çiyayên asê û saxlem bi cih kirine û me di erdê de her tişt (li gorî hewcehiyê) bi pîvan deraniye.
20. Me ji bo we û ji bo wan ên ku hûn ne risqdarên wan in di erdê de pêjînên (meîşeta) rengereng afirandin.
21. Herçî tiştê heye gencîneyên wê bes li cem me ne. Em wê her bi pîvaneke diyarkirî (bi qasî hewcehiyê) dadixin.
22. Me bayên ewrhilgir û avisker şandin, vêca Me ji ewran avek anî xwarê û me bi wê hûn av dan û we bi xwe nikarîbû wê avê bixezinînin.
23. Bêguman ê ku sax dike û dimirîne her em bi xwe ne, paşê her em in mîratpêmahiyên hemû mexlûqan.
24. Sond be Em wan umetên ku beriya we hatin û çûn dizanin û em bi yên ku di pey we re bên jî dizanin.
25. Bêguman her Xwedayê te ye yê ku (roja qiyametê) wan li hev bicivîne. Bêguman Ew karbinecih e, zana ye.
26. Sond be, Me însan (Adem) ji hişkeheriyeke pehtî, ji heriyeke reşeguherî afirandiye.
27. Me cin jî hê berî (Adem) ji agirekî sincirî afirandibûn
28. Wê demê Xwedayê te ji firîşteyan re got, bêguman Ez ê ji heriyeke hişk û hola, ji heriyeke reşeguherî mirovekî (Adem) biafirînim.
29. Dema min ew tekûz kir û min ji ruhê ku mexlûqê min e puf kirê, vêca di cih de hûn jê re herin sicûdê.
30. Firîşte tev bi hev re (ji Ademî re) çûn sicûdê.
31. Lê belê Îblîs bêemrî kir û nexwest ku bibe digel secdebiran.
32. (Xwedê jê re) Got: Hey Îblîs! Çi tiştî nehişt ku tu bibî digel secdebiran?
33. (Îblîs) Got: Ne layîqê min e ku ez ji mirovekî re biçim sicûdê ku te ew ji hişkeheriyeke reşeguherî afirandiye.
34. (Xwedê jê re) Got: Nexwe ji wê derkeve, here! Êdî bi rastî tu (ji rehma min) hatî qewirandin!
35. Bêguman heya roja qiyametê dê her lenet li te bibare.

36. (Îblîs) Got: Xwedêyo! Nexwe, heya roja qiyamet û hesabdîtinê, xwe li min bigire (û min nemirîne).
37. Xwedê jê re got: Baş e tu ji xwelêgirtiyan î…
38. Heyanî roja dema diyarkirî.
39. (Îblîsî) Got: Xwedêyo! Sond be, bi sedema ya ku te ez ji rê derxistim, ez ê jî li dinyayê ji mirovan re (gunehan) bixemilînim û ez ê teqez wan tevan ji riya rastiyê derînim!
40. Lê belê, evdên te yên bawermend ên dilpak ew cuda ne.
41. (Xwedê) Got: Bi rastî ha ev riyeke rast û durist e, yê li ser biçe digihîje min.
42. Bêguman bendeyên min (yên muxlis) tu hêza te li ser wan nîn e. Lê belê ew jirêketiyên ku li pey te herin, cuda ne.
43. Bêguman dojeh civan û cihê wan hemûyan e.
44. Ji dojehê re heft dergeh hene. Ji bo her dergehekî komeke diyarkirî heye.
45. Bêguman mutteqî, li nav bihiştê û li ser kaniyan in.
46. (Ji wan re dê bê gotin:) Bi selametî û ewlehî herin nav bihiştan!
47. Me kîna di sîngên wan de avêt; êdî (ji hev re) bûne bira, li ser textan li pêşberî hev in.
48. Li bihiştê tehb û westan wan nahingive û ew jê nayêne derxistin jî.
49. Ji bendeyên min re bibêje, teqez ez im gunehjêbir ê dilovîn...
50. Teqez ezabê min jî ezabê herî dijwar e.
51. Ji wan re behsa mêvanên Îbrahîm bike.
52. Dema çûne cem Îbrahîm, gotin: „Silav li te be!“ (Ji ber ku Îbrahîm ew nas nekirin, ji wan re) got: Bi rastî em ji we bifikar in!
53. Jê re gotin: Metirse! Em mizgîna kurekî pir zana didin te.
54. (Îbrahîmî ji wan re) Got: Erê ma piştî vê pîrîtiyê hûn mizgîniyê didin min? Vêca hûn mizgîniya çi didin min?!
55. Jê re gotin: Me mizgîniya heq û rast da te, zinhar; ji bêhêviyan nebe!
56. (Îbrahîm ji wan re) Got: Qey ji rêşaşan pê ve kî hêviya xwe ji rehma Xwedê dibire?
57. (Îbrahîm bi berdewamî ji wan re) Got: Gelî qasidan! Hûn ji bo çi hatin.
58. Jê re gotin: Bi rastî em ji bo (helaka) civateke gunehkar hatine şandin.
59. Lê belê malbata Lût ne tê de ye, bi rastî em ê Lût û malbata wî tevan rizgar bikin.
60. Lê belê pîreka wî cuda ye; me li serê hukim kir ku ew ji yên helakbûyî ye.
61. Gava qasid hatin cem malbata Lût.
62. (Lût ji wan re) Got: Bi rastî hûn civateke nenas in.

63. Jê re gotin: Na, em hatine cem te bi wî ezabê ku miletê te di hatina wî de gumandar in.

64. Me, rastî ji te re aniye, bêguman em rastbêj in.

65. Jê re gotin: Di wextekî şevê de malbata xwe derîne rê, tu jî li dûv wan here. Zinhar bila ji we tu kes li paş xwe ve jî nemeyzêne! Herin wî cihê ku fermana we pê hatiye kirin.

66. Me ji Lût re ragihand ku ew ên gunehkar di çaxê sibehê de wê ji binî ve bêne qutbirkirin.

67. Xelkê bajêr hatin û (ji bo kirina fiêlên kirêt) ji keyfxweşî mizgînî dane hev.

68. (Lût ji wan re) Got: Evên ha, mêvanên min in, vêca min rezil nekin.

69. Ji Xwedê bitirsin, min riswa mekin!

70. Jê re gotin: Erê ma me ji te re negotibû ku têkilî kare xelkê mebe?!

71. (Lût, ji wan re) Got: Eger hûn dixwazin bikin va ne keçên min (li xwe mehr bikin).

72. Bi jiyana te sond be; ew di nav serxweşiyê de bi sergêjane diçûn û dihatin.

73. Di çaxê hilhatina rojê de wê qîra dijwar ew hingaftin.

74. Êdî Me welatê wan serûbinî hev kir û me bi ser wan de kevirên ji heriya pehtî barandin.

75. Bêguman di vê de ji bo yên ku îbret bigirin nişan hene.

76. Bêguman kavilên wî welatî hêjî li ser riyekê dimînin.

77. Bêguman di vê de ji bo bawermendan ders û nîşan hene.

78. Bi rastî xelkê (bajarê) Eyketê jî zalim bûn.

79. Lê belê me tol li wan jî vekir. Ev herdu welat jî li ser riyeke diyar in.

80. Sond be, xelkê Hicrê jî bi pêxemberan bawerî neanî.

81. Me mucîzeyên xwe dan wan, lê belê wan berê xwe ji wan vegerandin.

82. Wan ji bo xwe ji çiyan malên ewle dikolan û çêdikirin.

83. Di çaxê spêdeyê de wê qîra dijwar ew jî hingaftin.

84. Ew (xaniyên qaîm û kelehên asê) yên ku lêdikirin tu zerar ji ser wan neda alî.

85. Me erd û asîman, tiştên ku di nava wan de hene her bi heqî afirandin. Bêguman roja qiyametê teqez dê bê, vêca tu bi xweşikayî bi wan re derbas bike.

86. Bêguman Xwedayê te afirînerê her tiştî ye û her tiştî dizane.

87. (Ya Muhemmed!) Sond be, Me heft ayetên ku têne dubarekirin û Qurana mezin dane te.

88. Zinhar, tu çavên xwe bernede wî malê ku ji bo feydeyeke demî me daye hin kesan, li ser wan xemgîn nebe û ji bo bawermendan perên xwe nizm bike, xwe ji bo wan bişikîne.

89. (Ji wan re) Bibêje: Bêguman ez her hişyarkerekî ronker im.

**90.** Çawa Me bi ser ên ku dabeş dikin (ezab) şand…
**91.** Ew ên ku Quran kirine beş bi beş (bi hinekî baweriyê tînin û bi hinekî nayinin).
**92.** Vêca bi Xwedayê te sond be, em ê hemin ji tevan wan bipirsin…
**93.** Ji a ku wan dikirin.
**94.** Vêca fermana ku li te hatî kirin aşkera bibêje û berê xwe ji muşrikan biguherîne!
**95.** Bêguman li hember tinazkeran Em besî te ne.
**96.** Ew ên ku digel Xwedê hin îlahên din jî girtine; vêca dê bizanin (ka dûmahîka wan dê çawa bibe).
**97.** Sond be, Em dizanin a ku ew dibêjin sînga (bêhna) te teng dike.
**98.** Nexwe tu digel hemd û senayê, Xwedayê xwe pak bidêre û bibe ji nimêjkaran!
**99.** Heta mirinê, ji Xwedayê xwe re îbadetê bike.

## 16. SÛREYÊ NEHL

Sûreyê Nehl 128 (sed û bîst û heşt) ayet e. Her sê ayetên wî yên dawiyê li Medînê û yên din jî li Mekkê hatine nazilkirin. Ji ber ku di ayeta 68ê de behsa mêşa hungivîn hatiye kirin ji vî sûreyî re Sûreyê Nehl hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Fermana Xwedê hat, vêca li hatina wê lezê mekin. Xwedê ji wê şirka ku ew dikin, pak û bilind e.
2. Xweda, ji bendeyên xwe kê bivê, bi vîna xwe, wehyê bi navgîna melayîketan jê re dişîne (Xwedê ji wan re dibêje: Evdên min) hişyar bikin ku bi rastî ji min pê ve tu Xweda nîn in, vêca bila ji min bitirsin.
3. Xwedê, erd û asîman bi heqî afirandine. Xwedê ji şirka ew dikin, dûr û bilind e.
4. Xwedê, însan ji dilopeke av afirandiye, vêca tu dinêrî ku va ye (ew) ji Xwedayê xwe re dijminekî aşkera ye.
5. Xwedê, terş (hêştir, dewar û pez) jî afirandin, di wan de germîtî û gelek feydeyên din jî ji bo we hene û hin ji wan jî hene ku hûn goştên wan dixwin.
6. Di wan de, dema êvarê wan tînin (hevşiyê wan) û dema spêdeyê jî wan dertînin (çêreyê) ji bo we dilxweşî û ciwanî heye.
7. Ev terş, barên we yên giran ji welatekî digihînin welatekî din ku (eger ew nebûna) bêyî zehmetiyeke zêde we nedikariya bigihînin wê derê. Bêguman Xwedayê we xwedîşefqet e, dilovîn e.
8. Xwedê, hesp û qantir û ker jî afirandin da ku hûn li wan siwar bibin û da ku ew bibin xeml û xweşkahî ji bo we. Xwedê ya ku (îro) hûn pê nizanin jî dê biafirîne.

**9.** Nîşandana rêya rast li ser Xwedê ye. Hin rê jî hene xwar in. Eger Xwedê bixwesta dê hûn tev bianîna ser riya rast.

**10.** Xweda ye, yê ku ji ewran av barandiye, hin jê ji bo we vexwarin e, hinek jî dar û şênkatî pê şîn dibin ku hûn tê de heywanên xwe diçêrînin.

**11.** Xwedê bi wê avê ji bo we çandinî, zeytûn, xurme, tirî û ji her texlîtên mêweyan (li erdê) hêşîn dike. Bêguman di vê rewşê de ji bo civateke ku bifikire nîşan hene.

**12.** Xwedê şev û ro, roj û heyv xistine ber xizmeta we. Stêr jî bi fermana Xwedê sernerm û misuxir in. Bêguman di van de, ji bo yên ku hişê xwe bixebitînin gelek nîşan hene.

**13.** Ew tiştên ku Xwedê rengereng ji bo we li erdê çêkirine, bi rastî di wan de jî ji bo civateke şîretwergir nîşan hene.

**14.** Xwedê ye, yê ku derya xistiye ber xizmeta we da ku hûn goştê ter û taze jê bixwin û ku hûn zînetan jê derînin ji bo hûn li xwe bikin. Tu keştiyên mezin dibînî ku li ser dikişin, da ku hûn bi wan (bi riya bazirganiyê) li kerema Xwedê bigerin û da ku hûn spasiya nîmetên Wî bikin.

**15.** Xwedê di erdê de çiyayên asê û mikûm çikandine da ku we nehejîne û tê de çem û rê danîne, hêvî heye ku hûn bi ser mebestên xwe ve bibin (û hûn xwe şaş nekin).

**16.** Xwedê ji bo we pir nîşanên din jî çêkirine û bi stêran jî ew bi ser riya xwe ve dibin.

**17.** Erê ma vêca ew ê ku diafirîne dibe wekî yê ku naafirîne? Ma hê jî hûn nafikirin?

**18.** Eger hûn bixwazin nîmetên Xwedê bijimêrin, hûn nikarin wan bijimêrin. Bêguman Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

**19.** Xwedê ya ku hûn vedişêrin û ya ku hûn aşkera dikin jî dizane.

**20.** Ew ên ku di şûna Xwedê de wan dihebînin, ew nikarin tiştekî biafirînin; ew bi xwe jî hatine afirandin.

**21.** Ew (ên hûn wan dihebînin) mirî ne, ne zindî ne. Ew nizanin kengê dê bêne vejandin û şandin jî.

**22.** Xwedayê we Xwedayekî tek û tenê ye. Vêca ew ên ku bawerî bi axretê nayînin, dilê wan (yekîtiya wî) înkar dike û ew xwe mezin didêrin.

**23.** Şik û guman nîn e, bi rastî Xwedê bi ya ku ew vedişêrin û bi ya ku aşkera dikin jî dizane. Bêguman Ew qet ji xwedbînan hez nake.

**24.** Dema ji wan re tê gotin: Xwedayê we ji jor çi hinartiye? Dibêjin: Çîrok û çîvanokên pêşiyan hinartine.

**25.** (Ew wisa dibêjin:) Da ku roja qiyametê gunehên xwe bi temamî û ji hin gunehên wan ên ku bêzanebûn ji rê xistine jî, hilgirin. Agahdar bin, a ku hildigirin çiqas pîs e!

**26.** Bêguman ew ên beriya wan jî (li ber pêxemberan) xefik vedabûn, vêca Xwedê

avahiya wan ji bin ve xera kir, êdî ban bi ser wan de hate xwarê û ezab ji dereke ku wan bîra wê nedibir, bi ser wan de hat.

**27.** Paşê roja qiyametê dê wan riswa bike û dê ji wan re bibêje: Ew hevpişkên ku we ji min re çêdikirin, ew ên ku der barê wan de (bi pêxemberan re) we dijatî dikir ka li ku ne? Ew ên ku ji wan re zanîn hatiye dayîn dibêjin: Bêguman îro riswatî û ezab ji bo kafiran e.

**28.** Wan kafirên ku (bi girtina hevpişkan) li xwe zilm kir, dema melayîket ruhê wan distînin, vêca radestî ber fermana Xwedê dibin, dê bêjin: Me tu karê xerab nedikir. (Vêca melayîket ji wan re dibêjin:) Nexêr. Teqez Xwedê bi ya ku we dikir, dizane.

**29.** Nexwe, de haydê di dergehên dojehê re bikevinê û seraqetî tê de bimînin. Bi rastî cihê xwemezinkeran çiqas pîs e!

**30.** Dema ji teqwadaran re hat gotin: Xwedayê we çi hinartiye? Gotin: Qencî û başî. Ji bo yên ku qencî kirin li dinyayê xelateke spehî heye û xelata axretê ji bo wan hê çêtir e. Bi rastî axîret ji mutteqiyan re çi xweşmal e!

**31.** Teqwadar diçin bihiştên 'Ednê (bihiştên lêmayînê) ku di bin wan de çem diherikin, ji wan re di wan de tiştê ew dixwazin heye. Bi vî awayî Xwedê teqwadaran xelat dike.

**32.** Ewên ku di rewşeke baş de bin û melayîket ruhê wan distînin (ji wan re) dibêjin: Silav li ser we be! Ji ber kar û kiryarên ku we (li dinyayê) kiriye de herin bihiştê.

**33.** Ma ew li benda ku ferişte werin an jî fermana Perwerdegarê te were, disekinin?! Wan ên beriya wan jî welê kiribûn. Xwedê li wan zilm nekiriye, lê belê wan bi xwe li xwe zilm dikir.

**34.** Vêca cezayê kar û kiryarên wan ew hingaftin û cezayê ya ku wan pê tinaz dikir bi ser wan de hat û dor li wan girt.

**35.** Yên muşrik gotin: Eger Xwedê bixwesta, ne me ne jî bav û kalên me, ji bilî Xwedê kes nedihebandin û me bêyî wî ji cem xwe tu tişt heram nedikir. Yên beriya wan jî mîna wan gotibûn. Vêca li ser pêxemberan bes ragihandineke aşkera heye?

**36.** Sond be, Me ji bo her miletekî pêxemberek şand (da ku bibêjin:) bes Xwedê bihebînin û xwe ji taxûtî dûr bigirin. Vêca hin ji wan Xwedê ew rasterê kirin û hin ji wan jî ezab li ser wan misoger bû. (Gelî muşrikan!) De li ser erdê bigerin û bibînin ka encama derewînan çawan bûye!

**37.** (Ya Muhemmed!) Çiqas tu li ser rasterêkirina wan birijd bî jî, vêca bi rastî Xwedê kesê ku xwe ji rê xistiye nayîne riya rast û ji bo wan tu arîkar jî nîn in.

**38.** Wan bi Xwedê sonda asê xwar, gotin: Kesê ku bimire Xwedê wî sax nake. Nexêr, (Xwedê dê wan sax bike). Ev, ji cem Xwedê soz û peymaneke heq e, lê belê pirên mirovan (vê) nizanin.

**39.** (Xwedê dê wan sax bike) da ku ya ew tê de (digel bawermendan) ketibûn

îxtilafê, ji wan re aşkera bike û da ku ew ên kafir bûne bizanin ku bi rastî ew derewker bûn.

**40.** Dema em çêbûna tiştekî bixwazin, gotina me jê re tenê ev e: Çêbibe! Vêca ew jî çêdibe.

**41.** Ew ên ku piştî neheqî li wan hatî kirin wan di riya (dînê) Xwedê de hicret kir; em ê wan li dinyayê rind bi cih bikin. Eger ew bizanin, xelata (wan a) axretê hê mezintir e.

**42.** Ew (muhacir) ên ku (li hemberî zorê) xwe ragirtine û ew ên ku xwe spartine Xwedayê xwe.

**43.** (Ya Muhemmed!) Me, beriya te yê ku ji wan re wehî şandiye her zilam bûne.

**44.** (Me pêxember bes) bi mucîze û pirtûkên pîroz şandin. Me ev Quran ji bo te hinart da ku tu ji bo mirovan a ku (ji helal û heramî) ji wan re hatî aşkera bikî û ji bo ku ew bifikirin.

**45.** Erê ma ew ên ku dek û dolabên xerab (li pêşiya pêxember) gerandin, piştrast in ku Xwedê wan di erdê de nabe xwarê, yan jî ji cihekî ku ew ne di ferqê de bin û bîrê nebin ezab bi ser wan de neyîne?

**46.** Yan jî (ma ew ewle ne ku) di çûn û vegera xwe de ezab dê nehingive wan? Teqez ew dê Xwedê neçar nehêlin da ku xwe ji ezabê Wî xelas bikin.

**47.** Yan jî (ew bibawer in ku) Xwedê dê wan li ser tirsekê (bi ezab) negire? Bêguman Xwedayê we xwedî şefqet e, dilovîn e.

**48.** Erê ma ew nabînin çiqas tiştê Xwedê ew afirandî ka çawa siha wan ji rast û çep ve tê veguhastin, ev tev li hemberî Xwedê şikandî, lawaz û perşikestî ne.

**49.** Çiqas rêveher û melayîketên li erd û asîmanan hene, her ji Xwedê re ew diçin sicûdê û ew xwe mezin nadêrin.

**50.** Ew ji Xwedayê xwe yê ku di ser wan re ye ditirsin û ya pê hatine fermankirin jî dikin.

**51.** Xwedê got: Ji bo xwe du mabûdan negirin. Bêguman Xwedayê we bes yek e û tek e. Nexwe bes ji min bitirsin.

**52.** Çi tiştên li erd û asîmanan hene her ew milkên Xwedê ne, îbadet her dem ji bo Wî ye. Erê ma piştî vê, ji bilî Xwedê hûn ê ji digerê wî xwe biparêzin?

**53.** (Gelî mirovan!) Çi qenciyeke ku gihiştibe we ew tev ji Xwedê ne, paşê dema tengezariyek bi ser we de bê vêca hûn bi bal Wî ve hawar dikin.

**54.** Paşê dema Xwedê ew tengasî ji ser we rakir, te dît ku civatekê ji we ji Xwedayê xwe re hevpişk çêdikirin!

**55.** Da ku der barê nîmetên ku me daye wan de nankoriyê bikin! Nexwe xweş bijîn. Teqez di nêzîk de hûn ê (encama nankoriyê) bizanin!

**56.** Ji risqê ku me dayî wan, ji wan (pût)ên ku hebûna wan nizanin parekê vediqetînin. (Gelî muşrikan!) Sond bi navê Xwedê be, hûn ê ji wan derewên ku we dikir (roja qiyametê) teqez bêne pirsiyarkirin!

57. Ew ji bo Xwedê keçan çêdikin (dibêjin; milyaket keçên Xwedê ne,) Xwedê ji vê yekê pak û paqij e. Yê ku li xweşiya wan diçe jî (ku kur in) didin xwe.

58. Dema bi bûyina keçekê mizgîn ji yekî wan re tê, ji hêrs û qehran rûyê wî reş digere û kîndar dibe.

59. Ji ber mizgîniya ne xweş xwe ji ber gelê xwe vedişêre (û difikire), gelo wê keçê şikestî û reben bihêle yan wê (bi saxî) di axê de veşêre? Hişyar bin, ev biryara wan çi pîs biryar e.

60. Ew ên ku bawerî bi axretê nayînin, salixên pîs ji bo wan in. Salixên herî bilind bes ji bo Xwedê ne. Her ew e, yê desthilat, yê karbinecih.

61. Eger Xwedê mirovan ji ber zilma ku dikin (pê re pê re) ceza bikira, li ser rûyê erdê yek rêveherek nedihişt. Lê belê heyanî demeke navlêkirî (cezayê) wan dide paş. Vêca dema civanê wan hat, ew nikarin saetekê paş de ne jî pêş de bixin.

62. Ew (muşrik) a ku ji bo xwe navên didin aliyê Xwedê. Zimanê wan bi derew dibêje: Ku encama bixêr her ji bo wan e. Bêşik û şubhe agir her ji bo wan e û bêguman ew beriya her kesî diçin dojehê.

63. Sond bi Xwedê be, Me berî te ji gelek umetan re (pêxember) şandin, vêca şeytên karên wan ji bo wan xemilandin. Êdî îro (li dinyayê) şeytan dost û arîkarê wan e û (li axretê) ji bo wan ezabekî dijwar heye.

64. Me ev kitêb ji bo te hinart da ku tu ji mirovan re tiştê ku tê de ketine îxtilafê aşkera bikî û da ku ji yên bawerî tînîn re bibe rêber û rehmet.

65. Xwedê ji ewran baranek barand, vêca erd piştî ku hişkemirî bû pê sax (û hêşîn) kir. Bêguman di vê de ji bo civateke ku ji dil û can guhdarî bike nîşan hene.

66. Bêguman ji bo we di terşan de ders û îbret hene ku Em şîrekî safî û parzûnkirî bi we didin vexwarin ku ew şîr di wan terşan de ji navbera rêx û xwînê dertê holê ku ew di gewriya yê vedixwin re bi hesanî diçe xwarê.

67. Hûn ji fêkiyên darxurme û ji tirîyê rezan şeraba serxweşker û risqekî pak û spehî werdigrin. Bêguman di vê de jî ji bo civateke ku bifikire nîşan hene.

68. Xwedayê te sirûş (û îlham) da mêşa hungivîn (û jê re got): Ji xwe re ji çiyan, ji daran û kewarên ku ji bo te çêdikin, ji xwe re bike xanî.

69. Paşê ji texlîtên fêkiyan bixwe, bikeve wan riyên ku Xwedayê te ji bo te hêsan kirin. Di nav hinavê wê de şerbeteke (hungivînekî) rengereng tê der ku tê de ji bo mirovan şîfa heye. Bêguman di vê de ji bo civateke ku tê bigihîjin, nîşan hene.

70. Xwedê hûn (ji tuneyî) afirandin, piştre dê we bimirîne. Hinekan ji we vedigerîne temenê perîşaniyê (ber dest û piyan) da ku piştî zanînê tiştekî nizanibe. Bêguman Xwedê ‘Elîm e, Qedîr e.

71. Xwedê di risqdayînê de hin ji we di ser hinan re girtine. Vêca ew ên ku bi dayîna risq di ser yên din re hatine girtin, ne ew in ku malê xwe bidine kole û xizmetkarên xwe, da ku ew tev di risq de bibin wekhev. Erê ma vêca ew nîmetên Xwedê mandel dikin?

**72.** (Gelî mêran!) Xwedê ji nifşê we, ji bo we hevser û hevjiyan afirandin, zarok û nevî ji wan hevseran dane we û tiştê pak û paqij kiriye risqê we. Ma qey ew hê jî bi pûçiyê bawer dikin û li hemberî nîmetên Xwedê nankoriyê dikin?

**73.** Ew (muşrik) ji bilî Xwedê îbadetê seneman dikin, ew ne xwediyê ku li erd û asîmanan rizqê wan bidin û ew neşên vê jî bikin.

**74.** Vêca hûn ji bo Xwedê tu metelokan negerînin (lewra Xwedê yek e û bêmînak e). Bêguman Xwedê dizane lê hûn bi xwe nizanin.

**75.** Xwedê, mînaka evdekî dide ku ew bi xwe milkê yekî din e û hêza wî li ser tiştekî nîn e û mînaka mirovekî azad dide ku me risqekî pak dayê, vêca ew jî bi dizî û aşkera (di riya Xwedê de) xerc dike. Erê ma ev herdu dibin wekhev? Pesn û spasî ji Xwedê re ne, lê belê pirên wan nizanin.

**76.** Xwedê ji du zilaman mînakê dide; yek ji wan lal e, hêza wî li ser tiştekî nîn e û ew li ser xwediyê xwe bar e; Xwediyê wî bi ku ve wî bişîne ew tu qenciyekê nayîne. Vêca erê ma ev (zilam) û ew ê ku bi xwe li ser riyeke rast be û bi dadî ferman dike, dibine mîna hev?

**77.** Zanîna nepeniya erd û asîmanan her ji Xwedê re ye. Rewşa roja qiyametê (li cem Xwedê) wekî çavgirtinekê ye, belkî ji wê jî nêzîktir e. Bêguman Xwedê li ser her tiştî qadir e.

**78.** (Gelî mirovan!) Xwedê hûn ji zikê dayîkên we (biçûk û lawaz) deranîn ku we hîç tiştek nizanîbû. Xwedê guh, çav û dil dane we da ku hûn şukrê Wî bikin.

**79.** Erê, ma ew berê xwe nadin teyran, ew wisan hatine çêkirin ku bi hêsanî li hewayê difirin? Bes Xwedê ye yê ku nahêle ew bikevin. Bêguman di vê de ji bo civateke ku bawerî bîne nîşan hene.

**80.** Xwedê xaniyên we ji bo we kirine rawestgeh. Ji çermên terşan we xanî çêkirin ku ew di roja rêwîtî û cihwarbûna we de hilgirtina wan sivik e. Ji hiri(ya mêşinan), liv(a deveyan) û kej(a bizinan) jî ji bo we navmal gerandiye ku heyanî demekê hûn jê feydê wergirin.

**81.** Xwedê ji tiştê ku afirandî ji bo we sî û sîwan çêkirin. Ji bo we ji çiyan jî mesken afirandin. Ji bo we kiras çêkirin da ku we ji germê biparêzin û ji we re kumzirx çêkirin ku di şer de we biparêzin. Bi vî awayî Xwedê (li dinyayê) qenciya xwe li ser we temam dike da ku hûn ji emrê Wî re berdest bibin.

**82.** Eger dîsa ew berê xwe (ji îmanê) vegerînin, vêca bi rastî erka te bes ragihandina tekûz a aşkera ye.

**83.** Ew (kafir), qenciyên Xwedê li ser xwe dizanin û paşê (bi kar û kiryarên xwe) wan mandel dikin û pirên wan jî kafir in.

**84.** Roja ku em ji her umetekê şahidekî (pêxemberê wan) dişînin, paşê destûra wan ên ku kafir bûne nayê dayîn (ku lêborîna xwe bixwazin) û lêborînxwazî jî ji wan nayê xwestin.

**85.** Dema sitemkar ezab dibînin, ezab li ser wan nayê sivikkirin û ji wan re muhlet jî nayê dayîn.

**86.** Dema muşrik çav bi wan hevpişkan dikevin, ew ên ku wan (ji bilî Xwedê) ew dihebandin, dibêjin: Xwedayê me! Ha ev in, ew hevpişkên ku ji bilî te me ew dihebandin. Vêca hevpişkên wan jî axaftina wan li wan zivirand, gotin: Bi rastî hûn derewker in.

**87.** Di wê rojê de muşrik ji hukmê Xwedê re berdest dibin û yên ku wan lêdianî ji ber wan winda dibin.

**88.** Ew ên ku kafir bûne û riya Xwedê li ber mirovan girtin, bi sedema xerabiya ku kirin, Me ezabê wan qat bi qat zêde kir.

**89.** Wê roja ku ji her umetekê, ji nav wan, li ser wan em şahidekî bişînin û em te jî li ser van (mislimanan) şahid tînin. Me ev Quran ji bo te hinart ku ronkera her tiştî ye û ji bo mislimanan jî jêdera hîdayet, rehmet û mizgîniyê ye.

**90.** Bêguman Xwedê, bi dadiyê, qencîkariyê û xêrpêkirina li eqrebeyan ferman dike û bêrêtiyê, kirêtî û zêdegaviyê li we qedexe dike. Xwedê li we şîret dike da qene hûn bifikirin û jê şîretê wergirin.[1]

**91.** Dema we peyman da, soz û peymanên xwe bi cih bînin. Piştî we sonda xwe mikûm kir û we Xwedê li ser xwe kire şahid, sonda xwe neşkînin. Bêguman Xwedê ya ku hûn dikin dizane.

**92.** Vêca hûn jî nebin wekî wê jinika ku piştî hiriya xwe bi zexm dirêsiya, (ji ber kêmeqliya xwe) dîsa vedikir ku hûn jî sondxwarina xwe bikin hîle û riya xapandinê di navbera xwe de, bi sedema ku hûn leqayî civatekê bibin ku ew (bi hejmar û mal) ji civata (ku we pê re payman daye) hîn bêhtir û bihêztir e. Xwedê bi van soz û peymanan bes we diceribîne û da ku roja qiyametê ya hûn tê de ketin îxtilafê ji bo we aşkere bike.

**93.** (Gelî mirovan!) Eger Xwedê bixwesta dê hûn bikirina yek umet (û ehlê yek dînî), lê belê kî ku delaletê bivê ew wî ji rê dixe û kî jî hîdayete bivê ew wî rasterê dike. Bi rastî jî ji ya ku we dikir hûn ê bêne pirsiyarkirin.

**94.** Sondên xwe, di navbera xwe de nekin riya hîle û xiyanetê, vêca piyên we piştî ku cih girtiye dê bişemite û bi sebûnet we berê xwe û berê xelkê ji rêya Xwedê dagerand hûnê (ezabê) pîs biçêjin û ji bo we ezabekî mezin heye.

**95.** Peymana ku we bi Xwedê re dayî bi nirxekî erzan nefiroşin. Bêguman eger hûn bizanin bes a li cem Xwedê ji bo we çêtir e.

---

1 Xwedê di vê ayetê de sê bingehên esasî ku huzûra mirovatiyê xwe li ser wan digre, li me ferman dike. Li hemberî van sê bingehên xerab ku ew mirovatiyê ji bin ve dihilweşînin li me qedexe dike.

Bingehên baş: Adalet, îhsan û arîkariya li xwediyan e. Adalet: Her tiştî ku di qiwama wê de were kirin, heqê herkesî bi temamî bête dayîn û tevgera merev bipîvan be. Îhsan: Qencîkarî ye, xêrkirine, bexşandine û her tiştî di cihê wê de bikî.

Arîkariya li xwediyan: Çi dûr bin çi nêzik merev qqenciyê li xwediya bikê, hewcetiyê wan temîn bike û ya baş bide ber wan.

Bingehên xerab: Fahşatî, Munker û sitemkarî ye. Fahşatî: Gotin û karên xerab in, mîna zinayê, derewkarî û iftîrayê.

Munker: Tişta ku şerî‘et û aqlê selim rewa nebîne ew munker e. Sitemkarî: Merev xwe li ser xelkê bilind bike, bi vî awayî merev li wan zulmêe bike. Xwedê ev hersê li me qedexe kirine.

**96.** (Lewra;) ya li cem we xelas dibe û ya li cem Xwedê ew seraqetî ye. Ew ên ku xwe (li ser peymana xwe) ragirin, helbet em ê xelata wan bi spehîtirîn a ku dikin, bidin wan.

**97.** Çi mêr be çi jin, kî karekî qenc bike û bawermend be, teqez em ê jiyaneke xweş bikin nesîbê wî û em ê xelata wan bi spehîtirîn a ku dikin, bidin wan.

**98.** Çi dema te dest bi xwendina Quranê kir, vêca xwe ji (şerê) şeytanê qeşitî bi Xwedê xwe biparêze.

**99.** Bêguman ji şeytanî re tu desthilatî li ser yên ku bawerî bînin û yên xwe bispêrin Xwedayê xwe, tune ye.

**100.** Lê belê desthilatiya şeytên, li ser yên ku wî ji xwe re dikin dost û arîkar û li ser yên ku ji Xwedê re şerîkan çêdikin, heye.

**101.** Dema em ayetekê bi ayetekê diguherînin -jixwe Xwedê bêhtir dizane ka ew çi nazil dike- dibêjin: Bes tu li ser navê Xwedê neweyî dibêjî. Nexêr, belkî pirên wan nezan û cahil in.

**102.** Bibêje: Canê Pak (Cibraîl), ew ji cem Xwedayê te bi heqî aniye xwarê da ku yên bawerî anîn mikûm ragire û ji bo mislimanan jî bibe rêber û mizgîn.

**103.** Sond be, em dizanin ku ew dibêjin, ew ê ku wê fêrî wî dike bes mirov in; (ne melayîket in). Ew ê ku hizir dikin (ku qaşo wî Quran fêrî Muhemmed kiriye) biyanî ye; (ne erebî ye). Hal ev e ku ev (Quran) bi zimanekî erebî, aşkera û zelal e.

**104.** Bêguman ew ên ku bawerî bi ayetên Xwedê nayînin, Xwedê wan rasterê nake û ji bo wan ezabekî dijwar heye.

**105.** Bêguman bes ên ku bawerî bi ayetên Xwedê nayînin derewan lê tînin û ew derewker bi xwe ne…

**106.** Ew ê ku piştî bawerî bi Xwedê anî Wî mandel bike, ji bilî yê ku zor lê hatibe kirin û dilê wî jî tije îman be (ew gazin jê nayê kirin). Lê belê kî ji kufrê re sînga xwe veke (û pê xweş bibe) vêca xezeba Xwedê li ser wan e û ji bo wan ezabekî mezin heye.[1]

**107.** Ev (ezab) jî, bi sedem ku wan jiyana dinyayê di ser ya axretê re girtiye. Bêguman Xwedê civata kafir nayîne riya rast.

**108.** Ev ên han, Xwedê mor li ser dil, guh û çavên wan xistiye û ew bi xwe jî bêagah in.

**109.** Bêşik û şubhe di axretê de yên xesirî ew bi xwe ne.

**110.** Paşê Xwedayê te, ji bo yên ku piştî şkencedîtinê hîcret kirin, paşê cîhad kirin û xwe ragirtin (sebir kêşan); bêguman Xwedayê te piştî vê, teqez gunehjêbir e, dilovîn e.

---

1 Li gorî ji Îbnî ebbas hatiye rîwayetkirin; muşrikan Emmar, Yasirê bavê wî, dayîka wî Sumeyye, Suheyb û Bilal girtin û şkence li wan kirin. Sumeyye û mêrê xwe Yasir jî di şkenceyê de hatine kuştin. Di tarîxa îslamê de ew her du şehîdên pêşî ne. Her çî ku Emmar bû, zorî lê kiribûn û wî jî ya ku jê xwestin got. Emmar eva hatî serê ji Pêxember re got. Pêxember got: Tu dilê xwe çawa dibînî? Got: Bi îmanê tije ye. Pêxember got: Eger ew careke din zorê li te bikin tu dîsa wisa bibêje. Vêca Xwedê di heqê vê mijarê de ew ayeta ku li jor borî nazil kir.

**111.** Dibîr bîne wê roja ku her kes tê (meydana hesabê), di ber xwe dide da ku xwe rizgar bike û wê roja her kes çi kiribe jê re tê dayîn û neheqî jî qet lê nayê kirin.

**112.** Xwedê, mîsala warekî dide ku gelê wî di nav selametî û rihetiyê de bûn. Ji her alî ve risqê wan bi firehî ji bo wan dihat, vêca li biwara nîmetên Xwedê nankorî kirin. Êdî Xwedê ji ber a ku wan dikir kirasê birçîbûn û tirsê li wan kir û ew pê çêjandin.

**113.** Sond be, ji wan re pêxemberek ji nav wan hat, vêca wan bawerî pê neanî. Êdî ezab ew hingaftin û teqez ew sitemkar bûn.

**114.** Eger bi rastî hûn bes jê re îbadetê dikin, êdî bi helalî û pakî ji wî risqê ku Xwedê daye we bixwin û şêkiriya nîmetên Xwedê bikin.

**115.** (Xwedê) ji bo we bes heywana mirar, xwîn, goştê berêz û heywana ku ne ji bo Xwedê hatî şerjêkirin, heram kiriye. Vêca kesê ku mecbûrî (xwarina van) bibe, bi şertê ku ne ji dilxweşî be û ji tixûbê hewcedariyê nebore, vêca bêguman Xwedê gunehjêbir e dilovîn e.

**116.** Tu caran, ji cem xwe bi derewî nebêjin: Ev helal e, ev jî heram e ku hûn li ser navê Xwedê neweyî bibêjin. Bêguman ew ên ku li ser navê Xwedê derewan lêtînin bi ser nakevin.

**117.** (Ev a ku bi dest xwe ve anîn) pêxweşî û jiyaneke hindik e û (li axretê jî) ji wan re ezabekî dijwar heye.

**118.** (Resûlê min!) Ew a ku berê Me ji te re gotî, Me ew li cihûyan heram kiribû. Me li wan zilm nekiriye, lê belê wan li xwe zilm dikir.

**119.** Paşê, birastî Xwedayê te ji bo yên ku bi nezanî guneh kirin, piştî hingê poşman bûn û xwe rast kirin, bêguman Xwedayê te piştî vê helbet gunehjêbir e, dilovîn e.

**120.** Bêguman Îbrahîm yek umetek bû, di xêrê de rêber û ji Xwedê re stûxwarbû, ji xwarî û xerabiyê veder bû û ew ne ji muşrikan bû.

**121.** Îbrahîm, şukirdarê nîmetên Xwedê bû, Xwedê ew neqandibû û li ser riya rast û durist ew rasterê kiribû.

**122.** Me li dinyayê kerem pê re kir û bêguman ew li axretê jî ji qencîkaran e.

**123.** (Ya Muhammed!) Paşê me peyam da te, (me got:) bide pey dînê Îbrahîm ku ew ji xwarî û pûçiyê veder bû û ew bi xwe ne ji muşrikan bû.

**124.** Qedexeya di roja şemiyê de, bes li ser yên ku tê de îxtilaf kiribûn hatibû ferzkirin. Bêguman Xwedayê te roja qiyametê der barê wê ya ku ew tê de ketine îxtilafê dê di navbera wan de hukim bike.

**125.** Tu bi zanîn û bi şîreta spehî (mirovan) vexwîne riya Xwedayê xwe û bi wan re bi rindtirîn awayî têbikoşe. Bêguman Xwedayê te bêhtir dizane bi yê ku ji riya wî şaş bûye û Ew bi yê ku rasterê jî bûye bêhtir dizane.

**126.** Eger hûn ceza bidin, bi qasî ya ku li we hatî kirin ceza bidin. Lê belê ku hûn xwe ragirin û sebrê bikêşin, helbet ew ji xweragiran re hê çêtir e.

**127.** Xwe ragire (sebrê bikêşe)! Xweragirtina te jî bes bi Xwedê ye. Ji bo wan xemgîn nebe û ji ber dek û dolabên wan bila bêhna te teng nebe!

**128.** Bêguman Xwedê digel yên ku xwe ji gunehan diparêze û digel yê ku qenciyê dike.

## 17. SÛREYÊ ÎSRA

Sûreyê Îsra 111 (sed û yazdeh) ayet e. li Mekkê daketiye. Ji ber ku ayeta yekem, behsa mucîzeya Pêxember a Îsrayê dike -ku di kêlîkekê şevê de ji Ke'bê çûye Mescidu'l-Eqsayê, ji vî Sûreyî re Îsra, ku bi wateya "lirêçûna bi şev e", hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Xwedê ji her kêmasî û pûçiyê pak û bêrî ye, ew ê ku bendeyê xwe (Muhemmed) di şevekê de ji Mescîd'ul-heramê (Kebê) biriye Mescîd'ul-eqsayê ya ku me hawirdora wê pîroz kiriye, da ku em nîşanên xwe şanî wî bidin. Bêguman Xwedê, her ew e yê bihîzer, yê bîner.

**2.** Me kitêb da Mûsa û me ew ji îsraîliyan re kir riya hîdayetê da ku ji bilî min tu kesî ji xwe re nekin wekîl (piştek û arîkar).

**3.** Ez ji we re dibêjim, gelî kinêsa yên ku me ew digel Nûh (li keştiyê) siwar kirin, bêguman Nûh evdekî zêde şukirdar bû.

**4.** Me di kitêbê de ji îsraîliyan re ragihand ku hûn ê du caran li ser erdê xerabî û tevdanê derînin û bêguman hûn (bi zilm û xerabiya xwe) dê bi serkeftineke mezin bi ser xelkê bikevin.

**5.** Vêca dema çaxê cezadana cara pêşî hat, Me hinek bendeyên xwe yên xwedanhêz û dijwar bi ser wan de şand, vêca ew bi xerabkarî ketin nav welatê we (da ku we bikujin û we dîl bigirin). Ev sozeke misogerbûyî bû.

**6.** (Gelî îsraîliyan!) Paşê li hemberî wan dîsa me serkeftin da we û bi serwet û zarokan me hêza we zêde kir û me hejmara we jî pir kir.

**7.** Êdî eger hûn qenciyê bikin hûn ji bo xwe dikin û eger hûn xerabiyê jî bikin hûn li xwe dikin. Dema çaxê cezakirina cara paşîn hat (em ê dîsa bendeyên xwe yên xwedanhêz û dijwar bi ser we de bişînin) dê rûyê we reş bikin û çawa ku cara pêşîn çûbûn mizgefta (Qudsê) dîsa wisan dê biçin û çi tiştên bi dest bixin dê tarûmar bikin.

**8.** Hêvî heye ku Xwedayê we li we rehmê bike. Eger dîsa hûn (li xerabiyê) vegerin, Em ê jî (li cezakirina we) vegerin. Me dojeh ji bo kafiran kiriye girtîgeh û zîndan.

**9.** Bêguman ev Quran (mirovan) tîne riya herî rast û mizgînê dide bawermendan, ew ên ku kar û kiryarên qenc dikin ku ji bo wan xelateke mezin heye.

**10.** Bêguman ew ên ku bi axiretê bawerî nayînin, me ji bo wan ezabekî dijwar amade kiriye.

**11.** Mirov çawa duaya xêrê ji bo xwe dike her wisa nifiran jî li xwe dike. Însan, (bi siruşta xwe) pir bêtebat e.

**12.** Me şev û roj kirine du nîşan (li ser yekîtî û qudreta xwe), vêca me nîşana şevê jê bir û me nîşana rojê kire ronker da ku hûn li kerema Xwedayê xwe (li risqê xwe) bigerin û hûn (bi herduyan) hejmara salan û hesabê (roj û mehan) bizanin. Me her tişt bi berfirehî ji hev veqetandiye.

**13.** Me deftera emelê her kesî bi stûyê wî ve daleqandiye. Roja qiyametê, em ê jê re deftereke (kar û kiryarên wî) vekirî ji bo wî derînin.

**14.** (jê re tê gotin:) Deftera (emelê) xwe bixwîne! Îro, ji bo hesabdîtinê tu besî xwe yî.

**15.** Kî ku rasterê bibe vêca bêguman ew ji bo xwe rasterê bûye, kî jî ji riya rast bikeve êdî bêguman ew li xwe zerarê dike. Tu gunehkar, gunehê kesekî din hilnagire. Heyanî Em qasidekî neşînin Em tu kesî nadin ezabê.

**16.** Dema em bixwazin xelkê welatekî helak bikin, em fermana qenciyê li dewlemend, serkar û mezinên wan dikin. Vêca ew guhdariya me nakin û ji rê derdikevin. Êdî helak ji bo wan heq dibe, vêca me jî warên wan kavil û wêran kirin.

**17.** Piştî Nûh, Me pir milet (ji ber kufra wan) helak kirine. Xwedayê te, li ser gunehên bendeyên xwe ji haydarî û bînerî ve bes e.

**18.** Ew ê ku bi (tenê) dinyayê bixwaze, em ji bo kesê ku em bivên a ku em bixwazin em ê bidinê, piştre jî em ê wî riswa bikin, (ji rehma xwe) biqewitînin û têxin dojehê.

**19.** Ew ê ku axretê bixwaze û lezê li kirina karê wê bike û digel wê kirinê ew bi bîr û bawer be, vêca xebata wan tê qebûlkirin.

**20.** Em ji dayîna Xwedayê te didine tevan; dayîna Xwedayê te li ser wan nehatiye birîn.

**21.** (Resûlê min!) De binêre, çawa me (di risq û dereceyan de) hin kes di ser hin kesan re girtine û teqez dereceyên axretê gelek çêtir û gelek mezintir in.

**22.** Digel Xwedê tu hevpişkan çêneke, vêca tu yê bibî şermezar û bêarîkar.

**23.** Xwedayê te ferman kiriye ku hûn, bi tenê ji Wî re îbadetê bikin û digel dê û bavên xwe qenciyê bikin. Vêca eger yek ji wan an jî herdu li cem te kal bibin; ji wan re nebêje "Of", wan neêşîne û ji bo wan xebereke xweş û germ bibêje.

**24.** Ji bo wan, bi dilovanî milê xwe ji wan re deyne û bibêje: Xwedayê min çawa ku wan di zarokantiya min de, bi dilovanî ez xwedîkirim, Tu jî li wan dilovaniya xwe bike.

**25.** Xwedayê we, bi ya ku di dilên we de ye bêhtir dizane. Eger hûn qenc bin, vêca bêguman Xwedê ji bo yên ku berê xwe ji neqenciyan vedigerînin û tobe dikin, gunehjêbir e.

**26.** Mafê xizm û xizan û rêwiyan bide û li cihê nerewa û nepêdivî destbelaviyê neke.

**27.** Bêguman ên destbelav dost û birayên şeytên in. Şeytan jî li biwara Xwedayê xwe zêde nankor bû.

**28.** Eger tu berê xwe ji wan (xizm û xizan û rêwiyan) vegerînî, ji ber ku tiştek li cem te nîn e ku tu bidî wan û tu li hêviyê yî ku Xwedê keremekê li te bike (ku tu jî bidî wan), nexwe ji bo wan gotineke xweş bibêje.

**29.** Di riya Xwedê de yekcar destgirtî nebe û bi temamî destvekirî jî nebe, paşê tu yê lomedar û destevala rûnê.

**30.** Bêguman Xwedayê te kê bivê risqê wî fireh dike û kê jî bivê risqê wî teng dike. Bêguman Xwedê bi (kirinên) bendeyên xwe hayedar û bîner e.

**31.** Ji tirsa xizaniyê zarokên xwe nekujin, Em risqê wan û yê we jî didin. Bêguman kuştina wan sûcekî mezin e.

**32.** Nêzîkî zinayê mebin. Bêguman zina karekî kirêt û çi pîserê ye.

**33.** Ji bilî ku sebebekî mafdar hebe, ew canê ku Xwedê (kuştina) wî heram kiriye mekujin. Çi kesê bi zilm û xerezî bê kuştin, vêca me desthilatî (û selahiyet) daye welîyê (xwînwergirê) wî. Êdî bila welî jî di kuştinê de sînor derbas neke. Bêguman (bi dayîna vê selahiyetê) arîkariya wî hatiye kirin.

**34.** Heta sêwî balix nebin û aqil negirin, ji bilî niyeteke baş (ku malê wî biparêze) xwe nêzîkî malê wî mekin. Wê peymana ku hûn didin jî bînin cih. Bêguman peymana ku were dayîn, berpirsiyê pêwîst dike.

**35.** Dema we pîva tam bipîvin û bi mêzîna rast bikêşin. Ev hem (ji aliyê xêrê ve) çêtir e hem ji aliyê encamê ve spehîtir e.

**36.** Nekeve pey a ku der barê wê de tu jê bêagah î. Bêguman guh, çav û dil (xwediyên wan) ji ya ku ew dikin, berpirs in.

**37.** Bi quretî li ser erdê bi rê ve neçe. Bêguman tu (bi giraniya xwe) hîç nikarî erdê biqelişînî û qet tu nikarî bi çiyan re berberiya bilindahiyê bikî.

**38.** Ev hemû li cem Xwedayê te gunehê wan pîs e.

**39.** (Ya Muhemmed!) Ha ev, ew hîkmet in ku Xwedayê te peyama wan daye te û digel Xwedê îlahekî din negire, piştre tu dê şermezar û qewitî, di dojehê de bê werkirin.

**40.** Ma Xwedayê we ji we re kur û ji bo xwe jî ji firîşteyan keç bijartine? Bêguman hûn gotineke (guneh)mezin dibêjin.

**41.** Sond be, Me di vê Quranê de (qise, peyman û gef) aşkera kirine da ku (kafir) aqil bigirin. Hal ev e ku ev ji dûrbûna wan (a ji heqiyê) pê ve tiştekî li wan zêde nake.

**42.** Bibêje: Eger digel Xwedê hin îlahên din jî hebûna wekî ku ew dibêjin, wê çaxê wan îlahan dê li riyekê bigeriyana da ku bigihîştana Xwedê ew ê ku xwedanê 'Erş e (da ku Ew bikuştina û mulkê Wî jê bistandina).

**43.** Xwedê ji her kêmasî û pûçiyê pak e û ji wan tiştên ku ew dibêjin bilind û mezin e.

**44.** Heft asîman, cîhan û her ên ku di nava wan de hene, Xwedê tesbîh dikin. Çi tiştê heyî her bi pesnên tekûz Xwedê dipesinînin û ji her kêmasiyê wî pak didêrin, lê belê hûn tesbîhên wan fehm nakin. Bêguman Xwedê bêhnfireh e, gunehjêbir e.

**45.** (Ya Muhemmed!) Dema tu Quranê bixwînî em perdeyeke veşartî dixin navbera te û wan ên ku bi axiretê bawerî nayînin.

**46.** Ji bo ew Quranê fehm nekin em perdeyekê datînin ser dilên wan û em giraniyekê datînin ser guhên wan. Dema tu di Quranê de bes Xwedayê xwe bi bîr tînî, bêhna wan teng dibe, li pişt xwe vedigerin û diçin.

**47.** Wê dema ew li (xwendina) te guhdarî dikin û dema yên zalim di nav xwe de pistepistê dikin; dibêjin, bes we daye pey zilamekî sêrlêkirî, em bêhtir dizanin ka ew bi çi armancê li te guhdarî dikin!

**48.** De binêre ka der barê te de çi mîsalan tînin! Ji ber vê yekê wan (bi van bêbextiyan) riya heq winda kir, êdî ew hîç nikarin rasterê bibin.

**49.** (Muşrikan înkara qiyametê kir û) Gotin: Ma rast e, dema ku em bibin hestî û ax, ma em ê dîsa wek mexlûqekî nû bêne vejandin?!

**50.** Bibêje: Hûn dixwazin bibin kevir an jî bibin hesin (Xwedê dîsa dê we sax bike û ceza bide we)!

**51.** Yan jî hûn bibin mexlûqekî ku hûn heyîna jiyanê tê de mezin û dûr dibînin. Vêca ewê bibêjin: Ka kî dê me dîsa vegerîne (jiyanê)? Bibêje: Ew ê ku cara pêşîn hûn ji tuneyî afirandine (dê we dîsa vegerîne jiyanê). Li ser vê ew dê bi tinaz serê xwe li te bihejînin û bibêjin: Ew (saxkirin) çi çaxî ye? Bibêje: Teqez ew nêz e.

**52.** Roja ku Xwedê (li ser zimanê Îsrafîl) gazî we bike (da ku hûn ji goran rabin), hûn jî dê digel hemdê wî bersiva banga wî bidin û ji we we ye ku hûn (di gorên xwe de) bes demeke pir hindik mane.

**53.** Ji bendeyên min re bibêje: Bila gotina herî spehî (ji hev re) bibêjin. (Eger ew vê nekin) şeytan dê navbera wan xera bike. Bêguman şeytan ji însên re neyarekî aşkera ye.

**54.** (Gotina herî spehî jî ev e:) Xwedayê we bêhtir bi we dizane, eger bivê (bi tobe û îmanê) dê rehmê li we bike; eger bivê (bi mirina li ser kufrê) dê we ceza bike. (Ya Muhemmed!) Me tu li ser wan berpirs neşandiye.

**55.** Xwedayê te, bi yên ku li asîmanan û erdê hene bêhtir dizane. Bêguman me hin pêxember di ser hinan re girtin û me Zebûr jî daye Dawid.

**56.** Bibêje: De haydê gazî wan ên ku ji bilî Xwedê we hizir dikir ku ew îlah in, bikin. Ew ne dikarin belayê ji ser we rakin ne jî dikarin ji ser we biguhêzin (ser hinekî din).

**57.** Ev mexlûqên ku ew (kafir) li ber wan digerin û wan dikine navgîn bi bal Xwedê ve, erê ma kî ji wan bêhtir nêzîkî Xwedê ye; ew ji bo xwe, bi bal Xwedayê xwe ve li riyekê digerin û rehma wî hêvî dikin û ji ezabê wî ditirsin (Vêca çawa mîna ku ew Xweda bin hûn li ber wan digerin?). Bêguman ezabê Xwedayê te (pir dijwar e û) hêja ye ku jê bê tirsandin.

**58.** Tu welatek (ji yên sitemkaran) nîn e ku em beriya roja qiyametê wan helak nekin an jî em bi awayekî dijwar wan nedin ezabê. Ev di kitêbê de nivîsandî ye.

**59.** Bes a ku em ji anîna mucîzeyan dane paş bi sebunet ku umetên berê bawerî

bi mucîzeyên me neanîbûn (lewra; Xwedê daxwaza wan bi cih anî, belê wan bawerî pê neanîbû). Me wek mucîzeyeke aşkera deveyeke mê dabû gelê Semûd, vêca wan jî (ev deve şerjê kir û) sitemkarî pê kirin. Em mucîzeyan bes ji bo tirsandina (mirovan) dişînin (da ku bêne îmanê).

60. (Ya Muhemmed!) Wê demê me ji te re got: Xwedayê te, (bi zanîn û qudreta xwe) dor li mirovan girtiye (vêca heqiyê ji wan re bibêje û ji wan netirse). Ew dîtina ku (Şeva Mîracê) me nîşanî te dabû û ew dara (rûlê/zeqqûmê ya) di Quranê de, ya lenetlêbar, ji bilî ku mirov pê bêne ceribandin pê ve ne tiştekî din e. Em wan ditirsînin, vêca ev (tirsandin) ji harîtiyeke mezin pê ve tiştekî din li wan zêde nake.

61. Dema me ji firîşteyan re got ji Adem re herin sicûdê, ji bilî Îblîsî tev çûne sicûdê. Îblîs got: Erê ma ez ê çawa herim sicûdê ji bo yekî ku te ew ji heriyê afirandiye?

62. (Îblîs) Got: De ka li vî kesê ku te ew ji min çêtir girtiye binêre! Ez sond dixwim eger heta roja qiyametê tu min sax bihêlî ez ê zuriyeta wî - ji bilî yên salih- ji rê bixim û têxim bin bandora xwe!

63. ( Xwedê jê re) Got: De biqeşite! Vêca kî ji wan dê bide pey te, bêguman cezayê we dojeh e; cezayekî pir û bêkêmasî ye!

64. (Hey Îblîs!) Ji wan kesên ku hêza te li ser wan hebe, bi dengê xwe wan ji rê derxe û bi siwar û peyayên xwe bi ser wan de here û di mal û zarokên wan de bibe hevpar û peymanê bide wan. Lê belê rewş ev e; şeytan ji xapandinê pê ve tu soz û peymanê nade wan.

65. (Hey Îblîs!) Bêguman li ser bendeyên min (yên dilpak) tu desthilatiya te dê tune be. Bi wekîlî û piştevanî Xwedayê te (ji wan re) bes e.

66. (Gelî mirovan!) Xwedayê we, ew ê ku ji bo we li ser deryayê keştiyan dide gerandin da ku hûn li xêr û kerema Rebê xwe bigerin. Bêguman Xwedê ji bo we dilovîn e.

67. Dema di behrê de karesatek bê serê we, ew ên ku hûn li ber wan digerin –ji bilî Xwedê- ew tev li ber we winda dibin. Vêca çaxê Xwedê bi bal bejahiyê ve hûn reha kirin, we pişta xwe dayê (û bi bal şirkê ve çûn). Jixwe însan (bi sirûşta xwe di biwara qenciyan de pir) nankor e.

68. Erê ma hûn ewle ne ku Xwedê li bejahiyê we di erdê de nexe xwarê yan jî keviran li ser we nebarîne, piştre hûn ê ji bo xwe parêzkar û arîkarekî jî nebînin.

69. An jî ma hûn ewle ne ku Xwedê careke din we venegerîne behrê, vêca bahozeke dijwar bi ser we de bişîne da ku bi sedema kafiriya we, we binav bike. Paşê hûn ê ji bo xwe piştgirekî nebînin ku hesabê we ji me bipirse.

70. Sond be, Me ademî xwedanrûmet û rêzdar kirin û Me ew li bejahî û deryayê (li wasîteyên cur bi cur) siwar kirin û Me ew bi tiştên pak û xweş risqdar kirin û Me ew di ser gelek mexlûqên xwe re çêtir girtine.

71. Roja ku Em her mirovî bi pêşewa wî re gazî wî dikin, vêca ji wan kî ku deftera

emelê wî ji rexê wî yê rastê ve were dayîn ew deftera emelê xwe dixwînin û bi qasî derzika sîsika xurmê jî heqê wan nayê windakirin.

72. Ew ê ku li vê (dinyayê) dilkor be, vêca ew li axretê kortir û rêwindatir e.

73. (Ya Muhemmed!) Bi rastî hindik mabû ku muşrik berê te ji wê peyxama ku me ji bo te hinartî vegerînin, da ku tu ji bilî wê li ser navê me ji cem xwe tiştekî lê bînî, wê çaxê teqez dê wan tu ji xwe re bikira dost (û ew ê ji te qayîl bibûna).

74. Eger Me tu ranegirtibûya bi rastî hindik mabû ku te hinekî meyla wan bikira.

75. Dema te meyl bidana wan, Me yê du qatê ezabê dinyayê û hem jî du qatê ezabê mirinê bi te bidaya çêjandin, piştre li hemberî Me te dê ji xwe re arîkarek jî nedîtaya.

76. Nêzîk bû ku ew dinyayê li te teng bikin da ku te ji wê (Mekkeyê) derxin. Wê çaxê piştî te, ew jî ji wextekî kurt pê ve dê li wê nemana (û dê helak bibûna).

77. Rêç û adetê me ev e li ser (helaka gelên) pêxemberên ku me beriya te ew şandin. Di rêç û adetê me de tu yê tu guherînekê nebînî.

78. (Ya Muhemmed!) Dema roj ji nîvê asîmanan werdigere heyanî tarîbûna şevê (nîvro, berêvar, êvar û şevê) nimêj bike û nimêja spêdeyê jî bike. Bêguman nimêja spêdeyê (firîşte) li ser şahid in.

79. Hinek ji şevê rabe bi Quranê nimêj bike ku ev (zêdeyî nimêjên ferz ferzeke zêde ye û) xasê bi te ye. Da ku Xwedayê te, bi wê nimêjê te bişîne meqamê pesinkirî (ku ew jî meqamê şefaeta mezin e).

80. (Di niyaza xwe de) bibêje: Xwedayê min! Min bi rindî têxe nav karê ku tu pê qayil bî û çiqas karê tu pê neqayîl î, bi rindî min jê derîne û ji cem xwe hêzeke arîkar bide min.

81. Bibêje: Heq hat û batil jî ji bin ve rabû. Bi rastî jî batil her ê çûyînê ye.

82. Em ji Quranê hin ayetên wisa dişînin ku ew ji bawermendan re şîfa û rehmet in û ew ji ziyanê pê ve tu tiştî li zaliman zêde nake.

83. Çi dema em qenciyê li însên dikin berê xwe vedigerîne (Xwedê di bîr nayîne û şukrê Wî nake) û çi dema musîbetek wî bihingêve ew gelekî bêhêvî dibe.

84. Bibêje: Her kes (ji me û ji we) li gorî sirûşta xwe (ya ku li serê hatî xuliqandin) kar dike. Di vê rewşê de Xwedayê we bêhtir dizane ka kî li ser riya rast û durist e.

85. Di heqê (heqîqeta) ruh de ji te dipirsin (ka ruh çi ye). Bibêje: Ruh, ji karê Xwedayê min e. (Gelî mirovan!) Ji bo we ji zanîneke hindik pê ve tu zanîn nehatiye dayîn.

86. Sond be, eger em bixwazin em ê wê peyama ku me dayî te ji holê bibin. Paşê di vê rewşê de tu jî dê li hemberî me ji bo xwe tu berevanekî nebînî.

87. Lê belê bi dilovaniya Xwedayê te me ev nexwestiye (ku em Quranê ji ser dilê te rakin û ji bîra te bibin). Bêguman qenciya Xwedê li ser te mezin e.

88. Bibêje: Sond be, eger însan û cin bicivin da ku pirtûkeke mîna Quranê (di

fesahet û belaxet û rastiyê de) bînin, çendî ji hev re bibin arîkar jî ew ê nikaribin kitêbeke wekî wê bînin.

**89.** Sond be me, ji mirovan re di vê Quranê de ji her cure mînak bi awayê jihevcuda aşkera kiriye, lê pirên mirovan ji înkarkirinê pê ve tiştekî din nekirine.

**90.** (Muşrikan ji Pêxember re) Gotin: Em ê bawerî bi te neyînin heyanî ku tu ji bo me ji erdê kaniyekê neherikînî…

**91.** Yan jî, ji bo te bostanekî xurma û rezekî tirî hebin ku di nav wan de bi coş û caş robar biherikin…

**92.** Yan jî, wekî ku tu dibêjî, divê tu esmên parçe parçe di ser me de bînî xwarê, yan jî tu Xwedê û firîşteyan aşkera bînî pêşberî me (em jî bi çavên xwe wan bibînin da ku yeqîn em bizanin ku tu rast dibêjî)….

**93.** Yan jî, divê ji bo te xaniyekî ji zêr hebe yan jî tu hilkişî asîman û em ê bi hilkişîna te ya bal asîmanan jî bawer nekin heyanî tu ji asîmanan kitêbeke (ku te rast bidêre) ji me re danexî jêr û em jî wê nexwînin. Bibêje: Ez Xwedayê xwe (ji her kêmasiyê) pak didêrim. Ma ez ji mirovekî qasid pê ve çi me?

**94.** Dema hîdayet ji mirovan re hatiye, ya ku nehiştiye ew bawerî bînin bes ev gotina wan e; erê ma mimkun e ku Xwedê pêxemberên xwe ji mirovan bişîne!?

**95.** Bibêje: Eger li ser erdê firîşte hebûna ku li serê bigeriyana û li wê bimana, helbet ji asîmanan me dê ji wan re pêxemberekî firîşte bişanda. (Lê belê ji ber ku xelkê erdê mirov in, pêxemberên wan jî dê beşer bin).

**96.** Bibêje: Di navbera min û we de bi şahidî Xwedê bes e. Bêguman Xwedê ji bendeyên xwe agahdar e, bîner e.

**97.** Xwedê kê rasterê bike vêca ew di riya rast de ye û kê jî ji rê bixe êdî ji bilî Xwedê tu dê ji wan re tu dostan nebînî (ku wan bînin ser riya rast). Roja qiyametê em ê wan di rewşekî kor, lal û ker de li ser rûyên wan bicivînin, cihê wan dojeh e, çiqas ku agirê wê kêm bibe em pêta wî zêde dikin.

**98.** Ha ev e cezayê wan, lewra wan ayetên me mandel kirin û gotin, dema em bibin hestî û ax, ma qey em ê dîsa wek mexlûqekî nû bên vejandin?

**99.** Erê ma ew nabînin; ew Xwedayê ku erd û asîman afirandine, ew dikare wekî van wan jî biafirîne? Xwedê ji bo wan civanek daniye ku tê de hîç guman tune ye. Lê belê van zaliman ji mandelkirinê pê ve tiştekî din qebûl nekiriye.

**100.** Bibêje: Eger hûn bibûna xwediyên gencîneyên rehma Xwedayê min, ji tirsa ku dê xerc bibe, dîsa we yê nemerdî bikiraya. Jixwe însan (bi sirûşta xwe) pir nemerd e!

**101.** Sond be, me neh ayetên aşkera dane Mûsa, vêca ji îsraîliyan bipirse, dema Mûsa hate nik wan, Firewn jê re got: Ey Mûsa! Ez guman dikim ku sêr li te hatiye kirin![1]

---

1 Berî her tiştî divê em bidin zanîn ku ev mijar, ya ku Xwedê ji pêxemberê xwe re gotiye, "Ji zaroyên Îsraîl bipirse" ne ew e ku ilmê wê ji wan fêr bibe. Belkî daxwaz ew e ku temamê cihûyan bizanin ku Pêxember rast gotiye. Ev pirs a delîlanînê ye. Ev „Neh ayetên eşkere" ya ku di ayetê de derbas bû ew neh mûcîze ne: Kopal, destê spî, tofan, kuleh, speh, beq, xwîn, duşeqbûna behrê û xela.

**102.** (Mûsa ji Firewn re) Got: Bêguman tu bi xwe jî dizanî ku ji Xwedayê erd û asîmanan pê ve tu kesî din ev ayetên bi îbret danexistine (lê belê dîsa jî tu rikdariyê dikî). Hey Firewn! Bi rastî ez jî, te di helakê de werbûyî dibînim!

**103.** Firewn xwest ku wan ji warê wan derîne, vêca me Firewn û ew ên ku digel wî bûn tev (di deryayê de) binav kirin.

**104.** Piştî (helaka) Firewn, me ji îsraîliyan re got: „Li wê erdê (Misrê) niştecî bibin! Dema peymana axiretê hat em ê we tevan li hev kom bikin û we bi hev re heşir bikin.

**105.** Me, Quran bi heqiyê aniye xwarê (da ku heqiyê aşkera bike) û Quran bi xwe jî bi heqî hatiye. (Ya Muhemmed!) Me tu jî bes bi mizgînber û hişyarkerî şandiye.

**106.** Me Quran mijar bi mijar, ayet bi ayet, (hin bi hin) hinart da ku tu ji mirovan re (hêdî hêdî, bi rihetî) bixwînî (û ew jî wê fehm bikin û ji ber bikin) û me ew (li gorî rewş û bûyeran) li pey hev hinart.

**107.** Bibêje: Hûn dixwazin bawerî bi Quranê bînin û hûn dixwazin neyînin; bêguman ew ên ku beriya vê zanîn ji wan re hatîye dayîn, dema Quran ji wan re bê xwendin, di cih de li ser rûyên xwe diçin sicûdê.

**108.** Dibêjin: Em Rebê xwe pak didêrin. Peymana Xwedayê me teqez tê cih.

**109.** Ew li ser rûyên xwe diçin sicûdê, digel ku digirîn û (xwendina Quranê) tirsa wan a ji Xwedê zêde dike.

**110.** Bibêje: We divê bi (navê) Xwedê gazî bikin û we divê bi (navê) Rehman gazî bikin, vêca (ev) navên herî rind her ji bo Xwedê ne. Di nimêja xwe de jî (Quranê) bi dengbilindî nexwîne (ku muşrik dengê te bibihîzin û ji te re tengezariyê çêkin) û bi dizî jî nexwîne (ku hevalên te dengê te nekin û jê feydê nebînin); di navbera herduyan de riyeke navincî bigire.

**111.** Bibêje: Hemd ji wî Xwedayî re be ku ji xwe re zarok negirtine û di hukimraniyê de tu hevpişk jê re tun in û tu pêdiviya Wî ji hewcedarî ve bi arîkarekî jî tune ye û bi mezindêriyeke mezin Wî mezin bidêre.

## 18. SÛREYÊ KEHF

Sûreyê Kehf, 110 (sed û deh) ayet e. Li Mekkê daketiye. Ji ber ku di ayetên 9ê, 10ê û 11an de bêjeya Kehf derbas bûye ku bi ma'neya"şikeft" e û behsa Eshabul Kehf dike, ji vî sûreyî re Kehf hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Hemd (pesn û sipasî) ji bo Xwedayê ye ku Qur'an ji bendeyê xwe re hinartiye û jê re tu nakokî û xwariyek çênekiriye…

**2.** Ew rast û durist û zêrevan e. (Xwedê ew hinartiye) da ku (kafiran) ji ezabekî dijwar bitirsîne ku ew ji cem Xwedê ye û da ku mizgînê bide bawermendan ew ên ku karên qenc dikin ku birastî ji bo wan xelateke rind heye…

3. Ew di nav xêr û xweşiyan de seraqetî mayînde ne.

4. (Xwedê kitêb nazil kir) da ku yên dibêjin: "Xwedê, ji xwe re zarok girtine" pê bitirsîne.

5. Di vî warî de ne ji bo wan zanînek heye û ne jî ji bav û kalên wan re. Ev gotina ku ji devên wan derdikeve (bêbextîyeke) pir mezin e! Bêguman a ku dibêjin bes derewkarî ye.

6. (Resûlê min!) Ji ber xemkêşiya ku wan bi vê Quranê bawerî neaniye, hindik maye tu nefsa xwe bibî helakê.

7. Bêguman çi tiştê li ser erdê heye Me ji (erdê) re kiriye xeml û xweşkayî da ku em însên pê biceribînin; ka kî ji wan bêhtir kar û kiryarên qenc dike.

8. Bêguman em ê yên li ser erdê hene bi carekê bikin axeke rip û rût.

9. (Resûlê min!) Ma tu guman dike ku rewşa Eshabul Kehf û Reqîmê ji nîşanên Me yên herî ecêb in (belkî ji wan yên ecêbtir jî hene).

10. Dema ew xort bi bal şikeftê ve vehewiyan û wiha dua kirin: Xwedayê me! Ji cem xwe rehmetekê bide me û ji bo vê rewşa em tê de ne ji bo me riyeke rehabûnê amade bike!

11. Vêca Me çend salan di şikeftê de perdeya xewê danî ser guhên wan (û me ew di xew re birin).

12. Paşê me ew hişyar kirin da ku ji herdu birekan (ew ên ku li ser mudeyê razana wan ketibûn îxtilafê) em bizanin ka kê bêhtir mudeyê mayîna wan rindtir hesab kiriye.

13. Em xebera rastîn a serpêhatiya wan ji te re radigihînin; bi rastî ew xortine wisa bûn ku wan bi Xwedayê xwe bawerî anîbû, vêca me jî baweriya wan zêde kir.

14. Me dilên wan (li ser gotina heqiyê) xurt kir, di wê dema ew (li hemberî taxût û muşrikan) rabûn ser piyan û gotin: Xwedayê me; Xwedayê erd û asîmanan e, em ji bilî wî bi tu îlahan naperizin. Eger em (hevpişkan jê re çêkin, wê çaxê) bi rastî em gotineke sitemkar û ji rastiyê dûr dibêjin.

15. Ha ev xelkê me jî, ji bilî Xwedê ji bo xwe hin îlah girtine (û bi wan diperizin). De bila ew delîleke aşkera bînin ku ew xweda ne. Nexwe ma ji wî kesê ku li ser (navê) Xwedê bi derewa iftira bike zalimtir kî heye?

16. (Yekî ji wan xortan wiha got:) Madem we ji wan û (pût)ên ku ji bilî Xwedê ew perestina wan dikin xwe dûr kiriye, nexwe li şikeftê vehewin da ku Xwedayê we rehma xwe li we bike û karê we ji bo we rihet bike.

17. Te didît dema roj hildihat bi rexê rastê yê şikefta wan ve meyl dida û dema diçû ava jî, ji rexê çepê ve li wan nediket û derbas dibû. Her wiha ew di nava valahiya şikeftê de radizan. Ha ev, ji nîşanên desthilatiya Xwedê ye. Xwedê kê bîne ser riya rast, vêca ew li ser riya rast rasterê bûye. Kê jî ji rê bixe, êdî tu dê jê re dostekî ku wî rasterê bike nebînî.

18. Digel ku ew razayî bûn jî ji te we ye ku ew hişyar in (lewra çavên wan vekirî bûn). Me ew diqulibandin aliyê rastê û aliyê çepê (da ku erd goştê wan nexwe)

û segê wan jî, li hewşa şikeftê lingên xwe yên pêş dirêj kiribû û raketî bû. Eger te ew (ser wî halî) bidîtina, tu dê bi lez û bez vegeriyaya û ji ber ya ku te dîtî dilê te tije tirs bibûya.

**19.** (Çawa ku me ew xistibûn xewê) her wiha me ew hişyar jî kirin da ku di nav xwe de ji hev bipirsin; yekî ji wan got: Hûn, çiqas di xew de mane? Gotin: Em rojekê yan jî hinekî ji rojê mane (lewra li nik hilhatina rojê ketibûn şikeftê û li nik avabûna rojê hişyar bûbûn). Gotin: Xwedayê we bêhtir dizane ka hûn çiqas mane. Vêga hûn yekî ji nav xwe bi van diravan bişînin bajêr, bila binêre ji xwarina bajêr a helal û pak ji we re xwarinekê bîne û bila bi tedbîr tevbigere û teqez bila tu kesî bi we nede hisandin!

**20.** Bêguman eger ew bi ser we ve bibin (û cihê we bizanin) dê we bi keviran bikujin an jî dê we vegerînin ser ola xwe ku êdî hûn ê tu carî bi ser nekevin.[1]

**21.** (Çawa ku me ew ji xew hişyar kirin) Her wiha me însan bi wan hisandin ji bo bizanin ku teqez peymana Xwedê (bi vejandina piştî mirinê) rast e û di rastiya roja qiyametê de jî tu guman tune ye. Wê demê der barê rewşa Eshab'ul-Kehf de bi hev ketin û gotin: Li ser wan avahiyekê lêkin (û dev ji wan berdin) Xwedayê wan bêhtir bi wan dizane. Ew ên ku xwedannufûz bûn, gotin: Em ê teqez li ser wan mizgeftekê ava kin.

**22.** Hin ji wan bi texmînî) dê bibêjin: Ew sê bûn, çarê wan jî segê wan e. (Hin jî) dê bibêjin: Ew pênc bûn; şeşê wan segê wan e. (Ev) der barê ya nepenî (xeybê) de texmîn dikin. (Hinek jî dê) Bibêjin: Ew heft bûn, yê heştê wan jî kûçikê wan e. Bibêje: Xwedayê min, bêhtir bi hejmara wan dizane. Ên ku bi wan dizanin pir hindik in. Nexwe der heqê Xelkên Şkeftê de ji bilî nîqaşeke diyar (ku ji te re wehyê diyar kiribe) tu munaqeşeyeke din neke û der barê wan de ji tu kesî (ji yên xwedankitêb) malûmatan nexwaze.

**23.** Ji bo tiştekî ku tu bikî, nebêje, ezê sibehê vî tiştî bikim.

**24.** Heyanî bi xwestina Xwedê ve girênedî (heya tu nebêjî: Xwedê hez bike/ Înşaellah). Dema tu vê ji bîr bikî, Xwedê di bîra xwe bîne û bibêje: Ez hêvîdar im ku Xwedayê min riyeke ji vê çêtir nîşanî min bide.

**25.** Ew di şikefta xwe de sê sed salî (razayî) man û neh salên din jî li vê hatine zêdekirin.

**26.** Bibêje: Xwedê bêhtir dizane ka ew çi qasî mane. Zanîna nependiya erd û asîmanan her ji Wî re ye. Ew çi rind dibîne û çi rind dibihîze! Ji bilî Xwedê, ji bo wan tu dost û arîkarek tune ye. Ew, di desthilatiya xwe de ji bo xwe tu kesî nake hevpişk.

**27.** (Ya Muhemmed!) Ji kitêba Xwedayê xwe wehya ku ji te re hatiye bixwîne.

1 Ew zilamê ku hinartine bajêr da ku ji wan re xwarinê bikire û bîne, çaxê dirav ji bêrîka xwe deranîn da ku xerc bike. Xelkê bajêr dibînin ku wa ye li ser diravan wêneyê Diyoklatiyanus heye. Vêca ji wan weye ku wî gencîneyek dîtiye û wî dibin cem hukimdarê wê demê. Ev hukumdar mirovekî bi eqîdeya filehtiyê bawer bû. Vêca zilamê ciwan ji hukumdar re rûdana ku di serê wan re buhurî dibêje. Tev bi hev re diçin şkeftê û bi ecêbmayîn dibînin ku tişta zilamê ciwan ji wan re gotî, rast e. Xwedê, piştî ku ji wan re da îsbatkirin ku derfeta jinûvesaxbûnê heye, Xwedê ew ciwan mirandin.

Tu kesê ku karibe kelîmeyên Xwedê biguherîne tune ye û ji bilî Xwedê tu dê stargehekê jî ji bo xwe nebînî.

**28.** Digel wan kesên ku sibeh û êvarê li ber Xwadeyê xwe digerin û rizaya Wî dixwazin, xwe ragire. Ji bo ku tu xemla jiyana dinyayê bixwazî, çavên xwe ji wan neguherîne. Bi ya wî kesî neke, ew ê ku me dilê wî ji bîranîna xwe bêhay kiriye û ew ê ku daye pey hewesa xwe û karê wî sînorbihêrî ye.[1]

**29.** Bibêje: Heq ji cem Xwedayê we ye. Nexwe; kî bixwaze bila bawer bike, kî jî bixwaze bila mandele bike. Bêguman me ji sitemkaran re dojeheke wisa amade kiriye ku sûrên wê hawirdor li wan girtiye. Eger ew avê bixwazin, aveke mîna hesinê helandî dê bi hawara wan ve bê ku ser û çavan dibirêje. Ew çi pîs vexwarin e û ew çi pîsecih e ji bo mayînê!

**30.** Bêguman ew ên ku bawerî anîn û karê qenc kirin, birastî Em xelata kesê ku karê rind kiribe winda nakin.

**31.** Ewê ha, ji wan re bihiştên ‘Ednê hene ku di bin wan de çem diherikin. Ew ê di wan de bi bazinên zêrîn bêne xemilandin û dê ji hevrîşimê tenik û armûşê stûr, cilên kesk li xwe bikin û ew ê di wan de li ser textên (xemilandî) pal bidin. (Ev bihişt), çi xweş xelat e û çi xweş wargeh e!

**32.** Ji wan re, ji du zilaman mînak bide; ku yek ji wan Me du rezên tirî dabûnê, me herdu rez jî bi darên xurma sênc kiribûn û me di navbera herduyan de jî çandinî danîbûn.

**33.** Herdu rezan jî fêkiyên xwe dan û tiştek jê kêm nedibû (her sal berê xwe didan). Me di navbera wan de jî robarek dabû herikandin.

**34.** Ji wî re fêkî û dahatên din jî hebûn. Vêca bi hevalê xwe re kete nîqaşê û wiha got: Ez, ji hêla mal ve ji te dewlemendtir im û ji hêla mirovan ve jî ji te xurttir û rûmetdartir im.

**35.** Ew bi rewşeke stemkar çû nav rezê xwe. Got: Ez tu carî guman nakim ku ev bax û bostan wêran bibin.

**36.** Ez bawer nakim ku qiyamet jî hebe. Eger ez li Xwedayê xwe bême vegerandin jî, qet gumana min tun e ku (li wê derê jî) ez ê encameke ji vê çêtir bibînim.

**37.** Havalê wî jî di bersiva nîqaşê de jê re wiha got: Ma tu wî Xwedayê ku tu ji axê, paşê ji dilopek avikê (meniyê) afirandî, piştre jî tu kirî zilamekî tekûz mandel dikî?

**38.** Lê belê ez ne mîna te me, rewşa min ev e ku Xweda perwedegarê min e û ez tu kesî jê re nakime hevpişk.

**39.** Dema tu çûyî nava rezê xwe, bila te bigota: Maşaellah! Hêz bes ya Xwedê ye! Eger ji hêla mal û zarok ve tu min ji xwe kêmtir bibînî….

1 Li gorî ku hatiye ragihandin, Qureyşî li cem Pêxember civiyan, jê re gotin: Eger tu bixwazî ku em baweriyê bi te bînin divê tu van xizanan; Bilal, Xebbab, Suheyb û yên wekî wan ji cem xwe biqewirînî. Lewra hîçepîla me ji vê tê ku em bi wan re bicivin. Naxwe ji bo wan civanekî diyar bike ku li cem te bicivin. Vêca di bara vê mijarê de ev ayet daket.

**40.** Vêca hêvî heye ku Xwedayê min rezekî ji yê te çêtir bide min, ji banî jî birûskan bişîne ser rezê te, îcar dê bibe axeke hişk û hola.

**41.** Yan jî, ava bostanê te dê sergom bibe, careke din tu dê nikaribî li avê bigerî û bibînî.

**42.** Fêkiyên wî hatin dorpêçkirin û tunekirin. Êdî wî ji derdê mesrefa ku li bostên kiriye destên xwe li ser hev danîn û rawestayî ma. Bostanên wan bi ser banê xwe de hilweşiyan. (Zilêm) digot: Wax, xwezî min ji Xwedayê xwe re hevpişk çênekirina!

**43.** Ji bo wî ji bilî Xwedê destekek nebû ku arî wî bike û wî bi xwe jî nikarîbû xwe rizgar bike.

**44.** Ha di wê dema zor de xwedanî û arîkarî her ên Xwedê ne, ew ê ku Heq e. Ew ê ku xelata Wî ya herî rind e û Ew ê ku encama herî rind dide bawermendan.

**45.** Ji wan re vê jî wek nimûne nîşan bide: Jiyana vê cîhanê mîna wê avê ye ku me ji jor ve daxistiye. Bi xêra wê, giyayê ser erdê (pêşî geş dibe) têkilî hev dibe (cîhan pê hêşîn û xweş dibe, piştre) giya hişk dibe (ji hev dikeve), ba wî ji hev derdixe û belawela dike. Xwedê li ser her tiştî desthilatdar e.

**46.** Mal û zarok xemla jiyana cîhanê ne, kar û kiryarên qenc jî li cem Xwedayê te bixêrtir û bihêvîtir in.

**47.** Wê roja ku em çiyan bimeşînin û tê bibînî ku erd bû çoleke vipîvala (bê dar û ber, bê çiya û behr) û Em wan (tevekî bawermend û kafiran) li hev bicivînin û Em yekî ji wan bernedin.

**48.** Hemû pevre sef bi sef ji Xwedayê te re hatine rapêşkirin. Sond be, ka çawa me cara pêşîn (tazî, pêxwas, bê mal û zarok) hûn afirandibûn, her wisa careke din hûn ê bêne ber destên me. Lê we hizir dikir ku em ê ji we re civanekî (saxkirina piştî mirinê) daneyînin?

**49.** Lênivîs (deftera kar û kiryarên mirovan) hatiye danîn, vêca wê rojê tu gunehkaran dibînî ku ew ji ya tê de hatiye nivîsîn bitirs in û dibêjin: Wax li halê me be! Ev çi kitêb e, çiqas gunehek hebe, çi biçûk çi mezin, bernedaye; her ew tê de nivîsiye û her çiqas tiştên li dinyayê kirin dîtin ku (di kitêbê de) nivîsandî ye. Xwedayê te qet li tu kesî neheqiyê nake.

**50.** Dema me ji firîşteyan re got: Ji Adem re (ji bo rêzgirtinê) herin sicûdê, vêca ew jî jê re çûne sicûdê. Ji bilî îblîs (ew neçû sicûdê), ew ji cinan bû, vêca ew ji fermana Xwedayê xwe derket. (Gelî mirovan!) Erê ma hûn, ji bilî min, iblis û kinêsa wî ji xwe re dikin dost û arîkar? Hal ev e ku ew dijminên we ne. Ji bo wan zaliman ev çi pîs bedêl e (ku Xwedê bihêlin û îblîs ji xwe re bikin dost û arîkar)!

**51.** Min ew (îblîs û kinêsa wî) nekirine şahid li ser çêkirina erd û asîmanan û min ew nekirine şahid li ser afirandina wan bi xwe jî. Ez ne Ew im ku jirêderketiyan ji xwe re bikim arîkar.

**52.** Wê rojê (Xwedê ji muşrikan re) dibêje; Gazî wan (hevpişkan) bikin, ew ên ku

we ew ji min re dikirin heval û şerîk. Ew jî gazî wan dikin; lê belê bersiva wan nadin. Me newaleke xeternak (ku dojeh e) xistiye navbera pût û perestiyên wan.

**53.** Gunehkaran agir dît, vêca wan yeqîn kir ku ew ê bikevinê û tu çare nedîtin ku wan jê bide paş.

**54.** Bi rastî Me di vê Quranê de ji bo mirovan her texlîtên mînakan aşkera kirine (da ku îbret bigirin). Lê belê însan ji her tiştî pirtir ji miqersiyê hez dike.

**55.** Piştî ku hidayet ji wan re hat, ji bilî ya ku bi serê yên berî wan de hatî, yan jî ji nişka ve ku ew tûşî ezabê bibin pê ve, ma çi tiştî ew ji baweriyê û ji daxwaza lêborîna (gunehên xwe) ji Xwedayê wan, ew dane paş?!

**56.** Em pêxemberan bes wek mizgînber û hişyarker dişînin. Ew ên ku kafir bûne jî têdikoşin da ku heqiyê bi batilî ji holê rakin û wan ayetên me û ew ezabê ku ew pê hatibûn tirsandin, pêkenok girtin.

**57.** Ma ji wî kesê ku bi ayetên Xwedayê xwe hatibe hişyarkirin, vêca berê xwe ji wan vegerîne û gunehên ku bi destên xwe kirin ji bîr bike, zalimtir kî heye? Bêguman Me perdeyek daniye ser dilên wan da ku Quranê fehm nekin û Me kerîtiyek xistiye guhên wan (da ku heqiyê nebihîzin). Eger tu gazî wan bikî bal riya rast ve jî ew tu carî rasterê nabin.

**58.** Xwedayê te, gunehjêbir û xwedanmerhemet e. Eger ji ber gunehên ku ew dikin, pê re pê re (li cîhanê) ew ceza bikirina, dê bi lez ezab bidaya wan. Lê belê ji wan re civanekî diyar heye. (Dema ew civan hat) êdî ew ê ji bo xwe stargehekê nebînin.

**59.** Xelkên wan welatan dema zilm kirin (û îman neanîn) Me ew helak kirin. Me ji bo helakkirina wan civanekî aşkera danî (vêca tiştê bi serê wan de hatî dê bi serê we de jî bê).

**60.** Dema Mûsa ji xortê digel xwe re got: Ez nawestim û ranawestim heyanî negihîjim cihê ku herdu derya digihên hev an jî ez ê demeke dirêj bi rê ve herim.

**61.** Çi dema herdu gihîştin wî cihê ku herdu derya digihan hev, wan masiyê xwe ji bîr kir. Masî, di behrê de ber bi qulekê ve rê girt û çû.

**62.** Çi dema herdu (ji wî cihê hevdîtinê) derbas bûn û çûn, Mûsa ji şagirtê xwe re got: Taştiya me ji me re bîne. Bi rastî vê rêwîtiya me em gelekî westandin.

**63.** Şagirtî got: Ma te dît, dema me xwe avêt ber wî zinarî min masî (li wir) ji bîr kir. Bes şeytên bi min da jibîrkirin ku ez qiseya masî ji te re bibêjim. Masî di behrê de riya xwe girt û çû, ev rewşeke ecêb bû.

**64.** Mûsa got: Ha ev bû ya ku em lê digeriyan. Di cih de li pey şopa xwe vegeriyan (û hatin cem zinêr).

**65.** Herduyan ebdek ji îbadên me dîtin ku Me ji cem xwe rehmetek dabû wî û ji nik xwe Me ew hînî zanîneke taybet kiribû.

**66.** Mûsa jê re got: Ma ez digel te bêm da ku wek rêber tu wê zanîna ku ji te re hatiye dayîn, fêrî min jî bikî?

67. (Evd ji Mûsa re) Got: Bi rastî tu dê nikaribî digel min xwe ragirî.

68. Ma çawa tu dê li hemberî zanîneke ku di rastiya wê de tu nagihîjî sebrê bikêşî?

69. (Mûsa jê re) Got: Înşaellah tu dê min sebirkêş bibînî û ez ê li ber fermana te jî ranebim.

70. (Evdê Salih jê re) Got: Eger tu bidî pey min, hetanî ku ez ji te re rastiya wê nebêjim, tu bi xwe der barê tu tiştî de ji min pirsê neke.

71. Li ser vê (şertê ku gotî) herdu bi rê ve çûn. Paşê, dema herdu siwarî keştiyê bûn, wî keştî qul kir. Vêca Mûsa jê re got: Ma te keştî qul kir ji bo ku tu xelkê tê de bixeniqîne? Bi rastî te karekî kirêt kir!

72. (Evd ji Mûsa re) Got: Ma min ji te re negotibû ku tu yê nikaribî bi min re xwe ragirî?

73. Mûsa (jê re) got: Ji ber tiştê ku min ji bîr kiriye li min negire û di karê min de ji min re zorê derneyîne.

74. Dîsa herdu bi rê ve çûn. Paşê, dema rastî zarokekî hatin, evdê salih di cih de ew (zarok) kuşt. Mûsa jê re got: Bêyî ku wî canek kuştibe Te çima canekî pak kuşt, birastî te tiştekî nerind kir!

75. (Evdê Salih ji Mûsa re) Got: Ma min ji te re negotibû ku tu yê nikaribî bi min re sebrê bikêşî?

76. Mûsa got: Eger piştî vê carê ez tiştekî ji te bipirsim êdî hevaltiya min neke. Birastî ji aliyê min ve tu gihiştî lêborîna dawîn (êdî rûyê min nagire ku ez lêborînê ji te bixwazim).

77. Dîsa herdu bi rê ve çûn heta gihîştin xelkê gundekî, ji wan xwarin xwestin. Vêca xelkê gund bi mêvantî ew nehewandin. Di vê navê de li wê deverê rastî dîwarekî hatin ku xwar bûbû û dikir biherife. Wî di cih de ew rast kir. Mûsa jê re got: Eger te bixwesta teqez te yê ji ber vê heqdestê xwe bistanda.

78. (Evdê salih) got: Ha ev, jihevcudabûna min û te ye. Vêga ezê şîroveya wan tiştên ku te nikarîbû li hemberî wan xwe ragirta ji te re bibêjim.

79. Heçîka keştî ye, ew a çend xizanan bû ku ew di deryayê de dixebitîn. Min xwest wê eybdar bikim, (lewra;) li pêşiya wan hukimdarek hebû ku her keştî(ya saxlem) bi zorê ji wan distand.

80. Herçî ku zarok bû dê û bavên wî mirovên bawermend bûn, vêca em tirsiyan (ku zarok) wan noqî batil û kufrê bike.

81. Vêca me xwest ku Xwedayê wan di şûna wî de yekî ji wî çêtir û li ser wan dilovantir, bide wan.

82. Herçî ku dîwar bû, ew di bajêr de yê du zarokên sêwî bû û di bin de xezîneyeke wan hebû û bavê wan jî mirovekî salih bû. Vêca Xwedayê wan xwest ku ew herdu zarok bigihîjin çaxê xurtiya xwe û gencîneya xwe derînin. Ev rehmetek bû ji Xwedayê te û min ev jî ne ji ber xwe ve kirin. Ha ev e şîroveya wan tiştên ku te nikaribû li hemberî wan xwe ragirta.

83. (Ya Muhemmed!) Pirsa Zulqerneyn, ji te dikin. Bibêje: Ez ê ji we re der heqê wî de wehyê bixwînim.

84. Bêguman me ew li ser rûyê erdê kire xwedanderfet û me ji her tiştî re rê û navgînek dayê (da ku xwe bigihînê).

85. Vêca ew jî ket pey wan rêyan.

86. Heta gihişt wî cihê ku (li gorî dîtina çavan) roj lê diçû ava. Dît ku va ye ew di kaniyeke herîreşik de diçe ava û li wê derê qewmek dît. Me jê re got: Ey Zulqerneyn! An tê ezab bidî wan an jî der barê wan de tê ya spehî (esas) bigirî (wan gazî îmanê bikî).

87. Zulqerneyn got: Ew ê ku zilmê bike, em ê wî ceza bikin, piştre ew ê li Xwedayê xwe bê vegerandin; ji bo vê Xwedê jî dê ezabekî dijwar bidiyê.

88. (Xwedê got:) Herçî ew kesê ku bawerî bîne û kar û kiryarên qenc bike, vêca jê re xelata herî spehî heye û ji fermana xwe, em ê ya (rihet û) hêsan jê re bibêjin.

89. Piştre dîsa ew kete pey wan rê û derfetan.

90. Heta gihîşte cihekî ku roj lê dihilat, wî dît ku wa ye roj li ser miletekî wisa dihilat ku ji rojê pê ve me tu starek ne dabû wan (roj zamanakî dirêj li ser wan nediçû ava).

91. Ev a te bihîst wisa bû û teqez bi her tiştê li balê (û ya dihate kirin) me agahî hebû.

92. Piştre dîsa ew kete pey wan rê û derfetan.

93. Paşê dema gihîşt nava du çiyan, li wir miletek dît ku (ji bilî zimanê xwe) tu ziman nedizanîn.

94. Wan got: Ey Zulqerneyn! Bi rastî li vî welatî yacûc û macûc xerabiyê dikin. Vêca ma tu ji vê re çi dibêjî ku em ji malê xwe heqekî bidin te da ku tu di navbera me û wan de sûrekê çêkî.

95. Zulqerneyn got: Ew mal, milk û hêza ku Xwedayê min daye min ji wê heqdestê ku hûn bidine min çêtir e. Hûn ji aliyê hêzê ve arîkariya min bikin da ku ez di navbera we û wan de sûreke asê çêkim.

96. Parçeyên hesin ji min re bînin, (parçeyên hesin danîn ser hev) heta navbera herdu çiyan misêwayî hev bû. (Zulqerneyn ji wan re) got: Pif bikinê (û agir geş bikin! Wan jî agir xweş kir) heta ku hesin bû agir. (Zulqerneyn) got: Ji min re sifrê heliyayî bînin da ku birêjim serê.

97. Êdî (yacûc û macûcan) ne dikarîn biserkevin û ne jî dikarîn wê qul bikin.

98. (Zulqerneynî) got: Ev a (min çêkirî) ji cem Xwedayê min rehmetek e. Lê belê dema peymana Xwedayê min were, ew ê vê sûrê bi erdê ve rast û hilû bike. Bêguman peymana Xwedayê min heq e (teqez ew ê were cih).

99. Wê rojê em dev ji wan berdidin; hin ji wan li hinan dikevin û dikeyin û (tu dinêrî ku) di sûrê de hate pifkirin, vêca me ew li hev kom kirine.

100. Di wê rojê de em ê dojehê ji bo kafiran berçav bikin.

**101.** Ew kafirên ku çavên wan derbarê Qur'ana min de girtî û perdekirî bûn û wan nikarîbûn guhdariya (heqiyê) bikirina.

**102.** Erê, ma ewên kafir bûne hizir dikin ku ew dikarin ji bilî min, bendeyên min ji xwe re bikin dost û piştevan? Bêguman Me dojeh ji bo kafiran kiriye wargeh.

**103.** (Ya Muhemmed!) Bibêje: Ma em ji we re ên ku di karê xwe de herî zêde ziyan kirin, nebêjin?

**104.** Ew ên ku kar û xebata wan li jiyana cîhanê pûç bûye. Hal ev e wan hizir dikir ku ew karekî qenc dikin.

**105.** Ev ên ha, yên ku ayetên Xwedayê xwe û çûna hizûra Wî mandel kirin; vêca xebata wan pûç bûye. Em roja qiyametê ji bo wan tu qîmetekê nagirin.

**106.** Evên ha, bi sedema ku wan bawerî neanî û tinazên xwe bi ayet û qasidên Min kirin cezayê wan dojeh e.

**107.** Bêguman ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirin, ji wan re bihiştên Firdewsê, cih û wargeh in.

**108.** Ew ê her û her tê de bin û ew naxwazin jê derkevin.

**109.** Bibêje: Eger ji bo peyvên Xwedayê min derya hibir bûna û me ew qasî din jî lê zêde bikira, beriya ku peyvên Xwedayê min biqedin ew ê derya biqediyana.

**110.** Bibêje: Bêguman ez bes wekî we mirovek im. (Lê ev heye), peyxam ji bo min hatiye hinartin; Xwedayê we her Xwedayekî bi tenê ye. Êdî kesê ku xelata Xwedayê xwe hêvî bike û ji ezabê wî bitirse, bila karekî qenc bike û di îbadetê xwe de qet tiştekî ji Xwedayê xwe re neke heval û hevpişk!

## 19. SÛREYÊ MERYEM

Sûreyê Meryemê, 98 (not û heşt) ayet e. Li Mekkê daketiye. Ev sûre, digel dabaşên din jî ji ber ku bi taybetî behsa Meryemê û anîna wê ya Îsa ya cîhanê dike jê re Sûreyê Meryemê hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Kaf, Ha, Ya, 'Eyn, Sad.

**2.** Ev behsa dilovaniya Xwedayê te ye, ya ku bi bendeyê xwe Zekeriya re kiriye.

**3.** Dema Zekeriya bi dengekî nizm li ber Xwedayê xwe geriya.

**4.** Got: Xwedayê min! Ji kalîtî hestiyê min lawaz bûne û pora serê min sipî bûye. Xwedayê min! Ez, bi duayên ku min ji te (kirin) qet bêhêvî nebûme.

**5.** Birastî ez piştî xwe ji yên ku bikevin ser kar endîşe dikim (ku ew dîn berevajî nîşan bidin). Pîreka min jî zarokan nayîne, vêca ji cem xwe serkar û mîratgirekî bide min.

6. Da ku ew bibe mîratgirê min û mîratgirê mala Yaqûb jî. Xwedayê min, wî bike layîqê rizaya xwe!

7. (Xwedê jê re got:) Ey Zekeriya! Em mizgîniya kurekî wisa didin te ku navê wî Yehya ye ku beriya wî Me tu kes bi vî navî nav nekiriye.

8. (Zekeriya) Got: Xwedayê min, dê çawa kur ji bo min çêbe, pîreka min zarokan nayîne û ez jî ji ber kalîtiyê hişk û zuha bûm e?!

9. Belê, gotina te rast e, lê Xwedayê te dibêje: Ew ji min re hêsan e. Birastî min tu berê afirand digel ku tu qet tune bû yî jî.

10. Zekeriya got: Xwedayê min! (Derbarê hemlebûna jina min de) nîşanekê bide min. Xwedê jê re got: Nîşana te ev e; tu yê sê şev (û sê rojan) bi mirovan re nikaribî bipeyivî.

11. Li ser vê Zekeriya ji mîhraba mizgeftê derkete pêşberî gelê xwe; bi îşaretekê ji wan re got: Sibeh û êvaran Xwedê tesbîh bikin (yanî; nimêj bikin).

12. (Me jê re got): Ey Yehya! Kitêbê bi hêz bigire. Me hêj di zarokîtiya wî de hîkmet dabûyê.

13. Me ji cem xwe henûnî û pakî dayê û ew mirovekî teqwadar bû.

14. Ji dê û bavê xwe re qenc bû û ew ne xwemezindêrekî neguhdar bû.

15. Silav li ser be; roja ew bûyî, roja ew bimire û roja ku ew ji gorê bê vejandin!

16. (Ya Muhemmed!) Di vê kitêbê de behsa Meryemê jî bike; dema ew ji malbata xwe vederbû û rexê rojhilat (ê mizgeftê) ji xwe re kire wargeh.

17. Êdî Meryemê di nav xwe û wan de perdeyek kişand. Me Cibrîl şande cem û di şeklê însanekî tekûz xwe nîşanî wê da.

18. Meryemê jê re got: Ez xwe bi Xwedayê ku rehman e ji te diparêzim! Eger tu birastî mirovekî xwedêtirs bî (nêzîkî min nebe).

19. Cibrîl jê re got: Ez bes qasidê Xwedayê te me da ku kurekî pak bidime te.

20. Meryemê jê re got: Dê çawa kur ji min re çêbe, digel ku tu kesî dest nedaye min û ez ne jineke dawpîs im jî.

21. Cibrîl jê re got: Fermana Xwedê wisa ye (bêyî destdanekê zarok dê ji te re çêbibe). Xwedayê te got: Ev li ber min hêsan e û da ku em wî ji cem xwe ve ji bo mirovan bikin nîşan û dilovanî. Ev karekî ku biryara wî hatiye dayîn (û dê her çêbe).

22. Meryem bi Îsa ducan bû. Vêca ji ber vê yekê xwe kişand cihekî dûr.

23. Êşa zarokçêbûnê berê wê da (ber) dara xurmê (da ku xwe pê bigire), got: Xwezî beriya vê (rewşê) ez bimirama û ez ji binî ve bihatma jibîrkirin.

24. Vêca (piştî vê xemgîniya wê) (Cibrîl) ji binê wê darê wiha gazî Meryemê kir: Xemgîn mebe! Xwedayê te, li pêşberî te coyeke avê aniye holê.

25. Dara xurmê bi bal xwe ve bihejîne, da ku xurmeyên ter û gihayî bi ser te de biweşin.

26. Vêca (ji wan xurme û avê) bixwe, vexwe û bila çavên te (bi kurikê te) ronî be!

Eger tu yekî ji mirovan bibînî (û pirsa vî kurî ji te bike. Jê re wiha) bibêje: Min, ji Xwedayê rehman re (rojiya) nepeyivînê li xwe nezir kiriye; êdî îro ez ê bi tu kesî re neaxivim.

**27.** Meryemê Îsa hilgirt (da ber sînga xwe) û anî cem gelê xwe. Jê re gotin: Ey Meryem! Bi rastî te karekî pir xerab û nebûyî kiriye!

**28.** Ey xweha Harûn! Bavê te ne mirovekî xerab bû û dayîka te jî ne pîrekeke dawpîs û nebaş bû.

**29.** Meryemê zarok destnîşan kir (ku ji wî bipirsin). Gotin: Em ê bi zarokekî dergûşê re çawa bipeyivin?

**30.** Zarok wiha got: Ez bendeyê Xwedê me, Xwedê kitêb (Încîl) daye min û ez kirime pêxember.

**31.** Ez li ku dibim bila bibim, Xwedê ez pîroz gerandime û heta ku ez li jiyanê bim ferman li min kiriye ku nimêj bikim û zekatê bidim.

**32.** (Xwedê li min ferman kiriye) ku li dayika xwe qenciyê bikim û ez nekirime xwemezindêrekî gunehkar.

**33.** Roja ku ez bûm, roja ku ez bimirim û roja ku piştî mirinê ez bême vejandin, silav her li min be.

**34.** Ha rastiya qiseya Îsayê kurê Meryemê ev e; ew rastiya ku (cihû û fileh) der barê wê de guman dikirin.

**35.** Ne babetê Xwedê ye ku ji xwe re zaroyekî bigire. Xwedê (ji van pûçegotinan) pak û dûr e. Dema ew bixwaze tiştekî bîne rastê, jê re tenê dibêje: „Bibe!“ Ew jî çêdibe.

**36.** (Îsa got:) Bêguman Xweda perwerdegarê min û we ye, nexwe jê re îbadetê bikin. Ha ev e riya rast û durist.

**37.** Piştre ref û komên îsraîliyan (di heqê Îsa de), di nav xwe de ji hev cuda bûn. Vêca wax li halê wan kafiran be, ew ên ku ji dîmenê rojeke mezin bêbawer in![1]

**38.** Roja ku ew bên hizûra me, dê çi qenc bibihîzin û bibînin (ya ku bê serê wan)! Lê belê ew sitemkar îro di rêşaşiyeke aşkera de ne.

**39.** (Ya Muhemmed!) Wan (ji erjengiya ezabê) roja poşmanî û kulan hişyar bike; ew roja ku hesabdîtin bidawî dibe. Rewş ev e ku ew di nav xefletê de ne û ew baweriyê bi wê (rojê) nayînin.

**40.** Bêguman her em in mîratgirê erdê û mîratgirê çi qas ên li ser erdê jî hene û ew ê li me bên vegerandin.

**41.** (Ya Muhemmed!) Di kitêbê de behsa Îbrahîm jî bike, bi rastî ew pêxemberekî pir rastgo bû.

**42.** Wê demê Îbrahîm ji bavê xwe re got: Bavê mino! Çima tu îbadetê tiştekî wisa dikî ku ew nabihîze, nabîne û hîç nikare tu feydê jî bide te?

1 Îsraîlî derheqî Îsa de bi hev ketin; hinekan got ku Îsa Xwedê ye, hineke din gotin ku ew kurê Xwedê ye û hinekan jî got ku diya wî bi dawnepakî gunehkarî kirîye.

43. Bavê mino! Bêguman zanînek (wehyek) ji min re hatiye ku ew ji te re nehatiye. Nexwe bide pey min, ez ê te bînim riyeke rast.

44. Bavê mino! Şeytên nehebîne! Bêguman şeytên bêemriya Xwedayê rehman kiriye.

45. Bavê mino! Bêguman ez ditirsim ku ji Xwedayê rehman ezabek te bihingêve û tu bibî dost û hevalê şeytên.

46. (Vêca bavê wî jê re) Got: Ey Îbrahîm! Ma tu berê xwe ji îlahên min diguherînî? Eger tu venegerî, sond be ku ez ê te bi keviran birecimînim û demeke dirêj ji min dûr bibe.

47. (Îbrahîm jê re) Got: Silav li ser te be, ez ê ji bo te lêborînê ji Xwedayê xwe bixwazim. Bêguman ew ji min re pir qencîkar e.

48. Ez ê ji we dûr bikevim û ji wan (pût)ên ku ji bilî Xwedê hûn ji bo wan îbadetê dikin û ez ê ji Xwedayê xwe dua bikim. Ez hêvî dikim ku bi gaziya Xwedayê xwe bêhêvî nebim.

49. Paşê, dema Îbrahîm ji wan û ji ên ku ji bilî Xwedê ew dihebandin xwe dûr kir, Me Îshaq (bi kurîtî) û Yaqûb (bi nevîtî) danê û me her yek ji wan jî kire pêxember.

50. Me ji bo wan ji rehma xwe (qenciya dinya û axretê) bexişand û Me nav û dengê wan bi qencî (di nav xelkê de) bilind kir.

51. (Ya Muhemmed!) Di kitêbê de behsa Mûsa jî bike. Bêguman ew bijare bû û ew qasid û pêxember bû.

52. Me ji rexê rastê, yê Çiyayê Tûr gazî wî kir û me ji bo munacatê ew tam nêzî xwe kir.

53. Me ji qencî û dilovaniya xwe, birayê wî Harûn jî digel wî kire pêxember.

54. Di kitêbê de behsa Îsmaîl jî bike; bêguman ew wefakarê peymana xwe bû û ew hem resûl hem jî pêxember bû.

55. Îsmaîl şîreta nimêj û zekatê li xelkê xwe dikir û ew li cem Xwedayê xwe mirovekî jêqayîl bû.

56. Di kitêbê de behsa Îdrîs jî bike; bêguman ew pêxemberekî rastgo bû…

57. Me ew hildaye cihekî bilind.

58. Ha evên ha, ew ên ku Xwedê nîmet daye wan; ji pêxemberên ku ji kinêsa Adem in û ji yên ku me ew digel Nûh (li keştiyê) siwar kirin û ji kinêsa Îbrahîm û Îsraîl (Yaqûb) û ji yên ku Me ew anîne ser riya rast û Me ew (ji bo pêxemberiyê) bijartine. Dema ayetên Xwedayê rehman ji wan re tên xwendin (ji tirsa Xwedê) ji xwe ve diçin û bi girî diçin sicûdê.

59. Paşê, di pey wan (qencan) de nifşekî wisa hat ku dest ji nimêjê berdan û li pey hewesên xwe çûn, vêca ew ê nexweşî û azarê bibînin.

60. Lê belê ewên ku ji kirinên xwe poşman bibin, bawerî bînin û karê qenc bikin, vêca ha ev dê biçin bihiştê û tu neheqî li wan dê neyê kirin.

61. (Ew) Bihiştên ‘Ednê (lêmayînê) ne ku Xwedayê rehman di xeybê de peymana wan ji bendeyên xwe re daye û wan bêyî ku bibînin bawerî pê aniye. Bêguman peymana Xwedê dê were cih.

62. Li wir, ew ê ne gotinên kelevajî; dê bes silavê bibihîzin. Li wir sibeh û êvarê rizqê wan ji wan re amade ye.

63. Ha ev e, ew bihişta ku ji bendeyên xwe em ê bidin kesê ku teqwadar be.

64. (Xwedê ferman li Cebraîl kir ku bibêje:) Em bes bi fermana Xwedayê te û bi destûra wî têne xwarê. Çi tiştê li ber destê me û çi ya li dûv me û çi ya ku di navbera van de heye, tev ên Xwedê ne (û her tişt bi fermana wî ye). Xwedayê te qet ne jibîrker e.

65. Ew, Xwedayê erd û asîmanan e û Xwedayê çiqas tiştê di navbera wan de ye. Nexwe, îbadetê Wî bike û li ser kirina îbadetê Wî sebrê bikêşe. Erê ma tu jê re hemkûfekî din dizanî?

66. Însan(ê kafir) dê bibêje: Dema ez bimirim, ma qey rast e ku ez ê dîsa (ji gorê) sax bême deranîn?

67. Ma însan nahizire! Me ew afirandiye digel ku berê ew tune bû.

68. Vêca bi Xwedayê te sond be, teqez em ê wan û şeytanên wan (li mehşerê) pêkve bicivînin, piştre em ê wan li ser çokên wan li dora dojehê kom bikin!

69. Piştre, ji her komekê ên ku li hemberî Xwedayê rehman bêhtir gunehkar be, em ê (ji nav wan) derînin.

70. Paşê, birastî jî Em, bi yên ku çûna dojehê bêhtir heq kirine baş dizanin.

71. Ji we her kes (çi mumîn û çi kafir) her wê bê ser dojehê û dê wê bibîne. Ev ji Xwedayê te hukmekî vebirî ye.

72. Piştre em ê yên ku xwe (ji muşrikî û kufrê) parastine reha bikin û Em ê sitemkaran jî li ser çokan rûniştî di dojehê de wisa bihêlin.

73. Dema ayetên Me yên aşkeraker ji mirovan re dihatin xwendin, ên ku kafir bûne ji yên bawermend re digotin: Ma ji me herdu civatan cih û warê kê çêtir e û dîwana kê spehîtir e?

74. Beriya wan jî me gelek milet ji navê birin ku ew ji aliyê pertal û dîtbarî ve (ji wan) rindtir bûn.

75. Bibêje: (ji me û we) kî di rêşaşiyê de be, bila (Xweda yê) Rehman muhletê bide wî, heta dema ya ku Xwedê ji wan re pê peyman dayî bibînin; yan ezabê vê dinyayê (ku têkçûna li hember bawermendan e) yan jî ezabê axretê bibînin, vêca wê çaxê ew ê bizanin ka ji hêla cih û war ve kî pîstir e û ji hêla leşkerî ve kî qelstir e.

76. Xwedê, ew ê hîdayeta wan bendeyên ku hatine ser riya rast zêde bike. Kar û barên qenc ên ku (ji bo mirov) dimînin, li cem Xwedayê te çêtir in û encama wan baştir e.

77. Ka ji min re bêje; ma tu ecêb naminê ji wî yê ku ayetên me inkar dike û got: Teqez mal û zarok (li axretê) dê ji min re bên dayîn.

**78.** Ma xeyb li ber wî vebûye, yan jî ma wî ji cem Xwedayê rehman peymanek wergirtiye?

**79.** Na, em ê ya ku ew dibêje binivîsin û em ê ezabê wî her dirêj bikin.

**80.** Em ê bibin warisê ya ku ew (ji mal û zarokan) dibêje û ew ê bi tenê dê bi bal me ve bê.

**81.** Wan ji bilî Xwedê îlah ji xwe re girtin da ku ji wan re bibin hêz û arîkar.

**82.** Na, mabûdên wan dê (roja qiyametê) îbadetên wan qebûl nekin û wê ji wan re bibin neyar.

**83.** Ma tu nabînî? Me şeytan museletî ser kafiran kir; wan rind diajo ser gunehkariyê.

**84.** Nexwe, der barê wan de lez meke. Em rojên wan yeko yeko dijimêrin.

**85.** Roja qiyametê Em mutteqiyan qefle bi qefle li cem Xwedayê rehman kom dikin.

**86.** Em, sucdaran jî tî diajon dojehê.

**87.** Ji wî yê ku ji cem Xwedayê rehman peyman û destûr wergirtiye pê ve tu kes nikare mehderê bike.

**88.** (Kafiran) Gotin: Xwedayê rehman ji xwe re zarok girtine.

**89.** Bêguman we tiştekî erjeng avêtiye meydanê…

**90.** Asîman dikin biderizin, erd dike biqelişe û çiya dikin biherifin…

**91.** Ji ber ku wan (kafiran) ji Xwedayê rehman re zarok gerandine.

**92.** Ji Xweda yê rehman re ne babet e ku ew zarokan ji xwe re bigire.

**93.** Li erd û asîmanan kes nîn e ku bi bendetî neyê cem Xwedayê rehman (vêca Xwedê çi hewcehî bi zarokan heye)!

**94.** Sond be, Xwedayê rehman ew tev hesab kirine û hûr hûr ew jimartine.

**95.** Roja qiyametê ew tev yeko yeko dê bêne ber destê Xwedê.

**96.** Bêguman ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirine, Xwedayê rehman dê hezkirina wan têxe dilan.

**97.** (Ya Muhemmed!) Me Quran bi zimanê te hêsan kiriye da ku tu bi wê mizgînê bidî mutteqiyan û tu bi wê civateke miqeris hişyar bikî.

**98.** Me beriya wan gelek milet birin hilakê. Erê ma tu pêjna kesî ji wan dikî yan jî ma tu pistepista wan dibihîzî?

# 20. SÛREYÊ TA-HA

Sûreyê Ta-Ha, sed û sî û pênc (135) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre, navê xwe ji herfên serê xwe yên Ta-Ha girtiye ku navek ji yên Pêxemberê Xwedê ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Ta-Ha.
2. Me ev Quran, ne ji bo ku tu (pê) zehmetiyê bikêşî û xemgîn bibî hinartiye…
3. Bes ji bo yê ku ji dil ji Xweda ditirse pend û haydarî ye.
4. (Ev peyam) ji teref Wî Xwedayê ku erd û asîmanên bilind afirandine, li pey hev hatiye hinartin.
5. Xwedayê ku Rehman e, li ser ‘Erş raser bû (raserbûneke babetê xwe).
6. Çiqas tiştê li erd û asîmanan hene û çiqas ê di navbera wan de û yê di binê erdê de jî tev yên Xwedê ne.
7. Eger ku tu dengê xwe aşkere bikî, vêca birastî Xweda ya bi dizî û ya ji wê jî veşarîtir dizane.
8. Xwedê, ew îlah e ku ji Wî pê ve tu m’ebûdê bi rastî tun in. Navên herî spehî her jê re ne.
9. Erê ma serpêhatiya Mûsa gihaşte te?
10. Dema Mûsa agirek dît û ji ehlê xwe re got: Li vir rawestin! Bêguman agirek li ber çavên min ket. Dibe ku ez ji we re perengekî jê bînim an jî li cem êgir rêberekî bibînim (da ku riya rast ber me bixe).
11. Gava Mûsa gihîşt cem êgir, lê hate gazîkirin: Ey Mûsa!
12. Ez im, Ez Xwedayê te me! Vêca sola xwe ji lingê xwe bike. Lewra tu li newala pîroz, li Tuwayê yî!
13. Min tu (bi pêxemberî) bijart, nexwe li peyama ku ji te re tê guhdarî bike.
14. Bêguman ez Xwedê me. Ji min pê ve tu îlah tun in. Nexwe tenê îbadetê min bike û ji bo bîranîna min nimêj bike.
15. Bêguman qiyamet teqez tê û hindik mabû ku ez wê veşêrim, da ku her kes cezayê tiştê ku di ber de dibeze, bibîne.
16. (Ey Mûsa!) Zinhar, bila ew kesê ku bawerî bi qiyametê neyîne û li pey hewesa xwe ketiye, te ji wê (bawerî û haziriya ji bo roja qiyametê) venegerîne! Vêca (eger tu ji qiyametê xafil bibî) tu (dê) biçî helakê.
17. Ey Mûsa! Ew çi ye di destê te yê rastê de?
18. (Mûsa) Got: Ew, gopalê min e, ez pala xwe didimê û ez pelên daran ji pezê xwe re pê diweşînim û ji bo min hin pêdiviyên din jî pê hene.
19. Xwedê got: Ey Mûsa! Wî biavêje.

**20.** Di cih de Mûsa ew avêt, vêca hemen ew (bi qudreta Xwedê) bû marek ku bi lez diçe.

**21.** Xwedê jê re got: Rahêjê û metirse! Em ê dîsa wî vegerînin ser rewşa wî ya berê.

**22.** Destê xwe bêxe bin çengê xwe, (dema te derxist) tê bibînî ku spî derket, spîtiyeke ne ji nexweşî ku ev jî mucîzeyeke din e.

**23.** (Daxwaza me ji vê ev e) da ku em hin ayetên xwe yên herî mezin nîşanî te bidin.

**24.** Here nik Firewn, birastî ew (pir) ji ser xwe ve çûye.

**25.** (Mûsa) Got: Xwedayê min! Sînga min fireh bike.

**26.** Karê min ji bo min hêsan bike.

**27.** Girêka zimanê min veke.

**28.** Da ku gotina min fêm bikin.

**29.** Ji malbata min wezîrekî (arîkarekî) bide min.

**30.** Bila ew birayê min Harûn be.

**31.** Bi (arîkariya) wî pişta min xurt bike.

**32.** Di pêxemberiyê de jî wî bike şirîk û hevalê min.

**33.** Da em pir pir te tesbîh bikin..

**34.** Em gelek gelek zikrê te bikin.

**35.** Bêguman tu me dibînî.

**36.** Xwedê jê re got: Ey Mûsa! Ya ku te dixwest ji te re hate dayîn.

**37.** Sond be, Me (ji bilî vê carê) careke din jî qencî li te kiribû.

**38.** Dema ku (tu ji dayika xwe bûyî) Me îlham da dayika te, ya ku me dayê:

**39.** Mûsa bixe sindoqê, piştre bavêje deryayê ku derya jî wî bavêje keviya xwe, vêca neyarê min û neyarê wî, wî bigire. Min ji cem xwe hezkirinek avête ser te (da ku ji te hez bikin) û da ku tu di bin çavdêriya min de perwerde bibî.

**40.** Dema ku xwişka te li pey te dihat û (ji mala Firewn re) digot: Ma ez yeka ku şîr bidê û wî xwedî bike şanî we bidim? Vêca me tu li dayika te vegerand da ku çavê wê bi te ronî bibe û xemgîn jî nebe. (Piştî tu mezin bûyî) te yek kuşt, Me tu ji xema wê kuştinê xelas kir. Me tu bi gelek derd û bela îmtîhan kir (lê belê her carê me tu rizgar kirî). Tu çend salan li nava xelkê Medyenê (digel Şueyb Pêxember) mayî. Ey Mûsa! Paşê li gorî teqdîrekê tu hatî.

**41.** Min tu ji bo (pêxembertiya) xwe bijartiye.

**42.** Tu û birayê xwe bi hev re nîşanên min bibin û di bîranîna (zikrê) min de sistiyê mekin.

**43.** Herdu herin cem Firewn, lewra ew pir ji ser xwe çûye.

**44.** Hûn herdu gotineke xweş jê re bibêjin. Belkî ew aqil bigire, yan jî (ji Xwedê) bitirse (û ji rêşaşiya xwe vegere).

**45.** Gotin: Xwedayê me! Bêguman em fikare dikin ku ew zû ceza bide me yan jî hê bêhtir ji ser xwe biçe.

**46.** (Xwedê) Got: Metirsin, lewra ez (bi arîkariya xwe) bi we re me; dibihîzim û dibînim.

**47.** De heydê herdu herin û jê re bibêjin: Em pêxemberên Xwedayê te ne. Vêca îsraîliyan digel me bişîne (dev ji wan berde) û bes azarê bide wan! Me ji Xwedayê te mucizeyek aniye (ku ew nîşan e li ser pêxemberiya me) û selametî ji wî kesî re ye ku bide pey hîdayetê.

**48.** Bêguman wehî ji me re hatiye hinartin ku bêşik ezab ji bo wî kesî ye ku (bi pêxemberan) bawerî nayîne û berê xwe (ji heqiyê) vedigerîne.

**49.** Firewn got: Ey Mûsa! Ma Xwedayê we kî ye?

**50.** Mûsa jî (jê re) got: Xwedayê me, ew Xweda ye ku her tişt daye mexlûqên xwe, piştre berê wan daye riya rast.

**51.** (Firewn jê re) Got: Ku welê be, nexwe rewşa wan miletên berê dê bibe çi?

**52.** (Mûsa jê re) Got: Zanîna der barê wan de, li cem Xwedayê min di kitêbê de ye. Xwedayê min ne şaş dike ne jî ji bîr dike.

**53.** Ew Xwedayê ku erd ji we re rast kiriye û ji we re tê de rê vekirine (çûn û hatin hêsan kiriye) û baran ji esmên (ewran) ji we re barandiye. Vêca bi wê, me texlîtên giya û şînkatiyan cur bi cur û cot deranîne.

**54.** Jê bixwin û terşên xwe lê biçêrînin. Bêguman di vê de ji bo aqilmendan nîşan hene.

**55.** Me hûn ji wê (erdê) afirandine û dîsa em ê we li wê vegerînin û careke din jî (piştî mirinê) em ê we jê derînin.

**56.** Sond be, me delîlên xwe tev nîşanî Firewn dan, vêca dîsa wî bawerî neanî û (li hemberî yekîtiya Xwedê) asê bû.

**57.** Firewn got: Ey Mûsa! Ma tu ji me re hatî da ku bi sêrbaziya xwe me ji welatê me derxî?!

**58.** Ku wisa be, teqez em ê jî sêrbaziyeke eynî weke wê li hemberî te bînin. Vêca di navbera me û xwe de demeke hevdîtinê li cihekî navendî diyar bike ku ne em ne jî tu xwe jê nedin paş.

**59.** (Mûsa) Got: Dema civanê we (û me) bila roja xemilandinê (roja cejnê) be (da ku xelk amade bibin) û di (dema) danê sibehê de mirov lê kom bibin.

**60.** Li ser vê yekê Firewn pişta xwe da Mûsa û çû, vêca hemî (sêrbaz û fêlbazên xwe) dan hev, di pey re (roja civanê) hat.

**61.** Mûsa ji wan re got: Wax li halê we be! Bi derewînî (neweyî) neavêjin ser Xwedê (; nebêjin ayetê wî sêr in)! Nexwe ew ê bi ezabekî (ji cem xwe) we bibe helakê û bêguman kesê ku iftira bike, ew perîşan bûye.

**62.** Vêca li hemberî vê yekê rewşa xwe di nav xwe de gotûbêj kirin û bi hev re kirin pistepist.

**63.** Gotin: Ev herdu, bêguman du sêrbaz in, bes dixwazin bi sêrbaziya xwe we ji welatê we derxin û riya we ya ji hemû riyan çêtir ji holê rakin.

**64.** (Firewn ji bereka xwe re got:) Nexwe, fen û fûtên xwe li hev kom bikin, paşê ref bi ref werin! Bi rastî îro kî bi ser keve ew rizgar bûye.

**65.** (Sêrbazan Got: Ey Mûsa! (Dixwazî pêşî) tu biavêje yan jî em ê pêşî biavêjin.

**66.** (Mûsa ji wan re) Got: Na, hûn pêşî biavêjin. Wê demê werîs û gopalên wan, ji sêrbaziya wan, ji Mûsa re hate xuyakirin mîna ku ew (mar in) bi rê ve diçin.

**67.** Mûsa, ji nişka ve di nava xwe de tirsiya.

**68.** Me jê re got: Metirse! Yê ku bi ser bikeve teqez tu yî (ne ew in).

**69.** (Ey Mûsa) ya di destê xwe de biavêje da ku ew dar û werîsên wan dabelîne (û sêra wan betal bike). Bi rastî ya ku wan çêkiriye bes hîleya sêrbazan e (û ne rastî ye). Sêrbaz li ku dibe bila bibe bi ser nakeve.

**70.** Li hemberî vê rewşê, sêrbaz çûne sicûdê û gotin: Me bawerî bi Xwedayê Harûn û Mûsa anî.

**71.** (Firewn ji wan re) Got: Erê ma beriya ez destûra we bidim we bawerî pê anî? Bêguman ew mezinê we ye ku sêrbazî fêrî we kiriye. Sond be ku vêga ez ê dest û piyên we çep û rast jê bikim û ez ê we bi çiqlên darên xurman ve daleqînim! Bi vî awayî hûn ê bibînin ka ezabê kê dijwartir û mayindetir e.

**72.** (Sêrbazan jê re) Gotin: Em ê te di ser mucîzeyên ku aşkera ji me re hatine û di ser Xwedê re negirin, ew Xwedayê ku em afirandine. Nexwe ya tu dikî bike, bêguman desthilatiya te bes di jiyana vê cîhanê de ye.

**73.** Me bawerî bi Xwedayê xwe aniye da ku gunehên me û gunehê wê sêra ku bi kotekî te bi me da kirin bibexşîne. Xwedê çêtir û mayindetir e.

**74.** Bêguman rewş ev e; kî ku here ber destê Xwedayê xwe û ku sûcdar be vêca bêguman dojeh jê re ye. Ew tê de ne dimire ne jî (bi heyateke xweş û bextewar) dijî.

**75.** Kî jî bi îman here ber destê Xwedayê xwe û karên qenc jî kiribin, ha ew ên wisa ji bo wan mertebeyên bilind hene.

**76.** Ew (mertebe) bihiştên Ednê ne ku di binê wan de çem diherikin, dê seraqetî di wan de bimînin! Ha ev e, xelata wan kesên ku xwe (ji gunehan) paqij kirine.

**77.** Sond be, me pexyam da Mûsa ku bendeyên min (ên îsraîlî) bi şev (ji Misrê) derêxe, vêca li deryayê ji bo wan riyeke ziwa bigire, fikar meke ku (Firewn û leşkerê wî) bigihin we û ji tu tiştî netirse.

**78.** Li hemberî vê yekê Firewn bi leşkerên xwe ve da pey (şopa) wan, vêca derya li wan hate hev, lê çawa li wan hate hev?!

**79.** Firewn, gelê xwe ji rê xist û ew neanîn ser riya rast.

**80.** Gelî zaroyên Îsraîl! Me hûn ji neyarê we rizgar kir û me, li teniştа rastê Çiyayê Tûr civan da we û me gezo û sûsik ji we re anîn xwarê.

**81.** Ji wan nîmetên pak û xweş bixwin ew ên ku me bi rizqînî daye we, di der barê wî de zêdegavî û nankoriyê nekin, vêca xezeba min dê li we bibare. Ew kesê ku xezeba min lê bibare, bêguman ew helak bûye.

**82.** Bêguman ez ji bo wî kesê ku poşman bibe, bawerî bîne û karê qenc bike, paşê di riya rast de here, pir bexşîner û tobepêjrîn im.

**83.** Ey Mûsa! Çi tiştî tu bi helebezê xistî ku te qewmê xwe ji paş ve hişt û tu hatî?

**84.** ( Mûsa) Got: Ew li pey min in dê bigihîjine min. Xwedayê min, bi bal te ve min lez kir da ku tu (ji min) razî bibî.

**85.** Xweda got: Piştî ku tu ji wan qetiyayî Me gelê te ceriband; Samirî ew ji rê birin.

**86.** Li hemberî vê yekê Mûsa, bi hêrs û xemgînî li gelê xwe vegeriya (û ji wan re) got: Hey gelê min! Erê ma Xwedayê we peymaneke rind nedabû we? Erê ma ew dem (çil roj) ji we re pir dirêj hat? Yan jî ma we xwest ku ji Xwedayê we xezebek li ser we bibare? Vêca ji peymana ku we da bû min, hûn vegeriyan.

**87.** (Gelê wî jê re) Gotin: Em, ne bi vîn û hêza xwe ji peymana ku me dabû te vegeriyan. Lê belê hinek zêr û zînetên xelkê li cem me bûn, vêca me avêtin (êgir), her wiha Samirî jî çi li cem hebû avêt.

**88.** (Samirî), ji wan re (peykerê) golikekê çêkir ku xwedîorîn bû (dema berê wê bidaya bayê mîna golikekê dioriya). Vêca (Samirî û peyrewên xwe ji wan re) gotin: Ha va ye Xwedayê we û Xwedayê Mûsa. Lê belê Mûsa ew ji bîr kiriye.

**89.** Erê ma ew nabînin ku ew (peykerê golikê) hîç nedikare bersiva gotina wan bide û ne dikare zerarê ji ser wan bide alî û ne jî dikare feydeyekê bide wan?

**90.** Bêguman, hê berî (Mûsa li wan vegere) Harûn ji wan re got: Gelî miletê min! Hûn bi vê golikê hatine ceribandin. Bêguman Xwedayê we ew Xwedayê ku rehman e. Nexwe bidine pey min û bi gotina min bikin.

**91.** Jê re gotin: Em qet dev ji perestina golikê bernadin, heyanî Mûsa vegere nav me em ê li serê berdewam bin!

**92.** (Pîştî ku Mûsa vegeriya nava wan, ji birayê xwe Harûn re) Got: Ey Harûn! Çaxê te dît ku ew ketin rêşaşiyê ew çi bû nehişt (ku tu wan ji riya wan degerînê)…

**93.** Ku tu li pey min werî? Erê ma tu li ber fermana min rabûyî?

**94.** (Harûn jê re) Got: Ey kurê dayika min! Riha min û pora min mekişîne! Bi rastî ez ditirsiyam ku tu bibêjî te dubendî xistiye nava zarokên Îsraîl û tu li hêviya gotina min nesekinî!

**95.** (Mûsa ji Samirî re) got: Samirî! Te ji bo çi ev kir?

**96.** Samirî got: Ya ku wan pê nizanibû min pê dizanî, vêca min hinek ji zanîna Pêxember wergirt, paşê min ew bi ser guhê xwe ve avêt. Her wisa nefsa min ev kar ji min re çêkir û ji bo min xemiland.

**97.** (Mûsa ji Samirî re) Got: De here biqeşte ji vir! Êdî (cezayê te) heyanî tu li dinyayê bijî, tu dê bibêjî: Ne ez têkilî kesî dibim û bila tu kes jî têkilî min nebe. Bêguman ji bo te (ji bo ezabwergirtinê) civanek heye ku her tu jê nayê vederkirin. Li wî mebûdê xwe binêre, ew ê ku te xwe dabû ser perestina wî, Ez sond dixwim ku em ê wî bişewitînin, paşê em ê xweliya wî biavêjin deryayê!

**98.** (Mûsa ji qewmê xwe re got:) Bêguman îlahê we bes Ellah e, ew ê ku ji Wî pê ve tu îlah tun e. Zanîna Wî her tiştî dorpêç kiriye.

**99.** Her wisa em hinekî ji agahiyên wan (umet)ên ku bihurîne ji te re radigihînin. Bêguman me ji cem xwe bîranîn (Quranek) daye te.

**100.** Kî berê xwe ji wê vegerîne muheqeq ew ê roja qiyametê barê gunehekî giran hilgire.

**101.** Ew tê de seraqetî dimînin û roja qiyametê ji bo wan çi barekî pîs e!

**102.** Roja ku di sûrê de tê pifkirin, wê rojê em gunehkaran diajon mehşerê ku ew reşûşînbûyî ne.

**103.** Di navbera xwe de bi hêdî dibêjin: Li dinyayê ji deh rojan pê ve em nemane.

**104.** Em wê dabaşa ku ew di nav xwe de dibêjin bêhtir dizanin, wê çaxê aqilmend û çêtirê wan dê bibêje: Hûn ji rojekê pê ve (li dinyayê) nemane.

**105.** Ew ji te der barê çiyan de (roja qiyametê dê çawa bibin) dipirsin. (Ji wan re) Bibêje: Xwedayê min dê ji bin ve wan rake, hûr û hêra bike û wan ber ba bixe.

**106.** Her wiha dê li cihê wan erdeke rast, hilû û rût bihêle.

**107.** Li wê derê hûn ê cihekî nizm û yekî bilind nebînin.

**108.** Wê rojê mirov li pey gaziya Xwedê diçin (meydana heşrê) û li ber (fermana) wî ranabin. Vêca ji bo hurmeta Xwedayê dilovan deng nizm bûne, vêca ji pistepistê pê ve tu denga seh nakî.

**109.** Wê rojê, ji bilî wî kesê ku Xwedayê dilovan destûrê dabe û ji gotina wî qayîl be, mehderiya tu kesî feydê nade.

**110.** Xwedê, bi kiryarên ku mirovan kirî û yên ku dikin jî dizane û ew tu car bi ser zanîna wî ve nabin.

**111.** (Wê rojê tu dibînî ku) hemû rû ji bo (Xweda)yê her sax û ragirê heyînê zebûn (û serpêl) bûne û bi rastî ewên ku sitemkarî kirine (di wê rojê de) perîşan bûne.

**112.** Çi kesê bawermend be û kar û kiryarên rind bike, vêca bila ew ji neheqî û ji kêmnivîsîna xêrên xwe netirse.

**113.** Her wisa me Quran bi zimanê erebî (ji te re) hinartiye û me di vê Quranê de gelek hişyarî û gef (ên bi ezabê) aşkera kirine, hêvî heye ku ew xwe biparêzin, an jî ev (Quran) ji bo wan pend û şîretekê derîne rastê.

**114.** Vêca ew Xwedayê hukimran ê desthilatedar ê heq, ji gotinên muşrikan pak û bilind e. (Ya Muhemmed!) Cibraîl heyanî wehya Xwedê (ji te re) neqedîne di (xwendina) Quranê de lez meke û bibêje; Xwedayê min, zanîna min zêde bike.

**115.** Sond be, hê berê jî me fermana (bi nexwarina ji darê) li Adem kiribû. Vêca wî (fermana me) ji bîr kir û me tu sebr û metanet jî pê re nedît.

**116.** Dema me ji firîşteyan re got, ji Ademî re herin sicûdê, ew di cih de çûne sicûdê, lê belê îblîs neçû sicûdê.

**117.** Vêca me got: Ey Adem! Ev (şeytan) dijminê te û hevsera te ye. Zinhar bila we ji bihiştê dernexe, paşê tu yê azarê bikêşî!

**118.** (Ey Adem!) Vêga li vir, ji bo te ne birçîbûnî heye ne jî tazîmayîn.

**119.** Tu, tê de ne tî dibî ne jî germa tavê li te dide.

120. Lê belê şeytên weswese û guman xiste dilê Adem û jê re got: Ey Adem! Erê ma ez dara sermedî (ebediyetê) û milkê ku narize nîşanî te nedim?

121. (Şeytên bi hîle û xapa ew xapandin) Vêca herduyan ji wê (darê) xwarin. Ewretê wan ji wan ve hate xuyakirin û wan hewl da ku bi pelên bihiştê xwe binixumînin. (Bi vî awayî) Adem bêemriya Xwedayê xwe kir, vêca riya xwe şaş kir.

122. Paşê Xwedayê Adem ew (ji bo pêxemberiyê) bijart; toba wî pejirand û berê wî da riya rast.

123. (Xwedê) Got: Hûn hemû (mirov û şeytan) pêkve, ji hev re dijmin, ji bihiştê dakevin! Vêca eger ku ji cem min ji bo we hidayetek hat, îcar kî bide pey hidayeta min ew rêşaş û bedbext nabe.

124. Çi kesê ku berê xwe ji kitêba min vegerîne, bêguman jê re jiyaneke teng û tarî heye û em ê wî roja qiyametê koregom heşir bikin.

125. Ew dibêje: Xwedayê min! Çima te ez koregom heşir kirim? Hal ev e ku bi rastî ez li dinyayê bi çav bûm!

126. (Xwedê Dibêje: Her wiha ayetên me ji te re hatin vêca te ew ji bîr kirin û her wisa îro tu jî dê werî jibîrkirin!

127. Bi vî awayî kesê ku (di arzûyên xwe de) destbelaviyê bike û baweriyê bi ayetên Xwedayê xwe neyîne, em ceza dikin. Bêguman ezabê axiretê teqez dijwartir û seraqetîtir e.

128. Ma ji wan re diyar nebûye ku beriya wan me çiqas milet helak kirin, digel ku ew di cih û warên wan de jî diçin û tên? Bêguman di vê de, ji aqildaran re gelek nîşan hene (ku ji wan îbret û ders bigirin).

129. Eger ji Xwedayê te peymana paşêxistina ezabdayîna wan nehatibûya dayîn û eger ji bo wan demeke navlêkirî nebûya, dê ezabê Xwedê li ser wan misoger bibûya.

130. (Ya Muhemmed!) Li hemberî tiştên ku ew dibêjin, xwe ragire û beriya derketina rojê, beriya roj biçe ava û hinekî ji wextê şevê û ser û binê rojê hemdê Xwedê bike û ji her kêmasiyê wî pak bidêre, da ku tu Xwedayê xwe qayîl bikî.

131. Zinhar, çavên xwe bernede wê xweşikiya jiyana cîhanê, ew a ku me daye kafir û yên mîna wan, da ku em wan pê biceribênin! Risqê Xwedayê te çêtir e, hem jî seraqetîtir e.

132. Emrê ehlê xwe bike bi kirina nimêjê û li ser kirina wê xwe ragire! Em, rizqekî ji te naxwazin; em risqê te didin. Encama xêrê teqez ji ehlê teqwayê re ye.

133. Kafiran got: De bila (Muhemmed) ji Xwedayê xwe mucîzeyekê ji me re bîne (ku wî rast bidêre)? Erê ma daxuyanek di suhûfên pêşiyan de ji wan re nehatiye?

134. Eger me, beriya vê (Quranê) bi ezabekî ew helak bikirina, teqez dê wiha bigotina: Xwedayê me! Çima te ji me re qasidek neşand ku beriya em rezîl û riswa bibin, me bidaya pey ayetên te!

135. Bibêje: Her yek (ji me û ji we) çavnêriya (encamê) dike; de çavnêriyê bikin. Lê di nêz de hûn ê bizanin ka xwedanên riya rast kî ne û kî li ser riya heq rasterê bûye.

# 21. SÛREYÊ ENBIYA

Sûreyê Enbiya, sed û dozdeh (112) ayet e. Li Mekkê daketiye. Digel pir dabaşên din jî, ji ber ku sûre bi taybetî behsa hin pêxemberan û munasebetên wan ên ligel gelên wan kiriye, jê re Sûreyê Enbiya yanî Sûreyê Pêxemberan hatiye gotin.

*Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm*

1. Ji bo însanan dema hesabwergirtina wan nêzîk bû. Hal ev e ku ew di nav xefletê de berê xwe (ji îmana pê) vedigerînin.
2. Çi dema ji Xwedayê wan, ji wan re ayeteke nû (ji Quranê) bihata, wan bi tinazî lê guhdarî dikirin.
3. Dilê wan (ji fahma wê) xafil e. Ew ên ku zalim in di navbera xwe de pistepist dikin; dibêjin: Ev (Muhemmed) her ew jî mîna we mirovek e, digel ku hûn têdigihîjin jî ma çawa hûn didin pey sêrbaziyekê!
4. (Pêxember ji wan re ) Got: Çiqas gotina ku li erd û esmên (tête gotin) Xwedayê min pê dizane û her ew e yê bihîzer û yê zana.
5. Gotin: Nexêr, ev xewnerojk in, na belkî wî Quran ji cem xwe ve lêaniye, na belkî ew şair e. Eger ne wisan e de ka bila ayetekê (mucîzeyekê) ji me re bîne, çawa ku ji pêxemberên berê re hatibûn.
6. Beriya wan çi welatekî ku Me ew birine helakê (piştî hatina mu'cizan) bawerî neanîne, erê ma vêca ew ê bawerî bînin?
7. (Ya Muhemmed!) Me, beriya te yê ku ji wan re wehî şandiye her zilam bûne; nexwe eger hûn (vê) nizanin ji ehlê zanînê bipirsin.
8. Me ew (pêxember) nekirin cesedên (bêruh) ku xwarinê naxwin û ew (li vê dinyayê) ebedî jî namînin.
9. Piştre, me ew peymana ku daye wan bi cih anî, vêca me ew û yên ku me ew xwestin rizgar kirin û Me yên musrif jî helak kirin.
10. Sond be, me kitêbeke wisa ji we re hinart ku rûmeta we (ya dinya û axretê) tê de ye. Ma hê jî hûn aqil nagirin?
11. Me xelkên pir welatan ji ber ku ew zalim bûn ji navê birin û li dûv wan me hin xelkên din anîn meydanê.
12. Çi dema pêjna ezabê me dikirin, ha te dît bi lez ji berê direviyan.
13. (Firîşteyan jî ji wan re digot:) De nerevin! Li nîmet û warên xwe yên xweş vegerin; belkî hûn bêne pirsyarkirin (ka ev a bi serê we de hat çi bû û ji bo çi bû?)
14. (Wan) Gotin: Wax ji ya ku hatiye serê me! Bi rastî jî em mirovinên sitemkar bûn.
15. Her feryada wan wisa berdewam bû, heyanî ku me ew kirin mîna giyayê dirûtî û agirê vemirî.

16. Me erd û esman û yên di navbera wan de wek pêlîstok (û bêmefa) neafirandine.

17. Eger me bixwesta ku mijûlahiyekê ji xwe re bigirin me dê ew ji cem xwe bigirtaya; em vê nakin.

18. Na, belkî em ê heqiyê biavêjin ser batilî, vêca ew ê mêjiyê wî belav bike. Vêca tu dinêrî ku wa ye batil ji holê rabûye. (Gelî kafiran!) Xwelî li serê we be, ji ber wan wesfên ku hûn (nisbetî bal Xwedê ve) dikin!

19. Çi tiştên li erd û asîmanan hene yên Xwedê ne û ew ên li cem Xwedayê te (ku melayîket in) li ser îbadetê Xwedê, xwe mezin nadêrin û jê nawestin jî.

20. Bi şev û rojê Xwedê pak didêrin û sist jî nabin.

21. Erê ma wan (pûtperestan) li erdê ji xwe re hin Xweda girtine ku ew ê (miriyan) sax bikin?

22. Eger li herduyan (asîman û erdê) ji Xwedê pê ve xwedayekî din hebûya, teqez dê (pergala erd û esmên) xera bibûya. Nexwe Xwedayê Erş(ê bilind) ji ya ku pê diwesifînin pak û dûr e.

23. Xwedê ji ya ku dike nayê pirsyarkirin, lê belê ew ê ji tiştên ku bikin dê bêne pirsyarkirin.

24. Yan jî ma ji bilî Xwedê ji xwe re îlahinên din girtine? Bibêje: De heydê delîla xwe bînin (eger bi rastî hûn rast dibêjin)! Ha va ye kitêba ligel min û kitêbên wan ên beriya min jî. Na, belkî pirên wan rastiyê nizanin, ji ber vê yekê berê xwe jê vedigerînin.

25. (Ya Muhemmed!) Beriya te, me çiqas pêxember şandibe, her me peyxam daye wan ku „Ji Min pê ve tu xweda nîn e û îbadetê min bikin.“

26. (Kafiran) Gotin: Xwedayê ku rehman e ji xwe re (ji firîşteyan) zarok girtiye. Haşa! Ew ji vê pak û dûr e. (Na) belkî firîşte bendeyên Xwedê yên rûmetdar in.

27. Ew beriya Wî napeyivin û ew tenê bi fermana Wî tevdigerin.

28. Xwedê bi ya ku wan kiriye û bi ya ku dikin jî dizane. Ew, ji wan kesên ku Xwedê jê qayîl e pê ve mehderiya tu kesê (din) nakin. Ew ji tirsa Xwedê dilerizin!

29. Ji firîşteyan kî bibêje: ‘Ji bilî Xwedê ez îlah im, Em ê bi dojehê wî ceza bikin. Her wiha em ê (pûtperestên) zalim jî ceza bikin!

30. Erê ma ew ên kafir bûne, qey nabînin ku berê erd û asîman bi hev ve bûn, vêca Me ew ji hev veqetandin û ma ew nizanin ku Me her tiştê zindî ji avê afirandiye? Ma hê jî ew bawerî nayînin?

31. Me di erdê de çiyayên mikûm çêkirin da ku erd xwe pê bigire û neheje. Me rêkên fireh tê de vekirin da ku ew (di rêwîtiyên xwe de) bi ser mebestên xwe ve bibin (û bigihîjin armancên xwe).

32. Me asîman jî kiriye banekî saxlem û parastî, vêca ew berê xwe ji nîşanên asîmanan vedigerînin.

33. Ew ê ku şev û ro, roj û heyv afirandine Xwedê ye. Her yek ji wan di rêgeha xwe de avjeniyê dike (û bi lez digerin).

**34.** (Ya Muhemmed!) Me beriya te ebediyet nedaye tu kesî. Erê ma ku tu mirî, ew ê her û her sax bimînin?

**35.** Her zindî dê mirinê tehm bike û em ê we bi şer û xêrê îmtîhan bikin û hûn ê dawî her li me bêne vegerandin.

**36.** Ew ên ku kafir bûne dema te dibînin bes henekê xwe bi te dikin û dibêjin: Ma ew ê ku bi nebaşî behsa mabûdên we dike ev e? Hal ev e ku ew kitêba Xwedayê dilovan mandel dikin.

**37.** Însan (bi tebîetê xwe) lezgînî hatiye afirandin, ez ê ayetên xwe nîşanî we bidim vêca lez li (ezab) nekin.[1]

**38.** (Kafir ji bawermendan re) Dibêjin: Eger bi rastî hûn rastgo ne, ka kengê ew ezabê te peyman pê daye, tê cih?

**39.** Ew ên kafir bûne, eger bizaniyana ku dema (roja qiyametê) dê nikaribin agir ji rûyên xwe û piştên xwe bidin alî û arîkariya wan jî dê neyê kirin, (helbet wan dê ev negota û dê bi lez ezab nexwesta).

**40.** Belkî, (qiyamet) ji nişka ve tê wan ku wan sergêj dihêle (û dibizdîne). Êdî ew nikarin wê vegerînin û muhlet(a tobê û lêborînê) jî, ji wan re nayê dayîn.

**41.** (Ya Muhemmed!) Sond be, bi wan pêxemberên beriya te jî tinaz hatiye kirin, vêca ew ezabê ku tinazê xwe pê dikirin hate ser wan tinazkeran û xistin nav xwe.

**42.** Bibêje: (Eger ezab bi ser we de hat) ew kî ye ku bi şev û rojê we ji (ezabê) Xwedayê ku rehman e biparêze? Na! Belkî ew berê xwe ji kitêba Xwedayê xwe vedigerînin.

**43.** Yan jî, ma ji bo wan hin îlah hene ku li hemberî (ezabê) me, wan biparêzin? (Hal ev e, ew tiştên ku ew dibêjin Xweda ne), ew nikarin arîkariya xwe bi xwe jî bikin û ew ê ji (ezabê) me jî neyêne parastin.

**44.** Erê, me qencî li wan û digel bav û bapîrên wan kir, heyanî ku di xweşiyê de jiyaneke dirêj derbas kirin. Erê ma vêca ew nabînin (û tênagihîjin) ku em erda wan ji hawir ve li wan teng dikin. Vêca ma ew in yên serkeftî?

**45.** Bibêje: Ez bes bi wehyê we hişyar dikim. Lê belê ew ên ker dema ku ew têne hişyarkirin, dengê vê bangê nabihîzin.

**46.** Sond be, eger ji ezabê Xwedayê te tiştekî hindik bihingive wan, hîç guman tune ye ku dê bibêjin: Wax li me be! Bi rastî em mirovên zalim bûn!

**47.** Em ê roja qiyametê şehînên edaletê deynin. Êdî li tu kesî bi tu awayî dê neheqî neyê kirin. Çendî ew (karê ku hatiye kirin) bi qasî giraniya libeke xerdelê be jî em ê dîsa wî bînin (ber şehîna edaletê) û ji aliyê hesabbîniyê ve em bes in.

**48.** Sond be, me Furqan daye Mûsa û Harûn ku ji mutteqiyan re ronahî û şîret e.[2]

---

1 Peyxamberê Xwedê (s) di ber Ebû Sufyan û Ebû Cehl re derbas bû. Dema Ebû Cehil Peyxamber dît, kenî û ji Ebû Sufyan re got: Ev pêxamberê zaroyên Ebdul Menaf e! Ebû Sufyan bi hêrs lê vegerand: Qey tu layiq nabînî ku ji zaroyên Ebdul Menaf re peyxamberek hebe? Vêca Peyxamberê Xwedê (s) li Ebû Cehil vegeriya û gotiyê: Çi qas ez te dibînim, tu her li ber xwe nakevî heta tişta ku hatî serê apê te Welîd kurê Muxîre neyê serê te jî. Vêca ev ayet işaretî bal wê ve ye.

2 Furqan: Di vê ayetê de mebest jê Tewrat e. Navek ji yê Qur'anê jî furqan e. Wateya wê: ya ku heq û batil, helal û heram ji hev vediqetîne.

**49.** Ew ên ku di nependî de ji Xwedayê xwe ditirsin û ji qiyametê jî bitirs in.

**50.** Ha ev (Quran) şîreteke bi xêr û bêr e ku me ew hinartiye. Erê ma vêga hûn wê mandel dikin?

**51.** Sond be, hê berê Me hîdayet, dawerî û duristî dabû Îbrahîm û me pê zanîbû (ku ew babetê vê ye).

**52.** Dema Îbrahîm ji bavê xwe û gelê xwe re got: „Ma ev pûtên ku hûn wan dihebînin çi ne?"

**53.** Gotin: Me bav û bapîrên xwe dîtin ku perestina wan dikirin, (vêca em jî li pey rêç û şopa wan diçin).

**54.** (Îbrahîm ji wan re) Got: Bêguman hûn û bavên we jî di rêşaşiyeke aşkera de ne.

**55.** Gotin: Ma te rastî ji me re aniye, yan jî tu ji lîstikbazan î?

**56.** (Îbrahîm ji wan re) Got: Ne wisan e, belkî Xwedayê we Xwedayê erd û asîmanan e. Ew ê ku ew afirandine û ez jî li ser vê ya ha ji şahidan im.

**57.** Ez bi Xwedê sond dixwim ku piştî hûn bi pişt min bikevin û herin, ez ê pûtê we bişkînim!

**58.** Îbrahîm, ew pût parçe parçe kirin, pûtê mezin dest nedayê bi hêviya ku ew xelk lê vegerin.

**59.** Gotin: Kê ev bi îlahên me kiriye, yê ew kirî bêguman ew ji zaliman e.

**60.** (Ji hev re) Gotin: Me bihîst ku ciwanekî (bi xerabî) behsa wan dikir, jê re dibêjin Îbrahîm (hebe nebe wî ew şikandine!)

**61.** Gotin: Nexwe di cih de Îbrahîm bînin pêşberî çavê xelkê, da ku li ser ya gotî şehdeyiyê bidin.

**62.** (Jê re) gotin: Ma te ev bi Xwedayên me kiriye ey Îbrahîm?!

**63.** Got: Belkî vî mezinê wan ew kiriye. De heydê ji wan bipirsin; eger (bi rastî) ew dipeyivin!

**64.** Li hemberî vê yekê, hişyar bûn û li xwe zivirîn û ji xwe re gotin: Hûn zalim bi xwe ne.

**65.** Piştre dîsa li kufra xwe vegeriyan û jê re gotin: Tu bi xwe jî dizanî ku ev pût napeyivin.

**66.** Îbrahîm (ji wan re) got: Ku welê ye, ma hûn ê ji bilî Xwedê wan ên ku ew ne dikarin tu feydeyekê bidin we ne jî zerarekê bidin we dihebînin.

**67.** Uf ji we re be û ji wan pûtên ku ji bilî Xwedê hûn îbadetê wan dikin! Erê ma hûn tênagihîjin (ku ev pût ne babetê îbadetê ne)?

**68.** (Ji hev re) gotin: Eger hûn dixwazin tiştekî pê bikin, wî bişewitînin û arîkariya îlahên xwe bikin!

**69.** Me got: Ey agiro! Li ser Îbrahîm bibe hênikahî û selametî!

**70.** Wan xwest (bi şewatê) dehfekê li ber Îbrahîm deynin, lê belê me ew kirin ên ku (di armanca xwe de) ziyan kirine.

**71.** Me ew û Lût ji wan reha kirin, me ew gihandine wî warê ku me ji xelkê re bi xêr û bêr kiriye.

**72.** Me (ji kerema xwe) Îshaq dayê û wek bexşîşeke zêdeyî (daxwaza wî jî) Yaqûb dayê. Me her yek ji wan kiriye (pêxemberekî) qencîkar.

**73.** Me ew kirine pêşewa, bi fermana me riya rast nîşanî (xelkê) didin û me ji wan re peyxam şand da ku karên qenc bikin, nimêjê bi duristî bikin û zekatê bidin û ew her ji me re îbadetkar bûn.

**74.** Me Lût jî kire pêşewa, me hikmet û zanîn dabûyê û me ew ji wî welatê ku (xelkê wî) karên xerab dikirin rizgar kir. Bêguman xelkê wî welatî karên neqenc dikirin û jirêderketî bûn.

**75.** Me Lût xiste nav rehma xwe, bêguman ew ji qencan bû.

**76.** Hê berê Nûh jî gazî Xwedayê xwe kir (ku em wî rizgar bikin û gelê wî helak bikin), vêca me jî gazîya wî qebûl kir, paşê me ew û xelkên wî (yên ku di keştiyê de pê re bûn) ji tengasiya mezin rizgar kirin.

**77.** Me ew ji (şerê) wî gelê ku bawerî bi ayetên me nedianîn parast. Bêguman ew xelkekî neqenc bû; ji ber vê yekê me ew tev binav û xerq kirin.

**78.** Serpêhatiya Dawid û Suleyman jî di bîra wan bîne, wê dema ku der barê çandiniyekê de hukim didan, wê dema pezê hinekan bi şevê ketibû navê û zerar dabûyê û em li ser hukimdayîna herduyan şahid bûn û me pê dizanî.

**79.** Me ev (hukimdayîn) bi Suleyman dabû zanîn. Me hikmet û zanîn dabû herduyan. Me ji Dawud re çiya û teyr berdest kirin ku ligel wî tesbîh û hemdê Xwedê dikirin û Me, (ev) kirine.

**80.** Me Dawud ji bo we hînî çêkirina zirxan kir, da ku (ew zirx) we ji şerê neyarên we biparêze. Erê ma vêca hûn şêkiriya Xwedê nakin?

**81.** Me ji Suleyman re jî bayê dijwar (berdest kiribû) ku bi fermana wî ew diçû wî welatê ku me bi xêr û bêr kiribû û me bi her tiştî dizanî.

**82.** Me ji Suleyman re hin şeytan (berdest kiribûn) ku ji bo wî xwe noqavî dikirin (gewher dertanîn) û ji bilî vê hin karên din jî (avasazî) dikirin. Me ew di bin çavdêriyê de digirtin.

**83.** Eyûb jî, dema gazî Xwedayê xwe kir; (Xwedêyo!) Derdekî giran bi min girtiye û tu dilovantirînê dilovanan î!

**84.** Vêca me duaya Eyûb qebûl kir, ew derdê pê girtî me jê bir û me kesên mala wî (keç û kurên wî), digel van jî bi qasî wan hinekî din jî, ji dilovaniya xwe danê, da ku îbadetkar di bîra xwe bînin û bêhna xwe fireh bikin.

**85.** Îsmaîl, Îdrîs û Zulkifil jî di bîr bîne ku ev hemû jî ji sebirkêşan bûn.

**86.** Me ew xistin nav rehmeta xwe, teqez ew ji salihan bûn.

**87.** Dibîr bîne; wê dema Zennûn bi hêrs (ji nava gelê xwe) çû, ji wî we ye ku em ê lênegirin. Paşê di nava tarîtiyan de (tarîtiya şevê, tarîtiya deryayê û tarîtiya di zikê masî de) wiha niyaz kir: (Xwedêyo!) Ji te pê ve tu îlah nîn in, ji her kêmasiyê tu pak û paqij î, teqez ez ji sitemkaran im!

**88.** Li hemberî vê yekê me bergerîna Yûnus pejirand û me ew ji kederê rizgar kir û her wiha em ê bawermendan jî rizgar bikin.

**89.** Zekeriya jî di bîr bîne ku ew wiha li ber Xwedayê xwe geriya (û got:) Xwedayê min! Min bi tenê nehêle û Tu çêtirînê mîratgiran î.

**90.** Me bergerîna Zekeriya jî pejirand û me Yehya dayê û me jê re jina wî jî ducanî kir (ku berê ew ducanî nedibû). Bi rastî wan di karên qenc de dilezand, ji tirsa ezab û bi hêviya qenciyên me li ber me digeriyan û wan (bi îbadetê) xwe ji me re xwe dişikandin û li ber fermanên me amade bûn.

**91.** Ew pîreka ku namûsa xwe bi îfet parastiye jî (di bîr bîne); vêca qasidê Me Cîbril bi emrê me pufkirê (ew bi Îsa ducan bû) û Me ew û kurê wê ji xelkê re kirin nîşan.[1]

**92.** Bêguman dînê van pêxemberan yek dîn e (ku ew îslam e) û Ez jî Xwedayê we me, nexwe ji bo min îbadetê bikin.

**93.** (Lê belê peyrewên pêxemberan) di nav xwe de, der barê karên (dînê) xwe de bi hev ketin. Ew tev dê li me vegerin.

**94.** Êdî kî ku karên qenc bike û ew bawermend be, vêca xebata wî winda nabe. Bêguman em wê jê re dinivîsin.

**95.** Li xelkê welatekî ku me ew birine helakê heram e ku ew careke din vegerine dinyayê.

**96.** Heta wextê pêşiya yacûc û macûcan vedibe û ew ji her cihê bilind ve dadikevin, tên.

**97.** Dema peymana heq (qiyamet) nêzîk bû, di cih de ew kesên ku kafir bûne çavên wan beloq dibin! (Dibêjin:) Wax li halê me be! Bi rastî haya me ji vê (rojê) tune bû, belkî zêdeyî vê jî em zalim bûn.

**98.** (Gelî muşrikan) bêguman hûn û ew ên ku ji bilî Xwedê we ew dihebandin ardûyê dojehê ne. Hûn ê (digel wan) herinê.

**99.** Eger bi rastî ew Xweda bûna dê neçûna dojehê. Hal ev e ku ew tev di dojehê de seraqetî ne.

**100.** Di dojehê de, ji bo wan (ji ber dijwariya ezabê wê) nalenaleke pir dijwar heye û ew li wê derê (tu tiştê) nabihîzin.

**101.** Bêguman ew ên ku berî niha me ji bo wan peymana rindiyê daye, ew ji dojehê dûr in.

**102.** Ew qîjîna dojehê jî nabihîzin, di nava nîmetên ku dilê wan bibijê de her û her dimînin.

**103.** Tirsa mezin jî (ya roja qiyametê) wan xemgîn nake. Melaîket wan pêşwazî dikin (û ji wan re dibêjin:) Ha ev e, ew roja we ya ku peymana wê ji we re hatibû dayîn.

1 Di mana vê ayetê û ayeta 12an ji sûreyê Tahrîm de gelek kes ketine şaşiyê. Yanî ji vî cumleyî "Me ji ruhê xwe puf kirê" muxalifi murada Xwedê fehm dikin. Dibêjin: Xwedê ji ruhê xwe; ew rûhê ku nefsa Xwedê ye puf kiriyê. Ev baweriyeke pûç û batil e. Mana ayetê ev e: Me emrê qasidê xwe Cîbrîl kir ku pifbikê ber xavika wê. Cibrîl pifkirê, vêca Meryem bi Îsa ducan bû.

104. Wê roja ku em ê esmên bipêçin mîna pêçandina rûpelên kitêban; Em ê dîsa mirovan vejînin ka çawa cara pêşîn me afirandibûn. Ev peymaneke li ser me ye, bêguman em ê (peymana xwe) bi cih bînin.

105. Sond be, me piştî Tewratê di Zebûrê de jî nivîsiye, bêguman evdên min ên qencîkar dê bibin wêrtên erdê.

106. Ha di vê (Quranê) de, ji bo xelkekî ku bi duristî îbadetê me bike pendeke bêkêmasî û tekûz heye.

107. (Hey Muhemmed!) Me tu şandî bes da ku tu ji heyînan re bibî rehmet.

108. (Ji pûtperestan re) Bibêje: Bêguman wehya ku ji min re hatî bes ev e; Xwedayê we bes xwedayekî bi tenê ye, vêca (ji fermanên wî re) berdest bibin.

109. Eger ku ew berê xwe (ji îslamê) vegerînin, êdî (ji wan re) bibêje: Min, hûn hemû bi fermanên Xwedê wekhev agahdar kirin. Êdî ez nizanim ew civanê ku peymana wê ji we re hatiye dayîn nêzîk e, yan jî dûr e.

110. Bêguman Xwedê bi gotina aşkera û bi ya ku hûn vedişêrin jî dizane.

111. Ez nizanim belkî jî ew (paşxistina ezab) ji we re îmtihanek be (ka hûn ê çawa tevbigerin) û dibe ku heyanî demeke navlêkirî xweşiyek be jî.

112. (Pêxember) Got: Xwedêyo! Di navbera min û van de bi heqî hukim bike. Xwedayê me yê rehman li hemberî ya ku hûn der barî me de dibêjin, arîkarê me ye.

## 22. SÛREYÊ HECC

Sûreyê Hecc, heftê û heşt (78) ayet e. Ji ayeta 19'em û pê de şeş ayet li Medînê, yên din jî li Mekkê daketine. Ji ber ku di vî sûreyî de behsa heccê tê kirin jê re Sûreyê Hecc hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Gelî mirovan! Xwe ji (ezabê) Xwedayê xwe biparêzin! Bêguman erdheja roja qiyametê bûyereke mezin e!

2. Roja ku hûn wê (erdhejê) bibînin, her dayîka şîrdar ji şîrmija xwe bêhay dibe û her jina li halekî berê xwe diavêje. Tu mirovan dibînî ku serxweş in. Na! Ew ne serxweş in, lê belê ezabê Xwedê pir dijwar e!

3. Ji mirovan hin hene ku der barê Xwedê de bêzanebûn guftûgo dikin û didin pey her şeytanê rikdar.

4. Hukim li ser şeytên hatiye dayîn; kî ku wî ji xwe re bike dost û arîkar, muheqeq ew ê riya rast li ber winda bike û ew ê berê wî bide riya agirê bipêt.

5. Gelî mirovan! Eger hûn ji "saxbûna piştî mirinê" gumandar bin; bêguman me hûn (pêşî) ji axê piştre ji dilopek av piştre ji xwîna meyandî piştre ji parçeyek goşt ku xulqiyeta wî di navbera kifşbûn û nekifşbûnê de bû afirandiye da ku em (qudreta xwe ya bêsînor) ji we re aşkera bikin. Em, ya bivên heta demeke

navlêkirî di malzarokê de dihêlin paşê em ê we zarok (ji zikê dayîkên we) derbixin, piştre hûnê bigihîjin çaxê xurtiya xwe. Hin ji we dimirin û hin ji we dê bimînin heta pîr û kal bibin; hetanî ku piştî ew zana bû ew tiştekî nizanibe. Tu ser erdê jî dibînî ku ew hişk û hola ye, lê belê dema ku em avê dadixin ser wê ew diwerime, bilind dibe û ji her texlîtî şînahiya spehî derdixe holê.

6. Ev rewşa hatî gotin, ji ber ku Xwedê ew bi xwe heq e û yê ku miriyan sax dike ew e û ew li ser her tiştî qadir e.

7. Bêguman roja qiyametê dê were, tê de qet guman tune û muheqeq Xwedê miriyên di goran de dê vejîne .

8. Hin ji mirovan hene ku bêzanîn, bêrêber û bê kitêbeke ronahîker der barê Xwedê de têdikoşin.

9. Ji bo (xelkê) ji riya Xwedê derxe (bi quretî) li kêleka xwe dizivire (û heqiyê qebûl nake). Ji wî re li cîhanê riswatiyek heye, li qiyametê jî em ê ezabê şewatok bi wî bidin çêjandin.

10. (Jê re tê gotin:) Ha ev, ji ber vê ye ku te li pêşiya xwe şandiye şandiye. Teqez Xwedê li bendeyên xwe zilmê nake.

11. Hin ji mirovan hene ku îbadetê Xwedê ne ji dil dikin, vêca eger qenciyek li wî bibe pê kêfxweş dibe û eger belayek bi ser de were rûyê xwe diguherîne (ji dîn derdikeve). Bi vê rewşê li dinya û axretê ziyan kiriye. Xesereta aşkera ha ev bi xwe ye.

12. Ew ji bilî Xwedê ji wî yê ku ne dikare zerarê bide û ne jî dikare feydê bide wî îbadetê dike. Ha rêşaşiya dûr ev e.

13. Ew perestina yekî dike ku (li gorî aqil) zerara wî ji feydeya wî nêzîktir e. Ew (ê ku mirovê kafir perestina wî dike) çi pîs arîkar e û çi pîs heval e!

14. Bêguman Xwedê, dê wan kesên ku bawerî anîn û karên qenc kirin bixe bihiştên ku di binê wan re çem diherikin. Bêguman Xwedê tiştê ku bivê dê bike.

15. Çi kesê guman bike ku Xwedê li dinya û axretê dê arîkariya wî (pêxember) neke, bila bi wesileyekê bigire bi bal asîman ve hilkişe, paşê arikarîya ku ji jor ve tê bibire, vêca bila binêre; gelo ev karê wî ya ku wî hêrs dike ji holê radike?

16. Her wiha me Quran bi ayetên aşkera hinartiye. Teqez Xwedê yê bivê wî rasterê dike.

17. Ew ên ku bawerî anîne û yên bûne cihû, sabiîn, fileh, mecûsî û yên muşrik, bêguman Xwedê roja qiyametê dê bi hukmê xwe wan ji hev biqetîne. Bêguman Xwedê li ser her tiştî Şehîd e.[1]

18. Ma tu nizanî ew ên ku li asîmanan û ew ên ku li erdê ne; roj, heyv û stêr, çiya

1 Eş-Şehîd: Ew ê ku li ser mexluqê xwe hazir û zêrevan e. Li ser xwe bi yekitî û dadperweriyê şehdeyiyê dide û dema bawermend wî yek didêrin li ser rastîtiya wan şehdeyiyê dide û ji bo pêxember û melaiketan jî şehdeyiyê dide.

Xwedê behsa olên li ser erdê dike. Ku ew musilman, Yehûdî, Fileh, Sabiî, Mecûsî û Muşrikin. Xwedê roja qiyametê wan lihev kom dike û bi wî hukmê xwe yê adil di navbera wan de hukim dide. Wan ji hev safî dike; ka ki li dinyayê li ser riya rast bû û kî li ser riya şaş bû. Xwedê dê wan li ser kirinên wan

û dar, heywan û gelek ji mirovan jî, ji Xwedê re diçin secdeyê û ji gelekan re jî ezab heq bûye. Xwedê kê reben û bêqîmet bike êdî tu kes tune ku qedrê wî bigire. Bêguman Xwedê ya ku bivê dike.

**19.** Ev herdu civat, (bawermend û kafir) dijraberê hev in, der barê Xwedayê xwe de bi hev ketine. Vêca yên ku kafir bûne ji wan re cilên ji agir hatine dirûtin ku bi ser serên wan de jî ava kelî dê were rijandin!

**20.** Bi wê (ava kelî) nav û hinavên wan tên helandin û çermên wan (tên biraştin!)

**21.** Gurzên hesinî jî ji wan re hene!

**22.** Ji ber xem û ezab, her cara ku dixwazin ji dojehê derkevin dîsa li wir têne vegerandin û (ji wan re tê gotin:) De ezabê sotinê tehm bikin!

**23.** Bêguman ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirine Xwedê dê wan bixe bihiştên ku di binê wan de çem diherikin. Ev tê de bi bazinên zêr û lûlûyan têne xemilandin û cilên wan jî tê de ji hevrîşim e.

**24.** Bi bal gotinên herî xweş ve hatine rasterêkirin û bi bal riya Xwedayê hemîd (pesnande) ve hatine hîdayetkirin.

**25.** Bêguman ew ên kafir bûne û riya Xwedê û Mescîdul Heramê li ber xelkê digirin, ew a ku me ew ji hemû mirovan –yên niştecih û yên ji derve hatin-re wekhev girtiye û kesê di Ke'beyê de bi sitemkarî ji rastiyê averê bibe, em ê ezabekî cansoj bi wî bidin çêjandin.

**26.** Dema ku me cihê Mala Xwedê ji Îbrahîm re diyar kir û (me jê re got:) Ji min re tu tiştî hevpişk negire û mala min ji tewafkeran, nimêjkeran, rikûkeran û secdebiran re paqij bike.

**27.** Di nav mirovan de ji bo çûna Hecê gazî bike ku yên peya û yên siwar li ser heywanên weza û westiyayî ji her riyên dûr ve werin cem te (serdana Ke'bê bikin).

**28.** Da ku ji bo xwe (di Hecê de) berjewendiyan (ên dinyayî û axretî) bibînin, da ku navê Xwedê li ser şerjêkirina heywanên qurbanê bibêjin, ew ên ku me bi risqînî daye wan. Vêca ji (goştê) wan bixwin û bidin jar û xizanan jî.

**29.** Paşê bila qirêja xwe ji ser xwe rakin û bila qurbanên ku li ser xwe nezir kiribûn bînin cih û bila wê mala qedîm (Ke'bê) tewaf bikin.[1]

**30.** Rewş ev e; kî ku rêz li fermanên Xwedê bigire, ev li cem Xwedayê wî jê re çêtir e. (Di dîn de ew ê ku herambûna wan) ji we re hatiye xwendin, ew ne tê de ye, heywanên din ji we re hatine helalkirin. Nexwe, xwe ji pûtên necis biparêzin û xwe ji şadezoriyê jî biparêzin.

**31.** Ji dînên pûç berê xwe vegerînin; berê xwe bidin dînê Xwedê û jê re hevpişkan çênekin. Vêca kî tiştekî ji Xwedê re bike hevpişk, her wekî ew ji esmên ketibe xwarê, vêca teyrek hê li hewa xwe lê bide, yan jî ba wî biavêjê cihekî dûr û kûr.

---

ceza bike. Lewra Xwedê tevekê 'emelê wan nivisîye, tomar kiriye û li serê buye şahid. Ji ber vê yekê; di dawîya ayetê de "Xwedê li ser her tiştî Şehîd e" gotiye.

1 Mebest ji jêbirina qirêjê ev e ku pora xwe kur bikin, neynokên xwe jê bikin û xwe tam paqij bikin.

32. Rewş ev e; kî, nîşanên Xwedê mezin bidêre (ji hukim û fermanên wî re rêzdar be) bêguman ew ji teqwadariya dilan e.

33. Ji bo we di wan (heywanên qurbanê) de, heyanî demeke navlêkirî (ku dema serjêkirina wan e) hin feyde hene (mîna siwarbûn, şîr û hiriya wan). Piştre cihê qurbankirina wan mala pîroz e (ku ew ê li Ke'bê bên şerjêkirin).

34. Me ji her umetê re qurbangehek daniye da ku li ser şerjêkirina wan terşan (deve, dewar, pezên) ku wek risq me daye wan navê Xwedê bînin. (Gelî mirovan!) Xwedayê we Xwedayekî yek e, vêca radestî ber fermana Wî bibin. Mizgînê bide wan kesên ku ji bo Xwedê xwe dişkînin û dilnizm in!

35. Ew ên ku dema (navê) Xwedê tê gotin, dilên wan dilerize û dema belayek bê serê wan xwe radigrin, nimêjê bi awayê pêdivî dikin û ji risqê me daye wan (di riya xwedê de) xerc dikin.

36. Me (qurbankirin) heywanên gir ji we re kiriye nişanên dînê Xwedê, di wan de ji bo we xêr û bêr heye. Naxwe dema we li ser sê lingan ji piya şerjêkirin, li ser wan (navê) Xwedê bînin û dema ku bi ser kêleka xwe ve ketin (şerjêkirina wan hate cih), êdî jê bixwin û bi ên xwedî ihtiyac û ên ne xwedî ihtiyac jî bidin xwarin. Her wisa me ev heywan ji we re berdest kirine da ku hûn spasiya min bikin.

37. Ne goştê wan qurbanan ne jî xwîna wan digihîje Xwedê, lê belê bes teqwedariya we digihijiyê. Her wiha Xwedê ev heywan ji we re sernerm kirine da ku hûn Xwedê mezin bidêrin û mizgînê bide qencîkarên rast û durist!

38. Bêguman Xwedê berevaniya yên ku bawerî anîne dike. Bêguman Xwedê ji tu xayîn û nankoran hez nake.

39. Ji bo wan (bawermend) ên ku şerê wan tê kirin ji ber zilma ku li wan hatiye kirin destûra wan (bi cengkirinê) hatiye dayîn. Bêguman Xwedê li ser arîkariya wan qadir e.

40. Ew ên ku bes ji bo digotin: "Perwerdegarê me Ellah e", bi neheqî ji malên xwe hatine deranîn. Eger Xwedê hin mirov bi hinekan nedaya alî, misoger dê keşîşxane, dêr, kenîşt û mizgeftên ku navê Xwedê di wan de pir tê gotin bihatana xerakirin. Kesê ku arîkariya (dînê) Xwedê bike teqez Xweda jî dê arîkariya wî bike. Bêguman Xwedê hêzdar û desthilatdar e.

41. Ew ên ku eger em li ser erdê desthilatiyê bidin wan, dê nimêjê bi şeklê pêdivî bikin, zekata malê xwe bidin, fermana bi qenciyê û nehya ji neqenciyê bikin û her ji Xwedê re ye encama kar û kiryaran.

42. (Ya Muhemmed!) Eger ew bi te bawerî neyînin, vêca bêguman beriya wan gelê Nûh, Ad û Semûd jî pêxemberên xwe derewker dêrabûn.

43. Gelê Îbrahîm û gelê Lût jî (pêxemberên xwe derewker dêrabûn).

44. Gelê Medyenê jî (pêxemberê xwe Şûeyb) derewker dêrand. Mûsa jî derewîn hatibû dêrandin. Vêca me muhlet da kafiran, piştre me ew bi ezab girtin, vêca (binêre) neqayiliya min li hemberî wan ka çawa bû?

45. Gelek welatên ku xelkê wî zalim bûn me ew helak kirin. Vêca xaniyên wan bi ser

hev de herifîne û bîr(ên avê) bêxwedî ne û koşkên dîwarbilind û xweşik (bêkes mane).

**46.** Erê ma ew li ser erdê nagerin, vêca ku ji wan re dil hebin ku pê têbigihijin û ibret bigrin û guh hebin pê seh bikin û fehm bikin. Vêca birastî korayî ne korayîya çehva ye, belkî korayî ya dilê di sîngan de ye.

**47.** (Ya Muhemmed!) Ew leza hatina ezab ji te dikin. Xwedê hîç ji peymana xwe venagere. Bêguman rojeke li cem Xwedayê te, beranberî hezar salên ku hûn dijimêrin.[1]

**48.** Pir welatên ku (xelkê wan) zilm dikirin min muhlet da wan, paşê min ew (bi ezab) helak kirin û veger her bi bal min ve ye.

**49.** Bibêje: Gelî mirovan! Ez ji bo we tenê hişyarkerekî aşkera me.

**50.** Herçî ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirine, ji bo wan lêborîn û risqekî birûmet heye.

**51.** Herçî ew ên ku pêşbaziyê dikin da ku di ayetên Me de Me bêçare bihêlin, ha ew xelkê dojehê ne.

**52.** Me beriya te her çiqas resûl û nebiyek şandibe, dema wî tiştek daxwaz kiriye, şeytên her hewl daye ku tiştekî (fesadiyekê, astengiyekê) baveje nav daxwaza wî de. Vêca Xwedê ya ku pelîd diavêje dilê wan pûç dike. Piştre Xwedê ayetên xwe bi saxlemî bi cih dike. Xwedê zana ye, karbinecih e.

**53.** (Xwedê vê destûrê dide şeytên) da ku ew tiştê ku şeytan zêde dike ji bo wan ên ku di dilên wan de nexweşî(ya nîfaqê) heye û ji bo wan ên ku dilên wan (bi pûtperestiyê) hişk û hola bûye, bike (navgîna) ceribandinê. Bêguman zalim di nav îxtilafeke kûr de ne.

**54.** Û da ku ew kesên ku zanîn (Quran) ji wan re hatiye dayîn, bizanin ku ev (Quran) heq e û ji cem Xwedayê te hatiye hinartin. Vêca da ku bawerî pê bînin û dilên wan pê aram bibe. Bêguman Xwedê berê wan ên ku bawerî aniye dide bal riya rast û durist ve.

**55.** Ew ên ku kafir in der barê Quranê de her di nava şik û gumanê de ne, heyanî ku ji nişka ve qiyamet bi ser wan de bê yan jî ezabê roja qiyametê bê wan.

**56.** Wê rojê hukimranî bes a Xwedê ye. Ew di nav wan (bawermend û kafiran) de hukim dide. Herçî ew ên ku wan bawerî aniye û karên qenc kirine ew di nav bihiştên xwedannîmet de ne.

**57.** Herçî ew ên ku kafir bûne û bawerî bi ayetên me neanîne, ha ji bo wan ezabekî riswaker û dijwar heye.

**58.** Ew ên ku wan di riya Xwedê de hîcret kirine, piştre jî hatine kuştin yan jî di koçberiya xwe de mirine, bêguman Xwedê dê (li bihiştê) risqekî spehî bide wan û bêguman Xwedê her ew e çêtirînê risqdaran.

---

1 Zeman, îzafî ye. Nexasim gava mirov dixwazin zû zeman derbas bibe, ew zû derbas nabe belkî rojek bi qasî sal û zemanan dirêj tê gumankirin. Ev jî nîşan dide ku zeman îzafî ye. Hezar salê ku em dijmêrin li cem Xwedê bi qasî rojekê kin e. Lewra parçeyekî zemên yê ku ji bo Xwedê serê wî û binê wî diyarkirî be tune ye. Li nik Xwedê bêdawîbûn û herûherî heye.

**59.** Xwedê dê wan bixe cihekî ku wan memnûn bihêle û bêguman Xwedê her zana ye, bêhnfireh e.

**60.** Rewş ev e; çi kesê ku zilm lê hatibe kirin Xwedê destûr daye ku bi qasî zilma lê hatî kirin tola xwe veke, piştî vê dîsa ku êrîş û zilm lê were kirin, muheqeq Xwedê dê arîkariya wî bike. Bêguman Xwedê bexşende ye, gunehjêbir e.

**61.** Ev a me gotî rast e; bi sedema ku Xwedê şevê dixe ser rojê û rojê jî dixe ser şevê, bêguman Xwedê bihîzer e, bîner e.

**62.** Ev a me gotî rast e; bi sedema ku birastî jî Xweda, Ew her heq bi xwe ye û ew ên ku ji bilî Xwedê perestina wan dikin ew tev pûç (û batil) in û bêguman yê 'Eliyy yê Kebîr her Xwedê ye.[1]

**63.** Ma tu nizanî ku Xwedê ji ewran av daxistiye (û bi wê avê) erd kesk û hêşîn bûye. Bêguman Xwedê hûrbîn e, agahdar e.

**64.** Çi tiştê li erd û asîmanan heye tev yên Xwedê ne û bêguman yê dewlemend ê babetê spasiyê her Xwedê ye.

**65.** Erê ma tu nizanî Xwedê tiştê di erdê de heye û ew keştiyên ku li gorî fermana Xwedê di deryayê de dikişin ji we re sitûxwar kirine. Xwedê esmên radigire da ku nekeve ser erdê, ji bilî ku ew destûr bide. Bêguman Xwedê ji bo mirovan Reûf e, Reḥîm e.[2]

**66.** Yê ku (ji tuneyî) hûn sax kirine Xwedê ye. Piştre dê we bimirîne, paşê dîsa dê we sax bike. Bêguman însan pir nankor e!

**67.** Me ji her umetekê re şerîetek (rêbazek) daniye ku ew jî wê bi kar tînin. (Ya Muhemmed!) Naxwe bila di vê de tu kes bi te re tênekoşe. Tu jî (mirovan) vexwîne bi bal Xwedayê xwe ve. Bêguman tu di riyeke rast û durist de yî.

**68.** Eger ew bi te re munaqeşeyê bikin (ji wan re) Bibêje: Xwedê, bi ya ku hûn dikin bêhtir dizane.

**69.** Xwedê, roja qiyametê di navbera we de, der barê wan mijarên ku we dijîtiya hev dikir de, dê hukim bide.

**70.** Ma tu nizanî ku çi tiştê li erd û asîmanan heye Xwedê wî dizane? Bêguman ev (zanîna Xwedê ya bi tiştê) li cem Xwedê di kitêbekê de nivîsandî ye û ev rewş li ber Xwedê pir hêsan e.

**71.** Ew ji bilî Xwedê îbadetê tiştekî dikin ku Xwedê li serê tu delîl danexistiye û zanîneke wan jî pê nîn e û ji bo zaliman tu arîkar tune ye.

**72.** Dema ku ayetên me yên aşkera û ronker ji wan re tên xwendin, tu dê ji rûyên wan nerazîbûnê (ya li hemberî Quranê) bibînî. Hindik dimîne ku ew êrîşî wan ên ku ayetên me ji wan re dixwînin bikin. (Ji wan re) Bibêje: Ma ez ji we re ya

---

1 El-'Eliyu: Ew ê ku rewşa wî bilind e, serdestiya wî bilind e û zatê wî bilind e, her tişt di bin serdestiya wî û hukimraniya wî de ye, tu tişt di ser wî re tuneye.

El-Kebîr: Ewê ku xwediyê meznatiyê ye û ji her tiştî mezintir e

2 Er-Reûf: Ewê ku rehm û dilovaniya wî pir zêde ye. Di dinyayê de ji bo hemî mirovan e û li axretê ji bo hinekan e ku ew weliyê Xwedê yê bawermend in.

ji vê (hêrs û nerazîbûna we) xerabtir bibêjim; (ew jî) agir e! Xwedê, ji bo wan ên ku kafir bûne peyman pê daye. Ew, çi pîs wargeh e!

**73.** Gelî mirovan! Ji we re derb û meselek hatiye dayîn, vêca rind lê guhdarî bikin; ew ên ku ji bilî Xwedê hûn perestina wan dikin û li ber wan digerin, eger ew ji bo wê armancê bên cem hev jî, ew nikarin mêşekê jî biafirînin. Eger mêş tiştekî ji (destê) wan birevîne, ew nikarin wî jî jê vegerînin?! Yê ku dixwaze neçar e û yê ku jê tê xwestin jî neçar e!

**74.** Wan bi awayekî babetî Xwedê, qedrê Wî negirtine. Bêguman Xwedê her Qewiyy e, ‘Ezîz e.[1]

**75.** Xwedê hem ji firîşteyan hem jî ji mirovan qasid bijartine. Bêguman Xwedê Semî‘e, Basîr e.[2]

**76.** Xwedê, bi ya ku ew dikin û bi ya ku ew ê bikin jî dizane. Hemû kar û bar li Xwedê vedigerin.

**77.** Gelî yên ku bawerî anîne! Herin rikû‘ê, herin sicûdê, îbadeta Xwedayê xwe bikin û qenciyê bikin da ku hûn bi ser bikevin.

**78.** Di ber (dînê) Xwedê de bi rast û duristî cîhadê bikin. Xwedê (ji bo arîkariya dînê xwe) hûn bijartine. Di mijara dîn de Wî tu zehmetî li we bar nekiriye. Bidin pey dînê bavê xwe Îbrahîm. Xwedê, ji berê de û di Quranê de jî hûn bi mislimanî nav kirine. Da ku Pêxember (roja qiyametê) li ser we bibe şahid û hûn jî li ser mirovan bibin şahid. Nexwe bi awayê pêdivî nimêjê bikin, zekata malê xwe bidin û xwe bi Xwedê bigirin. Ew dost û arîkarê we ye, vêca ew çi xweş dost e, çi xweş arîkar e!

---

1 El-Qewîyyu: Ew ê ku her jê re ye qudreta bê qeyd û şert digel meşîeta bêkêmasî.

El-‘Ezîz: Ew ê ku tevekê wateyên izzetê jê re ye; serdestiya quwetê, vêca yê wî têk bibe tune, serdestiya nehiştinê, îcar ne hewceyê tu kesî ye, serdestiya têkbirin, û serkeftinê naxwe bê destûra wî tu tişt xwe naleqe.

2 Es-Semî’u:Ew ê ku bi gotina pistepistî û ya bi dizî, bi gotina eşkere û ya xuya bihîzer e; belkî bi tevekê dengan ew çiqas hûr û gir bin jî û ewê ku bersiva lavakaran dide.

El-Besîru: Ew ê ku di alema nelberçav û ya liber çav de bi hemî heyînan bîner û dîdevan e, her çiqas ew veşartî û aşkere, hûr û gir bin jî.

# 23. SÛREYÊ MU'MÎNÛN

Sûreyê Mumînûn, (118) sed û hijdeh ayet e. Li Mekkê daketiye. Vî sûreyî, nexasim ayetên wî yên pêşîn ji ber ku behsa îbadet, exlaq, silûk û nîmetan dike ku li axretê ew bawermendên bi van salixan dê bigihîjin wan û li cîhanê jî bigihîjin serkeftinê, jê re Sûreyê Mumînûn hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Bêguman bawermend serfiraz bûne û gihîştine mirada xwe.
2. Ew ên ku di nimêja xwe de bitirs in…
3. Ew ên ku berê xwe ji kelevajiyan vedigerînin…
4. Ew ên ku zekata malê xwe didin…
5. Ew ên ku namûsa xwe diparêzin…
6. Ji bilî hevser û cariyên wan, ew bêgazind in…
7. Nexwe kî bixwaze ji vê û wir de here, vêca ew in yên ku tixûbê (helaliyê) derbas kirine.
8. Ew ên ku hay ji emanet û peymanên xwe hene…
9. Ew ên ku li nimêjên xwe miqate ne…
10. Ha ev in, ew ên mîratgir...
11. Ew ên ku Firdewsê mîrate werdigrin û ew tê de seraqetî dimînin.
12. Sond be ku me însan ji heriyeke sefandî afirandiye.
13. Paşê me ew kiriye nutfe (xwînpare) û di malzarokê de bi cih kiriye.
14. Paşê me ew nutfe kiriye xwîneke hişk, di pey re me xwîna hişk kiriye piçikek goşt, me ew piçika goşt kiriye hestî (skelêt), me ew hestî bi goşt kiras kiriye, paşê me ew kire afirandiyekî din. Vêca Xwedê pîroz û bilind e ku ew spehîtirînê afirînêran e.
15. Piştî vê qasê bêguman hûn ê bimirin.
16. Piştre, hûn ê roja qiyametê teqez bêne vejandin.
17. Sond be, me di ser we re heft asîman afirandine û em ji wan ne bêhay in.
18. Me ji ewran bipîvan (li gorî pêdiviyê) avek daxistiye, vêca me ew di erdê de daye sekinandin û bêguman qeweta Me li ser birina wê jî heye.
19. Her wiha bi wê (avê) me ji we re baxçeyên xurme û tirî anîne rastê ku ji we re di wan bostanan de gelek mêwe hene û hûn ji wan dixwin.
20. Me (bi wê avê) ji we re darek şîn kiriye (ku ew dara zeytûnê ye) ku li Çiyayê Sînayê çêdibe. Berê wê ji bo kesê ku bixwe dibe rûn û pêxwarin.
21. Bêguman ji bo we di terşan (deve, dewar û pez) de jî îbret hene. Em ji ya di

zikên wan de bi we didin vexwarin û ji bo we di wan de hin feydeyên din jî hene, ji bilî vê hûn ji (goştê) wan jî dixwin.

**22.** Hûn li ser wan û li ser keştiyan (bi siwarî) têne hilgirtin.

**23.** Sond be ku Me Nûh ji gelê wî re şand. Vêca wî (ji wan re) got: Ey Gelê min! Xwedê bihebînin, Ji Wî pê ve ji bo we tu îlah nîn in. Erê ma hê jî hûn xwe naparêzin?

**24.** Vêca (li hemberî vê yekê), ji gelê wî, giregirên ku kafirbûne (ji peyrewên xwe re) gotin: Ew jî, tenê mirovekî eynî wekî we ye. Ew dixwaze li ser we xwe qure bike. Eger Xwedê bixwesta (ku pêxemberekî bişîne) muheqeq dê firîşteyek bişanda. Me tiştekî mîna vê ji bav û bapîrên xwe yên pêşî nebihîstiye.

**25.** Ew zilamekî wisa ye ku dînîtiyek pê re heye. Naxwe heya demekê çavdêriya wî bikin.

**26.** Nûh got: Xwedayê min! Ji ber ku bawerî bi min neanîn arîkariya min bike!

**27.** Me peyam da Nûh ku di bin çavdêriya me de û bi awayê ku me wehî jê re ragihandiye, keştiyê saz bike. Vêca dema fermana me (ya bi helaka wan) hat û av ji tenûrê za û pijiqî, ji her cinsekî heywanan cotekî û -ji bilî wan kesên ku fermana me bi helakbirina wan hatîye- malbata xwe jî bixe keştiyê. Der barê wan kesên ku zilm kirine li ber min qet negere! Bêguman ew teqez dê bêne binavkirin.

**28.** (Ey Nûh!) Dema tu û ew kesên ku ligel te li keştiyê bi cih bibin, wiha bibêje: Hemd ji Xwedê re be ku em ji bereka zaliman reha kirin.

**29.** Dîsa bibêje: Xwedayê min! Min li cihekî pîroz û bi bereket bi cih bike û her Tu yî çêtirînê bicihkeran.

**30.** Bêguman di vê de (ji bo we) nişan hene û bêguman Me ew pê ceribandin.

**31.** Paşê li dûv wan Me miletekî din anî holê.

**32.** Vêca me ji nav wan bi xwe pêxemberek ji bo wan şand, (ji wan re got:) Ji Xwedê re îbadetê bikin, ji bilî Wî ji bo we tu Xweda nîn in. Erê ma hê jî hûn (ji guneh û şirkê) xwe naparêzin?

**33.** Giregirên gelê wî, ew ên ku kafir bûne, ew ên ku bawerî bi roja axretê neanîn û ewên ku jiyana nîmetên ku me dayî wan ew ji rê birin, gotin: Ev jî mirovekî wekî we ye; ji ya ku hûn dixwin dixwe û ji ya ku hûn vedixwin ew jî vedixwe.

**34.** (Giregiran got:) Eger hûn bi gotina mirovekî wekî xwe bikin, muheqeq hûn ê bixesirin.

**35.** Erê ma ew (pêxember) peymanê dide we û dibêje: Dema hûn mirin û bûne ax û hestî, hûn ê careke din (ji gorên xwe) bêne deranîn?

**36.** Ev peymana ku ji we re tê dayîn dûr e, dûr e!

**37.** Ev jiyana me bes jiyana vê dinyayê ye. Em ê bimirin û hinekên din jî dê sax bibin (bêne dinyayê) û piştî mirinê em bi xwe dîsa nayêne vejandin.

**38.** Ev pêxember bes zilamek e, li ser navê Xwedê derewan dike. Em bi xwe pê nebawer in.

**39.** (Pêxamberê wan) got: Xwedayê min! Bi sedema ku wan bawerî bi min neanî arikariya min bike!

**40.** (Xwedê jê re) Got: Di demeke nêzîk de ew dê (ji ber kufra xwe) poşman bibin!

**41.** Vêca wê qîrîna cansoj bi rastî ew girtin (û helak kirin). Îcar Me ew kirin wekî qafokên ser avê. Dûrbûna ji rehma Xwedê her ji bereka zalim re be!

**42.** Paşê me li dûv wan hin miletên din anîn holê.

**43.** Qet umetek ne dikare dema (hilaka) xwe bide pêş ne jî dikare bide paş.

**44.** Paşê me li pey hev qasidên xwe şandin. Ji kîjan umetê re qasidê wê hatibe, her bawerî pê neanîne. Me jî (di helakê de) ew dane dûv hev û Me ew kirin mijûlahî (ku xelk di civatan de pê mijûl dibe). Vêca ji bo miletekî be ku bawerî nayîne hilak û ezab ji wan re be!

**45.** Piştre Me Mûsa û birayê wî Harûn bi mucîzeyên xwe û tevî delîlên aşkera şandin…

**46.** Bi bal Firewn û giregirên wî ve. Vêca wan xwe qure kir (û bawerî neanîn) û ew civateke pozbilind bû.

**47.** Gotin: Erê ma em ê bi du mirovên wekî xwe bawerî bînin û rewş ev e ku xelkê wan jî ji me re xizmetkar in?

**48.** Vêca wan bawerî bi wan neanî û bûne ji yên helakbûyî.

**49.** Sond be, Me kitêb daye Mûsa da ku ew (zaroyên îsraîl pê) rasterê bibin.

**50.** Me kurê Meryemê (Îsa) û dayîka wî jî kirine nîşanek (li ser qudreta xwe) û me ew li cihekî bilind ku xwedan dar û kanî ye niştecih kirin.

**51.** Gelî qasidan! Ji xwarinên pak û helal bixwin û karên qenc bikin. Bêguman ez bi ya ku hûn dikin dizanim.

**52.** Ev dînê we tevan yek dîn e, Ez jî Xwedayê we me, vêca (bi pêkanîna fermanên min û bi dûrbûna ji qedexeyan) xwe ji min biparêzin.

**53.** Êdî ew (umetên pêxemberan) di karê dînê xwe de parçe parçe bûne. Her civat bi ya li cem xwe dilxweş in.

**54.** Vêca tu heyanî demekê wan di nav rêşaşiya wan de bihêle!

**55.** Ma ji wan we ye ku bi wî mal û zarokên ku em didin wan…

**56.** Em ji wan re lezê li xêran dikin? Na, belkî ew tênagihîjin.

**57.** Bêguman ên ku ji tirsa Xwedayê xwe bisaw û bitirs in…

**58.** Ew ên ku bawerî bi ayetên Xwedayê xwe tînin…

**59.** Ew ên ku ji Xwedayê xwe re tiştekî nakin hevpişk…

**60.** Ew ên ku ya li ser wan pêwist e didin digel ku dilên wan bitirs e ji ber ku birastî ew ê li Xwedayê xwe vegerin.

**61.** Ha ev ên hanê, li xêr û qenciyan dibezin û berî xelkê xwe diavêjine xêrê.

62. Em tu kesî zêdeyî qeweta wî berpirs nagirin. Li bal me kitêbek (a kar û kiryaran) heye ku rastiyê dibêje û neheqî yê li wan neyê kirin.

63. Naxêr, der barê vê Qur'anê de dilên wan (kafiran) di korîtî û nezanînê de ye û ji bilî vê jî hin karên wan ên xerab hene ku ew dikin.

64. Paşê dema em dewlemend û serekên wan bi ezab bigirin tu dê bibînî ku ew dikin feryad û fîxan!

65. (Ji wan re tê gotin:) Îro, bêyhûde nekin hawar! Bêguman hûn ê ji me arîkariyê nebînin!

66. Birastî jî ayetên min ji we re dihatin xwendin, vêca we pişta xwe dayê mîna ku bi ser pehniya xwe ve hûn vegerin.

67. We, bi Beytullahê xwe qure dikir ku di şevbihêrkê xwe de we dev diavêtyê.

68. Erê ma ew li vê Qur'anê qet nefikirîne? Yan jî, ma ya ku berê ji bav û bapîrên wan re nehatibû ji wan re hatiye?

69. Yan jî ma hê wan pêxemberê xwe nas nekiriye, vêca ji bo vê yekê wî înkar dikin?

70. Yan jî ew dibêjin: Bi wî re dînîtiyek heye? Naxêr, belkî wî heqî ji wan re aniye, digel ku pirê wan ji heqiyê hez nakin.

71. Eger heqî bidaya pey hewesên wan, muheqeq (pergala) erd û asîmanan û yên ku di wan de hene dê xera bibûya. Na belkî me ji wan re (ev Qurana ku) serbilindiya wan e daye wan, lê belê wan berê xwe ji serbilindiya xwe guhartiye.

72. Yan jî ma tu xeracekê ji wan dixwazî (vêca ew nayêne îmanê)? Êdî dana Xwedayê te (ji ya ku ew bidin) çêtir e û her ew e çêtirînê riziqdaran.

73. Rastî ev e ku tu wan vedixwînî riyeke rast û durist.

74. Bêguman ên ku bawerî bi axretê nayînin ew ji ser riya heq û rast ketine.

75. Eger em li wan bihatina rehmê û tengasiya ku gihatî wan me ji ser wan rakira, dîsa dê di rêşaşiya xwe de biketina rikê û ew ê sergêjane bigeviziyana.

76. Sond be me ew bi ezabê (birçîbûnê) girtin, dîsa jî wan xwe ji Rebbê xwe re nizm nekir û bi zarezar li ber Wî negeriyan.

77. Heyanî dema em deriyê ezabekî dijwar li ser wan vekin, tu dê binêrî ku va ye wan li wir hêviya xwe winda kiriye, şaş mane!

78. Xwedê ye, yê ku ji bo we guh, çav û dil afirandine, hun çi qas hindik spasî(ya wan nîmetan) dikin!

79. Xwedê ye, yê hûn li ser erdê afirandine û hûn ê li ber Wî bêne civandin.

80. Xwedê ye, yê ku sax dike û dimirîne, guherîna şev û rojê jî karê Wî ye, ma hê jî hun aqilê xwe bi kar nayînin!

81. Digel vê jî wan wekî gotina pêşiyên xwe got.

82. Gotin: Naxwe rast e ku dema em bimirin, bibin ax û hestî em ê dîsa bêne saxkirin?

83. Sond be eynî ev peyman hê berê ji me û bavên me re hatibû dayîn, (lê belê) ev ji çîrok-çîvanokên pêşiyan pê ve, ne tiştekî din e?

84. Bibêje: Eger bi rastî hûn dizanin (de ka bibêjin:) Ev cîhan û yên ku tê de hene, yên kê ne?

85. Dê bibêjin: Yên Xwedê ne. Bibêje: Ku wisa ye, erê ma hûn aqil nagirin?!

86. Bibêje: Ma Xwedayê asîmanên heft tebeq û Xwedayê ‘Erşê mezin kî ye?

87. Dê bibêjin: Yên Xwedê ne. Bibêje: Erê ma vêca hûn jê natirsin?

88. Bibêje: Eger bi rastî hûn dizanin (de ka bibêjin:) Ma kî ye, ew ê ku mulkiyet û gera her tiştî di destê wî de, ew ê ku her tiştî diparêze û ew ne hewceyî parastinê ye?

89. Dê bibêjin: (Ev hemû) yên Xwedê ne. Bibêje: Nexwe çawa hûn tên xapandin?

90. Naxêr, bêguman me heq ji wan re aniye û bêguman ew derewkar in.

91. Xwedê (ji bo xwe) tu zarok negirtine û digel wî tu xweda jî tun in. Eger wisa bûya dê her Xwedayek bi mexluqê xwe ve bûya (dê ew îdare bikira û nehişta xwedayên din muselletî ser wî bibin) û dê hinan ji wan zora yê din bibira. Xweda ji ya ku ew wî diwesifînin, pak û bilind e.

92. Xwedê, zanayê nepenî û aşkerayan e, vêca ji ya ku jê re dikin şirîk ew pir bilind e.

93. Bibêje: Xwedayê min! Eger te hukim dabe ku hêj ez sax bim tu wan bidî ezabê…

94. Xwedayê min! Min mexe nav civata zaliman.

95. Bêguman Em dikarin hinekî ji wî ezabê ku me peyman pê daye nîşanî te bidin.

96. Tu nebaşiyê bi ya herî spehî bide alî. Em bi ya ku ew der heqê te de dibêjin, bêhtir dizanin.

97. Bibêje: Xwedayê min! Ez xwe bi te ji tasewasên şeytanan diparêzim!

98. Xwedayê min! Ez xwe bi te diparêzim ku ew digel min bin.

99. Paşê dema mirina yekî ji wan (kafiran) hat, dibêje: Xwedayê min! Ji kerema xwe min vegerîne…

100. Da ku ez beranberî wî umrê xwe yê ku min bêfeyde bihurandiye karê qenciyê bikim. Na! Ev gotina ku wî gotiye, gotineke bêfeyde ye. Heyanî roja ku dîsa bêne saxkirin li pêşiya wan berzexek (astengek) heye.

101. Dema di sûrê de were pifkirin, êdî wê rojê di nav wan de ne neseb feyde dide ne jî li hev dipirsin.

102. Êdî kêşana kê giran were, ha ew bi ser ketine.

103. Kêşana kê jî sivik were, êdî wan jî bi xwe zerar kiriye, (lewra ew) dê her û her li dojehê bimînin.

104. Li dojehê agir rûyên wan dişewitîne, lêvên wan diqurmiçin û diranên wan qîç dibin.

105. (Ji wan re tê gotin:) Qey ayetên min ji we re nedihatin xwendin, vêca we jî ew înkar dikirin?

106. Ew dê bibêjin: Xwedayê me! Xerabiya me serî ji me stand û em civateke jirêketî bûn.

107. Xwedayê me! Me ji vir derîne. Eger careke din em (li kirinên xwe yên xerab) vegerin, êdî xuya ye ku em zalim in.

108. (Xwedê ji wan re) Dibêje: Li wir rezîl û riswa bimînin, hiş bin. Êdî bi min re nepeyivin!

109. Bêguman rewş ev e, ji bendeyên min civatekê digot: Xwedayê me! Me îman aniye, li gunehên me bibihure û li me were rehmê. Bêguman her tu yî çêtirînê dilovanan.

110. Vêca we ew ji xwe re kirin mijûlahî heyanî ku ew tinazpêkirina we zikrê min ji bîra we bir û hûn her bi wan bi tinazkerî dikeniyan.

111. Îro Min beranberê wê sebra ku kêşabûn xelat daye wan; bêguman her ew in ên xelasbûyî.

112. (Xwedê) dibêje: Hûn çend salan li ser rûyê erdê jiyane?

113. Dibêjin: Em rojekê yan jî bi qasî danekî rojê jiyane, vêca de ka ji hesabgiran bipirse.

114. (Xwedê) dibêje: Eger hûn dizanin ku jiyana hûn bi balê ve diçin çiqas dirêj e, hûn dizanin ku hûn li dinyayê hindik jiyan e.

115. (Gelî mirovan!) Erê ma hûn guman dikin ku me hûn beredayî afirandine û hûn gumandar in ku hûn ê li me neyêne vegerandin?

116. Vêca ew Xwedayê hukimran ê desthilatedar ê heq ê ku ji gotinên muşrikan pak û bilind e, ji Wî pê ve tu xweda nîn in. Ew xwedîyê ‘Erşê pîroz e.

117. Çi kesê ku digel Xwedê îbadetê îlahekî din bike ku tu delîleke wî li serê tune ye, vêca cezayê wî li cem Xwedayê wî ye. Bêguman mirovên kafir bi ser nakevin.

118. Bibêje: Xwedayê min! Li min bibihure, li min rehmê bike, teqez tu yî çêtirînê dilovanan.

## 24. SÛREYÊ NÛR

Sûreyê Nûr, 64 (şêst û çar) ayet e. Li Medînê daketiye. Ji ber ku di ayeta 35an de hatiye gotin: “Ellah nûra asîmanan û erdê ye” ku nûr jî bi maneya ronahî ye, ji vî sûreyî re Nûr hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Ev sûreyek e ku me ew hinartiye û me (hukmên ku tê de ne li ser we) ferz kirine. Me ayetên aşkera tê de anîne da ku hûn bifikirin, jê şîret bigirin.

2. Jin û mêrê zinaker her yekî ji wan sed darî li wan bidin û eger hûn bi Xwedê û roja axretê bawerdar in, di mijara (tetbîqa hukmên) dînê Xwedê de, bila

di biwara wan de hestê merhemetê (ji tetbîqa cezayî) we negire! Bila ji bawermendan civatek hazirî cezayê wan bibe.

3. Zilamê zinaker dikare tenê bi jineke zinaker re yan jî bi jineke muşrik re bizewice. Jina zinaker jî tenê mêrekî zinaker re yan jî mêrekî pûtperest dikare wê mehr bike. Ev (zewaca bi zinakeran re) li ser (mêr û jin)ên bawermend hatiye heramkirin.

4. Ew kesên ku zinayê biavêjin stûyê jinên binamûs, piştre (ji bo îsbata vê jî) çar şahidan neyînin, vêca her yekî ji wan heştê darî li wan bidin û îcar tu car şahidiya wan qebûl nekin. Ha ew jirêderketî bi xwe ne.

5. Lê belê ew kesên ku piştî vê tobe bikin (hal û hereketên xwe) rast bikin, ew cuda ne. Bêguman Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

6. Ew kesên ku zinayê biavêjin stûyê jinên xwe û ji bilî wan tu şahidên wan jî tune be, şahidiya her yekî ji wan ev e ku bi (navê) Xwedê çar caran sond bixwe ku ew ji rastbêjan e.

7. Di cara pêncem de jî, (ew dê bibêje:) Laneta Xwedê li wî (mêrî) be, eger ew ji derewbêjan be.

8. Cezayê zinayê li dinyayê ji ser tê avêtin ku jin jî, çar caran bi (navê) Xwedê sond bixwe û şahdeyî bide ku mêrê wê ji derewbêjan e.

9. Cara pêncem jî (dê bibêje:) Xezeba Xwedê li wê (jinê) bibare eger mêrê wê ji rastbêjan be.

10. Eger qencî û dilovaniya Xwedê li ser we nebûya (hûn ê şermezar û helak bûna) û bêguman Xwedê tobepejrên e, xwedanhîkmet e.

11. Bêguman ew kesên ku ev bêbextiya giran (li dayîka misilmanan Aîşeyê) anîn çend kesên ji we ne. Hûn vê yekê ji xwe re xerabî hesêb mekin. Belkî ew ji bo we xêr e. Ji bo her yekî wan bêbextan, guneh heye. Ew ê ku ev gunehê mezin jî hilgirtiye jê re ezabekî mezin heye.

12. Dema we ev (bêbextiya giran) bihîst, de bila we mêr û jinên bawermend der barê hev de zenneke qenc bikira û we bigota ku ev bêbextiyeke aşkera ye.

13. De bila wan (bêbextan) der barê wê (îdîaya xwe) de çar şahid bianîna? Vêca çi dema wan şahid neanîn, îcar li cem Xwedê ew derewker bi xwe ne.

14. Eger li dinya û axretê ne ji qencî û dilovaniya Xwedê ya li ser we bûya, ji ber wê (bêbextiya ku) we xwe noqî wê kiribû, muheqeq dê ezabekî mezin hûn bihingaftina.

15. Wê demê we bi zimanê xwe ji hev re radigihand û ya ku zanîna we pê tunebû we bi devên xwe digot. We hizir dikir ku ew tiştekî biçûk û hêsan e. Hal ev e ku li cem Xwedê ew pir mezin e.

16. Dema we ew (bêbextî) bihîst, de bila we bigota: ne babet e ji bo me ku em bi vê bipeyivin. Haşa; em Xwedê pak didêrin ku vê derewa bihetîketî ji me re musamehe bike! Ev, bêbextiyeke pir mezin e!

**17.** Eger birastî hûn bawermend in; Xwedê li we şîret dike da ku heya hûn sax bin careke din li bêbextiyeke wiha venegerin.

**18.** Xwedê (der barê ferman û qedexeyên xwe de) ji we re ayetên xwe aşkera dike, Xwedê zana ye, xwedîhîkmet e.

**19.** Bêguman ew ên hez dikin ku kiryarên xerab (mîna zinayê) di nav bawermendan de belav bibe (û bikeve stûyê wan), ji wan re hem li dinyayê hem jî li axretê ezabekî cansoj heye. Xwedê dizane û hûn nizanin.

**20.** Eger ne ji kerem û rehma Xwedê ya li ser we bûya (hûn ê bihetikîna û helak bûna). Bêguman Xwedê xwedîşefqet e, dilovîn e.

**21.** Gelî bawermendan! Nedin pey şûngavên şeytên. Kî bide pey şûngavên şeytên, (bila bizane ku) bêguman şeytan fermanê bi bêtoretî û kiryarên neqenc dike. Eger qencî û rehma Xwedê li ser we nebûya (ku deriyê tobê li we vekiriye), ji we tu kes (ji gunehê wê bêbextiyê) paqij nedima. Lê belê Xwedê kî bivê wî paqij dike û Xwedê bihîzer e, zana ye.

**22.** Bila ji we, ew ên ku camêr û xwedîserwet in sond nexwin ku êdî (ji malê xwe) dê nedin xizm û belengaz û yên ku di riya Xwedê de muhacir bûne; bila li wan biborin û li wan negirin. Ma hûn hez nakin ku Xwedê jî li gunehên we bibore? Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.[1]

**23.** Bêguman ew ên ku jinên bawermendên dawpaqij ên ku (ji zinayê) bêagah in bi zinayê sûcdar dikin li dinya û axretê lenet li wan hatiye barandin û ji bo wan ezabekî mezin heye.

**24.** Wê rojê dê zimanên wan, destên wan û piyên wan ji ber a ku kirine, li ser wan şahdeyî bidin.

**25.** Wê rojê Xwedê dê cezayê wan bêkêmasî bide wan û ew ê bizanin ku Xweda Heq bi xwe ye.

**26.** Jinên xerab ji bo mêrên xerab in, zilamên xerab jî ji bo jinên xerab in û jinên baş ji bo mêrên baş in, mêrên baş jî ji bo jinên baş in. Ha ev (ên dawîn) ji wê bêbextiya ku (der barê wan de) dibêjin, dûr û pak in. Ji bo wan lêborînek û rizqekî birûmet heye.

**27.** Gelî bawermendan! Ji bilî mala xwe, heta ku hûn destûrê nexwazin û li ser xelkê wê silavê nedin, neçin tu malê. Ev ji we re (ji çûna bêdestûrxwestinê) çêtir e, da ku hûn bifikirin û têbigihîjin.

**28.** Eger we li wê (malê) tu kes nedît (ku destûrê bide we), heyanî ji we re destûr neyê dayîn neçin wir. Eger ji we re bê gotin: „Vegerin!“ di cih de vegerin. Lewra

1 Dema diya mu'minan Aîşe (r.a.) bi îftirayeke giran rûbirû bû, yek ji wan mufteriyan jî Musteh bû ku Ebubekir ew kiribû bin himayeta xwe û dabara wî jî dabû ser xwe. Piştî Ebubekir ev iftîra bihîst sond xwar ku ew bes arîkariya wî bike. Vêca ayet nazil bû ku ji vir û pê de li ser nedayînê sond nexun, arîkariya xwe nebirin û li wan bibûrin. Her çiqas sebebê nuzûla vê ayetê xas be jî, lê murad jê gelempirî ye. Yanî xitab ji tevekê mu'minan re ye. Bawermend tev ji mefhûmê ayetê berpirsyar in.

ev (vegerîn) ji bo we (ji rûniştina li ber derî) paktir e. Xwedê bi ya ku hûn dikin dizane.[1]

**29.** Li ser we tu guneh tune ye ku (bêdestûr) hûn biçine xaniyên ku malbat tê de namînin, ew ên ku ji bo we cihê feydewergirtinê ne (mîna xan, xwaringeh û dezgehên giştî). Xwedê bi ya ku hûn aşkera dikin û bi ya ku hûn vedişêrin, dizane.

**30.** Ji zilamên bawermend re bibêje: bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin, ewretên (şermegeha) xwe biparêzin. Lewra ev (çavgirtin û namûsparêzî) ji bo wan çêtir e. Bêguman Xwedê ji ya ku ew dikin agahdar e.

**31.** Ji jinên bawermend re jî bibêje: Bila çavên xwe (ji nêrîna heram) bigirin, îffet û şermegeha xwe biparêzin, ji beşa ku xuya dike pê ve -ew ne tê de ye- bila xeml û zîneta xwe dernexin der. Bila çarikên xwe berdin ser sîngên xwe. Bila xişrên xwe ji bilî mêrên xwe, bavên xwe, xezûrên xwe, kurên xwe, kurên mêrên xwe, birayên xwe, biraziyên xwe, xwarziyên xwe, jinên digel xwe, qerwaşên xwe yên ku di bin destên wan de ne, ji mêran jî ew xîzmetkarên ku tu pêdiviya wan bi jinan nemaye yan jî ew zarokên ku hêj negihane ku dilê wan biçe deverên veşartî yên jinan, nîşanî tu kesî din nedin. Bila (bi tepînî) lingên xwe li erdê nedin ku êdî xişrên wan ên veşartî bêne zanîn. Gelî bawermendan! Tev bi bal Xwedê ve tobe bikin da ku hûn (hem li dinyayê hem jî li axretê) serfiraz bibin.

**32.** (Gelî mumînan!) Ezeb (û jinebiy)ên xwe bizewicînin û kole û qerwaşên xwe yên ehil jî bizewicînin. Eger ew xizan bin, Xwedê ji kerema xwe (bi zewacê) dê wan dewlemend bike. Xwedê xwedanê keremeke berfireh e û zanayê bi kiryarên îbadên xwe ye.

**33.** Ew kesên ku derfeta zewacê nabînin bila namûsa xwe biparêzin (bila xwe bidin zehmetê û bila xwe ragirin), heyanî ku Xwedê ji qenciya xwe wan dewlemend bike (êdî ku karîn bizewicin bila ew jî bizewicin). Ew (kole û qerwaş)ên we yên ku dixwazin bi we re tifaqekê çêkin da ku azad bibin, vêca eger hûn ji wan emîn bin ku ew ê vê tifaqê pêk bînin bi wan re (li ser hinek mal) tifaqa mukatebê deynin û ji wî malê ku Xwedê daye we hinekî bidin wan. Ji bo ku hûn hinek ji malê dinyayê bi dest bixin qerwaşên we yên ku dixwazin paqij û binamûs bimînin bi kotekî berê wan nedine zinayê. Kî kotekiyê li wan bike, vêca bêguman piştî zordestiya we li ser wan, Xwedê (ji bo wan) gunehjêbir e, dilovîn e.

**34.** (Gelî bawermendan!) Sond be ku me ayetên aşkeraker (ên ku pêdiviya we bi

1 Ev ayeta pîroz, rêz û toreyeke bêhnpakî û qaîdeyekî pir giring a şarezayiyê hînî mirovatiyê dike. Mirovek gava biçe mala yekî, divê pêşî destûrê bixwaze, piştî ku jê re destûr hate dayîn, silava îslamê li xelkê malê bike. Li gorî ku hatiye rîwayetkirin, zilamekî ji Peyxamberê Xwedê (s) re got: “ Ma ez destûra çûna malê ji diya xwe jî bixwazim? Got: Belê. Zilamî got: Ji min pê ve tu xizmetkarê wê tun in, vêca ma çi gava ez herim malê dîsa ez destûrê jê bixwazim? Pêcxember got: Ma tu hez dikî ku dayîka xwe tazî bibînî? Got: Na. Got: Naxwe jê destûrê bixwaze.” Ev şîreta ku Peyxamber (s) li wî zilamî kirî jî, girîngî û pêdiviya vê qaîdeyê nîşan dide û dide zanîn ku îslamê çi qasî şeref û rûmet daye însên, rêz û hurmeta wî girtiye, mafê wî parastiye. Lewra Îslam medeniyet bi xwe ye.

wan hebûye) û qiseyên (serpêhatiyên) wan kesên ku beriya we bûrîne ji we re anîne ku ew ji bo teqwedaran pend û şîret in.

**35.** Xwedê ronîkerê erd û asîmanan e. Mînaka ronahiya Wî, wekî kulekekê ye ku tê de çirayek hebe. Ew çira jî di nav şûşeyekê de be, ew şûşe jî her wekî stêreke ronak be ku (ronahiya wê) ji dareke pîroz be ku dara zeytûnê ye, ne li rojhilat e ne jî li rojava ye, çendî ku agir negihîjê jî hindik dimîne ku zeyta wê ronahî bide. (Ev ronahî) nûra li ser nûrê ye. Xwedê kî ku nûra wî bivê wî bi bal ve rasterê dike û Xwedê ji bo mirovan derb û meselan tîne (da ku têbigihîjin, jê ders wergirin û bawerî bînin). Xwedê bi her tiştî dizane.

**36.** (Ev ronahî) di hin mal (û mizgeftên) wisa de ye ku Xweda ferman daye da ew (mal) bêne bilindkirin û navê Xwedê di wan de were gotin û di wan de sibeh û êvaran (pênc wext) ji bo Xwedê nimêj bê kirin.

**37.** Hin merivên wisa (di wan de hene) ku ne bazirganî ne jî danûstandin nikare ji bîranîna (navê) Xwedê, ji kirina nimêjê û dana zekatê wan mijûl bike. Ew ji rojeke wisa ditirsin ku tê de dil û çav serûbinî hev dibin.

**38.** Da Xwedê, ji ya ku kirine xelata herî spehî bide wan û ji kerem û qenciya xwe ji wan re hê zêdetir bike. Xwedê kê bivê bêhesab û bêhejmar riziq didê.

**39.** Ew ên ku kafir bûne keda (kirinên) wan, li deşteke tenha wekî leylanekê ye ku ji kesê tî we ye ku ew av e, paşê dema ku bigihîje wê li wir tiştekî nabîne, veca ew li wê derê leqayî Xwedayê xwe dibe, êdî hesabê wî dibîne. Hesabdîtina Xwedê bi lez e.

**40.** Yan jî (keda karê kafiran) wekî tarîtiyên di behreke kûr de ye (deryayeke wisa) ku pêl li ser pêlê bilind bibe, li ser van pêlan pêleke din bilind bibe û di ser wê re jî ewrekî (reş û tarî) hebe. Ev tarîstan in, tarîstanê li ser tarîstanê ne. (Tarîstaneke wisa) eger ku mirov destê xwe derîne nikare destê xwe bibîne. Ew kesê ku Xwedê ronahiyek nedabe wî, vêca jê re tu ronahiyeke (din) tune ye.[1]

**41.** Ma tu nizanî ku yên li erd û asîmanan hene û teyrên li hewayê basikvekirî, (ev tev) Xwedê pak didêrin? Her yek ji wan nimêj û tesbîhê xwe dizanin. Xwedê bi ya ku ew dikin dizane.

**42.** Xwedanî û hukimraniya erd û asîmanan her ji Xwedê re ye û veger jî her bi bal Xweda ve ye.

**43.** Ma tu nizanî ku Xwedê (ku derê bivê) ewran diajo ser wir. Paşê wan tîne bal hev, piştre wan li ser hev dike şikêr, vêca tu dibînî ku ji nava wan (ewran) baran dibare. Xwedê ji ewrên mîna çiyan teyrokê dibarîne. Îcar Xwedê kê bivê bi teyrokê lê dixe, kê jî bivê wê ji (ser) wî vedigerîne. Hindik dimîne ku roniya birûskan çavan kor bike!

---

1 Hin zanistên ilmê tebî'tê ku ne misliman in ev ayet ji mislimanan bihîstin, ji wan pirs kirin: Gelo Muhemmed di deryayê de geriyaye? Gotin: Na! Vêca wî zanistî şahdeyî xwe anî û got: Ez bawer dikim ku Muhemmed Peyxamberê Xwedê ye. Jê re gotin: Tu, çawa dizanî ku ew peyxamber e? Got: Ez ji vê dizanim. Lewra ev wesfê deryayê bes ew mirovê ku temenê xwe di deryayê de derbas kiribe, tê de jiyabe û zehmetî û xeterên wê dîtibe dikare vê bizane. Dema we got: "Muhemmed, siwarî deryayê nebûye û lê negeriyaye" min zanî ku ew ayet ne gotina wî ye; gotina Xweda e.

44. Xwedê, şevê û rojê li hev werdigerîne, bêguman di vê de ji aqilmendan re îbretek heye.

45. Xwedê her rêveherek ji avê afirandiye. Ji wan hinek li ser zikê xwe dimeşin, hinek jî li ser du lingan, hinek jî li ser çar lingan dimeşin. Xwedê ya ku bivê diafirîne, bêguman Xwedê li ser her tiştî qadir e.

46. Sond be ku me ayetên aşkeraker hinartine. Xweda yê ku hîdayetê bivê wî li serê rasterê dike.

47. Dibêjin: Me bawerî bi Xwedê û bi Pêxemberê wî anî û me bi gotina (wan) kir. Piştî wê (iqrar kirinê) desteyekê ji wan berê xwe (ji heqiyê) vedigerînin. Ha ew ne bawermend in.

48. (Ew) Dema bang li wan were kirin da ku bêne cem Xwedê û Pêxemberê wî ji bo ku di navbera wan de hukim bike, tu dinêrî ku desteyek ji wan berê xwe jê vedigerînin.

49. Lê belê eger ew (hukimdayîna Pêxember) heq bide wan, ew ji dil û can tên ber (hukmê) wî û bi gotina wî dikin.

50. Erê ma di dilê wan de nexweşî (ya nîfaqê) heye, yan jî (der barê pêxemberiya Muhemmed de) ketine gumanê? Yan jî ew ditirsin ku Xwedê û Pêxemberê wî neheqiyê li wan bikin? Nexêr, ne wisan e, belkî ew bi xwe zalim in!

51. Dema ku bawermend bi bal hukmê Xwedê û Pêxemberê wî ve bêne vexwendin da ku (Pêxember) di nav wan de hukim bike, gotina wan bes ev e: Me (fermana te) seh kir û me qebûl kir. Vêca ha ev, ên ku di daxwaza xwe de serfiraz bûne.

52. Heçî kesê ku bi gotina Xwedê û Pêxemberê wî bike, ji (ezabê) Xwedê bitirse û xwe ji (heramiyan) biparêze, ha ew, ên (ku bi dana Xwedê) serfiraz bûne.

53. Wan munafiqan bi sonda herî asê sond xwar; ku eger te ferman (a derketina cîhadê) li wan bikira muheqeq dê ew derketina (cîhadê). Bibêje: Sond nexwin, îtaet aşîkar e! Bêguman Xwedê ji ya ku hûn dikin agahdar e.

54. (Ji wan re) Bibêje: Bi gotina Xwedê û qasidê wî bikin. Eger wan guhdarî nekir, vêca bizanin ku ew ji wezîfeya ku li ser hatiye barkirin berpirs e (vêca wî ew bi cîh anî) û hûn jî ji wezîfeya ku li ser we hatiye barkirin berpirs in. Eger hûn bi gotina wî bikin, hûn ê rasterê bibin. Wezîfeya Pêxember, bi rewşekî ronkar û eşkere bes teblîxa fermana Xwedê ye.

55. Xwedê ji nav we peyman daye wan kesên ku bawerî anîn û karên qenc kirine; ku teqez dê wan li şûna hinekên din li erdê bike şûngir, ka çawa ew ên beriya wan jî li şûna hinekên din kiribûn şûngir. Ew ê dînê wan (îslamê) desthilat bike, ew dînê ku Xwedê ji bo wan hilbijartiye û pê razî bûye. Ew ê rewşa wan piştî tirsa wan bi ewlehî û tenahiyê biguherîne. Ewê îbadetê min bikin û dê tiştekî ji min re nekin hevpişk. Êdî piştî vê kî nankorîyê bike vêca ha ew fasiq bi xwe ne.[1]

1 Ev ayeta pîroz di çaxekî wilo de daketiye ku peyxamber, ji nû dest bi teblîxê kiribû, misliman hê lawaz bûn, zulm û zor li wan dihat kirin, ev ayet mizgîn dida wan ku misliman piştî demeke nêz dê zora muşrikan bibin û desthilatî, dê bikeve destê wan û dînê wan dê belav bibe, bi ser bikeve.

**56.** Bi awayê pêdivî nimêj bikin, zekata malê xwe bidin û bi gotina qasid bikin da ku rehmet li we bê kirin.

**57.** Tu hizir neke ku ew ên kafir bûne wan zora Xwedê biriye ku li ser erdê nehatine ezabdan! Cihê wan agir e, ew çi pîsecih e û çi pîs wargeh e!

**58.** Gelî bawermendan! Bila ew ên ku di bin destên we de (kole û cariyeyên we) û ew ên ku ji we hê balix nebûne di sê deman de ji we destûrê bixwazin (ji bo ku werin cem we); beriya nimêja spêdeyê (fecrê), dema nîvro wexta ku hûn cilên xwe datînin û piştî nimêja eşayê. Ji we re ew sê demên bi tenêmayînê ne. Piştî van sê deman ne ji we re ne jî ji wan re tu guneh tune ye (ku bêdestûr hûn bêne cem hev). Hin ji we li ser hinan digerin; diçin û tên. Her wisa Xweda ji we re ayetan/hukman aşkera dike û Xwedê (di kar û barê xwe de) zana ye, karbinecih e.

**59.** Dema zarokên we balix bûn, bila ew jî (ji bo werin cem we) destûrê bixwazin, ka çawa yên berî wan destûr xwestine. Her wiha Xwedê ji we re ayetên xwe aşkera dike (ji bo ku hûn rêz û toreya xwe ji wan bigirin û li gorî wan tevbigerin). Xwedê (di kar û barê xwe de) zana ye, karbinecih e.

**60.** Ew jinên ketî ku ji zewacê hêvî birîne, ji wan re tu gunehek tune ye ku ew cilên ji ser xwe deynin, bêyî ku xişrên xwe nîşan bidin. Dîsa jî eger ew xwe binixumînin ji wan re hê çêtir e. Xwedê bihîzer e, zana ye.[1]

**61.** Li ser ê kor, li ser ê kulek û li ser ê nexweş guneh nîn e (ku ji cîhadê bi paş de bimînin, lewra kiryarên ku ew nikaribin bikin li wan nayêne barkirin). Ji we bi xwe re jî guneh tune ye ku hûn ji malê (zarokên) xwe, yan ji malê bavên xwe, yan ji malê dayîkên xwe, yan ji malê birayên xwe, yan ji malê xwehên xwe, yan ji malê apên xwe, yan ji malê metên xwe, yan ji malê xalên xwe, yan ji malê xaletên xwe, yan ji cihên ku kilîtên wan di destê we de ne (yanî spareyên ku bêheqdest hûn li wan dinêrin) yan jî ji malê dostên xwe bêdestûr bixwin. Ji we re guneh tune ye ku hûn tev bi hev re, yan jî ji hev cuda bixwin. Dema hûn herin malekê (ku tu kes li hundir tune be jî) bi wê silava ku li nik Xwedê pîroz û pak e, silavê li ser xwe bi xwe bidin. Her wiha Xwedê, ji we re ayetan eşkere dike da ku hûn (wan) fehm bikin (û li gorî wan tevbigerin).

**62.** Bêguman bawermendên rast û durist, ew ên ku ji dil û can bi Xwedê û Pêxemberê wî bawerî anîne. Ew dema digel Pêxember di karekî girîng ê civakî de bin, heta ku destûrê jê nexwazin ew naçin. Bêguman ew ên ku ji te destûrê dixwazin; ha ew in ên ku bi rastî bawerî bi Xweda û pêxemberê wî anîne. Nexwe; dema ku ew ji bo hin karên xwe destûrê ji te bixwazin, vêca ji wan ê ku

1 Şermegeha pîrekê li hember yên din li ser sê beşan e: 1. Li hember mêrê xwe; ji mêrê wê re durist e cihê ku bixwaze lêbinêre. 2. Li hember jin û mehremên wê, ciyê ku exleb xuya dibe ew dikarin lêbinêrin, mîna; rû, por, qirik, dest, ceng, ling û ... 3. Li hember zilamên din, ji bilî îhtiyacê, mîna ku ji bo ku pê re bizewicê yan jî ji bo dermankirinê û xeynî van.. ew nikarin li rûyê wê û li tu cihekî jinê binêrin. Çima? Lewra fitna pîrekê bi ruyê wê ye. Fatîmaya keçe Munzir (Xwedê jê razîbe) got: "Me ruyê xwe ji zilaman digirt." (El-Hakim) Diya muminan Aîşe (Xwedê jê razîbe) dibêje: "Siwar di ber me re derbas dibûn û em digel Pêxember di îhraman de bûn; dema mêr dihatin hemberî me, me cilbabê xwe davêt ser ruyê xwe û dema ji me derbas dibûn me ruyê xwe vedikir."(Ebu Dawûd)

tu bivê destûra çûnê bidê. ji Xwedê ji bo wan lêborîna gunehên wan bixwaze. Bêguman Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

**63.** (Gelî mumînan!) Hûn gazîkirina Pêxember ji bo xwe nekin mîna gazîkirina we ya di navbera xwe de. Bêguman Xwedê, ji nav we bi wan ên ku xwe vedidizin, di pişt hev de xwe diqelêzin (û bêdestûr) dertên, dizane. Vêca bila ew ên ku bi gotina wî nakin bitirsin ku belayek bi ser wan de bê, yan jî ezabekî cansoj îsabetî wan bike.[1]

**64.** Agahdar bin, bêguman çi tiştên li erd û asîmanan hene her ew ên Xwedê ne. Bêguman Xwedê ya ku hûn li serê ne û wê roja ku hûn ê tê de li Xweda bên vegerandin dizane. Vêca Xwedê ji ya ku kirin dê wan agahdar bike. Xwedê bi her tiştî zana ye.

## 25. SÛREYÊ FURQAN

Sûreyê Furqan 77 (heftê û heft) ayet e. Li Mekkê daketiye. Ji ber ku di ayeta yekem de bêjeya Furqan derbas bûye ku ew bi mehneya cudakera heqî û batilî ye û navek ji navên Qurana pîroz e, ji vî sûreyî re Furqan hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Ew ê ku Furqan ji evdê xwe re hinartiye da ku ji alemê re bibe hişyarker, pak û pîroz e.

**2.** Ew Xweda ye, yê ku hukimranî û desthilatiya erd û asîmanan her jê re ye, ew ê ku tu zarok ji xwe re negirtiye û ew ê ku di hukimranîya Wî de tu şirîk jê re tune ye, vêca her tişt bi pîvan û endaze afirandiye.

**3.** Muşrikan ji bilî Xwedê hin mabûd girtine ku ew nikarin tiştekî bixuliqînin û ew bi xwe hatine xuliqandin. Ew ne dikarin tu zerarê ji ser xwe bidin alî ne jî feydeyekê bidin xwe. Ew ne dikarin tu kesî bimirînin û ne jî sax bikin û ew nikarin tu kesî piştî mirinê dîsa vejînin.

**4.** Ew ên kafir bûne gotin: Ev (Quran) ji dereweke pê ve nîn e ku wî ew ji cem xwe ve lêaniye, der barê lêanîna wê de qewmekî din jî arikariya wî kiriye. Bi rastî jî wan kafiran (bi vê gotina xwe) zilm û derewkarî kirine…

**5.** Gotin: (Ev Quran) çîrok û çîvanokên pêşiyan e ku Muhemmed ew bi nivîsyarekî dane nivîsandin. Vêca ew sibeh û êvarê ji wî re têne xwendin.

**6.** Bibêje: Ew Xwedayê ku sir û raza erd û asîmanan dizane ev Quran (ji min re) şandiye. Bêguman ew gunehjêbir e, dilovîn e.

1 Ev ayeta pîroz; ji bo bawermendan dersek e, telîmek e ku wan hînî bersivdana Peyxamber dike, da ku musilman li biwara Pêxamber ne xemlês bin. Dema gazî wan kir lazim e herne huzura wî da ku li fermanên wî guhdarî bikin. Lewra Pêxember ji bo tiştê besît gazî wan nake; ew ji bo rewşeke girîng û fermaneke giştî gazî wan dike. Mimkune merev li hember hev xemlês be; lê belê li peşberî pêxember xemlêsî qet nabe.

7. Gotin: Ev çi pêxember e ku (ew jî wekî me) xwarinê dixwe û li sûkan digere! De bila firîşteyek ji bo wî bihata xwarê da ku pê re bibûya hişyarkerek (û ew rast bidêraya)?

8. Yan ji bo wî (ji esmên) gencîneyek hatibûya xwarê, yan jî jê re baxçeyek hebûya ku jê bixwara (da ku ferqeke wî ji me hebûya). Wan zaliman (ji bawermendan re) got: Bes we daye pey zilamekî sêrlêbûyî!

9. (Resûlê min!) De binêre ka çawa der barê te de derb û mesel anîne. Vêca ew ji rê ketine û êdî ew ê riyekê nebînin.

10. Pak û pîroz e, Ew ê ku eger ew bivê yên ku ji van hê çêtir ku ew bihişt in ku di binê wan de çem diherikin dê bide te û ew ê koşk û qesran jî bide te.

11. Naxêr! Belkî bi sedema ku wan bawerî bi roja qiyametê neanîbû û me jî ji bo wan ên ku bawerî bi qiyametê neaniye agirekî bipêt û har amade kiriye.

12. Dema ku cehenem ji mesafeyeke dûr ve wan dibîne, ew, guregur û fizîniya wê hê ji dûr ve dibihîzin.

13. Dema ku destên wan bi stûyê wan ve girêdayî di dojehê de li cihekî teng bêne werkirin, li wê derê mirina xwe dixwazin (da ku ji ezab xelas bibin).

14. (Ji wan re dê bê gotin:) Îro ne bes carekê; gelek caran mirina xwe bixwazin (lê xwestina we dê tu feydê nede we).

15. (Ji wan re) Bibêje: Erê ma ev (dojeh) çêtir e yan ew bihişta seraqetî ya ku teqwadar pê hatine sozdayîn ku ew ji bo wan her padaş û war e?

16. Di bihiştê de tiştê ku ew dixwazin ji wan re heye, ew li wir daîmî ne. Ev li ser Xwadayê te peymaneke misoger e ku mafdar jê dixwazin.

17. Wê rojê Xweda dê wan û wan mabûdên ku ji bilî Wî perestina wan dikirin, bîne cem hev û (ji mabûdan re dê) bibêje: Erê ma we ev bendeyên min ji rê xistin an ew bi xwe ji rê ketine?

18. Ew mabûd dibêjin: Em ji karê ku wan kirî Te pak didêrin. Ne hedê me ye ku ji bilî Te em dost û arîkaran ji xwe re bigirin, (vêca em ê çawa bibêjin bila xelk perestina me bikin). Lê belê Te ew qas nîmet li wan û bavên wan kirin heta ku wan Tu ji bîr kir û ew bûne qewmekî ku wan helak heq kir.

19. (Ji muşrikan re tê gotin:) Birastî ewên ku we perestina wan dikir, di gotina we de hûn derewîn derxistin. Vêca hûn ne dikarin ezab ji xwe vegerînin ne jî dikarin arîkariyekê ji xwe re bikin. Ji nav we kî zilmê (şirkê) bike em ê ezabekî mezin (û dijwar) bi wî bidin çêjandin!

20. (Ya Muhemmed!) Me beriya te her çiqas pêxemberek şandibe, her wan xwarin dixwar û li sûkan dimeşiyan. Me hin ji we ji hinan re kirine îmtîhan û ceribandin, ka hûn ê xwe ragirin (yan na). Xwedayê te her bîner e.

21. Ewên ku hêviya hatina ber destê me nakin, gotin: De bila firîşte ji bo me hatibûna xwarê yan jî de bila me aşkera Xwedayê xwe bidîtaya. Sond be, wan di nefsa xwe de xwe mezin dêra û bi pozbilindiyeke mezin ji hedê xwe derketin.

22. Roja ku (muşrik) firîşteyan dibînin, wê rojê ji gunehkaran re tu mizgîniya xêrê tune ye û firîşte ji wan re dibêjin: (Bihişt û dilşadî ji bo we) heram e û heramkirî ye!

23. Em kar û kiryarên ku wan kirin tînin û em mîna tozê wê li ber ba dixin.[1]

24. Wê rojê ehlê bihiştê di çêtirîn cihan de û di baştirîn îstîrahetgehan de ne.

25. Wê rojê asîman digel ewrên spî şeq dibe û firîşte bi hatineke bêjimar têne xwarê.

26. Ha wê rojê hukimraniya serdest a rasteqîne ji Xwedayê Rehman re ye. Ew ji bo kafiran rojeke dijwar e.

27. Wê rojê yê zalim dê herdu destên xwe gez bike û wê bibêje: Xwezîka min ligel Pêxember ji xwe re riyek bigirta!

28. (Dibêje:) Wax li halê min be! Xwezî min filankes ji xwe re nekira dost!

29. Sond be, piştî ku Quran ji me re hat wî ez xirandim û jê dame paş. Şeytan ji bo însanan her rezîlker e.

30. Pêxember got: Xwedayê min! Gelê min Quran terk kir û pê emel nekirin.

31. Her wisa em ji her pêxemberekî re ji gunehkaran dijminekî peyda dikin, Xwedayê te ji hêla rêberî û arîkarî ve besî te ye.

32. Ewên kafir bûne gotin: De bila Quran bi yek carê, bi neqlekê jê re bihata hinartin. Me wisa ew hinart da ku em dilê te pê mikûm bikin û me ew li dû hev, jiheveqetandî da xwendin.

33. (Ya Muhemmed!) Ew çiqas meseleyekê li hemberê te bînin (da ku doza te pûç bikin), em her a rastirîn û tefsîreke spehîtir ji te re tînin.

34. Ew ên ku li ser rûyên xwe ber bi dojehê ve têne ajotin, ha ew pîstirîn xwedancih in û şaştirîn xwedanrêk in.

35. Sond be, me kitêb daye Mûsa û me birayê wî Harûn jî ji bo wî kire wezîr û arîkar.

36. Me ji wan re got: Herin bal wî qewmê ku bi ayetên me bawerî neanîn, vêca (piştî ku ew çûn û wan bawerî neanî) me ew ji binî ve qir kirin.

37. Qewmê Nûh, çi dema ku wan bawerî bi pêxemberan neanî, me ew jî bi Tofanê xeniqandin û me ew ji bo mirovan kirin îbret. Me ji bo zaliman (li axretê) ezabekî cansoj amade kiriye.

38. Me Ad, Semûd, xelkê Ressê û gelek miletên ku di navbera van de jî...

39. Me ji her yekî ji wan re ayet û delîl anîn, (lê belê ji ber ku wan bawerî neanî) me tevek birin helakê.

40. Sond be, ew (muşrik) di ber wî welatê ku barana karesat û belaya pîs lê bariyaye

1 Ev ayeta pîroz dide zanîn ku dema merevê kafir kar û barekî baş bike, mîna ku mêvanan xwedî bike, arîkariya xwedî û dostan bike, seriya li eqreba bide, sedeqa bide û di hewara bindest û jaran here, ji bo ku bawerî neanîye tu feydê jê nabîne. Lewra; ya ku ew dike ne ji bo Xwedê ye; yan ji cibilîyeta wî ye yan jî jibo merameke din kirirne. Merevê musilman jî dema ne jibo Xwedê bike Xwedê jê qebul nake.

derbas bûne. Erê ma wan ew nedidît (ku jê îbret bigirin). Na, belkî ew bi saxbûna piştî mirinê bawerî nayînin.[1]

**41.** (Ya Muhemmed!) Dema ku ew te dibînin ew her henekên xwe bi te dikin (û dibêjin:) Ma ew ê ku Xwedê bi pêxemberî (ji me re) şandiye ev e?

**42.** (Ew ji hev re dibêjin:) Eger me li ser hebandina mabûdên xwe sebat nekira, hindik dima ku wî em ji riya îlahên me bixiranda. Paşê dema ew ezab bibînin, ew dê bizanin ka kî rêşaştir e!

**43.** (Ya Muhemmed!) Erê ma te ew kesê ku hewesa xwe ji xwe re kiriye îlah nedîtiye, erê ma vêca tu yê bibî kefîlê wî?

**44.** Yan jî, ma ji te we ye ku pirên wan seh dikin an jî fehm dikin? Ew bes mîna dewaran in, belkî ji dewaran jî rêşaştir in.

**45.** Ma tu nanêrî ku Xwedayê te çawa sî dirêj kiriye? Eger bixwesta teqez dê ew nelebitanda. Piştre me roj jî li ser hebûna wê kire nişan.

**46.** Paşê me ew sî hêdî hêdî bi bal xwe ve kişand.

**47.** (Gelî mirovan!) Xwedê ye, yê ku şev ji we re kiriye stargeh û xew jî kiriye tenahî û ro jî kiriye vejîn ji bo kar û xebatê.

**48.** Xwedê ye, yê ku berî rehmeta xwe bibarîne bi mizgîndêrî bayê dişîne û Me ji esmên baraneke paqijker barand.

**49.** Da ku em welatekî hişkemirî pê vejînin û hinek ji wan heywanên ku me ew afirandine û gelek însanan jî pê av bidin.

**50.** Sond be, me ew baran di nav welatan de belav kir da ku Xwedayê xwe di bîr bînin. Vêca pirên mirovan li ber wê asê bûn û wan her nankorî kir.

**51.** Eger me bixwesta helbet me dê ji her bajarekî re (pêxemberekî) hişyarker bişanda, (lê belê ji bo hişyarkeriyê me tu bijart).

**52.** Vêca bi gotina kafiran meke û bi Quranê li hemberî wan cîhadeke mezin bike!

**53.** Xwedê ye, yê ku du derya di kêleka hev de, wan ji wan re berdide. Ev a ha şêrînek e ku tîbûnê radike û ev a ha jî şorek e ku tîbûnê zêde dike. Di navbera wan de navbirek heye ku ew tevîhev nabin.

**54.** Xwedê ye, yê ku ji avê însan xuliqandiye û ew kiriye xwedanneseb û xwedanxizmî. Teqez Xwedayê te qadirê her tiştî ye.

**55.** Ew (kafir) ji bilî Xwedê perestina hin tiştên wisa dikin ku ew ne dikarin feydê bidin wan ne jî dikarin zerarê bidin wan. Mirovê kafir li hemberî Xwedayê xwe her (ji pelîd re piştek û) arîkar e.

**56.** (Ya Muhemmed!) Me tu bes bi mizgînberî û hişyarkerî şandiye.

**57.** (Ji wan re) Bibêje: Ez, beranberî vê (teblîxa xwe) tu heqekê ji we naxwazim. Lê

1 Ew welat ku ev felaket hate serê wan "Sedom" bû ku ew welatê gelê Lût peyxamber e. Xwedê, bi sedem 'emelê wan ê kirêt baran û kevir bi ser wan de barand û ew hilak kirin. Muşrikên Qureyşî jî gava ji bo bazirganiyê diçûne sefera Şamê di wî welatî re derbas dibûn, encama xirab a ku hatiye serê inkarkeran bi çavê serê xwe dîtine û dîsa jî îbret negirtine û nehatine îmanê.

belê ew kesê ku bivê bi bal Xwedayê xwe ve riyekê bigire (û di riya wî de ji bo rizaya wî malê xwe bide) ew cuda ye.

**58.** Tu xwe bispêre yê ku her sax ê ku hîç namire. Digel pesindayînê Wî ji her kêmasiyê pak bidêre. Xwedê, bi gunehên bendeyên xwe ji agahdarî ve bes e.

**59.** Xwedê ye, yê ku erd û asîman û yên ku di navbera wan de hene di şeş rojan de afirandine. Paşê Xwedayê rehman li ser Erşê xwe raser bû (raserbûneke babetî xwe); vêca tu pirsê ji yekî zana bike (ku ew jî Xweda ye).

**60.** Dema ji wan re bê gotin: Ji Xwedayê rehman re herin sicûdê, dibêjin: Ma Xwedayê rehman çi ye? Em ê çawa ji bo yê ku tu fermana me bi sicûda jê re dikî herin sicûdê! Ev gaziya we nefreta wan zêde dike.

**61.** Ew ê ku li esmanan rêgeh çêkirin û tê de roj û heyveke ronak danîn, pîroz û xwedankerem e.

**62.** Yê ku şev û roj ji hev re kirine şûngir Xwedê ye, ji bo wan kesên ku bixwaze (kerem û qenciya Xweda) bîne bîra xwe, yan jî bixwaze şêkiriya wî bike.

**63.** Bendeyên rehmanî, ew ên ku li ser erdê bi nefsbiçûkî bi rê ve diçin û dema ku mirovên nezan ji wan re peyvên ne li rê dibêjin (ew ji wan re dibêjin) Silav li we be (û ji wan derbas dibin)

**64.** Ewên ku ji Xwedayê xwe re şevê li piyan in û secde dibin…

**65.** Ewên ku dibêjin: Xwedayê me! Ezabê dojehê ji ser me bide alî. Bêguman ezabê wê lazim û daîmî ye.

**66.** Bêguman ew der çi pîsecih û çi pîs wargeh e!

**67.** Ewên ku dema xerc dikin, destbelavî û destengiyê nakin û di nava herduyan de riyeke navîn digirin.

**68.** Ewên ku digel Xwedê îbadetê mebûdekî din nakin û bi neheqî ew canê ku Xwedê (kuştina) wî heram kiriye nakujin û zinayê nakin. Kî ku van bike dê (li axretê) rûbirûyî ceza bibe.

**69.** Roja qiyametê ezabê wî dê qat bi qat zêde bibe û bi şerpezeyî her û her dê tê de bimîne.

**70.** Ji bilî wî kesê ku tobe bike, bawerî bîne û karekî qenc bike, vêca ha ew, Xwedê gunehên wan bi xêran tebdîl dike. Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

**71.** Çi kesê ku ji gunehan tobe bike û kar û kiryarên qenc bike, bêguman ew ê bi tobeyeke meqbûl li Xwedê vegere.

**72.** Ew ên ku şahdezoriyê nadin û dema di ber kirêtî û kelevajiyê re derbas dibin, bi ciwanmêrî têkil nabin.

**73.** Ew ên ku dema bi ayetên Xwedayê xwe têne pend û şîretkirin, ew mîna ker û koran jê xafil namînin.

**74.** Ew ên ku dibêjin, Xwedayê me! Ji jin û zarokên me tiştê ku çavê me pê ronahî bibe bide me û me ji teqwadaran re bike pêşeng û rêber!

**75.** Ha ew (bendeyên rehmanî), bi sebunet sebra ku kêşane dê bi bihişta herî bilind bêne xelatkirin û dê bi bixêrhatin û silava (firîşteyan) bêne pêşwazîkirin.

**76.** Ew tê de seraqetî û ebedî ne, ew xweş niştecih û rindlêmayîn e!

**77.** Bibêje: Eger ne ji dua û îbadetê we be, Xwedayê min dê çi ji we bike?! Vêca we bawerî neanî, îcar ezab dê li ser we misoger bibe.[1]

## 26. SÛREYÊ ŞU'ERA

Sûreyê Şu'era, 227 (du sed û bîst û heft) ayet e. Ji çar ayetên dawiyê pê ve tev li Mekkê daketine. Şu'era pirjimariya bêjeya 'şair' e ku bi maneya helbestvan e. Ji ber ku sûre di ayeta 224'em de behsa şairan kiriye jê re Şû'era hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Ta. Sîn. Mîm.

**2.** Ev ayetên kitêba ronker in.

**3.** (Ya Muhemmed!) Hay ji xwe hebe; ma tu yê xwe bikujê ji ber endîşeya ku ew bawerî nayînin?

**4.** Eger em bixwazin em ê ji esmên ji bo wan mucîzeyekê bînin, vêca ew ê jê re stûxwar bibin.

**5.** Her çiqas ayeteke nû ji cem Xwedayê rehman ji wan re were, her ew berê xwe jê vedigerînin.

**6.** Vêca wan pê bawerî neanî, êdî xebera wî ezabê ku wan pê tinaz dikir, di nêzîk de dê ji wan re bê.

**7.** Ma ew li erdê nameyzînin ku ji her rengên xweşik û rind me ew hêşîn kiriye?

**8.** Bêguman di vê de îbretek heye, lê pirên wan bawerî nayînin.

**9.** Bêguman Xwedayê te her ew e yê desthilat ê dilovîn.

**10.** Wê dema Xwedayê te gazî Mûsa kir (û jê re got): Bi pêxemberî here cem qewmê sitemkar…

**11.** Ku ew qewmê Firewn e; ka ew xwe naparêzin (û îman nayînin)?!

**12.** Mûsa got: Xwedayê min! Ez ditirsim ku ew bawerî bi min neyinin...

---

1 Xwedê Teala ji ayeta 63ê heyanî ayeta 77ê behsa salixê "îbad'ur-Raḥman" kiriye.

Îbad'ur-Reḥman: Li gorî ehlê teḥqîqê, ibadetkerê Xwedayê Reḥman in, yanî ew ê ku ji Xwedê re ibadet dikin. Lewra Îbad: gelejimara "âbid"i ye bi wateya îbadetker e.

Tişta em ji van 15 ayetan fehm dikin ev e: Pêşî, Xwedê îbad nisbetî bal xwe ve kirine da ku em bizanin; ibadetkirina ji Xwedê re, ji bo beniyan ne kêmasî ye belkî şeref e. Paşê, em bizanin ku ev Qur'an kelamê Xwedê ye, bi pîvan û endaz e. Piştê vê em dibîn ku salixên ibadên Xwedê bibal çar beşan ve hatiye beşkirin.

1. Salixên wan ê di kesayeta wan de ye. 2. Salixên wan ê digel civaka wan e. 3. Salixên wan ê digel Xwedayê wan e. 4. Salixên wan ê ku bi sedem civaka xwe digihijne lutkeya paqijî û medeniyetê.

13. Dilê min jî teng bibe û zimanê min negere, vêca (wehyê) bi bal Harûn ve bişîne.
14. Hem jî sûcekî ku ew dixin stûyê min heye, vêca ez ditirsim ku ew min bikujin.
15. Xwedê got: Nexêr, hûn herdu tevî ayetên me herin. Bêguman em digel we ne (û em li ser we) guhdêr in.
16. Hûn herdu herin cem Firewn û (jê re) bêjin: Birastî em qasidên Perwerdegarê alemê ne.
17. (Em hatin ku) tu zarokên îsraîl digel me bişînî (û wan bes bidî ezabdan).
18. (Firewn) Got: Erê ma me tu li cem xwe bi zarokîtî xwedî nekiri û ma di nav me de tu bi salan nemabûyî?
19. Paşê te ew kiryar jî kir ya te kirî û tu merivekî nankor î.
20. Mûsa (jê re) got: Wê çaxa ku min ew kir ez nezan bûm (min ne bi hemdê xwe kir).
21. Vêca ji ber ku ez ji we tirsiyam, ez ji ber we revîm. Piştre Xwedayê min pêxemberî da min û ez kirim ji pêxemberan.
22. Ew a ku tu mineta wê li min dikî ma ew qencî ya ku te zarokên îsraîl tev ji xwe re kirine kole û xizmetkar!
23. Firewn got: Xwedayê alemê kî ye?
24. Mûsa got: Ew Xwedayê erd û asîmanan û Xwedayê yên di navbera wan de ye, eger ku bi rastî yeqîniya we pê hebe.
25. Firewn, ji giregirên hawirdora xwe re got: Erê ma we dengê (Musa) seh nekir?
26. Mûsa got: (Rebul alemîn) Hem Xwedayê we ye hem jî Xwedayê bav û bapîrên we yên pêşîn e.
27. Firewn got: Qasidê ku ji we re hatiye şandin muheqeq dîn e!
28. Mûsa got: Eger hûn aqlê xwe bişuxilînin (hûn ê fehm bikin ku) Ew Xwedayê rojhilat û rojava ye û Xwedayê yê di navbera wan de ye.
29. Firewn got: Eger ji bilî min tu ji xwe re xwedayekî din bigirî, sond be ku ez ê te bixim zîndanê !
30. Mûsa got: Ma ku min tiştekî aşkera ji te re anîbe jî?
31. Firewn got: Eger bi rastî tu rastgo yî, de haydê wî bîne!
32. Vêca Mûsa gopalê xwe avêt û dît ku ew bû marekî aşîkar!
33. Destê xwe (ji paxila xwe) deranî, ew jî ji bo temaşekaran bû ronahiyeke spî.
34. Firewn, ji giregirên hawirdora xwe re got: Bêguman ev sêrbazekî zana ye!
35. Ew bi sêrbaziya xwe dixwaze we ji cih û warê we bike der. (Gelî giregiran!) Vêca hûn ê çi fermanê bidin?
36. Giregiran jê re gotin: Cezayê wî û birayê wî bide paş, wezîfedaran bişîne bajaran, bila sêrbazan bicivînin...
37. Bila her sêrbazên zana ji te re bînin.
38. Vêca sêrbaz di rojeke wextkifşkirî de hatin civandin.

**39.** Ji xelkê re jî hat gotin: De hûn jî kom bibin!

**40.** Gotin: Em di wê hêviyê de ne ku sêrbaz bi ser bikevin û em jî li pey wan biçin.

**41.** Vêca çi dema sêrbaz hatin ji Firewn re gotin: Eger em bi ser bikevin ma ji bo me xelatek heye?

**42.** Firewn ji wan re got: Belê, teqez hûn dê bibin ji yên nêzîkî min.

**43.** Mûsa ji wan re got: Tiştê ku hûn ê biavêjin, de haydê biavêjin!

**44.** Vêca sêrbazan werîs û gopalên xwe avêtin û gotin: Bi qeweta Firewn her em in yên serkeftî.

**45.** Vêca Mûsa jî gopalê xwe avêt, dîtin (ew bû marekî mezin û) sêra ku wan lêanî, dadibelîne!

**46.** Sêrbazan (piştî ku heqî dîtin) xwe avêtin erdê û çûne sicûdê.

**47.** Gotin: Me bawerî bi Xwedayê alemê anî…

**48.** Xwedayê Mûsa û Harûn.

**49.** Firewn got: Beriya ez destûrê bidim we, we çawa bawerî bi Mûsa anî! Bêguman her ew e mezinê we yê ku sêr fêrî we kiriye! Vêca hûn ê bizanin (ka ez ê çi bînim serê we). Sond be, ez ê dest û piyên we çep û rast jêkim û ez ê we tevan daleqînim.

**50.** Sêrbazan got: Ne xema me ye; em ê muheqqeq li Xwedayê xwe vegerin!

**51.** Em hêvî dikin ku Xwedayê me li gunehên me bibore, lewra me beriya her kesî bawerî anî.

**52.** Me wehî da Mûsa ku bendeyên min bi şev (ji Misrê) derîne, muheqqeq hûnê bene taqîbkirin (beriya hun bigihijin behrê bila negihijin we).

**53.** Vêca Firewn wezîfedar şandin bajaran da ku leşkeran bidin hev.

**54.** (Ji wan re got:) Bêguman ev civateke hindik û kêmhêz in.

**55.** Birastî jî wan bi kar û kiryarên xwe em hêrs kirine.

**56.** Em jî birastî civateke (yekwicûd û) hişyar in.

**57.** Vêca Me jî ew (Firewn û civata wî) ji nava baxçe û kaniyan deranîn…

**58.** Ji nava xezîne û (dîwan û) meqamên şerefnak jî.

**59.** Ha bi vî awayî (me ew deranîn û) Me zarokên îsraîl kirin mîratgirên wan.

**60.** (Firewn û civata xwe) di danê sibehê de ketin pey şopa wan.

**61.** Dema herdu destekan hev dîtin, hevalên Mûsa gotin: Hey wax em hatin girtin!

**62.** Mûsa got: Nexêr, bêguman Xwedayê min digel min e, dê rê nîşanî min bide.

**63.** Beranberî vê me peyam da Mûsa, me jê re got: Gopalê xwe li behrê bixe! (Çi dema gopalê xwe lê da) di cih de bû du şeq her şeqekî avê bû wekî çiyakekî mezin.

**64.** Me ew ên din (Firewn û destegirên wî) di behrê de nêzîkî wan kirin.

**65.** Me Mûsa û yên digel wî tev rizgar kirin.

66. Paşê me ew ên din xeniqandin.
67. Bêguman di vê de îbretek heye, lê pirên wan bawerî nayînin
68. Bêguman Xwedayê te her ew e yê desthilat ê dilovîn.
69. (Ya Muhemmed!) Ji wan re serpêhatiya Îbrahîm jî bixwîne.
70. Dema Îbrahîm ji bavê xwe û gelê xwe re got: Hûn çi dihebînin?
71. Jê re gotin: Em pûtan dihebînin û em ê her û her perestina wan jî bikin.
72. Îbrahîm got: Erê baş e, dema ku hûn li ber wan digerin qey ew dengên we dibihîzin?
73. Ma ew feydê yan jî zerarê didin we?
74. Jê re gotin: Na! Lê belê me bav û bapîrên xwe dîtin ku wan jî welê dikir.
75. Îbrahîm got: Erê baş e, ma hûn fikirîne ka hûn perestina çi dikin?
76. Hûn û bav û bapîrên we yên berê jî…
77. Bêguman ew ji min re dijmin in; (dostê min) tenê Perwerdegarê alemê ye…
78. Ew e yê ku ez afirandime û riya rast nîşanî min daye…
79. Ew e yê ku xwarin û vexwarinê dide min…
80. Dema ez nexweş bikevim Ew e yê ku min şîfa bike…
81. Ew e yê ku min bimirîne, paşê (dîsa) min sax bike…
82. Ew e yê ku ez hêvî dikim ku roja xelat û celatê li şaşiyên min bibore.
83. Xwedayê min! Hîkmetê bide min û min bigihîne qencîkaran.
84. Di nava kesên ku piştî min tên de, min bike ji yên ku bi rastî û duristî behsa wan tê kirin.
85. Min bike ji mîratgirên bihişta ku nîmetên wê pir in.
86. Li bavê min jî bibore, bêguman ew ji rêşaşan e.
87. Roja ku mirov bêne saxkirin, min riswa meke…
88. Ew roja ku mal û zarok feyde nadin tu kesî.
89. Ji bilî yê ku bi dilekî pak bête bal Xwedê ve.
90. (Wê rojê) Cennet ji mutteqiyan re tê nêzîkkirin.
91. Cehenem jî ji rêşaşên kafir re pêşçav dibe.
92. Ji wan re tê gotin: Ew ên ku we perestina wan dikir, ka li ku ne..?
93. Erê, ma ji bilî Xwedê; ma ew dikarin arîkariya we bikin an jî arîkariya xwe bikin?
94. Êdî ew û mebûdên wan yek li dû yekî di dojehê de tên werkirin...
95. Tevekî leşkerê Îblîsî jî.
96. Ew li gunehên xwe mukir hatin û bi hev re ketin nav gengeşiyê.
97. Em bi Xwedê sond dixwin ku em di nav rêşaşiyeke aşkera de bûn.
98. Lewra me hûn û Xwedayê alemê di yek rêzekê de digirtin.

99. Her wan gunehkaran em ji rê xistin.
100. Êdî ji me re ne mehdervan hene…
101. Ne jî dostekî nêzîk heye.
102. Ax xwezî ji me re vegerek hebûya, vêca ku em jî bibûna ji bawermendan!
103. Bêguman di vê de îbretek heye, lê pirên wan bawerî nayînin.
104. Bêguman Xwedayê te her ew e yê desthilat, yê dilovîn.
105. Gelê Nûh jî bi pêxemberan bawerî neanîn.
106. Dema birayê wan Nûh ji wan re got: Ma hûn (ji hatina li hemberî fermana Xwedê) natirsin?
107. Bêguman ez ji bo we pêxemberekî pêbawer im.
108. Vêca ji Xwedê bitirsin û bi gotina min bikin.
109. Ez ji bo vê (teblîxa ku ji we re radigihînim) tu heqekî naxwazim, teqez xelata min ji Xwedayê alemê ye.
110. Vêca ji Xwedê bitirsin û bi gotina min bikin.
111. (Qewmê wî jê re) Gotin: Em ê çawa bawerî bi te bînin, ma ne yên kêm û reben dane pey te?!
112. Nûh got: Der barê ya ku ew dikin de tu zanîna min nîn e.
113. Hesabê wan tenê li cem Xwedayê min e, eger we bizaniba (we ev nedigot).
114. Ez ne ew im ku bawermendan ji cem xwe biqewirînim.
115. Ez tenê hişyarkerekî aşkera me.
116. Gotin: Ey Nûh! Eger tu (ji vê doza xwe) venegerî, teqez tu yê bi keviran bêyî kuştin.
117. Nûh got: Xwedayê min! Gelê min, bawerî bi min neanî.
118. Êdî di navbera min û wan de hukmê xwe bike, min û bawermendên digel min rizgar bike.
119. Vêca Me Nûh û yên ku digel wî bûn di keştiya tije (mirov, ajal û teyr) de reha kirin.
120. Paşê me ên mayîn di avê de xeniqandin.
121. Bêguman di vê de îbretek heye, lê pirên wan bawerî nayînin.
122. Bêguman Xwedayê te, her ew e yê desthilat ê dilovîn.
123. Gelê Ad jî bi pêxemberên xwe bawerî neanî.
124. Dema birayê wan Hûd ji wan re got: Ma hûn ji Xwedê natirsin?
125. Bêguman ez ji bo we pêxemberekî êmindar im.
126. Vêca ji Xwedê bitirsin û bi gotina min bikin.
127. Ez ji we, tu heqekî naxwazim, teqez xelata min tenê ji Xwedayê alemê ye.
128. Erê ma li her cihê bilind, hûn ê bêfeyde û bêmeqsed avahiyên bi nav û nîşan ava bikin?

129. Bi hêviya ku hûn ê her û her bimînin hûn avahiyên mikûm û mezin lêdikin?
130. Dema ku hûn ceza didin, hûn bi sitemkarî ceza didin?
131. Vêca ji Xwedê bitirsin û bi gotina min bikin.
132. Ji wî Xwedayê ku tiştê hûn dizanin bexşî we kiriye bitirsin.
133. (Ji wî Xwedayê) ku terş (deve, dewar û pez) û zarok bexşî we kirine...
134. Baxçe û kanî jî dane we.
135. Bêguman ez ji bo we, ji ezabê rojeke mezin ditirsim.
136. Jê re gotin: Çi tu şîretan bikî, çi jî tu nekî ji me re wekhev e (em bawerîyê nayênin).
137. Ev a (ku em li serê ne) ji dînê pêşîyan pê ve ne tiştekî din e…
138. Em ê qet neyên ezabdayîn.
139. Wan bawerî bi Hûd neanî, vêca me jî ew helak kirin. Bêguman di vê de îbretek heye, lê pirên wan bawerî nayînin.
140. Bêguman Xwedayê te her ew e yê desthilat ê dilovîn.
141. Gelê Semûd jî bi pêxemberên xwe bawerî neanî.
142. Wê demê birayê wan Salih ji wan re got: Ma hûn ji Xwedê natirsin?
143. Bêguman ez ji bo we pêxemberekî êmindar im.
144. Vêca ji Xwedê bitirsin û bi gotina min bikin.
145. Ez ji bo vê tu heqekî naxwazim, teqez xelata min bes ji Xwedayê alemê ye.
146. Erê ma ji we we ye ku hûn ê li vê (dinyayê) ewle bimînin û Xwedê dê ezab nede we?
147. Di nava baxçe û kaniyan de…
148. Di nava çandinî û darxurmeyên gihiştî, taze û xweş de.
149. Hûn bi hostayî çiyan diqewêrin xaniyan çêdikin.
150. Vêca ji Xwedê bitirsin û bi gotina min bikin.
151. Bi gotina musrifan mekin…
152. Ew ên ku li ser rûyê erdê fesadiyê dikin û qenciyê nakin.
153. Jê re gotin: Bêguman tu bes ji wanên sêr li wan hatiye kirin!
154. Tu jî miroveki wekî me yî. Eger birastî tu rast dibêjî de haydê mucîzeyekê ji me re bîne.
155. Salih ji wan re got: Ha ev deve ji we re mucîze ye, rojekê dora avê jê re ye û rojeke diyar jî ji we re ye.
156. Zinhar bi neqencî dest nedinê, vêca ezabê rojeke mezin dê we bigire.
157. Lê belê wan ew serjêkir û (di piştre) poşman bûn.
158. Ji ber vê kirina wan ezab ew girtin. Bêguman di vê de îbretek heye, lê pirên wan bawerî nayînin.
159. Bêguman Xwedayê te her ew e yê desthilat ê dilovîn.

**160.** Gelê Lût jî bi pêxemberên xwe bawerî neanî.
**161.** Dema birayê wan Lût ji wan re got: Ma hûn ji Xwedê natirsin?
**162.** Bêguman ez ji bo we pêxemberekî pêbawer im.
**163.** Vêca ji Xwedê bitirsin û bi gotina min bikin.
**164.** Ez ji bo vê tu heqekî naxwazim, teqez xelata min ji Xwedayê alemê ye.
**165.** Erê ma ji alemê hûn bi zilaman re taluqatiyê dikin?..
**166.** Jinên we yên ku Xwedê ji we re afirandin jî hûn dihêlin. Nexêr, belkî hûn qewmekî tixûbbihêr in!
**167.** Wan jî got: Ey Lût! Eger tu ji vê (doza xwe) venegerî bêguman em ê te ji nav xwe derxin!
**168.** Lût ji wan re got: Bêguman ez ji vê kirina we ya kirêt pir dikeribim.
**169.** Xwedayê min! Min û malbata min ji ya ku ew dikin xelas bike.
**170.** Ji bo vê daxwaza wî, me ew û malbata wî tev rizgar kirin.
**171.** Lê belê pîreka wî na; ew di nav ên helakbûyî de ma.
**172.** Piştre me yên din qir kirin.
**173.** Me kevir bi ser wan de barandin, çi pîs baran bû li yên ku hatin hişyarkirin!
**174.** Bêguman di vê de îbretek heye, lê pirên wan bawerî nayînin.
**175.** Bêguman Xwedayê te, her ew e yê desthilat ê dilovîn.
**176.** Gelê Eyketê jî bi pêxemberên xwe bawerî neanî.
**177.** Dema Şûeyb ji wan re got: Ma hûn ji Xwedê natirsin?
**178.** Bêguman ez ji bo we pêxemberekî êmindar im.
**179.** Vêca ji Xwedê bitirsin û bi gotina min bikin.
**180.** Ez ji bo vê tu heqekî naxwazim, teqez xelata min ji Xwedayê alemê ye.
**181.** Pîvanê tam bikin û ji kêmkeran nebin.
**182.** Bi mêzîna rast bikişînin.
**183.** Ji heqê mirovan tiştekî kêm nekin û li ser erdê gelacî û tevdanê dernexin.
**184.** Xwe ji ezabê Xwedê biparêzin, Ew ê ku hûn û nifşên berê afirandine.
**185.** Jê re gotin: Bêguman tu, ji wan kesan î ku sêr li wan hatiye kirin?
**186.** Tu jî mirovekî wekî me yî û em te ji derewkeran dizanin.
**187.** Eger bi rastî tu ji rastgoyan î, de haydê ji esmên parçeyekî bi ser me de bixe.
**188.** Şûeyb got: Xwedayê min bi kirinên we bêhtir dizane.
**189.** Wan bawerî pê neanî, vêca ezabê roja bi ewr û mij ew girtin. Birastî ew ezabê rojeke mezin bû!
**190.** Bêguman di vê de îbretek heye, lê pirên wan bawerî nayînin.
**191.** Bêguman Xwedayê te her ew e, yê desthilat ê dilovîn.
**192.** Bêguman ev (Quran) ji aliyê Xwedayê alemê ve hatiye nazilkirin.

**193.** Ruhul Emîn (Cibraîl) ew (Quran) aniye xwarê.
**194.** Li ser dilê te da ku tu bibî ji hişyarkeran.
**195.** Bi zimanekî erebiyeke zelal.
**196.** Bêguman (mizgîn û saloxên vê) Quranê, di kitêbên pêşiyan de heye.
**197.** Erê ma ku alimên îsraîliyan vê Qur'anê nas dikin ji wan re ne delîleke?
**198.** Eger me Quran li ser yê ku ne ereb e hinartibûya…
**199.** Vêca ji wan re jî bixwenda, dîsa dê bawerî pê neaniyana.
**200.** Bi vî awayî me (tekzîba) wê xistiye dilên sûcdaran.
**201.** Heta ku ew ezabê dijwar nebînin dê bawerî pê neyînin.
**202.** Vêca ev (ezab) ji nişka ve dê bi ser wan de bê û haya wan ji (hatina) wî tun e.
**203.** Wê çaxê dê bibêjin: Gelo ji bo ku em (bawerî bînin) muhlet ji me re nayê dayîn?
**204.** Qey ew bi lez ezabê me dixwazin?
**205.** (Ya Muhemmed!) De ka bibêje, eger bi salan em jiyaneke xweş bidin wan.
**206.** Piştre (ezabê) ku peymana wî ji wan re hatiye dayîn, bi ser wan de bê.
**207.** Ew xweşiya ku pê jiyane dê feydeyekê nede wan.
**208.** Çiqas welatekî ku me (xelkê wî) helak kiribe her ji wan re hişyarker hebûne.
**209.** (Ew hişyarkerî da ku ji wan re) bibe pend û şîret. Birastî jî em ne zalim in.
**210.** Şeytanan ev (Quran) danexistiye.
**211.** Ev ji wan re nabe û nikarin vê bikin jî.
**212.** Ew ji guhdarîkirina wehyê hatine dûrxistin.
**213-** Vêca digel Xweda bi tu îlahan neperize, vêca tu dê bibî ji yên ku bi ber ezab dikevin!
**214.** (Berî her kesî) xwedî û lêzimên xwe yên nêzîk hişyar bike.
**215.** Ji bo bawermendên ku dane pey te xwe perşikestî û nerm bike.
**216.** Eger guhdariya te nekirin, vêca bibêje: Bêguman ez ji ya ku hûn dikin bêrî me.
**217.** Tu xwe bispêre wî Xwedayê desthilat ê dilovîn.
**218.** Ew Xwedayê dema tu radibî (şevnimêjan) te dibîne.
**219.** Rabûn û rûniştina te ya di nav nimêjkaran de jî (dibîne).
**220.** Bêguman Xwedê, her ew e yê bihîzer ê zana.
**221.** Ma ez ji we re bibêjim ka şeytan dadikevin ser dilê kê?
**222.** Ew dadikevin ser dilê her kesê pir dewrewkar ê pir gunehkar.
**223.** Ew (li asîmanan) guhveçiniyê dikin û pirên wan derewker in.
**224.** Herçî ku şair in, mirovên jirêderketî bi pey wan dikevin.
**225.** Ma tu nizanî ku ew bêzanîn û armanc xwe berdidin nav her derew û hunerê.
**226.** Bêguman ew ya ku nakin dibêjin.

227. Ji bilî ên ku bawerî anîne, ew ên ku kar û kiryarên qenc kirine, ên ku zikrê Xwedê pir kirine û piştî ku neheqî li wan hatî kirin xwe bi ser xistine (ew cuda ne). Yên ku zilm kirine teqez dê bizanin ka bi bal kû cihî û kîjan encamê ve vegerin.

## 27. SÛREYÊ NEML

Sûreyê Neml, 93 (not û sê) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji peyva Neml girtiye ku bi maneya mîro (morî -gêrik) tê kû di ayeta 18'em de bihuriye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Ta. Sîn. Ev sûre, ayetên Quranê û yên kitêba ronker in.
2. Ew ji bo bawermendan, rêber û mizgîn e.
3. Ew bawermendên ku nimêjê bi awayê pêdivî dikin, zekatê didin û bi axretê ji dil bawerî tînin...
4. Bêguman ew ên ku bawerî bi axretê nayînin, me ji wan re kiryarên wan xweş nîşan daye, vêca ew jî tê de sergêjane digevizin.
5. Evên ha ên ku (li dinyayê) ji wan re pîstirîn ezab heye û li axretê jî ew yên herî xesirî ne.
6. Bêguman tu vê Quranê ji cem ê ku hekîm e, zana ye werdigirî.
7. Serpêhatiya Musa dibîr bîne; dema Mûsa ji ehlê xwe re got: Min agirek dît, ez ê (biçim) ji we re ji wê derê xeberekê bînim an jî ji we re bizotekî êgir bînim ji bo ku hûn xwe pê germ bikin!
8. Gava Mûsa hate cihê agir, bang lê hate kirin: Ew ên li cem êgir û yên li hawirdora êgir pîrozdêrayî ne û ew Xwedayê ku perwerdegarê alemê ye ji hemû kêmasiyan pak û dûr e!
9. Ey Mûsa! Rewş ev e; Ez Xweda me, ew ê ku di kar û barê xwe de serdest û xwedanhîkmet e.
10. Tu gopalê xwe biavêje! (Mûsa jî gopalê xwe avêt). Vêca dema Mûsa dît ku gopalê wî wek mar bi lez xwe diavêje û diçe, (ji tirsa) revî û li pişt xwe nezivirî. (Me jê re got:) Ey Mûsa! Metirse, bêguman pêxember li cem min natirsin.
11. Lê belê yê ku zilmê kiribe, paşê tobe bike û li şûna xerabiyê qenciyê bike, bêguman ez gunehjêbir û dilovîn im.
12. Destê xwe hêdîka têxe paxila xwe, dê spî derkeve; spîtiyeke ne ji nexweşî. Tu digel van neh mucîzeyan here cem Firewn û gelê wî. Bêguman ew civateke jirêderketî û fasiq in.
13. Çi dema ku mucîzeyên me aşkera hatin pêşberî çavên wan, gotin: Ev sêreke aşkera ye.

**14.** Wan ji ber zilm û quretiya xwe mucîze înkar kirin, hal ev e ku wan ji qinyata dilê xwe bawer kiriye ku ev (mucîze rast û) heq in. De tu binêre encama mufsidan ka çawa bû!

**15.** Sond be, me zanîn daye Dawud û Suleyman. Herduyan got: Hemd ji Xwedê re be ku em di ser gelek bendeyên xwe yên bawermend re girtine.

**16.** Suleyman bû mîratgirê Dawud. Suleyman got: Gelî mirovan! Zimanê teyran bi me hatiye fêrkirin û ji her tiştî (nesîbê) me hatiye dayîn. Bêguman ev, her ew kerema aşkera ye (ku Xwedê em pê di ser xelkê re girtine).

**17.** Ji xizmeta Suleyman re leşkerên wî yên ku ji cin, însan û teyran pêkhatî, pêkve hatin civandin. Vêca ew tev (ji aliyê Suleyman ve) bi awayekî rêkûpêkbûyî dihatin berkarkirin.

**18.** Heta ku hatin newala mîroyan, mîroyekê got: Gelî mîroyan! Bikevin kunên xwe; bila Suleyman û leşkerên wî bêhay we nepelçiqînin!

**19.** Vêca Suleyman bi gotina mîroyê keniya û got: Xwedayê min! Sirûşê bide dilê min ji bo ku ez spasiya van nîmetên ku te ew li min û dê û bavê min kirine bikim û ez karê qenc ê ku te qayîl dike bikim û bi rehma xwe min bixe nava evdên xwe yên qencîkar.

**20.** Suleyman piştî çavê xwe li teyran gerand got: Çima ez Hudhud (li vir) nabînim? Ma ew ne hazir e?!

**21.** Sond be, ez ê ezabekî cansoj bidim Hudhud, an ez ê wî şerjê bikim an jî ewê delîleke aşkera û bihêz ji min re bîne.

**22.** Hê demeke dirêj nebihurî, hudhud hat, got: Ez fêrî tiştekî bûm ku tu jî nizanî. Min ji Sebeyê xebereke rast (û girîng) ji te re aniye.

**23.** Bêguman min xanimek (Belqîs) dît ku hukm li wan (Sebeiyan) dike û jê re her cure derfet hatine dayîn û textekî wê yî mezin heye.

**24.** Min ew xanim û gelê wê dît ku ew ji bilî Xwedê ji rojê re îbadet dikin. Şeytan ev karên wan ji wan re xemilandiye û ew ji riya rast dane paş, vêca ew bi ser riya rast û durist ve nabin.

**25.** (Ew ji riya rast dane paş) da ku ji Xwedê re îbadet nekin, ew Xwedayê ku ya li erd û asîmanan veşartî derdixe meydanê û bi ya ku hûn vedişêrin û bi ya ku hûn aşkera jî dikin, dizane.

**26.** Xwedê, ew ê ku ji bilî wî tu mebûdê heq tun in, Ew xwediyê ‘Erşê Mezin e.

**27.** Suleymanî ji hudhud re got: Em ê binêrin ka te rast gotiye yan jî tu ji derewînan î?

**28.** Vê nameya min here bide wan, piştre xwe hinekî ji wan bide paş û binêre ka ew ê çi bersivê bidin.

**29.** (Piştî ku şahbanoya Sebeyê nameya Suleyman wergirt) Got: Gelî giregiran! Ji min re nameyeke girîng û hêja hatiye.

**30.** Bêguman ev name ji Suleyman hatiye û ew bi navê Xwedayê mihrîvanê dilovîn dest pê dike.

**31.** (Tê de wiha nivîsiye:) Xwe li ser min mezin nedêrin, li hemberî min ranebin û werin bal min misilman bibin.

**32.** Wê got: Gelî giregiran! Der barê vê rewşê de bibêjin ka ez çi bikim? Ez ne ew im ku bêyî şêwra we tu biryarê bidim.

**33.** Giregiran gotin: Em mirovên xwedanhêz û desthelat in, di şeran de em mêrxas in, ferman a te ye; vêca binêre ka tê çi ferman bikî.

**34.** Wê got: Bêguman dema hukimdar dikevin welatekî wî kavil û wêran dikin, ezîzê wî zelîl dikin û karê wan her ev e.

**35.** Ez ê xelatekê ji wan re bişînim, vêca ez ê binêrim ka qasid dê bi çi vegerin?

**36.** Vêca dema hatin cem Suleyman; ji wan re got: Ma hûn dixwazin ku bi mal min qayîl bikin (da ku ez dev ji we berdim)? Vêca ya ku Xwedê daye min ji ya daye we çêtir e. Belkî hûn bi hediyegirtin û hediyedayinê dilxweş dibin.

**37.** (Suleyman ji qasidê Sebeîyan re got:) Li wan vegere (û ji wan re bibêje), em ê bi leşkerekî wisa bêne ser wan ku nikarin xwe li ber wan bigirin û teqez em ê wan di halekî şerpeze û reben de ji wê derê derxin!

**38.** (Suleyman) got: Gelî giregiran! Beriya ew bên radestî ber min bibin kî ji we dikare textê wê ji min re bîne?

**39.** Îfrîtekî cinî got: Beriya tu ji vî cihê xwe rabî, ez ê textê wê ji te re bînim. Hêza min ji vî karî re heye û ez bi xwe bawer im.

**40.** Ew ê ku ji kitêbê li cem wî zanîn hebû, got: Beriya tu çavê xwe bigirî û vekî, ez ê textê wê ji te re bînim. Vêca dema Suleyman textê wê li ber xwe hazir dît, got: Ev ji kerema Xwedayê min e, da ku min biceribîne, ka ez ê spasiya wî bikim an jî nankoriyê bikim. Kî şukrê Xwedê bike teqez feyda wî her jê re ye. Kî jî nankoriyê bike bêguman Xwedayê min dewlemend e, xwedankerem e.

**41.** Suleyman got: Textê wê biguherînin bixin haletekî ku nas neke, em ê binêrin ka wê nas bike yan jî wê bibe ji wan ên ku nas nake?

**42.** Vêca (Belqîs) dema hat jê re gotin: Ma textê te jî wiha ye? Got: Her wekî ew bi xwe ye! Jixwe beriya vê (mucîzeyê der barê pêxembertiya te de) zanîn ji me re hatiye dayîn û em ji te re teslîm bûn.

**43.** Perestina ji bilî Xwedê ew ji baweriya tewhîdê dabû paş. Bêguman ew ji qewmekî kafir bû.

**44.** Jê re gotin: Kerem bike here koşkê. Dema Belqîsê koşk dît, wê ew aveke kûr guman kir û daw û delingên xwe hildan (da ku tê re derbas bibe). Suleyman got: Ev, koşkeke hilû ye ji şûşan hatiye çêkirin. Belqîsê got: Xwedayê min! Bêguman min (bi rojperestiyê) zilm li xwe kiriye. Ez digel Suleyman ji Xwedê re berdest bûm ku ew perwerdegarê alemê ye.

**45.** Sond be, me ji gelê Semûd re birayê wan Salih, bi pêxemberî şand, (da ku ji wan re bibêje:) Evdîtiyê ji Xwedê re bikin! Vêca di cih de ew bûne du bend û bi hev ketin.

**46.** (Salih ji mandelkaran re) got: Gelî miletê min! Hûn çima beriya qenciyê li

neqenciyê lezê dikin? De ji Xwedê lêborîna gunehên xwe bixwazin da ku rehm li we bê kirin.

47. Qewmê wî got: Di rûyê te û yên digel te de bêqudoşî (bêoxirî) li me bariyaye. Salih ji wan re got: Tiştê ji başî û nebaşiyê were serê we ew ji cem Xwedê ye. Belkî hûn miletekî wisan e ku hûn têne ceribandin.

48. Di wî bajarî de neh kes hebûn ku wan li ser rûyê erdê gelacî dikir û hîç qencî nedikir.

49. (Wan neh kesan) ji hev re gotin: Ji hev re bi Xwedê sond bixwin ku em ê teqez bi şev ji xafil ve biavêjin ser Salih û ehlê wî (û em tevan bikujin), piştre em ê ji xwediyê wî re bêjin: Me kuştina wan bi çav nedîtiye û birastî jî em rastbêjin.

50. Wan (ji bo kuştina Salih) dafek veda û Me jî bêyî haya wan jê çêbe (ji bo pûçkirina dafa wan) dafek veda.

51. De tu binêre ka encama hîleya wan çawa bûye. Bêguman me ew û qewmên wan pêkve helak kirin!

52. Vêca ji ber zilma ku wan kiriye xaniyên wan kavil û vala ne (Xwedê ew helak kirin)! Bêguman di vê de ji bo yên têgihîştî nîşan û îbret hene.

53. Me ew ên ku bawerî (bi Salih) anî û xwe (ji şirkê) parastin, xelas kirin.

54. Lût di bîr bîne, dema ji gelê xwe re got: Erê ma hê jî hûn fehşîtiyê dikin digel ku hûn dizanin ew fehşîtî ye?

55. Ma hê jî hûn di şûna jinan de bi şehwetî diçin bal mêran? Naxêr, belkî hûn qewmekî nezanin!

56. Bersiva gelê Lût her ev bû: Malbata Lût ji welatê xwe derînin, birastî ew mirovên wisa ne ku xwe (ji lîwatê) paqij didêrin!

57. Vêca, Me ew û ehlê wî (ew ên ku pê bawerî anîbûn) rizgar kirin, ji bilî jina wî; me ew gerand ji yên helakbûyî.

58. Me baranek (ji kevirê sincirî) bi ser wan de barand. Vêca ew barana ku bi ser yên hatin hişyarkirin de barî çiqas pîs bû!

59. (Ya Muhemmed!) Bibêje: Pesn û şêkirî her ji Xwedê re be û silav li ser bendeyên Xwedê be, ew ên ku Xwedê ew (ji pêxemberiyê re) hilbijartine. Erê ma Xwedê çêtir e yan ew ên ku hûn jê re dikin hevpişk?

60. An jî ew ê ku erd û asîman çêkirin û ji ewran av ji we re aniye xwarê. Vêca me bi wê avê baxçeyên xweşik hêşîn kirine ku we nikarîbû darên wan hêşîn bikin. Erê, ma digel xwedê îlahekî din heye?! (Ne wisan e) belkî ew qewmek e ku berê xwe ji heqiyê vedigerînin.

61. An jî ew ê ku erd kiriye şûnwar, di navbera erdê de çem herikandine, ji bo erdê çiyayên mikûm xuliqandine û di nava her du deryayan de navberek vekişandiye? Erê, ma digel Xwedê İlahekî din heye? Lê pirên wan (muşrikan rastiyê) nizanin.

62. An jî ew ê ku dema dertdar gazî wî dikin bersiva wan dide, tengiyê ji ser wan radike û we dike şûngir û desthilatên erdê? Erê ma digel Xwedê îlahekî din heye (ku hûn perestina wî dikin)?! Hûn çiqas hindik difikirin!

**63.** An jî ew ê ku di nava tarîstana bej û behrê de rê nîşanî we dide û beriya rehma xwe bayê wek mizgînber dişîne? Erê ma digel Xwedê îlahekî din heye?! Xweda ji wan tiştên ku hûn jê re dikin hevpişk û heval, pak û bilind e!

**64.** An jî ew ê ku ji tuneyî diafirîne, piştre ji nû ve dîsa we vedijîne û hem ji asîmên hem jî ji erdê risqê we dide. Erê ma digel xwedê îlahekî din heye?! Bibêje: Eger bi rastî hûn rast dibêjin, de ka delîla xwe bînin!

**65.** Bibêje: Ji bilî Xwedê, yên li erd û asîmanan tu kes ji wan xeybê nizane. Ew nizanin ka kengê dê bêne saxkirin jî.

**66.** Nexêr; belkî zanîna wan derbarî axretê de qediya ye. Nexêr; belkî ew di vê derbarê de gumandar in. Nexêr; belkî ew fehmkor in.

**67.** Ew ên kafir bûne gotin: Erê ma çaxê em û bavanên me (mirin û) bûne ax, erê ma dîsa em ê (sax bibin û ji tirban) bêne deranîn?!

**68.** Sond be, ma ne ev gef û tirs li me û ji berê de jî li bavanên me hatibû kirin. Ev bes çîrok û çîvanokên pêşiyan in.

**69.** Bibêje: De haydê li ser rûyê erdê bigerin, vêca binêrin ka domahîka gunehkaran çawa bûye!

**70.** Tu ji bo wan xemgîn mebe, ji dafên ku ew li ber te vedidin jî dilteng mebe.

**71.** (Ew muşrik) dibêjin: Eger bi rastî hûn (di doza xwe de) rastgo ne, ev peyman (a bi hatina ezabê) ka kengê tê?

**72.** Bibêje: Ew ezabê ku hûn lezê li hatina wî dikin, hêvî heye ku di nêzîk de hinek jê bi ser we de bê.

**73.** Bêguman Xwedayê te ji mirovan re xwedanê keremê ye, lê belê pirên mirovan wî naşêkirînin.

**74.** Bêguman Xwedayê te bi ya ku ew di sînga xwe de vedişêrin û bi ya ku aşkera jî dikin dizane.

**75.** Li erd û esmên her çi tiştê nediyar, her ew di kitêbeke aşkera de nivîsandî ye.

**76.** Bêguman ev Quran ji îsraîlîyan re piraniya wan tiştên ku tê de li hev nedikirin û tê de ketibûn îxtîlafê aşkera dike.

**77.** Bêguman ev Quran ji bawermendan re rêber û rehmet e.

**78.** Bêguman Xwedayê te, dê di navbera wan de bi hukmê xwe daraz bike û her ew e yê serdest ê zana.

**79.** Naxwe tu xwe bisipêre Xwedê, lewra tu li ser wê heqiya aşkera yî.

**80.** Bêguman tu nikarî (heqiyê) bi dilmiriyan bidî bihîstin û tu doza xwe bi wan bêguhên ku pişta xwe dane heqiyê û jê direvin jî, neşê bidî guhdarîkirin.

**81.** Tu neşê fehmkoran ji rêşaşiya wan vegerînî û wan rasterê bikî, bes tu dikarî (doza heq) li yên ku ji dil û can misliman bûne û wan bawerî bi ayetên me aniye bidî guhdarîkirin.

**82.** Dema hatina qiyametê nêzîkî wan bû. Em ê ji bo wan ji erdê debeyekî (rêveherekî) derînin ku ew ê bi wan re biaxive; ji ber ku însanan bi ayetên me bawerî nedianîn.

**83.** Wê rojê em ê ji her umetê birekê ji wan ên ku bi ayetên me bawerî neanîbû li hev bicivînin. Êdî ew li cihekî têne girtin (û ji bo hesêb) têne ajotin.

**84.** Heta Gava ku ew bên (meydana hesabê, Xwedê ji wan re) dibêje: Erê ma digel ku zanebûna we tam pê tunebû jî we înkara ayetên min dikir? (Ku ne wiha be) Nexwe çibû ku we dikir?

**85.** Ji ber zilma ku kirin, ezab li ser wan misoger bû, vêca ew nikarin biaxivin (da ku bersiva xwe bidin).

**86.** Ma wan nedîtiye ku me şev afirandiye da ku ew tê de bêhna xwe bidin û me roj jî kiriye ronahî? Ji bo miletekî ku bawerî bîne, teqez di vê de îbret hene.

**87.** Roja di sûrê de were pifkirin, ji bilî yên ku Xwedê naxwestiye ku bitirsin, çi tiştên li erd û asîmanan hene dê bitirsin. Tevekî mexlûqan dê melûl û şikestî bêne hizûra Xwedê.

**88.** Tu guman dikî ku çiya rawestayî û bêhereket in. Ne wisan e, ew mîna gera ewran digerin. Ev pîşê Xwedê ye, ew Xwedayê ku her tişt tekûz û bihîkmet çêkiriye. Bêguman Xwedê, ji kirinên we agahdar e.

**89.** Kî ku bi qencî were hizûra Xwedê, vêca ya herî çêtir jê re heye (ku bihişt e) û wê roja bitirs ew ji tirseke mezin jî ewle ne.

**90.** Kî ku bi nebaşî werê hizûra Xwedê, ew bi ser devên xwe ve di êgir têne werkirin (û ji wan re tê gotin:) Hûn bes cezayê ya ku we li dinyayê kiriye, dikişînin!

**91.** (Ya Muhemmed! Bibêje:) Ferman li min hatiye kirin ku ez bes ji Perwerdegarê vî bajarî re (ku Mekke ye) îbadet bikim. Ew Xwedayê ku siyanet dayê (û ew hemandiye), her tişt bes yê wî ye û ferman li min hatiye kirin ku ez misliman bijîm û misliman bimirim.

**92.** Ez hatime fermanberkirin ku ez Quranê bixwînim. Vêca kî were ser riya rast, ew ji bo xwe hatiye ser riya rast û kî ku ji rê bikeve, îcar jê re bibêje: Ez bes hişyarkerekî ji pêxemberên hişyarker im.

**93.** Bibêje: Hemd ji bo Xwedê ye. Ew Xwedayê ku ayetên xwe (di nefsa we de û di erd û asîmanan de) dê nîşanî we bide, hûn ê jî wan nas bikin. Bêguman perwerdegarê te ji tiştê kû hûn dikin ne xafil e.

# 28. SÛREYÊ QESES

Sûreyê Qeses, 88 (heştê û heşt) ayet e. Li Mekkê daketiye. El-Qeses bi maneya rûdan, qise û hîkayeyan e. Sûreyî navê xwe ji ayeta 25-em girtiye. Mijarên sûreyî yên serekeyî ji zarokatiya wî û pê de jiyana Nebî Mûsa, têkoşîna wî, serkeftina ehlê îmanê û bawernebûna bi serweta dinyayê pêk tên. Sûretê Qeses -wekî hemû sûretên ku li Mekkê nazil bûne- bi girîngî li ser mijara bîr û baweriyê: "Yekîtiya Xwedê Teala, peyxambertî û saxbûna piştî mirinê" radiweste ku ew; hem ji aliyê rêbazê ve hem ji aliyê daketinê ve digel sûretên "Şû'era û Neml" ahengsaz e.

*Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm*

**1.** Ta. Sîn. Mîm.

**2.** Ev ayetên kitêba ronker in.

**3.** Ji bo miletekî ku bawer bikin em ê ji te re hinekî ji agahiyên Mûsa û Firewn bi rastî û duristî bixwînin.

**4.** Bêguman Firewn li ser erdê ji ser xwe ve çûye û xelkên wê ji hev perçe kiriye. Desteyekê ji wan qels dike; kurên wan dikuje û keçên wan sax dihêle. Bêguman ew her ji mufsidan bû.

**5.** Em jî dixwazin li wan ên ku li ser erdê hatine qelskirin keremê bikin û em wan bikin rêber û em wan bikin mîratgirê erdê.

**6.** Em divên wan li erdê desthilatdar bikin û em bi Firewn, Haman û leşkerên wan a ku ew jê ditirsiyan, bidin dîtin.

**7.** (Dema Mûsa ji dayîka xwe bû) Me sirûş (îlham) da dayîka Mûsa; (Me jê re got:) Wî bimêjîne (wî şîr bide). Vêca eger tu jê tirsiya îcar wî (bike sindoqê û) biavêje deryayê. Netirse û xemgîn jî mebe (lewra ew naxeniqe). Bêguman em ê dîsa wî li te vegerînin û em ê wî bikin pêxember.

**8.** Vêca malbata firewn ew girtin, di dawî de dê ji wan re bibe neyar û xemgînî. Bêguman Firewn, Haman û leşkerên wan her gunehkar bûn.[1]

**9.** Jina Firewn got: (Ev zarok) dê ji bo min û te bibe kêf û dilxweşî, wî mekujin, dibe ku feydê bide me, yan jî em wî ji xwe re bi kurînî bigirin. Hal ev e ku ew nizanin (ku helaka wan dê li ser destê wî be).

**10.** Dayîka Mûsa (piştî bihîst ku Mûsa ketiye destê Firewn) ji ber xema Musa hiş di serî de nema. Eger me dilê wê mikûm nekiribûya hindik mabû ew aşkera bike ku ew kurê wê ye. (Vêca me sebr û sebat dayê) da ku ew bawer bike ku soza me pê re daye heq e (muheqqeq dê bicih jî were).

1 Fir'ewn û malbata wî difikirîn ku ev lawik ji wan re bibe dilxweşî û şahî, lêbelê dawî dê ji wan re bibe neyar û xemgînî. Ew çi difikirîn çi çêbû? Ev qiset dide fehmkirin ku Fir'ewn ê ku digot ez îlah im bêhiş û bêbesîret bû. Piştî ku kahine ew hişyar kirin ku vî lawikî negire malê û piştî xewna ku dîtî ku ev lawik ji jiyan û hukimraniya wî re xeter e, razî bû ku wî di mala xwe de mezin bike. Ev rewş vê ayeta pîroz "Bizanin ku Xwedê dikeve navbera insên û dilê wî" rast derêxê. Enfal:24

11. Dayîka Mûsa ji xwişka wî re got: Li pey şopa wî here. Wê ew ji dûr ve dît, wan nizanî ew xwişka wî ye,

12. Berya em li dayîka wî vegerînin Me nehêla ew şîrê şîrdayiyan bixwe. Vêca xwişka wî ji wan re) got: Ma ez malekê nîşanî we bidim ku wî ji we re xwedî bikin û ew lê guhdar bin?

13. Vêca me ew li dayîka wî vegerand da ku çavê wê pê ronî bibe, xemgîn nebe û bizanibe ku peymana Xwedê (dayî) heq û rast e. Lê belê pirên mirovan (vê) nizanin.

14. Dema Mûsa (ji hêz û aqil ve) giha kemala xwe, Me hîkmet û zanîn dayê. Ha bi vî awayî em qencîkaran xelat dikin.

15. Mûsa di navberekê de ku haya xelkê bajêr jê nebû, çû bajêr. Li wê derê dît ku du zilam şer dikin. Yek ji wan ji qewmê wî (îsraîlî) bû û ew ê din jî ji neyarê wî (qibtî) bû. Vêca zilamê ji qewmê wî hawara xwe gihandê da ku li hemberî dijminê wî arîkariya wî bike. Vêca Mûsa jî kulmek lê da, êdî ew kuşt. (Mûsa) got: Ev (kuştin) ji karê şeytên e. Bêguman ew neyar û rêşaşkerekî aşkera ye.

16. Mûsa (poşman bû û) got: Xwedayê min! Bêguman min li xwe zilm kiriye. Li min bibore û gunehên min jê bibe! Êdî Xwedê jî gunehê wî jê bir. Bêguman Xwedê, ew e yê gunehjêbir ê dilovîn.

17. Mûsa got: Xwedayê min! Ji ber wê kerema te li min kirî (ku te ez bexşandim) êdî ez ê ji sûckeran re nebim piştek û arîkar.

18. Êdî Mûsa, di nav bajêr de bi tirs dima, çavdêrî li xwe dikir (da ku ji ber kuştina mirovê Firewn tiştek neyê serê wî). Ji nişka ve dît ew ê ku duh arîkarî jê xwestî, dîsa hawara xwe digihînê. Mûsa jê re got: Bêguman tu rêşaşkerekî aşkera yî!

19. Çi dema Mûsa xwest wî zilamê (qibtî) ku dijminê her duyan bû bi xurtî bigire, (îsraîlî) got: Ey Mûsa! Tu dixwazî min jî bikujî her wekî te duh yek kuşt? Bes dixwazî tu bibî zordarekî xwinrêj û tu naxwazî bibî ji navbeynkaran?!

20. Zilamek ji dûmahîka bajêr bi lez hate cem Mûsa û got: Ey Mûsa! Giregir derbarî te de ray û şêwrê dikin da ku te bikujin, vêca (ji bajêr) derkeve, bêguman ez xêra te dixwazim.

21. Êdî Mûsa bi tirs û saw ji bajêr derket, li xwe çavnêrî dikir û got: Xwedayê min! Min ji vê civata zalim rizgar bike.

22. Dema Mûsa berê xwe da rexê Medyenê (bajarê nebî Şueyb) got: Ez hêvîdar im ku Xwedayê min berê min bide riya rast.

23. Vêca wextê gihîşt ser ava Medyenê, li ser avê birek mirov dîtin ku wan pezên xwe av didan. Ji bilî wan jî du jin dîtin ku wan pezên xwe didan paş. Mûsa (ji wan re) got: We xêr e? Gotin: Heta ku şivan xwe nedin paş, em (xwe naxin nava wan û pezên xwe) av nadin; bavê me jî kalekî pîr e (ji wî pêştir kesekî me nîn e, ji neçarî em hatine ber pez).

**24.** Êdî Mûsa (pezên) wan av da, dûvre pişta xwe da wan, çû ber siyê û wiha dua kir: Xwedayê min! Ez muhtacê qenciyekê me ku tu ji bo min bişînî.[1]

**25.** Paşê yek ji her duyan bi heya û edeb hate cem Mûsa, jê re got: Bavê min gazî te dike, ji ber ku te pezê me av dabû dixwaze heqê te bide te. Vêca dema Mûsa hate cem Şueyb û qiseta xwe jê re got. Şueyb got: Metirse, tu ji wî miletê sitemkar xelas bûyî.

**26.** Ji wan her du keçan yekê got: Bavo! Wî bi şivanî bigire, bêguman ew çêtirîn kes e ku tu bi şivanî bigirî, ew xurt û emîn e.

**27.** Şueyb ji Mûsa re got: Ez dixwazim ji van her du keçên xwe yekê li te mehr bikim, bi şertê ku tu heşt salan li bal min bi şivanî bimînî. Eger tu deh salan temam bikî ew qenciyeke ji cem te ye û ez naxwazim ji te re zehmetiyê çêkim. Xwedê hez bike tu yê min miroveki qencîkar bibînî.

**28.** Mûsa got: Ev di neqeba min û te de ye. Ez ji van her du qewlan kîjanî temam bikim, zêdeyî ji min nayê xwestin. Xwedê li ser qewlê me şahid e.

**29.** Vêca dema Mûsa qewlê xwe temam kir û bi kebaniya xwe re derket rê, li aliyê (Çiyayê) Tûr agirek dît. Ji kebaniya xwe re got: Hûn (li vir) rawestin, min agirek dît, dibe ku ji wê ez ji we re xeberekê yan jî pêtek agir bînim da ku hûn xwe pê germ bikin.

**30.** Dema hat cem êgir, ji aliyê rastê yê newalê, li wî cihê pîroz ji darê hate gazîkirin: Ey Mûsa! Bêguman ez xweda me; perwerdigarê tevekî alemê me.

**31.** Gopalê xwe biavêje! Vêca dema Mûsa dît ku gopalê wî wek mar bi lez xwe diavêje û diçe, (ji tirsa) revî û li pişt xwe nezivirî. (Me jê re got:) Ey Mûsa! Metirse, bêguman tu ji yên piştrast û emîn î.

**32.** Destê xwe têxe paxila xwe dê spî derkeve, spîtiyeke ne ji nexweşî. Çengê xwe yê ku ji tirsê (vebûye) bi ber xwe ve bikişîne (tirsa te dê biçe), ha ev ji Xwedayê te, ji bo Firewn û giregirên wî du delîl û mucîzeyên binbir in. Bêguman ew her miletekî jirêderketî ne.

**33.** Mûsa got: Xwedayê min! Min şexsek ji wan kuştibû, vêca ez ditirsim ku ew min bikujin.

**34.** Birayê min Harûn ji min bi zimantir e, vêca wek piştevan û arîkar digel min bişîne da ku ew min rast bidêre, Ez ditirsim ku ew bi min bawerî neyînin.

**35.** Xwedê got: Em ê bi birayê te pişta te qayîm bikin û em ê bi ayet û mucîzeyên xwe serdestiyê bidin we, êdî ew nagihîjin we. Hûn û yên ku li pey we tên, teqez dê bi ser bikevin.

**36.** Vêca dema Mûsa bi ayetên me yên aşkera ji wan re hat, gotin: Ev, ji sêreke çêkirî pê ve ne tiştekî din e. Me tiştekî wiha ji bav û bapîrên xwe yên pêşîn nebihîstiye.

1 Ew çend roj bû ku zad di qirika Mûsa re neçûbû xwar, ketibû rewşeke wiha zehmet ku çi biketa destê wî dê bixwara û kê çi bida wî, dê qebûl bikira û bi vê gotina xwe li ber Rebbê xwe digeriya ku zadekî bike qismetê wî.

**37.** Mûsa got: Xwedayê min bêhtir dizane ka kê ji cem wî hîdayet aniye û encama xêrê ka ji kê re ye. Bêguman zalim bi ser nakevin.

**38.** Firewn got: Gelî giregiran! Ez ji bo we, ji xwe pê ve xwedayekî din nas nakim. Ey Haman! De haydê ji bo min li ser heriyê agir pêxe (kerpîçan çêke), ji min re koşkekî lêbike ku ez Xwedayê Mûsa bibînim, lê belê ez guman dikim ku teqez ew ji derewkeran e.

**39.** Firewn û leşkerên xwe bi neheqî xwe li ser axa Misrê mezin dêrane û ji wan we ye ku ew ê li me venegerin.

**40.** Me jî ew û leşkerên wî girtin û di deryayê de werkirin. De binêre encama zaliman ka çawa bûye!

**41.** Me ew kirin serokên ku (xelkê) gazî bal êgir ve dikin û roja qiyametê arîkariya wan dê neyê kirin.

**42.** Me li vê cîhanê lanet (dûrketina ji rehma Xwedê) li wan barand. Roja qiyametê jî ew ji lanetiyan in.

**43.** Sond be, piştî ku me umetên pêşî ji holê rakirin, Me kitêb da Mûsa ji bo ku ji mirovan re bibe ronahî, rasterêyî û rehmet, da ku ew jê şîretan wergirin.

**44.** Dema em digel Mûsa axivîn, tu (ey Muhemmed) ne li aliyê rojavayê Çiyayê Tûr bûyî û tu li wir jî ne hazir bûyî.

**45.** Lê belê me gelek umet afirandin, vêca bi ser wan de demên dirêj derbas bûn. Tu di nav xelkê Medyenê de niştecih jî nebûyî ku tu ji wan re bixwînî, lê belê me tu bi pêxemberî hinartî (û me serpêhatiyên wan ji te re dan zanîn).

**46.** Dema me bangî Mûsa kir jî tu ne li kêleka (Çiyayê) Tûr bûyî. Lê belê Xwedayê te ji dilovaniya xwe (wehî ji te re şand; tu kirî pêxember) da ku tu xelkekî ku beriya te tu pêxember ji bo wan nehatibûn, hişyar û agahdar bikî; hêvî heye ew tê bigihîjin û li xwe bizivirin.

**47.** Eger ku ne ji ber vê hênceta kafiran bûya; dema ku bi sedema kufra xwe hatin ezabdayin, vêca bibêjin: Xwedayê me! De bila Te pêxemberek ji me re şandibûya, vêca me jî bidaya pey ayetên te û em bibûna ji bawermendan (me tu bi pêxemberî ji wan re nedişand).

**48.** Vêca dema ji cem me heq (Quran) ji wan re hat, gotin: De bila ya ji bo Mûsa hatî ji wî re jî bihatiya? Baş e, qey wan a ku hê berê ji Mûsa re jî hatibû dayîn mandel nekiribûn? Qey wan negotibû: Ev her du (Muhemmed û Mûsa) du sêrbaz in piştevaniya hev dikin û gotin; bêguman me bi herduyan jî bawerî nîn e.

**49.** Bibêje: Eger bi rastî hûn rastgo ne, naxwe hûn jî kitêbekê ji (cem) Xwedê bînin ku ew ji her duyan (Quran û Tewratê) rasttir be, vêca da ku ez bidim pey wê!

**50.** Eger ew bersiva te nedin, bizane ku ew tenê li pey hewesên xwe diçin. Qey ji wî kesî kî rêşaştir e ku bêyî rêzanekî ji Xwedê jê re hebe, li pey hewesa xwe biçe? Bêguman Xwedê civata zalim rasterê nake.

**51.** Sond be, me ayetên Quranê li dûv hev, ji bo wan hinart da ku ew jê şîretan wergirin.

**52.** Ew ên ku berî Quranê me kitêb dane wan bawerî bi vê Quranê jî tînin.

**53.** Dema Quran ji wan re tê xwendin, dibêjin; me bawerî pê anî. Bêguman ew heq e, ji cem Xwedayê me hatiye. Bêguman berî wê jî em misliman bûn.

**54.** Ha ji ber sebra wan du caran xêr ji wan re tê dayîn. Ew neqenciyê bi qenciyê didin alî û risqê ku me daye wan jî ji bo rizaya Xwedê xerc dikin.

**55.** Dema ew gotina pûç/kelevajî dibihîzin, berê xwe jê vedigerînin û dibêjin: Karên me ji me re û karên we ji we re. Ji me emîn bin û em ji xêrê pê ve li we nazivirînin, em naxwazin têkilî nezanan bibin.

**56.** Tu nikarî yê ku tu jê hez dikî bînî hîdayetê, lê belê Xwedê kî bivê wî tîne hîdayetê û ew çêtir dizane; ka kî li ser hîdayetê ye.

**57.** Gotin: Eger em digel te bidin pey riya rast, em ê ji welatê xwe bêne derxistin. (Xwedê dibêje:) Qey me ew li cihekî ku (zilm) lê heram û li cihekî ewle cîwar nekirin ku ji kerema me ji her cihî fêkiyên her tiştî bi bal ve tên? Lê belê pirên wan nizan in.

**58.** Me gelek welat wêran kirin bi sedema ku bitrî kirin û ji ser xwe ve çûn. Vêca ha ev warên wan in, kavil in! Piştî wan ava nebûne -ku bi rêbiwarî nebe- kes di wan de niştecih nebûye û em bûne mîratgirên wan.

**59.** Xwedayê te tu welatî wêran nake heta ku pêxemberekî ji wan re neşîne, da ku ayetên me ji wan re bixwîne. Jixwe me tu welat ji navê nebirine eger ku xelkê wî bi xwe ne zalim bin.

**60.** Her tiştekî Xwedê daye we vêca ew xeml û pêxweşiya jiyana dinyayê ye û ya ku li cem Xwedê ye, ew jê çêtir û daîmîtir e. Erê ma hê jî hûn aqil nagirin?

**61.** Ma ew ê ku me ji cem xwe peymana bi bihiştê jê re daye ku her dê bigihîjê, weke wî kesî ye ku me pêxweşiya jiyana dinyayê dayê, paşî roja qiyametê ew bibe ji yên ku di dojehê de tên civandin.

**62.** Wê roja ku Xwedê gazî wan dike û dibêje: Ka ew hevpişkên ku bi derew we ji bo min çêdikirin li ku ne?

**63.** (Wê rojê) Ew ên ku ezab ji wan re pêdivî bûye, dibêjin: Xwedayê me! Ha ev ê han in, ew ên ku me ew ji rê xistine, çawa em ji rê ketibûn her wiha me ew jî ji rê xistin. Em li cenabê te aşkera dikin ku em ji (sûcên) wan bêrî û dûr in. Jixwe wan perestina me nedikir (belkî wan perestina dilxwaziyên xwe dikir).

**64.** (Wê rojê) Ji wan re tê gotin: De haydê gazî wan hevpişkên xwe bikin! Ew jî gazî wan dikin, lê belê ew (pût) neşên bersiva wan bidin. Dema ew (li pêşberî xwe) ezab û dojehê dibînin (hingî ji dil poşman dibin û dibêjin:) xwezî em li dinyayê li ser riya rast bûna.

**65.** Wê rojê Xwedê gazî wan dike, dibêje: We çi bersiv da pêxemberan?

**66.** Ha wê rojê temamê delîlan ji ber wan tên veşartin, ew ê nikaribin ji hev jî bipirsin.

**67.** Vêca çi kesê tobe bike, bawerî bîne û karê qenc bike, hêvî heye ku ew bibe ji yên ku serfiraz bûne.

**68.** Xwedayê te, yê ku bivê diafirîne û wî ji dostaniya xwe re dibijêre. Ji wan re mafê bijartinê tune ye. Xwedê ji her kêmasiyê pak û munezeh e û ji ya ku jê re dikin hevpişk bilind û dûr e.

**69.** Xwedayê te bi ya ku ew di sînga xwe de vedişêrin û bi ya ku aşkera jî dikin, dizane.

**70.** Ha ew xwedê ye, ji Wî pê ve tu îlah tun in. Hemd û spasî li dinya û axretê her ji bo Wî ye. Hukm û ferman her ên Wî ne û hûn ê her bi bal wî ve bên vegerandin.

**71.** Bibêje: De ji min re bibêjin, eger Xwedê heta roja qiyametê şevê li ser we bihêle, ji bilî Xwedê kî îlah heye ku ji we re rojê bîne? Erê ma hê jî hûn guhê xwe venakin û tênagihîjin?

**72.** Bibêje: De ka ji min re bibêjin, eger Xwedê heta roja qiyametê li ser we rojê bihêle jî, ji bilî Xwedê kîjan îlah (ên ku hûn bi wan diperizin) heye ku ji we re wê şevê bîne ku hûn tê de bêhna xwe berdin? Erê ma hê jî hûn nabînin?

**73.** Xwedê, ji dilovaniya xwe ji bo we şev û roj afirandine da ku hûn bi şevê bêhna xwe berdin û (bi rojê jî) ji kerema wî li risqê xwe bigerin û da ku hûn (di şev û rojê de) spasiya (nîmetên) Wî bikin.

**74.** Wê roja ku Xwedê gazî wan dike û dibêje: Ka ew hevpişkên ku bi derew we ji bo min çêdikirin, li ku ne (de ka bila arîkariya we bikin)?

**75.** (Wê rojê) Em ji her umetekê şahidekî derdixin û dibêje: Ka delîl û nîşanên xwe bînin (ku ji Xwedê re hevpişk hene)?! Vêca yeqîn zanîn ku heqqî her ji bo xweda ye û ew hevpişkên ku lêdianîn û texmîn dikirin ji ber wan winda bûn.

**76.** Bêguman Qarûn ji gelê Mûsa bû. Vêca xwe li ser miletê xwe mezin dêra û li wan zilm kir. Me hin gencîneyên wisa dabûn wî ku (hilgirtina) kilîtên wan ji desteyeke xurt re jî zor û giran dihat. Gelê wî jê re got: Çavsoriyê meke û bitir mebe! Bêguman Xwedê ji çavsor û bitran hez nake.

**77.** Bi wî malê ku Xwedê daye te mala axretê bixwaze. Lê belê para xwe ji cîhanê jî ji bîr neke. Xwedê wekî ku qencî li te kiriye tu jî wisa qenciyê (li xelkê) bike û li erdê xerabiyê nexwaze. Bêguman Xwedê ji mufsidan hez nake.

**78.** Qarûn got: Ew (serwet û mal) tenê bi zanîna min ji min re hatiye dayîn. Qey Qarûn nizanîbû ku Xwedê ji wan umetên beriya wî, gelek miletên jê bihêztir û têrmaltir jî ji navê biribûn? Gunehkar (roja qiyametê) ji gunehên xwe nayên pirsyarkirin (lewra Xwedê bi gunehên wan dizane, bes ji bo li xwe mikur werin û pîs bibin têne pirsyarkirin).

**79.** Qarûn bi îhtîşam û xemla xwe derket pêşberî gelê xwe. Ew ên ku jiyana cîhanê dixwestin, gotin: Xwezî wekî ya ji Qarûn re hatiye dayîn ji me re jî hebûya. Bêguman ew xwedan hebûneke mezin e!

**80.** Ew ên ku zanîn ji wan re hatibû dayîn, ji wan re wiha gotin: Xwelî li serê we be! Qenciya Xwedê ya ji bo wî kesê ku bawerî bîne û karê qenc bike çêtir e. Ew jî tenê ji sebirkêşan re tê dayîn.

**81.** Vêca me Qarûn bi mal û xanî ve di erdê de bire xwarê. Êdî jê re tu desteyek

nebû ku li hemberî Xwedê arîkariya wî bike û wî bi xwe jî nekarî arîkariya xwe bike.

**82.** Ew ên ku hê duh dixwestin (ew) li şûna Qarûn bûna, digotin: Hey wax! Rast e, Xwedê ji evdên xwe kê bivê risqê wî fireh dike (û kê bivê risqê wî) teng dike. Eger Xwedê kerem li me nekira dê em jî bixistina binê erdê. Hey wax! Rast e, kafir bi ser nakevin.

**83.** Ha ew mala axretê! Em wê didin ên ku li erdê bitrî û fesadiyê naxwazin. Encama (herî rind) ji bo teqwadaran e.

**84.** Kî (roja qiyametê) bi qenciyekê were, jê re xelateke ji wê çêtir heye. Kî jî bi neqenciyekê were, vêca ew ên ku neqenciyan bikin, tenê bi qasî ya ku kirine ceza dixwin.[1]

**85.** (Ya Muhemmed!) Bêguman ew Xwedayê ku Quran li ser te ferz kiriye, misoger dê te (dîsa) vegerîne wî cihê ku tu (dixwazî) lê vegerî. Bibêje: Xwedayê min bêhtir dizane ka kî li ser hîdayetê ye û kî jî di nav rêşaşiyeke aşkera de ye.

**86.** Te hêvî nedikir ku ev Quran ji te re were wehîkirin. Lê belê ev ji Xwedayê te her rehmetek e. Naxwe zinhar, ji kafiran re nebe arîkar!

**87.** Piştî ayetên Xwedê ji te re hatin hinartin, êdî zinhar bila ew muşrik te ji wan ayetan venegerînin. Tu (xelkê) vexwîne bal (dînê) Xwedayê xwe ve û zinhar tu nebe ji muşrikan!

**88.** Digel xwedê ji tu îlahan re îbadetê neke. Ji bilî wî tu îlah tun in. Ji xwedê pê ve her tişt fanî ye û namîne. Hukm û ferman her jê re ye û hûn ê her bi bal ve vegerin.

## 29. SÛREYÊ ENKEBÛT

Sûreyê Enkebût, 69 (şêst û neh) ayet e. Li Mekkê daketiye. Enkebût bi mehneya pîrevokê ye. Ji ber ku di ayeta 41'em de teşbîha karê kafiran bi tevna pîrê hatiye kirin ji vî sûreyî re Enkebût hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Elîf. Lam. Mîm.

**2.** Erê ma ji mirovan we ye ku ew bibêjin: 'Me bawerî anî' dê dev ji wan bê berdan û ew ê neyên ceribandin?

**3.** Sond be, me ew ên beriya wan jî ceribandine. Naxwe Xwedê muheqeq dê rastbêjan derîne rastê, teqez dê derewkeran jî derîne holê.

1 Pêxember wiha ferman dike:"Kî, di îslamê de adetekî qenc derîne holê, pê emel bike xêra wê ji wî re ye, hem jî bi qasî xêra kesê ku piştî wî jî pê emel bike jê re heye û tiştek ji xêra wan jî kêm nabe. Kî, di îslamê de adetekî neqenc derîne holê, pê emel bike gunehê wê ji wî re ye, hem jî bi qasî gunehê kesê ku piştî wî pê emel bike jî jê re guneh heye û tiştek ji gunehên wan jî kêm nabe". Muslim

4. Yan jî ma ew ên ku gunehan dikin guman dikin ku em nikarin wan bidin ezabê? Ev hukmê ku pê hukim dikin çiqas pîs e.

5. Ew kesê çûyîna huzûra Xwedê hêvî bike, vêca birastî ew civanê ku Xwedê (jê re) diyar kiriye muheqeq dê were. Xwedê bihîzer e, zana ye.

6. Ew kesê ku cehdê bike, vêca ew tenê ji bo xwe cehdê dike. Bêguman pêdiviya Xwedê bi kiryarên alemê tuneye.

7. Ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirine, bêguman em ê gunehên wan ji ser wan bibin û em ê xelatekî sipehîtir ji ya kû wan kirin bidin wan .

8. Me ferman li însanan kir ku li dê û bavên xwe qenciyê bikin. Eger ew bi te re têbikoşin da ku ew tiştê ku zanebûna te pê tune ye tu ji min re bikî heval û hevpişk, vêca hingê bi gotina wan meke. Vegera we her bi bal min ve ye, vêca ez ê bi ya ku we dikir, we agahdar bikim.[1]

9. Ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirine, teqez em ê wan bixin nav qencîkaran.

10. Ji mirovan hin hene ku dibêjin: "Me, bawerî bi Xwedê aniye", lê belê gava ku ji bo Xwedê bêne êşandin, îşkenceya mirovan wekî ezabê Xwedê digirin. Eger ku serkeftinek ji Xwedayê te were, teqez dê bibêjin: "Em bi we re bûn". Erê ma Xwedê ne zanatirê bi ya di sînga alemê de ye?

11. Sond be, Xwedê teqez dê bizanibe ka kê ji dil û can bawerî aniye û teqez dê bizanibe ka kî jî munafiq bûye.

12. Ew ên kafir bûne ji bawermendan re dibêjin: Bidin pey riya me, em ê gunehên we jî hilgirin. Hal ev e ku ji gunehên wan ew nikarin tiştekî hilgirin. Bêguman ew derewker in.

13. Sond be, ew (kafir) teqez dê gunehên xwe û digel gunehên xwe gunehên wan ên ku ew ji rê birine jî hilgirin! Bêguman ew ê roja qiyametê ji îftîrayên ku kirin jî bêne pirsiyarkirin!

14. Sond be me Nûh ji gelê wî re şand, ew pêncî kêm hezar sal di nav wan de ma, vêca di rewşa ku wan zulim dikir tofanê ew hingaftin.

15. Lê belê Me Nûh û xelkên di keştiyê de reha kirin û me ew kire îbretek ji bo alemê.

16. Me Îbrahîm jî ji gelê wî re) şand. Wî ji gelê xwe re wiha got: Îbadetê Xwedê bikin û xwe ji ezabê Wî biparêzin. Eger hûn zanibin, ev ji we re çêtir e.

17. Bi rastî ji bilî Xwedê hûn bes ji pûtan re îbadetê dikin û hûn gotinên bêbinyat lêtînin. Bêguman ew pûtên ku ji bilî Xwedê hûn Îbadetê wan dikin, ew nikarin

1 Ji Sa'd kurê Ebû Weqqas dibêje: Ez şexsekî wisa bûm ku min pir qencî li diya xwe dikir. Vêca gava ez misliman bûm. Gote min: Hey Sa'd! Ev çi dîn e ku te xwe pê girtiye? Yan tu dê dev ji vî dînî berdî, yan jî ez tiştekî naxwim heya ez bimrim. Sa'd dibêje: Diya min rojek û şevekê wisa ma û nexwar. Lê bû sibeh û ji hal ket. Piştre roj û şeveke din jî nexwar. Min jê re got: Dayika min! Ez bi Xwedê sond dixwim tu jî baş dizanî ku sed ruhên te hebin û yek bi yek ruhên te derkevin jî ezê ji bo te dev ji dînê xwe bernedim! Vêca heke tu bivî bixwe û heke tu bivî nexwe. Çi gava wê ev rewş dît, xwar. Vêca Xwedê ev ayet di bara vê yekê de nazil kir.

risqê we bidin. Vêca hûn risqê xwe ji Xwedê bixwazin, Îbadetê Wî bikin û wî bişêkirînin; hûn ê bi bal ve bêne vegerandin.

18. Eger hûn bawerî neyînin vêca bi rastî umetên beriya we jî bawerî neanîbûn. Li ser pêxember ji bilî teblîxa îslamê tu erkeke din tuneye.

19. Erê ma ew nabînin ku çawa Xwedê ji tuneyî mirov afirandine piştî (mirinê) dîsa dê wan vegerîne? Bêguman ev li ber Xwedê hêsan e.

20. (Ji wan re) Bibêje: Ji xwe re bigerin, vêca binêrin ka çawa Xwedê cara pêşî ji tuneyî mirov afirandine, paşê Xwedê nifşê axretê jî diafirîne. Bêguman Xwedê li ser her tiştî kara ye.

21. Xwedê kî bivê dide ezabê, kê jî bivê lê tê rehmê. Hûn ê bes li Xwedê bêne vegerandin.

22. Hûn ê, ne li ser erdê ne jî li asîmên Xwedê naçar nehêlin. Ji Xwedê pê ve ji bo we ne dost û ne jî arîkarek heye.

23. Ew ên ku ayetên Xwedê û çûna hizûra wî mandel kirin, ha ew ji rehma min bêhêvî bûne û ji wan re ezabekî dijwar heye.

24. Bersiva gelê Îbrahîm bes (ev) gotina wan bû: Îbrahîm bikujin, an jî bisojin! Lê belê Xwedê ew ji êgir xelas kir. Bi rastî di vê de, ji bo civateke ku bawerî bîne, îbret hene.

25. (Îbrahîm ji wan re) Got: Bêguman ev a ku ji bilî Xwedê hûn pûtan dihebînin, ev di navbera we de hezjêkirineke dinyewî ye (teqez ev dê bi dawî bibe û dê were birîn). Paşê roja qiyametê hinek ji we dê hinekan înkar bikin û hûn ê lenetê li hev bînin. Êwirgeha we dojeh e û ji bo we tu arîkar jî tun in.

26. Vêca Lût bawerî bi Îbrahîm anî. Îbrahîm wiha got: Bêguman ez ê hicretî bal Xwedayê xwe ve bikim. Bêguman Xwedayê min serdest e zanaye.

27. Me Îshaq û Yeqûb bexşî Îbrahîm kirin, Me pêxemberî û kitêb di kinêsa wî de gerandin, Me padaşa wî li cîhanê dayê û bêguman ew li axretê jî ji qencîkaran e.

28. Me Lût jî ji gelê wî re) şand. Wî ji gelê xwe re wiha got: Bi rastî hûn fehîşetiyeke wisa dikin ku beriya we ji alemê tu kesî ew (fehşîtî) nekiriye!

29. Erê ma hûn diçin cem zilaman, hûn riya dibirin û di civînên xwe de bêtoretiyê dikin?! Bersiva gelê wî tenê ev gotina wan bû: Eger bi rastî tu rast dibêjî de haydê ezabê Xwedê ji bo me bîne!

30. Lût wiha dua kir: Xwedayê min! Li hemberî vê civata jirêderketî arîkariya min bike.

31. Gava qasidên me mizgînî ji Îbrahîm re anî (jê re wiha) gotin: Em ê gelê vî welatî (Sedomê yê gelê Lût) helak bikin. Bêguman gelê wî her sitemkar in.

32. Îbrahîm ji qasidan re got: Ma ne Lût tê de ye! Qasidan got: Em bêhtir dizanin ka kî tê de ye. Misoger em ê Lût û malbata wî rizgar bikin, ji bilî jina wî; ew bû ji yên hilakbûyî.

33. Dema qasidên me hatin cem Lût, ew (ji tirsa destdirêjiya li ser wan) bi hatina wan xemgîn bû û ji taqet ket. Qasidan jê re got: Metirse û xemgîn mebe!

Bêguman em ê te û malbata te rizgar bikin, ji bilî jina te; ew ji yên ku helak bûne.

**34.** Bêguman em ê bi ser xelkê vî welatî de, ji ber jirêderketina wan ezabekî (dijwar) ji esmên bînin xwarê.

**35.** Sond be, me ji wî gundî ji bo miletekî ku tê bigihîje nîşaneke aşkera hêlaye.

**36.** Me ji (gelê) Medyenê re jî birayê wan Şueyb şand û wî wiha got: Gelî miletê min! Îbadetê Xwedê bikin, hêviya xwe bi roja axretê ve girêbidin û li ser rûyê erdê bi fesadî tevdanê dernexin!

**37.** Lê belê wan bi Şueyb bawerî neanî, vêca wê erdheja cansoj ew girtin, îcar di xaniyê xwe de li ser çokan kumişî man.

**38.** Me Ad û Semûd jî (birin helakê). Teqez ji bo we (ya hatî serê wan) ji cih û warên wan aşkera tê zanîn. Bêguman şeytan ji wan re kirinên wan spehî nîşan dan û ew ji riya heq deranîn. Hal ev e ku ew bi xwe bîrewer bûn.

**39.** Me Qarûn, Firewn û Haman jî (birin helakê). Sond be, Mûsa ayet ji wan re anîbûn, vêca wan li ser erdê xwe qure kirin û ew nikarin zora me bibin.

**40.** Me her yek ji wan ji ber gunehên wan, bi ezab ew girtin. Hin ji wan me kevir bi ser wan de barandin, hin ji wan qîrîna cansoj ew hingaftin, hin ji wan me ew di erdê de birin xwarê û hin ji wan me ew di avê de xeniqandine. Xwedê ne ew e ku zilmê li wan bike, lê belê ew bi xwe zilmê li xwe dikin.

**41.** Mînaka wan ên ku ji bilî Xwedê ji xwe re dost û arîkar girtine, eynî mîna konê tevnepîrê ye. Hal ev e ku mala herî qels mala tevnepîrê ye. Eger wan ev zanibaya (dê perestina wan pûtan nekiribûna).

**42.** Bêguman Xwedê dizane ku ew ên ji bilî Xwedê ji wan re îbadetê dikin, ne tiştek in. Her Xwedê ye yê serdest, yê xweyhîkmet.

**43.** Em van mînakan ji bo mirovan derb û mesel tînin, ji yên zana pê ve kes tê nagihîjin.

**44.** Xwedê erd û asîman bi rastî afirandine. Bêguman di vê de ji bo bawermendan nîşanek heye.

**45.** (Ya Muhammed!) Ev wehya ku ji vê Quranê ji te re hatî bixwîne û bi awayê pêdivî nimêj bike. Bêguman nimêj mirov ji neqencî û bêtoretiyan dûr digire û birastî zikrê xwedê (ji her tiştî) mezintir e. Xwedê bi ya ku hûn dikin dizane.

**46.** Li hember ehlîkitêban bi ya herî spehî tê bikoşin. Lê belê ew ên ku ji wan zilm kirin, ew cuda ne. Bibêjin: Me bi ya ku ji me re hatiye hinartin û bi ya ku ji we re jî hatiye hinartin bawerî aniye, Xwedayê me û Xwadeyê we yek e û em jê re berdest bûne.

**47.** (Çawa me ji yê beriya te re hinartiye) her wisa me ji te re jî kitêb hinartiye. Vêca ew ên ku me kitêb ji wan re hinartiye bawerî pê tînin û ji van jî yên ku bawerî tînin hene. Ji kafiran pê ve kes ayetên me mandel nake.

**48.** Te beriya vê Quranê, ne nivîsek dixwend ne jî bi destê xwe xetek dinivîsand.

Eger te xwendin û nivîsîn zanîbûya, wê demê kafiran der barê wê de dê guman bikira.

49. Naxêr, belkî ev Quran di sînga wan ên ku ji wan re zanîn hatiye dayîn de nîşanên aşkera ne. Ji yên zaliman pê ve tu kes ayetên me mandel nake.

50. Gotin: De bila ji Xwedayê wî hin mucîze jê re bihatina. Bibêje: Mucîze bes li cem Xwedê ne. Bêguman ez tenê hişyarkerekî aşkera me.

51. Erê ma (bi mucîzetî) ne besî wan e ku Me ev kitêb ji te re hinartiye ku ji wan re tê xwendin? Bêguman di vê de ji bo miletekî ku bawerî bîne rehmet û bîranîn heye.

52. (Resûlê min!) Bibêje: Di neqeba min û we de bi şahidî Xwedê bes e. Ew, bi tiştê ku di erd û asîmanan de heye dizane. Ew ên ku bawerî bi ya pûç anîne û Xweda mandel kirine, ha ew ên xesirîne.

53. Ew ji te lezkirina ezab dixwazin. Eger ne ji ber civanekî binavkirîbûya dê ezab ji bo wan bihata. Sond be, teqez ezab ji nişka ve dê bi ser wan de bê û ew li xwe hay nabin.

54. Ew ji te lezkirina ezab dixwazin, bêguman cehenemê dor li kafiran girtiye.

55. Wê rojê ezab dê wan (kafiran) hem ji ser wan ve hem ji bin wan ve wan bigire. Xwedê jî dê ji wan re bibêje: De (cezayê) ya ku we kiriye tehm bikin!

56. Gelî bendeyên min ên ku bawerî anîne! Bêguman erda min fireh e, vêca bi bal erda min ve hicret bikin û her ji min re îbadetê bikin.[1]

57. Her candar dê mirinê tehm bike. Paşê hûn ê li me bêne vegerandin.

58. Ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirin, em ê wan li bihiştê di koşkên bilind de bi cih bikin ku di bin wan re çem diherikin û ew her û her dê li wan bimînin. Çi rind xelat e, xelata yên ku karên qenc kirin!...

59. Ew ên ku sebirkêş in û xwe bes disipêrin Xwedayê xwe.

60. Gelek heywan hene ku risqê wan ne li ser pişta wan e. Xwedê rizqê wan û yê we jî dide. Ew e yê bihîzer, yê zana.

61. Sond be, eger tu ji kafiran bipirsî; yê ku erd û asîmanan afirandine, yê ku roj û heyv stûxwar kirine, kî ye? Teqez dê bibêjin: Xwedê ye. Nexwe ew çima berê xwe (ji îmana pê) vedigerînin?

62. Xwedê, ji bendeyên xwe kê bivê (ji bo ceribandinê) risqê wî fireh dike, kê jî bivê risqê wî teng dike. Bêguman Xwedê bi her tiştî zana ye.

63. Sond be, eger tu ji kafiran bipirsî; ew ê ku ji ewran avê dadixe û erdê -piştî hişkbûna wê- pê hêşîn dike, kî ye? Teqez dê bibêjin: "Xwedê ye". Bibêje: Pesn û şêkirî her ji Xwedê re be, lê belê pirên wan tênagihîjin.

64. Ev jiyana cîhanê tenê kêf û lîstik e. Herçî ku mala axiretê ye, ew jiyana rasteqînê ye, xwezî wan ev bizaniya.

---

1 Misliman, divê li welatekî ku nikaribe îbadetê Rebbê xwe bike, nemîne. Erda Xwedê fereh e. Ev ayeta pîroz dide zanîn ku li ser mirovê misliman ferz e ku hicretî welatê îslamê bike.

65. Vêca dema ku ew li keştiyê siwar dibin, bi dilekî safî ew hawara xwe digihînin Xwedê. Vêca dema Xwedê bi selametî wan derdixe bejê, ha tu dibînî ku wa ye ji Xwedê re şerîkan çêdikin.

66. Bila ew di biwara nîmetên me de nankoriyê bikin û bila xweş bijîn, paşê ew ê bizanin!

67. Ma ew nabînin ku me (welatê wan Mekke) kiriye warekî rêzdar û ewle? Hal ev e ku li hawirdora wan mirov têne revandin (têne kuştin û dîl têne girtin). Erê ma hê jî ew bi pûçiyê bawer dikin û der barê nîmetên Xwedê de nankorî dikin?

68. Erê ma ji wî kesê ku li ser navê Xwedê bi derewî xeber bide, yan jî bi wê wehya ku ji pêxemberê wî re hatiye bawerî neyîne, zalimtir kî heye? Erê ma di cehenemê de ji bo kafiran cih tune ye?!

69. Ew ên ku ji bo me cîhad kirin, teqez em ê wan li ser rêkên xwe rasterê bikin. Bêguman Xwedê her bi qencîkarên rast û durist re ye.

## 30. SÛREYÊ RÛM

Sûreyê Rûm, 60 (şêst) ayet e. Li Mekkê daketiye. Ji ber ku Sûreyî behsa rûmiyên ku di şerê li hemberî mecûsiyan kiribûn û tê de têkçûbûn, dike jê re Sûreyê Rûm hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Elîf, Lam, Mîm.

2. Rûm, hate şikandin (bi destê fursê/farisan).

3. Li erda herî nêzîk. Ew piştî vê têkçûnê dê bi serkevin.

4. Ev (serkeftin) jî di nava çend salan de çêdibe. Emr û ferman di serî û dawî de her ji bo Xwedê ye. Di wê rojê de bawermend jî dilşad dibin...

5. Bi arîkariya Xwedê. Ew kê bivê arîkariya wî dike. Her Xwedê ye yê serdest, yê dilovîn.

6. (Ev serkeftin) peymana Xwedê ye. Xwedê ji peymana xwe venagere, lê belê pirên mirovan nizanin.

7. Ew jiyana cîhanê ya li ber çavan dizanin, ew bi xwe ji jiyana axretê bêhay in.

8. Erê ma ew di çêkirina xwe de nafikirin. Xwedê erd û asîman û yên ku di navbera wan de hene bes bi heqî û ji bo demeke navlêkirî afirandine? Bêguman ji mirovan pir kes hene ku bi çûna ber destê Xwedê bawerî nayînin.

9. Ma ew li ser rûyê erdê negeriyane, vêca ku binêrin ka encama umetên beriya wan çawa bûye? Ku ew bi xwe jî, ji wan xurttir bûn û wan erd bêhtir çandibûn û bêhtir avasaz kiribûn. Pêxemberên wan jî ji wan re gelek delîl û mucîzeyên aşkera anîbûn. Vêca Xwedê ne ew bû ku zilmê li wan bike, lê belê wan bi xwe zilm li xwe dikir.

**10.** Paşê domahîka gunehkaran ji ber ku wan bi ayetên Xwedê bawerî neanîbû û pê tinaz dikirin, bû pîstirîn domahîk.

**11.** Xwedê pêşî dest bi afirandinê dike, piştre wî vedijîne, paşê hûn ê bi bal ve bêne vegerandin.

**12.** Roja ku qiyamet radibe, gunehkar bêhêvî û bêdeng dimînin.

**13.** Ji wan hevpişkên (ku ji bilî Xwedê ew dihebandin) tu kes ji bo wan nabe mehdervan û ew ê hevpişkên xwe jî mandel bikin.

**14.** Roja qiyamet radibe, wê rojê (mumîn û kafir) ji hev vediqetin.

**15.** Vêca herçî ew ên ku bawerî anîne û karên qencî kirine, ew di nav baxçeyên bihiştê de tên kêfxweşkirin.

**16.** Herçî ew ên ku kafir bûne û wan bi ayetên me û bi roja qiyametê bawerî neaniye, vêca ha ew di ezab de tên komkirin.

**17.** Êdî dema li we bû êvar û dema li we bû sibeh Xwedê ji her kêmasiyê pak bidêrin.

**18.** Li erd û asîmanan pesn û şêkirî her jê re ye û paşiya rojê û dema ku ro li we dibe roj li nîvro.[1]

**19.** Xwedê, yê sax ji yê mirî derdixe û yê mirî jî ji yê sax derdixe, ew erdê piştî mirina/hişkbûna wê zindî dike û her wisa hûn jî dê (ji gorên xwe) bêne deranîn.

**20.** Ji nîşanên (qudreta) Xwedê ye ku hûn ji axê afirandine, piştre hûn bûne mirov û (li ser erdê) belav dibin.

**21.** Ji nîşanên (qudreta) Xwedê ye ku ji bo we, ji we bi xwe jin afirandine da ku sebir û hedana we bi wan bê û hezkirin û lihevbanîn di navbera we de peyda kiriye. Bêguman di vê de ji bo miletekî ku bifikirin, îbret hene.

**22.** Ji nîşanên (qudreta) Xwedê ye ku erd û asîman afirandine, zimanên we û rengên we ji hev cuda çêkirine. Bêguman di vê de ji bo mirovên zana ders û îbret hene.[2]

**23.** Ji nîşanên (qudreta) Xwedê ye ku hûn di şev û rojê de radizin û hûn di wan de ji kerema Xwedê daxwaza risqê xwe dikin. Bêguman di vê de ji bo miletekî ku guhdarî bikin, îbret hene.

**24.** Ji nîşanên (qudreta) Xwedê ye ku birûskê bitirs û bihêvî nîşanî we dide. Ji ewran

1 Ebdullahê kurê Ebbas gotiye: Her pênc nimêjên ferz di van herdu ayetan de hatine diyarkirin, lewra; di hevoka “dema li we bû êvar du nimêj; mexreb û ‘îşa, di ayeta “li we bû sibeh” de nimêja sibehê heye. Di ya paşiya rojê de, nimêja esrê heye û di ya dema nîvro de jî nimêja nîvroyê heye.

2 Newekhevbûna zimanê mirovan dide nîşan ku xaliqê wan çi qas mezin û ḥekîm e. Lewra digel ku eslê wan yek e jî lê dîsa zimanê wan û rengê wan ne yek în. Bi rastî ev ayet, bi kurtî ramana îslamê ya di bara ziman û rengan de eşkere dike. Her wiha dide zanîn ku di îslamê de ziman tev wekhev bi nirx in û navgîna ji hev fêmkirinê ne. Li gorî fehma ji vê ayetê, însanê ku inkara zimanekî bike her wekî ku inkara nîşanekê ji nîşanên qudreta Xwedê bike û li ber xaliqiyeta Xwedê rabe. Mirovê ku zimanekî qedexe bike û milletekî asîmîle bike ew her wekî ku nîşanekî ji nîşanên Xwedê ji holê rake lû hikmeta wî qebûl neke. Hîç mafê tu kes û çi sazûmanê tun e ku bi tu behaneyê xeberdana milletekî bi zimanê wî û perwerdeya wî qedexe bike.

avê dibarîne û bi wê piştî hişkbûna erdê, wê hêşîn dike. Bêguman di vê de ji bo miletekî ku têbigihîjin îbret hene.

**25.** Ji nîşanên (qudreta) Xwedê ye ku erd û asîman bi fermana Wî xwe radigirin. Paşê gava (roja qiyametê) bi yek gaziyekê gazî we bike, di cih de hûn ê ji gorên xwe bêne der.

**26.** Çiqas tiştên li erd û asîmanan hene ew tev yên Xwedê ne. Tev li ber fermana Wî amade ne.

**27.** Ew Xweda ye yê ku ji nebûnê mexlûq çêkirine û paşê dê wî vejîne. Ev vejandin jê re ji ya ewil hêsantir e. Li erd û asîmanan pesnên herî bilind ên Xwedê ne. Her Ew e yê desthilat, yê xweyhîkmet.

**28.** (Xwedê) ji bo we derb û meseleyekê ji we tîne; ma kî ji we razî dibe ku koleyê we di wî malê ku me daye we de bibe hevpişkê we. Vêca ku hûn û ew tê de wekhev bin, ka çawa hûn ji hev ditirsin hûn ji wan jî bitirsin. Her wisa ji bo miletekî ku têdigihîjin em ayetên xwe berfireh aşkera dikin.[1]

**29.** Naxêr, belkî ew ên ku zalim bûne, bi nezanî dane pey arezûyên xwe. Vêca ew kesê ku Xwedê wî ji rê bixe ew kî ye wî rasterê bike? Ji bo wan tu arîkar jî tun in.

**30.** Tu berê xwe rast û durist, bêfetl û vîç bide dînê heq; xwe bi fitreta ji cem Xwedê bigire, ew fitreta ku Xwedê însan li serê çêkiriye. Ji afirandina Xwedê re guhartin tune ye. Ha ev e dînê rast û durist, lê belê pirên mirovan nizanin.

**31.** Hûn tev (bi îxlas û tobê) li Xwedayê xwe vegerin, bi nekirina gunehan xwe jê biparêzin, bi awayê pêdivî nimêj bikin û nebin ji muşrikan…

**32.** Nebin ji wan ên ku dînê xwe ji hev parçe kirin û bûne bend û civat ku her hevbendiyek bi ya li cem xwe dilşad dibe.

**33.** Dema tengezariyek bi ser mirovan de were, li Xwedayê xwe vedigerin û lavelavê jê dikin. Piştre dema ku Xwedê ji cem xwe nîmetekî bi wan bide tehmkirin, tu dinêrî ku berek ji wan ji Xwedayê xwe re şerîkan çêdikin.

**34.** De bila ew li biwara nîmetên ku me dane wan nankoriyê bikin û vêca bila xweş bijîn, paşê ew ê bizanin.

**35.** Yan jî ma Me delîlek ji wan re aniye xwarê, ku ew delîl ji wan re, ji ya ku ew ji Xwedê re dikine şerîk xeber dide?!

**36.** Dema em xweşiyekê bi mirovan bidin çêjkirin, ji ser xwe ve diçin û eger bi sedema ya ku destên wan kiriye belayek were serê wan, di cih de ew bêhêvî dibin.

**37.** Ma ew bi xwe nabînin ku Xwedê kê bivê risqê wî fireh dike, kê jî bivê risqê wî teng dike. Bi rastî di vê de ji bo civateke ku bawer bikin, ders û îbret hene.

---

1 Ev ayeta pîroz dîmenekî zindî ji bom e tîne da ku rind têbighijin. Mirovê azad, razî nabe ku di van çend rojên di dinyayê de mirovekî kole û xizmetkar bike şerîk û xwediyê serweta xwe. Çiqas ku ew ji cinsê wî ye jî. Vêca ew ên ku hûn wan ji Xwedê re dikin şerîk, digel ku ew mexlûqê Xwedê ne, Xwedê dê çawa razî bibe ku hûn jê re bikin hevpişk û hevta. Xweda qebûl nake ku çi tişt jê re bibe şerîk. Xwedê di salixên xwe yê ulûhiyyet û rubûbiyyetê de yek e, tek e, bêhimkûf û bêhevta ye.

38. Nexwe tu, mafê xizman, belengazan û rêwiyan bide. Ji bo yên ku li rizaya Xwedê bigerin, ev ya herî rind e. Ha ew in ên ku (li dinya û axiretê) serfiraz in.

39. Ew malê ku we (bi selef) daye xelkê da ku ji malê wan malê we zêde bibe, vêca ew li cem Xwedê qet zêde nabe. Ew a ku we bi zekat daye ku hûn bi wê rizaya Xwedê divên, vêca ha ew in ên ku xêra wan qat bi qat zêde dibe.

40. Xwedê ye yê ku hûn afirandine, piştre risqê we daye, piştre Ew ê we bimrîne, piştre ew ê we vejîne. Erê ma ji nav wanên ku hûn perestina wan dikin yekî ku bikaribe tiştekî ji van bike heye? Xwedê ji ya ku hûn dikine şerîk, pak û bilind e.

41. Ji ber gunehên ku mirovan bi destên xwe kirin, xerabî li bej û behrê xuya bûye, Vêca Xwedê dê hinekî ji ya ku kirin bi wan bide tehmkirin, da ku ew (ji kirinên xwe) vegerin.

42. Bibêje: Li ser rûyê erdê bigerin, vêca binêrin ka domahîka wan miletên berê ku pirên wan muşrik bûn, çawa bû?!

43. Berê xwe bide dînê rast û durist, beriya rojeke wisa werê ku li cem Xwedê jê re veger tune ye! Wê rojê (mirov) kom bi kom dê ji hev biqetin.

44. Kî kafir bibe webalê kafiriya wî jê re ye, kî jî kar û barên qenc bike ew (li bihiştê) cihê xwe bes ji xwe re amade dike.

45. (Ew ji hev diqetin) da ku Xwedê wan ên ku bawerî anî û karên qenc kirin, ji qenciya xwe xelat bike. Bêguman Xwedê ji kafiran hez nake.

46. (Gelî mirovan!) Ji nîşanên (qudreta Xwedê) ye ku bayê wek mizgînber dişîne, da ku hinekî ji dilovaniya xwe bi we bide tehmkirin, da ku keştî bi fermana wî bikişin, ji bo hûn ji kerema wî li risqê xwe bigerin û da ku hûn wî bişêkirînin.

47. (Resûlê min!) Sond be ku me beriya te jî gelek pêxember ji gelên wan re şandin, vêca ew bi mucîze û belge ji gelê xwe re hatin. Îcar Me ew ên ku guneh kirine tol li wan vekir û li ser Me misoger bûye ku Em bawermendan bi ser bixin.

48. Xwedê ye, Ew ê ku bayê dişîne, vêca ew ba ewran radike û dilivîne. Ew çawa bivê wisa li asîmanan belav dike, wan parçe parçe digerîne; êdî tu dibînî ku wa ye baran ji nava wan dibare. Vêca dema Xwedê ji bendeyên xwe kê bivê baranê lê bibarîne, di cih de kêfxweş dibin…

49. Çendî ku ew, beriya baran li ser wan bibare bêhêvî jî bûbûn.

50. Vêca de li berhemên rehma Xwedê binêre; piştî mirina (hişkbûna) erdê ka çawa wê vedijîne? Bêguman ew ê ku erdê sax dike, teqez yê mirî jî sax dike. Bêguman Ew li ser her tiştî qadir e.

51. Sond be, eger ku em bayekî (bi ser çandiniya wan de) bişînin û ew jî çandiniya xwe zerbûyî bibînin, piştî wê zerbûnê teqez dê nankoriyê bikin.

52. Bêguman tu nikarî gotina xwe bi dilmiriyan bidî bihîstin û tu doza xwe nikarî bi yên ker bidî bihîstin dema pişta xwe bidin te û ji te birevin.

53. Tu nikarî dilkoran jî ji rêşaşiya wan vegerênî ser riya rast. Bes tu dikarî (doza xwe) bigihînî wan ên ku bawerî bi ayetên me tînin, vêca ew ji fermana me re berdest in.

54. Xwedê ye, Ew ê ku hûn lewaz afirandine, piştî lewaziyê hûn bihêz û xurt kirine, piştî xurtiyê hûn lawaz û kal kirin. Xwedê çi bivê wê dixuliqîne. Ew e yê 'Elîm yê Qadîr.

55. Roja ku qiyamet radibe, gunehkar sond dixwin ku ew ji demeke pir kin pê ve (li dinyayê) nemane. Ha wan (li dinyayê) wisa berê xwe (ji heqiyê) vedigerandin.

56. Ew ên ku zanîn û îman ji wan re hatiye dayîn (ji wan munkiran re) gotin: Sond be; li gorî nivîsa Xwedê hûn heta roja vejînê man. Vêca ha ev roj roja qiyametê ye, lê belê we nedizanî.

57. Êdî wê rojê lêborînxwestina wan ên ku zalim in tu karî nade wan û ji wan nayê xwestin ku ew Xwedê jî ji xwe razî bikin.

58. Sond be; Me di vê Quranê de ji bo mirovan her texlît mînak aşkera kirine. (Resûlê min!) Bi sond; eger tu ji wan re mucîzeyekê jî bînî teqez ew ên kafirbûne dê bibêjin: Hûn tenê pûçiyê ji bo me tînin.

59. Bi vî awayî Xwedê morê li ser dilên wan ên nezan dixe.

60. Vêca tu sebrê bikêşe, lewra peymana Xwedê heq e. Zinhar bila ew ên ku (bi qiyametê) ji dil bawerî nayînin te sist û bêtebat mekin!

## 31. SÛREYÊ LOQMAN

Sûreyê Luqman, 34 (sih û çar) ayet e. Ji ayetên 27'em, 28'em û 29'em pê ve tev li Mekkê daketine. Ji ber ku tê de qiseya Luqmanê Hekîm hatiye ragihandin, jê re Sûreyê Luqman hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Elîf, Lam, Mîm.

2. Ha ev, ayetên kitêba xwedanhîkmet e.

3. Ew rêber û rehmet e ji bo mirovên qencîkar…

4. Ew ên ku bi awayê pêdivî nimêj dikin, zekata malê xwe didin û ji qinyata dilê xwe bi axretê bawerî tînin.

5. Ha ew li ser hîdayeteke ji cem Xwedayê xwe ve ne û ha ew ên ku (li dinyayê û axiretê) serfiraz û rizgar bûne.

6. Hin ji însanan hene ku gotina kelevajî û pûç dikirîn da ku bêzanîn mirovan ji riya Xwedê derxin û wê ji xwe re bikin tinazok. Ha ew, ezabê riswaker her ji wan re ye.

7. Dema ku ayetên me jê re tên xwendin, ji pozbilindiya xwe pişta xwe dide wan, her wekî ku wî ew ne bihîstibin û her wekî ku di guhên wî de kerîtî hebe. Vêca tu mizgîniya ezabekî cansoj bidê!

8. Bêguman ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirine, ji wan re bihiştên xwedînîmet hene.

**9.** Ew her û her tê de mayînde ne, ev soza Xwedê ye ku tê de guman tune ye û her Ew e, yê desthilat, yê karbinecih.

**10.** Xweda ev asîmanê ku hûn dibînin, bê stûn afirandiye. Çiyayên asê û mikûm di erdê de danîne da ku we nehejîne û tê de her texlît heywan afirandine û ji hev zêde kirine. Me ji ewran avek barandiye, vêca em tê de her texlît giyayên bifeyde hêşîn dikin.

**11.** Ha ev tev mexlûqên Xwedê ne. Vêca de ka nîşanî min bidin ew ên ku ji bilî Xwedê we ew dihebandin ka çi afirandine? Na, belkî yên sitemkar her di rêşaşiyeke aşkera de ne.

**12.** Sond be, me hîkmet daye Loqman, ango şêkiriya Xwedayê xwe bike. Kî şêkiriya Xwedê bike ew ji bo xwe dike. Kî jî nankoriyê bike bila bizane ku Xwedê dewlemend e, hêjayê pesindayînê ye.

**13.** Wê demê Loqman şîret li kurê xwe kir û jê re got: Kurê mino! Ji Xwedê re şerîkan çêneke! Bêguman şerîkçêkirin her zilmeke mezin e.

**14.** Me ji bo dê-bavan ferman li mirovan kir -dayîka wî bi zor û zehmetî ew hilgirtiye û di du salan de bi şîr vekiriye- ango şêkiriya min û şêkiriya dê û bavên xwe bikin. Veger, tenê bi bal Min ve ye.

**15.** Eger dê û bav, bi te re têbikoşin da ku ya tu pê nizanî ji min re bikî şerîk, wê çaxê bi gotina wan meke! (Lê belê dîsa jî) li dinyayê bi wan re xweş derbas bike û bide dûv riya kesê ku bi bal min ve tobe kiriye. Paşê vegera we bes bi bal min ve ye. Wê çaxê ya ku we dikir ez ê we pê agahdar bikim.

**16.** (Loqman got) Kurê mino! Ew tiştê ku tu bikî (çi xêr be çi jî guneh) çendî bi qasî giraniya libeke xerdelê be û di nava zinarekî de be jî, yan li asîmanan be yan jî li erdê be, dîsa Xwedê dê wê bîne (pêşberî te û hesabê wê ji te bipirse). Bêguman Xwedê, lutufkar e, agahdar e.

**17.** Kurê mino! Bi awayê pêdivî nimêj bike, bi ya qenc ferman bike, ji ya neqenc paş ve bide û li hemberî (bela)ya ku were serê te, xwe ragire. Bêguman ev ji karên lazim û pêdivî ne.

**18.** Ji çavsorî berê xwe ji mirovan venegerîne û bi puretî li ser erdê nemeşe. Bêguman Xwedê, ji tu qureyê xwemezindêr hez nake.

**19.** Di rêveçûna xwe de asayî be. Dengê xwe nizm bike. Bêguman dengê herî kirêt dengê kerê ye.

**20.** (Gelî mirovan!) Ma hûn nabînin ku Xwedê li erdê û tiştên li asîmanan hene ji bo we stûxwar kirine û nîmetên xwe yên xuyayî û nexuyayî li ser we reşandine. Ji mirovan hin hene ku bê zanîn, bê rêber û bê belgeyeke ronker der barê Xwedê de xirecir û zimandirêjiyê dikin.

**21.** Dema ji wan re bê gotin: Bidin pey wehya ku Xwedê ew hinartiye, dibêjin: Nexêr, belkî em ê bidin pey ya ku me bavanên xwe li serê dîtiye. Erê ma ku şeytan wan gazî bal agirê bi pêt ve jî bike (ew ê bidin pey wî)?

22. Kî ku xwe bisipêre Xwedê û rast û durist be, vêca bi rastî wî xwe bi qulpa saxlem girtiye û encama kar û baran her bi bal Xwedê ve ye.
23. Kî ku kafir bibe, bila kafiriya wî te xemgîn meke! Vegera wan tenê bi bal me ve ye. Em ê ya ku wan kiriye ji wan re bibêjin. Bêguman Xwedê bi ya di dilan de dizane.
24. Em (li vê dinyayê) hindikî wan diçêjînin, piştre em ê wan biajone ber bi ezabekî giran û dijwar.
25. Sond be, eger tu ji wan bipirsî kê erd û asîman afirandine? Teqez dê bibêjin, Xwedê ye. Bibêje: Hemd ji Xwedê re be, lê belê pirên wan de nezan in.
26. Her tiştên ku li erd û asîmanan hene ew tev yên Xwedê ne. Bêguman Xwedê her ew e yê dewlemend, yê hêjayê pesindayînê ye.
27. Eger birastî çiqas darên li erdê hene qelem bin, derya û bi qasî wê heft deryayên din jî hibra wan bin, (vêca gotinên Xwedê bi wan binivîsin) gotinên Xwedê dê xelas nebin. Bêguman Xwedê ‘Ezîz e, Ḥekîm e.
28. (Gelî mirovan!) Afirandina we û saxkirina we tevekan li cem Xwedê wekî afirandin û saxkirina yek mirovekî ye. Bêguman Xwedê bihîzer e, bîner e.
29. Ma tu nizanî ku Xwedê şevê dixe ser rojê û rojê jî dixe ser şevê, roj û heyv ji fermana xwe re stûxwar kirine û ev tev heya demeke navlêkirî digerin. Xwedê ji ya ku hûn dikin, agahdar e.
30. Ev rewş, ji bo ku hûn bizanin û iqrar bikin ku Xwedê her heq e û ew ên ku ji bilî Xwedê tên hebandin her batil û pûç in û Bêguman Xwedê her ew e yê bilind, yê mezin.
31. Ma tu nabînî ku keştî bi kerema Xwedê di behrê de dikişin da ku hinek ji nîşanên qudreta xwe nîşanî we bide. Bêguman di vê de, ji bo her kesê zêde xweragir û spasdar, ders û nîşan hene.
32. Dema pêlên behrê yên mîna çiyan li wan hatin hev, pêre ji dilekî xalis li ber Xwedê digerin. Gava ku Xwedê ew deranîne bejê û rizgar kirin, vêca hin ji wan kêm dişêkirênin. Ji bilî yê xeddarê nankor kes ayetên me mandel nake.
33. Gelî mirovan! Hay ji fermanên perwerdegarê xwe hebin û ji rojeke wisa bitirsin ku tu bav ji ber zarokên xwe ve û tu zarok jî ji ber bavê xwe ve nayê cezakirin. Bêguman soza ku Xwedê daye heq e. Zinhar bila jiyana cîhanê we nexapîne û bila şeytanê xapînok jî we nexapîne!
34. Birastî zanîna rabûna qiyametê li cem Xwedê ye û baranê Ew dibarîne, ya ku di malzarokan de ye jî Ew pê dizane, qet tu kes nizane ka sibehê ew ê çi qezenc bike û tu kes nizane ew ê li kîjan erdê bimire. Bêguman Xwedê zana û agahdar e.

# 32. SÛREYÊ SECDE

Sûreyê Secde 30 (sih) ayet e. Li Mekkê daketiye. Navê wî ji ayeta 15em tê ku tê de Xwedê pesnê bawermendên dide ku dema ayetên Qurana Mezin dibihîzin, diçin sicûdê dide.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Elîf, Lam, Mîm.
2. Ev Quran -tê de guman nîn e- ji cem Perwerdegarê alemê hatiye hinartin.
3. Belkî ew dibêjin wî ew ji cem xwe lêaniye. Naxêr, belkî ew heq bi xwe ye, ji cem Rebbê te ye, ji bo ku tu pê miletekî hişyar bikî ku beriya te tu hişyarker ji wan re nehatine, hêvî heye ew bêne ser riya rast.
4. Ew Xwedayê ku erd û asîman û yên ku di navbera wan de hene di şeş rojan de afirandine û ewê ku li ser ‘Arş raser bûye, ji wî pê ve ji bo we tu arîkar û mehdervan tun in. Erê ma hê jî hûn aqil nagirin?
5. Xwedê, ji esmên heyanî erdê hemû kar û barî bi rê ve dibe. Paşê (ew kar û bar) di rojekê de bi balê ve bilind dibin ku ew roj bi qasî hezar salî ye ji rojên ku hûn dijimêrin.
6. Ha ew, zanayê ya nependî û darîçav e, yê desthilat ê dilovîn e.
7. Ew Xwedayê ku her tişt mikûm çêkiriye û di serê pêşîn de însan ji heriyê afirandiye.
8. Piştre zuriyeta însên ji dilopek ava lawaz çêkiriye.
9. Piştre dirûv dayê; durist kir û ji rihê ku mexluqê wî ye pif kiriyê û ji we re guh, çav û dil çêkirin. Hûn Xwedayê xwe çiqas hindik dişêkirînin!
10. Ew dibêjin: Erê ma çaxê em di nav axê de winda bibin, erê em ê dîsa ji nû ve bêne xulqandin? Nexêr, belkî ew çûyîna hizûra Xwedayê xwe înkar dikin.
11. (Resûlê min! Ji wan re) Bibêje: Melekê mirinê yê ku bûye karspareyê (standina) ruhê we dê we bimirîne, paşê hûn ê li Xwedayê xwe bêne vegerandin.
12. Eger, dema gunehkar li ber Xwedayê xwe sertewandî (ku dibêjin) Xwedayê me! Me dît û me bihîst, vêca me vegerîne (dinyayê) da ku em karên qenc bikin û bêguman em ji dil bawerî tînin, te bidîta (te yê dîmenekî ecêb bidîta).
13. Eger me biviya; me dê hîdayet bidaya her kesî. Lê belê gotina “Sond be ku ez ê cehenemê ji tevekê (gunehkar û kafirên) cin û însa dagirim” misoger bû.
14. (Dema ku kafir diçin dojehê dergevan ji wan re wiha dibêjin: Bi sedema ku hûn ji vê rojê xafil man, de vêca ezab biçêjin. Birastî em jî we di ezab de dihêlin. De haydê bi sedema kirinên xwe ezabê her û herî biçêjin!
15. Bêguman bes ew kes bawerî bi ayetên me tînin; ew ên ku dema bi wan ayetan

şîret li wan bêne kirin diçin sicûdê û digel ḥemdkirinê Xwedayê xwe ji her kêmasiyê pak didêrin û xwe qure jî nakin.[1]

**16.** Ew ên ku teniştên wan ji nivînên wan dûr in. Bi tirs û bi hêvî li ber Xwedayê xwe digerin û ji risqê ku me daye wan jî (di riya Xwedê de) xerc dikin.

**17.** Vêca tu kes nizane ka Xwedê ji bo bawermendan, bi sedema ya ku kirin, ji wan tiştên ku çav pê ronî dibin, çi padaş hilandiye.

**18.** Erê kesê ku bawermend be ma mîna kesê jirêderketî ye? Teqez ew ne mîna hev in.

**19.** Herçî ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirin, vêca ji wan re bihiştên lêmayînê hene.

**20.** Herçî ew ên ku ji rê derketine, cihê wan agir e. Çi dema ku ew bixwazin jê derkevin bi paş ve têne vegerandin. Ji wan re tê gotin: De haydê ezabê êgir ew ê ku we bawerî pê nedianî, biçêjin.

**21.** Sond be, beriya ezabê herî mezin, em ê wan bi ezabê nêzîk bidin çêjandin da ku ew li xwe vegerin û bawerî bînin.

**22.** Ma ji wî kesê ku bi ayetên Xwedayê xwe bê hişyarkirin û paşê berê xwe ji wan vegerîne, zalimtir kî heye? Muheqeq em ê ji sûcdaran tolê hilînin.

**23.** Sond be, Me kitêb daye Mûsa vêca tu ji gihaştina wê (kitêbê) nekeve gumanê û Me ew ji zaroyên îsraîl re kiribû rêber.

**24.** Çi dema wan sebir kir û wan ji dil bi ayetên me bawerî anî, me ji nav wan gelek rêber derxistin ku bi emrê me (xelk) rasterê dikirin.

**25.** Bêguman Xwedayê te roja qiyametê der barê ya ku di heqê wan de ew bi hev ketibûn, dê di navbera wan de daraz/hukim bike.

**26.** Erê ma ji wan re eyan nebûye ku beriya wan me gelek umet birine helakê, ku ew jî li şûnwarên wan digerin? Bêguman di van de gelek nîşan û delîl hene. Ma hê jî ew guhê xwe nadinê?

**27.** Erê ma ew nabînin ku em avê diajone ser erdehişka bêgiya, vêca em dexl û dan pê hêşîn dikin ku hem terş (deve, dewar û pez) ên wan hem jî ew bi xwe jê dixwin? Erê ma hê jî ew lê nafikirin?

**28.** Ew dibêjin: Eger bera hûn rast dibêjin, de ka ew serkeftina ku hûn behs dikin kengê ye?

**29.** Bibêje: Roja serkeftinê ew roja ku baweriya kafiran tu feydê nade wan û ji wan re dê muhlet jî neyê dayîn!

**30.** Vêca tu dev ji wan berde û çav li rê be, bêguman ew jî çavlirê ne.

---

1 Ev ayeta sicûda xwendinê ye. Di vê babetê de Pêxamber (s) wisa ferman kiriye: Dema ademiyek (ayeta) sicûdê xwend û here sicûdê, şeytan digirî, xwe jê dûr dike û dibêje: Hey wax li min! Fermana sicûdê li zaroyê Adem hat kirin, ew çû sicûdê, jê re bihişt heye û fermana sicûdê li min hat kirin, ez neçûm sicûdê, vêca dojeh ji min re ye.

# 33. SÛREYÊ EHZAB

Sûreyê Ehzab 73 (heftê û sê) ayet e. Li Medînê daketiye. Sûre, navê xwe ji ayeta 20'em girtiye ku tê de peyva Ehzab derbas bûye û pirjimareya 'hizb' e ku ew jî bi maneya partî, civat, ajal û qafîle tê.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Ey Pêxember! Hay ji emr û nehyê Xwedê hebe û bi gotina kafir û munafiqan meke. Bêguman Xwedê zana ye, xweyhîkmet e.
2. Bide pey wehya ku ji cem Xwedayê te ji te re hatiye. Bêguman Xwedê ji ya ku hûn dikin agahdar e.
3. Xwe bispêre Xwedê, ji karsparî ve Xweda teqez besî te ye.
4. Xwedê, du heb dil nexistine sînga tu zilaman, jinên we jî ew ên ku we zîhar bi wan re kiriye nexistiye şûna dayîkên we û zirkurên we jî ji we re nekirine wekî kurên we yên ji we! Ev gotinên we ne, ku hûn ji xwe re dibêjin. Xwedê ya rast dibêje û ew riya rast aşkera dike.[1]
5. (Ew zarokên ku we bi 'eyalî ji xwe re wergirtiye ) bi bavên wan gazî wan bikin, ev li cem Xwedê dadmendtir û rasttir e. Vêca ku hûn nizanibin bavên wan kî ye, ew di dîn de bira û arîkarên we ne. Di ya ku hûn şaş bibin de (ku hûn ne bi bavên wan gazî wan bikin) ji we re guneh tune ye. Lêbelê di ya ku dilên we qesd bike de ji we re webal heye. Xwedê teqez gunehveşêr e, dilovîn e.
6. Pêxember ji bo bawermendan ji nefsa wan bi xwe jî çêtir û li pêştir e. Xanimên wî jî dayîkên bawermendan in. Ên ku xizmên hev in li gorî kitêba Xwedê ji bawermendên ensar û muhaciran li pêştir û nêzîktirê hev in. Lê belê ku hûn bi dostên xwe qenciyekê bikin ew cuda ye. Ev a me gotî di kitêbê de nivîsandî ye.
7. Dema me ji pêxemberan peyman wergirt û ji te, ji Nûh, ji Îbrahîm, ji Mûsa û ji Îsayê kurê Meryemê jî û Me sozeke mikûm û giran ji wan wergirt…
8. Da ku Xwedê ji rastgoyan pirsa rastiya wan bike û ji bo kafiran jî ezabekî cansoj amade kiriye.
9. Gelî bawermendan! Qenciya ku Xwedê li we kiriye di bîr bînin; wê dema ku leşkeran êrîşî ser we kir, vêca me jî bahoz û leşkerekî ku we ew nedidîtin bi ser wan de şandin. Xwedê bi ya ku hûn dikin bîner e.
10. Wê dema ku ew ji jor û ji jêr ve bi ser we de hatin û dema çav ji tirsa berevajî bûn, dil gihabûn qirikê û we jî der barê Xwedê de hizrên cuda dikir (ma gelo ew ê arîkariya me bike?).

---

1 Zîhar, ew e ku zilam ji pîreka xwe re bibêje: „Tu, ji min re wekî pişta diya min bî.“ Yanî çawa diya min ji min re heram e tu jî wisa ji min re heram bî. Beriya Îslamê gava zilamekî ev gotina ha ji pîreka xwe re bigota, ew pîrek dev jê dihat berdan, weke diya wî dihat dîtin û wî nikarîbû nêzîkî nivîna wê bibe. Xwedê bi vê ayetê ev adet bi mînakeke ecêb ji holê rakir; ka çawa di nava mirovekî de du dil nabin, her wiha ne mumkin e ku pîrekek hem jin be hem jî dayîk be. Bi rastî ev dabaş bi dorferehî dê di Sûreyê Mucadele de were.

11. Ha di wê gavê de bawermend hatibûn ceribandin û bi awayekî dijwar hatibûn hejandin.

12. Wê demê munafiqan û ew ên ku di dilên wan de nexweşî (zeîfiya îmanê) hebû, digotin: Xwedê û Pêxemberê wî meger peymanên xapandinê dane me!

13. Wê demê desteyekê ji munafiqan got: Gelî Yesrîbiyan (xelkê Medînê)! Êdî ji bo we (li vê derê) cih tune ye, haydê vegerin mala xwe! Ji wan (munafiqan) birekê jî ji Pêxember destûr dixwest, digotin: Bi rastî malên me ne asêkirî ne. Hal ev e ku malên wan asêkirî bûn, tenê wan dixwest (ji cengê) birevin.

14. Eger (dijmin) ji hawirdor ve bihatina ser wan û ji wan bixwestina ku ji dîn vegerin, teqez dê wan ev qebûl bikira.

15. Sond be, wan berê peyman dabû Xwedê ku ew pişta xwe nedin neyar û (ji cengê) nerevin û ev peymana ku wan da Xwedê ew ê teqez jê bêne pirsyarkirin.

16. (Ji wan re) Bibêje: Eger hûn ji tirsa mirinê yan jî ji tirsa kuştinê ji şer birevin, bizanin ku ev rev tu feydê nade we û wê çaxê jî hûn ê bes demeke hindik bêne jiyandin.

17. Bibêje: Eger Xwedê bixwaze zerarê bide we yan jî Ew bixwaze rehmê li we bike ew kî ye ku we jê biparêze?! Ew ê ji bilî Xwedê ji bo xwe tu dost û arîkarekî jî nebînin.

18. Bêguman Xwedê ji nav we, ew ên ku xelkê ji çûna cîhadê didin paş û ew ên ku ji birayên xwe (yên munafiq) re dibêjin: "Werin beşdarî me bibin (bi Muhemmed re dernekevin cîhadê)" baş bi wan dizane û jixwe kêm caran têne şer.

19. Ew munafiq li ser (arîkariya) we pir çikûs û nemerd in. Vêca dema tirs bi ser wan de bê, tu wan dibînî ku ew li te dinêrin mîna yê ku mirinê ew girtibe, çavên wan li dor wan dileyîzin. Vêca dema ku tirs ji ser wan rabû, bi zimanên xwe yên tûj we diêşînin û ji temahkarî malê xenîmetê ji te dixwazin. Ha van bawerî neaniye. Vêca Xwedê kirinên wan pûç kirine û ev li cem Xwedê hêsan e.

20. Ji wan munafiqan we ye ku hêzên hevkar ên dijmin hê jî ji dora Medînê neçûne. Eger ku leşkerên hevalbendan dîsa vegerin (şerê we), ew munafiq dixwazin ku herin çolê, bikevin nava bedewiyan û ji dûr ve der heqê we de xeberan bigirin. Jixwe eger ew di nav we de bûna jî, dê hindikî şer bikirina.

21. (Gelî bawermendan!) Sond be ji bo we, di (jiyan û tevgerên) resûlê Xwedê de, ji bo wî kesê ku (qenciya) Xwedê û roja axretê hêvî bike û zikrê Xwedê jî pir dike, mînak û nimûneyeke spehî û kamil heye.

22. Çi dema ku bawermendan hêzên hevalbend dîtin, gotin: Ha ev ya ku Xwedê û qasidê wî peymana wê dabû me, Xwedê û qasidê Wî rast gotine û vê rewşê tenê bawerî û radestbûna wan ji Xwedê re zêde kiriye.

23. Ji bawermendan hin zilamên wisa hene ku wan ew peymana dane Xwedê bi cih aniye. Vêca hin ji wan canê xwe feda kirin û hin ji wan jî çavnêriyê dikin û peymana xwe neguhartine (li ser soza xwe man e)…

24. Da ku Xwedê rastgoyan bi rastbêjiya wan xelat bike û munafiqan jî -eger ew

bivê- dê bide ezabdan, yan jî (eger ew tobe bikin) dê tobeya wan qebûl bike. Bêguman Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

**25.** Ew ên ku kafirbûne, Xwedê ew bi kîn û xezeba wan ve vegerandin. Wan tu feyde bi dest xwe ve neanî. Xwedê di şer de besî bawermendan e. Bêguman Xwedê xurt û desthilat e.

**26.** Xwedê, ji ehlî kitêb ew ên ku hevkariya wan (hevalbendên muşrik) kirin, ew ji keleyên wan anîne xwarê û tirsa we avêtiye dilên wan; vêca hûn hinekan ji wan (ji ber xiyaneta wan) dikujin, hinekan ji wan jî dîl digirin.

**27.** Xwedê hûn kirin mîratgirên cih, xanî û serwetên wan û hûn kirin mîratgirê erdeke ku hê jî we pê lê nekiriye. Bêguman Xwedê li ser her tiştî kara ye.

**28.** Ey Pêxember! Ji xanimên xwe re bibêje: Eger hûn jiyana dinyayê û xişrê wê dixwazin, werin ez mehra we bidim we û bi rindî we berdim.

**29.** Eger hûn Xwedê, resûlê Wî û mala axretê dixwazin, bizanin ku Xwedê ji nav we, ji bo qencîkarên rast û durist xelateke mezin amade kiriye.

**30.** Gelî xanimên Pêxember! Ji we kî bêtoretiyeke aşkera bike, ezabê wê du qat tê zêdekirin. Ev li cem Xwedê hêsan e.

**31.** Kî ji we bi gotina Xwedê û Resûlê Wî bike û digel vê jî karê qenc bike, em ê xelata wê du qat bidinê û Me ji bo wê risqekî rind amade kiriye.

**32.** Gelî xanimên Pêxember! Hûn, ji jinan ne mîna yekê ji wan in, (belkî hûn di ser wan re ne) bi şertê ku hûn xwe ji bêemriya Xwedê û Resûlê wî biparêzin. Nexwe li hember zilamên biyanî gotinên xwe nerm û nazik nekin, vêca ku yê di dilê wî de nexweşî hebe ku meyla wî çêbe û hûn bi gotineke birêz û edeb biaxivin.[1]

**33.** Di malên xwe de bi rêzdarî rûnin û mîna jinên berî îslamê bixeml û xişir xwe bernedin derve. Berdewamî nimêj bikin, zekata malê xwe bidin û bi gotina Xwedê û qasidê Wî bikin. Gelî ehlê mala Pêxember! Xwedê bi vê pend û şîretê bes dixwaze qirêjê ji ser we rake û we ji her kirêtiyê pak û paqij bike.[2]

**34.** Ayetên Xwedê û hikmeta ku di malên we de têne xwendin bînin bîra xwe. Bêguman Xwedê her tiştî bi temamî dizane û pê agahdar e.

**35.** Bêguman, zilamên misliman û jinên misliman, zilamên bawermend û jinên bawermend, zilamên îbadetkar û jinên îbadetkar, zilamên rastgo û jinên rastbêj, zilamên xweragir û jinên sebirkêş, zilamên Xwedêtirs û jinên Xwdêtirs, zilamên xêrker û jinên xêrker, zilamên rojîgir û jinên rojîgir, zilamên namûsparêz û jinên namûsparêz, zilamên ji Xwedê re pir zikirker û jinên zikirker, teqez Xwedê ji bo wan lêborînek û xelateke mezin amade kiriye.

---

1 Ev fermana Xwedê her çiqas bi navê xanimên Pêxember hatibe gotin, lê belê tevekê xanimên musilman dikevin bin de. Lewra xanimên Pêxember nimûne û mînak in xanimên musilman re. Ev xitabên bi vî awayî gelek caran derbas dibe.

2 Ehl'i-Beyt: Ma'na wê xelkê mala Pêxember e. Aliman gelek ta'rîf lêanîna, lê ya munasib ev e: Zarokên Pêxember, xanimên wî, neviyên wî Hesen û Huseyn û zavayê Pêxember 'Alî ye (r). Ji van tevan re Ehl'î-Beyt tê gotin.

**36.** Dema ku Xwedê û resûlê Wî li ser kêşeyekî hukim vebirîn, ji bo tu mêr û jineke bawermend maf tune ye ku li gorî daxwaza dilê xwe tevbigere. Kî bi gotina Xwedê û Resûlê Wî neke, êdî bi rastî wî bi rewşekî aşîkar rê şaş kiriye.

**37.** Wê dema ji bo wî yê ku Xwedê (bi îslamê) qencî lê kirî û te jî (bi azadkirina wî) qencî lê kiribû, te digot: Jina xwe bernede û (der barê wê de) ji Xwedê bitirse! Hal ev e ku tiştê Xwedê dixwaze wê derîne, ji tirsa lomekaran te ew di dilê xwe de vedişart. Hal ev e yê ku heq e tu jê bitirsî Xwedê ye. Vêca çi dema ku Zeyd pêwendiya xwe jê birî, me ew li te mehr kir, da ku (ji vir û pê de) der barê zewaca bi pîrekên kurgirtiyên xwe de, dema ku wan destê xwe li ser wan hilanî, tu guneh li ser bawermendan tune ye ku wan mehr bikin. Fermana Xwedê her bicih e.[1]

**38.** Li ser Pêxember tu guneh nîn e ku ya Xwedê jê re teqdîr kiriye wê bîne cih. Ev qanûna Xwedê ye der barê pêxemberan de, ew ên ku berê derbas bûne. Fermana Xwedê misoger dê were cih, (ev) qedereke nivîsandî ye.

**39.** Ew pêxemberên ku wehya Xwedê radigihînin, jê ditirsin û ji Xwedê pê ve ji tu kesî din natirsin. Ji hesabgirî ve Xwedê bi tenê bes e.

**40.** Muhemmed, ji zilamên we ne bavê kesî ji we ye. Lê belê ew resûlê Xwedê û paşîvanê pêxemberan e. Xwedê teqez bi her tiştî dizane.

**41.** Gelî yên ku bawerî anîne! Zikrê Xwedê pir bikin.

**42.** Di sibeh û êvarê de Wî pak bidêrin.

**43.** Xwedê ye, yê ku rehma xwe li we dike û firîşteyên Wî jî (lêborîna we dixwazin) da ku we ji tarîtiyan derxe ber ronahiyê. Xwedê digel bawermendan pir dilovîn e.

**44.** Roja ku ew (bawermend) digihin hizûra Xwedê, pêşwaziya wan ji hev re 'Silav' e. Xwedê ji bo wan padaşeke rind amade kiriye.

**45.** Ey Pêxember! Bi rastî me tu bi şahidî, bi mizgînberî û bi hişyarkerî hinartiye…

**46.** Da ku bi destûra Xwedê tu bibî dozkarê bal riya Xwedê û bibî çirayeke rewnaq û ronker.

**47.** Mizgînê bide bawermendan ku bêguman ji cem Xwedê, ji bo wan qenciyeke mezin heye.

---

1 Berê di nav ereban de adet bû ku dema yekî zarokek bi kurînî digirt, ew zarok dibû kurê wî û bi navê wî dihat gazîkirin. Vê ayeta pîroz ev adet rakir û hukmekî gelemperî ji nû ve danî. HUkim Ew ên ku bi kurînî tên girtin bi her awayî ne mîna kurên heqîqî ne; ew nabine waris û nikaha jinên wan jî li yên ku bi bal ve dihat gazîkirin heram nabe. Vêca Xwedê xwest ku ev hukim bi tetbîqa Pêxember durist bibe. Berê digotin "Zeydê kurê Muhemmed" piştî nuzûla ayetê "Zeydê kurê Harîse" hate gotin. Berî ayet nazil bibe xanima Zeyd ku berdane jî li pêxember heram bû, piştî nuzûlê ayetê Zeyd ew berda û Pêxember bi emrê Xwedê ew mehr kir.

Zeyd kurê Harîse, hê bi zarokatî hatibû dîl girtin. Xedîce bi koletî ew kirîbû û ji Pêxamber re diyarî kiribû. Pêxamber jî, ew azad kir û ji xwe re bi kurînî girt. Pêxamber (s) pir ji Zeydî hez dikir û keçmeta xwe Zeynep keça Cehş lê mehr kir. Lêbelê Zeynebê bi Zeyd re neburand. Lewra Zeyneb jineke esîlzade bû, nexwest ku bi koleyekî azadkirî re bizewice, lê belê ji bo xatirê Pêxamber pê re zewicî. Bi kurtî; bi hev re derbas nekirin. Zeyd hat cem Pêxamber û jê re got: Ez dixwazim Zeynebê berdim. Pêxamber jê re got: „Jina xwe bernede û derbarî mafê wê de ji Xwedê bitirse!" Paşê Zeyd ew berda û Pêxember bi emrê Xwedê ew mehr kir.

**48.** Bi gotina kafir û munafiqan meke, guh mede eziyeta wan, xwe bispêre Xwedê, bi wekîlî Xwedê her bes e.

**49.** Gelî bawermendan! Dema ku we jinên bawermend li xwe mehr kirin, beriya hûn herin livîna wan we ew berdan, vêca ji bo we li ser wan tu ‘idde (dema nemêrkirinê) tune ye ku hûn li ser wan bijimêrin. Nexwe ji malê xwe qenciyekê bi wan bikin û bi awayekî rind riya wan vekin.

**50.** Ey Pêxember! Me ji bo te ew xanimên te, yên ku te mehra wan daye, ew cariyeyên ku Xwedê bi xenîmetî dane te û dotmamên te, keçmetên te, keçxaletên te; ew ên ku bi te re hicret kirin, mehrkirina wan li te helal kiriye. Eger jineke bawermend xwe bexşî Pêxember bike û Pêxember jî bixwaze wê mehr bike -ne ji bawermendên din re- tenê ji te re (me helal kiriye). Bi rastî der barê jinên bawermendan û qerwaşên ku di binê destê wan de ne, me ji wan re tiştê ku ferz kiriye daye zanîn, da ku ji te re tu guneh û zehmetî çênebe. Xwedê gunehjêbir û dilovîn e.[1]

**51.** Ji wan (xanimên xwe) ya ku tu bivê, tu dê wê bihêlî paş, ya ku tu wê bivê jî tu dê wê bînî cem xwe. Ji wan jinên ku te ew ji xwe dûr kirine tu kîjanê bivê ji te re tu guneh tune ye ku dîsa tu wê bînî cem xwe. Ha ev munasibtir û nêzîktirî ya ku çavên wan pê ronî bibin, ewê xemgîn jî nebin û bi ya ku tu bidî wan hemû yê pê razî bibin. Xwedê bi ya ku di dilên we de ye dizane. Xwedê her zana û bêhnfireh e.

**52.** Ji van (xanimên te) pê de êdî jin, ji te re ne helal in û (ne helale) tu wan bi hin jinên din biguherînî jî, çendî spehîtiya wan li xweşa te biçe jî. Lê belê qerwaşên ku di binê destê te de ne, ew cuda ne. Xwedê li ser her tiştî çavdêr e.

**53.** Gelî bawermendan! Neçin mala Pêxember, lê belê ji bo xwarinekê ku destûr ji we re bê dayîn ew cuda ye. (Dema ku ji bo xwarinekê hûn herin mala Pêxember jî) çavnêriya pehtina xwarinê nekin. Dema ku hûn bêne vexwendin herin mala wî û dema ku we xwarin xwar jî di cih de belav bibin (û piştî xwarinê li mala Pêxember) xwe noqî sohbetê nekin. Lewra ev hereketa we Pêxember diêşîne, vêca ew şerm dike (we ji malê derxe). Lê belê Xwedê ji gotina heqiyê şerm nake. Dema ku hûn tiştekî ji xanimên Pêxember bixwazin li pişt perdeyekê bixwazin. Ev hem ji bo dilên we hem jî ji bo dilên wan bizaveke paktir e. Ji we re qet ne helal e ku hûn Pêxemberê Xwedê biêşînin û piştî wî xanimên wî mehr bikin. Bêguman ev tevgera we li nik Xwedê (gunehekî) mezin e.[2]

---

1 Di vî sûreyê de ev gazîya çarem e ji bo Pêxember. Ev gazî derbarê hinek rewşan de ye ku hinek ji wan bi umetê re hevpişk in û hin ji wan xasê bi Pêxember in ku xwedê kerema xwe pê re kiriye û dereca wî pê bilind kiriye. Hinek ji wan teqrîra rewşa hazir in û hinek ji wan jî hukm in ji pêjerojê re. Ew ên ku terxanî bi cenabê Pêxember in, mîna zewcandin Pêxember bi zêdeyî çar jinan re, zewcandina wî bi wê jina ku xwe diyarî bike ji bo pêxember. Ev herdu xeslet bes xasê bi pêxember ve ne.

2 Ev ayet çawa ku di Sehîha Bûxarî de derbas bûye ku Enes kurê Malik hatiye ragihandin di derbarî çend kesên ku ji bo xwarinê hatibûn mala pêxember û ranebûn de nazil bûye. Ev ayet ji bo muminan toreyekî datîne ku ka çawa bawermend li hemberî mala Pêxember tevbigerin û ka çawa bewermend li pêşberî malên hev jî tevbigerin. Mafê tu kesî tune ku bi seredana xwe ezyetê bide tu kesî. Bawermend lazim e bi rist û rêz bin; ne bêşerm û bêfihêt bin.

54. Eger hûn tiştekî aşkera bikin an jî wî veşêrin, vêca birastî Xwedê bi her tiştî zana ye.

55. Ji xanimên Pêxember re tu guneh nîn e ku bavên wan, kurên wan, birayên wan, biraziyên wan, xwarziyên wan û jinên bawermend û (cariye û kole)yên di bin destê wan de (ku bêperde wan bibînin). (Gelî xanimên Pêxember!) Xwe ji heramên Xwedê biparêzin, bêguman Xwedê li ser her tiştî hazir û nazir e.

56. Bêguman Xwedê rehmê li pêxember dike, melaiketên Xwedê jî bexşandina wî dixwazin, gelî bawermendan hûn jî jê re dua bikin û bi tekûzî jê re berdest bibin.

57. Bêguman ew ên ku Xwedê û Resûlê Wî biêşînin, Xwedê hem li dinyayê hem jî li axiretê lenet li wan barandiye û ji wan re ezabekî riswaker amade kiriye.

58. Ew ên ku zilamên bawermend û pîrekên bawermend der barê sûcekî de ku wan nekiriye biêşînin, vêca bi rastî wan bêbextî û gunehekî aşkera kiriye.

59. Ey Pêxember! Ji xanimên xwe re, ji keçên xwe re û ji pîrekên bawermendan re bibêje: (Dema ku ji bo pêdiviyekê derkevin derve), Bila bedena xwe bi perdepoşiyên xwe binixumînin. Ev ya herî nêzik e ku ew (ji dawpîsan) bêne naskirin, vêca da neyêne êşandin. Bêguman Xwedê gunehjêbir û dilovîn e.

60. Sond be, eger ku munafiq û ew ên ku di dilê wan de nexweşiya (fihûşê) heye û ew ên ku li Medînê xeberên derew belav dikin, dev ji van (bizavên xwe) bernedin emê destûra te li wan bidin (ku tu şerê wan bikî û wan ji Medînê derînî). Piştre li wê derê li cem te ew ê bes demeke hindik bişên bimînin.

61. Lanet li wan hatiye barandin. Ew li ku derê bêne bidestxistin ew ê bêne girtin û bêne kuştin.

62. Der barê wan ên ku berê hatine û çûne de adetê Xwedê ev e û tu yê ji adetê Xwedê re teqez tu guhertinê nebînî.

63. (Ya Muhemmed!) Însan pirsa qiyametê ji te dikin, ka kengê ye? Bibêje: Zanîna wê bes li cem Xwedê ye. Ma tu çi dizanî, dibe ku qiyamet nêzîk be jî.

64. Bêguman Xwedê, lenet li kafiran barandiye û ji wan re agirekî bipêt amade kiriye.

65. Ew ê her û her di wî agirê bipêt de bimînin, ew dê ji bo xwe ne dostekî ne jî arîkarekî bibînin.

66. Roja ku rûyên wan di êgir de têne wergerandin, dê bibêjin: Hey wax li me be! Xwezika me bi gotina Xwedê û bi gotina Pêxember kiribûya!

67. Kafir dibêjin: Xwedayê me! Me bi gotina serdar û mezinên xwe kir û wan jî em ji rê derxistin.

68. Xwedayê me! Du qatî ezab bide wan û bi leneteke mezin wan lenet bike.

69. Gelî yên bawerî anîne! Hûn jî nebin wek wan ên ku wan Mûsa êşandiye! Vêca Xwedê Mûsa ji ya ku digotin pak û paqij kir. Mûsa li cem Xwedê (pêxemberekî) bisiyanet û rûmetdar e.

70. Gelî bawermendan! Xwe ji (bêemriya) Xwedê biparêzin û gotina rast û durist bibêjin.

71. Xwedê dê kar û barên we li hev bîne û li gunehên we bibore. Kî bi gotina Xwedê û Pêxemberê Wî bike, wî serkeftineke mezin bi dest xistiye.

72. Me emanetê xwe li asîmanan, li erdê û çiyan derpêş kir, wan xwe neda ber hilgirtina wî (spareyî) û (ji berpirsiya wî) tirsiyan, lê belê însên ew hilgirt. (Vêca însên erka xwe pêk neanî, lewra ew birastî sitemkar e, nezan e.

73. (Xwedê ev emanet da însên) da ku Xwedê zilamên munafiq û pîrekên munafiq, zilamên pûtperest û pîrekên pûtperest bide ezabê û da ku Xwedê tobeya zilamên bawermend û pîrekên bawermend qebûl bike. Xwedê her gunehjêbir e, dilovîn e.

## 34. SÛREYÊ SEBE’

Sûreyê Sebe’, 54 (pêncî û çar) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre, navê xwe ji bêjeya Sebe girtiye ku ew di ayeta 15’em de derbas bûye û ew li Yemenê navê herêmekê ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Hemd (pesn û spasî) her ji Xwedê re ye. Ewê ku çiqas tiştên li erd û asîmanan hene her milkê wî ne û pesindariya axretê her jê re ye û ew di kar û barê xwe de xwedîhikmet e, agahdar e.

2. Ew dizane ya ku dikeve erdê û ya ku ji erdê derdikeve, ya ku ji esmên dakeve û ya ku hildikişe esmên. Ew e yê dilovîn ê gunehjêbir.

3. Ew ên ku kafir bûne, gotin: Qiyamet bi ser me de nayê. Bibêje: Belê! Bi Xwedayê min ew ê ku zanayê ya nepend e, sond be; misoger qiyamet her dê bi ser we de bê. Li erd û asîmanan bi qasî giraniya zereyekî jî tiştek ji ber Wî winda nabe. Ya ku ji zereyê biçûktir û ya ku jê mezintir jî her ew di kitêbeke aşkera de ne (ku Lewhul Mehfûzê e).

4. Ji bo ku Xwedê ew ên ku bawerî aniye û karên qenc kirine wan padaş bike. Ha ji bo wan lêborîn û risqekî xweş heye.

5. Ew ên ku der barê (pûçkirina hukmê) ayetên me de pîkoliyê dikin, (guman dikin) ku ew ê Xwedê naçar bihêlin. Ha ji bo wan jî ezabekî erjeng û xemnak heye.

6. (Ya Muhemmed!) Ew ên ku ilm û zanîn ji bo wan hatiye dayîn, ew baş dizanin ku ev Quran ji cem Xwedayê te hatiye hinartin, ew heq û rast e. Ew berê (mirovan) dide riya wî Xwedayê desthilat, yê hêjayî pesindayînê.

7. Ewên ku kafir bûne ji hev re wiha gotin: Ma em zilamekî wisa nîşanî we bidin (qesda wan pêxember e) ku ew ji we re bibêje; dema ku hûn ji hev parçe parçe bûn û ji hev pelişîn, hûn ê (piştî mirinê) dîsa ji nû ve rabin û sax bibin?!

8. (Wan ji hev re got:) Ma gelo li ser navê Xwedê bi derewan bêbextiyê dike yan jî pê re dînîtî heye? Nexêr, belkî ew ên ku bi axiretê bawerî nayînin di nav ezab û rêşaşiyeke dûr de ne.

9. Erê ma ew kafir li erd û asîmanên ku li pêşî û paşiya wan e, namêzînin? Eger em bivên em ê wan di erdê de bibin xwarê, yan jî em ê ji esmên parçeyên êgir bi ser wan de berdin. Bêguman di vê de ji bo her evdê ku (li Xwedayê xwe) vegere, îbretek heye.

10. Sond be Me ji cem xwe qenciyek da Dawud û me got: Gelî çiya û gelî teyran, hûn jî digel wî tesbîhan bidin û me jê re hesin jî nerm kir.

11. (Me ji malbata Dawud re got:) Zirxên fireh çêkin, fesala wan bi endaz bikin û karên hêja bikin, bêguman ez li ser ya ku hûn dikin bîner im.

12. Me ji Suleyaman re ba misixur kiribû ku danê spêdeyê qûnaxa mehekê wî bibe û danê êvarê jî ku qûnaxa mehekê wî bînê, Me kaniya paxir jê re herikand û ji cinan jî yên ku li ber destê wî rêncberî dikirin, hebûn. Ji wan kî ji fermana me derketaya vêca me dê azara agirê sincirî pê bida tehmkirin.

13. Wan ji Suleyman re tişta bixwesta ji keleyan, peykeran, cifniyên mîna hewzan û dîzên (di erdê de) cihgirtî çêdikirin. (Me ji wan re got:) Gelî malbata Dawud! Xwedayê xwe bişêkirînin, teqez ji bendeyên min (yên) şukirdar kêm in!

14. Êdî dema ji bo Suleyaman me mirin heq kir, bes kurmikê ku gopalê wî dixwar mirina wî ravayî wan kir. Vêca dema ku ew kumişî ser erdê, ji cinan re diyar bû ku eger bi nependiyê bizanibûna, wî qasî di wê keftelefta riswaker de nediman.[1]

15. Sond be, di cih û warê gelê Sebeyê de nîşaneke mezin hebû, li rexê rastê du baxçe û li rexê çepê du baxçe hebûn. (Ji wan re hat gotin:) Ji risqê Xwedayê xwe bixwin û şukrê wî bikin. Ji bo we cihekî nîmetxweş û Xwedayekî xefûr heye.

16. Lê belê wan berê xwe (ji Xwedê û spasiya nîmetên wî) vegerandin. Ji bo vê (nankoriya wan) me jî şapeyeke dijwar bi ser wan de anî. Me her du baxçeyên wan bi du baxçeyên din guherandin ku xweyxwarinên tehl û hin dargez (kifêrî) û tiştekî hindik jî ji darkinêrê bûn.

17. Ev, bi sedema ku zêde înkarî kirin me ew wisa dane cezadan û ji bilî yê mandelker em tu kesî ceza nakin.

18. Me di navbera wan de û wan gundên ku me bereket xistibûyê, gelek gundên ji derveyî wan anîne holê û me di navbera wan de çend qonax danîn, (me ji wan re got:) De bi şev û roj hûn çawa dixwazin ji xwe re biewleyî bigerin.

19. Di pey vê de wan got: Xwedayê me! Navbera wan bajaran ên ku em bi rêwingî diçin, ji hev dûr bike. Wan (bi sebunet bêşêkirî û kufra xwe) li xwe zilm kirin. Vêca me ew kirin mijûlî (ya ser zimanê xelkê) û me ew ji hev belawela kirin. Bêguman di vê de ji bo her kesê sebirkêş û şukirdar, belge û nîşan hene.

20. Sond be, şeytan texmîna xwe ya di heqê wan (kafiran) de bicih anî, vêca ji bilî bireke bawermend pê ve, tevekî wan dane pey wî.

21. Hal ev e ku tu pêkarîneke şeytên li ser wan tune bû, bes (me ev keys dayê) da

1 Xwedê bi vê ayetê dersekê dide mirovan. Ji wan re diyer dike ku cin bi xeybê nizanin. Eger bizaniyana piştî wefata Suleyman Pêxember zemanekî dirêj wan xizmet nedikir. Di dema me ya îro de gelek mirov ji bo hin daxwazên xwe diçin cem hin kesên ku qaşo bi cinan re heval in da ku daxwazên wan bînin cih. Ev çûna cem van guneh e û bawerkirina ji wan gunehtir e.

ku em yên ku bawerî bi axretê tînin ji yên ku ew jê bişik in, nas bikin. Bêguman Xwedayê te li ser her tiştî parêzkar e.

22. Bibêje: Ên ku di şûna Xwedê de we ew îlahên rastîn hizir dikirin, gazî wan bikin (bila di hewara we bên). Ew li erd û asîmanan bi qasî giraniya zereyekê jî ne xwediyê tiştekî ne. Di nav wan de ji Xwedê re tu hevkar tun in û ji nav wan jê re tu piştek û arîkar jî nîn in.

23. Şefaet jî li cem Xwedê feyde nade ji bilî yê ku Xwedê destûr dabe pê ve. Piştî ku tirs ji dilên wan çû; (ji firîşteyan re) dibêjin: Xwedayê we çi got? (Firîşte) dibêjin: Rastî got. Her ew e yê bilind, yê mezin.

24. Bibêje: Ma kî ye yê ku ji erd û asîmanan risq dide we? Bibêje: Xwedê ye! Nexwe em an jî hûn, yek ji me yan li ser riya rast e yan jî di nava rêşaşiyeke aşkera de ye.

25. Bibêje: Hûn ji gunehên ku me kirin nayên pirsyarkirin û em jî ji ya hûn dikin nayên pirsyarkirin.

26. Bibêje: Xwedayê me dê (roja qiyametê) me û we li hev bicivîne, piştre dê di navbera me de bi edaletî hukim bike. Her ew e yê Fettaḥ yê ‘Elîm.[1]

27. Bibêje: De ka ew (pût)ên ku di îbadetê de we ew ji Xwedê re kirine hevpişk nîşanî min bidin? Nexêr, ne wekî we hizir dikir! Belkî Xwedê ye yê deshilat, yê xweyhîkmet.

28. (Resûlê min!) Me tu ji tevekê însanan re bes mizgînber û hişyarker şandiye, lê belê pirên mirovan (bi vê) nizanin.

29. Kafir dibêjin: Eger hûn rast dibêjin, ew ezabê te peyman pê daye ka kengê tê cih?

30. Bibêje: Xwedê ji bo ezab rojek daniye. Hûn ne saetekê jê li paş dimînin ne jî saetekê hûn didin pêşiya wê.

31. Ew ên ku kafir bûne, gotin: Em ne ji vê Quranê bawer dikin û ne jî ji kitêbên beriya wê. Eger te ew kafirên zalim li ber destê Xwedayê xwe rawestayî bidîta ku çawa ew li hev gotinan vedigerînin; ewên ku (li dinyayê) qels bûn, ji wan ên ku xwe mezin didêran re dibêjin: Eger ne ji we bûya teqez em ê bawermend bûna.

32. Ew ên ku (li dinyayê) xwe mezin didêran ji yên qels re dibêjin: Piştî hîdayet ji we re hat, ma me hûn jê vegerand? Na, belkî hûn bi xwe gunehkar bûn.

33. Ew ên ku qels bûn, ji yên xwemezindêr re wiha dibêjin: Na! Bi şev û roj karên we hîle û fend bû. Her tim we ferman li me dikir da ku em Xwedê înkar bikin û jê re hevpişkan çêkin. Êdî peyrew û pêşrew piştî ku ezab dibînin, ji kezeba şewitî poşman dibin. Em jî dê zincîran bixin stûyên wanên ku kafir bûne, ew ji cezayê ya ku kirine pê ve nayêne cezakirin.

---

1 El-Fettah: Ew ê ku deriyê xezineya milkê xwe, deriyê xezineya dilovanî û rizqê xwe, tişta jê bivê, li gorî hikmet ü zanîna xwe ji kesê ew bixwazê re vedike.

El-‘Elîm: Ew ê ku zanîna wî dor li her berçav û veşareyan, raz û eşkereyan, alema jorîn û jêrîn, dema bûrî, dema têdeyî û dema werê girtiye û tiştek li ber wî veşartî û nehan namîne.

**34.** Çi welatekî ku Me pêxemberek şandibê, her maldar û serkarên wî digotin: Em bi emr û fermanên ku hûn pê hatine şandin bawerî nayînin.

**35.** Gotin: Em ji aliyê mal û zarokan ve (ji we) bêhtir in û em ne ew in ku bêne ezabdayîn.

**36.** Bibêje: Xwedayê min, kê bivê risqê wî fireh dike û (kê jî bivê risqê wî) teng dike, lê belê pirên mirovan (bi vê) nizanin.

**37.** Ne malên we ne jî zarokên we, we nêzîkî bal me ve nakin. Lê belê ew ên ku wan bawerî anî û karên qenc kirine, ew cuda ne. Vêca ha ew, bi sedema ya ku kirin, ji bo wan qat bi qat padaş heye. Ew di koşkên bilind de di nav (rihetî û) ewlehiyê de ne.

**38.** Ew ên ku der barê ayetên me de pîkoliyê dikin (ji wan we ye ku ew ê) zora me bibin, ha ew dê rûbirûyî ezab bêne hiştin.

**39.** Bibêje: Bêguman Xwedayê min ji evdên xwe kê bivê risqê wî fireh dike û (kê jî bivê risqê wî) teng dike. Vêca hûn (ji bo Xwedê) çi xerc bikin, Xwedê dê xelefa wê vegerinê û her Xwedê ye çêtirînê riziqdaran.

**40.** Wê roja ku Xwedê tevekê muşrikan li hev kom dike, paşê ji firîşteyan re dibêje; ma ev bûn yên ku ji we re îbadet dikirin?

**41.** Firîşte dê bibêjin: Tu pak û bilind î, dost û piştevanê me bes Tu yî; ne ew in. (Wan perestina me nedikir), belkî perestina cinan dikirin. Pirên wan bi cinan bawerî anîbû.

**42.** Vêca îro hûn nikarin tu feydê û tu xesarê bigihînin hev. Em ê ji wan ên ku zilm kirine re bibêjin: De haydê ezabê wî êgirê ku we ew înkar dikir biçêjin!

**43.** Dema ku ayetên me yên ronkar ji wan re dihatin xwendin, digotin: Ev bes şexsek e ku dixwaze we ji perestina wan (pûtan) vegerîne, ew ên ku bav û kalên we bi wan diperizîn. Digotin: Ev (Quran) jî bes derewek e ku wî ji cem xwe çêkiriye. Dema ku heq (Quran) ji wan re hat, ew ên kafir bûne gotin: Ev bes sêreke aşkera ye.

**44.** (Ya Muhemmed!) Me tu kitêb nedane wan ku ew wê bixwînin û me beriya te ji wan re tu pêxember jî neşandine.

**45.** Umetên beriya wan jî bawerî bi pêxemberên xwe neanîn. Ev (muşrikên Mekkê) nagihine dehyeka ya ku me (ji hêz û temen) daye wan. Vêca wan bi pêxemberên min bawerî neanî (û min ew birin helakê), vêca cezadayina Min çawa bû?

**46.** Bibêje: Ez bes yek şîretekê li we dikim; ji bo xatirê Xwedê dido dido û yeko yeko (bi mêjiyekî azad) heqiyê teleb bikin, paşê baş bifikirin, (hûn ê bibînin ku) li dor hevalê we (mexsed pê pêxember e) tu dînîtî tune ye. Ew her pêxemberek e, bi hatina ezabekî dijwar û xemnak we hişyar dike.

**47.** Bibêje: Min (li ser teblîxa îslamê) tu heqek ji we nexwestiye; vêca malê we yê we ye. Padaşa min her li Xwedê ye û ew li ser her tiştî şahid e.

**48.** Bibêje: Xwedayê min, heqiyê diavêje ser dilê pêxemberên xwe û Xwedê bi xeybê teqez agahdar e.

**49.** Bibêje: Heq hat û êdî batil tiştekî dernaxe hole û ew bi tu awayan venagere.

**50.** Bibêje: Eger ez ji heqiyê şaş bibim, ez ê li hemberî xwe şaş bibim, eger ez riya rast bibînim, ev jî bi xêra vê (Quranê) ye ku Xwedayê min peyama wê daye min. Bêguman Xwedê bihîzer e, nêzîk e.

**51.** Xwezî te bidîta dema tirsê ew girtin, vêca tu cihê revê ji wan re tune ye û ew ji cihekî nêzîk ve hatine girtin.

**52.** (Piştî ezabê xwe dîtin) gotin: Me bawerî pê anî. Erê ma ew ê li cihekî dûr wê çawa îmanê bi dest bixin.

**53.** Hal ev e ku ew berê kafirbûbûn û ji cîhekî dûr ve derheqê xeybê de texmîn dikirin.

**54.** Êdî navbirek di navbera wan û ya ku dilê wan di çûyê de hatiye danîn. Eynî wekî ya ku berê bi yên mîna wan jî hatiye kirin. Bi rastî ew di nava şik û gumanê de bûn.

## 35. SÛREYÊ FATIR

Sûreyê Fatir, 45 (çil û pênc) ayet e. Li Mekkê daketiye. Navê sûre ji ayeta 1'em tê ku kelîmeya Fatir tê de derbas bûye û ew bi mehneya Afirîner e yê ku bênimûne tişt îcad kirine.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Hemd (pesn û sipasî) ji bo Xwedê ye ku ew çêkerê erd û asîmanan e, firîşteyên xwedanbaz; du baz, sê baz û çar baz kirine qasid. Ew bi qasî ku bivê di afirandinê de zêde dike, tiştê ku bivê dixuliqîne. Bêguman Xwedê li ser her tiştî qadir e.

**2.** Çi tiştê Xwedê ji dilovaniya xwe bide mirovan, vêca tu kesê ku wê ji wan bigire tune ye. Ya ku Xwedê wê bigire, vêca piştî Wî kes nikare wê ji wan re berde. Her Ew e yê di kar û barê xwe de desthilat ê xweyhîkmet.

**3.** Gelî mirovan! Qenciya ku Xwedê li we kiriye bînin bîra xwe. Erê ma ji bilî Xwedê xaliqekî din heye ku ji erd û esmên risqê we bide? Ji bilî Xwedê tu mebûdê bi rastî nîn e. Vêca çawa hûn berê xwe jê vedigerînin?

**4.** (Ya Muhemmed!) Eger ew bi te bawerî nayînin, vêca bi rastî beriya te jî gelek pêxember bawerî bi wan nehatibû kirin û hemû kar û bar her bi bal Xwedê ve dê bêne vegerandin.

**5.** Gelî mirovan! Bêguman peymana Xwedê heq e. Vêca zinhar bila jiyana cîhanê we nexapîne û bila şeytanê xapînok jî bi (efûkirina) Xwedê we nexapîne!

**6.** Bêguman şeytan ji we re neyar e. Nexwe hûn jî, wî ji xwe re neyar qebûl bikin (û li dûv neçin). Ew bes gazî hevalbendên xwe dike da ku ew bibin ji xelkên agirê bipêt.

**7.** Ew ên ku kafir bûne, ji wan re ezabekî dijwar heye, ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirine, ji bo wan lêborîn û xelateke mezin heye.

**8.** Erê ma ew kesê ku karê wî yê pîs jê re were xemilandin, vêca ew jî wî karî qenc bibîne (ma dibe mîna wî kesê qenciyê qenc û xerabiyê xerab bibîne)!? Birastî jî Xwedê kî bivê wî ji rê dixe û kî jî bivê wî rasterê dike. Nexwe ji xema (bi sebunet kufra wan) xwe nebe helakê. Bêguman Xwedê bi ya ew dikin agahdar e.

**9.** Xwedê ye yê ku bayan dişîne û ewran dixe bizavê. Ha bi vî awayî em wan dişînin devera mirî (hişkbûyî) û piştî hişkbûna erdê Em dîsa wê hêşîn dikin. Her wisa em miriyan jî piştî mirinê sax dikin.

**10.** Kî ku şeref û rûmetê bixwaze, vêca izzet û rûmet tev ji cem Xwedê ne. Gotinên xweş û rind her bi bal Wî ve bilind dibin û kar û barên qenc wan gotinan bilind dike. Herçî ew ên ku fendên xerab dikin, ji bo wan ezabekî dijwar heye û fendên wan pûç dibin.

**11.** Xwedê hûn ji axê, paşê (hûn) ji dilopek av çêkirin, piştre hûn kirin hevser (jin û mêr). Tu mêyik ber nagire û berê xwe danayne ku ne bi zanîn û teqdîra Xweda be. Her candarekî ku temenê wî dirêj bibe yan jî kêm bibe, ew her di kitêbê de ye. Bêguman ev li cem Xwedê hêsan e.

**12.** Her du derya ne wek hev in; ev a pir şêrîn e, têhnahiyê dibe, vexwarina wê hêsan e. Ev a ha jî pir şor e, tehl e. Hûn ji tevan jî goştekî taze (masî) dixwin û xişrekî ku hûn li xwe dikin jê derdixin. Tu keştiyan dibînî ku behrê diqelêşin/digerin, da ku hûn ji qenciya Xwedê (li risqê xwe) bigerin û (ji bo ku Xwedê ev qencî daye we hûn) şukrê Wî bikin.

**13.** Xwedê şevê dixe ser rojê û rojê jî dixe ser şevê. Roj û heyv ji fermana xwe re stûxwar kirine. Her yek ji wan heya demeke navlêkirî dê di rêgeha xwe de bigerin. Ha (yê ku ev tev kirine) perwerdegarê we Xwedê ye. Milk (û desthilatedarî) yê Wî ye. Ew ên ku ji bilî Xwedê hûn îbadetê wan dikin, ew ne xwediyê qaşilka ser sîsikê ne jî.

**14.** Eger hûn gazî wan (pûtan) bikin, ew gaziya we nabihîzin. Eger ku ew (gaziya we) bibihîzin jî, lê ew nikarin bersiva we bidin. Roja qiyametê jî ew ê şirka we jî mandel bikin. Kes mîna wî Xwedayê ku bi her tiştî zana te agahdar nake.

**15.** Gelî mirovan! Hûn hewceyî Xwedê ne. Yê Ğenîy yê Ḥemîd her ew e.[1]

**16.** Xwedê eger bivê dê we ji navê bibe û mexlûqekî din bîne şûna we.

**17.** Ev yek ji bo Xwedê helbet ne zehmet e.

**18.** Tu kes gunehê tu kesê din hilnagire. Eger yekî gunehgiran gazî bike da ku gunehê wî hilgire, çendî ew lêzimê wî be jî, tiştek ji gunehên wî nayê hilgirtin. Bêguman bes tu wan ên ku di xeybê de ji Xwedayê xwe ditirsin û bi berdewamî nimêj dikin dikarî (bi vê Quranê) bitirsînî. Kî (ji gunehan) xwe paqij bike, ew xwe tenê ji bo xwe paqij dike û dûmahîka hemû mexlûqan her bi bal Xwedê ve ye.

---

1 El-Ğenîy: Ew ê ku qet ne hewceyî tu yekî ji mexlûqê xwe ye, ji bo ku ew bi xwe bêkêmasî ye û xwedanê salixên kemalê ye. Hemî mexlûq mihtacê wî ne û hewcedarê bal qencî û arîkariya wî ve ne.

El-Hemîd: Ew ê ku li ser zat, nav, sîfat û kar û barên xwe layîq û babetê hemd û sena ye. Ew ê ku di ferehî û tengezariyê, di tundî û xweşiyê de hemdê wî tê kirin. Ew ê ku bê sedem û sebeb babet e ji bo hemd û senayê. Lewra; yê ku bi kemal û tekûzî hatiye salixdayin her ew e.

**19.** Yê kor û yê biçav ne mîna hev in…

**20.** Tarîtî û ronahî…

**21.** Sî û germayî jî (wekhev nabin).

**22.** Yên sax û yên mirî ne wek hev in. Bêguman Xwedê kê bivê bi wî dide sehkirin. (Ya Muhemmed!) Teqez tu nikarî (heqiyê) bi miriyên di goran de bidî sehkirin.

**23.** Tu tenê hişyarkerek î.

**24.** Bêguman me tu digel heqiyê mizgînber û hişyarker şandî. Tu miletek tune ye ku pêxemberek ji bo wan nehatibe.

**25.** Eger ew bi te bawerî neyînin bêguman wan ên beriya wan jî bawerî neanîbû, digel ku (pêxemberên wan) mucîze, suhûf û kitêbên ronahîker ji wan re anîbûn.

**26.** Paşê ew ên ku kafir bûne, min ew bi ezab hingaftin, de ka binêre cezadana min çawan bû?

**27.** Erê ma tu nabînî ku Xwedê ji ewran avek barandiye, vêca me bi wê avê fêkiyên rengereng û di çiyan de jî rêkên spî, sor û reştarî ku rengên wan ne wek hev in, çêkirine.

**28.** Her wisa Me însan, dewar û terş (deve û pez) jî rengereng (afirandine). Ji bendeyên Xwedê bes yên alim ji Xwedê bi heqî ditirsin. Bêguman Xwedê desthilat û gunehjêbir e.[1]

**29.** Bêguman ew ên ku kitêba Xwedê dixwînin, berdewamî nimêj dikin û ji risqê ku me daye wan bi dizî û aşkera (di riya Xwedê de) xerc dikin, ew (ji Xwedayê xwe) bazirganiyeke bêxesar hêvî dikin.

**30.** (Ew vê dikin) da ku Xwedê xelata (reftarên) wan bide wan û ji qenciya xwe dê zêde jî bide wan. Bêguman Xwedê gunehjêbir e, şukirdar e.

**31.** (Ya Muhemmed!) Ew a me ji bo te ji vê kitêbê hinartiye, ew heq e. Rastderêxê kitêbên beriya xwe ye. Bêguman Xwedê bi bendeyên xwe teqez agahdar e, bîner e.

**32.** Paşê wan ên ku me ew ji nava bendeyên xwe bijartine, me ew kirin warisê kitêbê. Vêca hin ji wan hene ku neheqiyê li xwe dikin û hin ji wan di riya navinc de diçin û hin ji wan bi destûra Xwedê di qenciyan de pêşbaziyê dikin. Ha ev, kerema mezin e.

**33.** (Ew kerema mezin) bihiştên Ednê ne ku diçinê, ew tê de bi bazinên zêrîn û morîkên neqişandî têne xemilandin û cilên wan jî tê de hevrîşim e.

**34.** Ew dibêjin: Hemd ji wî Xwedayî re be ku derd û kovan ji me birin. Bêguman Xwedayê me her Xefûr e, Şekûr e.[2]

---

1 Zana ew kes e ku Xwedê tam nas bike, Wî mezin bidêre û bizane ku ew li ser her tiştî qadir e. Ji ilmê jî meqsûd; ew ilm e ku digel wî îman jî hebe. Îbnu Kesîr gotiye: “Zanayên ku Xwedê nas dikin ew tam jê ditirsin. Lewra mirov li gorî dereca naskirina xwea bi Xwedê ji Xwedê ditirs e.

2 El-Xefûr: Ewê ku gunehê gunehkaran di sitirîne, wan nahetikîne û li serê wan nede ezabê.

Eş-Şekûr: Emelê hindik li balê zêde dibe û padaşa wan qat bi qat zêde dide wan. Vêce şêkiriya Xwedê ji ebdê wî re ku li hemberî qenciya wan xêrê dide wan û emelê wan qebul dike.

**35.** Ew ê ku ji qenciya xwe em xistine mala lêmayîna bêdawîn. Tu zehmetî tê de nagihîje me û ne jî kerixandin.

**36.** Ew ên ku kafir bûne, ji wan re jî agirê dojehê heye. Hukmê mirinê li wan nayê birîn vêca ku ew bimirin (û reha bibin) û li ser wan ezabê dojehê jî qet nayê sivikkirin. Bi vî awayî em her kafirî ceza dikin.

**37.** Ew li dojehê dikine feryad û dibêjin: Xwedayê me! Me derîne da ku ji bilî wî karê ku me dikir, em karekî qenc bikin. (Xweda ji wan re dibêje:) Ma me temenekî wisa nedabû we ku kesê tê de bifikire ew ê jê şîret wergire û ji we re hişyarker jî hatibû. Nexwe ezab tehm bikin, îcar ji zaliman re tu arîkar jî tun in.

**38.** Bêguman Xwedê zanayê bi xeyba erd û asîmanan e. Bêguman Ew bi ya di dilan de jî dizane.

**39.** Xwedê ye yê ku li ser erdê hûn kirine şûngirên hev. Vêca kî kafir bibe webalê kafiriya wî jê re ye. Kufra kafiran li cem Xwedayê wan, ji hêrsê pê ve ew tiştekî din li wan zêde nake. Kufra kafiran ji ziyanê pê ve tiştekî din li wan zêde nake.

**40.** Bibêje: Ji min re bêjin, ew hevpişkên ku ji bilî Xwedê we îbadetê wan dikir, nîşanî min bidin ka çi ji erdê afirandine? Yan ma di afirandina asîmanan de (ji Xwedê re) hevpariyeke wan heye? Yan jî me pirtûkek daye wan, vêca ji wê pirtûkê delîleke wan heye?!. Nexêr, ew zalim ji xapandinê pê ve tu peymanê nadin hev.

**41.** Bêguman Xwedê erd û asîmanan radigire da ku nekevin û eger ku bikevin jî piştî wî kes nikare wan ragire. Bêguman Xwedê her berbihêr e, gunehjêbir e.

**42.** Wan kafirên (Mekkeyê) bi (navê) Xwedê sonda asê xwar; eger ku pêxemberek ji wan re were, ew ê ji temamê umetan (cihû û filehan) bêhtir di riya rast de bin. Lê belê çi dema pêxember ji wan re hat, hatina wî ji bilî ku ew ji heqiyê dûr kirin pê ve tiştekî din li wan zêde nekir…

**43.** (Ji ber ku) xwe li ser erdê qure dikirin û fen û fût digerandin. Hal ev e ku dolabên pîs tenê xwediyê xwe dorpêç dike. Vêca bes ew çavnêriya fermana Xwedê dikin, ya ku li ser ên berê bi kar hatibû. Tu yê di adetên Xwedê de tu guhartinê nebînî û tu yê di adetên Xwedê de tu veguhastinê jî nebînî.

**44.** Ma ew li ser erdê nagerin, vêca bibînin ka encama wan (umet)ên beriya wan çawa bûye?! Ew ji wan her zêde xurttir bûn. Ne li asîmanan ne jî li erdê tu hêzek tune ye ku Xwedê neçar bihêle. Birastî jî Xwedê ‘Elîm e, Qedîr e.[1]

**45.** Eger Xwedê ji ber gunehên mirovan ew zû bi zû ceza bikirana, dê li ser rûyê erdê tu zindiyek nehiştibûya. Lê belê Xwedê cezayê wan heya demeke navlêkirî dide paş. Vêca dema civanê wan bê, bêguman Xwedê bînerê bi evdên xwe ye.

---

1 El-‘Elîm: Ew ê ku zanîna wî dor li her berçav û veşareyan, raz û eşkereyan, alema jorîn û jêrîn, dema bûrî, dema têdeyî û dema werê girtiye û tiştek li ber wî veşartî û nehan namîne.

El-Qadiru: Ew ê ku li ser her tiştî karaye, di erd û asîmanan de tu tişt wî naçar nahêle, ew e yê ku her tiştî teqdîr dike.

El-Qedîru: Ev bi wateya “Qadir”î tê. Lê belê peyva “Qedîr”ê di pesindayîne Xwedê de zêde watebartir e ji peyva “Qadir”ê.

# 36. SÛREYÊ YASÎN

Sûreyê Yasîn, 83 (heştê û sê) ayet e. Li Mekkê nazil bûye. Sûre navê xwe ji ayeta 1'em girtiye.

Sûreyê Yasîn, bi piranî li ser bawerîanîna bi saxbûna piştî mirinê û heşr û neşrê, qiseya xelkê gundekî û delîlên ku yekîtiya Xwedê nîşan didin disekine.

Sûret, helwesta dozvanê bawermend "Hebîbê Neccar" bi bîr tîne ku şîret li milletê xwe kiribû û ji loma ew kuştibûn. Sûreyî, behsa delîlên yekîtî û qudreta Xwedê dike ew ên ku di vê kaînata ecêb de qewimîne û diqewimin. Pêşî, ji temaşegeha erda hişk û hola û ji temaşegeha şevê ya ku ew reşetarî ye û ro jê vediqete, ji temaşegeha roja ronak a ku bi qudreta Xwedê a di rêgeha xwe de digere û hîç xalekê jî şaş nake, ji temaşegeha heyvê ku dikeve rêgehên xwe û ji temaşegeha keştiya tije ya ku kinêsa pêşiyan hildigre behs kiriye ku ev hemû delîlne eşkere ne û qudreta Xwedê nîşanî xweyeqlan didin.

Sûre, dawiyê behsa saxbûna piştî mirinê û padaş û sezayê dike û ji vê re delîlan tîne.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Yasîn.
2. Qesem bi Qurana Ḥekîm be.
3. Bêguman tu (ey Muhemmed) ji pêxemberan î.
4. Li ser riyeke rast û durist î.
5. (Ev Quran), ji cem Xwedayê 'Ezîz ê Reḥîm ve hatiye hinartin…
6. Da ku tu qewmekî hişyar bikî ku bav û kalên wan nehatibûn hişyarkirin, vêca haya wan (ji îman û heqîqetê) tun e.
7. Sond be, li ser pirên wan ezab pêwîst bûye, vêca ew bawerî nayînin.
8. Bêguman me qeyd û zincîr xistine stûyên wan, êdî ew qeyd gihîştine heya çeneya wan, vêca serrakirî mane.
9. Me li pêşiya wan bendek û li pişt wan jî bendek daniye û me perdeyek xistiye ser çavên wan, êdî ew (heqiyê) nabînin.
10. Ji wan re wekhev e, çi tu wan (ji ezabê Xwedê) hişyar bikî, çi tu wan hişyar nekî, her ew bawerî nayînin.
11. Bêguman bes tu, wî yê ku dide pey Quranê û di halê nependiyê de jî ji Xwedayê rehman bitirs e, dikarî (bi vê Quranê) hişyar bikî. Vêca tu mizgîna lêborîn û xelateke hêja bidê.
12. Bêguman bes em in ên miriyan sax dikin. Em kar û barên ku wan li pêşiya xwe şandine (axiretê) û berhemên ku li dûv xwe hiştine jî dinivîsin û her tişt di kitêbeke diyarker de nivîsandî ye?
13. Ji bo wan, mînaka xelkê wî bajarî bîne, wê dema pêxember ji wan re hatin şandin.
14. Wê demê me ji bo wan du pêxember şandin, vêca wan bawerî bi wan neanî. Me jî bi pêxemberê sêyem piştgiriya wan kir. Wan (her sê pêxemberan) bi hev re (ji wan re) got: Bêguman em qasidên Xwedê ne, ji bo we hatine şandin!

**15.** Gotin: Hûn bes mirovên mîna me ne. Xweda yê Rehman ji bo me tiştek neşandiye. Bes hûn her derewan dikin.

**16.** (Pêxamberan) got: Xwedayê me dizane ku birastî em ji bo we bi pêxemberî hatine şandin.

**17.** Ji bilî teblîxa aşkera em bi tu tiştî ne berpirs in.

**18.** Gotin: Ji rûyê we de bêqudoşî bi ser me de hat. Sond be, eger hûn ji vê doza xwe venegerin em ê her we bi keviran birecimînin û ji cem me ve teqez îşkenceyeke erjeng dê bihingive we.

**19.** (Pêxemberan) Got: Bêqudoşiya we (ji ber kufra we) ligel we ye. Erê ma ji bo ku şîret li we hatiye kirin (bêqudoşî bi ser we de hat)? Naxêr, ne wisan e! Belkî hûn miletekî ku zêde serxweveçûyî ne.

**20.** Di vê navê de, ji dûrî wî bajarî zilamek bi bez hat û got: Hey qewmê min! Bidin pey van pêxemberan!

**21.** Bidin pey van ên ku ji we tu heqedestî (ucretê) naxwazin, bêguman ew li ser rasteriyekê ne.

**22.** Zilam Got: Ma çi li min qewimîye ku ez îbadetê Xwedê nekim, ew ê ku ez xuliqandime û ew ê ku hûn ê bi bal ve bên vegerandin.

**23.** Erê ma ez ê ji bilî Xwedê (ji xwe re) îlahekî din bigrim? Eger ew Xweda yê Reḥman, ji bo min zerarekê bixwaze mehdera wan (pûtên we) dê feydeya tiştekî nede min. Ew qet nikarin min (ji ezabê Xwedê) rizgar bikin.

**24.** (Eger ez ji bilî bilî Ellah li xwedayekî din bigerim), wê çaxê teqez ez di rêşaşiyeke aşkera de me.

**25.** Bêguman min bawerî bi Xwedayê we anî; vêca li min guhdarî bikin.

**26.** (Piştî vê axaftinê ew kuştin, vêca) jê re hat gotin: Têkeve bihiştê! (Piştî wî kerema Xwedayê xwe dît) Got: Xwezî gelê min jî ev bizaniya…

**27.** Bi ya ku Xwedayê min ez xefirandime û ez gerandime ji yên ku qencî li wan bûye.

**28.** Me piştî (şehîdbûna) wî ji bo (helaka) gelê wî, ji esmên tu leşkerek danexistiye û em danaxin jî.

**29.** Bes ew yek qîreke dijwar bû, vêca di cih de ditemirîn.

**30.** Hey wax li rewşa îbadan! Çiqas pêxemberek ji wan re hatibe, her wan tinaz pê kirine.

**31.** Ma ew nabînin ku Me beriya wan çend qewm birine helakê ku birastî jî ew careke din li wan nazîvirin.

**32.** Helbet ew hemû (ji bo hesabê xwe) dê li hizûra me bêne komkirin.

**33.** Erda mirî (ya hişk û hola) ku em wê sax (û hêşîn) dikin û em jê heb û tene derdixin, vêca ew jê dixwin (û pê dijîn), ji bo wan nîşan û delîl e (ku Xwedê dikare ji goran jî miriyan sax rake).

34. Me tê de gelek baxçeyên xurma û rezên tirî danîne û me gelek kanî jê pijiiqandin û herikandin.

35. Da ku ew ji fêkiyên wan bixwin û ew ne bi destên wan hatiye çêkirin. Erê ma hê jî şukrê Xwedê nakin?

36. Ew Xwedayê ku ji tiştên erd hêşîn dike û ji mirovan û ji mexlûqên ku hê jî însan rastiya wan nizane, her tişt cot (nêr û mê) afirandine (ji her kêmasî û ji ya nehêja) pak û paqij e.

37. Şev jî ji bo wan nîşan û delîl e (li ser qudreta Xwedê). Em rojê ji ser wê radikêşin, vêca di wê demê de ew di tariyê de dimînin.

38. Roj jî ji bo wan nîşan e, ew di rêgeha xwe de digere. Ha ev teqdîra Xwedayê desthilat ê zana ye.

39. Heyv jî ji bo wan nîşan û delîl e, Me ji bo heyvê jî hin qonax (rêgeh) terxan kirine, heyanî paşê ew wekî çiqlê dara xurmê xwar dibe (dibe hîlal) û vedigere.

40. Ne ji rojê re durist e ku bigihîje heyvê ne jî şev dikare bide pêşiya rojê. Her yek ji wan di rêgeh û çerxekê de melevanî dikin û çerx dibin.

41. Ji bo wan nîşan û delîl e ku Me kinêsa mirovan di keştiya tije de hilgirtiye.

42. Me ji bo wan gelek tiştên wekî keştiyê ku ew lê siwar bibin çêkirin.

43. Eger em bixwazin (digel keştiyan jî) em ê wan binav bikin û bixeniqînin, wê çaxê ji wan re ne hewar dê hebe ne jî ew ê bêne rizgarkirin.

44. Ji bilî ku em heta demeke navlêkirî ji cem xwe dilovanî û pêxweşbûnekê bidin wan.

45. Dema ji wan re bê gotin: ji ezabê dinyayê û yê axiretê xwe biparêzin, da ku rehmet li we bê kirin (ew deng nabin xwe).

46. Çiqas ayetek ji ayetên Xwedayê wan ji wan re hatibe her wan berê xwe jê guhartiye.

47. Dema ku ji wan re bê gotin; ji wî risqê ku Xwedê daye we di xêrê de xerc bikin; ew ên ku kafir bûne ji yên bawermend re dibêjin: Erê ma em ê xwarinê bidin wan ên ku Xwedê nexwestiye xwarinê bide wan? Bêguman hûn bes di rêşaşiyeke aşkera de ne.

48. Dibêjin: Eger bi rastî hûn rastgo ne (de ka bibêjin;) ma ev peyman (a saxbûna piştî mirinê) kengê ye?

49. Ew tenê çavnêriya qîrekê dikin ku ji nişka ve ew wan bigire û bihingêve û ku ew hêj bi hev re di nîqaşê de ne.

50. Wê demê ew ne dikarin wesiyetekê bikin ne jî dikarin li malbatên xwe vegerin.

51. Di sûrê (boqê) de tê pifkirin, ha (tu dibînî ku wa ye) ew ji goran radibin, bi lez û bez têne hizûra Xwedayê xwe.

52. Ha wê çaxê (yên kafir) dibêjin; hey wax li halê me be! Kê ji tirbên me em vejandine? (Ji wan re tê gotin) Ev, ya ku Xweda yê Rehman soz pê dabû û pêxemberan jî jê rast xeber dabû!

53. Ev rûdan bes yek qîrek e, wê hingê ew hemû li hizûra me amade dibin.
54. Îro bi tu tiştî neheqî li tu kesî nayê kirin û ji bilî ya we kirî pê ve hûn nayêne cezakirin.
55. Bêguman îro bihiştî bi dilxweşî di nav xweşiyan de mijûl in.
56. Ew û jinên xwe di binê siyan de li ser textan paldayî ne.
57. Tê de her texlît mêwe û çi tiştê ew bixwazin ji bo wan heye.
58. Ji cem Perwerdegarê dilovîn, ji wan re „silav“ tê gotin.
59. Îro, gelî gunehkaran (ji bawermendan) veqetin!
60. Gelî zarokên Adem! Erê ma (bi navgîna pêxemberan) me qewîtî li we nekiribû ku hûn şeytên nehebînin. Bêguman ew ji bo we neyarekî aşkera ye!
61. (Ma me qewîtî nekiribû ku) hûn bes min bihebînin. Ha ev riya rast û durist e!?
62. Şeytan ji we, pir kes ji rê xistin. Erê ma hûn tênagihîjin?
63. (Ji wan re li axiretê wiha tê gotin:) Ha ev e, ew dojeha ku soza wê ji we re hatibû dayîn.
64. Ji ber kafiriya ku we dikir, îro de bikevinê!
65. Îro em ê devên wan mor bikin û destên wan dê bi me re biaxivin û lingên wan dê şadehiyê li ser wan bidin.
66. Eger me xwestibûya me dê çavên wan kor û hitim bikirina, êdî bi lez û bez biketina ser rê, vêca ka çawa ew ê rê bibînin?
67. Eger me xwestibûya me dê ew di cihê wan de biguharta, vêca wan dê nekaribûya bi pêş ve herin ne jî bi paş ve vegerin.
68. Çi kesê ku Em temenê wî dirêj bikin, em di xulqiyeta wî de wî diguherînin (êdî bêhêz û piştxûz dibe). Erê ma ew ji vê jî aqil nagirin?
69. Me şi’r fêrî Pêxember nekiriye û ev ne babetê wî ye jî. Ya ku me fêrî wî kiriye, bes haydarî û Qurana ronak e.
70. Da ku ew bi vê Quranê kesê zindî hişyar bike û da ku li ser kafiran jî ezab misoger bibe.
71. Erê ma ew kafir nabînin ku me ji karê destê xwe ji bo wan terş afirandine, vêca ew ji wan re xwedî ne?!
72. Me ew terş ji wan re sernerm kirine, vêca hin ji wan siwareyên wan in û hin ji wan jî goştê wan dixwin.
73. Ji bo wan, di van de gelek berjewendî û gelek vexwarin hene. Erê ma hê jî ew şukir nakin?
74. Dîsa wan bi hêviya ku dê arîkariya wan bikin, ji bilî Xwedê ji bo xwe hin îlah girtin.
75. Ew qet nikarin arîkariya wan bikin, lê belê ew bi xwe di xizmeta wan de amade ne.

76. (Ya Muhemmed!) Bila gotina wan te xemgîn neke. Bêguman Em bi ya ku ew vedişêrin û bi ya ku aşkera jî dikin, dizanin.
77. Ma însan nabîne ku me ew ji dilopek av afirandiye, lê tu dibînî wa ye ew bûye dijminekî aşkera.
78. Der heqê Me de derb û meseleyan li dar dixe û xulqiyeta xwe ji bîr kiriye, dibêje; ma kî yê vî hestiyê riziyayî sax bike?!
79. Bibêje: Ew Xwedayê ku cara pêşîn ew afirandiye, dê wan sax jî bike. Ew bi her mexlûqî zana ye.
80. Ew ê ku ji dara hêşîn ji we re agir deraniye, vêca hûn pê êgir vêdixin.
81. Erê ma ew ê ku erd û asîman afirandin, nikare yên mîna wan biafirîne? Belê, helbet dikare. Her Ew e yê Xellaq yê 'Elîm.
82. Fermana Xwedê -dema ku ew tiştekî bixwaze- tenê ev e ku jê re bibêje „bibe." Vêca ew jî çêdibe.
83. Ew ê ku milk û hukimranîya her tiştî di destê Wî de ye (ji her kêmasiyê) pak û paqij e û hûn ê her bi bal Wî ve vegerin.

# 37. SÛREYÊ SAFFAT

Sûreyê Saffat 182 (sed û heştê û du) ayet e. li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de bêjeya Saffat derbas bûye û bi mehneya wan ên ku sef girtine/vewestan e.

*Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm*

1. Sond bi wan ên ku rêz bi rêz sef girtine…
2. Bi wan ên ku diajon…
3. B wan ên ku zikir dixwînin…
4. Bêguman Xwedayê we her yek e.
5. Ew Perwerdegarê erd û asîmanan û çiqas tiştê di navbera wan de û Perwerdegarê rojhilatan e.
6. Bêguman Me asîmanê cîhanê bi xweşikahiya stêran xemilandiye.
7. Me (bi stêran) asîman ji her şeytanê serhildêr parastiye.
8. Ew (şeytan) nikarin li civata bilind (a firîşteyan) guhdarî bikin û ji her aliyî ve (bi stêran) têne recimandin.
9. Da ku wan biqewirînin û ji bo wan ezabekî seraqetî heye.
10. Lê belê yê ku (ji gotinên firîşteyan) tiştekî bidestxe bizotên şewatok û qulker wî dişopînin.
11. Ji wan (muşrikan) bipirse! Ma çêkirina wan ji Xwedê re zor e, yan çêkirina tiştên dîtir? Bêguman me ew ji heriyeke zeliqînok afirandine.

12. Na, belkî tu (ji inkarkirina wan) şaş dimînî, digel ku ew jî tinazê xwe dikin.
13. Dema ku (bi Quranê) bêne şîretkirin jî; nafikirin û şîret nagirin.
14. Dema ku mucîzeyekê bibînin; tinazên xwe pê dikin.
15. Dibêjin: Ev, tenê sêrbaziyeke aşkera ye.
16. Erê dema em mirin, bûne ax û hestî, ma (dîsa) em ê bêne saxkirin?!
17. Erê ma bavên me yên pêşîn jî (dê bêne saxkirin)?
18. Bibêje: Belê, hem jî hûn ê şerpeze û reben bin.
19. Ew (saxkirin) tenê yek qîrek e, ji nişka ve ew (radibin û li dehşeta qiyametê) dinêrin.
20. Kafir dibêjin: Hey wax li me! Ev roja hesab û cezayê ye.
21. Ha ev, roja hukimbirînê ye, ya ku we bawerî pê nedianî.
22. (Xwedê li firîşteyan ferman dike:) Sitemkaran û hevalên wan li hev bicivînin û ew ên ku îbadetê wan dikirin…
23. Ji bilî Xwedê. Vêca berê wan bidin rêka dojehê.
24. Wan (sitemkaran) bidin sekinandin, bêguman ew ê bêne pirsyarkirin.
25. (Ji wan re tê gotin:) Erê ma çi ji we bûye ku hûn arîkariya hev nakin?
26. Naxêr! Ew îro (bi rebenî) radest bûne.
27. Hin ji wan berê xwe didin hinekan û hev sûcdar dikin.
28. Dibêjin: Hûn ji rastê ve dihatin cem me.
29. (Pêşrew jî ji peyrewan re wiha) Dibêjin: Na, belkî we bawerî neanîbû…
30. Tu hêza me ya ku em zorê li we bikin jî nebû. Lê belê hûn bi xwe civateke jirêderketî bûn.
31. Vêca ezabê Xwedayê me li ser me û li ser we pêwîst bû. Em ê jî (wî cezayî) tehm bikin.
32. Vêca me hûn ji rê xistin, lewra em bi xwe jî di rêşaşiyê de bûn.
33. Bêguman wê rojê di ezabê de ew hevpar in.
34. Ha Em, li gunehkaran bi vî awayî dikin.
35. Dema ku ji wan re dihat gotin; “Ji Xweda pê ve tu îlah tun in” wan xwe mezin didêra.
36. Digotin: Erê ma em ê ji bo şairekî dîn dev ji îlahên xwe berdin?
37. Naxêr, wî rastî aniye û qasidên (beriya xwe) jî rast dêrane.
38. Hûn ê (bi sedema kufra xwe) ezabê dijwar tehm bikin.
39. Bi tenê hûn ê bi ya ku we kiriye bêne cezakirin.
40. (Ji vî ezabî) tenê evdên Xwedê yên muxlis dê mu‘af bêne girtin.
41. Ew ên ha, ji bo wan risqekî vebirî heye.
42. Hemû texlîtên fêkiyan dixwin û qedrê wan tê girtin.

43. Di bihiştên xwedînîmet de…
44. Li ser textan, li pêşberî hev rûniştî ne.
45. Ji kaniyên herek kasên meyê ji wan re tên gerandin.
46. Şerabeke spî ye, lezetê dide vexweran.
47. Ne tê de sersemkirin heye ne jî pê serxweş dibin.
48. Li cem wan, jinên çavrind û mezin hene ku tenê li wan (mêrên xwe) dinêrin.
49. Her wekî ku ew, hêkên veşartîne.
50. Ha wê çaxê, hin xelkê bihiştê berê xwe didin hev; li hev dipirsin.
51. Ji nav wan yek dibêje: Birastî hevalekî min (li dinyayê) hebû…
52. (Ji tinaz ve ji min re) digot: Erê ma tu jî ji wanên ku (bi saxbûna piştî mirinê) bawerî tînin?
53. Erê ma dema ku em bibin ax û hestî em ê bêne cezakirin?
54. (Wî ji bihiştiyan re) got: Ma hûn jî lê nanihêrin.
55. Vêca wî çavê xwe li dojehê gerand, wî dît ku (hevalê wî) di nîvê dojehê de ye.
56. Jê re got: Ez bi Xwedê kim, hindik mabû tu min jî ji rê bibî.
57. Eger ne ji qenciya Xwedayê min bûya, teqez ez jî dibûm ji dojehiyan.
58. (Dojehî got:) Erê ma vêca em hew dimirin?
59. (Cennetî got:) Em ji mirina xwe ya pêşîn pê ve namirin û em nayêne ezabdayîn?
60. Bêguman ev a ha, her ew e rizgariya mezin.
61. Ji bo serfiraziyeke wisa bila yên karker kar bikin.
62. (Xwedê dibêje:) Ma ji aliyê mêvandarî ve ev nîmetên me gotî çêtir in yan jî dara rûlê (zeqûmê)?
63. Me dara rûlê ji zaliman re kiriye îmtihan û ceribandin.
64. Bêguman ew dareke wisa ye ku ji binê dojehê hêşîn dibe.
65. Fêkiyên wê her wekî ku ew serên şeytanan e.
66. Bêguman (dojehî) jê dixwin, vêca ew zikên xwe ji wê tijî dikin.
67. Piştre bi ser xwarina zeqûmê de ji wan re vexwarineke (ji edab û xwînê) têkilhev heye.
68. Paşê vegera wan bi bal dojehê ve ye.
69. Bêguman wan bav û kalên xwe di nava rêşaşiyê de dîtin.
70. Vêca wan jî di şopa bav û kalên xwe de dilezand.
71. Sond be, (resûlê min!) gelek qewmên berî wan jî ketibûn delaletê.
72. Bi sond, Me ji nav wan, ji wan re pêxember şandin da ku wan hişyar bikin.
73. De binêre, ka encama wan ên hatine hişyarkirin çawa bûye?!
74. Ji bilî bendeyên Xwedê yên dilsafî (yên ku bawerî anîn).
75. Sond be, Nûh hawara xwe gihande me, vêca em çi xweş bersivdar in.

76. Me Nûh û malbata wî ji tengasiya mezin xelas kirin.
77. Me zuriyeta wî tenê li ser rûyê erde hişt.
78. Me di nav yên ku piştî wî tên, navê wî bi qencî hêla.
79. Di nav temamê alemê de Silav li Nûh be!
80. Muheqqeq em bi vî awayî qencîkarên rast û durist xelat dikin.
81. Birastî Nûh, ji bendeyên me yên bawermend bû.
82. Paşê me ên din (yên ku bawerî neanîbûn) bin-av kirin û xeniqandin.
83. Yên ku li ser rêk û rêbaza Nûh diçin yek ji wan jî Îbrahîm e.
84. Dema (Îbrahîm) bi dilekî pak û saf hate cem Xwedayê xwe…
85. Gava ku ji bavê xwe û gelê xwe re got: Hûn îbadetê çi dikin?
86. Ma hûn bi derewan hin îlahên ji bilî Xwedê dixwazin?
87. Nexwe der barê Perwedegarê alemê de hizr û dîtina we çi ye?
88. Vêca Îbrahîm berê xwe da stêran.
89. (Ji wan re) Got: Ez nexweş im (nikarim derkevim cejnê).
90. Vêca pişta xwe dane Îbrahîm û çûn.
91. Îcar (Îbrahîm) bi dizîka berê xwe da bal pûtên wan û ji wan re got: Erê ma çima hûn xwarinê naxwin?!
92. Ma ji bo çi hûn napeyivin?
93. Bi ser pûtan ve çû û bi destê xwe yê rastê û bihêz ew şikandin.
94. (Gava dîtin ku pûtên wan hatine şikandin) Bi bez ber bi Îbrahim ve çûn.
95. Îbrahîm got: Ma hûn îbadeta tiştên ku we ew çêkirine, dikin?
96. Xwedê hûn jî û ya ku hûn dikin jî afirandiye.
97. (Pûtperestan ji hev re) Got: Ji bo wî avahiyekê saz bikin û di cih de wî di êgir werkin!
98. Vêca wan xwest li Îbrahîm kemînê çêkin, vêca Me ew rezîl û riswa kirin.
99. Îbrahîm got: Ez diçim bal Xwedayê xwe ve, ew ê min rasterê bike.
100. Got: Xwedayê min! Zarokekî qencîkar bide min.
101. Vêca me mizgîna kurekî mulayîm û îtaetkar da Îbrahîm.
102. Dema kurê wî gihîşte çaxa ku bi bavê xwe re bigere û digel wî kar bike, Îbrahîm jê re wiha got: Kurê min! Min di xewnê de dîtiye ku min tu şerjê dikir. Vêca tu çi dibejî? Wî jî bersiv da û jê re got: Bavo fermana ku li te hatiye kirin, bi cih bîne. Xwedê hez bike, tu dê min ji sebirkêşan bibînî.
103. Vêca dema ku herdu (ji emrê Xwedê re) teslîm bûn; ew li ser eniya wî gêr kir.
104. Me bangî wî kir; Ey Îbrahîm!
105. Bi rastî te xewn bi cih anî. Bêguman em bi vî awayî qencîkarên rast û durist xelat dikin.

106. Bêguman ev a ha, her îmtihaneke aşkera ye.
107. Me qurbaneke mezin kire goriya wî.
108. Me di nav yên ku di pişt wî tên de, navê wî bi qencî hêla.
109. Silav li Îbrahîm be!
110. Ha em bi vî awayî qencîkarên rast û durist xelat dikin.
111. Bêguman ew ji bendeyên me yên bawermend bû.
112. Me bi çêbûna Îshaq mizgîn dayê ku ew pêxemberekî ji salihan e.
113. Me bereketa xwe da ser wî û da ser Îshaq. Ji kinêsa wan hinek baş bûn û hinek jî ji bo xwe sitemkarên aşkere bûn.
114. Sond be, me qenciya xwe li Mûsa û Harûn jî kir.
115. Me ew herdu û gelên wan jî ji tengasiya mezin rizgar kirin.
116. Me arîkariya wan kir, vêca ew her yên serkeftî bûn.
117. Me kitêba ronak û aşkera daye wan.
118. Me herdu li ser riya rast rasterê kirin.
119. Me di nav yên ku di pişt wan tên de, navê wan bi qencî hêla.
120. Silav li Mûsa û Harûn be!
121. Bêguman Em bi vî awayî qencîkarên rast û durist xelat dikin.
122. Birastî her du jî ji bendeyên Me yên bawermend bûn.
123. Muheqqeq Îlyas jî ji pêxemberan e.
124. Wê dema ji gelê xwe re got, ma hûn (ji Xwedê) natirsin?
125. Ma hûn îbadetê Be'l dikin û çêtirînê afirîneran dihêlin?
126. Ku ew perwedegarê we û Perwerdegarê pêşîyên we ye jî.
127. Vêca wan bawerî pê neanî û ew ê (di dojehê de) bêne berhevkirin.
128. Ji bilî bendeyên Xwedê yên dilsaf (ew ji vê cuda ne).
129. Me di nav yên ku di pişt wî de tên, navê wî bi qencî hêla.
130. Silav li ser Îl'yasîn be!
131. Bêguman em bi vî awayî qencîkarên rast û durist xelat dikin.
132. Bi rastî ew jî ji bendeyên me yên bawermend bû.
133. Bêguman Lût jî ji pêxemberan e.
134. Wê demê Me Lût û malbata wî tev rizgar kirin…
135. Ji bilî pîrejinekê; ew digel yên li paş, ma.
136. Piştre Me ên din birin helakê.
137. Bêguman hûn sibehan di ber (cih û warên) wan re dibihurin…
138. Êvaran jî. Ma hê jî hûn aqil nagirin?
139. Bêguman Yûnus jî ji pêxemberan e.

140. Dema (ji gelê xwe) reviya çûbû keştiya barkirî.
141. Vêca yên di keştiyê de pişk avêtin, îcar Yûnus bû ji yên ku pişklêketî.
142. Masî Yûnus dabeland û ew bû ji yên ku lome li wan bûye.
143. Bi rastî, Eger ew ne ji wan ên ku Xwedê pak didêran bûya…
144. Dê heyanî roja qiyametê di zikê masî de bimaya.
145. Me ew (ji zikê masî) avêt bejahiyê û ew nexweşhal bû.
146. Me dareke ji kundiran li ser wî hêşîn kir (da ku siya xwe bide ser wî).
147. (Piştî ku sihheta wî hate cih) Me ew (bi pêxemberî) ji sed hezaran û hê bêhtirî re şand.
148. Vêca wan bawerî bi Yûnus anîn, îcar me heya demekê jiyaneke xweş da wan.
149. Ji wan bipirse: Erê ma keç ên Xwedayê te ne û kur jî yên wan in?
150. Yan jî, dema ku me melaîket keç afirandin, ew li wir hazir bûn?
151. Agahdar bin! Bi rastî ew bi derew û bêbextî dibêjin…
152. Ku Xwedê (firîşte) welidandine. Bêguman ew her derewan dikin.
153. Qey Xwedê, keç di ser kuran re girtine?!
154. Çi bi we hatiye, hûn çawa hukim didin?
155. Ma hûn qet nafikirin?
156. Yan jî delîleke we ya aşkera heye?
157. Vêca eger bera hûn rast dibêjin, de ka kitêba xwe bînin!
158. Wan di neqeba Xwedê û cinan de xizimtî danîne. Sond be, cin jî dizanin ku ew ên bêne berhevkirin.
159. Xwedê ji ya ku ew Wî pê diwesifînin pak û bilind e.
160. Ji bilî bendeyên Xwedê yên muxlis (ew ji vê cuda ne).
161. Bi rastî hûn û ew ên ku hûn perestina wan dikin…
162. Hûn nikarin tu kesî ji rê bixin.
163. Ji bilî kesê ku dê biçe dojehê.
164. (Firîşteyan got:) Ji bo her yekî ji me meqamekî kifşkirî heye.
165. Bêguman em, her ew in ên ku sef digirin…
166. Bi rastî jî em her ew in ên ku Xwedê ji her pûçiyê pak didêrin.
167. Her çiqas wan digot…
168. Eger kitêbek ji kitêbên pêşiyan hebûya…
169. Teqez em ê jî bibûna bendeyên Xwedê yên dilsaf!
170. Vêca (dema kitêb ji bo wan hat) wan bawerî pê neanî. Paşê ew ê bizanin ka domahîka wan dê bibe çi.
171. Sond be, me ji bendeyên xwe yên pêxember re soz dabû…
172. Birastî serkeftin her ji wan re ye.

173. Bêguman leşkerên me jî teqez dê bi ser kevin.
174. (Ya Muhemmed!) Vêca heta demekê tu berê xwe ji wan vegerîne.
175. Tu çavnêriya wan bike, ew jî dê bibînin.
176. Erê ma vêga ew bi lez ezab ji Me dixwazin?
177. Vêca dema ku dakeve qada wan, sibeha wan ên ku hatine hişyarkirin, çiqas pîs dibe!
178. Tu heta demekê berê xwe ji wan vegerîne.
179. Çavnêriyê bike, ew ê jî dê bibînin.
180. Perwerdegarê te, ew ê ku xwediyê izet û rûmetê ye, ji ya ku ew wî pê diwesifînin pak e, bilind e.
181. Silav li hemû pêxemberan bin!
182. Hemd (pesn û sipasî) ji Perwerdegarê alemê re be.

## 38. SÛREYÊ SAD

Sûreyê Sad, 88 (heştê û heşt) ayet e. Piştî Sûreyê Qemerê li Mekkê nazil bûye.

***Im Namen Allahs, des Erbarmers, des Barmherzigen!***

1. Sad! Sond be, bi vê Qurana ku xwedan pend û şîret e.
2. Nexêr, belkî ew ên ku kafir bûne di nav duretî û dijberiyekê de ne.
3. Beriya wan me çiqas milet birine helakê. Vêca wan (dema ezab didîtin) gazî û hawar dikir, (lê belê) dem ne dema xelasî û revê bû.
4. Ew (ên ku kafir bûne) ecêb dîtin ku ji nav wan pêxemberek ji wan re bê. Kafiran got: Ev, sêrbazekî pir derewkar e!
5. Erê ma ew tevekî İlahan dike yek İlah? Bêguman ev tiştekî pir ecêb e!
6. Giregir û mezinên wan derketin û (ji hev re) gotin: Li ser ya xwe berdewam bin, li ser perestina pûtên xwe sebr û sebat bikin. Bêşik ev a ku ji we tê xwestin tiştekî mezin e.
7. Me tiştekî wisa di dînê vê dawiyê de jî nebihîstiye. Bes ev tiştek e ku wî ji cem xwe derxistiye.
8. Erê ma ji nav me hemûyan ev Quran, bi tenê jê re hat? (Xwedê got:) Belkî ew derheqê Qurana min de di gumanê de ne. Nexêr! Belkî wan hêj ezabê min tehm nekiriye.
9. Yan jî, ma xezîneyên qenciya Xwedayê te li cem wan in, ew ê ku desthilat ê dayende ye?!
10. Yan jî, ma xwedanîya erd û asimanan û yên di navbera wan de ji wan re ye?

Vêca (ku wisa be) de bila bi hemû navgînan hilkişin asîmanan (û ew kê bivên bila wehyê bidinê)!.

11. Ew artêşeke bêxêr e ku ji çend qeflan pêk tê, li wir têkçûyî ye.

12. Beriya wan, gelê Nûh, gelê Ad û Firewnê ku xwedan hêz û seltenet bû, bi pêxemberên xwe bawerî neanîbûn.

13. Qewmê Semûd, qewmê Lût û xelkê Eyketê jî (bi pêxemberên xwe bawerî neanîbûn). Ha ev tev hevalbendên hev in.

14. Tevekê wan bi pêxemberên xwe bawerî neanîn, vêca ezab li ser wan misoger bû.

15. Ev ê han jî, bes çavnêriya yek qîrekê dikin, (gava ku ew bê) jê re veger û rawestan tune ye.

16. (Kafiran ) Gotin: Xwedayê me! Beriya roja hesabdîtinê, para me (ji ceza) zû bide me.

17. (Ya Muhemmed!) Xwe li hemberî ya ku ew dibêjin ragire û evdê me Dawud di bîra xwe bîne ku ew xwedanhêz bû. Bi rastî jî berê wî her bi bal Xwedê ve bû.

18. Birastî Me çiya misixur kirin, hemûyan, sibeh û êvarê ligel wî tesbih didan.

19. Me teyr jî stuxwarkirin ku ew komdibin û ev hemî bi bal Wî ve, vedigerin.

20. Me hikumraniya wî xurt kir, me hîkmet û qabiliyeta axaftineke xweş û zelal dabûyê.

21. Ma xebera her du dawedaran dema bi ser dîwarê mihrabê ketin ji te re nehat?

22. Wê dema ketin cem Dawûd, vêca ji wan tirsiya. Jê re gotin: Metirse, em du dawedar in; yekî ji me neheqî li yê din kiriye, de di navbera me de tu bi edaletî hukim bike, neheqiyê neke û me li ser riya rast rasterê bike.

23. (Yekî ji wan got:) Ev birayê min not û neh mêşinên wî hene û yê min jî yek mêşineke bi tenê ye. Ji min re dibêje: Wê jî bide min û bi xeberdanê zora min biriye.

24. Dawud jê re wiha got: Sond be; wî bi xwestina mêşina te, ji bo bixe nav mêşinên xwe neheqî li te kiriye. Bêguman pirên şerîkan, tecawizî mafê hev dikin. Lê belê şerîkên ku bawerî bînin û karên qenc bikin ew cuda ne, ew jî pir pir hindik in! Dawud bawer kir ku me ew îmtîhan kiriye. Ji Xwedayê xwe lêborîn xwest, çû sicûdê û tobe kir.

25. Vêca em jî lê borîn. Bêguman li cem Me jê re meqamekî bilind û lêvegereke spehî heye.

26. Ey Dawud! Me tu li ser erdê kirî şûngir. Vêca di navbera mirovan de bi edaletî hukim bike û nede dûv nefsê, vêca ew ê te ji riya Xwedê şaş bike. Bêguman ew ên ku ji riya Xwedê şaş bibin, bi sedem ku wan roja hesabê jibîr kiriye ji wan re ezabekî dijwar heye.

27. Me erd û asîman û yên di navbera wan de mişêya çênekiriye. Ev (a ku dibêjin ew mişêya ye) gumana wanên ku kafir bûne. Vêca hey wax li halê kafiran be, ji ber ku dê bikevin êgir!

28. Erê ma Em ê wan ên ku bawerî anî û karên qenc kirin û wan ên ku li ser erdê fesadiyê dikin wek hev bigrin. Yan jî em ê wan ên ku xwe ji ezabê Xwedê biparêzin û wan ên ku ji riya rastî derketine wek hev bigrin?

29. Me ev Quran ji bo te nazil kir ku ew pîroz e, da ku di ayetên wê de bifikirin û aqilmend jê şîretê bigirin.

30. Me (kurek bi navê) Suleyman daye Dawud. Suleyman çi xweş bende bû! Birastî jî ew pir tobekar bû.

31. Dema di çaxê êvarê de jê re hespên rewan hatin rapêşkirin.

32. Suleyman got: Bi rastî min hezkirina van hespan di ser zikrê Xwedê re girt. (Bi hespan ve mijûl bû) heta ku roj çû ava.

33. (Ji ber vê yekê got) Wan ji min re bînin û (ji bo Xwedê) dest bi jêkirina pî û stûyên wan kir.

34. Sond be; me Suleyman imtîhan kiriye. Me cesedek avêt ser textê wî. Piştre wî tobe kir û li Xwedayê xwe vegeriya.

35. Wiha dua kir: Xwedayê min! Li min bibore, hukimdariyeke wisa bide min ku piştî min tu kes negihîje wê. Bêguman her tu yî yê dayende.

36. Vêca Me jê re ba stûxwar kir ku devera ew bixwaze dê bi fermana wî bi nermahî bigere.

37 (Me jê re) şeytan jî (misixur kirin ku wan) jê re qesr lê dikirin û noqavî dikirin…

38. Hineke din jî ku bi qeydan girêdayî bûn.

39. (Me jê re) Got: Ha, dana Me ev e. Tu dixwazî bide an jî tu dixwazî nede, tu jê nayê pirsyarkirin.

40. Bêguman li nik me, meqamekî wî yî bilind û lêvegereke rind heye.

41. Behsa bendeyê me Eyyûb bike, wê dema gazî Xwedayê xwe kir: Bêguman şeytên meşeqet û azar gihandiye min.

42. (Me jê re got:) Lingê xwe li erdê bixe. Ev aveke sar e ji bo vexwarin û şûştinê ye.

43. Me jin û zarokên wî û bi qasî wan jî hinekî din lê vegerandin, ev dilovaniyek e ji cem me bû ye û ji bo aqildaran bîranînek e.

44. (Me ji Eyyûb re got:) Rahêje baqekî bi dest xwe bigire, vêca bi wan lê bide û nekeve gunehê. Bêguman Me Eyyûb evdekî sebirkêş dît; çi xweş evd e ew! Bêguman ew pir tobekar bû.

45. Behsa bendeyên me Îbrahîm, Îshaq û Yaqûb jî bike, ew ên ku xwedanhêz û şareza û xwedîbesîret bûn.

46. Bêguman me ew ji bo xwe bi xesletên paqij bijartin ku ew li axiretê difikirîn.

47. Bêguman ew li cem Me ji qencîkarên bijarte ne.

48. Behsa Îsmail, Elyese'î û Zulkifil jî bike. Hemû jî ji bijarteyan in.

49. Ha ev (behsa van pêxemberan) bibîranînek e. Bêguman ji bo yê mutteqî teqez lêvegereke rind heye…
50. Ku bihiştên lêmayinê ne, dergehên wan li taqê (ji wan re) vekirî ne.
51. Ew tê de (li ser textan) paldayî ne, ew tê de gelek fêkî û vexwarinan daxwaz dikin.
52. Li cem wan dîlber hene ku çavên wan tenê li mêrê wan in ku ji hev re hevsal in.
53. Ha ev in, tiştên ku ji bo roja hesabdîtinê soza wan ji we re hatiye dayîn.
54. Bêguman ev, dayîna me ye ku jê re qedandin nîn e.
55. Ev wisa ye, bi rastî ji kafirên serxweveçûyî re aqîbeteke pir xerab heye…
56. Aqîbeta wan dojeh e. Ew dojeh çi pîs livîn e.
57. Ew ceza, aveke kelî, şij û edab e, êdî bila wî ezabî tehm bikin.
58. Mîna vî ezabî (ji bo wan) hin ezabên din jî hene.
59. (Ji giregir û serokên kafiran re dê bê gotin:) Ha ev civat (li dinyayê dûvketiyên we bûn) digel we noqî dojehê dibin. (Giregir û serok dê bêjin:) Hûn ne bi xêr û ne bi selametî hatin! Bêguman ew ê bikevin agirê cehennemê.
60. (Dûvketî jî ji serokên xwe re) dibêjin: Nexêr, belkî hûn ne bi xêr û ne bi selametî hatin! We ev anî pêşiya me. Vêca ev çi pîs wargeh e!
61. Dîsa ew dibêjin: Xwedayê me! Kî ev anîbe pêşiya me, tu ezabê wî qat qat zêde bike!
62. (Serok û giregirên kafir) dibêjin: Erê ma ji bo çi em wan zilamên ku me ew ji xeraban dihesibandin li vir nabînin?
63. Yan me bi xeletî tinazên xwe bi wan dikir (vêca ew baş bûn) yan jî ew di êgir de ne, ji ber çavên me winda bûne?
64. Bêguman ev hevrikiya dojehiyan (di vî şeklî de) rast e û teqez dê misoger bibe.
65. Bibêje: Ez bes hişyarkerek im, ji Xwedê pê ve tu mebûdê heq tun e, ew Xwedayê ku her yek e û hêzşikênê her hêzê ye.
66. (Ew) Perwerdegarê erd û asîmanan e û Perwerdegarê çiqas tiştê di navbera wan de ye, Ew ê ku desthilat ê gunehjêbir e.
67. Bibêje: Ev Quran xebereke gelek mezin e.
68. Hûn jî berê xwe jê vedigerînin.
69. Tu zanebûna min, bi civata bilind (a firîşteyan) dema ku wan (der barê çêkirina Adem de) di nav xwe de munaqeşe dikir, tune bû (eger ku ne ji wehyê bûya).
70. Ji bo min wehî tê ku ez bes hişyarkerekî aşkera me.
71. Wê dema Xwedayê te ji firîşteyan re got; bêguman Ez ê ji heriyê mirovekî biafirînim.
72. Vêca dema min ew temam kir û min ji cem xwe ruh berdayê, vêca hemen jê re herin sicûdê.
73. Îcar hemû firîşte jê re çûne sicûdê.

**74.** Lê belê Îblîs neçû sicûdê; wî xwe mezin dêra û ew bû ji kafiran.

**75.** Xwedê jê re got: Ey Îblîs! Ew çi tişt bû nehêla ku tu ji bo wî herî sicûdê, ew ê ku min ew bi destên xwe afirandî? Erê ma te xwe mezin dêra yan jî tu bûyî ji yên ku bilind in?

**76.** Îblîs got: Ez ji wî çêtir im, Te ez ji êgir afirandime û Te ew ji heriyê afirandiye.

**77.** Xweda got: Nexwe ji wê derkeve, here! Êdî bêguman tu (ji rehma min) hatî qewirandin!

**78.** Heya roja qiyametê laneta min li ser te ye!

**79.** Îblîsî got: Xwedayê min! Nexwe heta roja qiyametê muhletê (derfetê) bide min.

**80.** Xwedê jê re got: Muhlet ji te re hatiye dayîn…

**81.** Heya roja diyarkirî.

**82.** Îblîs got: Bi îzet û ezemeta te sond be, teqez ez ê wan tevan ji riya rastiyê derînim!

**83.** Lê belê, evdên te yên bawermend ên dilpak ew cuda ne (ez nikarim wan ji rê derînim).

**84.** (Xwedê) got: Rastî… û ez her rastiyê dibêjim.

**85.** Sond be ez ê dojehê ji (şeytanê mîna) te û ji wan ên ku li pey te bên, dagirim.

**86.** Bibêje: Ez li ser ragihandinê tu heqekî ji we naxwazim û ez li ser we ne zordar im.

**87.** Ev (Quran), ji bo tevekê alemê bes ders û şîret e.

**88.** Sond be hûn ê teqez xeberên wê piştî demekê bizanin û fehm bikin

# 39. SÛREYÊ ZUMER

Sûreyê Zumer, 75 (heftê û pênc) ayet e. Li Mekkê daketiye. Navê sûre ji ayetên 71'em û 73'em tê ku di wan de bêjeya zumer derbas bûye û bi mehneya civatên cur bi cur e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Ev kitêb, ji cem Xwedê ve hatiye hinartin, ew ê ku ‘Ezîz e, Ḥekîm e.

**2.** Bêguman me ev Quran bi duristî ji te re hinartiye, vêca tu jî ji bo Xwedê ji dil îbadet bike.

**3.** Agahdar bin! Dînê xalis û durist ji bo Xwedê ye. Ew ên ku ji bilî Xwedê ji xwe re dost û arîkaran digrin –dibêjin; em bes da ku me nêzîkî Xwedê bikin em perestina wan dikin- bêguman Xwedê, dê di navbera wan de, der barê ya ku ew tê de ketine îxtilafê hukim bike. Bêguman Xwedê, yê ku zêde derewkar û kafir e, rasterê nake.

**4.** Eger Xwedê bixwesta ku ji xwe re zarok bigirta, helbet ji mexlûqên xwe Wî

kî bixwesta dê ew ji xwe re bigirta. Xwedê pak û bilind e. Xwedê her yek e û hêzşikênê her hêzê ye

**5.** Xwedê erd û asîman bi duristî û bi hîkmet afirandine. Ew şevê li ser rojê dipêçe, rojê jî li ser şevê dipêçe. Roj û heyv ji fermana xwe re tewandine. Her yek ji wan heta demeke diyarkirî dê (di rêgeha xwe de) bigerin. Agahdar bin! Her Xwedê ye yê desthilat, yê gunehjêbir.

**6.** Xwedê, hûn ji yek nefsê afirandine. Paşê ji wê jî hevjîna wê afirandiye (da ku zuriyet ji wan zêde bibe). Ji bo we ji terşan (deve, dewar û pezan) heşt zo xuliqandine. Di zikê dayikên we de, di nav sê tarîtiyan de, bi çêkirineke di pey çêkirinekê de hûn afirandin. Ha ew, perwerdegarê we Xwedê ye. Xwedanî û hukumranî her ji bo Wî ye. Ji Wî pê ve tu İlah tun in. Vêca çawa hûn ji rastiyê tên vegerandin?!

**7.** Eger (piştî baweriyê) hûn kafir bibin, vêca bi rastî hewcedariya Xwedê bi we tune ye û ew bi kufra we jî neqayîl e. Eger hûn şukrê wî bikin Ew bi vê ji we qayîl dibe. Qet tu gunehkarek gunehê tu kesî hilnagire. Paşê (li axretê) vegera we bes bi bal Xwedayê we ve ye, vêca ya ku we (li dinyayê) kirî dê ji we re bibêje. Bi rastî Xwedê, bi ya dilan de veşartî dizane.

**8.** Dema ku mirov dikeve tengezariyê, li Xwedayê xwe vedigere û jê lavelavê dike. Paşê dema Xwedê qenciyekê pê bike, ew wê lavelava ku berê ji Xwedê dikir, ji bîr dike û jê re hevpişkan çêdike da ku mirovan ji riya Wî bixe. Bibêje: Bi vê kufr û nankoriya xwe hinekî xweş bijî, bi rastî tu her ji xelkên dojehê yî!

**9.** Erê ma ew ê taetkar ku di demên şevê de, di sucûd û li ser piyan, ji (ezabê) axretê ditirse û dilovaniya Xwedayê xwe hêvî dike, çêtir û birûmetir e (yan ew ê ku kafir bûye)? Bibêje: Ma ew ên ku dizanin û ew ên ku nizanin qet dibin wekhev? Bi rastî tenê yên aqilmend ders û îbret werdigrin.

**10.** Bibêje: Gelî bendeyên ku bawerî anîne! Xwe Ji ezabê Xwedayê xwe biparêzin. Ji bo yên ku li vê dinyayê qenciyê dikin bihişt heye. Erda Xwedê fireh e. Bêguman mukafata sebirkêşan bêhesab tê dayîn.

**11.** (Ya Muhemmed!) Bibêje: Bêguman ferman li min hatiye kirin ku ez ji dilekî saf bes ji bo Xwedê îbadet û taetê bikim.

**12.** Ferman li min hatiye kirin ku (ji vê umetê) ez bibim ji pêşîkê mislimanan.

**13.** Bibêje: Eger ez bêemriya Xwedayê xwe bikim, ez ji ezabê rojeke mezin ditirsim.

**14.** Bibêje: Ez her ji Xwedê re îbadetê dikim, îbadetê min bes ji bo Wî ye.

**15.** (Gelî pûtperestan!) Vêca hûn ji bilî Xwedê kê divên jê re îbadet bikin! Bibêje: Bi rastî yên xesirîne ew in ku roja qiyametê xwe û malbata xwe li zerarê dane. Agahdar bin! Ha xesarkirina aşkera ev bi xwe ye.

**16.** Ji bo wan (kafiran) di ser wan re tebeqeyên ji êgir hene û di bin wan de jî tebeqeyên ji êgir hene. Ha Xwedê bendeyên xwe ji vê ditirsîne. Bendeyên min! Nexwe hay ji emr û nehyên min hebin.

17. Ew ên ku xwe ji îbadetkirina bo şeytan û taxûtî dûr digirin û (bi tobê) li Xwedê vedigerin; her ji wan re mizgînî heye. Vêca mizgînê bide bendeyên min.

18. Ew bendeyên ku li gotinan guhdarî dikin û li dûv a herî baş diçin. Ha ew in yên ku Xwedê ew rasterê kirine û ew bi xwe ne yên xwedanhiş û biaqil.

19. Erê ma vêca ew ê ku hukmê ezab li ser hatiye misogerkirin, êdî tu yê wî ji êgir xelas bikî?

20. Lê belê ew ên ku (emr û nehyên) Xwedayê xwe parastine, ji bo wan ode li ser odê rakirî hatine avakirin ku di binê wan de çem diherikin. Ha ev soza Xwedê ye ku ji bendeyê xwe yê teqwadar re daye. Bêguman Xwedê soza ku daye jê venagere.

21. (Ey însan!) Ma tu nabînî ku Xwedê ji ewran av barandiye, wê avê dixe ser kaniyên li ser erdê, piştre bi wê çandiniyên renge reng hêşîn dike. Piştre ew hişk dibe tu dibînî ku ew zer bûye piştre wê dike kewaş e. Bêguman di vê de ji bo aqilmendan îbret û şîret hene.

22. Erê ma kesê ku Xwedê dilê wî ji bo îslamê vekiribe, vêca ew ji cem Xwedayê xwe li ser ronahiyekê be (ma dibe mîna wî kesê ku dilê wî ji bêîmanî hişk bûbe)? Vêca wax li halê wan kesan be ku dilên wan ji bêzikrî hişk û hola bûye! Ha ew, di nav rêşaşiyeke aşkera de ne.

23. Xwedê spehîtirînê peyvan hinartiye, kitêbek e ku ayetên wê mîna hev û lihevhatî ku têne dubarekirin. Ew ên ku ji Xwedayê xwe ditirsin ji xwendina wê çermgij dibin, paşê çermên wan û dilên wan bi bal zikre Xwedê ve aram û nerm dibe. Ha ev (kitêb), hîdayeta Xwedê ye. Xwedê kî bivê pê tîne ser riya rast. Kî ku Xwedê wî ji rê bixe êdî tu kes nîn e ku wî rasterê bike.

24. Erê ma ew ê ku roja qiyametê bi rûyê xwe ji ezabê pîs û dijwar xwe diparêze (dibe mîna yê ku ji êgir rizgarbûyî)? Ji zaliman re tê gotin: De haydê cezayê gunehên ku we bi keda xwe qazanc kiriye biçêjin!

25. Ên beriya wan bawerî (bi pêxemberê xwe) neanî, vêca ezabê Xwedê ji cihekî ku wan hizir nedikir, bi ser wan de hat.

26. Vêca Xwedê li dinyayê riswatî bi wan da tehmkirin. Bi rastî ezabê axiretê mezintir e, ka ku wan ev zanîbûya.

27. Sond be, Me di vê Quranê de ji bo mirovan her mijarên mînakan dane, da ku ew jê îbret bigirin.

28. Me ev Quran bêyî ku xwarî û şaşî tê de hebe bi zimanê erebî hinartiye, da ku mirov (ji kufrê) xwe pê biparêzin.

29. Xwedê ji bo we mînakekê tîne; koleyekî ku çend heb kesên serhişk û bi hev ne xweş tê de hevpişk in û koleyekî ku tenê yê yek zilamekî be, erê ma rewşa van her duyan wekhev e? Medh û senayên tekûz her ji bo Xwedê bin. Lê belê pirên wan vê nizanin (ku hevpişkan ji Xwedê re çêdikin).

30. (Ya Muhemmed!) Teqez tu jî dê bimirî û ew jî dê bimirin.

**31.** Paşê, (gelî mirovan!) bêguman hûn ê roja qiyametê li cem Rebbê xwe bi hev re nîqaşê bikin.

**32.** Ma ji wî kesê ku li ser (navê) Xwedê derewan bike û dema ku Quran jê re hat bawerî pê neyîne, zalimtir kî heye?! Erê ma qey di dojehê de ji bo kafiran cih tuneye?

**33.** Ew (pêxember)ê ku rastî aniye û ew (peyrew)ên ku wê rast didêrin, ha ew yên teqwadar bi xwe ne.

**34.** Li cem Rebbê wan, ew çi bixwazin yê wan e. Ha ev e, xelata qencîkarên rast û durist.

**35.** (Xwedê ev peyman bi wan re da;) da ku neqenciya berê kirin veşêre û da ku bi qenciya ew dikin bi ya herî spehîtir wan xelat bike.

**36.** Erê ma Xwedê ne besî bendeyê xwe ye? (Resûlê min!) Ew, ji wan ên ku ji bilî Xwedê ew îbadetê wan dikin, te ditirsînin. Xwedê, kê ji rê bixe êdî ji bo wî tu rênîşander tune ye.

**37.** Xwedê kê bîne ser riya rast, êdî tu kesî ku wî ji rê bixe tune ye. Erê ma Xwedê ne desthilat ê tolveker e?!

**38.** Sond be, eger tu ji wan bipirsî, kê erd û asîman afirandine, teqez dê bibêjin; Xwedê afirandine. Bibêje: Nexwe eger Xwedê bixwaze zerarekê bide min, ma ew (pût)ên ku ji bilî Xwedê hûn îbadetê wan dikin, ew dikarin zerara Xwedê ji ser min rakin? Yan jî Xwedê bixwaze qenciyekê bide min, ma ew dikarin wê ji ser min bigirin? Bibêje: Xwedê besî min e, yên hêvîdar bes xwe dispêrin Wî.

**39.** Bibêje: Gelî miletê min! Hûn li ser şop û halê xwe kar bikin, bi rastî ez ê jî li ser rêk û rêbaza xwe kar bikim. Vêca paşê hûn ê bizanin…

**40.** Ka ezabê ku wî riswa bike dê were ser kê û ka ezabê seraqetî dê (li axiretê) bê ser kê!

**41.** (Ya Muhemmed!) Bêguman me Quran ji bo mirovan, ji te re bi heqî hinartiye. Êdî kî rasterê bibe vêca ew ji bo xwe dibe û kî jî ji rê bikeve îcar ew li dijî xwe rêşaş dibe û tu li ser wan ne wekîl î (ku bi kotekî wan bînî riya rast).

**42.** Xwedê nefsên ku çaxê mirina wan tê distîne û yên sax jî di xewê de (wan distîne); vêca ya ku li serê Xwedê bi mirinê hukim kiribe (li cem xwe wê) digire, ya din jî heta demeke navlêkirî wê berdide bedenê. Birastî di vê de ji bo miletekî ku bifikire nişan û îbret hene.[1]

**43.** Belkî ji bilî Xwedê wan ji xwe re şefaetkar girtine. Bibêje: Erê ma ku ew ne xwediyê tiştekî bin û tênegihîjin jî?

**44.** Bibêje: Şefaet tev bi destûra Xwedê ve girêdahî ye. Xwedanî û rêveberiya erd û asîmanan her ji bo Wî ye. Paşê hûn ê her bi bal ve bêne vegerandin.

---

1 Em bi kirp dibêjin ku, ev şaşiya di ferq neêxistina nava nefsê û rûh de buye sebebê betalhiştina hûrkolînên nefsî yên ferdî di psîqolojîyê de û hûrkolînên nefsî yên civatî di sosyolojiyê de. Bi vê yekê (weke me gotî) ÛMMETê pîvana rastxwendina tarîxê û tehlîlkirina bûyeran ji dest berdaye. Bi sedem ku umetê ev pîvan û meydan ji xerbê re hiştîye ku bi saya xebitandina îlmê psîkolojî û sosyolojiyê karîbûne şerqê bixin bin destê xwe, xwîna wê bimijin û kultura xwe bixin navê, wê bikin wekî xwe.

**45.** Dema ku behsa Xwedê bi tenê tê kirin, dilê wanên ku bi axiretê bawerî nayînin teng dibe û dema behsa yên ku ji bilî Xwedê tê kirin, di cih de rûyên wan geş dibe.

**46.** Bibêje: Ey Xwedayê min, ey xaliqê asîmanan û erdê, ey zanayê nependî û darîçavê! Yê ku di navbera bendeyên xwe de li ser ya ku bi hev ketin de hukim dike her Tu yî.

**47.** Birastî, eger (roja qiyametê) tiştê ku li erdê heye û bi qasî wê jî, ji sitemkaran re hebûya; ji ber xerabiya ezabê roja qiyametê dê teqez (di ber xwe de) bi gerewî bidana. Hal ev e ku wê rojê, ji bo wan ji cem Xwedê ve ya ku qet hesab nedikirin, diyar bûye.

**48.** Ji wan re xerabiyên ku (li dinyayê) bi dest xistin diyar dibe û ew cezayê ku pê tinaz dikirin bi ser wan de hat.

**49.** Çi dema ku tengasiyek bi ser însanî de were (ji bo rakirina wê) li ber me digere, paşê dema ku ji cem xwe, em qenciyekê bidinê, dibêje: Ev bes bi zanîna min ji min re hatiye dayîn. Naxêr, belkî ew ceribandinek e, lê belê pirên însanan nizanin.

**50.** Miletên berê jî ev gotibûn, lê belê tiştê ku bi destxistibûn tu feyde neda wan.

**51.** Vêca cezayê kirinên wan gihîşte wan. Ji nav van jî yên ku zilm kirin, cezayê neqenciyên wan dê were serê wan. Teqez ew nikarin Xwedê neçar bihêlin.

**52.** Ma ew nizanin ku Xwedê kê bivê risqê wî fireh dike, kê jî bivê (risqê wî) teng dike. Bêguman di vê de jî ji bo miletekî ku bawer bikin, ders û îbret hene.

**53.** (Resûlê min!) Tu vê gotina Min ji wan re bibêje: Gelî bendeyên min ên ku ji ola xwe derketine! Hêviya xwe ji rehma Xwedê nebirin! Bêguman Xwedê li tevekî gunehan dibore. Bêguman yê gunehjêbir, yê dilovîn her ew bi xwe ye.

**54.** Beriya ku ezab bi ser we de were, bi bal Rebbê xwe ve vegerin û teslîmî fermana wî bibin, paşê (eger hûn tobe nekin) arîkariya we dê neyê kirin.[1]

**55.** Beriya ku haya we jê çêbe û ji nişka ve ezab bi ser we de were, bidin pey Qurana spehîtirîn, ew a ku ji we re hatiye hinartin.

**56.** (Poşman bibin û tobe bikin) Beriya ku hinek ji we bibêjin; hey wax li min poşmanî ku ji ber texsîratiya min a ku li hemberî Xweda min kiriye û birastî jî ez ji tinazkeran bûm!

**57.** Yan beriya bibêjin; eger Xwedê ez rasterê kiribûma teqez ez ê bibûma ji mutteqiyan.

**58.** Yan jî dema ku ezab bibîne, bibêje: Xwezî ji bo min derfeta vegereke (dinyayê) hebûya, vêca her ez ê bibûma ji qencîkarên rast û durist!

1 Tewbe, berdewamî wacib e, lewra ketina gunehan ji siruşta însên e. Pêxember (silava Xwedê li ser be) dibêje: "Zaroyên Adem hemî gunehkar in û qenctirînê gunehkaran yên tobeker in." (Tirmizî) Di fermodeyeke din de: "Eger we guneh nekiribana; Xwedê dê we ji holê bibirana û yê qewmekî din bixuliqanda ku wan guneh bikirana vêca dê wan ji ber vê yekê lêborîna gunehên xwe ji Xwedê bixwesta, êdî Xwedê jî dê ew bixefiranda." (Muslim)

59. (Ji terefê Xweda ve dê bê gotin:) Erê, ma ne ayetên min ji te re hatibûn, vêca te bawerî bi wan neanî, te xwe mezin dêra û tu bûyî ji kafiran.

60. Roja qiyametê, ew ên der heqê Xwedê de derew kirin, tu yê wan bibînî ku rûyê wan reş bûye. Erê ma di cehenemê de ji xwemezindêran re cih tune ye?

61. Ew ên ku xwe (ji şirkê) parastine, bi sebûnet serkeftina wan (di kirina karên qenc de) Xwedê wan rizgar dike, ezab nagihîje wan û ew xemgîn jî nabin.

62. Xwedê, afirînerê her tiştî ye û Ew, li ser her tiştî rêveber e.

63. Kilîtên erd û asîmanan her ên Xwedê ne. Ew ên ku ayetên Xwedê mandel dikin, ha yên dixesirin ew bi xwe ne.

64. Bibêje! Gelî nezanan! Ma hûn li min emir dikin ku ez ji bilî Xwedê îbadetê tiştekî din bikim?

65. Sond be, bi rastî bi bal te ve û bi bal wan pêxemberên beriya te jî wehîy hatiye hinartin. Eger tu ji Xweda re şerîkan çêkî, karên te dê pûç bibin û tu dê bibî ji yên xesirî.

66. Naxêr, bes îbadetê Xwedê bike û bibe ji şukirdaran.

67. Wan qedrê Xwedê bi awayekî ku layîqî Wî be û babetî mezinahiya Wî be negirt. Hal ev e ku roja qiyametê erd tev di teserûfatiya Wî de ye. Asîman jî di destê Wî yê rastê de li hev pêçandî ye. Xwedê ji tiştên ku ji Wî re dikin şerîk pak û bilind e.

68. Dema ku di sûrê de hate pifkirin, ji bilî yên ku Xwedê bivê -ew cuda ne- li erd û asîmanan kî heye tev dimirin. Paşê dema ku careke din tê de were pifkirin, vêca di cih de radibin û çavnêriyê dikin (ka dê çi bê serê wan).[1]

69. Erd bi nûra Xwedayê xwe ronî dibe, kitêba emelan tê danîn, pêxember û şahid têne anîn û di navbera wan de bi edaletî hukim tê kirin û neheqî li wan nayê kirin.

70. Her kes a ku qezenc kiriye bi temamî jê re tê dayîn. Xwedê, bi ya ku wan kiriye bêhtir dizane.

71. Ew ên ku kafir bûne, bir bi bir ber bi dojehê ve têne ajotin. Dema ku gihîştinê, dergehên wê ji wan re vedibin û notirvanên wê dê ji wan re wiha bibêjin: Ma ji nav we pêxemberên ku ayetên Rebbê we dixwendin û we ji vê rojê ditirsandin, ji bo we nehatibûn şandin? Ew dibêjin: Belê hatibûn. Lê belê me xwe mezin dêra û me înad kir. Vêca peymana bi ezabê ji bo kafiran heq û pêwîst bûye.

72. Êdî ji wan re tê gotin: Di van dergehan de têkevin dojehê, her û her tê de bimînin, vêca cihê xwemezindêran çi pîs cih e!

73. Ew ên ku xwe ji (ezabê) Rebbê xwe parastine, bir bi bir ber bi bihiştê ve têne ajotin, dema ku têne ber derê wê, dergehên wê ji wan re tên vekirin, notirvanên

1 Li gorî vê ayeta pîroz du pufkirin ji sûrê re hene; ya pêşîn a mirinê ye. Ya duyem a saxbûna piştî mirinê ye. Ew ên ku ew cuda ne ku di pifkirina sûra ewil de namirin; Cibrail, Mîkaîl, Îsrafîl, Ezraîl, Hemeletul-Erş, Ridwan, horî, xezînedarên bihiştê, zebanî, malik û pasevanên dojehê ne.

wê ji wan re wiha dibêjin: Silav li ser we be! Hûn xweş bijîn. Vêca têkevin bihiştê û seraqetî lê bimînin.

74. Ew dibêjin: Hemd ji Xweda re be ku peymana daye me bi cih anî û em kirin mîratgirên bihiştê ku cihê em bivên li wir cihwar bin. Vêca padaşa xebatkaran çi qas rind e!

75. Tu yê firîşteyan bibînî ku hawirdora Erş girtine, bi hemdê perwerdegarê xwe tesbîh dikin. Vêca di navbera mexlûqan de bi edaletî hukim tê kirin û tê gotin: Hemd ji Xweda re be ku ew Perwerdegarê alemê ye.

## 40. SÛREYÊ XAFIR

Sûreyê Xafir 85 (heştê û pênc) ayet e. Li Mekkê daketiye. Navê sûre ji ayeta sêyem tê ku tê de kelîmeya Xafir derbas bûye û bi mehneya bexşînkar e. Navekî vî sûreyî din jî El-mumîn e ku ew jî bi maneya bawermend e. Sûreyî, ev nav jî ji ayetên 28an û 65an girtiye ku pesnê wî bawermendî didin ku ew ji malbata Firewn bû, lê belê bi Mûsa bawerî anibû.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Ha, Mîm.

2. Ev kitêb ji aliyê Xwedayê desthilat ê zana ve hatiye hinartin.

3. Ew ê ku gunehbexşîn e, tobepejrîn e, ezabdijwar e û xwedankerem e. Ji Wî pê ve tu mebûdê birastî tun in. Veger, tenê bi bal Wî ve ye.

4. Ji wan ên kafir bûne pê ve tu kesê din der barê ayetên Xwedê de tênakoşe. Nexwe bila ger û fera wan a di welatan de te nexapîne.

5. Beriya wan, gelê Nûh û civatên piştî wan jî (bi pêxemberên xwe) bawerî neanî. Her umetê hewl daye da ku pêxemberê xwe bigire (ku wî bikuje). Bi batilî têkoşiyane da ku pê heqiyê pûç bikin û ji holê rakin. Vêca min ew (bi ezabê xwe) hingaftin. Îcar de binêre ka ezabê min ji bo wan çawa bû!

6. Ha bi vî awayî gotina Xwedayê te ya der barê wan ên kafir de ku ew xelkê dojehê ne, misoger bû û hate cih.

7. Ew firîşteyên ku Erşê Xwedê hildigirin û ewên ku li dora Erş in, ew hemdê Xwedayê xwe dikin û ji her kêmasiyê Wî pak didêrin, ew pê bawerî tînin û ji yên ku wan bawerî aniye re jî lêborînê dixwazin, dibêjin: Xwedayê me! Dilovanî û zanîna te ser her tiştî girtiye. Nexwe ew ên ku wan tobe kiriye û dane ser riya Te, wan bibexşîne û ji ezabê dojehê biparêze!

8. Xwedayê me! Wan (mu'minan) têxe bihiştên Ednê, ew ên ku te soz pê dabû wan. Ji bavên wan û jinên wan û zuriyetên wan jî, ew ên ku îman anîn û karên qenc kirin (têxe bihiştên ednê). Bêguman ê desthilat ê xwedanhîkmet her Tu yî!

9. Wan ji hemû kirinên nebaş biparêze. Tu wê rojê kê ji kirinên nebaş biparêzî, vêca teqez te dilovanî lê kiriye. Ha ev, serfiraziya mezin bi xwe ye.

**10.** Bêguman ewên kafir bûne (ji aliyê firîşteyan ve) wiha têne gazîkirin: Sond be, ezabê Xwedê ji hêrsa we ya li hemberî we dijwartir e. Dema ku banga îmanê li we hat kirin, vêca we bawerî nedianî.

**11.** Ew kafir (dema ku ezab û cansojiyên axiretê dibînin wiha) dibêjin: Xwedayê me! Te du caran em mirandine û du caran em sax kirine. Em jî li gunehên xwe mukir hatin vêca ma (ji vî agirî) tu riyeke derketinê tun e?[1]

**12.** (Ji wan re wiha tê gotin:) Ezabê ku hûn tê de ne, ji ber vê ye ku dema (li dinyayê) hûn tenê bi bal Xwedê ve dihatin vexwendin, we ew înkar dikir û çi dema ku ji Xwedê re hevpişk dihatin çêkirin we bawer dikir û rast didêra. Êdî hukm û ferman her ji Xwedayê bilind ê mezin re ye.

**13.** Ew Xweda ye, yê ku nîşanên (qudret û yekîtiya) xwe nîşanî we dide û ji esmên risqê we dadixe. Ji bilî yê ku berê xwe bide Xwedê kes îbret nagire.

**14.** Vêca ji dil, bêyî xwar û vîç tenê îbadetê Xwedê bikin, çendî kafir vê nexwazin jî.

**15.** Xwedê, mertebeyên Wî bilind in, xwediyê Erşê hukimranîyê ye. Ew ji bendeyên xwe kê bivê wehyê jê re dişîne da ku (mirovan ji ezabê) roja qiyametê hişyar bike.

**16.** Wê roja ku ew (ji gorên xwe) dertêne meydanê. Tiştek ji wan li ber Xwedê ne veşartî ye. (Xwedê dê ji wan bipirse;) Îro xwedanî û hukimranî ji bo kê ye? Ew her ji bo Xwedayê yek ê hêzşikên e.

**17.** Îro, her kes bi ya ku bi dest xistî (bi xelatê yan celatê) dê bête cezakirin, îro zilimkarî nîn e. Bêguman hesabê Xwedê bilez û bez e.

**18.** Tu wan bi wê roja ku nêzîkî wan dibe hişyar bike. Ji ber dijwariya wê rojê hindik dimîne ku dilê wan bê ber devê wan. Ji bo zaliman ne dostek ne jî şefaetkarekî ku (şefaeta wî) were qebûlkirin heye.

**19.** Xwedê bi çavên xayîn û ya ku dil wê vedişêrin dizane.

**20.** Xwedê bi edaletê hukim dike. Ew ên ku ji bilî Xwedê têne perestin, ew nikarin bi tiştekî hukim bikin. Bêguman yê (bi her tiştî) bihîzer, yê zana her Xwedê ye.

**21.** Ma ew li ser rûyê erdê nagerin, vêca ku binêrin ka encama wan umetên beriya wan çawa bûye?! Bêguman ew li ser erdê ji van muşrikan bihêztir bûn û ji wan pirtir xwedî pîşe û pirtir xwedî berhem bûn. Vêca Xwedê ew bi sebûnet gunehên wan, ew hingaftin û tu kesê ku wan ji (ezabê) Xwedê rizgar bike jî tune bû.

**22.** Ev yek, bi sebûnet ku pêxemberên wan mucîzeyên eşkere ji wan re dianîn, vêca wan ew înkar kirin. Xwedê jî bi ezab ew hingaftin. Bêguman Xwedê, hêza Wî nayê şikandin û ezabê Wî dijwar e.

**23.** Sond be, Me Mûsa bi mucizeyên ji cem xwe û delîleke eşkere hinart.

---

1 Mirina yekem, halê însên ê beriya çêbûna ji diya xwe ye. Mirina duyem; mirina li dinyayê ye. Jiyana yekem ew jiyan e ku bi çêbûnê re dest pê dike. Jiyana duyem; saxbûna piştî mirinê ye ku êdî di piştî wê re mirin tune ye.

**24.** Me ji Firewn, Haman û Qarûn re ew şand. Vêca wan got: Ev sêrbazekî pir derewker e!

**25.** Çi dema ku Mûsa ji cem me ayet û mucîze ji bo wan birin, gotin: Ew ên ku wan bawerî aniye kurên wan bikujin û keçên wan (ji bo xizmetê) sax bihêlin! Lê belê fen û fûtên kafiran teqez dê pûç bibe.

**26.** Firewn got: Dev ji min berdin da ku ez Mûsa bikujim, vêca de bila gazî Xwedayê xwe bike! Bi rastî ez ditirsim ku ew, ola (nîzama) we biguherîne yan jî li ser erdê fesadiyê derîne.

**27.** Mûsa got: Ez ji (şerê) her pozbilindê ku bawerî bi roja qiyametê nayîne, xwe bi Rebbê xwe û Rebbê we diparêzim.

**28.** Ji malbata Firewn zilamekî bawermend ku îmana xwe vedişart got: Ma hûn ê zilamekî ji ber ku dibêje „Xwedayê min Ellah e" bikujin? Hal ev e ku wî ji cem Xwedayê we ji bo we mucîzeyên eşkere jî anîne. Eger ew ne rast dibêje, vêca cezayê derewa wî jê re ye. Eger ew rast dibêje, hinek ji wî ezabê ku bi wî gefan li we dixwe, teqez dê were serê we. Bi rastî jî mirovê ku sînorbihêr û pir derewkar be Xwedê wî rasterê nake.

**29.** (Zilêm) got: Gelî miletê min! Îro desthilatî ya we ye, li ser vê erdê hûn hukimran in. Vêca eger ezabê Xwedê bi ser me de bê, ew kî ye ku arîkariya me bike? Firewn got: Ez her a ku çêtir dibînim nîşanî we didim û ez bes li ser riya rast we rasterê dikim.

**30.** Wî (zilamê) ku bawerî anibû got: Gelî miletê min! Bi rastî ez ditirsim ku ezabekî mîna ezabê roja ehzaban bi ser we de bê…[1]

**31.** Ezabekî wekî ezabê gelê Nûh, Ad, Semûd û ew civatên ku piştî wan hatine. Xwedê ne ew e ku ji bendeyên xwe re zilmê bixwaze.

**32.** Gelî miletê min! Bi rastî ez ji bo we ji (ezabê) roja gazî û hawarê ditirsim.

**33.** Wê roja ku hûn ê bi pişt xwe ve vegerin û birevin ku tu kesî we ji (ezabê) Xwedê biparêze tune ye. Xwedê kê ji rê bixe, vêca tu kesê ku wî bîne ser riya rast nîn e.

**34.** Sond be, berê, Yûsuf jî nîşanên eşkere ji we re anîbûn. Wê çaxê jî hûn der barê ya ku ji we re anîbû, her di gumanê de bûn. Heta dema ku Yûsuf wefat kir, we got: Êdî Xwedê dê piştî Yûsuf pêxemberekî neşîne. Ha wisa Xwedê ew ên ku tixûbbihêr û şibhekar in dibe delaletê.

**35.** Ew ên der heqê ayetên Xwedê de bêyî delîleke ku ji cem Xwedê ji wan re hatibe têdikoşin, li hemberî vê hevrikiya wan, li cem Xwedê û li cem wan ên ku wan bawerî aniye rik û hêrs mezin bûye. Ha wisa Xwedê dilê her zordar ê xwemezindêr mor dike.

**36.** Firewn got: Ey Haman, ji min re avahiyeke gelek bilind lêke, belkî ez bi wê bigihîjim dergeh û riyan…

1 Ahzab: Gelejimara hizbê ye bi wateya part û bend tê. Dem ali ser hadiseyekê qewm, xelk bêne cem hev ji wan re ahzab tê gotin. Di vir de, ew xelkên ku li ser dijatiya pêxemberan hatina cem hev û ji hev re bûne hevalbend.

37. Ez bigihîjim rêkên asîmanan da ku bi ser Xwedayê Mûsa ve bibim! Bi rastî jî ez Mûsa her derewîn dizanim. Ha bi vî awayî pîsekarê Firewn jê re xweşik hate nîşandan û ji riya heq hate xistin. Bêguman fen û fûtên Firewn her pûçî û xusran bû.

38. Wî zilamê ku bawerî anîbû got: Gelî miletê min! Li pey min werin, ez ê riya rizgariyê nîşanî we bidim.

39. Gelî miletê min! Qet guman tune ye ku ev jiyana dinyayê xweşiyeke demkurt e, lê belê axiret mala lêmayînê ye.

40. Kî karekî ne baş bike, vêca bi qasî wê her dê ceza bibîne. Kî jî - çi jin be çi mêr- karekî baş bike û ew bawermend be, vêca ha ew ê têkevin bihiştê û ew ê tê de bêhesab bêne risiqdarkirin.

41. Gelî miletê min! Ev çi hal e; ez we vedixwînim azadiyê, hûn jî min vedixwînin bal êgir ve?

42. Hûn min vedixwînin da ku ez Xwedê înkar bikim û ya ku tu zanîna min bi wan tune ye ez jê re bikim hevpişk. Ez jî we vedixwînim bal Xwedê ve, ew ê desthilat ê gunehjêbir.

43. Bêguman ew ê ku hûn min vedixwînin bi bal ve, ne li dinyayê ne jî li axiretê bersiva tu gaziyê nade. Bêguman vegera me her bi bal Xwedê ve ye û herçî yên sînor buhêrin teqez ew xelkê êgir in.

44. Ev a ku ez ji we re dibêjim hûn ê di nêz de di bîra xwe bînin, ez karê xwe her dispêrim Xwedê. Bêguman Xwedê bi tevekî bendeyên xwe bîner e.

45. Xwedê ew bawermend ji xerabiya dek û dolabên wan parast û ezabê pîs jî dor li malbata Firewn girt.

46. Sibeh û êvarê ew ji êgir re têne rapêşkirin (û pê têne sotin) roja ku qiyamet radibe jî (ji firîşteyan re wiha dê bê gotin:) malbata Firewn têxin ezabê herî dijwar!

47. Wê dema ku di êgir de kafir bi hev dikevin; yên qels ji yên giregir re dibêjin: Em peyrewên we bûn, vêca ma hûn nikarin hinekî ji êgir ji ser me bidin alî?

48. Ew ên ku giregir bûn dibêjin: Bi rastî em tev bi hev re tê de ne. Bêguman Xwedê di navbera evdên xwe de hukim daye.

49. Ew ên ku di êgir de ne, ji notirvanên dojehê re dê bibêjin: Li ber Xwadeyê xwe bigerin bila rojekê ezab ji ser me sivik bike!

50. Notirvanên dojehê ji wan re dibêjin: Ma pêxemberên we ji we re delîlên eşkere neanîn? Ew jî dibêjin: Belê, anîn. (Notirvan jî) dibêjin: Hûn bi xwe daxwaz bikin. (Xwedê dibêje:) Daxwaza kafiran her di pûçbûnê de ye.

51. Bêguman em ê di jiyana vê cîhanê de û roja ku şahid radibin (ku roja qiyametê ye) arîkariya pêxemberên xwe bikin û arîkariya wan ên ku bawerî anîne jî.

52. Wê roja ku hênceta zaliman tu feydê nade wan û her lanet ji bo wan e û her mala pîs ya wan e.

53. Sond be, Me hidayet da Mûsa û zaroyên îsraîl kirin mîratgirê Tewratê.

54. Ew, rêber û bîranîn e ji bo aqilmendan.

55. Vêca tu bêhna xwe fireh bike. Bêguman soza Xwedê daye heq û rast e. Lêborîna gunehên xwe bixwaze. Sibeh û êvarê hemdê Xwedayê xwe bike û ji her kêmasiyê wî pak bidêre.

56. Ew ên ku der heqê ayetên Xwedê de nîqaşê dikin –bêyî delîleke vebirî ku ji wan re hatibe.  ji bilî kibr û quretiyekê pê ve tiştekî di dilên wan de tune ye. Ew ê negihîjin armanca xwe. Tu xwe biavêje ber hifza Xwedê. Bêguman Xwedê, her ew e yê bihîzer, yê bîner.

57. Teqez çêkirina erd û asimanan zehmettir e ji çêkirina însanan. Lê belê pirên mirovan (vê) nizanin.

58. Merivê kor û yê biçav ne wek hev in, yên ku bawerî anîn û karên qenc kirin jî ne mîna yên neqenc in. Ma hûn çiqas hindikî îbret digirin!

59. Bêguman qiyamet her tê, di hatin û hebûna wê de tu şibhe tune ye. Lê belê pirên mirovan bawerî nayînin.

60. Xwedayê we got: Hûn hêvî û dua ji min bikin, ez ê jî bersiva we bidim. Bêguman ew ên ku li ser îbadetkirina ji bo min xwe mezin didêrin, dê rezîl biçin dojehê.

61. Xwedê ye, ew ê ku ji bo we şev tarî afirandiye da ku hûn tê de bêhna xwe berdin, roj jî ronahîker (afirandiye da ku hûn tê de bixebitin). Bêguman Xwedê, li ser mirovan xwedî kerem e. Lê belê pirên mirovan naşêkirînin.

62. Ha ew, Xwedê ye, perwerdegarê we ye, xaliqê her tiştî ye, ji Wî pê ve tu Xwedê tun in; vêca hûn çawa berê xwe jê vedigerînin!

63. Ha bi vî awayî ew ên ku ayetên Xwedê mandel dikin, (ji heqiyê) têne vegerandin.

64. Xwedê ye, ew ê ku erd ji we re kiriye wargeh û asîman jî kiriye ban, dirûv daye we û bi şekleki pir spehî hûn çêkirine û ji nîmetên pak û helal risqê we daye. Ha yê ku ev kirine Xwedê ye ku ew perwerdegarê we ye. Vêca ew Xwedayê ku perwerdegarê alemê ye, pak û pîroz e.

65. Ha ew Xwedê ye, Ew ê ku her sax e, ji Wî pê ve tu mebûd tun in, vêca ji dil jê re îbadetê bikin, di îbadetê de jê re şerîkan çênekin (û bibêjin:) pesnên bêhempa û şukrê bêdawî her ji Xwedê re be ku ew perwerdegarê alemê ye.

66. Bibêje: Bêguman piştî ku ji cem Xwedayê min ji min re delîlên eşkere hatin, ez hatime nehîkirin ku ez îbadetê wan pûtan bikim ew ên ku hûn di şûna Xwedê de wan dihebînin û ferman li min hatiye kirin ku ez radestî ber perwerdegarê alemê bibim.

67. Ew e, yê ku ji axê, piştre (hûn) ji dilopek av, piştre ji xwînpareyekê hûn çêkirine, piştre we zarok diwelidîne, piştre we dihêle da ku hûn bigihîjin kemala xwe, piştre dîsa we dihêle da ku hûn pîr û kal bibin û hin ji we berî van rewşan dimirin û we dihêle da ku hûn bigihîjin demeke navlêkirî û da ku hûn têbigîjin.

68. Ew Xwedê ye, yê ku sax dike hem jî dimirîne. Dema ku Ew bixwaze karekî bike, bes jê re dibejê “Çêbe!” Ew jî çêdibe.

69. Erê ma tu ecêb namînî ji wanên ku der barê ayetên Xwedê de mucadelê dikin, ew çawa berê xwe ji îmanê dadigerînin?!

70. Ew ên ku bi Quranê û bi wehya ku me pêxemberên xwe pê şandiye, bawerî nayînin, ew ê paşê bizanibin…

71. Dema ku qeydên hesinî û zincîr bikevin stûyên wan û bêne xijkirin…

72. Bi bal ava kelî ve. Paşê ew ê di êgir de bêne şewitandin.

73. Piştre ji wan re dê were gotin: Li ku ne ew ên ku we ji Xwedê re dikirin hevpişk…

74. Ji bilî Xwedê?! Ew jî dê bibêjin: Ji ber me winda bûn (çûn û em di ezab de hiştin). Belkî me berê îbadetê tiştekî nedikir. Ha bi vî awayî Xwedê dê kafiran şaş bike.

75. Ev ezab, bi sedema ku hûn bêheqî li ser erdê (bi şirk û înkarê) kêfxweş dibûn û bi sedema ku hûn di ser xwe ve çûbûn.

76. De haydê di dergehên dojehê de têkevinê û tê de her û her bimînin. Vêca cihê sekn û mayîna qure û pozbilindan çiqas pîs e.

77. (Rêsûlê min!) Vêca tu bêhna xwe fireh bike. Bêguman soza Xwedê daye heq û rast e. Eger em hinekî ji wî ezabê ku me ji bo wan soz daye, nîşanî te bidin, yan jî beriya (em ezab bînin ser wan) em te bimirînin, ew ê her li me bêne vegerandin (vêca ew ji ber me xelas nabin).

78. (Rêsûlê min!) Sond be, Me beriya te jî gelek pêxember hinartine. Me serpêhatiyên hinekan ji wan ji te re gotine û yên hinekan jî me ji te re qise nekirine. Ne babetê tu pêxemberî ye ku bêyî destûra Xwedê ji ber xwe ve mucîzeyekê bîne. Îcar dema fermana Xwedê bê, bi heq û edaletê tê darazkirin. Ha wê demê ew ên ku di riya batilî de dixebitîn, xesirîne.

79. Ha ew Xwedê ye, ew ê ku ji bo we terş (deve, dewar û pez) afirandine da ku hûn li hinan ji wan siwar bibin û ji hinekan jî goştê wan bixwin.

80. Ji bo we di terşan de gelek feydeyên din jî hene; ji bo ku hûn li wan siwar bibin, bigihîjin daxwazên ku di dilên we de ne. Hûn (li bejiyê) li ser wan û (li deryayê jî) li keştiyan têne hilgirtin.

81. Xwedê nîşanên xwe nîşanî we dide, vêca ma hûn ê kîjan ayetên Xwedê mandel bikin?

82. Erê ma vêca ew li ser rûyê erdê nagerin, da ku bibînin aqîbeta wan miletên beriya wan çawa bûye? Digel ku ew bi hejmar ji wan pirtir bûn, ji aliyê hêz û şiyan ve dijwartir bûn û ji aliyê cih û war ve mikûm û asêtir bûn. Vêca ya ku wan bi dest xwe xistibû qet feyde neda wan.

83. Çi dema ku pêxemberên wan ji wan re ayet û delîlên eşkere anîn, ew bi wê zanîna li cem xwe ya ku li dijî zanîna pêxemberan e kêfxweş bûn û ew ezabê ku wan pê tinaz dikir bi ser wan de hat.

84. Êdî dema ku wan ew ezabê me yê dijwar dît, gotin: Me bes bawerî bi Xwedê tenê anî û em wan (pût)ên ku me jê re dikir hevpişk, înkar dikin.

85. Vêca piştî ku ezabê me dîtin, (ew îmanê bînin jî) îmana wan dê qet feydeyekê nede wan. Ev rêk û rêbaza Xwedê ye ku der barê bendeyê wî de derbas bûye û ha li wê derê kafir xesar dikin.

## 41. SÛREYÊ FUSSÎLET

Sûreyê Fussîlet 54 (pêncî û çar) ayet e. Piştî sûretê Xafir li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta 3'em girtiye. Hin navên vî sûretî yên din jî ev in: Secde, Ha-Mîm û Mesabîh e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Ḥa, Mîm.
2. Ev, ji cem Xwedayê mihrîvanê dilovîn ve hatiye hinartin.
3. Ev kitêbeke ku ayetên wê bi berfirehî ji hev hatine veqetandin, ew Quraneke erebî ye ji bo miletekî ku wê dizanin.
4. Ew mizgîndar û hişyarker e, piraniya mirovan pişta xwe danê û ew qet dengê wê nabine xwe.
5. Muşrikan got: Dilên me, li bara doza ku tu me bi bal ve gazî dikî, girtî ne. Di guhên me de giraniyek heye û di navbera me û te de jî perdeyek heye, vêca tu wekî xwe bike, em ê jî wekî xwe bikin.
6. Bibêje: Bêguman ez her wekî we tenê mirovek im. Ji min re peyam hatiye ku ez bibêjim Xwedayê we her Xwadeyekî yek e, vêca bi rastî û duristî berê xwe bidinê û lêborîna (gunehên) xwe jê bixwazin. Wax li halê muşrikan!
7. Ew muşrikên ku zekata malê xwe nadin û axiretê înkar dikin.
8. Bêguman ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirin, ji bo wan xelateke bênavbir heye.
9. Bibêje: Hûn çawa wî Xwedayê ku erd di du rojan de afirandiye înkar dikin û hûn çawa jê re hevpişkan çêdikin? Ha Ew, perwerdegarê alemê ye.
10. Xwedê di erdê de çiyayên mikûm û bilind bi cih kirine û bereketa xwe xistiyê û di çar rojan de ji bo yên ku tê de li risqê xwe digerin, qûtê wan birêkûpêk kiriye.
11. Paşê Xwedê berê xwe da afirandina asîmanan ku ew dûman bû, ji esmên û erdê re got: Bi dilê xwe yan jî bêyî dilê xwe werin radestî fermana min bibin. Her duyan jî got: Em bi dilê xwe hatin radestî ber fermana te bûn.
12. Vêca Xwedê ew heft asîman di du rojan de temam kirin û ji her asîmanî re wezîfeya wî jê re wehî kir. Me asîmanê dinyayê bi stêran xemiland û me ew parastiye. Ha ev, teqdîra Xwedayê desthilat ê zana ye. Wateya ku "ji her asîmanî re wezîfeya wî jê re wehî kir" ev e; melayîket, stêr û cismên asîmanî yên din li her asîmanî li gorî pêdiviya wî bi cih kiriye û karê her yekî, ji wan re bi wan daye zanîn.

13. Îcar eger ew berê xwe (ji îmanê) vegerînin, (ji wan re) bibêje: Ez we bi yek helakê hişyar dikim, mîna wê helaka ku bi serê qewmê Ad û Semûd de hatî.

14. Dema ku pêxemberê wan ji her rexî ve û bi her wesîleyê hatin cem wan û ji wan re gotin: Ji bilî Xwedê îbadetê tu tiştî nekin. Gotin: Eger Xwedayê me bixwesta dê firîşte ji me re bişandina. Vêca bi rastî jî ev a ku hûn pê hatine şandin, em bawerî pê nayînin.

15. Vêca heçî ku gelê Ad bû, wan ji neheqî li erdê xwe mezin dêran û digotin: Ma kî ji me xurttir û bihêztir e? Erê ma ew nizanin ew Xwedayê ku ew çêkirine ji wan xurttir û bihêztir e. Wan ayetên me her înkar dikirin.

16. Êdî me jî di wan rojên şûm û bêqudoş de bayekî sar ê seqemî û bi vîzevîz şand ser wan, da ku em di jiyana dinyayê de ezabê riswaker bi wan bidin çêjandin. Ezabê axiretê teqez riswakertir e û arîkariya wan jî nayê kirin.

17. Herçî ku gelê Semûd e, me riya rast nîşanî wan da, vêca wan rêşaşî di ser hîdayetê re girtin. Êdî bi sebûnet a ku bi dest xistin birûska ezabê riswaker ew hingaftin.

18. Me ewên ku bawerî anîn û ewên ku teqwadar bûn, xelas kirin.

19. Wê roja ku dijminên Xwedê ber bi êgir ve têne civandin, vêca tev li cihekî têne girtin.

20. Paşê dema ku ew hatin qada heşrê, guhên wan, çavên wan û çermên wan li hemberî ya ku wan (li dinyayê) kiriye dê li ser wan şahdeyiyê bidin.

21. Ew ji çermên xwe re dibêjin: We ji bo çi li ser me şahdeyî da? Çermên wan jî dibêjin: Ew Xwedayê ku her tiştî dide axaftin em jî dane axaftin. Xwedê cara pêşîn hûn afirandin û hûn ê her bi bal ve bêne vegerandin.

22. We xwe ji guhên xwe, çavên xwe û çermên xwe nediparast ku ew ê şahdeyiyê li ser we bidin. Lê belê we hizir dikir ku Xwedê bi piraniya tiştên ku we dikir, nizane.

23. Ha vê hizra we ya ku we der barê Xwedê de dikir, hûn birin helakê û hûn bûne ji yên ziyanker.

24. Vêca eger ew di ezab de xwe ragirin ji xwe cihê wan agir e. Eger ew bivên bizivirin dinyayê da ku Xwedê ji xwe razî bikin, vêca hênceta wan nayê qebûlkirin.

25. Me ji wan (muşrikan) re hin heval û hogir amade kirin ku ji her alî ve kirinên wan ji wan re xweşik nîşan dan. Li ser wan ezab misoger bû, ku ew ezab ji umetên beriya wan li ser hin kesên cin û însî jî pêwist bûbû. Bêguman wan her xesar kiriye.

26. Ew kesên ku kafir bûne ji hev re gotin: Li vê Quranê guhdarî mekin, dema ku ew bê xwendin, bikin qîrewîr, hêvî heye hûn bi ser bikevin.

27. Sond be, ew ên ku kafir bûne teqez em ê ezabekî dijwar bi wan bidin çêjandin û em ê bi pîstirîn karê ku wan dikir, wan ceza bikin.

**28.** Ha ev agir cezayê dijminên Xwedê ye. Ji ber ku wan bi zanîn ayetên me mandel dikirin, cezayê wan (dojeh e ku ew) mala seraqetî ye.

**29.** Ew ên ku kafir bûne dibêjin: Xwedayê me! Ji cin û însanan wan her duyên ku em ji rê xistine nîşanî me bide da ku em wan bixin bin piyên xwe, da ku ew bibin ji yên di binê dojehê de!

**30.** Bêguman ew ên ku dibêjin "perwerdegarê me Xwedê" ye, paşê xwe rast û durist jî dikin; (li ber mirinê) firîşte bi ser wan de tên (û ji wan re dibêjin;) metirsin, xemgîn mebin û bi wê bihişta ku soza wê ji we re hatiye dayîn, dilşad bibin!

**31.** (Firişte dibêjin:) Em li jiyana dinyayê û li axiretê jî dost û piştgirên we ne, di bihiştê de tiştê ku dilê we bibijiyê û ya ku hûn bivên, ji bo we heye.

**32.** Ev qedirgirtin û mazûvaniyeke ji cem Xwedê ye, ewê ku gunehjêbir e, dilovîn e.

**33.** Erê ma gotina kê ji ya wî kesî lawtir û spehîtir e, ew ê ku xelkê gazî bal Xwedê ve dike, kar û kiryarên qenc dike û dibêjê: Bêguman ez ji mislimanan im?

**34.** Qencî û neqencî ne wekhev in. Tu (neqenciyê) bi helwesteke herî spehî rake. Wê çaxê (tu dê bibînî) ew kesê ku di navbera te û wî de neyartiyek heye, dê bibe her wekî dostekî germ û nêzîk.

**35.** Ji wan kesên ku xweragir in pê ve tu kesên din nagihîjin vê radeyê û ji bilî wan ên ku di xêr û qenciyê de xwediyê pareke mezin in tu kesên din nagihîjin vê dereceyê.

**36.** Eger ji şeytên fikrekî nebaş te (ji van mertebeyên baş) vegerîne, di cih de xwe bi Xwedê biparêze. Bêguman Xwedê, her ew e yê bihîzer, yê zana.

**37.** Şev û ro, roj û heyv ji nîşanên Xwedê ne. Eger bi rastî hûn dixwazin tenê îbadetê Xwedê bikin. Ji roj û heyvê re neçin sicûdê; ji Xwedê re herin sicûdê, ew ê ku wî ew (heyv û roj) afirandine.

**38.** Eger mirov xwe qure bikin (û ji Xwedê re îbadet nekin), vêca ew firîşteyên ku li cem Xwedayê te, bi şev û roj Xwedê pak didêrin û ew qet ranawestin jî.

**39.** Ji nîşanên (hêz û qudreta) Xwedê ye ku tu dibînî erd hişk û hola ye, vêca dema ku em baranê dadixin ser wê, dilive û bi avê dinepixe; bilind dibe. Ew Xwedayê ku erdê (bi avê) vedijîne, teqez ew ê miriyan jî vejîne. Bêguman Xwedê li ser her tiştî qadir e.

**40.** Bêguman ew ên ku ayetên me înkar dikin ew ji ber me nayêne veşartin. Erê ma vêca ew ê ku di êgir de bê werkirin çêtir e, yan ew ê ku roja qiyametê bi ewlehî were? Hûn çi divên wê bikin, bêguman Xwedê bi tiştên ku hûn dikin bîner e.

**41.** Bêguman ew ên ku dema Quran ji wan re hatî bawerî pê neanîn, (ji wan re dojeh heye). Bêguman ew kitêbeke qedirbilind û zorşikên e.

**42.** Ne ji pêş wê ve, ne jî ji pişt wê ve pûçî têkilî wê nabe. Ew ji cem Xwedayê hekîm ê hemîd ve hatiye hinartin.

**43.** (Ya Muhemmed!) Ya ji te re hatiye gotin, her ew ji pêxemberên beriya te re jî hatiye gotin. Bêguman Xwedayê te teqez xwedanê mexfîretê ye, hem jî xwedanê ezabekî cansoj e.

44. Eger me ev Quran ne bi zimanê erebî bihinarta, vêca dê bigotina ‘De bila ayetên wê bi erebî bihata ronîkirin, (da ku me jê fehm kiribûya), erê ma ev çêdibe ku Quran ecemî û pêxember jî erebî be? Bibêje: Ev Quran, ji bo wan ên ku îman anîye, rêber û şîfa ye. Ew ên ku îman nayînin, di guhên wan de kerîtiyek heye. Ev Quran li ser wan tarîtî û gumanek e (ku ew tênagihîjin). Her wekî ku ji cihekî dûr ve bang li wan bê kirin (vêca ew tênegihîjin û fehm nekin).

45. Sond be, Me kitêb ji Mûsa re hinart, vêca xelkê wî der barê wê de bi hev ketin. Eger ne ji ber soza Xwedayê te bûya ew a ku berê daye, dê di navbera wan de (bi helaka wan) hukim hatibûya dayîn. Ew der barê Quranê de di nav gumaneke gumandar de ne.

46. Kî ku karekî qenc bike ew ji xwe re dike û kî jî neqenciyekê bike, vêca zerara wê her jê re ye. Rebbê te ji bendeyê xwe re ne sitemkar e.

47. Zanîna qiyametê her bi bal Xwedê ve tê spartin (her ew dizane). Bêyî zanîna Wî tu fêkî ji kumika xwe dernakeve, tu mêyik jî bêyî zanîna Wî ber nagire û berê xwe danayne. Wê rojê Xwedê gazî wan dike: Ka li ku ne ew hevpişkên min (ew ên ku we ji min re dikirin şerîk)? Ew dibêjin: Em ji cenabê te re eşkere dikin ku der barê vê de tu şahid ji me tun in.

48. Ew tiştên ku wan berê îbadetê wan dikir ji ber wan winda bûn û wan baş yeqîn kir ku ji wan re tu cihê revê tune ye.

49. Însan ji xwestina xêrê naweste, lê belê eger xerabiyek bi ser de bê di cih de hêviya xwe winda dike û umîda wî namîne.

50. Sond be, eger piştî tengezariyeke ku bi ser însên de bê, em ji cem xwe qenciyekê pê bidin tehmkirin, teqez dê bibêje: Ev, bi keda min bû û min ne bawer e ku qiyamet jî rabe. Eger ez li Xwedayê xwe vegerim jî, teqez li cem Wî ji min re ya hê spehîtir heye. Sond be, em ê wan ên ku kafir bûne bi hemû karên ku kirin her agahdar bikin û teqez em ê ji ezabê giran wan bidin çêjandin.

51. Dema ku em qenciyekê bidin însên berê xwe (ji me) vedigerîne û xwe dûr dike. Lê belê dema ku xerabiyek bi ser de bê, di cih de dua û lavelavên dirêj ji me dike.

52. (Resûlê min ji wan re) bibêje: De ka hûn bêjin: Eger ev (Quran) ji cem Xwedê be û paşê we jî ew mandel kiribe, wê çaxê ji wî kesê ku ketiye îxtilafeke dûrî heqiyê rêşaştir kî heye?

53. Teqez em ê delîlên xwe di asoyan de û di nefsa însên bi xwe de jî nîşanî wan bidin, heyanî ku ji wan re tam eşkere bibe ku ev (Quran) heq û rast e. Erê ma ne besî te ye ku Xwedayê te li ser her tiştî hazir û şahid e.

54. Agahdar bin! Bi rastî ew kafir ji çûna ber hizûra Xwedê bişik û guman in. Agahdar bin! Bêguman Xwedê (bi zanîna xwe) dor li her tiştî girtiye.

# 42. SÛREYÊ ŞÛRA

Sûreyê Şûra 53 (pêncî û sê) ayet e. Li Mekkeyê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta 38'em girtiye ku tê de bêjeya Şûra derbas bûye û bi mehneya "şêwr" e ku ew jî, bingeh û prensîbeke girîng a desthilatiya mislimanan e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Ḥa, Mîm,
2. 'Eyn, Sîn, Qaf.
3. (Ya Muhemmed!) Xwedayê desthilat ê karbinecih, bi vî awayî wehyê bi bal te ve û bi bal pêxemberên beriya te ve dişîne.
4. Çi tiştên di erd û asîmanan de hene, her yên Xwedê ne. Yê bilind ê mezin her Ew e.
5. Hindik ma ku asîman di ser hev re (ji heybeta Xwedê) biqelişin! Melaîket jî Xwedayê xwe, ji her kêmasiyê pak didêrin û ji bo yên li erdê lêborînê dixwazin. Agahdar bin! Bêguman Xweda her ew e yê gunehjêbir, yê dilovîn.
6. Ew ên ku ji bilî Xwedê ji bo xwe dost û arîkar girtine, Xwedê li ser wan her tim zêrevan e û tu jî li ser karên wan ne kefil î.
7. Me bi vî awayî ji bo te Quranek bi zimanê erebî wehî kiriye da ku tu xelkê Mekkê û yên ku li hawirdora wê ne, hişyar bikî û tu wan ji roja civînê bitirsînî, ew roja ku tê de qet guman tune ye. Wê rojê, hin di bihiştê de ne hin jî di agirê bipêt de ne.
8. Eger Xweda biviya teqez dê hemû mirov kiribûna yek umet. Lê belê Xwedê kî bivê wî dixe nav rehma xwe. Ew ên ku zalim in (kafir in) ji bo wan tu dost û arîkarek tun e.
9. Yan jî ma wan ji bilî Xwedê ji bo xwe xwedî û arîkar girtine? Xwedê, her ew bi tenê xwedî û piştevan e. Ew miriyan sax dike û ew li ser her tiştî qadir e.
10. Çi dema hûn ji kar û barên xwe di tiştekî de ketin îxtilafê, vêca hukmê wî bidin bal Xwedê ve. Ha ew Xwedayê ku hukmê her tiştî li cem e, perwerdegarê min e. Min xwe spartiyê û ez ê bi bal ve vegerim.
11. Afirînerê erd û asîmanan e. Wî ji bo we ji cinsê we hevjîn xuliqandiye û ji terşan jî, ji cinsên wan hevjîn afirandine. We (bi vî awayî) bi wan zêde dike. Tu tişt mîna Xwedê tune ye. Her Xwedê ye yê bihîzer, yê bîner.
12. Kilîdên (xezîneyên) asîmanan û erdê yên Xwedê ne. Ew kê bivê risqê wî fireh dike, kê jî bivê (rizqê wî) teng dike. Bêguman Ew bi her tiştî zana ye.
13. Di dîn de ya ku li Nûh hatiye emirkirin û ya ku me ji bo te şandî û ya ku me Îbrahîm, Mûsa û Îsa pê fermanber kirin, ji bo we kiriye rêk û rêbaz da ku hûn dîn li ser piyan bigirin û hûn tê de nekevin îxtilafê. Ev a ku hûn muşrîkan gazî

bal ve dikin li ser wan giran tê. Xwedê kî bivê ji dînê xwe re dibijêre û kesê ku (bi tobê) li Xwedê vegere, wî rasterê dike.

**14.** Ew piştî ku zanîn ji wan re hatin, her ji çavnebariya xwe, di navbera xwe de ketin îxtilafê. Eger gotina Xwedayê te, bi paşdexistina cezayê wan heta roja qiyametê derbas nebûya dê di cih de di navbera wan de (bi helaka wan) hukim bihata kirin. Bi rastî ew ên ku piştî gelên xwe bûne wêrisê kitêbê, der barê Quranê de, di nava şik û gumanê de ne.

**15.** (Resûlê min!) Vêca bi bal wî (dînê rast) ve gazî xelkê bike û çawa ferman li te hatiye kirin wisa xwe rast û durist bike û nede pey hewesên wan. Ji wan re bibêje: Min bi kitêba ku Xwedê ew hinartiye bawerî anî û li min hatiye fermankirin ku ez di navbera we de bi edaletî hukim bikim. Xweda, perwerdegarê me û perwerdegarê we ye. Cezayê karên me ji me re ye û cezayê karên we jî ji we re ye. Di navbera me û we de tu munaqeşe tune ye. Xwedê dê me û we tevan (roja qiyametê) li hev bicivîne, veger jî her bi bal Wî ve ye.

**16.** Ew ên ku der barê (dînê) Xwedê de piştî ku mirovan ew qebûl kirin û jê re teslîm bûn, gengeşî û nîqaşê dikin; nîqaş û delîlên wan li cem Xwedayê wan pûç û betal in. (Li dinyayê) xezeb li ser wan e û (li axiretê jî) ji bo wan ezabekî dijwar heye.

**17.** Ew ê ku kitêb û terazî bi heqî şandine (da ku mirov di hemû karên xwe de bi edaletî rabin) Xweda ye. Ma tu çi dizanî, dibe ku roja qiyametê nêzîk be.

**18.** Ew ên ku bi roja qiyametê bawerî nayînin lezê li hatina wê dikin. Ew ên ku bawerî pê anîne, jê ditirsin û ji dil dizanin ku ew heq e. Haydar bin! Bi rastî ew ên ku der barê roja qiyametê de têdikoşin, ew di nav rêşaşiyeke dûr de ne.

**19.** Xwedê ji bendeyên xwe re lutifkar e, kê bivêt risqê wî dide û her ew e yê xwedanhêz, yê desthilat.

**20.** Kî (bi emelê xwe) qazanca axiretê bixwaze, em ê qazanca wî jê re zêde bikin. Kî jî deskeftiyên dinyayê bixwaze, em ê ji wê tiştekî bidinê û li axiretê jê re tu parek tune ye.

**21.** Yan jî, ma ji wan re îlahin hene ku ji wan re hukmên dîn datînin, ya ku Xwedê destûr pê nedaye? Eger hukmê Xweda ku ew ên roja qiyametê ji hev bêne cudakirin nebûya, dê di cih de di navbera wan de (bi ezab) hukim bihata dayîn. Bêguman ji yên zalim re ezabekî cansoj heye.

**22.** Tu (roja qiyametê) zaliman dibînî ku ew ji ber kirinên xwe (yên xerab) bitirs in. Teqez ew ê bi ser wan de were. Ewên ku bawerî anîn û karên qenc kirine, ew di baxçeyên bihiştê de ne. Li cem Xwedayê wan, ji wan re ya ku bixwazin heye. Ha ev, kerem û qenciya mezin bi xwe ye.

**23.** Ha ev (kerem û qencî) ya ku Xwedê mizgîniya wê dide bendeyên xwe; yên ku bawerî anîn û karên qenc kirine. (Rêsûlê min! Ji wan re) Bibêje: Ez ji bilî parastina (hiqûqê) eqrebatiyê tu heqekî ji we naxwazim. Kesê ku qenciyekê bike em ê padaşa wî zêde bikin. Bêguman Xwedê gunehveşêr û şukirwergir e.

**24.** Yan ma ew dibêjin: Wî li ser (navê) Xwedê derew lêaniye? Eger Xweda

(hetîketiya te) bixwesta dê dilê te mor bikira (û bi te bidana jibîrkirin). Xwedê pûçî (ya ku ew dibêjin) ji holê radike û bi ayetên xwe, heqiyê bi cih dike. Bêguman Xwedê bi ya di dil û sîngan de veşartî dizane.

**25.** Ew e yê ku ji bendeyên xwe tobê qebûl dike û li neqenciyên wan dibore û bi ya ku hûn dikin dizane.

**26.** Xwedê bersiva (bergerîna) wan ên ku bawerî anîn û karên qenc kirine dide û ji qenciya xwe zêdeyî ya ku kirin jî dide wan. Herçî ku kafir in, ji wan re jî ezabekî dijwar heye.

**27.** Eger Xwedê ji evdên xwe re risq fireh bikira dê li ser rûyê erdê ji ser xwe ve biçûna. Lê belê Xweda, bi qasî ku divê risqê wan dişîne. Bêguman Xwedê bi bendeyên xwe agahdar e bîner e.

**28.** Ew e yê ku baranê piştî ku mirov (ji hatina wê) bêhêvî bûn, dibarîne. Rehmeta xwe li her aliyî belav dike. Ew e, yê dost û arîkar, yê babetê pesindayînê.

**29.** Ji nîşanên (qudret û yekîtiya) Xwedê ye ku erd û asîman û rêveherên ku di nava wan de belav kirin jî afirandine û Xweda dema bixwaze li ser lihevkomkirina wan qadir e.

**30.** Çi musîbeteke ku were serê we her ew bi sebûnet gunehên ku we kirine û Xwedê li pirên wan jî dibore.

**31.** Hûn ê (Xwedê) li ser erdê neçar nehêlin û ji bilî Xwedê, ji bo we tu dost û arîkarek jî tune ye.

**32.** Ji nîşanên Xwedê ne; ew keştiyên ku mîna çiyan di behrê de dikişin.

**33.** Eger Xweda bixwaze dê ba rawestîne, vêca keştî jî dê li ser rûyê behrê seknandî bimînin. Bêguman di vê de, ji bo her kesê sebirkêş û şukirdar re nîşan hene.

**34.** Yan jî bi sebûnet kirinên wan dê wan helak bike, (lê belê ew) li pirê tiştan dibore.

**35.** (Bi vî awayî) da ku ew ên der barê ayetên me de têdikoşin bizanin ku ji wan re tu cihê revê tune ye.

**36.** Ya ku ji we re hatiye dayîn, vêca ew pertalê jiyana vê dinyayê ye û ji bo yên ku bawerî anîne û xwe disipêrin Perwerdegarê xwe, ya li cem Xwedê çêtir û mayîndetir e.

**37.** Ew bawermendên ku ji gunehên mezin û ji fehşîtiyan (bêtoreyiyan) xwe diparêzin û dema ku ew hêrs dibin jî (hêrsa xwe dadiqurtînin ) û efû dikin.

**38.** Ew ên ku bersiva banga Xwedayê xwe dane, nimêj kirine, di navbera wan de karên wan bi şêwrê ye û ji wî risqê ku me daye wan jî (di cihê wê de) xerc dikin.

**39.** Ew ên ku dema neheqî li wan dibe (ji yê neheq) heqê xwe distînin û tehdehiyê nakin.

**40.** Cezayê neqenciyekê bi neqenciyeke eynî mîna wê ye. Lê belê kî ku bibore, aştiyê saz bike teqez xelata wî li ser Xwedê ye. Bêguman Xwedê ji zaliman hez nake.

41. Kî piştî ku neheqî lê hate kirin heqê xwe bistîne, vêca tu riyek (a cezakirin û şermezarkirinê) li ser wî tune ye.

42. Riya (cezakirinê) tenê li hemberî wan kesan e ku li mirovan zilmê bikin û li ser erdê bi neheqî tevdanê derxin. Ha ji kesên wiha re ezabekî cansoj heye.

43. Kî ku (li hemberî azara xelkê) xwe ragire û wan bibexşîne, bêguman ev ji karên hêja û pesnande ye.

44. Xwedê kê ji rê bixe; vêca piştî Xwedê ji bo wî tu xwedî û arîkar tun in. Dema zalim ezab dibînin; tu yê wan bibînî ku dibêjin: "Erê ma ji bo em vegerin dinyayê tu riyek nîn e"?

45. Dema ew ji agirê dojehê re têne rapêşkirin, tu wan dibînî ku ji rebenî û riswayî bitirs in ku di bin çavên xwe de bi hêdî û dizî (li ezabê xwe) dinêrin. Ên ku bawerî anîne dibêjin: Yên ku bi rastî xesirîne, ew ên ku roja qiyametê xwe û xelkê xwe xistine xesarê. Guhdar bin! Bêguman ên zalim di nav ezabekî seraqetî de ne.

46. Ji bo wan li hemberî ezabê Xwedê tu xwedî û arîkar nîn in ku wan rizgar bikin. Xwedê (bi sebûnet kufr û zilma wan) kê ji rê bixe êdî jê re tu rê(yên rizgarbûnê) nîn in.

47. Beriya ku qiyamet rabe bersiva (gaziya) Xwedayê xwe bidin, ku êdî ne pêkan e tu kes wê vegerîne. Lewra wê rojê ji bo we tu asêgeheke ku ji ezab we xelas bike û tu çareya mandelkirina gunehan jî tune ye.

48. Eger ew berê xwe jê vegerînin, bizane ku me tu li ser wan wek çavdêr neşandiye, bes erka te ragihandin e. Çi dema ku em ji cem xwe qenciyekê bi însên bidin çêjandin, bi wê dilşad dibe. Lê belê eger ji ber sûcên ku wan kirin belayek were serê wan, ha wê demê însan pir nankor e!

49. Xwedanî û rêveberiya erd û asîmanan her ji Xwedê re ye. Ew çi bivê wê diafirîne. Ew kê bivê keçan û kê jî bivê kuran didiyê…

50. Yan jî kur û keçan bi hev re dide wan. Kê jî bivê bernegir dihêle (ne kur jê re çêdibin ne jî keç). Bêguman Xwedê zana û kara ye.

51. Ji tu kesî re ne mimkun e ku Xwedê pê re biaxive, ji bilî ku bi riya wehyê be yan ji pişt perdê yan jî qasidekî jê re bişîne, vêca bi destûra Xwedê ya ku Xwedê bivê jê re wehî bike. Birastî jî Xwedê bilind e, karbinecih e.

52. (Ya Muhemmed!) Bi vî awayî me bi fermana xwe peyama Quranê daye te. Te nizanîbû kitêb çi ye, îman çi ye. Lê belê me kitêb kire ronahiyeke wisa ku ji bendeyên xwe em kê bivên bi wê tînin riya rast û durist. Bêguman tu mirovan li ser riyeke rast û durist rasterê dikî.

53. Ku ew riya Xwedê ye, ew ê ku yên li erdê û asîmanan tev ên Wî ne. Guhdar bin! Her kar û bar bi bal Xwedê ve vedigerin.

# 43. SÛREYÊ ZUXRUF

Sûreyê Zuxruf 89 (heştê û neh) ayet e û li Mekkê daketiye. Ji ber ku di ayeta 35'em de kelîma Zuxruf hatiye ku ew bi mehneya zêr, xişr û gewher e, navê sûreyê Zuxruf e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Ḥa, Mîm.
2. Sond be, bi kitêba ronker...
3. Birastî Me ev Quran bi zimanê erebî nazil kiriye da ku hûn têbigihîjin.
4. Bêguman ev Quran li nik me di Lewhul Mehfûzê de qedirbilind e, tijî hîkmet e.
5. Erê ma ji ber ku hûn miletekî tixûbbihêr (û neguhdar) in em Quranê ji ser we rawestînin; we pê hişyar nekin?!
6. Me ji bo pêşîyan pir pêxember şandine.
7. Çiqas ku pêxemberek ji wan re hatiye, her wan tinazên xwe pê kirine.
8. Vêca Me jî yên ji wan hêzdartir û xurttir birine helakê û serpêhatiya wan jî (di Quranê de) derbas bûye.
9. Sond be, eger tu ji wan bipirsî kê erd û asîman afirandine, teqez dê bibêjin: desthilat ê zana ew afirandine.
10. Ew ê ku erd ji bo we raxistiye û di erdê de rê çêkirine da ku hûn rasterê bibin.
11. Ew ê ku ji ewran, bi endaz (û pîvan) av daxistiye. Vêca Me bi wê avê welatekî hişk û mirî hêşîn û sax kiriye. Ha hûn jî dê wisa (ji gorên xwe) bêne deranîn û saxkirin.
12. Ew ê ku ji her texlîtî cot afirandine û ji keştî û heywanan jî yên ku hûn li wan siwar bibin çêkirine.
13. Da ku hûn li ser pişta wan rawestin. Piştî ku hûn li ser pişta wan siwar bûn da ku hûn qenciya Xwedayê xwe di bîr bînin û bibêjin 'Em wî yê ku ev ji xizmeta me re berdest kirine pak didêrin. (Eger Xweda ew berdest nekiribûna) em ê li ser vê ne xwedanhêz bûna.
14. Bêguman em ê her li Xwedayê xwe vegerin.
15. Wan muşrikan, hin ji bendeyên Xwedê kirine parçeyek jê. Bêguman însan nankorekî aşkera ye.
16. Erê ma Xwedê ji mexlûqên xwe, ji bo xwe keç girtine û ji bo we jî kur terxan kirine?!
17. Çi dema yek ji wan (muşrikan) bi ya ku ji Xwedayê rehman re îsnad kiriye bê mizgîndayîn, ji hêrsan rûyê wî reş û tarî dibe.
18. Yan jî, ma hûn ew keça ku di nava xemla xwe de tê xwedîkirin û di dema têkoşînê de nikare li ber xwe bide, bi aliyê Xwedê ve didin?
19. Ew (pûtperest) bawer dikin ku ew melaîket ên ku bendeyên Rehman in, mê

ne. Gelo (dema Xwedê melaîket afirandin) ew hazirî ser afirandina wan bûne? Ew şahidiya wan dê were nivîsandin û ewê ji wê bêne pirskirin.

20. Gotin: Eger Xweda yê Rehman bixwesta dê me îbadetê wan nekiribûya. Di vê mijarê de tu zanîna wan tune ye. Bes ew derewan dikin.

21. Yan jî ma beriya vê (Quranê) me kitêbek daye wan, vêca ew xwe bi wê digirin?

22. Na! Wan gotiye, me bavên xwe li ser vê olê dîtiye û bêguman em jî li dûv şopa wan diçin.

23. Her wiha Me beriya te ji xelkê welatekî re çiqas pêxemberek şandibe, dewlemend û giregirên wî welatî ev gotine: Me bavên xwe li ser olekê dîtiye û em ê li pey şopa wan herin.

24. Pêxemberê wan ji wan re got: Ma eger min ji bo we, ji ola ku we bavên xwe li serê dîtiye dînekî rasttir anîbe jî (disa hûn ê li pey min neyên?) Gotin: Em dînê ku hûn bi wî hatine hinartin, înkar dikin.

25. Me jî cezayê wan da wan, de tu binêre ka encama bêbaweran çawa bûye?!

26. Ji qewmê xwe re bibêje; dema Îbrahîm ji bavê xwe û gelê xwe re got: Ez ji wan ên ku hûn îbadetê wan dikin dûr û bêrî me.

27. Ji bilî wî Xwedayê ku ez afirandime, lewra ew ê min rasterê bike.

28. Îbrahîm ev kelîme (ya tewhîdê) ji zuriyeta xwe re wek mîraseke seraqetî hişt da ku ew (li dînê heq) vegerin.

29. Naxêr; belkî Min ev (muşrik) û bav û kalên wan çêjandin heta ku heq (Qur'an) û qasidekî aşkeraker ji wan re hate şandin.

30. Lê belê çi dema ku heq ji wan re hat, gotin: Ev sêrbaziyek e û em îmanê pê nayînin.

31. Gotin: De bila ev Quran ji mezinê yekî ji van herdu bajaran re daketibûya![1]

32. Erê ma ew qenciya Xwedayê te (ku pêxemberî ye) par vedikin? Di jiyana cîhanê de me risqê wan di neqeba wan de par vekiriye. Me hin ji wan di ser hinan re girtiye da ku hin ji wan hinekan bidin xebatê. Qenciya Xwedayê te (roja qiyametê) ji tiştê ku ew kom dikin, gelek çêtir e.

33. Eger ji ber hênceta ku însan hemû (li ser kufrê) yek milet bimînin nebûya, me dê ji bo wan ên ku Xwedê înkar dikin, banê xaniyên wan û pêlikên ku bi wan hildikişin jorê ji zîv çêkiribûna.

34. Me dê ji xaniyên wan re jî dergeh (ji zîv) û textên ku ew li ser wan pal didin çêkiribûna.

35. Me dê wan di nava xemlên zêr de noq bikirana. Ev hemû tenê pertalên jiyana cîhanê yên biwext in (ku demeke wan î vebirî heye). Qenciya axiretê jî li cem Xwedayê te, tenê ji bo mutteqiyan e.

1 Muşrikan ji çavnebarî nedixwestin ku Qur'an ji Pêxember re hatiye. Di gotin bila ji yekî herdu mezinên wan re bihata. Ji mezinê Mekkê Welîdê kurê Muxîre yan jî ji mezinê Taîfê Urweyê kurê Mesûd re bila hatibûya.

**36.** Kî ku berê xwe ji Qurana Xwedayê Rehman biguherîne, em ê jê re şeytanekî vebohtî (hazir) bikin, êdî ew şeytan hevalê wî ye.

**37.** Bêguman ev şeytan wan ji riya rast derdixin û ji wan (kafiran) we ye ku ew di riya rast de ne.

**38.** Paşê heyanî ku ew were ber destê me, (ji şeytanî re wiha) Dibêje: Hey, xwezî di neqeba min û te de bi qasî rojhilat û rojava dûrahî hebûya. Vêca tu çi hevalekî pîs î!

**39.** (Xwedê dibêje:) Ji ber ku hûn her du jî zalim bûn, îro poşmaniya we dê tu feydeyekê nede we. Bêguman hûn di ezab de hevpişk in.

**40.** Erê ma tu yê bi keran bidî bihîstin, yan jî tu yê kor û yên ku di rêşaşiyeke aşkera de ne, rasterê bikî?

**41.** Eger em (beriya ezabekî bidin wan) te bimirînin, vêca teqez em ê wan ceza bikin.

**42.** Yan jî em wî ezabê ku me ji wan re soz daye nîşanî te bidin, vêca birastî em li ser wan kara ne.

**43.** Vêca tu xwe bi ya ku ji te re hatiye wehîkirin bigire. Bêguman tu li ser riya rast û durist î.

**44.** Bêguman ev Quran ji bo te û qewmê te şîret û bîranîn e; paşê hûn ê jê bêne pirsyarkirin.

**45.** Tu ji peyrewên wan pêxemberên ku me beriya te ew şandin, bipirse: Ma ji bilî Xwedayê rehman, Me hin îlahên din çêkirine ku perestina wan were kirin?

**46.** Sond be, Me Mûsa bi ayetên xwe bi bal Firewn û giregirên wî ve şand. Mûsa got: Ez qasidê perwerdegarê alemê me (bi bal we ve hatime şandin).

**47.** Dema ku Mûsa ayetên me ji wan re anîn, di cih de bi wan keniyan (û tinazê xwe bi wan kirin).

**48.** Em çiqas nîşanekê bi wan didin dîtin her ew ji ya beriya xwe mezintir e û Me ew bi ezab hingaftin da ku ew (ji kufrê) vegerin.

**49.** Gotin: Ey zanayê sêrê! Ew soza Xwedê daye te, ji bo me ji Xwedê bixwaze, bêguman em ê bêne ser riya rast (û îman bînin).

**50.** Vêca dema Me (bi duaya Mûsa) ezab ji ser wan rakir, wan di cih de peymana xwe şikand.

**51.** Firewn, gazî li qewmê xwe kir û got: Gelî miletê min! Ma desthilatiya Misrê ne ya min e, ma ev çem ne di bin serayên min de diherikin? Erê ma hûn (hêza min û lewaziya Mûsa) nabînin?

**52.** Belkî ez ji vî zilamê (Mûsayê) reben û ku nikare (mebesta xwe) bibêje, çêtir im.

**53.** De bila li ser Mûsa bazinên zêr bihatina avêtin, yan jî digel wî melaîket bihatina ku arîkariya wî bikira!

**54.** Vêca Firewn (aqilê) gelê xwe sivik dêra, êdî wan jî bi gotina wî kir, lewra; birastî ew qewmekî fasiq bûn.

55. Vêca çi dema wan hêrsa me anî, Me (bi ezab) tol ji wan hilanî; êdî me ew tev di avê de xeniqandin.

56. Me (bi vê cezadanê) ew kirin pêşîkêş û mînak ji bo yên di pey wan re bên.

57. (Ya Muhemmed!) Çi dema Me ji Îsayê kurê Meryemê derb û mesel anî, qewmê te (ew ê ku bawerî neanîn) di cih de ji kêfa dan qîra.

58. Gotin: Ma îlahên me çêtir in yan Îsa çêtir e? Ev gengeşiya wan, bes da ku nîqaşê bikin. Belkî ew qewmekî zêde nîqaşker e.

59. Îsa bes evdê me ye, Me qencî lê kiriye û Me ew ji Benî Îsraîlîyan re kiriye nimûne.

60. Eger me bixwesta, me dê ji we li ser erdê melaîket biafirandina ku ew ê bibûna şûngirên hev.

61. Bêguman Îsa ji bo qiyametê zanînek e, vêca der barê qiyametê de nekevin gumanê. (Ya Muhemmed! Ji wan re bibêje:) Li dû min werin, ev riya rast û durist e.

62. Zinhar, bila Şeytan we (ji dînê Xwedê) venegerîne! Bêguman ew ji we re neyarekî aşkera ye.

63. Gava Îsa delîl û mucîze anîn, ji wan re got: Bêguman ez bi hîkmetê ji we re hatime, da ku hinekî ji yên ku hûn tê de bi hev ketin ji we re aşkera bikim. Vêca hay (ji helal û heramê) Xwedê hebin û bi gotina min bikin.

64. Bêguman Xweda perwerdegarê min û perwerdegarê we ye, vêca îbadetê Wî bikin. Ha ev rêyeke rast û durist e.

65. Vêca deste û komên îsraîliyan (der barê Îsa de) di nava xwe de bi hev ketin. Ji ber ezabê rojeke cansoj wax li halê zaliman!

66. Ma ew ji bilî ku ji nişka ve qiyamet bi ser wan de were pê ve -digel ku ew jê bê hayin- ew çavnêriya çi dikin?

67. Wê rojê, ji bilî yên teqwadar, hemû dost û hogir ji hev re dijmin û neyar in.

68. (Xwedê dibêje:) Gelî bendeyên min! Îro li ser we tirs tune ye û hûn ê xemgîn jî nebin.

69. Ew ên ku bi ayetên me bawerî aniye û ji Xweda re berdest bûne…

70. Hûn û hevjînên xwe bi qedr û dilşadî têkevin bihiştê!

71. Li ser wan (xwarin û vexwarin) bi firaq û qedehên zêrîn tên gerandin. Ji bo wan a ku dilên wan dixwaze û çavên wan pê zewqê dibîne, heye. Hûn ê her û her li wir bimînin.

72. Ha ev bihişta ku we mîras wergirtiye, xelata emelê we ye.

73. Tê de ji bo we pir pir fêkî hene ku hûn ê ji wan bixwin.

74. Bêguman sûcdar her û her dê di ezabê dojehê de bin.

75. Ezab li ser wan dê qet neyê sivikkirin, ew di nav ezab de dê hêviya xwe ji xelasbûnê bibirin.

76. Me li wan zilm nekiriye. Lê belê ew bi xwe zalim in.
77. Ew gazî dergehvanê dojehê dikin: Ey Malik! Bila Xwedayê te hukmê mirinê li me bibire! Malik jî dê ji wan re bibêje: Bêguman hûn ê wiha bimînin!
78. Sond be, Me heqî ji we re şand. Lê belê pirên we ji heqiyê hez nakin.
79. Na, belkî wan biryarek daye. Vêca bi rastî me jî biryar daye.
80. Yan jî, ji wan we ye ku em peyva wan a bi dizî û aşkera nabihîzin? Naxêr, em wê dibihîzin û qasidên me yên ku li cem wan in, wê dinivîsin.
81. Bibêje: Eger ji Xwedayê Rehman re zarok hebûna, teqez ez ê bibûma pêşiyê perestkaran.
82. Xwedayê erd û asîmanan û Xwedayê Erş ji saloxdayîna muşrikan teqez pak û dûr e.
83. Tu wan di rewşa wan de bihêle, bila xwe di pûçiyê de berdin û bi dinyaya xwe dilxweş bibin, heyanî ku pêrgî wê roja ku soza wê ji wan re hatiye dayîn bên.
84. Yê ku li asîmanan Xweda û li erdê jî Xweda Ew e. Her Ew e yê karbinecih yê zana.
85. Ew Xwedayê ku xwedanî û rêveberiya erd û asîmanan û yên di navbera wan de ji bo Wî ye, pîroz û bilind e. Her li cem Wî ye zanîna (bi roja) qiyametê û hûn ê lê bêne vegerandin.
86. Ew ên ku di şûna Xwedê de îbadetê wan tê kirin ew nikarin mehdervaniya tu kesî bikin. Lê belê yê ku bi zanebûn bawerî bi dînê heq bîne û şahidiyê jê re bide, ew cuda ye.
87. Sond be, eger tu ji wan bipirsî kê ew afirandine? Teqez dê bibêjin: Xwedê ye. Vêca ma çawa berê we jê tê zîvirandin?
88. Pêxember got: Xwedayê min! Ev miletekî wisa ye ku bawerî nayînin.
89. Vêca tu dev ji wan berde û bibêje: Bi rêka xwe ve herin. Paşê hûn ê karên xwe) bizanin!

# 44. SÛREYÊ DUXAN

Sûreyê Duxan 59 (pêncî û neh) ayet e û li Mekkeyê daketiye. Navê sûre ji kelîmeya Duxan hatiye ku di ayeta 10'em de derbas bûye û bi maneya dû ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm!***

1. Ḥa, Mîm.
2. Sond be, bi kitêba ronker.
3. Bi rastî me ew di şeveke pîroz de nazil kiriye. Bêguman Em bi wê (mirovan) hişyar dikin û ditirsînin.
4. Di wê şevê de, her kar û barên xwedanhîkmet tên veqetandin…

5. Ku ew fermaneke ji cem Me ye. Bêguman Em in ê ku dişinin…
6. Ew rehmetek e ji cem Xwedayê te. Bêguman, her Ew e yê bihîzer, yê zana.
7. Ew, perwrdegarê erd û asîmanan û perwrdegarê yên di navbera wan de ye, eger ji dil hûn bawer dikin.
8. Ji bilî Wî tu îlah nîn in. Ew sax dike û dimirîne. Ew perwrdegarê we û perwrdegarê bav û bapîrên we yên pêşî ye.
9. Belkî ew (muşrik) di gumanê de ji xwe re dileyîzin (û bawerî nayînin).
10. Vêca tu çavnêriyê bike, wê roja ku asîman dûmaneke aşkera tîne…
11. Ew mirovan dide nav xwe (û li wan tê hev). Ha ev ezabekî dijwar û bijan e.
12. (Hingê ew dê bibêjin:) Xwedayê me! Ezab ji ser me bide alî, bi rastî me îman anî.
13. Erê ma piştî ku ezab ji wan re hat ew ê çawa şîretê wergirin? Rewş ev e ku ji bo wan pêxemberekî ronak hatibû (û wan bawerî pê ne anîbû).
14. Piştre wan berê xwe ji pêxember guherand û gotin: Ew ji teref hinekan ve hatiye perwerdekirin, ew dîn e.
15. Em ê demeke kurt ezab ji ser we rakin, lê belê hûn ê dîsa (li halê xwe yê berê) vegerin.
16. Roja ku Em wan bi hingaftineke tûj û mezin bihingêvin. Teqez em ê tol û heyfê li wan vekin.
17. Sond be, me beriya wan (muşrikan) gelê Firewn jî ceriband û ji wan re pêxemberekî birûmet hat.
18. (Ji wan re wiha got:) Bendeyên Xweda (benî îsraîlîyan) teslîmî min bikin, lewra ez ji bo we pêxemberekî pêbawer im.
19. Xwe li hemberî Xweda mezin nedêrin, birastî jî min ji bo we delîl û belgeyeke aşkera anîye.
20. Ez xwe diavêjim ber hefza Xwedayê xwe û Xwedayê we da ku hûn min bi keviran nekujin.
21. Eger hûn ji min bawer nakin, nexwe ji min dûr bibin.
22. Li hemberî vê, Mûsa gazî Xwedayê xwe kir, got: Ev ên ha qewmekî sûcdar in.
23. (Xwedê jê re got:) Nexwe bendeyên min bi şev (ji Misrê) derîne, bêguman ew ê bi dûv we bikevin.
24. Deryayê di rewşa wê de aram bihêle, birastî ew ê di avê de bên xeniqandin.
25. Wan li dûv xwe gelek baxçe û kaniyên (bêxwedî) hiştin…
26. Zeviyên çandinî û koşkên xweşik…
27. Pir nîmetên ku di nav wan de kêf û şahî dikirin (hiştin)!
28. Rewş wiha ya û me miletekî din kire warisê wan.
29. Erd û asîman ji bo wan negiriyan û muhlet jî ji wan re nehate dayîn.
30. Sond be, Me zaroyên Îsraîl ji wî ezabê riswaker xelas kirin…

31. Ji Firewn. Lewra ew zordarekî tixûbbihêr bû.
32. Sond be, Me zaroyên Îsraîl bi zanîn di ser xelkê (dema wan) re girtin.
33. Me hin nîşan dane wan ku di wan de ceribandineke aşkere hebû.
34. Bi rastî ev ên han dibêjin:
35. Ji mirina me ya pêşîn pê ve tiştekî din nîn e û em ê neyêne saxkirin.
36. (Gotin:) Vêca eger hûn rast dibêjin, de ka bav û bapîrên me bînin.
37. Ma ev (muşrik) xurttir in, an jî gelê ‘Tubbe’yê û ên beriya wan jî? Ji ber ku gunehkar bûn, Me ew tev birin helakê.
38. Me erd, asîman û yên di navbera wan de mişêya neafirandine.
39. Me ew her bi heqiyê afirandine, lê belê pirên wan (vê rastiyê) nizanin.
40. Bêguman roja jihevcudabûnê (roja qiyametê) civanê wan hemûyan e.
41. Wê rojê, tu dost nikare feydê bide dostekî, arîkariya wan jî dê neyê kirin.
42. Ji bilî yên ku Xwedê li wan hatiye rehmê. Bêguman, desthilat ê dilovîn, her Ew e.
43. Birastî dara zeqqûmê…
44. Xwarina gunehkaran e.
45. Eynî wekî hesinê helandî di zikên wan de dikele.
46. Her wiha wekî kela ava kelî ye.
47. (Xweda ferman li zebaniyan dike:) Wî bigirin, bikêşin nîvê dojehê!
48. Piştre ji ezabê dojehê (ava kelî) bi ser wî de birijînin.
49. (Jê re dibêjin:) De haydê (ezab) tehm bike! Lewra tu desthilat û birûmet bûyî!
50. Bêguman ev ezab ew ê ku we der barê wî de guman dikir.
51. Her çî ku mutteqî ne, bi rastî ew li cihekî ewle ne.
52. Di nav bexçeyan de û li ser kaniyan in…
53. Cilên hevrîşimê tenik û etlesê beriqok li xwe dikin û li pêşberî hev rûdinin.
54. Her wiha me ew bi horiyên çavgir ên çavbelek re kirin hevjîn.
55. Tê de her texlîtên fêkî bi ewlehî dixwazin.
56. Ji mirina pêşîn pê ve ew ê mirineke din neçêjin û Xwedê ew ji ezabê dojehê parastine.
57. Ev dayîna han qenciyek e ji Xwedayê te ye û teqez ew e xelasiya mezin.
58. Me ev Quran bi zimanê te hêsan kiriye da ku ew şîret wergirin.
59. Vêca tu çavnêriyê bike, bêguman ew jî çavnêriyê dikin.

# 45. SÛREYÊ CASIYE

Sûreyê Casiye 37 (sih û heft) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre, navê xwe ji bêjeya Casiye girtiye ku di ayeta 28'em de derbas bûye û bi mehneya "çokdayîn, kombûyîn" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Ḥa, Mîm.
2. Ev kitêb ji cem Xwedê ve hatiye hinartin, ew ê ku desthilat e, karbinecih e.
3. Bêguman di erd û asîmanan de, ji bo bawermendan gelek ayet hene.
4. Bêguman di afirandina we de û di zindîyên ku li ser erdê belav bûne de, ji bo miletekî ku ji dil bawer bike, gelek îbret hene.
5. Bêguman di guhertina şev û rojê de, di wê barana ku Xwedê ew ji asîmên daxistiye, vêca ku bi wê baranê erda mirî sax û hêşîn dike û di anîna bayê ji hemû aliyan ve, ji bo miletekî ku fehm bike, pir ayet hene.
6. Ha ev ayetên Xwedê ne. Em wan bi heqî û rastî ji te re dixwînin. Êdî ew (muşrik) piştî ku bawerî bi Xwedê û ayetên Wî neyînin, ew ê bi kîjan gotinê bawerî bînin?
7. Wax li halê her derewbêjê gunehkar!
8. Ku ew ayetên Xwedê yên ku jê re têne xwendin seh dike, piştre xwe mezin didêre her wekî ku ew nebihîstine asê dibe, vêca mizgîniya ezabekî dijwar bidê!
9. Dema ji ayetên me tiştekî fêr dibe henekê xwe bi wan dike. Ha ji bo wan ezabekî riswaker heye.
10. Cehenem li pêşiya wan e. Tiştên ku wan bi dest xistin û ew ên ku wan di şûna Xwedê de ji xwe re kirine piştevan jî nikarin tu feydeyekê bidin wan û ji bo wan her ezabekî mezin heye.
11. Ha ev, serkaniya hîdayetê ye. Herçî ew ên ku ayetên Xwedayê xwe înkar kirin, ji wan re ezabekî bieş û dijwar heye.
12. Xwedê ye, yê ku derya ji bo we misixur kiriye da ku keştî bi destûra Wî tê de bikişin û ku hûn ji kerema Wî li risqê xwe bigerin û da ku hûn Wî bişêkirînin.
13. Xwedê ji kerema xwe çi li erd û li asîmanan hene tev ji bo we bindest kirine. Teqez di vê de ji bo miletekî ku bifikirin pir ayet hene.
14. Ji bawermendan re bibêje: Bila wan ên ku ji rojên Xwedê (ên karesat) natirsin bibexşînin da ku Ew qewmekî xelat bike bi sedem ya ku kirin.
15. Kî ku karekî qenc bike ew ji xwe re dike û kî jî karekî neqenc bike ew li xwe dike. Piştre hûn ê li Xwedayê xwe bên vegerandin.
16. Sond be Me kitêb, desthilatî û pêxemberî daye zarûyên Îsraîl û Me ew bi tiştê pak û helal risqdar kirin û me ew di ser xelkê (heyama wan) re girtin.
17. Me der barê dîn de delîlên aşkera dane wan. Lê belê ew, piştî ku zanîn ji wan

re hat, ji çavnebariya xwe bi hev ketin. Bêguman Xwedayê te roja qiyametê dê di navbera wan de der barê ya ku ew tê de bi hev ketin, hukim bike.

**18.** Piştre me tu der barê dîn de li ser şerîeteke (rêbazeke) aşkera danî. Vêca wê riyê bigire û bi dû hewesên nezanan nekeve.

**19.** Bêguman ew (nezan), ji ezabê Xwedayê te nikarin tiştekî ji te bidin alî. Bêguman zalim dost û piştevanê hev in. Xweda jî heval û arîkarê mutteqiyan e.

**20.** Ev (Quran) têgihînin ji bo mirovan û serwextî û dilovanî ye ji bo civateke ku ji dil bawerî tînin.

**21.** Erê ma ew ên ku guneh kirin, guman dikin ku Em ê wan û yên ku bawerî anîn û karên qenc kirin, di saxî û mirinê de wekhev bigirin? Çi pîs hukm e ya ew didin!

**22.** Xwedê erd û asîman bi heqî afirandine. Bi vî awayî her kes dê li gorî qazanca xwe bête xelat û celatkirin, tu zordarî jî li wan nayê kirin.

**23.** Erê ma te nedît, ew ê ku hewesa xwe ji xwe re kire îlah? Piştî ku zanîn gihaştê Xwedê ew gumrah kir, guh û dilê wî mor kir û perde bi ser çavê wî de anî. Êdî ji Xwedê pê ve kî heye ku wî bîne ser riya rast? Ma hê jî hûn tênagihîjin?!

**24.** (Muşrikan) Gotin: Jiyan tenê jiyana vê dinyayê ye; em tê de dimirin û dijîn û bes pêşdeçûna zemanî me dibe helakê. Di vê dabaşê de tu zanîna wan tune ye. Gotina wan bes guman e.

**25.** Dema ayetên me yên ronkar ji wan re tên xwendin, ji bilî ku bibêjin “Eger hûn rastbêj in de ka bav û bapîrên me sax bikin” pê ve tu mehneya wan tune ye.

**26.** Bibêje: Xwedê dê we sax bike, piştre dê we bimirîne. Piştre dê we di roja qiyametê de ya ku qet tê de guman tune ye we li hev bicivîne, lê belê pirên mirovan (vê) nizanin.

**27.** Xwedaniya erd û asîmanan ji Xwedê re ye. Roja qiyamet rabe, ha wê rojê ew ên ku guhê xwe dane ya pûç û betal, dê ziyan bikin.

**28.** (Roja qiyametê) tu dê her umetî bibînî ku (ji tirsa hesabê xwe) çokdayî ne. Her umet bi bal deftera emelê xwe ve tên gazîkirin (û ji wan re tê gotin:) Îro hûn ê li gorî kirinên xwe bêne xelat û celatkirin!

**29.** Ev kitêba Me, derbarê we de bi rastî diaxive. Bêguman Me kirinên we didan nivîsandin.

**30.** Herçî ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirin, Xwedayê wan, wan dixe nav rehma xwe. Ha ev, ew serkeftin û serfiraziya aşkera bi xwe ye.

**31.** Ew ên ku kafir bûne (ji wan re dê bê gotin:) Erê ma ayetên min ji we re nedihatin xwendin, vêca we jî xwe mezin didêra û hûn bûne civateke gunehkar?!

**32.** Dema tê gotin; bi rastî peymana Xwedê heq e û di roja qiyametê de tu guman tune ye, hûn dibêjin: Em nizanin qiyamet çi ye. Lê belê bes em gumanekê dikin û em ji hatina wê ne piştrast in.

**33.** Cezayê neqenciyên ku wan kirî ji wan re xuya bûye û ezabê ku wan pê tinaz dikir dor li wan girtiye.

**34.** (Ji wan re) Tê gotin: We çawa gihiştina vê roja xwe ji bîr kiribû, eynî wisa em ê jî îro we di ezab de bihêlin! Hêwirgeha we agir e û tu arîkarê we jî tun in!

**35.** Sedema vî ezabî ev e ku we tinazên xwe bi ayetên Xwedê kiriye û jiyana cîhanê hûn xapandine. Êdî îro ew ê ji êgir neyêne deranîn û (razîkirina Xwedê jî) dê ji wan neyê xwestin.

**36.** Vêca her saloxên baş û têkûz ji bo Xwedê ne, Ew ê ku perwedegarê erd û asîmanan û perwerdegarê alemê ye.

**37.** Di erd û asîmanan de, mezinahî û kubarî her jê re ye û Ew e yê serdest, yê karbinecih.

## 46. SÛREYÊ EHQAF

Sûreyê Ehqaf, 35 (sih û pênc) ayet e. Li Mekkê nazil bûye. Sûreyî, navê xwe ji bêjeya Ehqaf girtiye ku di ayeta 21-em de derbas bûye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Ḥa, Mîm.

**2.** Ev kitêb, ji cem Xwedayê desthilat ê xwedanhikmet ve hatiye şandin.

**3.** Me asîman, erd û yên di navbera wan de heyî, her bi heqî û heta demeke diyarkirî aferandine. Ew ên ku kafir bûne, piştа xwe didine wî tiştê ku pê hatine hişyarkirin.

**4.** Bibêje: De ka ji min re bêjin; ew ên ku ji bilî Xwedê hûn îbadetê wan dikin nîşanî min bidin; ka di erdê de çi xuliqandine! Yan jî çi hevkariyeke wan di (aferandina) asîmanan de heye? Eger hûn rastgo ne, de ka kitêbekê ku beriya vê (Qur'anê) hatibe, yan jî berhemekê ji zanîna (pêşiyan) ji min re bînin.

**5.** Ma ji wî yê ku ji bilî Xwedê, ji yekî daxwaz dike ku heyanî roja qiyametê ew neşê bersiva bergerîna wî bide rêşaştir kî heye? Rewş ev e ku ew jî ji bergerîna wan xafil in.

**6.** Dema mirov (di mehşerê de) li hev bêne civandin, ew ê ji wan (abidên xwe) re bibin dijmin û wê ji perestina wan xwe bêrî bikin.

**7.** Dema ayetên me yên ronker ji wan re dihatin xwendin; ew ên ku kafir bûne piştî ku heqî ji wan re hat, gotin: "Ev sêhreke aşkera ye."

**8.** Yan jî ew (muşrik) dibêjin: Wî, ew Qur'an ji cem xwe lêaniye? Bibêje: eger min ew lêanîbe, hûn dê nikaribin tiştekî ji (ezabê) Xwedê ji ser min bidin alî. Xweda, bêhtir bi ya ku hûn xwe tê de berdidin dizane. Di navbera min û we de bi şahidî Xwedê bes e. Ew, gunehveşêr û dilovîn e.

**9.** Bibêje: Ez ne pêşîvanê pêxemberan im û ez nizanim dê çi ji min û çi ji we jî bê kirin. Ez tenê didim pey wehya ku ji min re hatiye û ez bes hişyarkerekî aşkera me.

**10.** Bibêje: De ka ji min re bibêjin; eger diyar bû ku ev Qur'an ji cem Xwedê ye û we jî ew înkar kiriye û ji zaroyên îsraîl jî yekî şehdeyî li ser dabe ku ew mislê Tewratê ye, vêca wî bawerî anî û we jî xwe mezin dêra (ka ji we zalimtir kî heye)? Bêguman Xwedê qewmê zalim nayêne ser riya rast.

**11.** Ew ên ku kafir in, di bara bawermendan de gotin: Eger ev (dînê îslamê) çêtiriyek bûya, wan berî me bawerî pê nedianîn û dê neketana pêşiya me. Lê belê ji ber ku ew bi vê (Qur'anê) naxwazin bêne ser rêya rast, dê bibêjin: "Ev, dereweke kevnare ye."

**12.** Beriya vê jî, kitêba Mûsa rêber û rehmet bû. Ev kitêb jî, ji kitêbên beriya xwe re rastdêrek e, bi zimanê erebîye, (nazil bûye) da ku yên zulim kirine hişyar bike û ew ji bo qencîkaran re mizgînî ye.

**13.** Bêguman ew ên ku gotin: „Xwedayê me Ellah e" paşê xwe (li ser rêya İslamê) rast û durust kirin, vêca ji bo wan (roja qiyametê) tu tirs tune ye û ew ê xemgîn jî nebin.

**14.** Ha ew xelkê bihiştê ne, ew dê her û her lê bimînin, ev xelata kirinên wan e.

**15.** Me, li însanî qewêtî kir ku qenciyê li dê û bavê xwe bike. Dayîka wî bi zehmetî ew hilgirtiye û bi zehmetî ew welidandiye. Hilgirtina wî û jişîrvekirina wî sih mehî dewam dike. Paşê însan, çi dema ku bigihîje temenê xortaniya xwe û çil saliya xwe, dibêje: Xwedayê min! Îlhamê bide min, min muwefeq bike, da ku ez şukrê qenciya te bikim, ew qenciya ku te li min û li dê û bavê min kirî û da ku ez karekî qenc bikim ku te razî bike û zurriyeta min jî ji bo min baş bike. Min bi bal te ve tobe kir û ez ji mislimanan im.

**16.** Ha ew in, ên ku em ê spehîtirê ya ku kirine ji wan qebûl bikin, em ê li gunehên wan biburin û ew di nava xelkê bihiştê de ne. Ev e, peymana rast a ku ji wan re hatiye dayîn.

**17.** Ew ê ku ji dê û bavê xwe re dibêje: Of ji we re be! Ma hûn sozê didin min ku ez ê (ji gorê) bême der. Hal ev e ku beriya min pir umet derbas bûne, çûne (û tu kes ji wan ji gorê dernehatine). Dê û bavê wî hawara xwe digihandin Xwedê (da ku wî vegerîne rêya rast) û jê re digotin: Xwelî li serê te be! Îmanê bîne, bêguman soza Xwedê heq e, rast e. Vêca ew jî dibêje: Ev, (saxbûna piştî mirinê) ji çîrok û çîvanokên pêşiyan pê ve ne tiştekî din e.

**18.** Ev (xwediyê van gotinan), ew kes in ku wekî umetên beriya xwe; ji cin û mirovan ezab li ser wan pêwist bûye. Bêguman yên di ziyanê de her ew in.

**19.** Ji bo her kesî li hemberî kar û kiryarên wan kirî mertebeyên wan hene. Xwedê dê bedêliya kirinên wan bide wan û qet neheqî dê li wan neyê kirin.

**20.** Wê roja ku yên kafir li ser êgir bêne rapêşkirin, (ji wan re dê bê gotin:) We, di jiyana xwe ya cîhanê de hemû lezzet û xweşiyên xwe birin, we bi wan kêf kir, vêca îro (!) ji ber ku we li erdê bêheqî xwe mezin didêra û ji ber ku hûn ji rê derketine, hûn ê bi ezabekî riswaker bêne cizakirin!

**21.** Birayê Ad (Hûd) jî bîne bîra xwe; dema qewmê xwe li erda ahqafê (ji ezabê Xwedê) hişyar kir -beriya Hûd û piştî wî jî pir pêxember (ji bo gelên xwe) hatine

(şandin) û çûne- ku (Hûd ji gelê xwe re got:) Ji Xwedê pê ve îbadetê (tu kesî din) nekin. Ez li ser we ji ezabê rojeke mezin ditirsim.

**22.** Gelê Hûd got: (Ya Hûd!) Ma tu ji me re hatî ji bo ku me ji îbadetkirina pûtên me vegerênî? De heydê, eger tu ji rastbêjan î de ezabê ku tu pê gefan li me dikî, ji bo me bîne.

**23.** Hûd, ji wan re got: Zanîn (a bi hatina ezabê) bes li cem Xwedê ye. Ez ya ku pê hatime şandin ji we re radigihînim. Lê belê ez we milletekî ku xwe li nezanînê datîne, dibînim.

**24.** Çi dema wan ew (ezab) di dirûvê ewrekî de dît ku berê xwe dabû ser newalên wan, gotin: Ev ewrek e dê baranê li ser me bibarîne. (Hûd, ji wan re got:) Naxêr! Ew, wî ezabê ku we lez li hatina wî dikir. Ew bayekî wisa ye ku di nava wî de ezabekî dijwar heye!

**25.** Ew (ba), bi fermana Xwedayê xwe her tiştî tarûmar dike, hildiweşîne. (ezabê Xweda bi ser wan de hat) êdî ji cih û warên wan pê ve tiştek nema tê dîtin (lewra ew, digel mal û sewalên xwe tev çûne helakê). Ha bi vî awayî em qewmê gunehkar ciza dikin.

**26.** Sond be, hêz û derfetên ku me nedayî we, me dabû wan. Me, guh, çav û dil jî dabûne wan lêbelê; guhên wan, çavên wan û dilên wan tu feyde nedane wan. Lewra wan ayetên Xwedê înkar dikirin. Ezabê ku wan pê tinaz dikir bi ser wan de hat û ew xistin nav xwe.

**27.** Sond be, Me xelkên welatên hawîrdora we jî birin helakê. Me delîl û belge pir caran anîn da ku ew vegerin ser riya rast.

**28.** De bila ew pûtên ku di şûna Xwedê de ji bo xwe îlah girtibûn, da ku wan nêzîkî Xwedê bikin hatibûn perestin, arîkariya wan kiribûna? Nexêr, ew ji ber wan winda bûn û ev derew û bêbextiya wan e.

**29.** Wê dema Me berê çend kesên cinî dabûn te da ku li Qur'anê guhdarî bikin. Vêca dema ji bo ku li Qur'anê guhdarî bikin amade bûn; (ji hev re) gotin: Huş bibin, li Quranê guhdarî bikin! Çi dema (xwendina) Qur'anê temam bû; li gelê xwe vegeriyan û ew pê agahdar kirin.

**30.** (Wan cinan ji gelê xwe re) Gotin: Gelî milletê me! Bêguman me li kitêbeke wisa guhdarî kir ku ew piştî Mûsayî hatiye hinartin, ew kitêbên beriya xwe rast didêre, mirovan gazî heqiyê dike û bi bal rêyeke rast ve rasterê dike.

**31.** Ey qewmê me! Bersiva dozdarê (dînê) Xwedê bidin, baweriyê pê bînin, Xwedê jî dê li gunehên we bibore û ji ezabekî dijwar we biparêze.

**32.** Kesê ku bersiva dozvanê (dînê) Xwedê nede, li ser erdê ew ê Xwedê naçar nehêle û zora Wî nebe. Ew ê ji Xwedê pê ve ji bo xwe tu xwedî û piştevanekî nebîne. Ha ev di nav rêşaşiyeke aşkera de ne.

**33.** Ma ew nabînin, ew Xwedayê ku erd û asîman afirandin û di ber afirandina wan de newestiyaye, Ew dikare miriyan jî sax bike? Belê, rast e. Birastî Xwedê li ser her tiştî qadir e.

**34.** Wê roja ku yên kafir li ser êgir têne rapêşkirin (ku ji wan re tê gotin:) Ma ev (ezab), ne rast û heq e? Ew dê bibêjin: Belê, em bi Rebbê xwe sond dixwin ku rast e. Ji wan re tê gotin: Naxwe ji ber kafirbûna xwe de ezabê tehm bikin!

**35.** Nexwe tu jî wekî wan pêxemberên "ulul ezm" ew ên ku xwe ragirtine, sebrê bikêşe û lezê ji bo (hatina ezabê ) wan meke. Roja ku ew, wî ezabê ku peymana wî ji wan re hatiye dayîn, bibînin; (wê çaxê) ji wan weye ku ew tenê bi qandî saeteke rojê (li dinyayê) mane. Eva hatî gotin (ji bo we) dazanînek e. Erê ma ji civata jirêderketî pê ve kî ji holê tê rakirin?

## 47. SÛREYÊ MUHEMMED

Sûreyê Muhemmed 38 (sih û heşt) ayet e û li Medînê daketiye. Navê sûre ji ayeta 2ê hatiye ku tê de navê Pêxemberê Îslamê Muhemmed (s) derbas bûye. Navekî din ê vî sûreyî jî Sûreyê Qîtal e ku ew jî bi maneya şer e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Ew ên ku kafir bûne û rêka Xwedê li ber xelkê girtine, Xwedê kirinên wan pûç kiriye.

**2.** Ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirine û bi ya ku ji Xwedayê wan ji Muhemmed re hatiye hinartin -ku bêguman ew heq e- ji dil bawer anîne, Xwedê li gunehên wan dibûre û rewşa wan sererast dike.

**3.** Ev yek jî, ji ber vê ye ku ew ên ku bawerî neanîne dane pey batilî û ew ên ku bawerî anîne dane pey heqiya ku ji cem Xwedayê wan hatiye. Bi vî awayî Xwedê ji mirovan re encama kirinên wan bi mînakan aşkera dike.

**4.** (Gelî mumînan) Gava (di şer de) hûn rastî kafiran bên li stûyên wan bixin (û wan bikujin). Paşê gava we berxwedana wan şikand, vêca (wan esîr bigirin û) qeydên wan bişidînin. Paşê yan li ser wan bikin minnet bêgerew wan berdin, an jî bi gerew (bi bedêl) wan berdin, heta ku qiraniya cengê biqede. Ev hukmê Xwedê ye, eger Xwedê bixwesta dê (bêyî we jî) tol ji wan vekira (û ewê helak bibûna). Lê belê da ku hinekan ji we bi hinekan biceribîne, vê dike. Ew ên ku di riya Xwedê de hatine kuştin, Xwedê kirinên wan dê winda neke.

**5.** Xwedê dê wan li ser riya rast rasterê bike û dê rewşa wan sererast bike.

**6.** Xwedê dê wan bixe wê bihişta ku (li dinyayê) bi wan dabû naskirin.

**7.** Gelî yên ku bawerî anîne! Eger hûn arîkariya (dînê) Xwedê bikin, Xwedê jî dê arîkariya we bike û dê we li hember dijmin bide ragirtin û lingên we dê mikûm bigire.

**8.** Herçî ew ên ku îman neanîne, riswatî û şermezarî ji wan re be. Xwedê kirinên wan pûç kirine.

**9.** Ev jî ji ber ku wan ji Qur'ana ku Xwedê (ew) nazil kiriye hez nekirine. Xwedê jî emelên wan pûç kiriye.

**10.** Ma ew li ser erdê negeriyane ku bibînin ka encama wan ên ku beriya wan çûne çawa bûye? Xwedê ew tar û mar kirin. Ji van kafiran re jî encameke wekî wê (encama wan qewmên ku bihurîne) heye.

**11.** Ev jî, ji ber ku Xwedê piştgîrê bawermendan e. Bi rastî ji bo yên kafir, tu piştgîr û arîkar tun in.

**12.** Bêguman Xwedê ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirin dê bixe bihiştên ku di binê wan de çem diherikin. Ew ên ku bawerî neanîn (bi jiyana dinyayê) xweş dibin, mîna heywanan dixwin û vedixin û cihê wan (li axiretê) her agir e.

**13.** (Ya Muhemmed!) Me gelek xelkên welatan ku ew ji xelkê welatê te, ew ê ku tu jê deranîne, xurttir û bihêztir bûn helak kirine, vêca ji bo wan tu arîkar jî nebûn.

**14.** Ma ew kesê ku ji Xwedayê xwe li ser delîleke aşkera ye, dibe wekî kesê ku karê wî yê nebaş jê re hatiye xemilandin û daye pey dilxwaziyên xwe?

**15.** Salix û rewşa wê bihişta ku peymana wê ji mutteqiyan re hatiye dayîn wiha ye: Di nav de çemên ji avê hene ku xerab nabe, tê de çemên ji şîr hene ku tehma wî nayê guhartin, tê de çemên ji şeraban hene ku ji yên vedixwin re lezîz e, tê de çemên ji hingivên helandî yên sefandî hene û tê de ji bo wan her texlît fêkî hene û ji cem Xwedayê wan ji bo wan lêborînek heye. Ma ev (ê ku di nava van nîmetan de bijî) dibe wekî wî kesê ku her û her dê di agirê dojehê de bimîne û ji aveke kelijî bête avdan ku roviyên wî ker ker bike?

**16.** Ji minafiqan hin hene li te guhdarî dikin heyanî ji cem te dertên, ji yên xwedîzanîn re dibêjin; ma niha wî çi got? Ha ev ên hanê, ew kes in ku Xwedê mor li ser dilên wan daye û wan dane pey hewesên xwe.

**17.** Ew ên ku li ser riya rast rasterê bûne, Xwedê hîdayeta wan zêde dike û rêka teqwadariya wan fêrî wan dike.

**18.** Ew (muşrik), bes li wê hêviyê ne ku ji nişka ve qiyamet bi ser wan de were. Vêca bi rastî nîşanên qiyametê hatine û xuya bûne. Erê dema ku qiyamet li wan rabû, ma êdî ew ê çawa tobe bikin û çawa jê şîretê wergirin?

**19.** Vêca tu bizane ku ji bilî Xwedê tu mebûd nîn in. Daxwaza lêborîna gunehên xwe û gunehên jin û mêrên bawermend bike. Xwedê, bi ger û fera we û bi lêvehewîna we dizane.

**20.** Ew ên ku bawerî anîne, dibêjin: De bila (der barê ferzbûna cîhadê de) sûreyek bihata hinartin? Lê belê çi gava sûreyekî hukmê wî aşkera dakeve û tê de behsa şer (cîhadê) bê kirin, ew ên ku di dilên wan de nexweşî (ya nîfaqê) heye, tu dê bibînî ku wekî nêrîna kesê ku bêhişiya mirinê ew girtiye, li te dinêrin. Ji wan re ya çêtir û xêrtir ev bû (ku)…

**21.** Bi gotina pêxember kiribûna û bi gotina xêrê axaftibûna. Vêca gava fermana cîhadê misoger bû, êdî heke ew bi Xwedê re rast bûna, teqez ji wan re çêtir bû.

**22.** Muheqqeq ku hûn bêne ser kar, hûn ê li ser erdê fesadiyê bikin û benê xwedîtiyê jî bibirin?!

**23.** Ha ev, ew ên ku Xwedê lanet li wan barandiye, vêca ew ker kirine û çavên wan kor kiriye.

**24.** Erê ma ew li Quranê nafikirin, an jî ma li ser dilên wan kilît hene?

**25.** Bêguman ew ên ku piştî riya rast ji wan re diyar bû berê xwe ji îslamê vegerandine, şeytên ji wan re (kufr û neqencî) şîrîn nîşan dan û gelek hêvî dane wan.

**26.** Ev (jidînderketina wan) jî, ji ber vê ye ku ji wan ên ku wan ji Quranê hez nedikir re digotin: Em ê di hin karan de bi gotina we bikin. Hal ev e ku Xwedê bi ya di dilên wan de veşartî jî dizane.

**27.** Vêca dema firîşte ruhên wan bistînin û li rûyên wan û pişta wan bidin, dê rewşa wan çawa be?

**28.** Ev (ezab) jî, ji ber vê ye ku ew li pey karên ku Xwedê pê ne qayil e diçin û ji karên ku pê qayil e hez nakin, vêca Xweda kar û kiryarên wan pûç kiriye.

**29.** Yan jî, ma ew ên ku di dilên wan de nîfaq heye hizir dikin ku Xwedê dê kîna wan dernexe holê?

**30.** Eger me bixwesta me dê ew nîşanî te bidana û te yê ew ji rûyên wan nas bikirina. Sond be, te yê wan ji şêwaza wan a axaftinê naskiribûya. Xwedê, hemû kar û barên we dizane.

**31.** Sond be, Em ê we biceribînin da ku Em ji we cîhadker û sebirkêşan derînin holê û em ê rewşa we jî aşkera bikin (da ku yê rast û derewkar ji hev kifş bibe).

**32.** Bêguman ew ên ku bawerî neanîne û wan riya Xwedê li ber xelkê girtiye û piştî ku hîdayet ji wan re diyar bûye, wan dijraberiya pêxember kiriye, ew ê tu zerarekê negihînin Xwedê. Hal ev e ku Xwedê dê kirinên wan pûç bike.

**33.** Gelî yên ku bawerî anîne! Guhdariya Xwedê bikin, bi gotina Pêxember bikin û kar û kiryarên xwe (bi bêîtaetiyê) pûç mekin.

**34.** Bêşik ew ên ku wan bawerî neaniye û riya Xwedê li ber xelkê girtiye û piştre jî li ser kufrê mirine, Xwedê dê hîç li wan nebore.

**35.** Zinhar, sist mebin ku vêca hûn daxwaza lihevhatinê bikin. Her hûn in yên serkeftî û Xwedê digel we ye. Ew ê qet (xelata) kirinên we kêm neke.

**36.** Bi rastî jiyana cîhanê bes kêf û mijûlahî ye (vêca bi wê nexapin). Eger hûn bawerî bînin û hûn hay ji helal û heramên Xwedê hebin, Xwedê dê padaşa we tam bide we û ji we (xerckirina) tu malî jî naxwaze.

**37.** Heke Xwedê malê we ji we bixwesta, vêca li ser dayînê zor li we bikira, we dê timayî bikira û vê yekê dê kîna we (ya li hemberî îslamê) deraniya meydanê.

**38.** Hûn ev ên han, bang li we tê kirin ku hûn malên xwe di riya Xwedê de xerc bikin. Ji we hinek nemerdiyê dikin. Lê belê kî timayiyê bike, ew timayiyê ji xwe re dike. Xwedê dewlemend e, hewceyî bi tu kesî tune ye û hûn xizan in hewcedarê Wî ne. Eger hûn berê xwe ji (îtaeta) Xwedê biguherînin, Xwedê dê qewmekî din bîne şûna we, paşê ew ê ne wekî we bin.

# 48. SÛREYÊ FETIH

Sûreyê Fetih 29 (bîst û neh) ayet e û li navbera Mekke û Medîneyê hatiye ku hingê Pêxember (s) ji peymana aştiyê ya Hudeybiyê vedigeriya. Sûre, navê xwe ji peyva fetihê girtiye ku di ayeta 1an de derbas bûye û bi mehneya "vekirin, vegirtin, standin, serkeftin û azadkirin"ê tê.

*Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm*

1. (Ya Muhemmed!) Bi rastî me deriyê serkeftineke aşkera ji bo te vekir.
2. Da ku Xwedê, gunehên te yên ku bihurîne û yên ku hê bên, bibexşîne û qenciya xwe (serkeftina dînê te) li ser te temam bike û li ser riyeke rast û durist te rasterê bike…
3. Ji bo ku bi serkeftineke bêşikestin jî te bi ser bixe.
4. Ew Xwedayê ku aramiyê dixe dilên mumînan da ku îmana wan xurt û zêde bibe. Leşkerên erd û asîmanan her yên Xwedê ne. Xwedê her zana û xwedanhîkmet e.
5. Ev tev, da ku Xwedê zilamên mumîn û jinên mumîn bixe bihiştên ku di binê wan de çem diherikin û ew ê her û her di wan cenetan de bin û da ku Xwedê gunehên wan efû bike. Ha ev li cem Xwedê serfiraziyake mezin e…
6. Ji bo ku Xwedê mêrên munafiq û jinên munafiq, mêrên muşrik û jinên muşrik, ew ên ku der barê Xwedê de zena xerab dikin, bide ezabê. Çerxa xerabî û ezabê li ser wan be. Xwedê qehr û xezeb li wan kiriye, lenet li wan barandiye û ji bo wan dojeh amade kiriye. Ew çi cihlêvegerîneke pîs e!
7. Leşkerên erd û asîmanan her yên Xwedê ne. Xweda di kar û barê xwe de her desthilat e, xwedîhikmet e.
8. (Ya Muhemmed!) Bi rastî Me tu bi şahidî, mizgînberî û hişyarkerî, şand.
9. Da ku mirov bi Xwedê û pêxemberê Wî bawerî bînin û arîkariya pêxemberê wî bikin, rêz û hurmeta wî bigirin û da ku sibeh û êvarê Xwedê pak bidêrin.
10. Bêguman ew ên ku peymanê didine te, bi rastî ew peymanê didin Xwedê; destê Xweda li ser destên wan e. Vêca kî peymana xwe bişkîne webalê peymanşikandina wî ji wî re ye. Kî wê peymana ku daye Xwedê bîne cih, vêca Xweda dê xelateke mezin bide wî.
11. Ew bedewiyên ku xwe li paş hiştine (û beşdarî cenga Hudeybiyê nebûne), dê ji te re bibêjin: Mal û eyalên me em mijûl kirin (me nekarî digel te derkevin Hudeybiyê, vêca) ji Xwedê lêborîna me bixwaze. Ew, tiştê ku bi zimanê xwe dibêjin, ne ya di dilê wan de ye. Bibêje: Eger Xwedê bixwaze zerarekê bide we, yan jî bixwaze feydeyekê bide we, qey li hemberî Xwedê kî dikare tiştekî bike? Belkî Xwedê bi her çi tiştê ku hûn dikin agahdar e.
12. Belê, we hizir dikir ku pêxember û mumîn dê qet li malbatên xwe venegerin. Ev di dilê we de hate xemilandin û we gumana xerab kiribû û hûn bûne civateke sezawarê (musteheqê) helakê.

13. Kî (ji dil û can) bawerî bi Xwedê û pêxemberê Wî neyîne, bêguman Me ji bo kafiran agirekî dijwar amade kiriye.

14. Xwedanî û hukimraniya erd û asîmanan xasê bi Xwedê ve ye. Ew kê bivê dibexşîne, kê jî bivê dide ezabê. Xwedê, her gunehjêbir e, dilovîn e.

15. Ew ên ku (ji Hudeybiyê) li paş mane dê bibêjin: Gava hûn ji bo bidestxistina xenîmetê derkevin bihêlin da ku em jî digel we bên. Ew dixwazin ku soza Xwedê biguherînin. Bibêje: Hûn ê qet bi me re neyên. Ev hê berî niha Xwedê ji we re gotiye. Ew dê ji we re bibêjin: Ne wisan e, belkî hûn ji çevnebarî vê dibêjin. Nexêr, ne wekî wan e, belkî ew civateke fehmkorin.

16. Ji bedewiyên ku li paş mane re bibêje: Li hemberî miletekî ku xwedan hêzeke dijwar e gaziya şer dê li we bê kirin. Hûn ê şerê wan bikin, an jî ew ê (bêşer) misliman bibin. Vêca eger hûn (çûna şer) qebûl bikin, Xwedê dê perûyeke spehî bide we. Lê belê eger weke cara pêşîn hûn dîsa ji paş ve vegerin, Xwedê dê bi ezabekî dijwar û cansoj we ceza bike.

17. Li ser koran tu guneh nîn e, li ser seqetan tu guneh nîn e û li ser nexweşan jî tu guneh nîn e (ku beşdarî şer nebin). Kî bi gotina Xwedê û pêxemberê Wî bike, Xweda dê wî bixe bihiştên ku di binê wan de çem diherikin. Kî li paş bimîne Xwedê dê bi ezabekî dijwar û xemnak wî ceza bike.

18. Sond be, Xwedê ji mumînan razî bûye wê dema ku wan li binê darê peyman dayî te. Vêca bi (rastî û wefadarî) ya ku di dilê wan de heye Xweda zaniye, êdî aramî û tenahî bi ser wan de şand û bi vekirina rêke serkeftineke nêzîk (bi fetha Xeyberê) ew xelat kirin.

19. (Xwedê soza) gelek xenîmetên din jî dane wan ku ew ê wergirin. Xwedê di kar û barê xwe de her serdest e, xwedîhikmet e.

20. Xweda peymana gelek xenîmetan daye we ku hûn dê wan wergirin. Bi lez ev daye we û destên mirovan ji (zerara ku bidin) we girtiye û da ku ev ji mumînan re bibe nîşanek (ku Xwedê soza xwe tîne cih) û Xwedê dê li ser riya rast û durist, we rasterê bike.

21. Hin xenîmetên din jî, ji bo we hene ku vêga hêza we ji wan re tun e. Lê belê Xwedê ji bo we, ji her terefî ve dor li wan girtiye. Xwedê li ser her tiştî qadir e.

22. Eger ew ên ku kafir bûne şerê we kiribûna, dê bişkestina û dê bi paş ve revîbûna. Piştre dê wan ji xwe re xwedî û arîkar jî nedîtina.

23. Ev suneta (adetê) Xwedê ye ku ji berê ve wiha derbas bûye (ku Xwedê pêxemberê xwe bi ser têxe) û tu dê qet guhartinekê di adetên Xwedê de nebînî.

24. Ew e yê ku piştî hûn li hemberî wan bi ser xistin, li newala Mekkê destên wan ji ser we dan paş û destên we jî ji ser wan dan paş. Xwedê bi kar û kiryarên ku hûn dikin, bîner e.

25. Ew (ên ku behsa wan bihûrî), ew ên ku kafir bûne û berê we ji ziyareta Mizgefta Mescîdul Heramê dagerandine û nehiştine ew qurbanên ku hatine berhevkirin bigihîjin cihê xwe (ku bêne qurbankirin). Eger ne ji ber êşandina hin mêr û jinên bawermend bûya, ew ên ku hûn wan nasnakin, vêca bi sedema wan

binezanî hûnê têketina bin webalekî giran de (Me yê hûn museletî ser wan bikira). (Ev tev) da ku Xwedê yê ew bivê wî têxe ber rehma xwe. Eger ew (mumîn û kafir) ji hev cuda bûna, teqez ji wan ên ku îman neaniye Me dê ezabekî cansoj bidaya wan.

26. Wê dema ku wan ên îman neaniye rika cahiliyetê xist dilên xwe, vêca Xwedê jî tenahî û aramiya xwe bi ser pêxemberê xwe û mumînan de şand û kelîmeya teqwayê li ser wan lazim kir. Ew bi xwe jî her babetir û ehiltirê wê bûn. Xwedê, teqez bi her tiştî zana ye.

27. Sond be, Xwedê xewna pêxemberê xwe bi heqî deraniye rastê. Hûn ê bi destûra Xwedê, bi ewlehî û bêtirs herin Mescîdul Heramê. Hin ji we porê xwe tevî biqusînin û hin ji we jî kurt bikin. Xwedê ya ku hûn nizanin, dizane, vêca ji bilî vê jî Xwedê fetheke nêzîk daye we.

28. Ew e, yê ku pêxemberê xwe bi hîdayet û dînê heq şandiye, da ku dînê wî bi ser hemû dînan bixe. Li ser vê yekê Xweda bi şahidî bes e.

29. Muhammed qasidê Xweda ye. Ew ên ku digel wî ne li hember kafiran dijwar in û di navbera xwe de bimerhemet in. Tu wan di rukû' û sicûdê de dibînî. Ew ji Xwedê kerem û razîbûnê dixwazin. Nîşana secdebirinê di rûyên wan de xuya dike. Ev wesfên wan ên di Tewratê de ne, herçî wesfên wan ên di Încîlê de jî wiha ne. Ew weke çandiniyekê ne ku zîxa xwe derxistiye, xurt bûye, stûr bûye û xwe li ser koka xwe girtiye ku ev li xweşa cotkaran jî diçe. Xwedê bi vî awayî wan xurt û belav dike da ku kafiran hêrs bike. Xwedê ji bo wan ên bawerî anîn û karên qenc kirine, peymana lêborîn û padaşeke mezin daye.

## 49. SÛREYÊ HUCURAT

Sûreyê Hucurat 18 (hijdeh) ayet e. Li Medînê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta 4'em girtiye ku tê de bêjeya El Hucurat derbas bûye û bi mehneya “gelek ode” ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Gelî yên bawerî anîne! Nekevin pêşiya Xwedê û qasidê Wî (bibin peyrewê Pêxemberê wî). Ji pêkneanîna hukmê Xwedê xwe biparêzin. Bêguman Xwedê bihîzer e, zana ye.

2. Gelî yên ku bawerî anîne! Dengê xwe bi ser yê Pêxember nexin, çawa ku hûn bi dengê bilind gazî hev dikin wisa gazî Pêxember mekin û bêyî ku haya we jê çêbe emelên we dê pûç bibe.

3. Bêguman ew ên li cem resûlê Xwedê dengê xwe nizm dikin, ha ew, ewên ku Xwedê dilê wan ji bo teqwadariyê ceribandiye. Ji wan re lêborîn û padaşeke mezin heye.

4. (Ya Muhemmed!) Bi rastî ew ên ku ji pişta odeyan bi dengê bilind gazî te dikin pirê wan fehm nakin.

**5.** Eger wan sebir bikira heta ku tu derketayî cem wan, teqez ji wan re çêtir dibû. Xwedê gunehjêbir û dilovîn e.

**6.** Gelî bawermendan! Eger yekî fasiq (derewker) ji were xeberekê bîne, vêca rastiya wê bikolin (ka rast e yan na), ku hûn rastiya wê nekolin, bê zanîn hûn dê destdirêjî civatekê bikin û piştre hûn ê li kirina xwe poşman bibin.

**7.** Hûn bizanin ku Resûlullah di nav we de ye. Eger wî di pir kar û baran de bi gotina we bikira, hûn ê biketina tengasiyê. Lê belê Xwedê îman bi we daye hezkirin û ew di dilê we de xweşik kiriye. Kufr û fisq û îsyan jî ji bo we kirêt nîşan dane. Ha ev in, yên ku di riya rast de ne.

**8.** Ev ( ji bo we) ji Xwedê lutf û nîmetek e. Xwedê ‘Elîm e, Ḥekîm e.

**9.** Eger ji mumînan du kom şerê hev bikin, wan li hev bînin. Eger yek ji wan êrîşî ser a din bike, heta ku li hukmê Xwedê venegere hûn şerê koma ku êrîş kiriye bikin. Eger (ji êrîşkariya xwe) vegere, êdî bi edaletî nava wan çêkin û (di her kar û barî de) bi dadî hukim bikin. Bêguman Xwedê ji dadperweran hez dike.

**10.** Bi rastî mumîn ji hev re bes bira ne. Nexwe navbera birayên xwe çêkin û xwe ji pêkneanîna hukmê Xwedê biparêzin da ku rehmet li we bê kirin.

**11.** Gelî yên ku bawerî anîne! Bila qewmek (ji we) henekê xwe li qewmekî din neke, dibe ku ew ên henek lêbûne ji yên din çêtir be. Bila (ji we) jin jî, henekê xwe bi jinên din nekin, dibe ku ew ji wan çêtir bin. Hûn hev eybdar mekin û bi leqebên pîs gazî hev nekin. Piştî îmanê fasiqî çiqas navekî pîs e! Kî ku tobe neke, vêca ha ew, yên zalim bi xwe ne.

**12.** Gelî yên bawerî anîne! Xwe ji gelekê gumanê biparêzin. Bi rastî qismek ji gumanê heye ku guneh e. Li eybên hev negerin, seba hev mekin (hin ji we li pişt hinan neaxivin). Erê ma bi yekî ji we xweş tê ku yek goştê birayê xwe yê mirî bixwe? Vêca ev li xweşa we naçe. Xwe ji (heramên) Xwedê biparêzin. Bêguman Xweda tobewergir e, dilovîn e.

**13.** Gelî mirovan! Bêguman me hûn ji mêrekî û jinekê afirandine û me hûn kirine qewm û qebîle da ku hûn (maf û hiqûqê) hev nas bikin. Bêguman li cem Xwedê yê herî birûmet ew ê ku bi pêkanîna heq û mafan xwe bêhtir diparêze.

**14.** Bedewiyan got: Me bawerî anî. Bibêje: We (hê jî) bawerî neaniye, lê belê bibêjin; ‘Em teslîm bûne.’ Hê jî îman neketiye dilê we. Heke hûn bi gotina Xwedê û qasidê Wî bikin, Xwedê dê ji karên we tiştekî kêm neke. Bi rastî Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

**15.** Bi rastî bawermend, ewên ku wan bi Xwedê û resûlê Wî îman anine, piştre jî (di îmana xwe de) qet nakevin gumanê û di riya Xwedê de bi mal û canên xwe cîhadê dikin. Ha ew in yên rast û durist.

**16.** Bibêje: Erê ma hûn dînê xwe bi Xwedê didine fêrkirin? Rewş ev e ku Xwedê bi tiştê li erd û asimanan, dizane. Xwedê bi her tiştî zana ye.

**17.** Ew ji ber ku misliman bûne minetê li te dikin, bibêje: Mineta mislimanbûna xwe li min mekin. Eger hûn di îmana xwe de rastgo bin, belkî Xwedê bi sebûnet hûn hîdayetî bal îmanê kiriye minnete li we dike.

18. Bêguman Xwedê bi nepeniya tiştê erd û asîmanan dizane. Xwedê bi ya ku hûn dikin bîner e.

## 50. SUREYÊ QAFF

Sûreyê Qaf 45 (çil û pênc) ayet e û li Mekkê daketiye. Navê Sûre ji herfa Qafê tê ku bi wê dest pê dike.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Qaf, sond be bi Qurana Mecîd.
2. Bi rastî (xelkê Mekkeyê) şaş maye ku ji nav wan bi xwe, ji bo wan pêxemberekî hişyarker were, vêca kafiran got: Ev, tiştekî ecêb û sosret e…
3. Erê ma ku em bimirin û bibin ax qey dîsa (em ê vegerin û sax bibin)? Ev vegereke dûr e (û hîç ne pêkan e ku biqewime).
4. Bêguman Em dizanin ka erdê çi ji bedena wan kêm kiriye û li cem me kitêbeke parêzker heye.
5. Belkî çi gava ku Quran ji wan re hat, wan bawerî pê neanî. Êdî ew di kar û rewşeke tevlîhev de ne.
6. Ma ew li asîmanên di ser xwe re nanêrin ku Me çawa ew (bêstûn) avakirine û Me ew (bi stêran) xemilandiye û jê re tu qelş û kêmasî tun in.
7. Me erd jî raxistiye û tê de çiyayên mikûm û asê durist kirine. Me tê de ji her cure (giyayên) ku bêhna (mirov) fireh bikin, hêşîn kirine.
8. (Me ev tev kirin), da ji bo her bendeyê ku li Xwedê vegere, bibin îbret û bîranîn.
9. Me ji ewran aveke bi bereket daxistiye û me pê baxçe û teneyê ku tê çinîn hêşîn kirine.
10. Me darxurmeyên dirêj ku werşiyên (goşiyên) wan yek di ser yekî re ye, pê deranîne.
11. Da ku ji mirovan re bibin risq û qût. Me bi wê avê welatekî hişkemirî sax (hêşîn) kiriye. Saxkirina miriyan (rabûna wan ji goran jî) her wisa ye.
12. Beriya wan gelê Nûh, gelê Ressê (bîrê) û gelê Semûd jî bawerî neaniye.
13. Ad, Firewn û xelkê Lût jî (bi pêxemberên xwe bawerî neanîn).
14. Gelê Eyketê û qewmê Tûbbeyê jî, van tevan bi pêxemberên xwe bawerî neanîn û ezabê min ji bo wan heq û pêdivî bû.
15. Erê ma qey ji afirandina cara pêşîn Em westiyane (heta ku em nikaribin dîsa wan sax bikin)? Naxêr, ew ji afirandineke nû bêbawer û gumandar in.
16. Sond be, bi rastî Me însan afirandiye û ya ku nefsa wî jê re dibêje Em dizanin û em ji rahjiyana (şahdamara) wî jî bêhtir nêzîkî wî ne.

17. Dema ku li rast û çepê însên du melayîketê rûniştî ne ku her hal û hereketên wî dinivîsin jî (Xwedê nêziktirê we ye).
18. Însan çi bibêje, her li balê (du melayîketên) çavdêr û amadekar hene (ku xêr û şerên wî qeyd û tomar dikin).
19. Serxweşiya mirinê bi fermana heq hat. Hey însan ha ev e ya ku tu jê direviyayî!
20. Di sûrê de hate pifkirin, ha ev e roja ku soza wê hatiye dayîn.
21. Her kes (çi baş çi xerab), digel ajoyekî û şahidekî tê (heşrê).
22. (Jê re dê wiha bê gotin: Hey mirov!) Sond be, haya te ji vê tune bû, vêca me perde ji ser çavê te hilanî, êdî dîtina te îro pir dijwar e (ya te pê nedidît îro tu dê bibînî).
23. Hevalê wî dê bibêje: Ha ev (kitêba kar û kiryarê wî ye) li cem min hazir e.
24. (Xwedê dê bibêje) Haydê her kafirê rikdar biavêjin dojehê…
25. Ew ên ku li ber qenciyê dibûn asteng, yên zordar û şubhekar…
26. Ew ê ku digel Xwedê ji xwe re îlahekî din girtî, wî biavêjin ezabê dijwar (û di cehenemê werkin).
27. Hevalê wî (şeytan) yê bibêje: Xwedayê me! Min ew ji rê dernexistiye. Lê belê ew bi xwe di nava jirêderketineke dûrî heq de bû.
28. Di wê navê de (Xwedê dê) bibêje: Li bal min nîqaşê mekin! Min hê berê (li ser zimanê pêxemberê xwe) ji we re haydarî şandibû.
29. Li bal min hukim nayê guherandin û Ez ne ew im ku zilmê li bendeyên (xwe) bikim.
30. Wê rojê, em ê ji cehenemê re bibêjin: Erê ma tu tije nebûyî? Ew jî dê bibêje: Ma hê jî tune ye?
31. Cennet jî ji mutteqiyan re tê nêzkirin û ew ne dûr e.
32. Ev e, ya ku peyman pê hatiye dayîn ji bo her bendeyê tobedar ê parêzkar.
33. Ew ê ku di nependî de ji Xwedayê bexşende bitirse û bi dilekî tobeker were cem Xwedê!
34. (Ji bihiştiyan re dê wiha bê gotin:) Bi selametî herin bihiştê. Ha ev, ew roja her û herî ye!
35. Ji bo cenetiyan tê de tiştê ew bixwazin ji wan re heye û li cem Me hê ji wê zêdetir jî heye.
36. Me beriya wan muşrikan çiqas milet birine helakê ku ew ji van xurttir bûn jî, vêca ew li welatan digeriyan, erê ma xelasî heye?
37. Bêguman di vê de, ji bo her kesê ku jê re dilekî bîner hebe yan jî guhveçîn be şîret û bîranîn e.
38. Sond be, Me erd û asîman û yên ku di navbera wan de hene di şeş rojan de afirandine û tu westandin jî negihîşte me.

39. Vêca (hey Muhemmed) li hemberî gotinên wan xwe ragire. Berî roj hilbê û here ava hemdê Xwedayê xwe bike û ji her kemasiyan Wî pak bidêre.
40. Di hinekî ji şevê de û piştî nimêjan jî Wî pak bidêre.
41. Guhdar be, li wê roja ku delalî ji cihekî nêzîk ve gazî bike.
42. Ew roj, mirov dê vî dengê heqiyê bibihîzin. Ha ev e, ew roja derketina ji goran.
43. Bêguman yê sax dike yê dimrîne Em in û lêvehewîn jî her bi bal me ve ye.
44. Wê rojê, erd dê li wan şeq bibe, ew bi lez dê ji goran derkevin. Ha ev civandineke ku li ber me hêsan e.
45. Em bi ya ku ew dibêjin baş dizanin. Tu li ser wan ne zordest î (ku bi zorê wan misliman bikî), tu tenê bi vê Quranê ew kesê ku ji ezabê min bitirse, şîret bike.

## 51. SUREYÊ ZARIYAT

Sûreyê Zariyat 60 (şêst) ayet e. Li Mekkê daketiye û navê sûre ji ayeta pêşîn tê ku tê de bêjeya Zariyat derbas bûye û bi mehneya "bayê tozbelav" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Sond be, bi bayên belavker…
2. Bi ewrên avhilgir ê bargiran…
3. Bi keştiyên ku bi hêsanî digerin…
4. Bi melayîketên ku kar û bar par vedikin…
5. Bi rastî ya ku hûn pê hatine sozdayîn heq û rast e.
6. Bi rastî dîn (roja xelat û celatê) teqez dê bê.
7. Sond bi asîmanê xwedan rêk...
8. Bi rastî jî hûn (der barê pêxember û Quranê de) di nav gotineke bêser û ber de ne.
9. Ê ku berê wî ji îmanê hatibe zîvirandin, dê rû jê bê zîvirandin.
10. Lenet li wan derewînan be.
11. Ew ên ku di nav tarîtiya nezanînê de bêhay mane.
12. Ew dipirsin ka roja cezadanê kengê ye?
13. Roja (cezadanê) ew roj e ku ew di êgir de têne şewitandin.
14. (Di dema îşkenceyê de ji wan re tê gotin:) Ezabê xwe tehm bikin! Ha ev e, ew ezabê ku we bi lez dixwest were!
15. Bêguman ên mutteqî di nava baxçe û kaniyan de ne.
16. Ya ku Xwedayê wan daye wan, werdigrin. Bi rastî ew beriya vêga mirovên qencîkar bûn.
17. Ew bi şev pir hindikî radizan.

18. Di çaxê spêdê de jî îstixfar dikirin.
19. Di malên wan de ji xwestek û bêparan re heqekî (kifşkirî) hebû ku didan.
20. Li ser erdê ji bo mumînan nîşan (ên ku yekîtî û qudreta Xwedê nîşan didin) hene.
21. Di nefsa we bi xwe de jî (nîşan û îbret hene) ma hûn nabînin?
22. Risqê we û tiştên ku peymana wan ji we re tê dayîn jî, li asîman in.
23. Bi Xwedayê asîman û erdê sond be, ev peymana (ku ji we re tê dayîn) wekî peyivîna we, rast û heq e
24. Erê ma behsa mêvanên Îbrahîm ên birûmet negihîştiye te?
25. Dema çûn cem Îbrahîm, silav lê kirin. Îbrahîm jî silava wan vegirt û got: Hûn biyanî ne (em hev nas bikin).
26. Vêca Îbrahîm bi lez çû rexê malê û goştê golikekî qelew (û biraştî) anî.
27. Vêca Îbrahîm ew (goşt) li ber wan danî û ji wan re got: De kerem bikin bixwin.
28. (Dema Îbrahîm dît ku ew naxwin) di dilê xwe de ji wan tirsiya. Jê re gotin: Metirse; wan mizgîna kurekî zana dayê.
29. Kebaniya Îbrahîm berê xwe da wan, vêca bi qîrîn li rûyê xwe da û bi heyret got: (Ez) pîrejinek im ku zarok ji min re çênabin!
30. Melayîketan got: Xwedayê te wisa gotiye. Bêguman Xwedê, her ew e yê xweyhîkmet, yê zana.
31. Îbrahîm (piştî zanî ku ew melayîket in) got: Gelî qasidan! Nexwe hûn ji bo çi hatine?
32. Gotin: Em ji bo (cezadana) qewmekî gunehkar hatine.
33. Em hatine da ku bi ser wan de kevirên ji heriyê bibarînin.
34. Ew (kevir) li cem Xwedayê te ji bo musrifan hatine nîşankirin.
35. Vêca Me mumînên ku li nav wan bûn, hemû deranîn.
36. Jixwe ji maleke misliman pê ve li wir nebû.
37. Ji bo yên ku ji ezabê dijwar ditirsin, me li wir nîşanek (li ser helaka kafiran) hişt.
38. Di (qiseya) Mûsa de jî (îbret hene); wê dema Me ew bi delîleke aşkera û ronak bi bal Firewn ve şand.
39. Firewn digel leşkerên xwe berê xwe (ji îmanê) vegerand û got: Mûsa, ya sêrbaz e, yan jî dîn e.
40. Paşê me Firewn û leşkerên wî girtin, vêca Me ew di behrê werkirin ku ew (bi sebûnet kufr û tuxyanê) li xwe lomekar bû.
41. Di Ad de jî (îbret hene). Me ji bo (helaka) wan bayê bêbereket û xerabker şand.
42. Tiştê ku bi ser de çûye zindî nehiştiye, her ew kiriye mîna hestiyê rizî yan jî mîna xweliya liberbaketî.
43. Di (helaka) Semûdî de jî (îbret hene), dema ji wan re hate gotin: Heta demekê xweş bijîn.

44. Ew li ber fermana Xwedayê xwe rabûn, vêca birûskan li ber çavên wan li wan da.
45. Wan ne dikariya rabin (ser xwe ku ji ber ezab birevin) ne jî arîkariya wan dihat kirin.
46. Beriya wan, me qewmê Nûh jî bire helakê. Bi rastî ew civateke jirêderketî bûn.
47. Me asîman bi hêz ava kiriye û bi rastî em wî hê jî fireh dikin.
48. Me erd jî raxistiye (da bi kêrî jiyanê bê), çi xweş raêxer in Em!
49. Me ji her tiştî cotek afirandiye da ku hûn bifikirin û şîret wergirin.
50. Nexwe bi bal Xwedê ve bibezin, bi rastî ez ji cem Wî, ji bo we hişyarkerekî aşkera me.
51. Hûn digel Xweda îlahekî din ji xwe re megrin. Bêguman ez ji cem Wî, ji bo we agahdêrekî aşkera me.
52. Her wiha çiqas pêxemberek ji yên beriya wan re hatibe, her gotine; sêrbaz e, yan jî dîn e.
53. Erê ma wan wesiyeta vê (derewîndêriyê) li hev kiriye? Nexêr, belkî ew civateke serxweveçûyî ne.
54. Vêca berê xwe ji wan vegerîne. Êdî gazin dê ji te neyê kirin.
55. Tu li wan pend û şîretan bike, vêca şîret teqez feydê dide mumînan.
56. Min, cin û însan bes ji bo ku îbadetê min bikin afirandine.
57. Ez ji wan tu risqekî naxwazim û Ez ji wan naxwazim ku ew xwarinê jî bidin min.
58. Bêşik yê pir rizq dide û yê xwediyê hêza xurt her Ew e.
59. Bêguman ji bo yên sitemkarî kirin jî parek ji ezab heye mîna ezabê yên beriya wan. Nexwe bila lezê li hatina ezab nekin!
60. Vêca ji ber (dijwariya) wê roja ku soza wê ji wan re hatiye dayîn wax li halê wan kafiran!

## 52. SUREYÊ TÛR

Sûreyê Tûr 49 (çil û neh) ayet e. Li Mekkê daketiye û navê sûre ji ayeta pêşîn hatiye ku tê de bêjeya Tûr derbas bûye ku bi mehneya çiya ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Bi Tûrê…
2. Bi kitêba ku rêze rêz hatiye nivîsandin…
3. Li ser çermê tenikê vekirî…
4. Bi Bey'tul-ma'mûrê…
5. Bi banê bilindkirî…

6. Bi wê deryaya ku hatiye sincirandin, sond be…
7. Muheqqeq ezabê Xwedayê te dê bê.
8. Tu paşbirek (ku wî dide paş) jê re nîn e.
9. Wê rojê asîman dê li hev bikeve, bikeye û şelq lê bikeve…
10. Dê çiya (mîna ewran) bimeşin.
11. Vêca wê rojê, wax li halê derewdêran (bêbaweran)!
12. Ew ên ku xwe di pûçî û batilî de berdidin, xafil û bêhay in.
13. Wê rojê, ew bi dijwarî bi bal agirê dojehê ve têne kêşandin,
14. (Dergehvanên dojehê dê ji wan re bibêjin) Ha ev e ew agirê ku we bawerî pê nedianî.
15. Erê ma ev sêrebazî ye, yan jî ma hûn nabînin?
16. De herin dojehê, vêca hûn sebrê bikêşin û nekêşin ji bo we her wekhev e. Bi rastî hûn cezayê ya ku we dikir, dikişînin.
17. Bêguman yên mutteqî di nav bostan û xweşiyan de ne.
18. Ew bi ya ku Xwedayê wan daye wan kêfxweş dibin û Xwedê ew ji ezabê dojehê parastine.
19. (Dergehvanên bihiştê ji wan re dibêjin) Bi sedema kar û kiryarên ku we kirin; bixwin, vexwin û ji bo we noşîcan be.
20. Li ser textên rêzerêzbûyî paldayî ne û Me ew bi horiyên çavgir re zewicandine.
21. Ew ên ku wan bawerî anine û zuriyeta wan jî bi bawerî dabe pey şopa wan, Em ê zuriyeta wan jî bigihînine wan û em ji mukafata wan jî tiştekî kêm nakin. Her kes di gerewa keda xwe de ye.
22. Em bi fêkî û goştê ku dilê wan dibijiyê piştgiriya wan dikin.
23. Ew tê de qedehên meyê ji dest hev digirin, di wê meyê de ne axaftineke kelevajî ne jî tê de gunehkarî (serxweşî ) heye.
24. Li ber destên wan xortên nûgihîştî ji bo xizmetê digerin, her wekî ew sedefên di qotîkên xwe de veşartî ne.
25. Ew berê xwe didin hev û (rewşa xwe ya li dinyayê) ji hev dipirsin.
26. (Sedema gihîştina xwe ya van xweşiyan îşaret dikin û) Dibêjin: Bi rastî em li dinyayê di nav malbata xwe de (ji ezabê Xwedê) bitirs bûn.
27. Vêca Xwedê kerem li me kir û em ji ezabê semûmê (germebayê) parastin.
28. Bi rastî em li dinyayê li ber Xwedê digeriyan (da ku me biparêzê). Bi rastî her Xwedê ye yê xwedankerem, yê dilovîn.
29. (Ya Muhemmed!) Vêca tu (li qewmê xwe) şîretan bike, vêca tu bi nimeta ku perwerdegarê te li te kiriye tu ne kahin û ne jî dîn î.
30. Na, belkî ew dibêjin: Ew şair e. Em li hêviya bûyerên zemên in (ka dê çi bê serê wî).

31. Bibêje: Hûn çavnêriyê (li mirina min) bikin. Ez jî digel we çavnêriyê dikim (ka Xwedê di navbera min û we de dê çawa hukim bike).
32. Erê, ma xeyala wan (bi van gotinên çewt) li wan ferman dike? Nexêr, belkî ew (di zilm û kufrê de) civateke serxweveçûyî ne.
33. Yan jî ew dixwazin bibêjin, wî ew ji ber xwe ve lê aniye! Naxêr, belkî ew bawerî nayînin.
34. Eger bi rastî ew rast dibêjin, de bila ew jî gotineke mîna Quranê bînin.
35. Gelo ew bêyî xaliqekî hatine xuliqandin? Yan jî wan bi xwe, xwe xuliqandiye?
36. Ma wan erd û asîman afirandine? Nexêr, belkî ew (derewkar in ku) bawerî nayînin.
37. Yan jî ma xezîneyên Xwdayê te li cem wan in yan jî ma ew li ser her tiştî desthilatdarin?
38. Yan jî ji bo wan hin sêlim (derence) hene ku hildikişin û bi wan li razên veşarî guhdarî dikin? Eger wisa be, de bila guhdêrê wan delîleke aşkera bîne.
39. Yan jî, ma keç ên Xwedê ne û kur jî yên we ne?
40. Yan jî ma tu ji wan heqekê dixwazî, vêca ji ber vê yekê ew dikevin bin bêşeke giran (û ji ber vê yekê misliman nabin)?
41. Yan jî zanîna xeybê li cem wan e ku vêca ew wê dinivîsin?!
42. Yan jî ew dixwazin kemînekê li ber te vedin, veca ew ên ku kafir in li ber wan bi xwe kemîn hatiye vedan.
43. Yan jî ji bilî Xwedê ji bo wan îlahek heye? Xwedê ji wan ên ku jê re dikin şerîk dûr û pak e.
44. Eger derewkar bibînin ku ji esmên parçeyek (bi ser wan de) ketiye, dê bibêjin: Ev ewrekî bi ser hev de kombûyî ye (û ew dîsa îman nayînin).
45. Êdî wan di halê wan de bihêle, heta ku ew çav bi wê roja xwe bikevin, ya ku ew tê de bêne bêhişkirin.
46. Wê rojê, kemîna wan dê tu feydeyê nede wan û arîkariya wan jî dê neyê kirin.
47. Bêguman ji bo yên zilm kirin ezabekî ji bilî ezabê axiretê, ji bo wan heye, lê belê pirên wan nizanin.
48. Vêca li ser hukmê Xwedayê xwe sebrê bikêşe. Bi rastî tu di bin çavdêriya me de yî (em te diparêzin). Gava ku tu (ji xewê) rabî jî şukrê Xwedayê xwe bike û ji her kêmasiyê wî pak bidêre.
49. Di hinekî ji şevê de û piştî windabûna stêran jî, tu Xwedayê xwe tesbîh bike.

# 53. SUREYÊ NECIM

Sûreyê Necim 62 (şêst û du) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre, navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de bêjeya Necim derbas bûye û bi mehneya stêr e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Sond bi stêrê dema diçe ava…
2. Hevalê we (Pêxember) ji riya rast derneketiye û bi batilî bawer nekiriye…
3. Ew, ji dilxwaziya xwe napeyive…
4. Peyva wî her wehya ji cem Xwedê ye.
5. Yê hêzmezin ew fêr kiriye (ku Cibraîl e).
6. Ew (di aql û şekl û xulqiyeta xwe de) zexm û bêkêmasî ye. Vêca ew (di kirasê melayîketiyê de) rawestiya…
7. Ew li asoyê herî bilind.
8. Paşî ew nêzî (Pêxember) bû, vêca hin bi hin berjêr bû.
9. Bi qasî du kevanan an jî hê jê kêmtir nêzîkî wî bû.
10. Vêca wî wehî da bendeyê Xwedê, ewa ku Xwedê lê ferman kirî.
11. Dilê wî, ya ku çavê wî dîtî derew dernexistiye.
12. Ma li ser a ku (şeva Mi’racê) wî dîtî vêca hûn ê pê re têbikoşin?
13. Sond be, wî careke din jî ew dîtibû.
14. Li cem sidret‘ul-muntehayê.
15. Cennetul Me’wa (bihişta vehewîngeh) jî li cem wê ye.
16. Wê dema sidret‘ul-munteha nixuimandibû ya ew nixuimandî (Wî Cibrîl dît).
17. Çavê wî (rast û çep) meyl nedaye û (ji ya ku dîtî) derbas nebûye.
18. Sond be, wî hin ji nîşanên Xwedayê xwe yên herî mezin dîtine.
19. Erê, (gelî muşrikan) ma we Lat û Uzza dîtin (ew ên ku hûn îbadetê wan dikin)?
20. Hem jî yê sêyem Menat (ka çi qudreta wan heye ku hûn îbadetê wan dikin)!
21. Erê ma kur yên we ne û keç jî yên Xwedê ne?
22. Ev çi parvekirineke bêînsaf e!
23. Ev (pût û senem) ji hin navên ku we û bav û bapîrên we danîne pê ve ne tiştekî din in. Xwedê der barê wan de tu delîlek neşandiye. Bi rastî ew (muşrik) li pey gumanê û dilxweziya xwe dikevin. Sond be, bi rastî jî ji teref Xwedayê wan pêxember ji wan re hatiye.
24. Erê çi tiştê însan bivê ma ew ê were cih?
25. Vêca axiret û dinya jî yên Xwedê ne.

26. Li asîmanan gelek melayîket hene ku mehderiya wan feydeya tu tiştî nade; ji bilî kesê ku Xwedê jê re bivê û jê razî be.

27. Bêguman ew ên ku bi axiretê bawerî nayênin, birastî ew melayîketan mê binavdikin (dibêjin: melaiket mê ne û keçên Xwedê ne).

28. Hal ev e ku tu zanîna wan bi vê tune ye. Tenê li pey gumanê diçin. Bi rastî guman mirov ji heqiyê bêminet nake.

29. Vêca tu jî berê xwe ji wan ên ku pişta xwe dane Quranê vegerîne û ji jiyana dinyayê pê ve ew tiştekî din naxwazin.

30. Ha ev dûmahîka zanîna wan e. Bêguman Xwedayê te, bi yê ku ji riya wî derketiye bêhtir dizane û bi yê ku di riya rast de ye jî bêhtir dizane.

31. Çi tiştên di erd û asîmanan de hene her yên Xwedê ne. Da ku Xwedê yên neqencî kirin wan ceza bike û yên ku qencî jî kirin bi ya herî rind xelat bike.

32. Ew (qencîkar) ên ku -ji gunehên biçûk pê ve- xwe ji gunehên mezin û fehşîtiyan vedidin. Bi rastî lêborîna Xwedayê te berfireh e. Ew, dema hûn ji axê afirandin û dema hûn di zikên dayîkên xwe de bûn jî, bi we çêtir dizane. Vêca hûn xwe paqij nebînin (û nebêjin em qenc û teqwedar in), bi rastî Xwedê bi teqwadaran çêtir dizane.

33. Ka bêje min; ma ew ê ku berê xwe (ji îmanê) guhartiye te nedît?

34. Hindik daye û qelsî kiriye.

35. Gelo ma zanîna xeybê li cem wî ye, vêca ew xeybê dibîne û dizane?

36. Yan jî ma ew ji ya ku di suhûfên Mûsa de hatiye nivîsîn xeberdar nebûye?

37. Hem (ji ya ku di suhûfên) Îbrahîmê wefadar de (hatiye nivîsîn) jî?

38. Bi rastî tu gunehkar barê gunehê tu kesê din hilnagire.

39. Ji însên re, ji kar û kiryarê wî pê ve tiştekî din jê re nîn e.

40. Bi rastî jî ew ê kar û kiryarê xwe paşê bibîne.

41. Piştre Xweda dê bedêla kar û kiryarên wî bêkêmasî bide wî.

42. Bêguman vegera dawîn bi bal Xwedayê te ve ye.

43. Bêguman Ew e yê ku ken û girîn dane.

44. Bêguman Ew e yê ku mirin û jiyan dane.

45. Bêguman Ew e yê ku her cot; nêr û mê afirandine...

46. Ji dilopek av gava (ku di malzorakê de) tê verêhtin.

47. Bêguman saxkirina piştî mirinê jî her li ser Wî ye.

48. Bêguman Ew e yê ku zengînî û qinyatê dide.

49. Bêguman Ew e Xwedayê stêra Şi‘rayê (Gelawêjê).

50. Bêguman Ew e yê ku Adê yekem biriye helakê.

51. (Xwedê) Semûd jî (biriye helakê), vêca kes ji wan nehiştiye.

52. Beriya wan gelê Nûh jî (biriye helakê). Bi rastî ew zalimtir û hartir bûn.

53. Welat û bajarên gelê Lût jî serûbin kirine.
54. Vêca Xwedê bi serê wan de anî ya ku anî.
55. Vêca (hey însan) ma tu di kîjan nîmetên Xwedayê xwe de dikevî gumanê?!
56. Ha ev pêxember jî hişyarkerekî ji wan hişyarkerên pêşîn e.
57. Qiyamet nêz bûye.
58. Ji Xwedê pê ve tu kes nîn e ku (cansojiyên) qiyametê (ji ser xelkê) rake.
59. Êdî ma hûn li vê Quranê dimînin şaş?
60. Hûn dikenin û nagirîn!
61. Haya we (ji fikirîna Quranê) nîn e.
62. De haydê ji Xwedê re herin sicûdê û îbadetê Wî bikin!

## 54. SÛREYÊ QEMER

Sûreyê Qemer 55 (pêncî û penc) ayet e û li Mekkeyê daketiye. Sûre, navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de bêjeya Qemer derbas bûye û bi mehneya heyvê ye. Hem jî ji ber ku mucîzeya duşeqbûna heyvê di vî sûreyî de hatiye ragihandin jê re Qemer hatiye gotin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Qiyamet nêz bû û heyv bû du şeq.
2. Eger ku ew mucîzeyekê bibînin di cih de berê xwe jê vedigerînin û dibêjin: Ev sêreke kevnare ye, berdewam e.
3. Muşrikan bi pêxember bawerî neanîn û da pey hewesên xwe. Her karek (ku peymana Xwedê pê hebe) di zemanê xwe de misoger dibe.
4. Sond be, bi rastî (di Quranê de) gelek agahî ji bo wan hatine ku wan ji kufrê vegerîne.
5. Hîkmeteke temam (û mikûm) ji bo wan hat, vêca ew tu feydê nade (wan).
6. Vêca wan di rewşa wan de bihêle heta ku roja delêlî (Îsrafîl) wan gazî bal tiştekî bitirs, nedîtî û nebînayî bike.
7. Çavtirsandî û çavşikestî ji tirban derdikevin, her wekî ew kuliyên belavbûyî ne...
8. Bi bal banghildêr ve dibezin (da ku li qada qiyametê amade bibin).Yên kafir dibêjin: Ev rojeke dijwar û zehmet e!
9. Beriya van (muşrikan) gelê Nûh jî bawerî neanî û wan bendeyê me Nûh derewîn derxist, gotin: Nûh dîn bûye û (ji teblîxa dîn) ew dana paş.
10. Vêca Nûh gazî Xwedayê xwe kir: Bi rastî ez têkçûm; bêçare me, arîkariya min bike!
11. Me jî di cih de deriyên asmên bi baraneke pir li ser wan vekirin.

12. Me ji erdê jî kanî herikandin, vêca bi awayekî ku Xwedê teqdîr kirî ev her du av (ya erd û asmên) gihîştin hev.
13. Me Nûh (û hevalên wî) jî siwarî keştiyekê kirin ku ji depan hatibû çêkirin û bi bismaran hatibû sazkirin û şidandin.
14. Wê (keştîyê) bi hifz û çavdêriya me avjenî dikir. Ha ev e, cezayê yên ku kafir bûne.
15. Sond be, me ew keştî wisa hişt da ku bibe nîşan û îbret. Edî ma ka îbretgir û şîretwergir?
16. Vêca ka ezabê min û hişyarkirina min çawa bû?!
17. Sond be, Me Quran ji bo şîretgirtinê hêsan kiriye. Vêca ma ka ew ê ku bifikire û jê şîret bigire?
18. Gelê Ad jî (bi Hûd) bawerî neanî, vêca ka ezabê Min û hişyarkirina Min çawa bû?!
19. Me bayekî zêde sar û bi vîzevîz, di rojeke bêqudoş de, bi berdewamî bi ser wan de şand.
20. Wî bayî mirov digirtin, diavêtin, her wekî ku ew qurmê dara xurmê bin ku ji rehên xwe hatine hilkirin û avêtin.
21. Vêca ka ezabê min û hişyarkirina Min çawa bû?!
22. Sond be, Me Quran ji bo şîretgirtinê hêsan kiriye. Vêca ma ka ew ê ku bifikire û jê şîret bigire?
23. Gelê Semûd jî bi peyxemberan bawerî neanî.
24. Gotin: Ma em ê bidin pey mirovekî ji nav xwe? Wê çaxê em di nav rêşaşî û dînîtiyê de ne.
25. Erê ma ji nav me hemûyan wehî jê re hat? Na, belkî ew derewînekî bitir e.
26. Ew ê sibehê bizanin ka kî ye derewînê bitir?
27. (Xwedê ji Salih Pêxember re got:) Bi rastî ji bo ceribandina wan em ê ji wan re devehê bişînin. Vêca tu çavnêriya wan bike û sebrê bikêşe.
28. Ji wan re bibêje ku av di navbera wan (û deveyê) de hatiye parvekirin, her yek bila roja vexwarinê hazir be.
29. (Êla Semûd) Gazî hevalekî xwe kirin, wî jî bi ya wan kir û (deve) serjêkir.
30. Vêca ka ezabê min û hişyarkirina min çawa bû?!
31. Me yek qîreke cansoj bi ser wan de şand. Di cih de ew bûn wekî pûş û pelaxên hûrbûyî.
32. Sond be, Me Quran ji bo şîretgirtinê hêsan kiriye. Ma kesekî ku bifikire û jê şîret bigire tune ye?
33. Gelê Lût jî pêxember derewîn derxistin.
34. Bi rastî Me bahozeke kevirbarîn şande ser wan, ji bilî malbata Lût, me berdestî sibehê ew xelas kirin.

35. Ev qenciyek bû ji cem me, her wiha em şukirdaran xelat dikin.
36. Sond be, Lût ew bi ezabê me tirsandin û hişyar kirin, lê belê wan bawerî bi hişyariyên me neanî.
37. Sond be, wan ji Lût xwestibû ku ji nava wan û mêvanên xwe derkeve. Di cih de me çavên wan kor kirin, vêca de ezab û gefên min tehm bikin!
38. Sond be; birastî di danê sibehê de ezabekî berdewamî bi ser wan de girt.
39. Vêca de ezab û gefên min tehm bikin!
40. Sond be, Me Quran ji bo şîretgirtinê hêsan kiriye. Ma kesekî ku bifikire û jê şîret bigire tun e?
41. Sond be; hişyariyên cur bi cur ji Firewn û malbata wî re jî hatin.
42. Wan bi tevekê mucizeyên me bawerî neanîn; vêca Me jî ew bi girtineke serdest, li serê kara, ew girtin.
43. Êdî ma kafirên we ji kafirên wan (umetên ku çûne helakê) çêtir in? Yan jî di kitêban de ji bo we piştrastiyek heye?
44. Yan jî ew dibêjin: Em civateke hevkar in?
45. Ew civat dê têk biçe û tev dê bi paş de birevin.
46. Bi rastî civanê wan qiyamet e. Ew, (ji her ezabî) dijwartir û tehltir e!
47. Bêguman gunehkar (li dinyayê) di nav rêşaşiyê û (li axiretê jî) di agirê bipêt de ne.
48. Wê rojê, gava li ser rûyê xwe di êgir de tên xijiqandin, ji wan re tê gotin: Hingavtina (jana) dojehê biçêjin!
49. Bêguman Me her tişt bi pîvan afirandiye.
50. Fermana Me (ji bo çêkirina her tiştekî) carek e; wekî miçkirin û vekirina çav e.
51. Sond be, birastî Me milletên mîna we (ji ber kufr û înkara wan) hilak kirine; vêca ma yekî ku bifikire û jê şîretê bigire tun e?
52. Her tiştê ku îbadan kirine di deftera (emelê) wan de ye.
53. Çi biçûk û çi mezin her tişt rêzerêz hatiye nivîsandin.
54. Bêguman ên mutteqî di nava bostan û çeman de ne.
55. Li dîwaneke heq, li cem padîşahekî xwedî qudret û destbilind in.

## 55. SÛREYÊ REHMAN

Sûreyê Rehman 78 (heftê û heşt) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre, navê xwe ji ayeta pêşîn Er Rehman girtiye. Ew jî navekî Xwedê ye. Bi maneya Mihrîvan e. Yanî yê ku li dinyayê rehmê li her tiştî dike û risqê wan dide û mexlûq jê hez dikin.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Ew Xwedayê ku rehman e…

2. Quran (bi pêxember) daye fêrkirin…
3. Însan afirandiye…
4. Ew fêrî axaftinê kiriye.
5. Roj û heyv li gorî hesabekî tevdigerin.
6. Giya û dar (ji Xwedê re) diçin sicûdê.
7. Asîman bilind kiriye û şehîn (û pergala edaletê) daniye.
8. Zinhar di kêşanê (û mêzînê) de neheqiyê nekin.
9. Kêşanê bi edaletî bikin û di şehînê (mêzînê) de kêmasiyê mekin.
10. Erd ji bo hemû mexlûqan daniye û raxistiye.
11. Her texlîtê fêkî û darxurmeyên xwedanxonçe tê de ne…
12. Libên xwedan qaşil (dexl û dan) û rihan (giyayên bibêhn) tê de ne.
13. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
14. Xwedê însan, ji heriya pahtî mîna heriya ku bi pahtinê bûye kevir afirandiye.
15. Cin jî ji guriya êgir a bêdû afirandine.
16. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
17. Ew Xwedayê her du rojhilat û her du rojavayan e.
18. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
19. Xwedê herdu derya (ya şîrîn û ya şor) herikandin ku ew digihên hev.
20. Di navbera wan de navberek heye, ew têkilî hev nabin.
21. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
22. Ji herdu deryayan sedef û mercan derdikevin.
23. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
24. Ew keştiyên wekî çiyayan bilind, ew ên ku mirovan ew çêkirin û di behrê de dikişin, her yên Xwedê ne.
25. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
26. Her çi tiştên ku li ser erdê hene tev fanî ne.
27. Lê belê Xwedayê te ku xwediyê mezinahî û keremê ye, dê baqî bimîne.
28. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
29. Yên ku li erd û asîmanan hene tev daxwazên xwe jê dikin. Ew, her gav di karekî ji hev cuda de ye.
30. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
31. Gelî îns û cinan! Em ê ji (hesabê) we re jî vala bibin.
32. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
33. Gelî civata cin û însanan! Eger hûn dikarin ji aliyên erd û asîmanan (ji binê desthilatiya me) derkevin (û neyêne heşrê) de derkevin. Lê belê hûn bêyî hêzekê nikarin derkevin (ew hêz jî ji bo we ne mimkun e).

34. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
35. Bi ser we de guriya agirê bêdû û risasê helandî dê were şandin û (hingê) hûn nikarin arîkariya hev jî bikin.
36. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
37. Gava asîman biqelişe û bibe wekî sorguleke mîna zeyta kelî.
38. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
39. Ha wê rojê ji tu însanî û ji tu cinekî gunehê wî jê nayê pirsîn.
40. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
41. Gunehkar, bi nîşanên xwe têne naskirin, bi perçem û lingên wan têne girtin (û di cehenemê tên werkirin).
42. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
43. Ha ev, ew cehennem e ya ku gunehkaran pê bawerî nedianî.
44. Gunehkar di navbera dojehê û ava kelî de diçin û tên.
45. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
46. Ji bo kesê ku ji rawestana li ber destên Rebbê xwe ditirse, du cenet hene.
47. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
48. Herdu cenet jî xweydarên bi çiql û fêkî ne.
49 Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
50. Di herdu cenetan de du kanîyên ku diherikin hene.
51. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
52. Di herdu cenetan de jî, ji her mêweyî du texlît hene.
53. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
54. Xelkê cenetê li ser doşekan paldayî ne ku betanê wan ji hevrîşimê stûr e. Mêweyên herdu cenetan jî (ji wan re) nêzîk in.
55. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
56. Di wan de dîlberên wisa hene ku çavê wan tenê li mêrên wan e û beriya wan, ne însekî ne jî cinekî dest nedaye wan.
57. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
58. Ew dîlber her wekî yaqût û mercan in.
59. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
60. Ma xelata başiyê ji bilî başiyê dê çi be?
61. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
62. Ji van herdu cenetan pê ve du cenetên din jî hene.
63. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
64. Ev herdu cenet kesketarî ne.
65. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?

66. Di herduyan de du kanî hene ku her û her diherikin (û naçikin).
67. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
68. Di herduyan de mêwe û xurme û hinar jî hene.
69. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
70. Di cenetan de dîlberên exlaqxweş û rûspehî hene.
71. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
72. Horiyên ku di konan de niştecih in û jê dernayên, çavê wan her li mêrên wan e.
73. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
74. Beriya mêrên wan, ne însekî ne jî cinekî dest nedaye wan.
75. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
76. Xelkê bihiştê li ser balgehên kesk û mexfûrên xweşik paldayî ne.
77. Vêca (gelî îns û cinan) ma hûn bi kîjan qenciya Xwedayê xwe bawerî nayînin?
78. Pak û pîroz e navê Xwedayê te, ew xwedanê mezinahî û keremê ye.

## 56. SÛREYÊ WAQÎE

Sûreyê Waqî'e 96 (not û şeş) ayet e. Li Mekkeyê daketiye û navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de bêjeya waqî'e derbas bûye û bi maneya “rûdan û qewimîn” e. Mebest jê rûdana cansoj, dehşeta qiyametê ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Gava ku qiyamet rabû…
2. Tu kesê ku rabûna wê derewîn derxe tune ye.
3. Ew hin kesan nizim dike û hinekan jî bilind dike.
4. Gava ku erd bi dijwarî hejiya…
5. Çiya jî hûr û hêra bibin…
6. Vêca ew bibin toz û dûmana berbayî.
7. Hûn jî bûne sê beş…
8. Xelkê milê rastê, ma (tu dizanî ka) xelkê milê rastê kî ne!
9. Xelkê milê çepê, ma (tu dizanî ka) xelkê milê çepê kî ne!
10. Ew ên ku (ji bo qenciyê) li pêş bûne (li axiretê jî,) ew li pêşiyê ne.
11. Evên ha, ên ku bi bal Xwedê ve hatine nêzîkkirin.
12. (Ew), li bihişta ne'îmê ne.
13. Pirên wan ji pêşîya nin.
14. Hindek jî ji paşiyan in.

15. Li ser textên zîv û zêrîn rûniştî ne.
16. Li ser wan textan li pêşberî hev paldayî ne.
17. Li ber destê wan (ji bo xizmetê) xortên tim ciwan digerin.
18. Ji kaniyan cêr û misîn û kasan dadigirin (û li ber wan digerînin)…
19. Ku ji vê meya (lezîz) ne serê wan diêşe ne jî pê serxweş dibin.
20. Mêweyên ku bi kêfa xwe dibijêrin…
21. Goştê teyran ên ku dilê wan dibijiyê…
22. Horiyên çavmezin…
23. Ew ên mîna sedefên hilandî û veşartî.
24. Ev perûya kirinên wan e ku ji wan re têne dayîn.
25. Ew li bihiştê kelevajî û gotineke ku xwediyê wê pê gunehkar bibe, nabihîzin.
26. Gotina ku bibihîzin tenê „silav û silav“ e.
27. Xelkê rexê rastê ma (tu dizanî) xelkê rexê rastê kî ne?!
28. Li bin gelyazên bêstrî û bêkelem in.
29. Di binê darmûzan de ne, ew ên ku gûşî bi gûşî li ser hev in.
30. Li bin sîberên dirêj ê seraqetî.
31. Li ber sûlavên avê ku daîm li herk in.
32. Di nav gelek mêweyan de ne.
33. Ku ne xelas dibin ne jî têne qedexekirin.
34. (Ew) li ser doşekên bilind in.
35. Bi rastî Me ew ji nû ve afirandine.
36. Me ew keçik çêkirine.
37. Evîndarê mêrê xwe ne û ji hev re hevsal in.
38. Ew hemû ji bo xelkê ku deftera emelê xwe bi destê rastê werdigirin.
39. Komek ji umetên pêşî ne..
40. Komek jî ji ya paşî ne.
41. Xelkê milê çepê (ew ê ku deftera emelê wan dikeve destên wan ê çepê), ma (tu dizanî ka) xelkê milê çepê kî ne?
42. Ew di nava germeba û ava kelijî de ne.
43. Ew li binê siya dukeleke reşetarî de ne.
44. Ku ew ne hênik e, ne jî xweş e.
45. Lewra ew beriya vê, ehlê keyf û zewqê bûn.
46. Li ser kirina gunehên mezin bi rıjd bûn.
47. Digotin; gava ku em mirin û bûne ax û hestî, ma qey rast e ku dîsa em ê bêne saxkirin?
48. Erê ma bav û kalên me yên pêşîn jî (dê bêne saxkirin)?

49. (Ji wan re) Bibêje: Bi rastî yên pêşîn û yên paşîn jî…
50. Bi bal civanê rojeke melûm ve dê bêne civandin.
51. Piştre bi rastî hûn, hey gelî jirêderketiyên derewîn!..
52. Teqez hûn ê ji dara rûlê (zeqûmê) bixwin.
53. Hûn ê zikê xwe her ji wê dagirin.
54. Hûn ê bi ser wê de jî ava kelijî vexwin.
55. Hûn ê wekî ku deveya tî êrîşî avê dike û vedixwe, avê vexwin.
56. Ha ev e, ziyafeta ku roja cezadanê ji wan re tê amadekirin.
57. Me hûn afirandin, vêca çima hûn (bi saxbûna piştî mirinê) yeqîn nakin?
58. Erê, ma ew avika (meniya) ku hûn dirijînin (malzarokan) ka çi ye?
59. Ma hûn (ji wê avikê însên) dixuliqînin an em dixuliqînin?
60. Me di nava we de mirin teqdîr kiriye û zora Me dê neyê birin jî.
61. Da ku bi vî awayî em yên wekî we bînin şûna we û em we di afirandineke din de ku hûn nizanin (di roja qiyametê de) dîsa sax bikin.
62. Sond be, bi rastî we xulqandina xwe ya pêşîn zaniye, vêca çima hûn nafikirin û îbret nagirin?
63. Erê ma ew tovê ku hûn diçînin hûn nabînin?!
64. Ma hûn wî hêşîn dikin, an em in ê ku hêşîn dike?
65. Eger me bixwesta me dê ew bikira kewaşe û hûn ê jî poşman û xemgîn bimana.
66. (We dê bigotaya:) Bi rastî me ziyan kiriye...
67. Ya rast, em bêpar mane.
68. Ma hûn wê ava ku hûn vedixwin nabînin?!..
69. Ma we ew ji ewran aniye xwarê yan em in yê ku wê tînin xwarê?
70. Eger me bixwesta me dê ew şor bikiraya, vêca ma çima hûn naşêkirênin?
71. Erê ma ew agirê ku hûn vêdixin nabînin?!..
72. Ma we dara wî peyda kiriye yan em wê peyda dikin?
73. Me agir kiriye bîranîn (ji bo agirê axiretê) û ji bo rêwiyan jî feyde gerandiye.
74. Vêca (piştî van tevan) tu navê Xwedayê xwe yê mezin pak bidêre.
75. Vêca ez bi cihê stêran sond dixwim…
76. Eger hûn bizanibin ev, sondeke pir mezin e.
77. (Sond be) ku ev Quraneke pîroz û pir birûmet e.
78. Di kitêbeke parastî (Lewhul Mehfûzê) de ye…
79. Ji ên paqij pê ve tu kes dest nadê...
80. Ew ji aliyê Perwerdegarê alemê ve hatiye şandin.
81. Êdî ma qey hûn vê Quranê vedişêrin û biçûk dibînin?

82. Di şûna ku hûn spasiya nîmetên Xwedê bikin, hûn bawerî pê nayînin û nankoriyê dikin.
83. Vêca bila gava ku ruh digihîje qirikê.
84. Wê çaxê hûn lê dimeyzînin.
85. Em (bi ilm û agahiyên xwe) ji we bêhtir nêzîkî wî ne, lê belê hûn nabînin.
86. Madem hûn dê neyêne cezakirin…
87. De wî ruhî vegerînin wî cesedî; heke (bi rastî) hûn di doza xwe de rastgo ne.
88. Naxwe eger (ewê mirî) ji muqerebînan be…
89. Vêca ji bo wî aramî, risqê pak û bihişta xwedan nîmet hene.
90. Êdî eger ew ji yên ehlê rastê be (ew ê ku riya çûna cennetê naskiriye).
91. (Ji wan re dê were gotin:) Ji bo te û ji (hevalên te) xelkê milê rastê pir silav hene.
92. Eger ku ew (mirî) ji derewdêrên rêşaşbûyî be…
93. Vêca ji bo wî jî ziyafeteke ji ava kelijî heye.
94. Encama wî jî werkirina di cehenemê de ye.
95. Bêguman ev rastiyeke yeqînî û misoger e.
96. Nexwe (piştî van tevan) tu navê Xwedayê xwe yê mezin pak bidêre.

## 57. SÛREYÊ HEDÎD

Sûreyê Hedîd 29 (bîst û neh) ayet e û li Medîneyê daketiye. Sûre, navê xwe ji ayeta 25’em girtiye ku tê de bêjeya El Hedîd derbas bûye û bi mehneya “hesin” e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Çiqas tiştên di erd û asîmanan de hene ew Xwedê pak didêrin. Ew e yê ‘Ezîz ê Ḥekîm.
2. Xwedanî û hukimraniya erd û asmanan terxanî pê ve ye. Ew sax dike hem jî dimirîne û Ew li ser her tiştî qadir e.
3. Xwedê, yê pêşîn e (ku berî Wî tiştek tune bû), yê paşîn e (ku di piştî Wî re tiştek tune ye), yê zahir e (ku di ser Wî re tu tişt tune ye û dîtbar e), yê batin e (ku nayê dîtin û nedîtbar e) û Ew, bi her tiştî zana ye.
4. Xwedê, ew ê ku erd û asîman di şeş rojan de afirandine û piştre (bi awayekî babetî mezinahiya xwe) li ser ‘Erş raser bûye. Ew, bi ya ku dikeve erdê û bi ya ku jê derdikeve, bi ya ku ji asmên tê xwarê û bi ya ku hildikişe asmên jî dizane. Hûn li ku derê bin (bibin, her) Ew (bi zanîna xwe) ligel we ye. Xwedê bi ya ku hûn dikin, bîner e.
5. Xwedanî û hukimraniya erd û asmanan jê re ye û her kar û bar bes bi bal Xwedê ve têne vegerandin.

6. Xweda, şevê dixe (ser) rojê û rojê jî dixe (ser) şevê û Ew bi raza ku di sîngan de ye dizane.

7. Bi Xwedê û pêxemberê wî bawerî bînin û ji wî malê ku hûn tê de kirine şûngir (di riya Xwedê de) xerc bikin. Ji we, yên ku bawerî anîn û malê xwe di qenciyê de xerc kirin re perûyeke mezin heye.

8. Ji bo çi hûn bawerî bi Xwedê nayînin, hal ev e ku Pêxember gazî we dike da ku hûn bi Xwedayê xwe bawerî bînin. Bi rastî Xwedê peymaneke asê û saxlem ji we stand. Eger bi rastî hûn bawermend in (vêca bawerî bînin).

9. Xwedê ye, yê ku ji bendeyê xwe (Muhemmed) re nîşanên aşkera dişîne da ku we ji tarîtiyên (kufrê) derîne ronahiya (îmanê). Bêguman Xwedê ji bo we Reuf e, Rehîm e.

10. Çi ji we bûye ku hûn malê xwe di riya Xwedê de xerc nakin? Hal ev e ku mîrateya asîmanan û erdê her ji bo Xwedê ye (mulk dê lê vegere). Ne wekhev e; ew ên ku ji we beriya fetha Mekkê malê xwe di rêka Xwedê de xerc kirin û şer kirin. Ev ên ha, mertebaya wan ji yên ku piştre xerc kirin û şer kirin teqez mezintir e. Digel vê jî, Xwedê peymana herî spehî (cenet) daye her du desteyan jî. Bêguman Xwedê, ji kar û kiryarên we agahdar e.

11. Erê ma kî heye ku di rêka Xwedê de malê xwe bi rindî bide, vêca Xwedê jî dê qat bi qat lê zêde bike û her jê re padaşeke giranbiha heye.

12. Roja (qiyametê) tu dê bibînî ku mêrên bawermend û jinên bawermend, va ye nûra wan li pêşiya wan û li rastê wan digere (û ji wan re dê bê gotin:) Îro, mizgîniya we cenet in ku di bin wan de çem diherikin û hûn ê her û her li wan bimînin. Ha ev e serfirazî û xelasiya mezin.

13. Wê rojê mêr û jinên munafiq dê ji yên bawermend re bibêjin; li benda me rawestin, da em jî ji nûra we parçeyekî wergirin. Dê ji wan re bê gotin: Li paş xwe vegerin (herin dinyayê) vêca (li wir) li nûrê bigerin. Êdî di neqeba wan de navberek tê danîn, jê re dergehek heye ku ji rexê hundir ve (li aliyê bawermendan) tê de rehmet e û ji rexê derve (li aliyê munafiqan) jî tê de ezab e.

14. (Munafiq) gazî wan (bawermendan) dikin, Ma em (li dinyayê) ne ligel we bûn (ji bo çi we dev ji me berda)? Bawermend ji wan re dibêjin: Erê hûn (li berçav) digel me bûn, lê belê we (bi dirûtîyê) xwe helak kir, we (bo mumînan) çavnêriya nebaşiyê dikir, (der barê îslamê de) hûn ketin gumanê, hêviyên pûç hûn xapandin heyanî ku fermana Xwedê hat û şeytên bi Xwedê hûn xapandin.

15. Vêca (gelî munafiqan!) îro, ne ji we û ne ji yên bêbawer (ên gawir) tu gerew dê neyê qebûlkirin. Cihê we agir e, ew e ji bo we xwedî û heval. Ew cih çi pîsecihê lêvegerê ye!

16. Erê ma ji bo yên ku bawerî anîne hê jî wext nehatiye ku bi zikrê Xwedê û bi Quranê dilên wan bitirs e û ew nebin wekî wan ên ku berê kitêb ji bo wan hatin, vêca piştî sal û zemanan dilê wan hişk bû û gelek ji wan jî ji rê derketine.

17. Agahdar bin! Bi rastî Xwedê erdê piştî hişkbûna wê hêşîn dike. Bi rastî ji bo hûn têbigihîjin Me nîşanên xwe ji bo we aşkera kirin.

**18.** Bêguman mêrên xêrker û jinên xêrker û yên ku malên xwe di rêka Xwedê de dane, xêra wan qat bi qat zêde dibe û ji bo wan padaşeke (xelateke) giranbiha heye.

**19.** Ew ên ku bi Xwedê û pêxemberên wî bawerî anîn; ha ew in yên rast û durist. Herçî ku şehîd in, ji bo wan li cem Xwedayê wan, xelat û ronahiya wan heye. Herçî ew ên ku kafir bûne û bawerî bi ayetên me neanine, ha ew xelkê dojehê ne.

**20.** Agahdar bin! Bi rastî herçî jiyana dinyayê ye, bes leyîstin, mijûlî, xweşikahî, di navbera hev de xwemezinkirin e û kubariya bi mal û zarokan e. Jiyana dinyayê wekî baranekê ye ku giyayê wê cotkar kêfxweş dike, piştre hişk bibe; tu dibînî ku va ye zer bûye, paşê dibe pûş û pelax û di axiretê de jî ezabekî dijwar e (ji bo kesê dinyayê di ser axiretê re bigire), yan jî lêborîn û keremeke ji cem Xwedê ye (ji bo yê ku axiretê di ser dinyayê re bigire). Jiyana dinyayê ji malê xapandinê pê ve ne tiştekî din e.

**21.** (Gelî bawermendan!) Bi bal mexfîreteke ji cem Xwedayê xwe ve û bi bal ceneteke ve ku firehiya wê bi qasî firehiya asîman û erdê ye pêşbaziyê bikin ku ew (cenet) ji bo yên ku bi Xwedê û pêxamberên Wî bawerî anîne, hatiye amadekirin. Ha ev kerema Xwedê ye ku ew kê bivê dide wî. Bi rastî Xwedê xwediyê kerema mezin e.

**22.** Çi karesata ku li erdê biqewime û çi were serê we, her beriya ku em wê bixuliqînin ew di kitêbekê de (ku Lewhul Mehfûz e) hatiye nivîsandin. Bêguman ev li ber Xwedê hêsan e…

**23.** Da ku bi vî awayî hûn, ji ber ya ku ji dest we çûye xemgîn nebin û bi qenciya ku Xwedê daye we jî çavsor nebin. Bi rastî Xwedê ji kesên qure û serxweveçûyî hez nake.

**24.** Ew (qure û serxweveçûyî), ên ku temahiyê dikin û şîreta temahiyê li xelkê jî dikin. Kî berê xwe (ji dayîna xêran) vegerîne, vêca bi rastî Xwedê dewlemend û hêjayê pesindayînê ye.

**25.** Sond be, Me pêxemberên xwe bi delîlên ronkar ve şandin û me digel wan jî kitêb û şehîn (nîzama edaletê) hinartin da ku însan (bi van) edaletê bikin. Me hesin jî anî xwarê ku tê de hêz û qeweteke dijwar heye û ji bo xelkê jî pir feyde tê de ne û da ku Xwedê, ka kî di xeybê de arîkariya dînê Xwedê û pêxemberên wî dike derîne holê. Bêguman Xwedê pir bihêz û serdest e.

**26.** Sond be, Me Nûh û Îbrahîm (bi pêxemberî) şandin û me pêxemberî û kitêb dane zuriyeta wan. Hin ji wan ketine riya rast, pir ên wan jî fasiq in.

**27.** Piştre li ser şopa wan me pêxemberên xwe li pey hev şandin û me Îsayê kurê Meryemê jî li pey wan hinart. Me Încîl dayê û me şefqet û merhemet xiste dilê yên ku dane pey wî. Ruhbaniyeteke (destşûştina ji dinyayê) ku wan ji cem xwe lêanîbû me ew li ser wan ferz nekiribû. Lê belê wan (ji ber xwe ve) ew deranîn da ku razîbûna Xwedê qazanc bikin. Vêca heqê wê neanîn cih. Paşê ji wan ên ku wan bawerî anî, me mukafata wan da wan û gelek ji wan jî fasiq in.

28. Gelî yên ku bawerî anîne! Ji Xwedê bitirsin û bawerî bi pêxemberê wî (Muhemmed) bînin da ku Xwedê ji rehma xwe du pişkan bide we (yek: baweriya bi Muhemmed e. Ya diduyan: baweriya bi peyxemberên beriya wî ye) û nûrekê bide we ku hûn bi wê bimeşin û da ku li we bibore. Bi rastî Xwedê gunehveşêr e, dilovîn e.

29. (Bi vî awayî me hûn agahdar kirin) da xwedankitêb bizanin ku ji kerema Xwedê tiştek di destê wan de nîn e. Bi rastî kerem tev di destê Xwedê de ye. Ew kê bivê dê bide wî. Xweda xwediyê qenciya mezin e.

## 58. SÛREYÊ MUCADELE

Sûreyê Mucadele 22 (bîst û du) ayet e û li Medînê daketiye. Navê sûre ji ayeta pêşîn hatiye ku tê de bêjeya Tucadilû derbas bûye û bi mehneya 'têdikoşe' ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. (Resûlê min!) Bi rastî Xwedê gotina wê jina ku der barê mêrê xwe de bi te re guftûgo dike û giliyê (derdê) xwe digihîne Xwedê helbet seh kir. Xwedê, hevpeyvîna we seh dike û bi rastî jî Xwedê bihîzer e, bîner e.

2. Ji we, ew kesên ku bi jinên xwe re zîharê dikin (ku ji jinên xwe re dibêjin: Tu mîna dayika min li min heram bî), jinên wan ne dayikên wan in. Dayikên wan tenê ew ên ku ew welidandine. Bi rastî ew (bi zîharê) gotineke derew û dûrî heqiyê dibêjin. Bêguman Xwedê lêbuhêr û gunehveşêr e.

3. Ew mêrên ku bi jinên xwe re zîharê dikin û paşê ji gotina xwe vegerin (cezayê wan) beriya ew biçin nivîna hev, azadkirina koleyekî ye. Ev şîreta Xwedê ye ku li we hatiye kirin. Xwedê, ji kirinên we haydar e.

4. Vêca ew kesê (ji bo azadkirinê) kole bi dest nekevê, êdî beriya ew biçe nivîna xwe, ew ê du mehan li ser hev rojî bigire. Kesê nikaribe (du mehan rojî bigire) bila xwarinê bide şêst feqîran. Ev (kefaretê zîharê), ji bo ku hûn baweriyê bi Xwedê û pêxemberê Wî bînin. Ha ev tixûb û hukmên Xwedê ne. Ji bo yên kafir jî (ên ku bi wan bawerî nayênin) ezabekî dijwar heye.

5. Bi rastî ew ên ku dijatî û neyartiya Xwedê û pêxemberê Wî dikin, ka çawa yên beriya wan rezîl û riswa bûne, ew jî dê mîna wan rezîl û riswa bibin. Bi rastî jî me nîşanên ronak û aşkera hinartine. Ji bo kafiran her ezabekî riswaker heye.

6. Wê roja ku Xwedê tevekî wan vedijîne, vêca çiqas karê wan kirî dê wan pê agahdar bike. Xwedê hemû kirinên wan tomar kirine û wan jî kirinên xwe ji bîr kirine. Xwedê li ser her tiştî çavdêr e.

7. Ma tu nabînî, ku çi tiştên li erd û asîmanan hene her Xwedê bi wan dizane? Çi pistepista ku di nav sisiyan de çêbe, Xwedê her yê çaran e, ku pênc bin şeşê wan her Xwedê ye. Çi kêmtir û çi zêdetirî van, ew li ku derê dibin bila bibin

Xwedê her (bi zanîna xwe) ligel wan e. Paşê roja qiyametê bi kirinên wan dê wan haydar bike. Bi rastî Xwedê bi her tiştî zana ye.

**8.** Ka ji min re bêje, maew ên ku nehya wan ji pistepistê hatiye kirin (ku ew cihû û munafiq in), piştre li ya ku li wan hatiye qedexekirin vedigerin û di gunehkarî, dijminahî û neguhdariya Pêxamber de pistepistê dikin te nedîtin? Gava ku ew bên cem te, bi silaveke ku Xwedê tu pê silav nekiriye li te silav dikin. Di dilê xwe de jî dibêjin 'De bila Xwedê bi ya ku em dibêjin me bide ezab? Cehenem besî wan e, ew dê biçin wê, ew çi pîsecih e![1]

**9.** Gelî yên ku bawerî anîne! Gava ku we bi dizîka di nav xwe de xeber da, bi ya guneh, bi ya neyartî û ya dijraberiya Pêxember xeber nedin; bi qencî û teqwayê xeber bidin û ji Xwedayê ku hûn ê bi bal ve bêne civandin, bitirsin.

**10.** Pistepist bes ji şeytên e; da ku bawermend pê xemgîn bibin. Ew bi xwe (şeytan) heta destûra Xwedê nebe nikare tu zerarê bide wan. Vêca bawermend bila her xwe bispêrin Xwedê.

**11.** Gelî yên ku bawerî anîne! Dema ku ji we re bê gotin; di dîwanên xwe yên civînan de (ji yên ku beşdar dibin re rê vekin û cih) fireh bikin, vêca hûn jî cih fireh bikin, Xwedê jî ji bo we cih fireh dike. Gava ku ji we re bê gotin; ji cihê xwe rabin, vêca hûn jî rabin (da cihê hinekî din çêbe). Ew ên ku ji we bawerî anîne û ew ên ku zanîn ji wan re hatiye dayîn Xwedê mertebeya wan bilind dike. Xwedê bi kar û kiryarên ku hûn dikin agahdar e.

**12.** Gelî yên ku bawerî anîn! Gava we xwest ku hûn bi dizî bi Pêxember re bipeyivin, beriya wê axaftina xwe sedeqeyekê bidin (xizanan). Ev ji bo we çêtir û paktir e. Eger hûn tiştekî nebînin (ku bikin sedeqe) vêca bi rastî Xwedê gunehjêbir e, dîlovîn e.[2]

**13.** Erê ma hûn ji feqîrbûnê tirsiyan ku berî hûn bi peyxember re biaxivin we sedeqe bicih neanîn? Êdî ku we ew nekir û Xwedê jî hûn efû kirin; vêca bi tekûzî nimêj bikin, zekata malê xwe bidin û guhdariya Xwedê û Pêxemberê wî bikin. Teqez Xwedê ji kirinên we agahdar e.

**14.** Ka ji min re bêje, ma ew ên ku bûne dost û arîkarê qewmekî ku Xwedê xezeb li wan kiriye tu nanêrî? Ew (munaqif) ne ji we ne, ne jî ji wan (cihûyan) e. Digel ku (rastiyê) dizanin jî bi derew sond dixwin.

**15.** Xwedê, ji wan (munafiqan) re ezabekî dijwar amade kiriye. Bi rastî ya ku ew dikin, çiqas pîs e!

---

1 Ev kes cihû û munafiq bûn. Li cem mislimanan dikirin pistepist û dixwestin gumanê bixin dilên mumînan û bi vê helwesta xwe bi mumînan bidin fehmkirin ku di cîhadê de cîhadkar têk çûne û hatine kuştin. Pêxember (s) ev pistepist li wan qedexe kiribû. Bêtoreyiyeke din a cihûyan ew bû ku rastî pêxember (s) dihatin, jê re digotin: Essamû eleyke (yanî; Mirin ji te re be). Pêxember (sellellahu eleyhî wesellem9 gotina wan fehm dikir û wiha bersiva wan dida "We eleykum" (yanî; Ji we re be). Lê belê helwesta xwe ya nazik û birûmet nediguherand û li rûyên wan nedida.

2 Ev fermana îlahî ji bo vê ye, da ku ji bo Pêxember rêz û hurmet were girtin, arîkariya xizanan were kirin. Zêde pirs neyên kirin, mirovên xalis û munafiq û yên ku ji dinyayê hez dikin û yên ku ji axiretê hez dikin, ji hev bêne veqetandin û zanîn.

16. Wan sondên xwe ji xwe re kirine mertal (da ku xwe û malê xwe pê biparêzin) û wan rêka Xwedê li xelkê girtin. Vêca ji wan re ezabekî riswaker û hetikber heye.

17. Mal û zarokên wan li hemberî ezabê Xwedê dê tu feydeyekê nede wan. Ew xelkê dojehê ne. Ew dê her û her lê bimînin.

18. Wê roja ku Xwedê wan tevan sax dike û ji bo hesabdîtinê li hev kom dike, vêca ka çawa li dinyayê ji bo we bi derew sond dixwin, wisa ji Xwedê re jî dê sond bixwin. Ji wan we ye ku ew li ser tiştekî ne? Agahdar bin! Bêguman ew her derewkar bi xwe ne.

19. Şeytan li ser wan bûye desthilat, zikrê Xwedê bi wan daye jibîrkirin. Ha ev benda şeytên in. Agahdar bin! Bi rastî jî benda şeytên her yên xesirî ne.

20. Bêguman ew ên ku neyartiya Xwedê û Pêxemberê Wî dikin. Ha ew (di nav) kesên rezîltirîn û riswatirîn de ne.

21. Xwedê biryar daye: Bi rastî ez û qasidên xwe her em ê bi ser kevin. Bêguman Xwedê hêzdar û serdest e.

22. Tu dê civateke ku bawerî bi Xwedê û roja axiretê anîbe nebînî ku ew ji wan kesên ku neyartiya Xwedê û pêxemberê Wî dikin, hez bikin. Çendî ew bavên wan, kurên wan, birayên wan, an eşîra wan bin jî. Ha ew, Xwedê di dilên wan de îman nivîsiye û bi cih kiriye, bi arîkarî û piştgiriyeke ji cem xwe ew xurt kirine. Xwedê dê wan bixe bihiştên wisa ku di binê wan de çem diherikin û ew dê her û her lê bimînin. Xwedê ji wan razî bûye, ew jî ji Xwedê razî bûne. Ha ew benda Xwedê ne. Agahdar bin! Bi rastî jî benda Xwedê her ew in yên serfiraz û rizgarbûyî.

## 59. SÛREYÊ HEŞIR

Sûreyê Heşir 24 (bîst û çar) ayet e, li Medînê daketiye, navê xwe ji ayeta 2yê girtiye ku tê de bêjeya "heşir" bihuriye û bi maneya koçkirine.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Çiqas tiştên li erd û asîmanan hene Xwedê tesbîh dikin Her ew e yê 'Ezîz yê Ḥekîm.

2. Xwedê ye, yê ku ji ehlîkitêban ên bawerî neanîn (ku cihûyên Benî Nedr in), cara yekem ew ji welatê wan derxistin. We zen nedikir ku ew ê bêne derêxistin. Ji wan jî we ye ku keleyên wan dê wan ji (hêza) Xwedê biparêzin. Lê belê Xwedê ji devereke ku wan bîra wê nedibir ve hate wan. Xwedê tirs avêt dilê wan, bi awayekî wilo ku hem bi destên xwe hem jî bi destên muminan xaniyên xwe wêran kirin. Vêca hey gelî aqilmendan, ders û îbret bigirin.

3. Eger Xwedê ji bo wan derketin nenivîsanda, di dinyayê de bi awayekî din (bi kuştin û dîlkirinê) teqez dê ew bidana ezabê. Ji bo wan li axiretê jî ezabê êgir heye.

4. Ev (ezab), ji ber vê ye ku wan dijminatiya Xwedê û pêxemberê Wî dikir. Kî, dijminatî û bêemriya Xwedê bike, vêca bi rastî ezabê Xwedê pir dijwar e.

5. Çi darxurmeyên (Benî Nedriyan) ku we birîbin, an jî we li ser koka wan hiştibin ew bi destûra Xwedê bûye û da ku Xwedê fasiqan riswa û rezîl bike.

6. Ya ku Xwedê ji malên wan (cihûyan) xenîmet daye pêxemberê xwe, vêca we ji bo wê (xenîmetê) tu hesp û deve nebezandine. Lê belê Xwedê, kê bivê dê li dijî wan Pêxemberê xwe serfiraz bike. Xwedê li ser her tiştî qadir e.

7. Ew malê ku bêşer Xwedê kiriye destkeftî ji bo pêxemberê xwe, ew ê ku ji xelkê gundan hatiye standin, vêca ew ji bo Xwedê û pêxemberê wî, xizmên pêxember û sêwiyan, xizan û rêwiyan e. Da ew xenîmet, tim nemîne di destê dewlemendên we de. Pêxamber çi fermanê bide ber we, wê bikin û çi li we qedexe bike xwe jê vedin. Hay ji hukm û fermanên Xwedê hebin. Bi rastî jî Xwedê ezabdijwar e.

8. (Ew malê xenîmetê) ji bo feqîr û jarên muhaciran e, ew ên ku ji mal û welatê xwe hatine deranîn, daxwaza kerem û razîbûna Xwedayê xwe dikin û arîkariya (dînê) Xwedê û pêxemberê Wî dikin. Ha ew, ên rast û durist in.

9. Ew ên hê ji berê ve li Medînê bicih bûne û berî hicreta muhaciran bawerî anîne, ew ji wan ên ku bi bal wan ve hicret kirin hez dikin û ji bo malê ku ji wan (muhaciran) re hatiye dayîn di dilê xwe de çavnebariyekê jî nakin. Çendî ku pêdiviya wan bi xenîmetê hebe jî muhaciran di ser xwe re digirin (hewcehiya muhaciran li pêşiya hewcehiya xwe dibînin). Kî xwe ji bexîliya nefsa xwe biparêze, vêca birastî ew in yên rizgarbûyî û yên serfiraz.

10. Ew ên di piştî wan (muhacir û ensariyan) de hatin, dibêjin: Xwedayê me! Li gunehên me û gunehên birayên me ew ên ku beriya me bawerî anîne bibore, kîn û rika wan nexe dilê me! Xwedayê me, birastî tu Reuf î, Reḥîm î!

11. Ma te ew ên munafiq nedîtin ku ji birayên xwe yên ehlî kitêb ew ên ku kafir bûne re dibêjin: Eger hûn ji cih û warên xwe bêne deranîn, teqez em ê jî ligel we derkevin; li dijî we em ê hîç bi gotina tu kesî nekin. Eger şerê we bê kirin, muheqeq em ê arîkariya we bikin? Xwedê, şahdeyiyê dide ku munafiq birastî derewîn in.

12. Sond be, eger ew bêne deranîn, munafiq ligel wan dernakevin, heke şerê wan bê kirin ew dê arîkariya wan nekin, heke arî wan bikin jî dê bi şûn xwe ve vegerin û birevin, piştre arîkariya wan (cihûyan) jî dê neyê kirin.

13. Tirsa we di dilê wan de ji tirsa Xwedê bêhtir e. Lewra ew, civateke tênegihîştî ne.

14. Cihû, ku di warekî asê de yan jî di pişt dîwaran de nebin, pêkve şerê we nakin. Kîna wan bi hev re pir dijwar e. Ji te we ye ku ew bi hev re hevkar in, hal ev e ku dilê wan belawela (û ji hev cuda) ne. Ev rewşa wan ji ber ku ew civateke kêmaqil û tênegihayî ne.

15. (Rewşa wan cihûyan) mîna rewşa wan (muşrik)ên ku di beriya wan de, ji nêzîk

ve (li dinyayê) cezayê kar û kiryarên xwe çêjandine û ji bo wan (li axiretê) ezabekî dijwar heye.

16. (Rewşa munafiqan jî) eynî wekî rewşa şeytên e, gava ji însên re dibêje: Kafir bibe. Çi gava ku însan kafir dibe, jê re dibêje: Bi rastî ez ji te dûr im. Bêguman ez ji Xwedê ditirsim ku perwerdegarê alemê ye.

17. Vêca encama herduyan (cihû û munafiqan) jî dê bibe agir, ew ê her û her tê de bimînin. Ha ev e cezayê zaliman.

18. Gelî bawermendan, bi ya Xwedê bikin û bila her kes binêre ka ji bo axretê çi amade kiriye (û li pêşiya xwe çi hinartiye). Hay ji fermanên Xwedê hebin, bi rastî Xwedê ji kirinên we agahdar e.

19. Hûn nebin wekî wan ên ku Xwedê ji bîr kirin, vêca Xwedê jî wan bi wan da jibîrkirin. Yên jirêderketî ha ew bi xwe ne.[1]

20. Cehenemî û cenetî nabin wekhev; Cenetî, yên rizgarbûyi ne.

21. Eger Me ev Quran li ser çiyayekî bihinarta, bi rastî te dê ew bidîta ku wa ye ji tirsa Xwedê tirsgirtî, berdestbûyî û parçeparçe bûye. Em van nimûneyan ji mirovan re aşkera dikin da ku bifikirin.

22. Ew Xwedayê ku ji Wî pê ve tu îlah tun in, tevekê xeyb û darîçavê dizane. Her ew e, yê Reḥman yê Reḥîm.

23. Ew Xweda ye, yê ku ji Wî pê ve tu îlah tun in. Ew xwediyê her tiştî ye, ji her kêmasiyê pak û paqij e, serkaniya rihetî û selametiyê ye, pêbawer e, li ser her tiştî zêrevan e, di karê xwe de serkeftî ye, ji mexlûqê xwe re serdest e, xwemezindêr e (mezin e û kubar e), Xwedê pak û bêrî ye ji ya ku (ew) jê re dikin hevpişk.

24. Ew Xweda ye, yê ku afirîner e, ji tunehiyê avasazê avasazan e, ji mexlûqan re dirûvdêr e, navên herî xweşik her jê re ne, yên li asîman û erdê Wî pak didêrin û Ew e yê ‘Ezîz yê Ḥekîm.

## 60. SÛREYÊ MUMTEHÎNE

Sûreyê Mumtehîne sêzdeh (13) ayet e. Li Medînê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta 10’em girtiye ku tê de bêjeya Îmtîhan derbas bûye û bi maneya “ezmûn” e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Gelî yên bawerî anîne! Dijminê min û dijminê xwe ji xwe re nekin dost û arîkar ku bi hezkirinî hûn xwe bigihînin wan. Rewş ev e ku ew bi heqiya ku ji we re hatiye şandin bawerî nayînin. Ji ber ku we bi Xwedê ku ew perwerdegarê we ye bawerî anîbû, hûn û pêxember ji cih û warê we derxistin. Eger hûn ji bo cîhadê

1 Xwedê li me ferman dike ku em nebin mîna wanên ku terka taetê Xwedê kirine û emrê Wî pişt guhê xwe ve avêtine. Vêca bi sedem vê kirina wan, Xwedê jî ya ku di berjewendiyê wan de ye bi wan da jibîrkirin û wan dev ji kar û barên baş berda û ketin dû ya bê feyde ye.

û razîbûna min (ji warê xwe) derketibin, hûn wan ji xwe re nekin dost û arîkar ku bi dizî hûn hezkirina xwe bigihînin wan. Ez bi ya hûn vedişêrin û bi ya hûn aşkera jî dikin dizanim. Ji we kî vê bike bi rastî wî riya rast winda kiriye.

**2.** Eger hûn bikevin destê wan (û ew zora we bibin), dê ji we re bibin dijmin û dê bi xerabiyê dest û zimanên xwe dirêjî we bikin. Jixwe ew ji dil û can dixwazin ku hûn jî (wekî wan) kafir bibin.

**3.** Roja qiyametê xwedî û zarokên we dê tu feydê nedin we. Xwedê , (roja qiyametê) dê we ji hev biqetîne. Xwedê bi ya hûn dikin bîner e.

**4.** Bi rastî di serpêhatiya Îbrahîm de û bawermendên ligel wî ji bo we nimûneyeke spehî û baş hebû; dema wan ji gelê xwe re gotin: Em ji we û wan ên ku ji bilî Xwedê hûn wan dihebînin bêrî û dûr in û em (rêça) we nas nakin. Ev rik û neyartî her di navbera me û we de xuya bû û ranabe heta ku hûn bawerî bi Xwedê tenê neyînin. (Di her tiştî de Îbrahîm Pêxember ji bo we nimûne ye) ji bilî gotina Îbrahîm a ji bavê xwe re gotî, “Sond be, ez ê lêborîna te bixwazim, lê belê ez nikarim tu ezabê Xwedê ji ser te bidim alî ”. Xwedayê me! Me xwe her spartiye Te û em li Te vegeriyane û veger bes bi bal Te ve ye.

**5.** Xwedayê me! Me bi ezabdayîna ji cem kafiran neceribîne. Xwedayê me, li me bibore! Bi rastî her tu yî yê serdest, yê karbinecih.

**6.** Sond be, birastî ji bo we di wan de nimûneyên herî baş hene, ji bo yên ku xelata Xwedê hêvî bike û ji roja qiyametê bitirse. Kî ku berê xwe (ji îmanê) vegerîne vêca bi rastî her Xwedê ye yê dewlemend, yê layîqê hemd û senayê.

**7.** Dibe ku Xwedê hezkirinekê bixe navbera we û wan ên ku we dijminiya wan dikir. Xwedê, xwedanhêz û şiyan e. Xwedê gunehjêbir û dilovîn e.

**8.** Ew ên ku ji bo dîn şerê we nekirin û hûn ji welatê we dernexistin, Xwedê li we qedexe nake ku hûn li wan qencî û edaletê bikin. Bi rastî Xwedê ji edaletkeran hez dike.

**9.** Bes Xwedê li we qedexe (nehya we) dike ku hûn wan ên ku ji bo dîn şerê we kirin û hûn ji cih û warê we der xistin û ji bo deranîna we arîkarî kirin ku hûn ji xwe re bikin dost û arîkar. Kî wan ji xwe re bike dost û arîkar, vêca ha ew in ên sitemkar.

**10.** Gelî bawermendan! Gava ku jinên bawermend hicret bikin û bên cem we, wan biceribînin (ka ji dil bawerî anîne yan na). Xwedê bêhtir agahdar e ji îmana wan. Eger we zanî ku ew jin ji dil bawermend in, wan li kafiran venegerînin. Ne ew jinên bawermend li kafiran helal in ne jî kafir li wan jinan helal in. Ew mehra ku mêrê wan jinan daye wan, li wan (mêrên kafir) vegerînin. Dema hûn mehra wan jinan bidin wan, tu guneh ji we re nîn e ku hûn bi wan re bizewicin. Jinên kafir di bin mehra xwe de negirin. Ew mehra ku we daye wan (jinên ku gihîştine kafiran) ji wan bixwazin. Bila ew (kafir) jî mehra ku dane (ên ku mislimanbûne) ji we bixwazin. Ev hukmê Xwedê ye ji we re ku Xwedê di navbera we de hukim dike. Xwedê zana û karbinecih e.

**11.** Eger tiştek ji malê we bi jinên we re bigihîje kafiran, vêca we bi wan re şer kir

û hûn bi ser ketin û we xenîmet bi dest xist, êdî ji xenîmetê bi qasî mehra ku dane, bidin wan mêrên ku jinên wan revîn û (malên wan) birine. Hay ji hukmê Xwedê hebin, ew ê ku we pê bawerî aniye.

12. Hey Pêxember! Gava ku jinên bawermend da ku peymanê bidin te bên cem te ku ew hevpişkan ji Xwedê re çênekin, diziyê nekin, zinayê nekin, zarokên xwe nekujin, tu zarokan bi bêbextî dûv zilamê xwe neêxin û di qenciyê de ji fermana te dernekevin, vêca tu jî peymanê ji wan wergire, ji Xwedê ji bo wan lêborînê bixwaze, bi rastî Xwedê gunehveşêr û dilovîn e.

13. Gelî yên ku bawerî anîne! Dostanî û arîkariya qewmekî nekin ku Xwedê xezeb li wan kiriye. Birastî ew ji xelata axiretê bêhêvî ne, çawa ku yê kafir ji miriyên di qebran de bêhêvî ne.

## 61. SÛREYÊ SEFF

Sûreyê Seff, çardeh (14) ayet e. Li Medînê daketiye û sûre navê xwe ji ayeta 4'em girtiye ku tê de bêjeya Sef derbas bûye û bi maneya "rêz" e.

*Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm*

1. Çiqas tiştên li erd û asîmanan hene Xwedê tesbîh dikin û yê 'Ezîz, yê Ḥekîm her Ew e.

2. Hey gelî yên ku bawerî anîne! Ya ku hûn nakin ma çima hûn dibêjin?

3. Gotina ku hûn dibêjin û nakin li cem Xwedê dibê sebebê hişm û hêrsê.

4. Bi rastî Xwedê ji wan ên ku di rêka Xwedê de yekrêz her wekî ku ew avahiyeke saxlam û bi hev ve girêdayî ne, şer dikin hez dike.

5. Bêne bîra xwe; wê dema Mûsa ji gelê xwe re got: Gelî miletê min! Hûn çima min rencîde dikin û min diêşênin. Bi rastî jî hûn dizanin ez qasidê Xwedê me ku ji bo we hatime şandin. Vêca çi gava ew ji rê derketin, Xwedê jî dilên wan ji riya rast derxist. Xwedê civata jirêderketî nayîne ser riya rast.

6. Di bîr bîne, dema Îsayê kurê Meryemê got: Gelî zarokên Îsraîl! Ez qasidê Xwedê me ji bo we hatime şandin, ez rastderêxê kitêba berî xwe me ku Tewrat e û mizgîna pêxemberekî didim we ku dê piştî min were, navê wî Ehmed e. Lê belê çi gava ku wî delîlên aşkera ji wan re anîn, gotin: Ev, sêrbaziyeke aşkera ye.

7. Ma ji wî kesê ku bi derew li ser navê Xwedê lêbîne, zalimtir kî ye? Hal ev e ku ew bi bal îslamê ve tê vexwendin. Xwedê civata sitemkaran nayîne ser riya rast.

8. Ew (sitemkar û kafir) dixwazin ku ronahiya Xwedê (ku Quran e) bi gotinên xwe vetemirînin. Hal ev e ku Xwedê wê ronahiya xwe temam bike çendî bi kafiran ne xweş be jî.

9. Xwedê ye yê ku qasidê xwe (Muhemmed) bi hîdayet û heqiyê şandiye da ku dînê xwe bixe serpişka hemû dînan, çendî ev bi muşrikan ne xweş be jî.

10. Gelî yên bawerî anîne! Ma ez bazirganiyekê nîşanî we bidim ku we ji ezabekî dijwar xelas bike?..

11. Bawerî bi Xwedê û pêxemberê Wî bînin, di riya Xwedê de bi mal û canê xwe cîhadê bikin. Eger hûn bizanin ha ev ji bo we çêtir e.

12. (Eger hûn vê bikin) Xwedê dê li gunehên we bibore û we bixe bihiştên ku di binê wan de çem diherikin û di cenetên Ednê de (dê we bixe) xaniyên pak û rind. Ha ev, serfiraziya mezin e.

13. Tiştekî din jî heye ku hûn dê jê hez bikin, arîkariyek û fetheke nêzîk e ji cem Xwedê (ku fetha Mekkê ye). (Ya Muhemmed) Mizgînê bide bawermendan.

14. Gelî yên bawerî anîne! Bibin arîkarên (dînê) Xwedê; her wekî ku Îsayê kurê Meryemê, ji hewariyan re gotiye: Ji bo ragihandina dînê Xwedê kî dê bibe arîkarê min? Hawariyan got: Em in, arîkarên dînê Xwedê. Ji zarokên Îsraîl komekê (ku hawarî ne) bawerî anî û komek jî kafir bûn. Vêca me piştgiriya wan ên ku bawerî anîbûn kir, êdî ew bi ser ketin.

## 62. SÛREYÊ CUMU'E

Sûreyê Cumu'e yazdeh (11) ayet e. Li Medînê daketiye û navê sûre ji ayeta 9'em tê ku di wê de bêjeya Cumu'e derbas bûye û bi maneya "roja înê" ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Çiqas tiştên ku li erd û asîmanan hene ji Xwedê re tesbîh dikin, ew ê ku xwedîyê her tiştî ye, yê ku ji her kêmasiyê pak e û pîroz e, yê ku li ser mexlûqê xwe serdest e û yê ku di kar û barê xwe de karbinecih e.

2. Ew ê ku ji nav nexwendayan pêxemberek ji wan re şand; ji wan re ayetên Xwedê dixwîne, wan paqij dike û wan fêrî kitêb û hîkmetê dike. Digel ku ew berê di nav rêşaşiyeke aşkera de bûn.

3. (Xwedê, Muhemmed ji) hin kesên din re jî (şandiye ku) hê jî beşdarî nav wan nebûne. Yê 'Ezîz yê Hekîm her Xwedê ye.

4. Ev qencî û kerema Xwedê ye. (Ew) kê bivê dide wî. Xwedê xwediyê kerema mezin e.

5. Rewşa wan cihûyên ku Tewrat li wan hatiye barkirin (da ku pê emel bikin) piştre wan ew hilnegirtiye (û wan îman bi Muhemmed neaniye) wekî rewşa kerê ye ku barê kitêban hildigire. Çi pîs mînak e rewşa wan ên ku bi ayetên Xwedê bawerî neanine! Xwedê civata sitemkaran nayîne ser riya rast.

6. Bibêje: Gelî cihûyan! Heke ji we we ye ku ji bilî mirovan hûn bi tenê dostên Xwedê ne, de haydê mirinê bixwazin eger (bi rastî) hûn rastbêj in.

7. Lê belê cihû ji ber kar û kiryarên ku kirine, ew tu car mirinê naxwazin. Xwedê bi zaliman dizane.

8. Bibêje: Ew mirina ku hûn jê direvin teqez ew dê her bigihê we. Piştre hûn ê bi bal zanayê bi ya nepenî û darîçav ve bên vegerandin. Vêca ew, bi çiqas tiştên we kirî dê we agahdar bike.

9. Gelî yên bawerî anîne! Gava roja înê banga nimêjê hate dayîn, vêca bi bal zikrê Xwedê (nimêja înê) ve lez bikin û dev ji kirîn û firotanê berdin. Ha ev (çûna nimêjê û terka bazarê) eger hûn bizanin ji bo we çêtir e.

10. Piştî ku nimêj hate kirin vêca li ser erdê belav bibin, ji kerema Xwedê (bi karê xwe) bixwazin. Xwedayê xwe pir bi bîr bînin da ku hûn rizgar bibin.

11. Dema wan bazirganiyek an kêf û şahiyek dît, ber pê diçin û te (li ser mînberê) li piyan dihêlin. Bibêje: Ya li cem Xwedê, ji bo we ji kêf û bazirganiyê çêtir e. Xwedê çêtirînê risqdaran e.[1]

## 63. SÛREYÊ MUNAFÎQÛN

Sûreyê Munafîqûn yazdeh (11) ayet e û li Medînê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Munafîqûn bihuriye û bi maneya "dirûye" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. (Ya Muhemmed!) Gava munafiq tên cem te dibêjin: Em şahdeyiyê didin ku tu pêxemberê Xwedê yî. Xwedê jî dizane ku teqez tu pêxemberê Wî yî. Xwedê teqez şadehiyê dide ku munafiq derewkar in.

2. Sondên xwe (yên ji derew ve) ji bo xwe kirine mertal û xelkê ji riya dînê Xwedê vedigerînin. Bi rastî ya ku ew dikin çiqas pîs e!

3. Ev (rewşa wan) bi sedema ku wan bawerî anî û paşê (di dilê xwe de) kafir bûne. Vêca Xwedê dilê wan mor kir, êdî ew tênagihîjin.

4. Dema tu wan dibînî, bejn û bala wan te ecêbgirtî dihêle, eger ku biaxivin jî guhê te dê bimîne li axaftina wan. Tu dibêjî ew darên (li ber dîwaran) paldayî ne (ku xêr di wan de nîn e). Ji wan we ye her qîreke ku hebe li dijî wan e. Ew neyar in, xwe ji wan biparêze. Xwedê wan bikuje! Çawa ew (ji heqiyê) berê xwe vedigerînin?

5. Gava ji wan re bê gotin: Werin, bila pêxemberê Xwedê ji bo we lêborînê bixwaze, serê xwe dihejînin û tu wan dibînî ku berê xwe (ji heqiyê) vedigerînin û xwe mezin didêrin.

1 Pêxember (s) li ser mînberê xutba înê dixwend, di wê navê de Dehiyetul-Kelbî karwanekî bazirganiyê ji Şamê dianî ku barê wî xwarin bû. Wê çaxê li Medînê dilaxêvî bû, bihayê xwarinê pir giran bûbû. Ev yek jî bûbû adet ku gava karwanekî xwarinê dihat Medînê ji kêfan xelk bi teblik, qîr û fîran diçû pêşwaziya wî. Vêca çi gava ku ew karwan hat Medînê, xelkê mizgeftê belav bûn, çûn bal karwên û pêxember (s) li ser mînberê ji piyan hiştin û tenê dozdeh zilam li dora wî (s) man. Cabir kurê Ebdullah got: Ez jî yek ji wan bûm. Vêca der barê wê rûdanê de ew ayeta ku li jorê bihurî, nazil bû.

6. Tu ji bo wan lêborinê bixwazî û nexwazî, ji wan re wekhev e; Xwedê dê hîç li wan nebore. Bi rastî Xwedê desteya jirêderketiyan nayîne riya rast û durist.

7. Ew ên ku (ji Ensariyan re) dibêjin: Tu tiştî nedin muhacirên ku li cem Pêxemberê Xwedê ne, da ku ji hev belav bibin û herin. Hal ev e ku gencîneyên asîmanan û erdê yên Xwedê ne. Lê belê munafiq di vê nagihîjin.

8. Munafiqan digot: Sond be, eger ku em vegeriyan Medînê , ew ên desthilatdar ê xoşewîst (ku ew bi xwe ne) dê yên bêrûmet û reben (ku Peyxember û muhacir in) ji Medînê derxin. Rewş ev e; serkeftin û rûmet her ji bo Xwedê, Pêxemberê wî û ji bo bawermendan e, lê belê munafiq tênagihîjin.

9. Gelî yên ku bawerî anîne! Bila mal û zarokên we, we ji zikrê Xwedê meşxûl nekin. Kî vê bike ha ew ên ku xesirîne.

10. Ji wî risqê ku me daye we (di riya Xwedê de) xerc bikin, beriya ku mirina yekî ji we bê û ku bibêje: Xwedayê min! Bila te mirina min bidaya paş da min sedeqe bidaya û ez bibûma ji qencîkaran!

11. Xwedê tu car mirina tu kesî, dema ku mirina wî were bi paş de nade û Xwedê bi ya hûn dikin agahdar e.

## 64. SÛREYÊ TEXABUN

Sûreyê Texabun hijdeh (18) ayet e. Li Medînê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta 9’em girtiye ku tê de peyva Texabun derbas bûye û bi maneya “xapiyayî û ziyan” e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Çiqas tiştên ku li erd û asîmanan hene ji bo Xwedê tesbîh dikin, xwedanî û fermandarî, pesn û şêkirî her jê re ne û ew li ser her tiştî qadir e.

2. Xwedê ye, yê ku (bi vî şeklê xweşik) hûn afirandin, vêca hinek ji we înkar dikin û hinek ji we jî bawerî tînin. Xwedê bi ya hûn dikin bîner e.

3. Xwedê erd û asîman bi heqî (û hîkmet) afirandin. Şekil û dirûv dana we, vêca bi durûvê herî xweşik hûn bi şekil û şemal kirin. Vegera we her bi bal Wî ve ye.

4. Xwedê bi ya di erd û asîmanan de dizane, bi ya hûn dizî û aşkera dikin jî dizane û Xwedê bi ya di dilan de veşartî jî dizane.

5. Erê ma xebera wan ên berê kafir bûne negihîştiye we? Vêca wan cezayê kufra xwe tehm kir û (li axiretê jî) ji wan re ezabekî dijwar heye.

6. Ev (ezab) bi sebûnet ku pêxemberên wan bi delîl û mucîzeyên aşkera ji bo wan dihatin, vêca digotin: Erê ma çawa însanek dê (bibe peyxember û) me bîne riya rast? Vêca kafir bûn û berê xwe (ji heqiyê) vegerandin. Xwedê jî ne hewceyî baweriya wan bû. Xwedê, dewlemend û pesinande ye.

7. Yên kafir hizir kirin ku ew ê piştî mirinê dîsa neyêne saxkirin û vejandin. Bibêje:

Nexêr! Sond bi Xwedayê min be; teqez hûn ê bêne saxkirin û hûn ê teqez bi kar û kiryarên xwe bêne agahdarkirin. Ev rewş li ber Xwedê pir hêsan e.

**8.** Vêca bi Xwedê û Pêxemberê Wî û bi wê ronahiya (Qurana) ku me hinartî, îman bînin. Xwedê bi kar û kiryarên ku hûn dikin agahdar e.

**9.** Roja ku Xwedê ji bo roja civînê (ji bo hesab wergirtinê) we berhev bike, ha ew e roja ku yê xapiyayî (û xesirî) derkeve rastê. Kî bi Xwedê îman bîne û karê qenc bike, Xwedê dê gunehên wî jê bibe, dê lê bibore û dê wî bixe bihiştên ku di bin wan de çem diherikin û ew dê her û her di wan de bimînin. Ha ev e serkeftin û rizgariya mezin.

**10.** Ew ên ku kafir bûne û bi ayetên me bawerî neanine, ha ew xelkê dojehê ne, ew seraqetî tê de ne. Ew çi pîs lêvegergeh e!

**11.** Çi bela û nexweşiyek ku bi ser mirovan de bê, her ew bi destûra Xwedê ye. Kî bi Xwedê bawerî bîne, Xwedê dê dilê wî ji ya rast re veke. Xwedê bi her tiştî zana ye.

**12.** Guhdariya Xwedê û Pêxemberî wî bikin. Eger hûn berê xwe (ji îmanê) vegerênin, êdî bizanin ku bes wezîfeya pêxemberê me, ragihandineke ronak û aşkera ye.

**13.** Xweda, ji Wî pê ve tu îlah tun in, vêca bila bawermend bes xwe bispêrin Xwedê.

**14.** Gelî yên ku bawerî anîne! Ji jin û zarokên we hin ji bo we neyar in, vêca li wan hişyar bin û xwe ji wan biparêzin. Eger hûn efû bikin û li kêmasiyan biborin û wan bibexşînin, vêca bi rastî Xwedê gunehveşêr û dilovîn e.

**15.** Bi rastî malê we û zaroyên we ji bo we îmtîhan in. Xelata mezin jî li cem Xwedê ye.

**16.** Nexwe heya ku hûn dikarin ji Xwedê bitirsin, guhdarî (ya şîretên wî) bikin, bi gotina wî bikin û ji bo qenciya xwe xêran bikin. Kî xwe ji temahîya nefsa xwe biparêze, ha ew in ên serfiraz û rizgarbûyî.

**17.** Eger hûn ji dil malê xwe di riya Xwedê de xerc bikin, Xweda dê ji we re wî (malî) qat bi qat zêde bike û li gunehên we bibore. Xwedê şukirdar û bêhnfireh e.

**18.** Xwedê, zanayê nependî û darîçav e, ew e yê serdest ê karbinecih.

## 65. SÛREYÊ TELAQ

Sûreyê Telaq dozdeh (12) ayet e û li Medînê daketiye. Navê sûre ji ayeta pêşîn hatiye ku tê de peyva Telaq derbas bûye û bi maneya “jinberdan” e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Hey Pêxember! Gava hûn bixwazin jinan berdin, wan di dema paqijiya wan de berdin, (piştî we ew berdan) iddeyê wan bijimêrin (û tomar bikin). Ji Xwedayê xwe yê perwerdegar bitirsin (ku iddeyê wan ne kêm ne jî zêde bihesibênin).

Wan ji xaniyên wan dernexin û bila ew bi xwe jî (heta di iddeyê xwe de ne, ji xaniyên xwe) dernekevin; ji bilî ku ew fehşîtiyeke aşkera bikin (bi gotin û bizavên xwe xelkê malê tengezar bikin). Ev tixûb ên Xwedê ne. Kî bide ser tixûb û ehkamên Xwedê, bi rastî wî li xwe sitemkarî kiriye. Tu nizanî; dibe ku Xwedê piştî berdana jinan rewşeke din derîne holê (eger ku ji mala xwe dernekevin û tê de bimînin dibe ku li hev jî bizivirin).

**2.** Dema wan iddeyê xwe temam kir, vêca ya bi rindî li wan vegerin an jî bi rindî ji wan cuda bibin (wan berdin). Ji nav xwe du mêrên adil (li ser berdana wan an li ser zivirandina wan) bikin şahid û bila ji bo Xwedê (bi duristî) şahdeyiyê bidin. Ha ev biryar û şîret e ji bo wî kesê ku bi Xwedê û roja axiretê bawerî tîne. Kî biryar û hukmên Xwedê biparêze, Xwedê dê riyekê jê re veke…

**3.** Bi awayekî ku hizir nedikir dê risqê wî bidê. Kî xwe bispêre Xwedê vêca Ew besî wî ye. Bêguman Xweda fermana xwe bi cih tîne, (lê belê) Xwedê ji bo her tiştî miqdar (û endazek) daniye.

**4.** Ew jinên ku ji xwîna heyzê bêhêvî bûne (ku temen mezin in) û ew ên ku nakevinê, eger hûn (di iddeyê wan de) ketin gumanê, civanê (bendemayîna) wan sê meh e. Ew ên ku li halekî ne dema lihêvîmayîna wan danîna barê wan e (çêbûna zarokê ye). Kî biryar û hukimên Xwedê biparêze, Xwedê dê karê wî jê re hêsan bike.

**5.** Ha ev ên hatin gotin, hukim û biryarên Xwedê ne ku ji we re şandine. Kî biryar û hukmên Xwedê biparêze, Xwedê dê gunehên wî veşêre û perûya wî mezin bike.

**6.** Jinên berdayî li gorî taqeta xwe li cihê ku hûn lê bi cih bin (wan jî) bi cih bikin. Der barê wan de destengiyê mekin, da ku bi vî awayî (bi derketin û gerewdayînê) tengezar bibin. Eger ew li halekî bin (ducanî bin), heta barê xwe deynin nefeqên wan bidin. Heke ew ji we re zarok şîrdayî bikin ucreta wan bidin û di neqeba xwe de bi rindî (û awayekî munasib) li hev bên. Eger we li hev nekir, bila bavê (zarokî) ji zarokî re şîrdayiyeke din bi bigire.

**7.** Yê destfireh bila nefeqê li gorî destfirehiya xwe bide. Kesê destteng jî ji malê ku Xwedê daye wî, bila nefeqê bide. Xwedê li tu kesî zêdetirî ya ku dayê, bar lê nake. Xwedê dê piştî destengiyê destfirehiyê bîne.

**8.** Gelek ji xelkê welatan ji fermana Xwedayê xwe û peyxemberê Wî derketin, vêca me ew kişandin hesabekî dijwar û Me ew bi ezabekî kesnedîtî ceza kirin.

**9.** Wan cezayê kar û kiryarên xwe tehm kirin û dawiya rewşa wan jî ziyan e.

**10.** Xwedê ji wan re ezabekî dijwar amade kiriye. Vêca gelî aqilmendên ku we bawerî anî, ji Xwedê bitirsin. Ma ne Xwedê bi rastî jî ji bo we kitêbek şandiye (vêca ji we re hêncet nîn e).

**11.** (Xwedê ji bo we) Pêxemberek jî şand ku ayetên Xwedê yên ronker ji we re dixwîne, da ku yên bawerî anîn û karê qenc kirin ji tarîtiyên (nezanîn û kafiriyê) derîne ronahiya (bawerî û zanînê). Kî bi Xwedê bawerî bîne û karê bifeyde bike,

Xweda dê wî bixe bihiştên wisa ku di binê wan de çem diherikin û ew ê heta hetayê tê de bin. Bi rastî jî Xwedê risqekî pak û paqij daye wî.

12. Xwedê ye yê ku heft asîman afirandin û ji erdê jî ew qas afirandin. Peyxam û fermana Xwedê di navbera van de tê û diçe, da ku hûn bizanin ku bi rastî Xwedê li ser her tiştî qadir e û bi rastî zanîna Xwedê dor li her tiştî girtiye.

## 66. SÛREYÊ TEHRÎM

Sûreyê Tehrîm, dozdeh (12) ayet e. Li Medînê daketiye û navê xwe ji ayeta pêşîn hatiye ku tê de peyva Heram derbas bûye û bi maneya "qedexekirin" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Hey Pêxember! Ji bo çi ya Xwedê ji te re helal kiriye, ji bo razîkirina xanimên xwe, tu li xwe heram dikî? Xwedê gunehjêbir û dilovîn e.

2. Bêguman Xwedê, ji bo we hukim danî ku (bi dayîna kefaretê) hûn ji sondên xwe vegerin. Xwedê dost û arîkarê we ye û Ew e yê 'Elîm yê Ḥekîm.

3. Dema Pêxember, bi dizî peyvek ji yekê ji xanimên xwe re got, vêca gava ew peyv eşkera kir; Xwedê jî ev yek ji Pêxember re ragihand, Pêxember jî hinek ji wê peyvê jê re aşkera kir û hinek jî hişt. Gava ku Pêxember ew peyv jê re diyar kir, got: Kê ev ji te re got? Pêxember (jê re) got: Xwedayê zana û haydar ji min re got.

4. Eger hûn herdu tobe bikin (tobe ji we re baştir e), vêca bi rastî dilê we berê xwe ji başiyê çerx bûye. Eger hûn li dijî Pêxember ji hev re bibin piştevan, vêca bi rastî (hûn bizanin) ku Xwedê Cibraîl û qencên bawermend dost û arîkarê wî ne. Piştî vê milyaket hemû jî arîkarên wî ne.

5. Eger Pêxember we berde, Xwedayê wî di şûna we de hinek jinên ji we çêtir û baştir bidiyê ku ew misliman bin, bawermend bin, îtaetkar bin, tobedar bin, îbadetkar bin, rojîgir bin.

6. Gelî yên ku bawerî anîne! Xwe û malbata xwe ji agirekî biparêzin ku ardûyê (şewata) wî mirov û kevir in. Li ser wî (agirî) melayîketên dilstûr û dijwar hene, li ber fermana Xwedê ranabin û ya ku fermana wan pê hatî kirin, dikin.

7. Gelî yên kafir bûne! Îro lêborîna xwe nexwazin. Hûn dê tenê cezayê kirinên xwe bikişînin.

8. Gelî bawermendan! Berê xwe bidin Xwedê û bi tobeyeke ji dil û can tobe bikin. (Eger hûn ji dil û can tobe bikin) hêvî heye ku Rebbê we li gunehên we bibore û we bixe bihiştên ku di binê wan de çem diherikin. Ew roja ku Xwedê Pêxember û bawermendên ligel wî riswa nake û nade şermê, (wê rojê) ronahiya wan dê li pêşî û rexê wan ê rastê biçe. Dibêjin: Xwedayê me! Ronahiya me temam bike û me bibexşîne, bi rastî jî tu li ser her tiştî xwedanhêz î.

9. Hey Pêxember! Li hember kafir û munafiqan cîhadê bike û li ser wan dijwar bibe. Cihê wan cehenem e. Ew çi pîsecih e!

10. Xwedê ji yên kafir re jina Nûh û jina Lût nimûne anîne. Ev herdu jin di bin mehra du bendeyên me yên salih de bûn û (bi kafirbûna xwe) herdu jinan bi wan re xayîntî kirin (ne xiyaneta namûsê). Vêca mêrên wan (digel ku pêxember bûn) nikarîn ezabê Xwedê ji ser wan bidin alî. Ji herdu jinan re hate gotin: De haydê digel yên ku diçin êgir de hûn jî biçin!

11. Xwedê ji yên bawermend re nimûne ji jina Firewn aniye. Dema gotibû: Xwedayê min! Ji bo min li cem xwe li bihiştê malekê çêke, min ji Firewn û karê wî xelas bike û min ji wê civata zalim rizgar bike!

12. Ji Meryema keça Îmranî jî nimûne tîne, ew a ku namûsa xwe parastî. Vêca Cîbrîl qasidê Me, bi emrê Me pufkire ber xavika wê. Wê bawerî bi şerîeta Xwedayê xwe û kitêbên wî anî û ew ji îtaetkaran bû.

## 67. SÛREYÊ MULK

Sûreyê Mulk sî (30) ayet e û li Mekkê hatiye xwarê. Sûre, navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva El-Mulk derbas bûye û bi wateya desthilatî û hukimranî ye. Hinek navên vî sûreyî yên din jî ev in: Tebareke, Munciye, Mucadele, Manî’ û Waqiye. Der barê vî sûreyî de pir hedîs hene û didin zanîn ku kesê her şev wî bixwîne, xêreke mezin ji xwe re hasil dike.

***Bi Navê Xwedayê Reḩman ê Reḩîm***

1. Ew Xwedayê ku xwedanî û fermandarî bi destê Wî ye pak û pîroz e û ew li ser her tiştî qadir e.

2. Xwedê mirin û jiyan afirandin da ku we biceribîne; ka kar û kiryarên kê ji we çêtir e. Her ew e yê ‘Ezîz yê Xefûr.

3. Ew Xwedayê ku heft tebeq asîman di ser hev re ahengsaz çêkirine, tu yê di çêkirina Xweda yê Reḩman de tu kêmasî û nakokiyê nebînî. Vêca de berê xwe bidê, erê ma tu kêmasiyekê tê de dibînî?

4. Paşê dîsa berê xwe bidê (ka tu eybekê tê de dibînî), çavên te dê reben û westiyayî li te vegerin.

5. Birastî Me asîmanê dinyayê bi stêran xemilandiye. Me ew (stêr) ji bo recimandina şeytanan kirine têwer û me ji bo wan ezabê bipêt amade kiriye.

6. Ji bo wan ên ku Rebbê xwe mandel dikin ezabê dojehê heye. Ew çi pîsewar e!

7. Gava ew (kafir) di cehnemê tên werkirin, dengekî bihêrs î kirêt jê tê û ew di nav xwe de dikele.

8. Cehenem ji hêrsa xwe hindik dimîne ku xwe bixwe û ji hev biteqe! Çi gava melayîket komekê ji kafiran diavêjinê, zebaniyên wê ji wan dipirsin; erê ma ji bo we pêxamber nehatibûn (ku ji ezabê vê rojê we bitirsînin)?

**9.** Di bersiva xwe de, gotin: Rast e, birastî pêxember ji bo me hatin, vêca me
bawerî bi wan neanî û me got: Xwedê tu pêxember neşandine. Hûn bes di nav
jirêderketineke mezin de ne!
**10.** Gotin: Eger me guh bidaya pêxemberan an jî me fehm bikira vêga em nedibûn
ji xelkê dojehê!
**11.** Vêca li gunehên xwe mikur hatin. Nexwe bila dojehî bimirin û ji dilovaniya
Xwedê dûr bin!
**12.** Birastî ew ên ku ji nedîtî û nebînayî ve ji Xwedayê xwe ditirsin, ji wan re lêborîn
û perûyeke mezin heye.
**13.** Hûn dixwazin gotina xwe bi dizî yan jî aşkera bibêjin, bi rastî Xwedê bi ya di
dilan de her dizane.
**14.** Erê ma (xaliqê alemê) nizane ka çi afirandiye? Ew e yê Letîf yê Xebîr.[1]
**15.** Xwedê ye ew ê ku erd ji bo we sernerm (û hêsan) kiriye. Vêca di nav her aliyên
wê de bigerin, ji risqê ku Xwedê daye we bixwin û veger bes bi bal Wî ve ye.
**16.** Erê ma hûn ji Wî Xwedayê li jor ewle ne ku ew di erdê de we nebe xwarê. Ha
we dît ku erd dilerize?
**17.** Erê ma hûn ji Wî Xwedayê li jor piştrast in ku kevirbaranekê bi ser we de
nerijîne? Vêca hûn ê bizanin ka tirsandina min çawan e?
**18.** Birastî yên beriya van (pûtperestan) jî bawerî bi (pêxemberên xwe) neanîn. Vêca
li hemberî înkara wan (de binêre) ka ezabê min çawa bû?!
**19.** Ma ew li teyran nanêrin ku di ser wan re difirin, perên xwe vedikin û digirin?
Ji Xwedayê Reḥman pê ve (tiştek) wan (li hewa) nagire. Birastî ew bi her tiştî
bîner e.
**20.** Erê ma ji bilî Xwedê, ew kî ye ku ji bo we bibe leşker ku arîkariya we bike?
Birastî kafir her di nav xapandineke aşkera de ne (şeytan wan dixapîne û nahêle
ew bawerî bînin.)
**21.** Erê ma ku Xwedê risqê xwe li ser we bibire, ma kî dikare risq bide we? Nexêr,
belkî wan xwe di çavsorî û nefretê de berdane û rikdariyê dikin.
**22.** Erê ma kesê ku li ser rûyê xwe bimeşe duristtir e yan ew kesê ku li ser piyan di
riyeke rast de dimeşe?
**23.** Bibêje: Xwedê ye, ew ê ku hûn ji nû ve xuliqandine û ji bo we guh, çav û dil
çêkirine. Hûn çiqas kêm şukrê Xwedê dikin!
**24.** Bibêje: Xweda ye, yê ku hûn dane ser erdê û tê de belav kirine û hûn ê bes bi
bal Wî ve bêne civandin.
**25.** Ew dibêjin: Eger hûn rast dibêjin, de ka ev soz (a tu me pê ditirsînî) kengê ye?
**26.** Bibêje: Birastî zanîna wê li cem Xwedê ye. Ez tenê hişyarker û agahdêr im.

1 Letîf: Ew ê ku bi heqîqeta her tiştî, bi hûrê û girê wî zana ye.
Xebîr: Ew ê ku bi kirinên bendeyên xwe, yên aşkera û nehênî agahdar e.

**27.** Êdî dema ezab û nexweşiyê nêzî xwe dibînin, rûyê kafir û bêbaweran reş dibe. Melayîket ji wan re dibêjin: Ha ev e, ew ezabê ku we lê lez dikir!

**28.** Bibêje: Eger Xwedê min û kesên ligel min bimirîne, yan jî li me were rehmê, me sax bihêle, de ji min re bibêjin ma kî heye ku kafiran ji ezabê dijwar rizgar bike?

**29.** Bibêje: Ew Xwedayê Reḥman e (ew ê ku mirovan ji nexweşî û ezab rizgar dike). Me bawerî pê anî û me xwe bes sparte Wî. Vêca hûn ê di nêz de bizanin ka kî ye yê di rêşaşiyeke aşkera de.

**30.** Bibêje: Ka bejin: Eger ava we di erdê de winda bibe û biçike, ma kî heye ku aveke herek ji we re bîne?

# 68. SÛREYÊ QELEM

Sûreyê Qelem, pêncî û du (52) ayet e. Li Mekkê daketiye û sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Qelem derbas bûye û bi wateya pênûs û xame ye. Navekî din ê vî sûreyî jî Nûn e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Nûn. Bi qelemê û bi ya ku rêzerêz tê nivîsîn sond be.

**2.** Bi sedema ku Xwedê qencî daye te tu dîn nebûyî.

**3.** Bêguman ji bo te perûyeke bêqutbûn heye.

**4.** Birastîtu li ser rewiştekî (exlaqekî) mezin î.

**5.** Di nêzîk de (resûlê min) tu yê bibînî û ew ê jî bibînin…

**6.** Ka kî ji we dîn e.

**7.** Birastî Xwedayê te bêhtir dizane bi yê ku rê winda kiriye û ew bêhtir dizane bi yê ku rasterê bûye.

**8.** Nexwe bi gotina derewkeran meke!

**9.** Ew dixwazin ku tu bi nermî tevbigerî da ku ew jî li bara te nerm tevbigerin.

**10.** Bi gotina mirovê zêde sondxwer ê riswa meke,

**11.** Ew ê devavêj ê eybderêx û ew ê sebker ê xeberguhêz.

**12.** Ew ê çikûs ê xêrnexwaz ê ta‘deker ê pir gunehkar…

**13.** Ew ê dilhişk û xeberreq, piştî wê jî ku ew bîjî be û bi xerabiyê navdar be.

**14.** Ji ber ku xwedan mal û zarok bû (ji lew derbarê Quranê de wisa bû)!

**15.** Dema ayetên me jê re dihatin xwendin, digot: Ew çîrok û çîvanokên pêşîyan e!

**16.** Em ê wî li ser pozê wî bikişkişênin.

**17.** Birastî Me xelkê Mekkê jî mîna xwedanê baxçe ceribandin; dema sond xwarin ku sibehê zû (hê tu kesî nedîtî) fêkiyê xwe biqurêfin (da feqîran bêbehr bihêlin).

**18.** Ji bo feqîr û belengazan tu par veneqetandin. Bi wateyeke din, wisa ji xwe bawer bûn; negotin: 'Eger Xweda hez bike'!

**19.** Vêca hê ew di xewê de, bi şev, belayeke mezin bi ser baxçeyê wan de hat.

**20.** Êdî ew baxçe bû mîna rijiyê.

**21.** Serê sibehê gazî hev kirin da ku herin nav baxçê xwe.

**22.** (Gotin) de haydê sibehê zû herin eger (birastî) hûn dixwazin fêkiyên xwe biqurêfin!

**23.** Ew, ber bi riya baxçe ve çûn, bi dizî ji hev re digotin:

**24.** Bila tu feqîr û belengaz bi we nehisin û bi we re neyên nav baxçê we!

**25.** Ew sibehê zû bi rê ketin û ji wan we ye ku ew dê bigihîjin armanca xwe.

**26.** Lê belê gava wan baxçe (bi vê rewşê) dît, gotin: Me riya xwe şaş kiriye (ev ne baxçê me ye)!

**27.** (Gotin:) Naxêr, belkî em mehrûm û bêpar man.

**28.** Yê ji wan têgihîştir, got: Ma min ji we re negot: bêemriya Xwedê mekin, de bila we Xwedayê xwe pak bidêra, we zekata malê xwe bidaya da ku ev nehata serê we.

**29.** Gotin: Xwedêyo! Tu ji her kêmasiyê pak û paqij î. Birastî em her sitemkar bûn.

**30.** Paşê berê xwe dane hev, gazin ji hev kirin û sûc xistin stûyên hev.

**31.** Gotin: Wax li rewşa me! Birastî em ji riya rast derketibûn.

**32.** Hêvî heye ku Xwedayê me ji bedêla baxçeyê me yekî çêtir bide me. Birastî em hêvîdarê (kerema) Rebbê xwe ne.

**33.** Ha wisa ye azabdayîna me. Lê belê, eger bizanin û têbigihîjin ezabê axiretê gelek dijwartir û mezintir e.

**34.** Bêguman ji bo wan ên ku xwe ji bêheqiyê diparêzin li cem Xwedayê wan bihiştên xweş hene.

**35.** Erê ma em ê misliman û gunehkaran wekhev bigrin?

**36.** Erê çi li we qewimiye? Ma hûn çawa (bi wekheviyê) hukim didin?

**37.** Yan jî di dest we de kitêbek heye ku hûn di wê de dixwînin?

**38.** Ku birastî jî ya hûn dixwazin ji bo we tê de ye?!

**39.** Yan jî ma sozên we li ser me hene ku heta roja qiyametê ya hûn hukim pê bidin dê her ji bo we be?!

**40.** Ji wan bipirse: Ka kî ji wan kefîlê vê doza pûç e?

**41.** Yan jî di vê bîr û baweriyê de hevkarên wan hene, vêca eger birastî ew rast dibêjin bila gazî hevkarên xwe bikin!

**42.** Roja ku li wan dibe tengasî û zehmetî (ku roja qiyametê ye), daxwaz li wan tê kirin ku herin sicûdê, lê belê ew nikarin biçin sicûdê.

**43.** Çavên wan bitirs e, zelîlî wan digre. Birastî berê daxwaz ji wan dihate kirin ku biçin sicûdê (dîsa jî ew neçûn sicûdê), digel ku ew saxlem û rihet bûn jî.

**44.** Tu min û kesê ku bi vê Quranê bawerî nayînê ji hev re bihêle. Di nêzîk de Em ê jî hêdî hêdî wan ber bi dojehê ve bikêşim, bêyî ku ew bi xwe bihisin.

**45.** Ez muhletê didim wan. Birastî dehfa Min a cezadanê pir dijwar e!

**46.** Yan jî tu heqekî ji wan dixwazî vêca ew li ser wan giran e?

**47.** Yan jî zanîna nepeniyê li cem wan e, vêca ew dinivîsin?

**48.** Vêca tu ji bo hukmê Rebbê xwe, xwe ragire. Tu nebe wekî xwedanê masî (Yûnus Pêxember) dema bi derd û kul gazî Xwedayê xwe kir (da ku wî ji nava masî rizgar bike)…

**49.** Eger dilovaniya Xwedayê wî pê re negihîştbûya ew ê li çola rip û rût û lomekirî bihata avêtin.

**50.** Belê Xwedayê wî ew bijart (wehî dayê û ber bi dilovaniya xwe xist), vêca wî gerand ji mirovên qencîkar.

**51.** Birastî, hindik mabû ku yên kafir dema li Quranê guhdarî dikin ji kerb û kîna xwe te çavînî bikin û te bixin erdê. Dibêjin: Birastî jî ew dîn e.

**52.** Hal ev e ku Quran bi xwe ji bo mirovan agahdarî ye.

## 69. SÛREYÊ HAQQE

Sûreyê Haqqe pêncî û du (52) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Haqqe hatiye û bi wateya wê qiyametê ye ku wan heqîqetên hatine mandelkirin, dertîne rastê.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** El-Haqqe.[1]

**2.** Erê ma El-Haqqe çi ye?

**3.** Ma tı ji ku dizane ka El-Haqqe çi ye?

**4.** Semûd û Ad bi roja qiyametê bawerî neanîn.

**5.** Herçî Semûd (û qewmê wî) bû bi qîreke ji hedê der helak bûn.

**6.** Herçî Ad (û qewmê wî) bû bi bahozeke bivîzevîz û zêde sar helak bûn.

**7.** Xwedê ew heft şev û heşt rojan li pey hev bi ser wan de şand. Ew di malên xwe de mirî û bêbizav man, her wekî ew qurmê darxurmayên rizî bûn.

**8.** Vêca ma tu şûnmayînekê ji wan dibînî?

**9.** Firewn û yên beriya wî û xelkê wan welatên ku hatine serûbinkirin jî, dest bi gunehan kirin.

**10.** Her wiha wan guhdariya pêxemberê xwe nekir, vêca Xwedê bi ezabekî tund/dijwar ew ceza kirin.

1 El-Haqqe, navek ji navê roja Qiyametê ye, lewra di vê rojê de peymana bi padaş û cizayê misoger dibe.

11. Birastî gava avê (her alî) da ber xwe û bilind bû, Me hûn di keştiyê de hilgirtin…
12. Da ku em vê yekê ji we re bikin pend û şîret û da ku guhên têgihîştî têbigihîjin.
13. Êdî gava ku di sûrê de yek pifkirinek bê pifkirin…
14. Erd û çiya bên rakirin û bi carekê li hev bên xistin û hûr û hêra bibin.
15. Ha wê rojê bizane ku qiyamet rabû.
16. Asîman diderize û êdî wê rojê asîman sist û xav e.
17. Melayîket li dora asmên in. Wê rojê heşt melayîket Erşê Xwedayê te di ser mirovan re dê hilgirin.
18. Wê rojê (ji bo hesab) hûn ê bêne pêşberî Xwedayê xwe, tiştekî we yî veşartî namîne.
19. Herçî yê ku deftera emelê xwe bi destê xwe yê rastê wergire, (bikêf) dibêje: Kerem bikin; deftera min bixwînin.
20. Birastî min ji dil zanîbû ku hesabê roja qiyametê li pêşiya min e.
21. Vêca ew di jiyaneke xweş de ye.
22. Di bihiştekе qedirbilind û xwedanrûmet de ye.
23. Fêkiyê wê nêzik û berdest in.
24. (Melayîket ji wan re dibêjin:) Bi sedema kar û kiryarên ku we di dinyayê de kirin bixwin, vexwin, ji we re noşîcan be.
25. Herçî yê ku deftera emelê xwe, bi destê xwe yê çepê wergire, dê bibêje: Xwezî ev defter ji bo min nehatibûya dayîn!
26. De bila min nizanibûya ka hesabê min çi ye!
27. Xwezî bi mirinê re her tişt bi dawî bûya!
28. Mal û milkê min qet feyde negihande min…
29. Desthilatiya min ji min hate standin.
30. (Tê gotin:) Wî bigirin û bi zincîran (destên wî bi stûyê wî ve) girê bidin…
31. Paşê wî biavêjin nav agirê bipêt!
32. Piştre wî bi zincîreke heftê gaz zincîrpêç bikin.
33. Birastîwî bawerî bi Xwedayê mezin nedianî…
34. Li ser nandayîn û têrkirina belengazan teşwîq nedikir.
35. Îro li vir, jê re tu heval û hogir nîn in.
36. Ji bilî xwîn û edabê tu xwarin jî tun e.
37. Ji gunehkaran pê ve kes vê xwarinê naxwe.
38. Sond be, bi tiştên ku hûn dibînin…
39. Bi tiştên ku hûn nabînin jî…
40. Bêguman ev (Quran), gotina qasidekî pir birûmet e.
41. Ev, ne gotina şairekî ye, hûn çiqas kêm bawer dikin!

42. Ev, ne gotina remildarekî ye jî, hûn çiqas hindikî difikirin!
43. Ev, ji cem Perwerdegarê alemê ve hatiye şandin.
44. Eger wî pêxemberî li ser (navê) me hin gotin lêbianîna..
45. Teqez Me yê ew bi xurt bihingavta..
46. Piştre Me yê dilreha wî biqetanda.
47. Ji we tu kesî dê nikariya ji bo wî berevanî bikira.
48. Birastî ev (Quran) ji bo teqwadaran bîranîn û şîret e.
49. Em, teqez dizanin ku ji we hin kes pê bawerî nayînin.
50. Bêguman ew ji bo kafiran hesret û poşmanî ye.
51. Birastî jî ev Quran rastî bi xwe ye.
52. Vêca tu navê Rebbê xwe yê mezin pak û paqij bidêre.

## 70. SÛREYÊ ME‘ARIC

Sûreyê Me’aric çil û çar (44) ayet e. Li Mekkê daketiye û navê xwe ji ayeta 3’em girtiye ku peyva Me’aric tê de derbas bûye û bi wateya bilindbûn û hilbûna bi ber bi asîmanan ve ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Pirsyarekî daxwaz kir: Ka bila ezabê qiyametê bê.
2. Ew ezab ji bo kafiran e. Yê wî ji ser wan bide alî tune.
3. Ew ezabê ew dixwazin ji cem Xwedê ve ye ku Ew xwediyê meqamên mezin û bilind e.
4. Melayîket û Cebraîl di rojekê de bi balê ve hildikişin ku bilindahiya wê qonaxa pêncî hezar sal e.
5. Vêca tu bi sebreke rind sebirkêş be.
6. Birastî kafir ezabê wê rojê dûr dibînin.
7. Em jî wî nêzîk dibînin.
8. Ew roj asîman dibe wekî ma‘dena heliyayî.
9. Çiya jî dibin mîna hiriya jendî.
10. Dost li halê dost napirse.
11. Ew dê nîşanî hev bêne dayîn. Kesê gunehkar ji ber ezabê roja qiyametê dixwaze ku zarokên xwe…
12. Jina xwe û birayê xwe…
13. Eşîr û malbata ku wî himbêz dikir…
14. Çiqas kesên ku li ser erdê hene jî tevekan gorî xwe bike, da ku ew rizgar bibe.
15. Nexêr, ew nikare vê bike; dojeh agirekî gur û bipêt e.

16. Ew çermê seriyan radike.
17. Ew (dojeh) gazî kesê ku pişta xwe daye (îmanê) û berê xwe jê daye paş, dike.
18. Gazî yên ku (serwetê) dide ser hev (û zekatê jê nade) dike!
19. Birastî însan lezgîn û çikûs hatiye afirandin…
20. Dema nebaşî bi ser de tê (xemgîn dibe û) dike feryad…
21. Gava ku qenciyek bi ser de bê destgirtî û çikûs dibe.
22. Ji bilî yên nimêjker…
23. Ew ên ku nimêja xwe berdewamî dikin.
24. Ew ên ku di malên wan de pareke diyarkirî heye…
25. Ji bo parsek û bêparan.
26. Ew ên ku bi roja cezadanê bawerî tînin…
27. Ew ên ku ji ezabê Xwedayê xwe bitirs in.
28. Bi rastî ezabê Rebbê wan bêewle ye…
29. Ew ên ku dawpaqij in û namûsa xwe diparêzin.
30. Lê belê ne li hember jin û cariyeyên xwe. Bi rastî der barê wan de ew bêgazin in.
31. Êdî kesê ku ji bilî van bixwaze ku bi hinekên din re (bênîkah) raze, vêca ha ew sînorbihêr her bi xwe ne.
32. Ew ên ku spare û peymanên xwe bi cih tînin…
33. Ew ên ku şahdeyiya xwe (bi rast û duristî) didin…
34. Ew ên ku li nimêja xwe miqate ne…
35. Ha ev in, ên ku di bihiştan de rûmeta wan tê girtin.
36. Vêca ma çi li yên kafir qewimiye ku ji te direvin û bawerî bi te nayînin?!
37. Li rast û çepê te, ji hevbelavbûyî qefle qefle ne.
38. Ma her yek ji wan li hêviyêne ku ew biçin Cenneta Ne‘îmê?
39. Na, bila vê hêviyê nekin! Birastî ew jî dizanin ku me ew ji çi afirandine.
40. Na; rastî ne wekî hêviya wan e! Sond bi Xwedayê rojhilat û rojavayan, birastî jî em kara ne…
41. Li ser a ku hinekan ji wan çêtir bînin şûna wan û tu kes dê zora me jî nebe.
42. Vêca ji wan bigere, bila xwe (di pûçiyê de) berdin û bi dinyaya xwe ve bimînin heta wê rojê bibînin a ku peymana (ezabê) wê ji wan re hatiye dayîn.
43. Ew roja ku bi lez ji goristanan derdikevin, ber bi cihê kombûnê ve diçin, tu dibêjî qey ew bi bal rênîşandereke cikandî ve dibezin.
44. Wê rojê ser û çavên wan bitirs û riswa ne. Ha ev e, ew roja ku li dinyayê pê dihatin tirsandin.

# 71. SÛREYÊ NÛH

Sûreyê Nûh bîst û heşt (28) ayet e û li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de navê Nûh Pêxember (es) derbas bûye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Bêguman Me Nûh ji bo gelê wî re şand; Me jê re got: beriya ezabekî cansoj bi ser wan de bê tu gelê xwe hişyar bike û wan bitirsîne.
2. Nûh got: Gelî miletê min! Birastî ez ji bo we hişyarkerekî aşkera me.
3. Ku hûn îbadetê Xwedê bikin û hay ji ferman û qedexeyên Wî hebin û bi gotina min bikin…
4. Xwedê jî dê li gunehên we bibore û heta demeke navlêkirî dê jiyana we dirêj bike. Birastî jî gava ew dema navlêkirî hat ew nayê bipaşdexistin. Eger we bizaniya (we dê bi bal îman û taetê ve lez bikira)!
5. Nûh pêxember got: Xwedayê min! Birastî min, bi şev û roj gelê xwe her vexwend bal îmanê.
6. Vêca banga min tenê ew ji min dûr kirin.
7. Birastî ji bo ku tu li gunehên wan biborî, çiqas min gazî wan kir, wan her tiliyên xwe xistine guhê xwe, cilên xwe li ser û çavên xwe werdan û rikdarî kirin, bi quretî û pozbilindî xwe mezin dêran.
8. Paşê min bi aşkera gazî wan kir.
9. Piştre, dîsa jî min bi aşkera, bi dizî gazî wan kir.
10. Min ji wan re got: Ji Rebbê xwe lêborînê bixwazin, bi rastî Ew pir efûkar e.
11. Xwedê, dê ji ewran ji bo we baranê li dû hev bibarîne.
12. Mal û zarokên we pir bike, baxçan bide we û ji we re çeman biherikîne.
13. Çi li we qewimiye ku hûn qedrê mezinahiya Xwedê nagirin?
14. Hal ev e ku Xwedê hûn merhele bi merhele afirandine.
15. Ma hûn desthilatiya Xwedê nabînin ku çawa heft tebeq asîman afirandine?
16. Xwedê çawa heyv di wan de kiriye rewşen û roj jî kiriye çirayeke ronîker.
17. Xwedayê mezin hûn ji axê mîna giyayê hêşîn kir.
18. Careke din dê we vegerînê û dîsa (ji bo mehşerê) dê we jê derîne.
19. Xwedê erd ji we re raxistiye…
20. Da hûn karibin di erdê de riyên fireh bigirin (û li risqê xwe bigerin).
21. Nûh got: Xwedayê min! Birastî wan guhdariya min nekir û dan pey maldarên xwe, ew ên ku mal û zarokên wan ji bili zerarê tu feyde li wan nekiriye.
22. Wan hîle û dekên mezin girêdan.

23. Gotin: Zinhar, îlahên xwe terk mekin û dev ji wedd, suwa, yexûs, ye'ûq û nesr jî bermedin!
24. Birastî wan pir kes ji rê deranîn. (Xwedayê min!) Tu jî rêşaşiya wan sitemkaran her zêde bike!
25. Ew ji ber gunehên xwe di tofanê de xeniqîn, vêca paşê ew ketin êgir, êdî li hemberî Xwedê ji bo xwe tu arîkar jî nedîtin.
26. Nûh got: Xwedayê min! Li ser erdê ji kafiran tu kesî mehêle!
27. Birastî eger Tu wan bihêlî dê evdên te ji rê derînin û dê tenê mirovên nankor û neqenc biwelidînin.
28. Xwedayê min! Li min û dê û bavên min û ji bawermendan kesê bikeve xaniyê min û li mêrên bawermend û jinên bawermend bibûre û tenê helaka zaliman zêde bike.

## 72. SÛREYÊ CIN

Sûreyê Cin bîst û heşt (28) ayet e. Li Mekkê nazil bûye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Cin derbas bûye û bi wateya "yên pir veşartî" ye. Sûre behsa wan cinan dike ku hatine li Quranê guhdarî kirine û wan îman pê aniye. Her wiha hedan û sebra Pêxember (sew) aniye ku cin jî bûne tabi'ên wî.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. (Ya Muhemmed!) Bibêje: Ji bo min wehî hat ku civatek ji cinan (li Quranê) guhdarî kir. Vêca (piştî ku li qewmê xwe vegeriyan) gotin: Birastî me li Quraneke balkêş guhdarî kir…
2. Bi bal riya rast ve rasterê dike. Vêca me bawerî pê anî û em tu kesî ji Xwedayê xwe re nakin hevpişk û heval.
3. Bêguman şanê Xwedê bilind û mezin e û ji bo xwe tu heval û zarok negirtine.
4. Birastî rewş ev e, bêhişên me der barê Xwedê de derewên bêbinyad lêanîn.
5. Me hizir dikir ku tu îns û cin der barê Xwedê de qet bi derew nabêjin.
6. Ji însanan hinek hebûn ku ji cinan parastin dixwestin. Vêca cinan ew zêdetir ji rê derxistin.
7. Wan cinan jî wekî ku we hizir dikir, digo: Xwedê dê (piştî mirinê) tu kesî sax neke.
8. Birastî me hewl da ku em herin asîmanan (da ku li melayîketan guhdarî bikin). Lê belê me dît ku asîman ji zêrevanên dijwar û stêrên bizotavêj tije bûye.
9. Hal ev e, (berî şandina Pêxember) ji bo me, li asîmanan cihê guhdariyê hebû. Lê belê vêga kî bixwaze guhdariyê bike dê bibîne ji stêran pêta agir li berê sekiniye.
10. Birastî em (cin) nizanin ka (ev rewş) ji bo çi ye; gelo Xwedê dixwazê xelkê erdê pê biêşînê yan jî pê xêra wan xwestiye?

11. Hin ji me hene ku salih in û hin ji me hene ku ne wisan in, em xwedanê gelek rêk û rêbaz in.

12. (Êdî) me yeqîn fehm kir ku Xwedê li erdê li ser me desthilatdar e û em nikarin bi revê wî naçar bihêlin.

13. Birastî gava me li Quranê guhdarî kir, me yekser bawerî pê anî. Vêca kî bawerî bi Rebbê xwe bîne, bila netirs e ku xêrên wî kêm bibin an jî gunehên wî zêde bibin.

14. Hin ji me misliman bûn û hin ji me sitemkarî kirin. Vêca kî ku misliman bibe, ha ew in ên ku bi ser riya heq ve bûne.

15. Herçî yên ku ji riya heq derketine ew ardûyê dojehê ne.

16. Eger ew (ên kafir) li ser rê rasterê bibûna Me yê baranek pir bi ser wan de bibaranda û risqê wan berfireh bikira…

17. Da ku em wan tê de biceribênin. Kî berê xwe ji kitêba Rebbê xwe vegerîne, Xweda dê wî bixe ezabekî dijwar.

18. Bêguman mizgeft ên Xwedê ne. Nexwe digel Xwedê ji tu kesî re îbadet û du‘a nekin.

19. Çi dema bendeyê Xweda (Muhemmed) rabû ku peyama Xwedê bang hildêre, cin li hawirdora wî kom bûn, hindik mabû ku herin ser milên hev (da li Quranê guhdarî bikin).

20. Bibêje: Ez bes îbadetê ji bo Xwedayê xwe tenê dikim û ez tu kesî jê re nakim hevpişk.

21. Bibêje: Birastî ez ne dikarim zerarekê bidim we ne jî feydeyekê.

22. Bibêje: Birastî (eger ez guhdariya Xwedê nekim) tu kes nikare min li hember Xwedê biparêze û ez ji Wî pê ve asêgehekê jî nabînim (ku xwe tê de biparêzim).

23. Ji bilî ku ez peyamên Xwedê ragihînim (ez nikarim tiştekî bikim). Êdî kî guhdariya Xwedê û pêxemberê wî neke, vêca birastî jê re agirê dojehê heye û heta hetayê ew dê tê de bimîne.

24. Ew ê li ser ya xwe bin heyanî ew ezabê ku peymana wî ji wan re hatî dayîn dîtin, vêca (dema dîtin) dê ew bizanin ji aliyê arîkariyê ve ka kî qelstir û ji aliyê hejmarê ve kî kêmtir e.

25. Bibêje: Ez (bi xwe) nizanim ma gelo ew ezabê ku peymana wî ji we re hatiye dayîn nêzik e yan jî Xwedayê min dê ji bo wî demeke dûr û dirêj deyne.

26. Xwedê zanayê nepeniyê ye. Ew xeyba xwe ji tu kesî re aşkera neke.

27. Lê belê ew pêxemberê ku Xwedê wî bivê ji vê cuda ye. Birastî Xwedê li pêşiya wî û pişt wî melayîketên çavdêr dişîne.

28. Da ku bi vî awayî Xwedê bide zanîn ku wan peyamên Xwedayê xwe ragihandine. Xwedê bi ya li cem wan dizane û her tişt yek bi yek jimartiye (û tomar kiriye).

## 73. SÛREYÊ MUZZEMMIL

Sûreyê Muzzemmil bîst (20) ayet e. Ayetên 10, 11, û 20'em li Medîneyê û yên din tev li Mekkê daketine. Sûre, navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Muzzemmil derbas bûye û bi wateya "yê ku cil li xwe werda" ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Hey ê ku cil li xwe werdaye!
2. Ji bilî hindikî ji şevê, tu rabe....
3. Nîvê wê, yan ji nîvê wê kêmtir...
4. An ji nîvê wê zêdetir rabe nimêj ke û Quranê hêdî hêdî, bi hizr û tefekkur bixwîne.
5. Birastî Em ê gotineke giran nazilî ser te bikin.
6. Bêguman îbadetê şevê bandora wî zêdetir e û bêhtir muwafiqê dil e û xwendina tê de duristir û mikûmtir e.
7. Birastî bi rojê ji bo te meşxuliyeteke dirêj heye.
8. Navê Rebbê xwe dibîrbîne û xwe ji bo îbadetê wî vala bike.
9. Ew hem Xwedayê rojhilat hem jî yê rojava ye. Ji Wî pê ve tu Îlah nîn in. Nexwe wî ji xwe re bike wekîl û karspêr.
10. Li hember ya dibêjin xwe ragire û bi xweşikayî dev ji wan berde.
11. Min û wan bêbawerên halxweş ji hev re bihêle (ez ê ceza bidim wan) û hinekî muhletê bide wan.
12. Bêguman li bal me (ji wan re) qeyd û zincîrên giran, dojeheke sincirî...
13. Xwarineke bistrî û ezabekî dijwar heye.
14. Roja erd û çiya dihejin, çiya dê bibin lodên xîz (qûm)ê, biherikin (û li ber bayê herin).
15. Birastî çawa ku me ji Firewn (û civata wî) re pêxemberek (Mûsa) şandibû, her wisa me ji bo we jî pêxemberek şandiye ku ew ê li ser we bibe şahid.
16. Lê belê Firewn li pêxember guhdarî nekir û pê bawerî neanî, vêca Me jî bi hingavtineke dijwar û tûj ew hingavt.
17. Eger hûn bawerî neyînin, hûn ê çawa xwe ji ezabê rojeke wisan biparêzin ku zarokan pîr û kal dike?
18. Asîman bi xwe jî dê ji (tirsa) wê (rojê) bibe du şeq. Peymana Xwedê her dê were cih.
19. Birastî eva ha bîranîn û şîretek e, vêca kî bixwaze dê riyekê bigire ku wî bigihîne Xwedayê wî.
20. (Ya Muhemmed!) Bêguman Xwedayê te dizane ku tu ji sêyeka şevê nêzî du paran, (carinan) nîvê wê, (carinan jî) sêyeka wê radibî (nimêjê) û civatek ji

wan bawermendên ligel te jî (radibin). Xwedê ye yê ku şev û rojê teqdîr dike. Xwedê zaniye hûn nikarin tevekê şevê ibadetê bikin, vêca li ser we sivik kiriye. Êdî ji Quranê ya ku hûn bikarin (wê) bixwînin. Xwedê dizane ku dê ji nav we nexweş çêbin û yên din jî dê li ser erdê ji kerema Xwedê li risqê xwe bigerin û hinekî din jî dê di riya Xwedê de şer bikin. Nexwe ji Quranê ya ku hûn bikarin bixwînin, berdewamî nimêj bikin, zekata malê xwe bidin û di riya Xwedê de xêran bikin. Hûn ji xêrê çi li pêşiya xwe ji bo xwe bişînin axiretê, hûn ê li cem Xwedayê xwe çêtir û mezintirê wê bibînin. Lêborîna xwe ji Xwedê bixwazin. Birastî Xwedê gunehjêbir û dilovan e.

## 74. SÛREYÊ MUDDESSIR

Sûreyê Muddessir pêncî û şeş (56) ayet e. Li Mekkê daketiye û sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de bêjeya Muddessirderbas bûye û bi wateya “yê ku cil li xwe werdaye/cil bi ser xwe de kiriye.”

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Hey ê ku cil li xwe werdaye!
2. Rabe karê xwe bike, êdî hişyar bike.
3. Tenê Xwedayê xwe mezin bidêre.
4. Cilê xwe paqij bigire.
5. Ji pîsîyê xwe dûr bigire.
6. Bi niyeta ku zêdetir bê şûnê, minnetê neke.
7. Vêca ji bo Xwedayê xwe sebrê bikêşe.
8. Gava ku di sûrê de bê pifkirin…
9. Vêca ha ew roj, rojeke giran û dijwar e.
10. Ew li ser kafiran (qet jî) ne hêsan e.
11. Tu min û wî kesê ku Min ew bi tenê (bê mal û zarok) afirandiye, ji hev re bihêle.
12. Paşî min malekî pir dayê û min ew kire xwedanmilk…
13. Min kur danê ku her tim li ber wî hazir bûn…
14. Min jê re dinyadarî raxist…
15. Piştî vê hê jî hêvî dike ku ez (nîmetên xwe jê re) zêdetir bikim.
16. Naxêr! Bi rastî ew li dijî ayetên me rikdar e.
17. Ez ê wî di ezabekî de werkim ku nayê tehemulkirin.
18. Bi rastî ew fikirî û pîva.
19. Vêca xwedêkuşto çi fikirî û pîva!
20. Paşê xwedêkuşto çawa piva!

21. Piştre dîsa fikirî…
22. Paşê rûyê xwe tirş û tehl kir.
23. Paşê pişta xwe da heqiyê û xwe li serê mezin kir.
24. Êdî got: Ev (Quran) bes sêreke ku (ji sêrbazan) hatiye veguhastin.
25. Hebe nebe ev gotina mirovan e.
26. Ez ê wî biavêjim seqerê (agirê sincirî).
27. Ma kê te fêr kiriye ka seqer çî ye?
28. Ew (ji bedenê) ne tiştekî dihêle ne jî berdide.
29. Ew çermê însên diperitîne (û disoje).
30. Li ser seqerê nozdeh (zebaniyên notirvan) hene.
31. Me wezîfeya kar û barên dojehê tenê da melayîketan û Me hejmara wan (notirvanan) jî kire ceribandin da ku kitabî (cihû û filah) ji dil bawer bikin û da baweriya bawermendan jî zêdetir bibe, da xwedankitêb û bawermend (di hejmara wan de) nekevin gumanê û da ew kesên ku di dilên wan de nexweşî (nîfaq) heye û yên kafir bibêjin; mexseda Xwedê bi vê hejmarê çi ye? Ha wisa Xwedê kî bixwaze ji rê dixe û kî jî bixwaze tîne riya rast. Ji wî pê ve kes (bi hejmara) leşkerên wî nizane. Ev seqer (dojeh) ji bo mirovan tenê şîret û ders e.
32. Naxêr! Sond bi heyvê…
33. Sond bi şevê gava bi tarîtiya xwe ve diçe..
34. Sond bi spêdeyê gava bi ronahiya xwe ve tê…
35. Bi rastî ev cehenem yek ji belayên mezin e.
36. Ji bo însanan agahdarî ye.
37. Ji bo kesê ku bixwaze bi pêş ve here yan jî li paş bimîne.
38. Her nefs di gerewa kirinên xwe de ye.
39. Ji bilî kesên ku (deftera emelê wan) ji rexê wan ê rastê hatiye dayîn, ev cuda ne…
40. Di bihiştan de ji hev pirs dikin...
41. Ji rewşa gunehkaran…
42. Çi tiştî hûn xistine vî agirê sincirî?
43. Gunehkar dibêjin: Me nimêj nedikir.
44. Me xwarin nedida feqîr û belengazan.
45. Me jî wekî xelkê xwe noqî xeberdana dikir.
46. Me li dinyayê bawerî bi roja cezadanê nedianî.
47. Heta ku mirin bi ser me de hat.
48. Vêca mehderiya mehdervanan tu feydê nade wan.
49. Çi li wan qewimiye ku pişta xwe didine wê biranînê?
50. Tu dibêjî qey ew kerên kovî ne…

**51.** Ku ji şêr direvin.
**52.** Xwedêgiravî her yekî ji wan diviya ku ji bo wî rûpelên vekirî bihata.
**53.** Naxêr! Belkî ew ji axiretê natirsin,
**54.** Naxêr, Bi rastî ew bîranîn û hişyarî ye!
**55.** Kî bixwaze dê ji wê pend bigire.
**56.** Bes ê ku Xwedê ji bo wî viyabe dê şîretê jê wergire. Her Xwedê ye hêjayî parêzkariyê û hêjayî gunehjêbirinê.

## 75. SÛREYÊ QIYAMET

Sûreyê Qiyamet çil (40) ayet e. Li Mekeyê daketiye. Navê sûre ji ayeta pêşîn tê ku tê de peyva Qiyamet derbas bûye û bi maneya “xerabûna dinyayê” ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Sond bi roja qiyametê…
**2.** Sond bi nefsa lomekar.
**3.** Ma ji însên we ye ku em nikarin hestiyên wî li hev bicivînin?
**4.** Belê em dikarin movik û sertiliyên wî jî (mîna berê) durist bikin.
**5.** Lê belê însan dixwaze ku riya xerabiyê her li ber vekirî bimîne.
**6.** Yên kafir (ji tinaz ve) dipirsin: Ka roja qiyametê kengê ye?
**7.** Vêca gava çav şaş û zeloq dibin…
**8.** Heyv xera dibe…
**9.** Roj û heyv li hev tên komkirin!
**10.** (Ha) Wê rojê însan dê bibêje: Ma gelo cihê revê heye?
**11.** Na! Cihê revê tune ye!
**12.** Wê rojê veger tenê bi bal Xwedayê te ve ye.
**13.** Wê rojê ji însên re kar û kiryarên ku kirin dê bên gotin.
**14.** Êdî însan bi xwe şahidê ser nefsa xwe ye.
**15.** Çendî ew hênceta xwe bîne jî.
**16.** (Ya Muhemmed!) Ji bo bi lez tu wehyê wergirî, zimanê xwe nelivîne.
**17.** Bêguman li ser Me ye ku Em vê Quranê di sînga te de kom bikin û bi te bidin xwendin.
**18.** Nexwe gava (bi navgîna Cibraîl) Me Quran ji bo te xwend, tu xwendina wî bişopîne (û guhdariya wê bike).
**19.** Piştre teqez ravekirina wê jî li ser Me ye.
**20.** Naxêr, lê hûn li nîmetên dinyayê bilez in…

21. Hûn axiretê jî dihêlin.
22. Wê rojê, hin rû hene ku ronak û geş in…
23. Ew li Xwedayê xwe dinêrin.
24. Hin rû jî hene ku ew tirş û reben in.
25. Yeqîn dike ku sosretek dê bi ser de bê ku ew ê hestiyê pişta wî bişikîne.
26. Naxêr, çi gava ruh bigihîje hestiyê gewriyê…
27. Tê gotin: Ka kî heye ku dermanekî jê re bibîne?
28. Yeqîn kir ku mirina wî hat û destê wî ji mala wî qut dibe.
29. Û çaqên wî li hev aliyan (û nikarî tev bigere).
30. Ha wê rojê ber bi Xwedayê te ve dê bêne ajotin.
31. Vêca ne wî îman anî, ne jî nimêj kir.
32. Lê belê bawerî neanî û pişta xwe dayê.
33. Piştre bi quretî û devavêtin çû cem alîgirên xwe.
34. (Hey bêbawer!) Ezab li ser ezab ji bo te be.
35. Paşê ezab li ser ezab ji bo te be!
36. Ma ji însanî we ye ku dê wisa bimîne (û hesabê wî neyê dîtin)?
37. Ma ew ne ji dilopek ava meniyê ya ku di malzarokê de dihat rêtin çêbûye?
38. Paşê ew bûye parçeyek xwîna stûr, vêca Xwedê ew çêkir, durist kir û şekil û dirûv dayê.
39. Êdî ji wê mêr û jin çêkirin.
40. Erê ma ew Xwedayê ku hûn wisa çêkirin nikare miriyan jî dîsa sax bike?

## 76. SÛREYÊ ÎNSAN

Sûreyê Însan, sî û yek (31) ayet e. Li gorî hin rîwayetan li Mekkê û li gorî hin rîwayetên din jî lî Medîneyê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva însan derbas bûye û bi wateya "mirov" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. 1. Bi rastî di ser însên re, zemanekî dirêj derbas bû ku ew nebû û behsa wî nedihat kirin.
2. Bêguman Me însan ji dilopek avika tevlîhev afirand da ku em wî bi ceribînin, vêca me ew bi guh û çav kirin.
3. Me riya rast nîşan dayê, êdî yan dê şukirdar be yan jî dê nankor be.
4. Bêguman Me ji bo kafiran zincîr û qeyd û agirekî bipêt amade kiriye.

5. Bi rastî mirovê qenc, ên bawermend dê ji meykaseyeke ku kafûr tevlî wê bûye vexwin.
6. (Ev av) kaniyeke wisa ye ku xwedênas (bendeyên Xwedê) jê vedixwin û devera bixwazin bi wê ve diherikînin.
7. (Ew bend e), nezr û peymanên xwe tînin cih û ji rojeke wisa ditirsin ku kes ji şerê wê veder nîn e.
8. Ew xwarina ku pêdiviya wan pê heye û jê hez dikin didin feqîr û sêwî û dîlan (êsîran).
9. (Ji wan re dibêjin:) Em tenê ji bo rizaya Xwedê xwarinê didin we, em ji we tu perûyekê û tu spasiyekê naxwazin.
10. Lewra em ji Xwedayê xwe ditirsin da ku di rojeke giran û tehl de me biparêze.
11. Vêca ji ber qenciya wan, Xwedê ew ji ezabê wê rojê parastin, rûgeşî û dilşadî dan ser wan.
12. Xwedê, li beramberî sebra wan bi bihiştê û bi lixwekirina hevrîşim ew xelat kirin.
13. Di cenetê de li ser textan paldayî ne, tê de, ne germê dibînin ne jî sermayê.
14. Siya (dar û barê) cenetê nêzîkî wan e, fêkî û mêweyên wan daran ji wan re berdest in.
15. (Xizmetkar) bi kaseyên zîvî û qedehên camî li ber wan digerînin…
16. Şûşeyên ji zîv, wan bi pîvan dadigirin.
17. Ew, tê de ji meyeke wisa têne avdayîn ku zencefîl tevî wê bûye.
18. Ev şerab di bihişte de kaniyeke wisa ye ku jê re “Selsebil” tê gotin.
19. Xizmetkarên law û her ciwan li ber xizmeta wan digerin, dema tu wan dibînî tu dibêjî qey ew sedefên belavbûyî ne.
20. Dema tu lê dinêrî tu li wir dibînî ku milkekî mezin û xweşiyeke berfireh heye.
21. Ji hevrîşmê tenik û stûr cilên bi xeml û kesk li ser wan in, bazinên zîvî di destên wan de û Xwedayê wan dê ji şerabeke paqij wan av bide.
22. (Xwedê ji wan re dibêje:) Bi rastî ha ev mukafata xebata we ye û me xebata we qebûl kir.
23. (Ya Muhemmed!) Bi rastî Me Quran li pey hev û hin bi hin ji te re hinart.
24. Nexwe li ser gihandina hukmê Xwedayê xwe sebrê bikêşe û bi gotina tu gunehkarî yan jî tu bêbawerî meke.
25. Sibeh û êvarê navê Xwedayê xwe di bîr bîne.
26. Di beşeke şevê de ji Xwedê re nimêj bike, di beşa şevê ya dirêj de Rebbê xwe ji her kêmasiyê pak bidêre.
27. Ev bêbawer û muşrik ji dinyayê gelek hez dikin û rojeke giran li pişt xwe dihêlin.

**28.** Bes Me ew ji tuneyî çêkirin û me çêkirina wan bi hev ve muhkem kir. Gava em bixwazin jî em ê hinekên ji wan çêtir bînin şûna wan.

**29.** Bêguman ev (Quran) şîret û bîranîn e. Vêca kî bixwaze dê bi bal Xwedayê xwe ve (ji xwe re) riyekê bigire.

**30.** Bêyî vîna (xwestina) Xwedê, hûn nikarin karekî bivên. Bêguman Xwedê zana û karbinecih e.

**31.** Xweda kî bivê dixe nav rehmeta xwe û herçî ku zalim in, Xwedê ji bo wan ezabekî dijwar amade kiriye.

## 77. SÛREYÊ MURSELAT

Sûreyê Murselat, pêncî (50) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Murselat derbas bûye û bi wateya "şande û qasidan" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Sond bi wan ên li pey hev tên şandin…

**2.** Vêca bi wan ên dijwar ku her tiştî tarûmar dikin…

**3.** Bi wan ên ku heqiyê belav dikin…

**4.** Bi wan ên ku ji hev veqetînin…

**5.** Bi wan ên ku bîranînê tînin…

**6.** Ji bo ku xelkê hêncetbir bikin an jî wan bitirsînin…

**7.** Bi rastî ew qiyameta ku peymana wê ji we re hatiye dayîn, teqez dê bê!

**8.** Vêca dema stêr rijiyan û şewqa wan nema…

**9.** Dema ku asîman qul bibe û biqelişe…

**10.** Dema çiya ji bin ve rabûn û belawela bibin…

**11.** Dema ji qasidan re wext hat tayînkirin (êdî qiyamet rabûye).

**12.** Ji bo kîjan rojê (qasid) hatine bipaşvexistin?

**13.** Ji bo roja ji hev veqetandinê.

**14.** Ma kê tu hînkirî ka roja jihevcudakirinê çî ye!

**15.** Wê rojê xwelî li serê derewdêran be!

**16.** Erê ma me pêşiyên wan gunehkaran helak nekirin?

**17.** Piştre ma me gunehkarên piştî wan jî li pey wan nebirin.

**18.** Ha wisa em bi serê gunehkaran tînin!

**19.** Wê rojê xwelî li serê derewdêran be!

**20.** Ma me hûn ji aveke weza (bêqîmet) neafirandin?

**21.** Vêca me ew av di cihekî mikûm de bi cih kir (ku malzarok e).

**22.** Heta demeke diyarkirî.
**23.** Vêca em li ser çêkirin û şekildayîna wê qadir bûn, êdî em çi xweş qadir in!
**24.** Wê rojê xwelî li serê derewdêran be!
**25.** Erê ma Me erd negerand cihê vehewandinê?
**26.** Yên zindî li ser xwe radigire û yên mirî di nav xwe de vedişêre.
**27.** Me li erdê çiyayên cihgirtî û bilind afirandin û me aveke şîrîn û xweş daye we.
**28.** Wê rojê xwelî li serê derewdêran be!
**29.** (Wê rojê ji wan re tê gotin:) De ber bi wî ezabê ve herin ew ê ku we pê bawer nedikir û we derew dizanî!
**30.** Ber bi siyeke xwedî sê çiql ve herin…
**31.** Ew li ser we ne dibe sî û sîwan, ne jî we ji pêtê dojehê diparêze.
**32.** Ew dojeh çîkên mezin wekî avahiyan diavêje.
**33.** Çîkên dojehê didin pey hev tu dibêjî ew deveyên zer in.
**34.** Wê rojê xwelî li serê derewdêran be!
**35.** Ew rojeke ku ji kesî re axaftin nîn e.
**36.** Destûr jî ji wan re nayê dayîn vêca ku mehna xwe (uzrê xwe) bibêjin.
**37.** Wê rojê, xwelî li serê derewdêran be!
**38.** Ha ev roj, roja ji hev veqetandinê ye û Me hûn û yên beriya we li hev civandin.
**39.** Vêca eger fend û plana we heye (ji bo hûn ji ezab rizgar bibin) bînin.
**40.** Wê rojê, xwelî li serê derewdêran be!
**41.** Bêguman ên teqwadar li binê siyan û li serê kaniyan in.
**42.** Di (nava) mêweyên ku dilê wan dibijiyê de.
**43.** Ji ber wan kar û kiryarên we kirine; bixwin, vexwin û ji we re noşican be.
**44.** Ha em, qencîkarên rast û durist wisa xelat dikin.
**45.** Wê rojê, xwelî li serê derewdêran be!
**46.** (Gelî bêbaweran!) Di dinyayê de bixwin, hinekî xweş bijîn! Bi rastî hûn sûcdar û gunehkar in.
**47.** Wê rojê, xwelî li serê derewdêran be!
**48.** Gava ji wan re dihate gotin nimêj bikin, nimêj nedikirin.
**49.** Wê rojê, xwelî li serê derewdêran be!
**50.** Erê ma piştî Quranê dê bi kîjan gotinê bawerî bînin?!

# 78. SÛREYÊ NEBE

Sûreyê Nebe çil (40) ayet e û li Mekkê daketiye. Navê sûre ji ayeta 2'em hatiye ku tê de peyva En-Nebe derbas bûye û bi ma'neya "agahî û xeber" e. Hin navên vî Sûreyî yên din jî ev in: Tesaul (jihevpirsîn) û Emme.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Ew pirsa çi ji hev dikin?
**2.** Pirsa xebera (bûyera) mezin ji hev dikin.
**3.** Ya ku der barê wê de dudil in (hin bawerî pê tînin, hin jî wê mandele dikin).
**4.** Na; bila dudilî nebin, ew ê bizanin!
**5.** Nexêr, ne mîna wan e; paşê ew ê bizanin (dema heqîqet bi çavê serê xwe dîtin)!
**6.** Ma me erd ranexistiye?!
**7.** Ma Me çiya jî (di erdê de) nekirine sing?!
**8.** Ma me hûn cot (mê û nêr) neafirandine?!
**9.** Ma me xewa we ne kiriye bêhnberdan?!
**10.** Ma me şev nekiriye cil (û star)?!
**11.** Ma me ro jî ne kiriye çaxê kar?!
**12.** Ma me di ser we re heft qat (asîmanên) mikûm ava nekirine?!
**13.** Ma me çirayeke geş û germ çênekiriye?!
**14.** Ma me ji ewrên avbarkirî, baraneke pir nebarandiye?!
**15.** Ji bo Em bi wê, tene û giya hêşîn bikin.
**16.** Baxçeyên têrdêlî (darên fêkî) derxin.
**17.** Bêguman roja jihevcudakirinê (ya qenc û neqencan) li pêşiya her kesî ye, teqez dê bê.
**18.** Roja ku di sûrê de were pifkirin, vêca hûn ê pêl bi pêl ber heşrê ve bên.
**19.** Wê rojê, asîman vedibin û dibin dergeh.
**20.** Çiya dihejin û dibin leylan (serab).
**21.** Birastî wê rojê cehehem li hêviya bêbaweran e.
**22.** Domahîk û vehewîngeh e ji bo serxweveçûyan.
**23.** Ku her û her tê de dimînin.
**24.** Tê de, ne hênikatî û ne jî vexwarina sar naçêjin.
**25.** Ji bilî ava kelijî, kêm û zoxê pê ve (ew tiştekî dî tehm nakin).
**26.** Ev ceza li gorî kar û kiryarên wan e.
**27.** Birastî wan hesabê axretê hêvî nedikir (û wan bawer nedikir ku heye).
**28.** Wan bawerî bi ayetên me nedianîn (û digotin ew derew in).

**29.** Me her tişt bi nivîsandinê qeyd kiriye.
**30.** (Ji wan re dê bê gotin:) De ezab biçêjin! Vêca ji ezab pê ve Em ê tiştekî din li we zêde nekin!
**31.** Bêguman ji mutteqiyan re felat û serfirazî heye.
**32.** Bostan û rezên tirî…
**33.** Horiyên nûgihayî, hevsalî û yekdest…
**34.** Kaseyên tijî mey (hene).
**35.** Ew li bihiştê, ne kelevajiyekê ne jî li hemberî hev dereweke dibihîzin.
**36.** Ew ji Xwedayê te mukafat û diyariyeke di cihê xwe de ye.
**37.** Xwedayê erd û asîmanan û yên di navbera wan de Xwedayê Reḥman e. (Wê rojê) tu kes nikare (ji bo rakirina ezab) pê re bipeyive.
**38.** Roja ku ruh (li ser cesedan) hazir dibin û melayîket bi rêz sef digirin, ji bilî yê ku Xwedayê rehman destûra wî bide, kes nikare biaxive û ew ê rastiyê bibêje.
**39.** Ha ew e roja heq. Piştî vê kî bivê dê riyekê bigire ku wî bigihîne Xwedayê wî.
**40.** Bêguman me hûn ji ezabekî nêzîk hişyar kir. Ew roja ku her kes kar û kiryarên xwe dibîne û yê kafir dibêje: Xwezî ez ax û xwelî bûma!

## 79. SÛREYÊ NAZÎ‘AT

Sûreyê Nazî‘at çil û şeş (46) ayet e. Li Mekkê daketiye û navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Nazî‘at derbas bûye û bi ma‘neya “canstînên bi dijwarî” ne.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Bi wan ên ku bi dijwarî dikişînin…
**2.** Bi wan ên ku bi hêsanî distînin…
**3.** Bi wan ên ku li ber fermanê amade ne…
**4.** Vêca bi bi lez û bez, bi hev re pêşbaziyê dikin…
**5.** Bi wan ên ku kar û bar bi rê ve dibin, sond be…
**6.** Roja ku her tiştî dihejîne.
**7.** Yeka din jî li pey wê tê.
**8.** Di wê rojê hin dil, bitirs û lerzok in…
**9.** Çavên wan melûl û perîşan in.
**10.** Dibêjin: Ma piştî mirinê qey em ê li halê xwe yê pêşî vegerin?
**11.** Ma gava ku em bibin hestiyên riziyayî û ji hev belav bibin jî (em ê sax bibin)?
**12.** Ji tinaz ve gotin; vêca (eger wisa be) ew ji bo me dê bibe vegereke bi ziyan!
**13.** Belkî ew bes qîreke bitenê ye.

14. Ha piştî wê qîrê di cih de însan dê xwe li ser erdê dibînin.
15. Ma gelo (serpêhatiya) Mûsa ji te re nehatiye ragihandin?
16. Wê dema ku Xwedayê wî li newala pîroz, li Tuwayê gazî wî kir (û jê re got:)
17. Here bal Firewn! Bi rastî ew (di zilmê de) pir ji ser xwe ve çûye.
18. Bibêje: Ma te divê tu xwe paqij bikî?
19. Ez ê berê te bidime bal Rebbê te ve, da tu bitirsî.
20. Di wê navê de Mûsa mucîzeya herî mezin nîşanî Firewn da.
21. Firewn jê bawer nekir û bêemriya Xwedê kir.
22. Piştre Firewn pişt da heqiyê û isyanî kir.
23. Firewn xelk li xwe kom kir û bang hildêra…
24. Ji wan re got: Ez Xwedayê we yê herî bilind im!
25. Xwedê jî ew bi ezabê axiret û dinyayê ceza kir.
26. Bêguman di vê (serpêhatiya Firewn) de ji bo kesê ku ji Xwedê ditirse, îbret heye.
27. Erê ma saxkirina we ya piştî mirinê zehmettir e yan çêkirina asîmanan? Digel ku Xwedê asîman jî çêkiriye…
28. Banê wî (bêstûn) bilind kir, vêca bi hostayî ew sererast û tekûz kir.
29. Şeva wî tarî û roja wî ronî kiriye.
30. Piştî hingê erd (mîna hêkê) durist û xweş kir.
31. Ji erdê, ava wê û çêreya wê derxist.
32. Çiya jî (tê de) mikûm û qehîm kirin.
33. Da ku hûn hemû bi terşên xwe ve jê feydê wergirin.
34. Vêca gava ew karesata (qiyameta) mezintirîn hat…
35. Wê rojê însan dê ya ku kiriye di bîra xwe bîne.
36. Cehenem ji yên ku dibînin re (çi mumîn çi kafir) diyar dibe.
37. Vêca ew ê ku (bi kafirbûnê) serxweve çûbe…
38. Jiyana dinyayê di ser (nîmetên) axiretê re girtibe…
39. Bêguman dojeh vehewîngeha wî ye.
40. Herçî ku ji mezinahî û rabûna ber (destê) Xwedayê xwe tirsiyabe û nefsa xwe ji hewesên wê dabe paş…
41. Bêşik vehewîngeha wî Cennet e.
42. Ew, pirsa qiyametê ji te dikin ka kengê dê rabe?
43. Ma tu çi jê dizanî heta ku pirsa wê ji te dikin!
44. Birastî zanîna wê bes li ba Xwedayê te ye.
45. Bes tu wî kesê ku ji qiyametê ditirse hişyar dikî.
46. Roja ku ew qiyametê dibînin, hizir dikin ku ew ji êvarê yan jî ji danê sibehê pêvetir (li dinyayê) nemane.

# 80. SÛREYÊ ‘EBESE

Sûreyê ‘Ebese çil û du (42) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva ‘Ebese derbas bûye û bi maneya ku rûyê xwe tirş kirîye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Rûyê xwe tirş kir û berê xwe jê guherand.
2. Dema yê kor (Abdullah bin Mektûm) hate cem.
3. Ma tu çi dizanî ka halê wî çî ye? Dibe ku ew xwe (ji gunehan) paqij bike.
4. Yan jî ew şîretê wergire, vêca ew şîret feydê bide wî!
5. Herçî ew ê ku xwe ne hewce dîtiye…
6. Tu pê ve dimînî û wî bernadî.
7. Eger ew bawerî neyîne tu jê ne berpirs î. Bes a te ragihandin e.
8. Lê belê ew kesê ku ji dil tê cem te…
9. Ji Xwedê jî ditirse…
10. Tu wî ji bîr dikî (û bi yê dî ve dimînî).
11. Naxêr (careke din wisa meke)! Birastî ev (Quran) şîret e.
12. Vêca kî bixwaze wê jê şîret bigire.
13. Ew di rûpelên pîroz de ne.
14. Bilind û paqij in.
15. Di destên qasidên nivîskar…
16. Ên birûmet û qencîkar de ne.
17. Bimre însan, ma ew çiqas nankor e.
18. Ma Xwedê ew ji çi afirandiye?
19. Ew ji dilopek av afirandiye, dirûv û pîvan dayê.
20. Piştre, jê re rê hêsan kiriye.
21. Piştre, ew mirandiye û di gorê de ew veşartiye.
22. Piştre, gava ku Xwedê bixwaze dê wî sax bike.
23. Naxêr! Însan hê jî ya ku Xwedê emrê wî pê kiriye neaniye cih.
24. Bila însan li xwarina xwe binêre;
25. Me av ji ewran barand.
26. Piştre me erd bi şînkatiyê qelaşt.
27. Me lib û tene jê derxist.
28. Tirî û zerzewat.
29. Zeytûn û xurme.

30. Dehlên (bostanên) têrdêlî.
31. Fêkî û mêrg jî.
32. Ji bo ku ji we û terşên we re bibe aborî û çêre.
33. Vêca gava qîrîn (a qiyametê) hat…
34. Roja ku mirov ji birayê xwe…
35. Ji dayik û bavê xwe…
36. Ji hevjîn û zarokên xwe, direve.
37. Wê rojê, ji her yekî ji wan re halekî wî heye ku wî meşxûl bike.
38. Wê rojê, hin rû hene ku geş in.
39. Devliken û kêfxweş in.
40. Wê rojê, hin rû jî hene ku tozê ew girtine.
41. Reştariyê ew nixumandine.
42. Ha ew in kafirên gunehkar.

## 81. SÛREYÊ TEKWÎR

Sûreyê Tekwîr, bîst û neh (29) ayet e. Li Mekkê daketiye û navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Kuwwîret derbas bûye û bi ma'neya "pêçan" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Dema roj tê pêçan û ronahiya wê diçe.
2. Dema stêr vemirin û hilweşin.
3. Dema çiya bêne hejandin, hûrhûr û berba bibin.
4. Dema deveyên avis bêne avêtin û bêxwedî bimînin.
5. Dema (heywanên) kovî li hev bêne civandin.
6. Dema derya bêne sincirandin û fûrandin…
7. Dema can û beden bigihin hev.
8. Dema ji keça ku bi saxî hatiye binaxkirin bê pirsîn:
9. Ka ew "bi çi sûcî hatiye kuştin?"
10. Dema ku defterên emelan bêne belavkirin.
11. Dema ku asîman ji cihê xwe diçin.
12. Dema ku cehenem tê pêxistin.
13. Gava ku cenet tê nêzîkkirin.
14. (Wê çaxê) Her kes dê bizane ka çi ji bo xwe amade kiriye û çi biriye (axiretê).
15. Naxêr! Sond bi wan stêrên ku bi şev xuya û bi roj winda dibin..

16. Ew ên ku di rêgeha xwe de digerin û bi şev diçirisin.
17. Sond bi şevê, dema (bi tarîtiya xwe) ronahiyê radike.
18. Bi sibehê, dema bi ronahiya xwe ve tê.
19. Bi rastî ev (Quran) gotina qasidekî birêz û birûmet e…
20. Xwedanhêz e, li cem Xwedanê Erş xwedî cih û qedirbilind e.
21. Melayîket jê re guhdar in, paşê li cem xwedê jî emîn e.
22. Nexwe hevalê we (Muhemmed) ne dîn e.
23. Sond be, wî Cibraîl li asoyê diyar û aşkera ew dîtiye.
24. Ew der barê wehyê de ne bexîl e.
25. Ew ne gotina şeytanekî qewitî ye.
26. Nexwe hûn bi ku ve diçin!
27. Ew ji mirovan re her şîret û ronahî ye…
28. Ji nav we bo kesê ku bixwaze xwe rast û durist bike.
29. Heta ew Xwedayê ku perwerdekarê alemê ye nexwaze hûn nikarin bixwazin.

## 82. SÛREYÊ ÎNFÎTAR

Sûreyê Înfîtar nozdeh (19) ayet e û li Mekkê daketiye. Navê sûre ji ayeta pêşîn hatiye ku tê de peyva Înfîtar derbas bûye û ma‘neya wê “terikîn û derizîn” e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Dema ku asîman biqelişe…
2. Dema ku stêr ji hev belavbibin…
3. Dema ku derya biteqin û têkilî hev bibin…
4. Dema ku gor serûbinî hev bibin…
5. Hingê, her kes dê bizane ka çi li pêşiya xwe şandiye û çi li dûv xwe hiştiye.
6. Hey Mirov! Çi tiştî tu li hemberî Xwedayê te yê xwedankerem xapandiye?
7. Ew Xwedayê ku bêkêmasî, rast û durist tu çêkirî.
8. Di kîjan awayî de xwestiye (wisa) tu aniye ber hev.
9. Naxêr! Birastî hûn bi roja cezadanê bawerî nayînin.
10. Birastî hin melayîket li ser nivisîna kar û kiryarên we zêrevan in.
11. Ew melayîketên xwedanrêz û birûmet in, her tiştê win dikin dinivîsin.
12. Ew, a ku hûn dikin dizanin û dinivîsin.
13. Birastî mirovên çak û xwedênas di nava nîmetan de ne.
14. Bêguman neqenc jî di nava dojehê de ne.

15. Ew, roja cezadanê dikevin cehenemê.
16. Bi tu riyekê jê rizgar nabin û nikarin jê birevin.
17. Ma tu ji ku dizanî ku roja cezadanê çi ye?
18. Dîsa ma tu ji ku dizanî ku roja cezadanê çi ye?
19. Ew roj a ku tu kes nikare ji tu kesî re tiştekî bike. Wê rojê ferman her a Xwedayê mezin e.

## 83. SÛREYÊ MUTEFFIFÎN

Sûreyê Mutteffifîn sî û şeş (36) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Muteffifîn derbas bûye û bi vê wateyê ye "yên ku di kêşîn û pîvanê de hîle û sextekariyê dikin."

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Hey wax li halê wan kêşandiz û pîvandizan be…
2. Ew ên ku dema ji xelkê bi pîvan û kêşan werdigirin bi temamî werdigirin…
3. Dema bi kêşan û pîvan difiroşin kêm dipîvin û kêm dikêşin.
4. Ma yeqîn nakin ku ew piştî mirinê (ji bo hesabê kirinên xwe) dê bi rastî bêne vejandin?
5. Ji bo rojeke mezin (ku roja qiyametê ye).
6. Roja ku hemû mirov li ber Xwedayê alemê û fermana wî radiwestin.
7. Nexêr, wisa nekin! Birastî tomarkirina bedkar û gunehkaran di sicinê de ye.
8. Ma tu ji ku dizanî ka siccîn (cihê tomara dojehiyan) çi ye?
9. Ew, tomargeheke bi nav û hejmar e (navê herkesî li ser cihê wî nivisî ye).
10. Wê rojê, wax li halê bêbawer û bedkaran be!
11. Ew ên ku bi roja cezadanê bawerî nayînin.
12. Her ê sitemkar û gunehkar bi roja cezadanê bawerî neyîne.
13. Ew ê ku gava ayetên me jê re tên xwendin, dibêje: ev „çîrok û çîvanokên pêşiyan e."
14. Naxêr, ne wisan e! Belkî xerabî û gunehên wan dilê wan perde kiriye.
15. Na; bi rastî wê rojê ew ji Xwedayê xwe bêpar û mehrûm in.
16. Paşê, ew ê herin dojehê.
17. Paşê, melayîket û dergehvan ji wan re dibêjin: Ha ev e, ew (ezabê) ku we pê bawerî nedianî.
18. Dev ji van berde; birastî nivisîna (navê) xweşmirov û qencan di 'Îlliyînê' de ye.
19. Ma tu ji ku dizanî ka Îlliyîn çi ye?
20. Ew lenivisîneke bi nav û hejmar e (navê herkesî li ser cihê wî nivisî ye).

21. Melayîketên li cem Xwedê birûmet dê şahdeyiyê jê re bidin.
22. Birastî yên qenc, di (nava) nîmet (ên cenetê) de ne.
23. Ew (li bihiştê) li ser textan (li xêra ku Xwedê ji bo wan berhevkiriye) temaşe dikin.
24. Tu di rûyên wan de xweşiya nîmetan dibînî.
25. Ew ji meyeke safî ya devgirtî têne avdayîn.
26. Dumahiya vexwarina wê tehma miskê dide. Ha di vê de bila pêşbaz pêşbaziyê bikin.
27. Ya tevlî wê meyê dibe ava tesnîmê ye.
28. Tesnîm, kaniyeke wisan e ku yên li cem Xwedê birûmet jê vedixwin.
29. Birastî li dinyayê yên sûcker bi bawermendan dikenîn.
30. Gava ku bawermend di ber wan re derbas dibûn, ji hev re bi çavan ew nîşan didan (û bi wan tinaz dikirin).
31. Dema vedigeriyan nav ehlê xwe bi kêf û laqirdî vedigeriyan.
32. Dema ku kafiran bawermend didîtin, digotin: Birastî ev ên ha ji rê derketine.
33. Hal ev e ku kafir, li ser bawermendan bi zêrevanî nehatine şandin.
34. Ha îro (roja qiyametê) bawermend bi kafiran dikenin.
35. Bawermend li ser textan (li rewşa kafiran) temaşe dikin..
36. (Da bizanin:) Ka gelo kafir li ser ya ku kirin hatin cizadan?

## 84. SÛREYÊ ÎNŞÎQAQ

Sûreyê Inşiqaq bîst û pênc (25) ayet e. Li Mekkê daketiye. Navê sûre ji ayeta pêşîn hatiye ku tê de peyva Inşeqqet derbas bûye û bi ma'neya "terk û derz" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Dema ku asîman biqelişe…
2. (Asîman) guhdariya fermana Xwedayê xwe kir û heq bû ku ew guhdarîya wî bike.
3. Dema ku erd dirêj û rast bibe û…
4. Yên ku di nav xwe de biavêje û xwe vala bike.
5. (Erdê) guhdariya fermana Xwedayê xwe kir û heq bû ku ew guhdarîya wî bike
6. Hey însan! Birastî tu di jiyana xwe de heyanî tu biçe hizûra Xwedayê xwe di ber kar de (çi xêr çi şer) xwe diwestînê, vêca tu yê bigihîjî karê xwe.
7. Herçî ku kitêba kiryarên wî ji rexê wî yê rastê ve bê dayîn…
8. Ew ê hesabekî sehl û hêsan bibîne.

9. Ew ê bi kêfxweşî li malbata xwe vegere.
10. Herçî ku kitêba kiryarên wî ji pişt wî ve were dayîn…
11. Ew ê hingê mirina xwe bixwaze.
12. Ew ê bikeve agirê bipêt.
13. Ew, (berê) di nav malbata xwe de dilxweş û şad bû.
14. Ji wî we ye ku ew ê neçe ber destê Xwedayê xwe.
15. Ne wisan e. Teqez Xwedayê wî li ser hemû kar û kiryarên wî agahdar e.
16. Bi soratiya rojavabûnê sond be…
17. Bi şevê û ya ku di xwe de berhev kiriye…
18. Bi heyva çardeh şevî (sond be), ku…
19. Hûn (gelî mirovan!) dê ji rewşekî bikevin rewşeke din de.
20. Ma çi ji wan bûye ku ew bawerî nayînin?
21. Dema Quran ji wan re tê xwendin guhdarî nakin û naçin sicûdê?
22. Ji bilî ku naçin sicûdê; ew ên ku kafir in Quranê derew jî didêrin.
23. Hal ev e Xwedê bi ya ku ew di dilê xwe de vedişêrin bêhtir dizane.
24. Mizgîniya ezabekî dijwar bide wan!
25. Lê belê ew ên ku bawerî anîn û karên qenc kirin ne tê de; ji wan re perûyeke bêqutbûn heye.

## 85. SÛREYÊ BURÛC

Sûreyê Burûc bîst û du (22) ayet e û li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Burûc bihuriye û bi ma‘neya "bircan û çerxan" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Sond bi asîmanê ku xwedan birc in.
2. Sond bi roja ku peymana wê hatiye dayîn (ku ew roja qiyametê ye).
3. Sond bi wan ên ku şahdeyiyê didin û yên ku şahdeyî ji bo wan jî tê dayîn, ku…
4. Xwedanê xendek û koncalan lenet li wan hatiye barandin.
5. Ew koncalên ji agirê xwedanpêt.
6. Wê dema ew li dorê (li ser kursiyan) rûniştî…
7. Wan li işkenceya ku bi bawermendan dikirin temaşe dikirin.
8. Wan ew didan ezabê ji ber ku wan bawerî bi Xwedayê ‘Ezîz ê ‘Elîm anîbû.
9. Ew Xwedayê ku desthilatiya erd û esmanan her jê re ye, agahdarê bi her tiştî ye.

10. Bêguman ew ên ku li mêr û jinên bawermend şkence kirine û paşê tobe jî nekirin, vêca ji bo wan ezabê cehnemê û ezabê bişewat heye.
11. Bêguman ew ên ku îman anîn û karên qenc kirin, ji wan re bihiştên wisa hene ku di binê wan de çem diherikin. Ha ev serkeftin û rizgariya mezin e.
12. Bêguman higavtina Xwedayê te pir dijwar e.
13. Bêguman Xwedê ew e, yê ku ji tuneyî diafirînê, piştî mirinê sax dike.
14. Her ew, gunehjêbir û bendedost e.
15. Ew, xwedanê Erş e û payebilind e.
16. Xwedê çi bixwaze teqez wê dike.
17. Erê ma xebera serpêhatiya leşkeran ji te re nehatiye?
18. Leşkerên Firewn û Semûd.
19. Belê ew ên ku kafir in, hê jî li ser bêbaweriya xwe ne.
20. Xwedê hay ji wan heye, dê wan jî mîna leşkerê Firewn û Semûd têk bibe (ji ber Xwedê mecala revê jî tune).
21. Bi rastî ew (a ku bawerî pê nedianî) Qurana Mecîd e (pîroz û qedirbilind e).
22. (Ew Quran) di Lewhul Mehfûzê de parastî ye.

## 86. SÛREYÊ TARIQ

Sûreyê Tariq 17 (hivdeh) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Et-Tariq derbas bûye û bi ma‘neya “stêra tarîdirîn û ronîker” e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Sond bi asîman û tariqî…
2. Ma tu ji ku dizanî ka tariq çi ye?
3. Ew, stêra tarîdirîn û ronîker e.
4. Tu kes nîn e ku li ser wî çavdêr tune bin.
5. Bila însan binêre ka ji çi hatiye afirandin!
6. Însan ji aveke verêtok hatiye xulqandin.
7. Ew av (menî) ji nava hestiyê pişta mêran û hestiyê sînga jinan derdikeve.
8. Bêguman piştî mirinê Xwedê li ser saxkirina wî xwedanhêz e.
9. Wê roja ku nehênî (raz û sir) aşkera dibin.
10. Ji însan re (ji bilî Xwedê) ne hêzek heye (ku nehêle bikeve ezab) ne jî arîkarek heye.
11. Bi ewrên ku buxarê digerîne av û li ser erdê dibarîne…

12. Bi erda xwedanqelşok (ku baran dadirijê ser û şênkatî wê diqelêşe) sond be, ku…
13. Birastî ev (Qur'an) gotineke jihevqetîn û cudaker e.
14. Ev Quran rastî ye; ne leyîstok e.
15. Birastî kafir (bi çêkirina fend û fêlan) dehfekê vedidin.
16. Ez jî dehfekê li ber wan vedidim (pilana wan pûç dikim paşê wan ceza dikim).
17. Vêca muhletê bide wan, hinekî muhletê bide wan!

## 87. SÛREYÊ E'LA

Sûreyê E'la 19 (nozdeh) ayet e. Li Mekkê daketiye û navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva El-E'la derbas bûye û bi ma'neya "bilind" e ku ew jî wesfek ji yên Xwedê Teala ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Navê Xwedayê xwe yê herî bilind pak bidêre.
2. Ew Xwedayê ku (mexlûq) afirandine, vêca bêkêmasî şekil û teşe daye wan.
3. Ew Xwedayê ku her tişt bi pîvan çêkiriye, vêca rê nîşan dayê.
4. Ew ê ku ji erdê çêreya hêşîn deraniye.
5. Vêca stewand û kire pûşekî hişkereş.
6. Em ê bi te (Qur'anê) bidin xwendin vêca tu yê wê ji bîr nekî…
7. Ji bilî ya ku Xwedê bivê (ku tu jibîr bikê). Bi rastî jî Xwedê bi (gotina) aşkera û ya bi dizî dizane.
8. Em ê te bi ser riya hêsan ve bikin.
9. Vêca tu (bi Quranê însanan) şîret bike, hema te dît ku şîret feydeyê bide wan.
10. Kesê ku ji Xwedê ditirse dê şîretê wergire.
11. Kesê ku neqenc be dê xwe ji wa'zê dûr bike.
12. (Neqenc) Ew ê ku dikeve agirê herî mezin.
13. Paşê ew di cehenemê de, ne dimire ne jî sax dibe (her û her di ezabê dijwar de dimîne).
14. Bêguman ew ê ku xwe (ji gunehan) paqij bike…
15. Navê Rebbê xwe di bîr bîne û nimêj bike serfiraz bûye.
16. Lêbelê hûn jiyana dinyayê (di ser ya axiretê re) digirin û çêtir dibînin.
17. Rewş ev e, jiyana axiretê çêtir û daîmtir e.
18. Bêguman ev her di kitêbên pêşîn de ne…
19. (Ku ew) di suhûfên Îbrahîm û Mûsa de ne.

# 88. SÛREYÊ XAŞIYE

Sûreyê Xaşiye 26 (bîst û şeş) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva El-Xaşiye derbas bûye û bi ma‘neya “niximînker” e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Erê ma xebera roja qiyametê a ku herkesî digre ji te re nehat?
2. Wê rojê hin ser û çav bitirs û rezîl in.
3. Ew dibin karekî zehmet de ji xwe de ketine.
4. Wê rojê dikevin agirekî pir germ.
5. Ji kaniyeke kelijî têne avdan.
6. Ji striyê genî û tehl pê ve ji wan re xwarin tune.
7. Ew jî ne (wan) qelew dike ne jî birçîbûna wan dibe.
8. Wê rojê hin ser û çav hene ku geş û mehdxweş in.
9. Ji kar û xebata xwe razî ne.
10. Di ceneteke bilind de ne…
11. Tê de kelevajî û gotina pûç nabihîzin…
12. Kaniyên ku li herk in …
13. Textên qîmetbilind…
14. Qedehên (ji bona avê) amadekirî…
15. Palgehên rêzkirî…
16. Mexfûrên raxistî, tê de ne.
17. Ma însan li deveyê nanêrin ka çawa hatiye afirandin?!
18. Ma li asîman namêzînin ka çawa (bêstûn) hatiye bilindkirin?
19. Ma li çiyan namêzînin ka çawa (di erdê de) hatine çikandin?
20. Ma li erdê nanêrin ka çawa hatiye raxistin?
21. Vêca (bi ayetên Xwedê) şîret bike, bi rastî tu her şîretkar î.
22. Tu li ser wan ne zordar î.
23. Bes ew kesê ku piştа xwe bide îmanê û kafir bibe…
24. Vêca Xwedê dê bi ezabê herî mezin wî bide ezabdayin.
25. Bêguman vegera wan her bi bal me ve ye.
26. Piştre hesabdîtina wan jî bêguman li ser Me ye.

# 89. SÛREYÊ FECIR

Sûreyê Fecir sî (30) ayet e û li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva El-Fecr derbas bûye û bi ma'neya "spêde" yan jî "spêdeya her rojê" ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Sond bi spêdê…

**2.** Bi deh şevan (deh şevên meha zilhiccê yan deh şevê meha Remezanê..)…

**3.** Bi cot û ferê (bi maxlûq û xaliqî)…

**4.** Bi şevê gava ku diçe…

**5.** Erê ma ev ji bo aqilmendan ne hêjayî sondê ne?

**6.** Ma tu nizanî ka Xwedayê te çi bi serê gelê Ad anîye?

**7.** Îrema xwedan stûnên bilind…

**8.** Ya ku li tu welatan ên wekî wan (mikûm) nehatiye çêkirin.

**9.** Ma te zanî ka Xwedayê te çi bi serê Semûd de aniye, ew ên ku di newalan de zinar kolane û birîne (da ku bi wan avahiyan lê bikin)…

**10.** Ma ka çi bi serê Firewnê xwedî leşker aniye, ew leşkerên ku bi zend û hêz bûn.

**11.** Ew ên ku li welatên xwe çavsorî û zêdegavî dikirin…

**12.** Vêca tê de gelek tevdan û bêşermî kirin.

**13.** Xwedayê te ezab û nexweşiyeke dijwar bi serê wan de anî.

**14.** Birastî Xwedayê te, her dem li ber (wan) veketî ye (û çavdêr e).

**15.** Herçî însan e, gava perwerdegarê wî, wî biceribîne, vêca qenciyê lê bike û pêxweşbûnekê bidê, dibêje: Xwedayê min, bi min re kerem kiriye.

**16.** Dema ku wî biceribîne; vêca rizqê wî teng bike, dibêje: Xwedayê min, ez rezîl û riswa kirim.

**17.** Naxêr, ne wisan e; belkî hûn birastî der heqê sêwiyan de qenciyê nakin.

**18.** Hûn hev di ber arîkariya belengazan re ranakin…

**19.** Hûn ji mîratê heqê xelkê dixwin.

**20.** Hûn gelek hez ji maldariyê dikin.

**21.** Naxêr, wisa mekin! Gava ku erd li pey hev diheje (û parçe parçe dibe û diherife).

**22.** Dema Xwedayê te hat û firîşte rêz bi rêz sef girtin.

**23.** Wê rojê dojeh tê ber çavan, wê rojê însan (kirinên xwe yeko yeko) di bîra xwe tîne. Lê belê ma çi feydeya vê bibîranînê jê re heye?

**24.** (Ha wê çaxê însan) dê bibêje: Xwezî min ji bo jiyana xwe (ya axiretê) xêrek li pêşiya xwe şandibûya.

**25.** Wê rojê tu kes nikare mîna ezabê Xwedê ezab bide.

26. Tu kes nikare mina qeyda ku Xwedê (kafiran pê) qeyd dike, qeyd bike.
27. (Wê rojê dê bê gotin:) Hey nefsa bibawer û ewle, nefsa piştrast û hedinî!
28. Qayilbûyî û qaîlkirî li Xwedayê xwe vegere.
29 . Vêca têkeve nav bendeyên min…
30. Têkeve ceneta min!

## 90. SÛREYÊ BELED

Sûreyê Beled bîst (20) ayet e. Li Mekkê daketiye û navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva El-Beled derbas bûye ku bi ma‘neya “bajar” e. Daxwaz jê bajarê Mekkê ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Sond bi vî bajarî (ku Mekke ye).
2. Ku tu jî akincî yî di vî bajarî de.
3. Sond bi her bav û zarokên wî.
4. Birastî Me însan di nav meşeqet û tengasiyan de afirand.
5. Ma însan hizir dike ku tu kes nikaribe bi wî?
6. Dibêje: Min malekî pir xerc kiriye.
7. Ma ew hizir dike ku kesekî ew nedîtiye?
8. Ma me du çav nedanê?
9. Zimanek û du lêv jî?
10. Ma Me her du rê (heq û batil) nîşanî wî nedane?
11. De ka bila ji Wê Eqebê (astengiyê) derbas bibe.
12. Ma tu ji ku dizanî ka ew Eqebe çi ye?
13. Azadkirina koleyekî ye…
14. Yan nandayînek e di roja dilaxêv de…
15. Yan jî xwarindayîna sêwiyekî lêzim e.
16. Yan jî, ji bo belengazekî destteng ê li erdêmayî.
17. Piştî van lazim e xwedî bawer be û qewîtiya bêhnfirehiyê û qewîtiya merhemetê li hev bikin.
18. Ha ev in yên dilxweş û bextewar.
19. Ew ên ku ayetên me mandel kirine û bawerî bi wan neanîne, ew yên bextreş û dilnexweş in.
20. Ew di nav agirekî dadayî de, ji her aliyî ve agir li wan tê daxistin.

## 91. SÛREYÊ ŞEMS

Sûreyê Şems pazdeh (15) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Eş-Şems derbas bûye û bi ma'neya "roj" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Sond bi rojê û ronahiya wê…
2. Bi heyvê dema li pey rojê dertê…
3. Bi royê dema bi rojê ronî dibe…
4. Bi şevê gava ku tavê diniximîne (û dipêçe)…
5. Bi asîman û yê ku ew ava kiriye…
6. Bi erdê û yê ku ew raxistiye…
7. Bi nefsê û bi yê ku şekil û durûv dayê…
8. Vêca sirûşa (îlhama) neqencî û teqwayê nîşan dayê…
9. Birastî yê nefsa xwe ji gunehan paqij kir ew serfiraz bûye.
10. Kesê ku nefsa xwe bi gunehan rezîl û kêm kiribe ew xesiriye.
11. Gelê Semûd ji ber çavsorî û zêdegaviya di gunehan de bi pêxemberê xwe bawerî neanî.
12. Dema ji wan yê herî xeddar (ji bo deveyê bikuje) bi lez rabû…
13. Vêca pêxemberê Xwedê ji wan re got: Hay ji deveya Xwedê û ava wê hebin!
14. Vêca wan bawerî pê neanî û deve şerjê kirin. Êdî Xwedayê wan bi sedema gunehên wan, ezab bi ser wan de anî; bi yek carê ew birne helakê.
15. Ji encama vê ezabdayînê jî Ew natirse.

## 92. SÛREYÊ LEYL

Sûreyê Leyl bîst û yek (21) ayet e û li Mekkê daketiye. Navê sûre ji ayeta pêşîn hatiye ku tê de El-Leyl derbas bûye û bi ma'neya "şev" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Bi şevê dema bi tarîtiya xwe erdê dinixumîne…
2. Bi rojê gava ronî dibe…
3. Bi Xwedayê ku nêr û mê afirandine, sond be…
4. Bi rastî kar û xebata we ji hev cuda ye.
5. Vêca herçî ku (malê xwe di riya Xwedê de) da û hay ji fermanên Xwedê ma…

6. Bawerî bi cennetê anî û jê re xebat kir…
7. Êdî em ê jî riya wî ji bo karê baş sehl bikin.
8. Herçî ku çikûsî bike û xwe hewceyî Xwedê nebîne…
9. Bawerî bi cennetê neyîne û jê re xebat neke…
10. Vêca em ê jî riya wî ji bo karê nebaş sehl bikin.
11. Gava ku bimire, yan jî ew bikeve êgir de, malê wî dê tu feydê nedê wî.
12. Bi rastî li ser me ye rênîşandayîn.
13. Bêguman her tiştê li axiretê û li dinyayê yê me ye û bi destê me ye.
14. Vêca me hûn ji agirekî gurî û geş hişyar kir.
15. Tenê yê rêwinda û kafir diçê tê de.
16. Ew ê ku bi rastiyê bawerî neaniye û pişt daye îmanê.
17. Mutteqî dê ji wî agirî dûr bibe.
18. Ew ê ku malê xwe di riya Xwedê de xerc dike; dixwaze ku ji gunehan paqij bibe.
19. Ew malê xwe dide ne ku qenciya yekî li serê ye vêca wî padaş dike…
20. Her ji bo rizaya Xwedayê xwe yî herî bilind e.
21. Paşê ew ê bi xelata Xwedê qayîl û dilxweş bibe.

## 93. SÛREYÊ DUHA

Sûreyê Ed-Duha yazdeh (11) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Ed-Duha derbas bûye û bi ma‘neya “danê tavê” ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Bi danê sibehê; dema roj tîrêjên xwe berdide ser erdê sond be…
2. Bi şevê, gava aram û tarî dibe…
3. Xwedayê te dev ji te bernedaye û ji te nexeyidiye jî.
4. Axiret ji bo te ji dinyayê çêtir e.
5. Xwedayê te dê bide te û tu dê razî bibî.
6. Ma tu ne sêwî bûy vêca Xwedê tu vehewandî?
7. Ma tu neheyirî bûy êdî Xwedê tu rasterê kirî?
8. Ma tu ne xizan bûy Xwedê tu dewlemend kirî?
9. Vêca herçî ku yê sêwî ye, tu wî neêşîne û riswa meke.
10. Herçî yê parsek e jî tu wî neqewirîne.
11. Tu her behsa qencî û kerema Xwedayê xwe bike û pê biaxive.

## 94. SÛREYÊ ÎNŞÎRAH

Sûreyê Şerh heşt (8) ayet e. Li Mekkê daketiye û navê sûre ji ayeta pêşîn hatiye ku tê de peyva Eş-Şerh derbas bûye û bi ma‘neya “firehkirin” e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Erê ma Me sînga te (ji bo ahkamên dîn) venekir?
2. Ma Me barê te li ser te sivik nekir?
3. Ew barê ku pişta te xistibû ber te.
4. Ma Me nav û dengê te bilind nekir?
5. Vêca birastî digel her tengasiyê firehî heye.
6. Birastî digel her tengasiyê firehî heye.
7. Nexwe dema ku tu (ji karekî) vala bûyî, dest bi karekî din bike.
8. Bila perwerdegarê te jî daxwaza te bê.

## 95. SÛREYÊ TÎN

Sûreyê Tîn, heşt (8) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Et-Tîn derbas bûye û bi ma‘neya “hejîr” e, yan jî navê çiyayekî ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Sond bi hejîr û zeytûnê…
2. Bi Çiyayê Tûrî Sîna.
3. Bi vî bajarê ewle…
4. Bi rastî jî Me însan di şeklê herî rind û tekûz de afirandiye.
5. Paşê me ew gerandiye nizmtirînê nizman.
6. Ji bilî yên bawerî anîn û emelê salih kirin, vêca ji wan re perûyeke bêqutbûn heye.
7. Êdî (hey însan!) ew çi ye ku piştî vê yekê te ji roja cezadanê bêbawer dike?
8. Erê, ma Xweda ne mikûmtirîn fermanrewa ye.

# 96. SÛREYÊ ‘ELEQ

Sûreyê ‘Eleq nozdeh (19) ayet e. Li Mekkê daketiye. Navê sûre ji ayeta 2’em tê ku tê de peyva Eleq derbas bûye û bi ma‘neya “xwîna hişk” e. Navekî din ê vî sûreyî jî „Iqra“ ye ku ew jî bi maneya „bixwîne“ ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

**1.** Bi navê Xwedayê xwe yî ku (her tiş wî) afirandiye bixwîne!

**2.** Însan ji (parçeyek) xwîna hişk afirandiye.

**3.** Bixwîne! Xwedayê te her xwediyê kerema pir e.

**4.** Ew Xwedayê ku bi riya qelemê mirov perwerde kiriye.

**5.** Însan fêrî ya ku nizanê kiriye.

**6.** Naxêr, birastî însan ji rê derdikeve…

**7.** Dema xwe maldar û nehewce dibîne.

**8.** Bêguman veger her bi bal Xwedayê te ve ye.

**9.** Erê ma te nedît ew ê ku riya nimêjê digire..

**10.** Li ber evdekî dema dixwaze nimêj bike.

Şîrove

Ev ayet der barê Ebû Cehil de hatine xwarê. Lewra gava ku Pêxember nimêj dikir dev diavête wî.

**11.** De ka bêje; eger ew (ê tê astengkirin) ku di riya rast de be…

**12.** Yan jî daxwaza teqwadariyê dike!

**13.** Ka bêje min; eger ew (astengker) bi rastiyê bawerî nayîne û pişta xwe dide îmanê?

**14.** Erê ma ew nizane ku Xwedê wî dibîne!

**15.** Nexêr; bila wisa neke, sond be; eger ew ji ya ku dibêje û ya ku dike venegere, di cih de em ê bi perçema wî bigirin.

**16.** Perçemek e derewker a gunehkar.

**17.** Vêca bila gazî heval û civata xwe bike.

**18.** Em jî dê gazî zebaniyan (zêrevanê cehenemê) bikin.

**19.** Na, bi ya wî meke. Ji Xwedayê xwe re here sicûdê û xwe nêzî Wî bike!

## 97. SÛREYÊ QEDR

Sûreyê Qedr, pênc (5) ayet e. Li Mekkê daketiye û navê sûre ji ayeta 1'em, 2'yem û 3'yem hatiye ku di wan de peyva El-Qedr derbas bûye û behsa şeva qedra pîroz dike ku qedr jî bi ma'neya "diyarkirin û binavkirin" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Bêguman Me ew (Quran) di Leyletu'l-Qedrê de hinartiye.
2. Ma kê te fêrkiriye heta ti zanibe ka Leyletu'l-Qedir çi ye?
3. Şeva Qedrê ji hezar heyvî bixêrtir e.
4. Di wê şevê de, melayîket û Ruh (Cibrîl) bi destûra Xwedayê xwe, der barê her kar û barî de têne ser erdê.
5. Ew şev selametî û aramî ye. Heyanî spêdeyê berdewam e

## 98. SÛREYÊ BEYYÎNE

Sûreyê Beyyîne, heşt (8) ayet e. Li Medînê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de bêjeya "El-Beyyîne derbas bûye û bi ma'neya "delîl û pêbaweriya aşkera" ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Ji ehlîkitêb (fileh û cihû) û muşrikan ew ên ku kafir bûne dev ji wan nehate berdan û ew di rewşa ew tê de nehatin hêlan heyani ku rênîşanderek ji wan re hat.
2. Ew (rênîşander) pêxemberekî ji cem Xwedê ve ye ku ji wan re rûpelên pîroz dixwîne.
3. Fermanên binirx û rastgo di wan rûpelan de ne.
4. Ew ên ku ehlikitêb in, bes piştî ku delîla aşkera ji wan re hat, ketin îxtilafê.
5. Ew bes hatibûn fermankirin ku ew îbadetê Xwedê bikin, di dînê Xwedê de dilbaş û dilsoj bin, berê xwe ji her baweriya pûç vegerînin û berê xwe bidin riya Xwedê, bi awayê pêdivî nimêj bikin û zekata malê xwe bidin. Ha ev e dînê rast û durist.
6. Birastî ew ên ku bawerî neanîn ji ehlê kitêb û muşrikan, ew dê biçin agirê dojehê û dê her û her tê de bimînin. Ha ew pîstirînê mexlûqan in.
7. Bi rastî yên ku bawerî anîn û karên qenc kirin, ew çêtirînê mexlûqan in.
8. Mukafata wan li cem Xwedayê wan bihiştên Ednê ne ku di binê wan de çem dikişin û heta hetayê ew dê di wan de bin. Xwedê ji wan razî bûye û ew jî jê razî bûne. Ev perû ji bo wî kesî ye ku ji Xwedayê xwe ditirse.

## 99. SÛREYÊ ZELZELE

Sûreyê Zelzele, heşt (8) ayet e. Li Medîneyê daketiye û nav ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Zelzele derbas bûye û bi maneya "erdhej" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Dema erd bi heja xwe ya taybetî biheje…
2. Dema erd çiqas tiştên di zikê xwe de derîne ser xwe…
3. Dema însan jî bibêje: Çi lê hatiye ku diheje!
4. Ha wê rojê, erd dê hemû xeberên xwe ragihîne û bibêje.
5. Ku Xwedayê te bi wehyê wisa ferman lê kiriye ku her tiştî ragihîne û bibêje.
6. Wê rojê, însan ref bi ref (ji goran) radibin da ku (encama) kirinên xwe bibînin.
7. Kî ku bi qasî giraniya zereyekê qencî kiribe dê wê bibîne.
8. Kî jî bi qasî giraniya zereyekê neqencî kiribe dê wê bibîne.

## 100. SÛREYÊ ‘ADIYAT

Sûreyê ‘Adiyat, yazdeh (11) ayet e û li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de bêjeya El-A’diyat boriye û bi ma‘neya "bezokên bixurexur" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Sond bi ên ku di riya Xwedê de bi hilke hilk baz didin…
2. Bi ên ku bi xwe çirûskan dertînin…
3. Bi ên ku di sibehê de ji nişka ve êrîş dikin…
4. Vêca toz û dûmanê berhewa dikin…
5. Bi wê tozê dikevin nava koma…
6. Birastî însan li hemberî Xwedayê xwe pir nankor e.
7. Bêguman ew bi xwe jî li ser vê (nankoriyê) şahid e.
8. Bêguman ew, pir pir ji maldariyê hez dike.
9. Erê ma ew nizane gava miriyên di goran de sax dibin û radibin...
10. Ya ku di sîng û dilan de veşartî jî aşkera dibe…
11. Bi rastî wê rojê haya Xwedayê wan, ji wan heye!

## 101. SÛREYÊ QARÎ'E

Sûreyê Qarî'e yazdeh (11) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre, navê xwe ji ayetên 1'em, 2'yem û 3'yem girtiye ku di wan de bêjeya El-Qarî'e derbas bûye û bi ma'neya "derîreqîn" e. Daxwaz jê ew qiyamet e ku dilan direqîne.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. El-Qarî'e, roja ji gohkirinê..
2. Roja ji guhkirinê çi ye?
3. Ma kê te fêr kiriye heta tu zanibê ka roja ji guhkirinê çi ye?
4. Ew roj e ku însan dibin wekî perperîkên şerpeze û ji hev belavbûyî…
5. Çiya jî dibin wekî hiriya jendî!
6. Vêca ew kesê ku teraziya wî giran be…
7. Êdî ew ê di nava jiyaneke jêrazî û rihet de be.
8. Herçî kesê ku teraziya wî sivik be…
9. Vêca cihê wî hawiye ye.
10. Ma tu ji ku dizanî ka hawiye çi ye?
11. Agirekî cansoj û dijwar e!

## 102. SÛREYÊ TEKASUR

Sûreyê Tekasur heşt (8) ayet e û li Mekkê daketiye. Navê sûre ji ayeta pêşîn tê ku tê de peyva Et-Tekasur derbas bûye û ma'neya wê "bi pirbûnê pesndayîn" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Pirkirina maldarî û nefsan we meşxûl kir ji erka we ya girîng.[1]
2. Bi vê rewşê heta ku hûn çûn seredana goristanan jî.
3. Naxêr; wisa mekin; paşê hûn ê bizanin!
4. Disa naxêr; paşê hûn ê bizanin!
5. Na; ne weke hûn hizir dikin; eger we bi yeqînî zanîbûya (we dê xwe ji bîr ve nekiribûya)!
6. Sond be; hûn ê cehenemê bibînin!
7. Dîsa sond be; hûn ê bi çavên xwe rast û durist wê bibînin.
8. Paşê wê rojê hûn ê ji nîmet û xweşiyên li ser xwe bêne pirsyarkirin!

1 Malkomkirin û maldariya dinyayê, kubarî û pozbilindî ya bi pirbûna zarok û mêran, hûn ji îbadetê Xwedê ji bîr ve kirin.

## 103. SÛREYÊ ‘ESIR

Sûreyê ‘Esir, sê (3) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva ‘Esir derbas bûye û bi ma‘neya “sedsal, çax, berêvar û nimêja berêvarê” ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḩman ê Reḩîm***

1. Bi demê (an jî, bi dema ‘Esrê) sond be!
2. Bi rastî mirov hemû di ziyanê de ne.
3. Ji bilî yên ku bawerî anîn û karên qenc kirin û li ser heqî û sebrê hev şîret kirin.

## 104. SÛREYÊ HUMEZE

Sûreyê Humeze, neh (9) ayet e. Li Mekkê daketiye û nav ji ayeta pêşîn tê ku tê de peyva Humeze dibihure û bi ma‘neya “seb, tinazkirin û rencîdekirin û şermezarkirin” e.

***Bi Navê Xwedayê Reḩman ê Reḩîm***

1. Wax li halê çiqas kesê tanavêj û eybderêx be.
2. Ew ê ku (mal û) serwetê kom dike û dihejmêre!
3. Ji wî we ye ku serweta wî (li dinyayê) dê wî her û her bihêle (û wî bike nemir).
4. Naxêr, bila wê hizrê neke! Birastî ew ê di hutemeyê de bê werkirin.
5. Erê ma tu çi dizanî ka huteme çi ye?
6. Agirê Xwedê yê pêketî ye.
7. Ew agirê ku ser dilan digire.
8. Bi rastî ew agir li ser wan girtî û dadayî ye.
9. Bi stûnên dirêjkirî ve girêdayî ne.

## 105. SÛREYÊ FÎL

Sûreyê Fîl pênc (5) ayet e û li Mekkê daketiye. Navê sûre ji ayeta pêşîn hatiye ku tê de peyva Fîl derbas bûye ku ew jî heywanekî naskirî ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḩman ê Reḩîm***

1. Ka ji min re bêje: Ma tu dizanî Xwedayê te çi bi serê Eshabu’l-Fîl anî?
2. Ma Wî fen û fûtê wan berhewa û pûç nekir?
3. Ma teyrên ebabîl bi ser wan de ref bi ref neşand?

4. Wan, kevirên ji heriya pehtî di wan werkirin.
5. Vêca wekî gihayê cûtî ku ketiye bin piya li wan kirin.[1]

## 106. SÛREYÊ QUREYŞ

Sûreyê Qureyş çar (4) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre, navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Qureyş derbas bûye û ew navê êla Pêxemberê alîcenab e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Bi sedema hogirî û sehilkirina bazirganiyê bi qureyşiyan;
2. Hogirî û sehlkirina bazirganiya zivistan û havînê.
3. Vêca bila qureyşî, xwedayê vê malê (ku Ke'be ye) bihebînin.
4. Ew Xwedayê ku ew ji birçîbûnê têr kirine û ji tirsê ewle kirine.

## 107. SÛREYÊ MA'ÛN

Sûreyê Ma'ûn heft (7) ayet e û li Mekkê daketiye. Nav ji ayeta heftem tê ku tê de bêjeya Ma'ûn boriye û bi wateya "arîkarî, zekatdayîn û sedeqedayîn, feydedayîn" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Ji min re bêje: te dît ew ê ku bi roja cezadanê bawerî nayînî?
2. Ha ew e ku yê sêwî bi dilhişkî dide paş (merhemetê lê nake).
3. Li ser nandayîn û têrkirina belengazan kesî diber ranake.
4. Wax li halê nimêjkeran be…
5. Ew nimêjkerên ku haya wan ji nimêja wan nîn e.
6. Ew ên ku zerqekariyê (riyakariyê) dikin.
7. Riya qedandinê jî li ber hewcedaran digirin.

1 Xwedî û hevalbendên fîl waliyê Yemenê Ebrehe ye ku li Sen'ayê dêrek çêkiribû ji bo ku xelk di şûna Ke'beyê de herin serdana wê. Zilamekî Kenanî bi şev çûbû tê de rîtibû. Ji lew re Ebrehe sond xwar ku Ke'beyê wêran bike û bi çend fîlan berê xwe dabû Mekkê. Çi gava ku wan berê xwe da Ke'beyê, Xwedê Teala ref bi ref berê çivîkan da wan û wekî ku ayetan îfade kiriye, ew birine helakê. Bi ragihandina vî sûreyî pûtperest hişyar kirine ku encama neyarên Xwedê Teala û muqeddesatan, ne xêr e.

## 108. SÛREYÊ KEWSER

Sûreyê Kewser sê (3) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Kewser derbas bûye û bi ma'neya "xêra pir, li cenetê çemek, hewzek" e. Pêxembertî, Quran û şefaet e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. (Resûlê min) Bi rastî me kewser (xêra pir) daye te.
2. Vêca ji Rebbê xwe re nimêj bike û ji bo Wî şerjê bike.
3. Bi rastî yê ku ji te dikeribe û hez ji te nake, ew e yê warkor û bêdunde.

## 109. SÛREYÊ KAFÎRÛN

Sûreyê Kafîrûn şeş (6) ayet e û li Mekkê daketiye. Navê sûre ji ayeta pêşîn tê ku tê de peyva Kafîrûn dibihure, pirjimara "kafir" e ku bi ma'neya "Xwedênenas, heqîveşêr, dînbetal û gawiran" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Bibêje: Hey gelî kafiran!
2. Ew ên ku hûn îbadetê wan dikin ez îbadetê wan nakim.
3. Ew ê ku ez îbadetê Wî dikim hûn jî îbadetê Wî nakin.
4. Ez bi xwe dê nebim îbadetkerê yê ku hûn îbadetê wî dikin.
5. Hûn bi xwe jî dê nebin îbadetkerê wî yê ku ez îbadetê Wî dikim.
6. Dînê we ji we re û dînê min jî ji min re ye.

## 110. SÛREYÊ NESR

Sûreyê Nesr sê (3) ayet e. Li Medîneyê daketiye. Sûre, navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de peyva Nesr derbas bûye û bi ma'neya "arîkarî" ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Dema arîkarîya Xwedê û serkevtin ji bo te hat.
2. Te jî dît ku mirov kom bi kom dikevine dînê Xwedê de.
3. Vêca hingê ḥemdê Xwedayê xwe bike, ji her kêmasiyê pak bidêre û daxwaza lêborîna xwe jê bike. Birastî jî ew, pir tobepejrên e.

## 111. SÛREYÊ TEBBET

Sûreyê Tebbet pênc (5) ayet e. Li Mekkê daketiye navê sûre ji ayeta pêşîn tê ku tê de peyva Tebbet boriye û bi ma'neya "ziyan kiriye, şeht bûye" ye, ku ew jî nifir û beduayî ye. Hin navên dîtir ên sûre ev in: Mesed û Leheb.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Dest û lepê Ebû Leheb şeht bibin ku xêrê ji xwe nebîne û xêr ji xwe ne dît jî.
2. Serwet û qazanca ku kirî tu feyde nedayê.
3. Ew ê bikeve agirekî bipêt.
4. Jina wî jî barhilgira daran e (daran davêje ser agirê mêrê xwe).
5. Werîsekî lihevhûnayî di stûyê wê de ye.

## 112. SÛREYÊ IXLAS

Sûreyê Ixlas çar (4) ayet e û li Mekkê daketiye. Navê sûre ji naveroka sûre tê ku behsa bîr û baweriya yekdêrînê, tewhîdê dike.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm!***

1. Bibêje: Xwedê her yek e, tek e.
2. Her Xwedê ye bergeha hewcedaran.
3. Kes jê çênebûye û ew jî ji kesî çênebûye.
4. Tu hemkûf û hevta jî jê re tun in.

Semed; hewcehiya Wî bi tiştekî tune ye û her tişt hewceyî Wî ye.

## 113. SÛREYÊ FELEQ

Sûreyê Feleq pênc (5) ayet e. Li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayeta pêşîn girtiye ku tê de bêjeya El-Feleq derbas bûye û bi ma'neya "sibeh û beyanî" ye.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Bibêje: Ez bi Xwedayê spêdeyê (şeveqê) xwe diparêzim.
2. Ji xerabî û neqenciya her afirandiyekî…
3. Ji zerar û neqenciya şevê gava bi tekûzî tarî dibe…
4. Ji neqenciya sêrebendan dema di girêkan de pif dikin…
5. Ji neqenciya kesê çavnebar gava çavnebariyê dike.

# 114. SÛREYÊ NAS

Sûreyê Nas şeş (6) ayet e. Li Medîneyê daketiye. Lê belê li gorî hin rîwayetên din jî li Mekkê daketiye. Sûre navê xwe ji ayetên 1'em, 2'em, 3'yem, 5'em û 6'em girtiye ku di wan de peyva Nas derbas bûye û bi ma'neya "mirov" e.

***Bi Navê Xwedayê Reḥman ê Reḥîm***

1. Bibêje: Ez bi Perwerdegarê mirovan xwe diparêzim…
2. Padîşah û serwerê mirovan…
3. Xwedayê mirovan…
4. Ji neqenciya (şeytan)ê tasawasker ê xwe nependî dike…
5. Ew ê ku şubhe û tasewasê dixe dilên mirovan…
6. Ji şeytanên cinî û şeytanên insî.

## NAVÊ SÛREYAN LI GORÎ RÊZA WAN A DI QUR'ANÊ DE


| Rêza Sûreyan | Navê Sûreyan | Jimara Ayetan | Jimara Rûpelan |
|---|---|---|---|
| 1 | SÛREYÊ FATÎHÊ | 7 | 4 |
| 2 | SÛREYÊ BEQERE | 286 | 5 |
| 3 | SÛREYÊ ALÎ ÎMRAN | 200 | 35 |
| 4 | SÛREYÊ NÎSA | 176 | 51 |
| 5 | SÛREYÊ MAÎDE | 120 | 69 |
| 6 | SÛREYÊ EN'AM | 165 | 82 |
| 7 | SÛREYÊ E'RAF | 206 | 96 |
| 8 | SÛREYÊ ENFAL | 75 | 112 |
| 9 | SÛREYÊ TEWBE | 129 | 119 |
| 10 | SÛREYÊ YÛNUS | 109 | 132 |
| 11 | SÛREYÊ HÛD | 123 | 140 |
| 12 | SÛREYÊ YÛSUF | 111 | 149 |
| 13 | SÛREYÊ RE'D | 43 | 158 |
| 14 | SÛREYÊ ÎBRAHÎM | 52 | 162 |
| 15 | SÛREYÊ HICR | 99 | 166 |
| 16 | SÛREYÊ NEHL | 128 | 170 |
| 17 | SÛREYÊ ÎSRA | 111 | 179 |
| 18 | SÛREYÊ KEHF | 110 | 186 |
| 19 | SÛREYÊ MERYEM | 98 | 194 |
| 20 | SÛREYÊ TA-HA | 135 | 200 |
| 21 | SÛREYÊ ENBIYA | 112 | 207 |
| 22 | SÛREYÊ HECC | 78 | 213 |
| 23 | SÛREYÊ MU'MÎNÛN | 118 | 220 |
| 24 | SÛREYÊ NÛR | 64 | 225 |
| 25 | SÛREYÊ FURQAN | 77 | 232 |
| 26 | SÛREYÊ ŞU'ERA | 227 | 237 |
| 27 | SÛREYÊ NEML | 93 | 245 |
| 28 | SÛREYÊ QESES | 88 | 251 |
| 29 | SÛREYÊ ENKEBÛT | 69 | 257 |
| 30 | SÛREYÊ RÛM | 60 | 262 |
| 31 | SÛREYÊ LOQMAN | 34 | 266 |
| 32 | SÛREYÊ SECDE | 30 | 269 |
| 33 | SÛREYÊ EHZAB | 73 | 271 |
| 34 | SÛREYÊ SEBE | 54 | 277 |
| 35 | SÛREYÊ FATIR | 45 | 281 |
| 36 | SÛREYÊ YASÎN | 83 | 285 |
| 37 | SÛREYÊ SAFFAT | 182 | 289 |
| 38 | SÛREYÊ SAD | 88 | 295 |
| 39 | SÛREYÊ ZUMER | 75 | 299 |
| 40 | SÛREYÊ XAFIR | 85 | 305 |
| 41 | SÛREYÊ FUSSÎLET | 54 | 311 |
| 42 | SÛREYÊ ŞÛRA | 53 | 315 |
| 43 | SÛREYÊ ZUXRUF | 89 | 319 |
| 44 | SÛREYÊ DÛXAN | 59 | 323 |
| 45 | SÛREYÊ CASIYE | 37 | 326 |
| 46 | SÛREYÊ EHQAF | 35 | 328 |
| 47 | SÛREYÊ MUHEMMED | 38 | 331 |
| 48 | SÛREYÊ EL-FETIH | 29 | 334 |
| 49 | SÛREYÊ HUCURAT | 18 | 336 |
| 50 | SUREYÊ QAFF | 45 | 338 |
| 51 | SUREYÊ ZARIYAT | 60 | 340 |
| 52 | SUREYÊ ET-TÛR | 49 | 342 |
| 53 | SUREYÊ EN-NECIM | 62 | 345 |
| 54 | SÛREYÊ QEMER | 55 | 347 |
| 55 | SÛREYÊ ER- REHMAN | 78 | 349 |
| 56 | SÛREYÊ EL-WAQÎE | 96 | 352 |
| 57 | SÛREYÊ EL-HEDÎD | 29 | 355 |
| 58 | SÛREYÊ MUCADELE | 22 | 358 |
| 59 | SÛREYÊ HEŞIR | 24 | 360 |
| 60 | SÛREYÊ MUMTEHÎNE | 13 | 362 |
| 61 | SÛREYÊ SEFF | 14 | 364 |
| 62 | SÛREYÊ CUMU'E | 11 | 365 |
| 63 | SÛREYÊ MUNAFÎQÛN | 11 | 366 |
| 64 | SÛREYÊ TEXABUN | 18 | 367 |
| 65 | SÛREYÊ TELAQ | 12 | 368 |
| 66 | SÛREYÊ TEHRÎM | 12 | 370 |
| 67 | SÛREYÊ MULK | 30 | 371 |
| 68 | SÛREYÊ QELEM | 52 | 373 |
| 69 | SÛREYÊ HAQQE | 52 | 375 |
| 70 | SÛREYÊ ME'ARIC | 44 | 377 |
| 71 | SÛREYÊ NÛH | 28 | 379 |
| 72 | SÛREYÊ CIN | 28 | 380 |
| 73 | SÛREYÊ MUZZEMMIL | 20 | 382 |
| 74 | SÛREYÊ MUDDESSIR | 56 | 383 |
| 75 | SÛREYÊ QIYAMET | 40 | 385 |
| 76 | SÛREYÊ ÎNSAN | 31 | 386 |
| 77 | SÛREYÊ MURSELAT | 50 | 388 |
| 78 | SÛREYÊ NEBE | 40 | 390 |
| 79 | SÛREYÊ NAZÎ'AT | 46 | 391 |
| 80 | SÛREYÊ 'EBESE | 42 | 393 |
| 81 | SÛREYÊ TEKWÎR | 29 | 394 |
| 82 | SÛREYÊ INFÎTAR | 19 | 395 |
| 83 | SÛREYÊ MUTEFFIFÎN | 36 | 396 |
| 84 | SÛREYÊ ÎNŞÎQAQ | 25 | 397 |
| 85 | SÛREYÊ BURÛC | 22 | 398 |
| 86 | SÛREYÊ TARIQ | 17 | 399 |
| 87 | SÛREYÊ E'LA | 19 | 400 |
| 88 | SÛREYÊ XAŞIYE | 26 | 401 |
| 89 | SÛREYÊ FECIR | 30 | 402 |
| 90 | SÛREYÊ BELED | 20 | 403 |
| 91 | SÛREYÊ ŞEMS | 15 | 404 |
| 92 | SÛREYÊ LEYL | 21 | 404 |
| 93 | SÛREYÊ DUHA | 11 | 405 |
| 94 | SÛREYÊ ÎNŞÎRAH | 8 | 406 |
| 95 | SÛREYÊ TÎN | 8 | 406 |
| 96 | SÛREYÊ 'ELEQ | 19 | 407 |
| 97 | SÛREYÊ QEDR | 5 | 408 |
| 98 | SÛREYÊ BEYYÎNE | 8 | 408 |
| 99 | SÛREYÊ ZELZELE | 8 | 409 |
| 100 | SÛREYÊ 'ADIYAT | 11 | 409 |
| 101 | SÛREYÊ QARÎ'E | 11 | 410 |
| 102 | SÛREYÊ TEKASUR | 8 | 410 |
| 103 | SÛREYÊ 'ESIR | 3 | 411 |
| 104 | SÛREYÊ HUMEZE | 9 | 411 |
| 105 | SÛREYÊ FÎL | 5 | 411 |
| 106 | SÛREYÊ QUREYŞ | 4 | 412 |
| 107 | SÛREYÊ MA'ÛN | 7 | 412 |
| 108 | SÛREYÊ KEWSER | 3 | 413 |
| 109 | SÛREYÊ KAFÎRÛN | 6 | 413 |
| 110 | SÛREYÊ NESR | 3 | 413 |
| 111 | SÛREYÊ TEBBET | 5 | 414 |
| 112 | SÛREYÊ IXLAS | 4 | 414 |
| 113 | SÛREYÊ EL-FELEQ | 5 | 414 |
| 114 | SÛREYÊ NAS | 6 | 415 |

# FIHRISTA SÛREYÊN QUR'ANÊ Bİ GOR RÊZA ELÎFBAYÎ

| Navên Sûreyan | Jimareya Sûreyan | Jimara Ayetan |
|---|---|---|
| – A – | | |
| 'ADIYAT | 100 | 11 |
| ALÎ ÎMRAN (*) | 3 | 200 |
| – B – | | |
| BELED | 90 | 20 |
| BEQERE (*) | 2 | 286 |
| BEYYÎNE (*) | 98 | 8 |
| BURÛC | 85 | 22 |
| – C – | | |
| CASIYE | 45 | 37 |
| CIN | 72 | 28 |
| CUMU'E (*) | 62 | 11 |
| – D – | | |
| DUHA | 93 | 11 |
| DÛXAN | 44 | 59 |
| – E – | | |
| E'LA | 87 | 19 |
| E'RAF | 7 | 206 |
| EHQAF | 46 | 35 |
| EHZAB (*) | 33 | 73 |
| EL-FELEQ (*) | 113 | 5 |
| EL-HEDÎD (*) | 57 | 29 |
| EL-WAQÎE | 56 | 69 |
| EN'AM | 6 | 165 |
| ENBIYA | 21 | 112 |
| ENFAL (*) | 8 | 75 |
| 'EBESE | 80 | 42 |
| 'ELEQ | 96 | 19 |
| 'ENKEBÛT | 29 | 69 |
| EL-FETIH (*) | 48 | 29 |
| ER-REHMAN | 55 | 78 |
| 'ESIR | 103 | 3 |
| ET-TÛR | 52 | 49 |
| – F – | | |
| FATÎHÊ | 1 | 7 |
| FATIR | 35 | 45 |
| FECIR | 89 | 30 |
| FÎL | 105 | 5 |
| FURQAN | 25 | 77 |
| FUSSÎLET | 41 | 54 |
| – H – | | |
| HAQQE | 69 | 52 |
| HECC (*) | 22 | 78 |
| HEŞIR (*) | 59 | 24 |
| HICR | 15 | 99 |
| HUCURAT (*) | 49 | 18 |
| HÛD | 11 | 123 |
| HUMEZE | 104 | 9 |
| – I – | | |
| IXLAS | 112 | 4 |
| ÎBRAHÎM | 14 | 52 |
| INFÎTAR | 82 | 19 |
| ÎNSAN (*) | 76 | 31 |
| ÎNŞÎQAQ | 84 | 25 |
| ÎNŞÎRAH | 94 | 8 |
| ÎSRA | 17 | 111 |
| – K – | | |
| KAFÎRÛN | 109 | 6 |
| KEHF | 18 | 110 |
| KEWSER | 108 | 3 |
| – L – | | |
| LEYL | 92 | 21 |
| LOQMAN | 31 | 34 |
| – M – | | |
| MA'ÛN | 107 | 7 |
| MAÎDE (*) | 5 | 120 |
| ME'ARIC | 70 | 44 |
| MERYEM | 19 | 98 |
| MU'MÎNÛN | 23 | 118 |
| MUCADELE (*) | 58 | 22 |
| MUDDESSIR | 74 | 56 |
| MUHEMMED (*) | 47 | 38 |
| MULK | 67 | 30 |
| MUMTEHÎNE (*) | 60 | 13 |
| MUNAFÎQÛN (*) | 63 | 11 |
| MURSELAT | 77 | 50 |
| MUTEFFIFÎN | 83 | 36 |
| MUZZEMMIL | 73 | 20 |

# FIHRISTA SÛREYÊN QUR’ANÊ Bİ GOR RÊZA ELÎFBAYÎ

| Navên Sûreyan | Jimareya Sûreyan | Jimara Ayetan |
|---|---|---|
| – N – | | |
| NAS (*) | 114 | 6 |
| NAZÎ‘AT | 79 | 46 |
| NEBE | 78 | 40 |
| EN-NECIM | 53 | 62 |
| NEHL | 16 | 128 |
| NEML | 27 | 93 |
| NESR (*) | 110 | 3 |
| NÎSA (*) | 4 | 176 |
| NÛH | 71 | 28 |
| NÛR (*) | 24 | 64 |
| – Q – | | |
| QAFF | 50 | 45 |
| QARÎ‘E | 101 | 11 |
| QEDR | 97 | 5 |
| QELEM | 68 | 52 |
| QEMER | 54 | 55 |
| QESES | 28 | 88 |
| QIYAMET | 75 | 40 |
| QUREYŞ | 106 | 4 |
| – R – | | |
| RE‘D | 13 | 43 |
| RÛM | 30 | 60 |
| – S – | | |
| SAD | 38 | 88 |
| SAFFAT | 37 | 182 |
| SEBE’ | 34 | 54 |
| SECDE | 32 | 30 |
| SEFF (*) | 61 | 14 |
| – Ş – | | |
| ŞEMS | 91 | 15 |
| ŞU’ERA | 26 | 227 |
| ŞÛRA | 42 | 53 |
| – T – | | |
| TA-HA | 20 | 135 |
| TARIQ | 86 | 17 |
| TEBBET | 111 | 5 |
| TEHRÎM (*) | 66 | 12 |
| TEKASUR | 102 | 8 |
| TEKWÎR | 81 | 29 |
| TELAQ (*) | 65 | 12 |
| TEWBE (*) | 9 | 129 |
| TEXABUN (*) | 64 | 18 |
| TÎN | 95 | 8 |
| – X – | | |
| XAFIR | 40 | 85 |
| XAŞIYE | 88 | 26 |
| – Y – | | |
| YASÎN | 36 | 83 |
| YÛNUS | 10 | 109 |
| YÛSUF | 12 | 111 |
| – Z – | | |
| ZARIYAT | 51 | 60 |
| ZELZELE (*) | 99 | 8 |
| ZUMER | 39 | 75 |
| ZUXRUF | 43 | 89 |

**Têbînî:** Sûreyên ku ev (*) nîşan li ber wan hatin nivîsîn ew Medenî ne; li Medînê hatine xwarê, yên din jî Mekkî ne, li Mekkê hatine xwarê!

1- **EXLAQ**

2- **RISTEYA MALBATÊ**

3- **ELLAH**

4- **WESFÊN ELLAH TEALA**

5- **DÎN, BAWERÎ, RÊYÊN BAŞ Û XIRAB**

6- **ÎBADET**

7- **JIYANA ABORÎ**

8- **‘ILM, AQIL, TEFEKKUR**

9- **ÎNSAN**

10- **AYETÊN KEWNÎ** (**Kozmolojîk**)

11- **QUR’AN**

12- **KITÊBÊN BERIYA QUR’ANÊ**

13- **MU’MIN-MISLIMAN, KAFIR, MUNAFIQ, MUŞRIK**

14- **MIRIN Û PIŞTÎ WÊ**

15- **PEYXAMBER**

16- **PEYXAMBER Û QEWMÊN WAN**

17- **ŞER-CÎHAD**

18- **RISTEYA CIVATÊ**

19- **NAVÊN CIH Û DEVERAN**

**20**- **MIJARÊN CURBECUR**

## EXLAQ


**Dad-Edalet,** Beqere, 282; Alî Îmran, 18, 21; Nîsa, 3, 58, 105, 135, 152; Maîde, 8, 42; E‘eaf, 29, 159, 181; Nehl, 76, 90; Enbiya, 47; Ehzab, 5; Şûra, 15; Hedîd, 25; Mumtehîne, 8; Hucûrat, 10.

**Cezayê mirovkuştinê,** Nîsa, 92, 93.

**Efûkirin-Lêborîn,** Beqere, 178, 219, 237; Alî Îmran, 134, 159; Maîde, 13; E‘raf, 199; Şûra, 37, 40, 43; Texabun, 14.

**Wefadarî- Bicihanîna Peymanê,** Beqere, 177; Maîde, 1; Enfal, 56; Tewbe, 4, 7; Nehl, 91, 95; Re‘d, 21, 25; Isra, 34; Ehzab, 15; Fetih, 10.

**Mirovên ku di exlaq de nimûne ne,** Însan, 7-10.

**Fezîletên exlaqê baş,** Alî Îmran, 134, 136.

**Ferman û wezîfeyên exlaqî,** Beqere, 83-84; Nîsa, 36-40, 114; E‘raf, 199, 200; Nehl, 90; Rûm, 38.

**Heram-Qedexeyên exlaqî,** En‘am, 151-153; E‘raf, 85-86; Nehl, 90; Hucûrat, 11-12.

**Exlaqê malbatê,** Nîsa, 3, 4, 129; Nûr, 22; Ehzab, 55.

**Di malbatê de aştî,** Nîsa, 128.

**Malbat, hêlîna hezkirin û aramiyê ye,** Rûm, 21.

**Tewazû-Nefspiçûkî,** Furqan, 63.

**Îta‘eta dê-bavan,** Isra, 23-25; ‘Enkebût, 8; Luqman, 14-15; Ehqaf, 15.

**Minnetkirin,** Beqere, 264; Muddessir, 6.

**Çavberdana malê xelkê,** Ta-Ha, 131.

**Yekîtî û biratî,** Beqere, 178, 220, 253; Alî Îmran, 28, 103, 105; Enfal, 63; Hucurat, 10.

**Fezîleta bi deyn-dayînê,** Beqere, 245; Maîde, 12; Hedîd, 18; Texabun, 17; Muzemmil, 20.

**Tevdanî-Fesadî,** Maîde, 64; Hûd, 85, 116; Re‘d, 25; Nehl, 88; Şu‘era, 183; Qeses, 84.

**Nemerdî,** Alî Îmran, 180; Nîsa, 37; Tewbe, 34,35, 76; Isra, 31, 100; Ehzab, 19; Muhemmed, 38; Hedîd, 24; Texabun, 16; Leyl, 8-11.

**Nifşê ku mînaka comerdiyê ye,** Heşr, 9.

**Wezîfeyên exlaqî yên ku biratiya dînî wan pêwist dike,** Hucûrat, 9-12.

**Yên ku tinazan bi dîn dikin, mirov nikare wan ji xwe re bike dost,** Maîde, 57.

**Gotina rast,** Ehzab, 70.

**Xelata rastan,** Fussîlet, 32.

**Biratiya dînî,** Tewbe, 11.

**Rastî-xwehrî,** Alî Îmran, 161; Tewbe, 7; Hûd, 112; Şûra, 15.

**Ewleyî û xiyaneta li emanetê,** Nîsa, 58; Enfal, 28; Mumînûn, 8; Me‘arîc, 32.

**Destûrxwestina li cem çûyîna malan,** Nûr, 28, 32.

**Riyakarî,** Nîsa, 38.

**Gotina xweş,** Zumer, 18; Fussîlet, 33; Muhemmed, 21.

**Çavnebarî-hesed,** Beqere, 109; Nîsa, 54; Feleq, 5.

**Ji jiyanê re rêzgirtin,** Nîsa, 92-93; Isra, 33; Furqan, 68.

**Xêr,** Beqere, 110; Alî Îmran, 115; Nîsa, 127; Hec, 11.

**Xêr di destê Xwedê de ye,** Alî Îmran, 26.

**Hezkirina xêrê,** Sad, 32.

**Banga li xêrê,** Alî Îmran, 104.

**Yên ku li ber xêrê dibin asteng,** Qelem, 12; Qaf, 24-26.

**Pêşbaziya di xêrê de,** Beqere, 148; Maîde, 48; Fatir, 32; Hedîd, 21; Mumînûn, 57-61.

**Çalakiyên bi xêr û bêr,** Beqere, 277.

**Yên ku dişibin heywanan,** E'raf, 179; Muhemmed, 12.

**Xiyanet,** Nîsa, 107; Enfal, 71.

**Civateka homoseksuel,** E'raf, 81.

**Di hukm û şahidiyê de bêterefî,** Nîsa, 135.

**Mey û xirabiyên wê,** Beqere, 219; Nîsa, 43; Maîde, 90-91.

**Iffet-namûsparêzî,** Mumînûn, 5, 7; Furqan, 68; Me'arîc, 29, 31.

**Jinên bi iffet,** Beqere, 270.

**Ihsan,** Nehl, 90; Qeses, 77.

**Xeberdana li pişt xelkê,** Hucûrat, 12; Humeze, 1.

**Îsraf-Destbelavî,** Nîsa, 6; Maîde, 32; En'am, 141; E'raf, 31; Isra, 27; Ta-Ha, 121; Furqan, 67; Zumer, 53; Xafir, 28-32.

**Exlaqê kar û bazirganiyê,** Nîsa, 29,31; E'raf, 81; Isra, 35; Şu'era, 181, 182; Rehman, 89; Muteffifîn, 1-6.

**Gotina baş,** Nîsa, 5.

**Qencîkariya bê daxwaza tiştekî,** Însan, 7-9; Leyl, 19-21.

**Duayê milyaketan ji bo qencan,** Mumin, 7-9.

**Qenc û neqenc,** Beqere, 200, 202, 204, 207; Muteffifîn, 7-28; Infîtar, 13-14; Leyl, 5-12; Beyyîne, 6-8.

**Xwedê qenc û neqencan wekhev nagire,** Casiye, 21.

**Qencî-neqencî,** Re'd, 6, 22; Isra, 7; Neml, 89, 90; Qeses, 84; Fussîlet, 34, 46.

**Qencîkirin,** Nehl, 30.

**Zehmetiya qencîkirinê,** Beled, 11,12.

**Qenciya bi aşkera,** Nîsa, 149.

**Hemberê qenciyê bes qencî ye,** Rehman, 40.

**Hemberiya qencî û neqenciyê,** En'am, 160.

**Xelata yên ku qenciyên wan girantir be,** Qarî'e, 6,7.

**Cezayê yên ku qenciyên wan kêm in,** Qarî'e, 8, 11.

**Heqê jinan,** Nîsa, 19, 21, 25, 32.

**Xelata yên ku dilê wan paqij e,** Qaf, 33, 35.

**Qenciyên mayende,** Kehf, 46; Meryem, 76.

**Bi biryarbûn-'ezm,** Alî Îmran, 186, 189; Ta-Ha, 115; Luqman, 17; Şûra, 43; Ehqaf, 35; Muhemmed, 21.

**Kubarî,** Nehl, 23; Isra, 37; Luqman, 19.

**Kîn,** Alî Îmran, 135; Maîde, 8; Heşr, 10.

**Çûna li pey arzûyên xirab,** Nîsa, 135; E'raf, 176; Kehf, 28; Ta-Ha, 16; Furqan, 43; Qeses, 50; Sad, 26; Casiye, 23; Necm, 3.

**Zenna xerab,** Hucûrat, 12.

**Eşkerekirina neqencî û qenciyê,** Nîsa, 148-149.

**Neqencî li xwediyê xwe tê,** Fatir, 43.

**Paqijbûna ji neqenciyê,** Fatir, 18.

**Qumar û xerabiya wê,** Maîde, 90-91.

**Encama yên ku bi hêza xwe bawer dibin,** Tewbe, 100; Qeses, 78,81; Rûm, 9; Xafir, 82, 85; Muhemmed, 13; Qaf, 36.

**Leqeb-lêdanîn,** Hucurat, 11.

**Hevkariya dareyî-malî,** Beqere, 3, 177, 195, 215, 254, 261, 268, 270, 274; Alî Îmran, 92, 134; Nîsa, 34, 39; Enfal, 3; Tewbe, 54; Îbrahîm, 31; Nehl, 75; Hec, 35; Furqan, 67; Qeses, 54; Secde, 16, 32; Sebe' 39; Fatir, 29; Şûra, 42; Hedîd, 7, 10; Munafîqûn, 10; Texabun, 16; Telaq, 7.

**Hirsa menfî'etê,** 'Adiyat, 8.

**Merhemet,** Alî Îmran, 159; En'am, 12; Isra, 24; Rûm, 21; Fetih, 29; Beled, 17.

**Iffet-namûsparêziya Meryemê,** Meryem, 20, 33.

**Helwesta li hemberî mu'min û kafiran,** Maîde, 54; fetih, 29.

**Musamehekarî-xweşbînî,** Zuxruf, 89.

**Nefsa xerabîxwaz,** Yûsuf, 53.

**Nefsa mutmeînne-dilaram, Radiye, Merdiyye,** Fecr, 27-30.

**Yê ku nefsa xwe pîs dike, ziyan kiriye,** Şems, 10.

**Yê ku nefsa xwe paqij dike, xelas bûye,** Şems, 9.

**Hêrs û lêborîn,** Alî Îmran, 134; Şûra, 37.

**Mirovên ku mînak in,** Mumtehîne, 5, 6.

**Exlaqê Pêxember (s)** Alî Îmran, 159; Qelem, 4.

**Resûlûllah (s) nimûneya sipehîtirîn a exlaq e,** Ehzab, 21.

**Belavkirina aramiyê,** Heşr, 7.

**Riya,** Beqere, 264, 266, 270, 272; Alî Îmran, 188; Nîsa, 38, 39, 108; Ma'ûn, 6.

**Sebr û sebat,** Beqere, 45, 152, 250; Alî Îmran, 200; En'am, 34; Hec, 35; Luqman, 17; Ehqaf, 35; Beled, 17; 'Esr, 3.

**Encama yên ku xwe bi dûv hirsa serwetê ve berdan,** Humeze, 2-9.

**Hezkirin,** Alî Îmran, 119; Maîde, 54; E'raf, 79; Meryem, 96; Ta-Ha, 39.

**Bicihanîna soza xwe,** Beqere, 177; Alî Îmran, 76; Isra, 34; Mumînûn, 8; Me'arîc, 32.

**Sixêf,** En'am, 109.

**Yên ku bi ya arzûyên xwe dikin,** Meryem, 59.

**Di şahdedayînê de rast û duristî,** Beqere, 140; Nîsa, 135; Maîde, 8, 106; Furqan, 72; Me'arîc, 33; Telaq, 2.

**Zimanê şêrîn,** Isra, 28.

**Tecessus,** Hucûrat, 12.

**Dilê pak,** Saffat, 84.

**Qenciya bi rast û duristî (birr),** Beqere, 44, 177, 189; Alî Îmran, 92; Maîde, 2; Mucadele, 9.

**Sebra Yaqûbî,** Yûsuf, 38.

**Yên ku ji arîkariyê direvin,** Ma'ûn, 7.

**Heqê yê sêwî û ji sêwî re arîkarî,** Beqere, 83, 177, 215, 220; Nîsa, 2, 3, 6, 8, 10, 36, 127; En'am, 153; Isra, 34, 170; Kehf, 82; Beled, 15; Fecr, 17; Dûha, 9.

**Iffeta Yûsuf,** Yûsuf, 23, 29, 34, 51.

**Encama zaliman,** Hec, 48, 53.

**Zilamê ku bi dewlemendiya xwe serxweveçûye,** Kehf, 32-44.

**Zina,** Isra, 32; Nûr, 2; Furqan, 68; Mumtehîne, 12.

**Zilm û zalim,** Beqere, 124, 258; Nîsa, 168, 169; Maîde, 45; En'am, 21, 129, 135; E'raf, 44; Tewbe, 109; Hûd, 18, 100-102; Yûsuf, 23; Îbrahîm, 27, 45; Şûra, 39; Ehqaf, 10; Zumer, 47.

## RISTEYA MALBATÊ

**Exlaqê malbatê,** Nîsa, 3, 4, 129; Nûr, 22; Ehzab, 55.

**Berpirsiya serdarê malbatê,** Meryem, 55; Ta-Ha, 132; Tehrîm, 6.

**Exlaqê malbatê,** Nîsa, 3, 4, 129; Nûr, 22; Ehzab, 55.

**Di malbatê de aştî,** Nîsa, 128.

**Malbat, hêlîna hezkirin û aramiyê ye,** Rûm, 21.

**Pêwendiya xizimtiyê,** Beqere, 83, 177, 215; Nîsa, 1, 36; Tewbe, 23; Hûd, 45, 47; Re'd, 21, 25; Nehl, 90; Isra, 26; Nûr, 22; Rûm, 38; Muhemmed, 22.

**Ita'eta dê-bavan,** Isra, 23-25; 'Enkebût, 8; Luqman, 14-15; Ehqaf, 15.

**Zewaca bi pirtirî jinekê re,** Nîsa, 3-4; Ehzab, 50.

**Xwedîkirina zarokên mêr û jinên hevberdayî,** Nîsa, 35, 128; Telaq, 6, 7.

**Jinberdan û usûla wê,** Beqere, 227, 231; Nîsa, 130; Mumtehîne, 10, 11; Telaq, 1, 2.

**Zarok û perwerdekirina zarok,** Beqere, 223; Kehf, 45; Enfal, 28; Ta-Ha, 123; Texabun, 14, 15; Tehrîm, 6.

**Hezkirina zarok,** Alî Îmran, 14; Kehf, 45; Sebe' 37.

**Nêrîna li zarokan,** Beqere, 233.

**Duakirina ji bo zarok qenc bibin,** Beqere, 128, 129; Alî Îmran, 38-41; E'raf, 189; Îbrahîm, 40; Furqan, 74; Ehqaf, 15.

**Şîrdayîn û dema şîrmijandinê,** Beqere, 233; Luqman, 14; Ehqaf, 15; Telaq, 6, 7.

**Mêr û mafên mêran,** Beqere, 178, 228, 233; Nîsa, 34.

**Hekem di halê lihevnekirina hevseran de,** Nîsa, 35.

**Jinên ku mehrkirina wan helal e,** Maîde, 5.

**Jinên eqreba yên ku mehrkirina wan qedexe,** Nîsa, 22, 23.

**Halê heyzê,** Beqere, 222.

**Dema 'iddetê,** Beqere, 228, 235; Ehzab, 49; Telaq, 1, 4.

**Jinên qenc û jinên neqenc,** Nîsa, 34.

**Jin û mafên jinan,** Beqere, 187, 228, 229, 232, 233, 237, 282; Alî Îmran, 14; Nîsa, 1, 4, 7, 11, 12, 19, 20, 21, 24, 25, 33, 34, 127, 128, 176; E'raf, 189; Rûm, 21; Ehzab, 28-34; Zumer, 6; Ehqaf, 15; Mumtehîne, 12; Texabun, 14.

**Jin, muşrikan qîmet nedidanê,** En'am, 139; Nehl, 58, 59; Şûra, 17; Zuxruf, 17; Tûr, 39; Necm, 21, 22.

**Wezîfeyên jinan yên dînî û exlaqî,** Mumtehîne, 12.

**Ayetên lî'anê,** Nûr, 6-9.

**Mehr,** Beqere, 229, 237; Nîsa, 4, 20, 21, 24, 25.

**Mîras,** Nîsa, 7, 8, 11, 12, 32, 33, 126.

**Zarokên ku neseba wan nediyar,** Ehzab, 5.

**Nîkah (zewac, zewicandin),** Beqere, 221, 235; Nîsa, 3, 24, 25, 127; Maîde, 5; Nehl, 72; Nûr, 32, 33; Ehzab, 37, 50.

**Xişr û zînet,** E'raf, 32; Nehl, 14; Zuxruf, 18.

**Zewaca bi dayîka şîrdayînê re heram e,** Telaq, 4, 6.

**Hîcab-Xwenixumandin,** E'raf, 26, 31, 32; Nehl, 5, 81; Nûr, 31, 60; Ehzab, 35, 59.

**Zewaca bi jinên sêwî re,** Nîsa, 127.

**Zîhar û kefaretê wê,** Ehzab, 4; Mucadele, 2, 3.

**Cezayê zinakaran,** Nûr, 2, 3.

**Îftîraya zinayê û cezayê wê,** Nûr, 4-6, 9, 23-26.

**Xweparastina ji zinayê,** Isra, 32; Nûr, 30, 31; Furqan, 68.

**Îsbata zinayê,** Nîsa, 15; Nûr, 6-9.

## ELLAH-XWEDÊ

**Dostên Ellah Teala,** Yûnus, 62, 63.

**Ellah Teala zanayê nependiyê ye,** Tewbe, 78; Hucûrat, 18; Cin, 26.

**Ellah Teala zanayê nependî û diyarîçav e,** En'am, 73; Tewbe, 94, 105; Re'd, 9; Mu'mînûn, 92; Secde, 6; Zumer, 46; Heşr, 22; Cumû'e, 8; Texabun, 18.

**Ellah Teala vedijîne û dimirîne,** Hicr, 23.

**Ellah Teala hukumdarê rasteqîne ye,** Ta-Ha, 14.

**Ellah Teala ya veşartî û ya eşkere jî dizane,** Beqere, 77; Nehl, 19, 23; Enbiya, 110.

**Ellah Teala razê û raza razê jî dizane,** Ta-Ha, 7.

**Ellah Teala ya ku tê veşartin û ya ku tê eşkerekirin jî dizane,** Ehzab, 54; Mumtehîne, 1; Texabun, 4; Mulk, 13.

**Ellah Teala, erd û asîman di şeş rojan de afirandin,** E'raf, 54; Yûnus, 3; Hûd, 7; Furqan, 59; Secde, 4; Qaf, 38; Hedîd, 4.

**Ellah Teala çavdêr e,** Nîsa, 1.

**Ellah Teala, nêrîna çavan a xaîn û ya ku dil vedişêrin jî dizane,** Mu'mînûn, 19.

**Ellah Teala hakimê hakiman e,** Tîn, 8.

**Ellah Teala her dem di halê afirandinê de ye,** Rehman, 29.

**Ellah Teala her tişt di awayê herî sipehî de afirandiye,** Secde, 7.

**Ellah Teala rizqê her kesî parve kiriye,** Zuxruf, 32.

**Yên ku peymana dane Ellah Teala xera dikin,** Beqere, 27.

**Ellah Teala qencî û neqencî nîşanî mirovan daye,** Şems, 8; Beled, 10.

**Ellah Teala, zilmê li mirovan nake,** Tewbe, 70; Enfal, 51; Hûd, 101; Qaf, 29.

**Ellah Teala, însan hewante neafirandine,** Mu'mînûn, 115.

**Li cem Ellah Teala dem,** En'am, 12.

**Ellah Teala, zilmê li tu kesî nake,** Yûnus, 44, 47; Rûm, 9.

**Ellah Teala, ji bo me rehetiyê dixwaze,** Beqere, 185.

**Tirsa Ellah Teala,** Beqere, 74, 150; Alî Îmran, 175; Nîsa, 77; Tewbe, 13; Ehzab, 39; Fatir, 28.

**Ellah Teala, li bendeyên xwe pir lutufkar e,** Şûra, 19.

**Ellah Teala dostê muminan e,** Alî Îmran, 68; Hec, 78.

**Ellah Teala, dê nûra xwe timam bike,** Tewbe, 32; Seff, 8.

**Ellah Teala, ji pêxemberan peyman standiye,** Ehzab, 7.

**Ellah Teala pêxemberê xwe parastiye,** Dûha, 1-8; Inşîrah, 1-8.

**Hezkirina Ellah Teala,** Beqere, 165; Alî Îmran, 31; Tewbe, 24.

**Ellah ne sisê ne,** Nîsa, 171.

**Bêguman ewên ku dibêjin; Ellah sisiyê sisêyan e!!,** Nîsa, 73.

**Ellah Teala, ji peymana xwe venagere,** Îbrahîm, 47; Hec, 47; Rûmê, 6.

**Hezkirina Ellah Teala û Pêxember,** Alî Îmran, 31.

**Dijminên Ellah Teala û pêxember -çendî xizmên nêzîk bin jî- mirov nikare wan ji xwe re bike dost,** Enfal, 13, 28.

**Ellah Teala û pêxemberê xwe hemin dê bi ser kevin,** Mucadele, 21.

**Îtaeta Ellah Teala û resûlê wî,** Nîsa, 13, 14, 69, 80; Maîde, 92; Enfal, 20, 24; Nûr, 52, 54; Ehzab, 36, 71; Muhemmed, 33; Fetih, 17; Hucûrat, 14; Heşr, 4; Texabun, 12.

**Ji Ellah Teala û resûlê wî re rêzgirtin,** Hucûrat, 1.

**Ellah Teala ne zalim e,** Alî Îmran, 182; Nîsa, 40; Nehl, 33, 34; Kehf, 49; Hec, 10.

**Ellah Teala arîkarê qelsan e,** Qeses, 5.

**Li ber Ellah Teala tu qencî û neqencî veşartî namîne,** Luqman, 16.

**Li ber Ellah Teala tiştek veşartî namîne,** Mucadele, 7.

**Edaleta Ellah Teala,** Alî Îmran, 195.

**Dînê Ellah Teala,** Alî Îmran, 83; fetih, 2.

**Kirinên Ellah Teala,** Re‘d, 17.

**Navên herî sipehî yên Ellah Teala,** Isra, 110; Ta-Ha, 8; Heşr, 22-24.

**Zanîna Ellah Teala dor li her tiştî girtiye,** Xafir, 7.

**Zanîna Ellah Teala bi nivîsandinê xelas nabe,** Kehf, 109.

**Lutf û kerema Ellah Teala li mirovan,** Beqere, 22; Nîsa, 95-99, 113, 141, 142; Nehl, 66-69, 71, 72, 78, 81; Isra, 11, 20, 21, 66, 70; Ta-Ha, 53, 54; Hec, 63, 65, 66; Mumînûn, 18, 22; Nûr, 21; Furqan, 45-49; Qeses, 71-73; Rûm, 46; Luqman, 20; Secde, 27; Yasîn, 33-35, 71-73; Xafir, 61, 64, 79, 80; Zuxruf, 10-13; Casiye, 12-13; Waqî‘e, 85; Qaf, 6-11; ‘Ebese, 24-32.

**Nêzîkîtiya Ellah Teala ya ji bo însên,** Qaf, 16.

**Musamehekariya Ellah Teala ya ji bo mirovan,** Nehl, 61.

**Laneta Ellah Teala,** Nîsa, 52, 118.

**Ezab û lêborîna Ellah Teala,** Hicr, 49, 50.

**Lêborîna Ellah Teala berfereh e,** Nîsa, 116; Necm, 32.

**Arîkariya Ellah Teala ji bawermendên mucahid,** Enfal, 17, 26; Rûm, 47.

**Ni‘metên Ellah Teala bêjimar in,** Îbrahîm, 34; Nehl, 18.

**Rehmet û mexfîreta Ellah Teala,** Kehf, 58.

**Rehmeta Ellah Teala dor li her tiştî girtiye,** E‘raf, 156; Xafir, 7.

**Hêvî ji rehmeta Ellah Teala nayê birrîn,** Yûsuf, 87; Zumer, 53.

**Ellah Teala ji milletekî wisa hez dike ku,** Maîde, 54, 55.

**Di sunneta (qanûna) Ellah Teala de guhertin çênabe,** Isra, 77; Ehzab, 38, 39; Fatir, 43; Fetih, 23.

**Peymana Ellah Teala heq e,** Xafir, 55; Casiye, 32.

**Delîlên heyîna Ellah Teala,** Yûsuf, 105; Re‘d, 2-5; Nehl, 10, 13, 65-69; Hec, 5; Yasîn, 32-44; Fussîlet, 37, 39, 53; Şûra, 29, 32; Casiye, 3, 6; Waqî‘e, 58-72; Xaşiye, 17-20.

**Di afirandinên Ellah Teala bêahengî nîn e,** Mulk, 3,4.

**Arîkariya Ellah Teala,** En‘am, 63, 64; Tewbe, 25, 26; Nesr, 1-3.

**Yên ku babetî arîkariya Ellah Teala ne,** Hec, 40, 41.

**Zanîna ku li ber dîgerên Ellah Teala veşartî ye,** Luqman, 34.

## WESFÊN ELLAH

**Ellah yek e (Wehdaniyet),** Beqere, 163, 255; Alî Îmran, 2, 6, 18; Nîsa, 87, 171; En‘am, 19, 102; Tewbe, 31; Hûd, 14; Re‘d, 16, 30; Nehl, 22, 51; Isra, 42, 43; Ta-Ha, 8, 98; Enbiya, 22, 25; Mumînûn, 91, 116; Qeses, 70, 88; Fatir, 3; Seffat, 1-5; Sad, 65, 66; Zumer, 4-6; Xafir, 3, 16, 62, 65; Fussîlet, 6; Zuxruf, 84; Dûxan, 8; Heşr, 22, 23; Texabun, 13; Muzemmil, 9; Ixlas, 1.

**Ellah ya ku bivê, dike (Îrade),** Beqere, 185, 253; Alî Îmran, 26, 40; Maîde, 1; Hûd, 107; Îbrahîm, 27; Hec, 14, 18; Nûr, 45; Qeses, 68; Rûm, 54; Şû‘era, 49; Burûc, 16.

**Ellah sax (Heyat) e,** Beqere, 255; Alî Îmran, 2; Ta-Ha, 111; Xafir, 65.

**Ellah ebedî ye (Beqa),** Beqere, 255; Furqan, 58; Qeses, 88; Rehman, 26; Hedîd, 3.

**Ellah ezelî ye (Qidem),** Beqere, 255; Hedîd, 3.

**Ellah her tiştî dizane (Ilm),** Beqere, 29, 33, 231, 255, 282; Alî Îmran, 29; Maîde, 7, 99; En'am, 3, 59, 73; Hûd, 5; Re'd, 8-10; Îbrahîm, 38; Nehl, 19, 23; Ta-Ha, 7, 98; Enbiya, 110; Hec, 70, 76; Mu'mînûn, 92; Qeses, 69; 'Enkebût, 45, 52; Luqman, 23, 34; Secde, 6; Sebe' 2; Fatir, 38; Zumer, 7, 46; Xafir, 19; Fussîlet, 47; Şûra, 12, 24-25; Hedîd, 3, 4, 6; Mucadele, 7; Heşr, 22; Texabun, 4, 11, 18; Mulk, 13, 14.

**Ellah her tiştî dibîne (Beser),** Beqere, 96, 110, 233, 237; Alî Îmran, 15, 20; Nîsa, 58, 134; Isra, 1, 17, 30, 96; Hec, 61, 75; Sebe' 11; Fatir, 31, 45; Xafir, 20, 44, 56; Şûra, 11, 27; Hedîd, 4; Mucadele, 1; Mulk, 19; Inşîqaq, 15.

**Ellah her tiştî dibihîze (Semî'),** Beqere, 127, 137, 181, 124, 227, 244, 256; Alî Îmran, 34, 35, 38, 121; Nîsa, 58, 134, 148; En'am, 13, 115; E'raf, 200; Enfal, 61; Yûnus, 65; Yûsuf, 34; Îbrahîm, 39; Enbiya, 4; Nûr, 21, 60; Şû'era, 220; 'Enkebût, 5, 60; Sebe' 50; Xafir, 20, 56; Fussîlet, 36; Şûra, 11; Mucadele, 1.

**Tiştek wekî Ellah Teala nîn e,** Beqere, 22; En'am, 101; Meryem, 65; Şûra, 11; Ixlas, 4.

**Ellah heyîna wî bi wî ye,** Beqere, 255.

**Ellah gotinê dibêje (Kelam),** Beqere, 37; Nîsa, 164; En'am, 34, 115; E'raf, 158; Kehf, 27, 109; Luqman, 27.

**Ellah heye (Wucûd),** En'am, 75-79; Neml, 59-64; Qeses, 71-73; 'Enkebût, 61, 63; Hedîd, 3; Mulk, 19, 30.

**Ellah Afirîner e,** Beqere, 28, 29; Alî Îmran, 47; Maîde, 17; En'am, 73, 95, 101, 102; E'raf, 54; Re'd, 16; Hicr, 86; Isra, 99; Nûr, 45; Qeses, 68; Rûm, 27, 40, 54; Secde, 7; Fatir, 1; Yasîn, 81; Zumer, 62; Xafir, 62; Şûra, 49; Qemer, 49, 50; Waqî 'e, 57-59, 63-65; Heşr, 24; Texabun, 2.

**Ellah li ser her tiştî kare ye (Qudret),** Beqere, 20, 106, 109, 148, 259, 284; Alî Îmran, 26, 29, 65, 189; Nîsa, 133, 149; Maîde, 17, 19, 40, 120; En'am, 17, 37, 41, 65; Enfal, 41; Tewbe, 39; Hûd, 4; Nehl, 70, 77; Isra, 99; Hec, 6, 39; Mu'mînûn, 18; Nûr, 45; Furqan, 54; 'Enkebût, 20; Rûm, 54; Fatir, 1, 4; Yasîn, 81; Şûra, 9, 21, 50; Ehqaf, 33; Fetih, 21; Hedîd, 2; Heşr, 6; Telaq, 12; Tehrîm, 8; Mulk, 1; Me'arîc, 50; Qiyamet, 4, 40; Murselat, 23; Tariq, 8.

## DÎN, BAWERÎ, RIYÊN QENC Û NEQENC

**Dîn,** Beqere, 132, 193, 217, 256; Alî Îmran, 19, 24, 83, 85; Nîsa, 46, 125, 146; Maîde, 3, 54, 57, 77; En'am, 161; E'raf, 29, 51; Enfal, 39, 49, 72; Tewbe, 11, 12, 29, 33, 36, 122; Yûnus, 22, 105; Yûsuf, 40; Nehl, 52; Hec, 78; Nûr, 2, 25; 'Enkebût, 65; Rûm, 30, 32, 33, 43; Luqman, 31; Ehzab, 5; Zumer, 2, 3; Şûra, 13, 21; Fetih, 28; Zariyat, 6; Mumtehîne, 8, 9; Seff, 9; Infîtar, 9; Tîn, 7; Beyyîne, 5; Ma'ûn, 1; Kafîrûn, 6; Nesr, 2.

**Roja dîn,** Fatîhe, 4; Hicr, 35; Şû'era, 82; Saffat, 20; Sad, 78; Zariyat, 12; Waqî'e, 56; Me'arîc, 26; Muddessir, 46; Infîtar, 9, 15, 17, 18; Muteffifîn, 11.

**Di dîn de ixlas,** E'raf, 26; Yûnus, 22; 'Enkebût, 65; Luqman, 32; Zumer, 2, 11; Xafir, 14, 65; Beyyîne, 5.

**Di dîn de tefrîqe (bihevketin),** En'am, 159.

**Di dîn de kotekî,** Beqere, 256.

**Ji dîn derketin (irtîdad),** Beqere, 108, 217; Alî Îmran, 86-90; Nîsa, 137; Nehl, 106-109; Muhemmed, 25; Necm, 36-38.

**Bi temamî nepejirandina dîn,** Hec, 11, 12.

**Dînê rast,** Tewbe, 29, 33, 36; Nûr, 25; Fetih, 28; Seff, 9; Beyyîne, 5.

**Heq-batil,** Beqere, 42; E'raf, 118; Isra, 81; Kehf, 56; Hec, 62; Luqman, 30; Sebe' 49; Xafir, 5; Şûra, 24; Fetih, 28; Seff, 9.

**Dînê henîf (pak),** Yûnus, 105; Nehl, 123.

**Hîdayet-delalet,** Beqere, 175; En'am, 125; E'raf, 30, 186, 178; Yûnus, 108; Re'd, 27, 33; Îbrahîm, 4; Nehl, 36, 37; Isra, 15, 97; Kehf, 17; Meryem, 75, 76; Neml, 92, 93; Qeses, 50, 56, 85; Rûm, 29; Sebe' 24, 50; Fatir, 8; Zumer, 23, 37, 38, 41; Xafir, 33; Qelem, 7.

**Silav li wan be ku hîdayet bûne,** Ta-Ha, 47.

**Îman xemla dil e,** Hucurat, 7.

**Hêza îmanê,** Nehl, 99, 100.

**Îman-îbadet-exlaq,** Beqere, 177.

**Îman-îslam,** Hucûrat, 14.

**Hezkirina îmanê,** Hucûrat, 7.

**Îman paqijî, kufr pîsîtî ye,** Alî Îmran, 179.

**Di îmanê de bê sebatî,** Nîsa, 137.

**Di îmanê de yeqîn,** Beqere, 260.

**Bingehên îmanê,** Beqere, 177; Nîsa, 136.

**Îslam,** Alî Îmran, 19, 85; Maîde, 3; En'am, 125; Tewbe, 74; Zumer, 22; Hucûrat, 29; Seff, 7.

**Îslam tekûz e,** Maîde, 3.

**Kufr (inkar, kafirtî),** Beqere, 88, 93, 108, 217; Alî Îmran, 52, 80, 90, 167, 176, 177; Nîsa, 46, 137, 155, 156; Maîde, 41, 61, 64, 68; Tewbe, 12, 22, 36, 74, 97, 107; Îbrahîm, 28; Nehl, 106; Zumer, 7, 8; Rûm, 44; Luqman, 23; Fatir, 39; Hucûrat, 7.

**Munafiqîtî (nîfaq),** Tewbe, 77, 97, 101.

**Hin nîşanên munafiqan,** Beqere, 9-12, 15, 17, 19, 20, 264, 266; Nîsa, 66, 83, 142, 143; Maîde, 41, 62, 63; Tewbe, 42, 54, 56, 59, 67, 69, 74-76, 78, 107; Hûd, 5; Nûr, 19; Qeses, 60; Muhemmed, 22, 25, 26; Fetih, 11, 15; Hucûrat, 14, 16, 17; Heşr, 11-13, 16; Munafîqûn, 1, 4, 7.

**Muşriktî (ji Xwedê re heval çêkirin),** Nîsa, 36, 46, 116; Maîde, 76; En'am, 110, 151; Nehl, 74; Isra, 23, 39; Hec, 31; 'Enkebût, 10, 11, 68; Rûm, 28, 29, 31, 32; Ehzab, 57; Sebe' 41; Luqman, 13; Zuxruf, 20, 21, 57-59; Casiye, 23; Ehqaf, 5; Muhemmed, 12.

**Xwe ji şirkê parastin,** Şû'era, 213; Qeses, 88; Rûm, 31; Zumer, 65, 66; Xafir, 66; Fussîlet, 37; Muhemmed, 15, 36; Zariyat, 51.

**Sirata musteqîm,** Fatîhe, 6; Beqere, 142, 213; Alî Îmran, 51, 101; Nîsa, 68, 175; Maîde, 16; En'am, 39, 87, 126, 161; E'raf, 16; Yûnus, 25; Hûd, 65; Hicr, 41; Nehl, 26, 121; Isra, 35; Meryem, 36; Hec, 54; Mu'mînûn, 73; Nûr, 46; Yasîn, 4, 61; Saffat, 18; Şûra, 52; Zuxruf, 43, 61, 64; Ehqaf, 36; Fetih, 2, 20; Mulk, 22.

**Tewhîd û baweriya tewhîdê (yekdêrînê),** Fatîhe, 5; Beqere, 163, 255; Alî Îmran, 2, 6, 18, 62; Nîsa, 78, 171; Maîde, 73; En'am, 19, 46, 102, 106; E'raf, 59, 65, 73, 85, 158; Tewbe, 31, 129; Hûd, 14, 50, 61, 84; Re'd, 30; Îbrahîm, 52; Nehl, 2, 22, 51; Kehf, 110; Ta-Ha 8, 14, 98; Enbiya, 22, 25, 85, 108; Hec, 34; Mu'mînûn, 32, 91, 116; Neml, 26, 60-64; Qeses, 70-72, 88; Fatir, 3; Sad, 65; Zumer, 6; Xafir, 62, 64; Fussîlet, 6; Zuxruf, 84; Dûxan, 8; Muhemmed, 19; Zariyat, 51; Tûr,

43; Heşr, 22, 23; Texabun, 13; Muzemmil, 9.

## ÎBADET

**Destnimêj,** Maîde, 6.
**Xusil,** Maîde, 6.
**Teyemmum,** Nîsa, 43; Maîde, 6.
**Hîmgeh (Ma'bed) parastî ne,** Beqere, 114; Hec, 40.
**Mizgeft yên Ellah Teala ne,** Cin, 18.
**Saxkirina mizgeftan,** Tewbe, 18, 19.
**Nimêj,** Beqere, 3, 43, 45, 83, 110, 152, 177, 238, 239, 277; Nîsa, 77, 162; Nîsa 142; (nimêja sibehê), Nîsa, 43; (di şer de nimêja bi cema'etî), 102; (nimêja 'eşayê), Maîde, 12, 55, 58, 91, 106; En'am, 72, 92, 162; E'raf, 170; Enfal, 3, 35; Tewbe, 5, 11, 71; Yûnus, 87, Re'd, 22; Îbrahîm, 31, 37, 40; Meryem, 31, 55; Ta-Ha, 14, 132; Enbiya, 73; Mu'mînûn, 2, 9; Hec, 35, 78; Neml, 3; Nûr, 37, 56; Nûr, 58; (nimêja di rewşa serxweşbûnê de), Nûr, 58. Rûm, 31, 39; Luqman, 4, 17; Ehzab, 33; Fatir, 18, 29; Mucadele, 13; Me'arîc, 22, 23, 34; Muzzemmil, 20; Beyyîne, 5; (nimêja înê), cumû'e, 9, 10; (nimêja munafiqan),
**Nimêj divê çawa be,** 'Enkebût, 45.
**Wextên nimêjê,** Isra, 78, 79; Hûd, 14; Ta-Ha, 136; Rûm, 17, 18.
**Yên ku nimêjê kêm û bi riyakarî dikin,** Ma'ûn, 4-6.
**Yên ku nimêjê ziyan dikin,** Meryem, 59.
**Kurtkirina nimêjê,** Nîsa, 101.
**Ferzbûna nimêjê,** Nîsa, 103.
Hecc, Beqere, 189, 196-200, 203; Maîde, 97; Hec, 26-37.
**Hecc û umre,** Beqere, 158, 196.
**Hecca mezin,** Tewbe, 3.
**Adabê heccê,** Maîde, 1-2.
**Avgerandina li heciyan,** Tewbe, 19.
**Zewaca di halê ihraman,** Maîde, 95.
**Qurban,** En'am, 162; Hec, 26-37.
**Qurban û nimêj,** Kewser, 2.
**Rojî,** Beqere, 183-185, 187, 196; (rojiya kefaretê), Nîsa, 92; Maîde, 89; Mucadele, 4.
**Fideya ji bo rojiyê,** Beqere, 184.
**Zekat,** Beqere, 43, 83, 110, 177, 277; Nîsa, 77, 162; Maîde, 12, 55; E'raf, 156; Tewbe, 5, 11, 71; Meryem, 31, 55; Enbiya, 73; Mu'mînûn, 4; Hec, 74; Neml, 3; Nûr, 37, 56; Luqman, 4; Ehzab, 33; Fussîlet, 7; Mucadele, 13; Muzzemmil, 20; Beyyîne, 5.
**Yên ku zekat li wan diçe,** Tewbe, 60.

## JIYANA ABORÎ

**Nêçîr û nêçîrvanî,** Maîde, 1, 2, 4, 94, 96; Nehl, 14; Fatir, 12.
**Nemerdî,** Beqere, 195; Alî Îmran, 49, 180; Nîsa, 36, 37; Tewbe, 34, 35; Furqan, 67; Isra, 29, 31, 100; Muhemmed, 37, 38; Hedîd, 23, 24; Heşr, 59; Texabun, 15-18; Leyl, 8-10; Humeze, 1-4; 'Adiyat, 8-11.
**Merdîtî (li hevkariya diravî-exlaq jî binêre),** Beqere, 268; Isra, 29.
**Xebat,** Nîsa, 32; Qeses, 77; Şû'era, 20; Necm, 39-42; Leyl, 4.
**Girîngiya ma'dena hesin,** Hedîd, 25.
**Zerardayîna beytul-malê,** Alî Îmran, 161.
**Beraberiya dinya-axretê,** Qeses, 77.

**Jiyana cîhanê îmtihanek e,** ‘Enkebût, 2, 3.

**Jiyana cîhanê keyf û leystik e,** En‘am, 32; ‘Enkebût, 64; Muhemmed, 36; Hedîd, 20.

**Jiyana cîhanê demî ye,** Kehf, 15, 16; Hedîd, 20.

**Ni‘metên dinyayê,** Alî Îmran, 14; Nîsa, 134; Hedîd, 23.

**Kelkwergirtina ji ni‘metên dinyayê,** E‘raf, 31-33.

**Ni‘metên dinya û axretê,** Alî Îmran, 145, 148.

**Xwestina dinyayê,** Isra, 18.

**Riba,** Beqere, 188, 275, 276, 278, 279; Alî Îmran, 130; Nîsa, 29-31, 160, 161; Rûm, 39.

**Meşxûliyeta bêfeyde,** Mu’mînûn, 3.

**Xesb (bi zor standina malê yekî),** Beqere, 188; Nîsa, 29-31.

**Roj ji bo kar-xebatê ye,** Yûnus, 67; Isra, 12; Furqan, 47; Neml, 86; Qeses, 73; Rûm, 23; Xafir, 61; Nebe’ 11.

**Xwarin-vexwarinên heram,** Beqere, 173, 219; Nîsa, 43; Maîde, 3, 5, 90, 91, 93; En‘am, 121, 138, 145; Nehl, 67, 115; Hec, 30.

**Di xerckirinan de riya navîn,** Isra, 29; Furqan, 67.

**Jiyan imtîhan e,** Alî Îmran, 153; Hûd, 7; Muhemmed, 31.

**Xwarin-vexwarina ji yê helal,** Beqere, 168, 172, 173; Maîde, 1, 3-5, 87, 88; En‘am, 118, 119, 142, 145; Nehl, 114, 115; Hec, 30.

**Her kes hewceyî Ellah Teala ye,** Fatir, 15; Muhemmed, 38.

**Dizî,** Beqere, 188; Nîsa, 28, 31; Maîde, 38, 39.

**Israf û musrif (destbelav û destbelavî),** En‘am, 141; E‘raf, 31; Isra, 26, 27, 29; Furqan, 67; Zuxruf, 32.

**Qumar,** Beqere, 188, 219; Nîsa, 29-31; Maîde, 90, 91.

**Îmtihana bi mal û zaroyan,** Enfal, 28; Texabun, 14, 15.

**Ji mafê mulkiyetê re rêzgirtin, Beqere,** 188.

**Destdirêjîkirina li mulkiyetê,** Nîsa, 161.

**Kêş û pîvan,** En‘am, 152; E‘raf, 85; Hûd, 84-86; Isra, 35; Şû‘era, 181, 182; Rehman, 7-9; Muteffîfîn, 1-7.

**Gerew û kirê,** Qeses, 26, 29.

**Rizq,** Re‘d, 26; Nehl, 114; Isra, 30; Nûr, 28; ‘Enkebût, 60, 62; Sebe’ 24, 36, 39; Zumer, 52; Şûra, 12, 19, 27; Mulk, 21; Telaq, 3; Zariyat, 22, 57, 58.

**Yê ku riziq ji hev cuda dike Ellah Teala ye,** Nehl, 71.

**Bertîl,** Beqere, 188.

**Serwet, bila li navbera dewlemendan tenê negere,** Heşr, 7.

**Zêde li pey serwetê ketin,** Alî Îmran, 14; Tewbe, 24, 35, 58, 59, 67, 75, 76; Fetih, 15; Hucûrat, 14, 16, 17; Munafîqûn, 8; Fecr, 20; ‘Eleq, 6-8.

**Serwet berhevkirin û veşartin,** Alî Îmran, 49; Tewbe, 34, 35; Texabun, 15-18; Humeze, 1-4.

**Mal, ji sefîhan (eqlsivikan) re nayê dayîn,** Nîsa, 5.

**Ticaret, bazirganî-danûstandin,** Beqere, 188, 198, 201, 275, 282; Nîsa, 29-31; Maîde, 1; Hec, 28; Nûr, 37; Sad, 21-24; Cumû‘e 9, 10.

**Zekat, li îbadetan binêre.**

**Zekat, ji malê qenc tê dayîn,** Beqere, 267.

**Zekat, mafê feqîran e,** Zariyat, 19; Me‘arîc, 24, 25.

**Yên ku babetî zekatê ne,** Tewbe, 60.

**Yên ku zekatê nadin û cezayên wan,** Nîsa, 77; Tewbe, 5, 11, 67, 79, 80; Fussîlet, 7.

**Dewlemendî nabe sedema çêtiriyê,** Qeses, 78-82; ‘Ebese, 1-10.

**Dewlemendî û rehmet di destê Ellah Teala de ne,** Alî Îmran, 73.

**Di malê zengînan de heqê feqîran jî heye,** Zariyat, 19; Me‘arîc, 24-25.

**Zilamê ku bi zengîniya xwe bi serxweveçûyî,** Kehf, 32-44; Qeses, 76-82.

**Zira‘et-çandinî,** Beqere, 267; En‘am, 95, 99, 141; E‘raf, 58; Yûnus, 47, 49, 63, 65; Re‘d, 4; Nehl, 1; Kehf, 32; Şû‘era, 148; Secde, 27; Waqî‘e, 63-65.

## ‘ILM, AQIL, TEFEKKUR, ‘IBRET

**Ayetên ku şîreta aqilxebitandinê dikin,** Beqere, 44, 73, 75, 164, 170, 171, 242; Alî Îmran, 65, 118; Maîde, 58, 100; En‘am, 32, 126, 151; E‘raf, 169; Enfal, 22; Yûnus, 16, 42, 100; Hûd, 51; Yûsuf, 2, 109; Re‘d, 4; Nehl, 12, 67; Enbiya, 10, 67; Hec, 46; Mu’mînûn, 80; Nûr, 61; Furqan, 44; Şû‘era, 28; Qeses, 60; ‘Enkebût, 35, 43, 63; Rûm, 24, 28; Yasîn, 62, 68; Saffat, 138; Zumer, 43; Xafir, 67; Zuxruf, 3; Casiye, 5; Hucûrat, 4; Hedîd, 17; Heşr, 14; Mulk, 10.

**Xwedî-eqlan,** Beqere, 164, 169, 197, 269; Alî Îmran, 7, 190; Maîde, 100; Yûsuf, 11; Re‘d, 19; Îbrahîm, 52; Nehl, 12; Sad, 29, 42; Zumer, 9, 18, 21; Xafir, 54; Telaq, 10.

**Ji bilî Ellah Teala zanîna yên din bi sînor e,** Beqere, 30-33, 255; Yûsuf, 76; Luqman, 34.

**Xwestina zanînê ji Ellah Teala,** Ta-Ha, 114.

**Divê mirov zanîna xwe hînî dîgerê xwe bike,** Beqere, 129, 151, 159, 174; Tewbe, 122; ‘Ebese, 1-4.

**Divê mirov li ser ya ku zanîna mirovî pê nîn e, nesekinê,** Alî Îmran, 66; Isra, 36.

**Divê mirov hukum li ya ku nizane nebire,** En‘am, 119, 144; Hecc, 8; Luqman, 20; Xafir, 83.

**Xwe ji cahilan (nezanan) dûrgirtin,** Beqere, 67; Maîde, 50; En‘am, 35; E‘raf, 199; Hûd, 46.

**Hin bûyerên ku divê mirov wan bifikire û îbretê ji wan bigre,** Yûnus, 5, 6, 12; Re‘d, 3, 4; Nehl, 11-13, 65, 66, 68, 79; Yûsuf, 7; Rûm, 19-25; Mu’mînûn, 21, 30; Şû‘era, 7-9; ‘Enkebût, 15, 24, 34, 35; Yasîn, 71; Sad, 27; Şûra, 39; Dûxan, 38, 39; Casiye, 4; Mulk, 19; Tariq, 5-7.

**Falkarî, sêhrbazî û efsûnkarî,** Beqere, 102; Maîde, 3, 90; feleq, 1-4.

**Gerîn-dîtin û feydeyên wê,** Alî Îmran, 137; En‘am, 6, 11; Yûsuf, 109; Nehl, 36; Hec, 46; Neml, 69; ‘Enkebût, 20; Rûm, 9, 42; Fatir, 44; Mumînûn, 21, 82; Muhemmed, 10.

**Hikmet,** Beqere, 251, 269; Ehzab, 34; Sad, 20; Zuxruf, 63; Qemer, 5; Cumû‘e, 2.

**Qîmetê zilamê ‘ilmê (zanînê),** Alî Îmran, 7, 18; Nîsa, 162; Isra, 107; Hec, 54; Şû‘era, 197; ‘Enkebût, 43; Fatir, 28; Zumer, 9; Mucadele, 11.

**Bihayê ‘ilmê û teşwîqkirina ‘ilmê,** Nehl, 43; Ta-Ha, 114; Qeses, 80; Zumer, 9; Mucadele, 11; ‘Eleq, 1-5.

**Tiştên ku însan dê wan nizanibe,** Re‘d, 8; Luqman, 43.

**Qada zanînê ya ku ji têgihiştina însên derbas dibe (xeyb),** Beqere, 33; En‘am, 59; E‘raf, 188; Hûd, 123; Nehl, 77; Kehf, 26; Meryem, 78; Furqan, 6; Neml, 65; Luqman, 34; Sebe’ 48; Fatir, 38; Yasîn, 11; Hucûrat, 18; Qelem, 47; Cin, 10, 26; Tekwîr, 24.

**Teşwîqkirina tefekkurê li ser heyîna kaînat û însên,** Fussîlet, 53; Zariyat, 20, 21.

**Qelem û nivîs,** Qelem, 1; ‘Eleq, 4, 5.

**Bi navê Ellah destpêkirina xwendinê,** ‘Eleq, 1.

**Xweparastina ji hukmdayîna pêşî,** Nîsa, 94; Hucûrat, 6.

**Pirsîn û hîn bûn,** Enbiya, 7.

**Tefekkur,** Beqere, 219, 266; Alî Îmran, 191; Maîde, 18; En‘am, 50; E‘raf, 176, 184; Yûnus, 24; Re‘d, 3; Nehl, 11, 44, 69; Rûm, 8, 21; Sebe’ 46; Zumer, 42; Casiye, 13; Heşr, 21.

**Zen-guman, zanîna vebirî îfade nake,** Yûnus, 36; Hucûrat, 12; Necm, 28.

## ÎNSAN

**Însan ketiyê hirsa xwe ye,** Me‘arîc, 19-21; Fecr, 16-20.

**Însan şûngirê ser erdê ye,** Beqere, 30; En‘am, 165; E‘raf, 69, 74; Yûnus, 14, 73; Neml, 62; fatir, 39; Sad, 26.

**Însan ji îbadetê bike, hatiye afirandin,** Hicr, 99; Zariyat, 56, 57; Mulk, 2; Cin, 16, 17.

**Însan qels hatiye afirandin,** Nîsa, 28.

**Ji însên re riya rast hatiye nîşandayîn,** Însan, 3.

**Neqenciyên ku însên di cehennemê werdikin,** Muddessir, 43-47.

**Yê ku însên baş dizane û bêhtir nêzîkî wî ye, yê ku ew afirandî ye,** Qaf, 16.

**Naçariya însên,** Maîde, 30, 31; Nehl, 4.

**Xwazgînîbûna însên ya ji bo emanetê Ellah Teala,** Ehzab, 72, 73; Heşr, 21.

**Çi were ser însên ji ber ya ku wî bi destê xwe kirî ye,** Rûm, 41; Şûra, 30, 34.

**Perwerdeya însên,** Rehman, 3-4.

**Heyber û derfetên ku ji xizmeta însên re hatine pêşkêşkirin,** Beqere, 29; Re‘d, 2-4; Îbrahîm, 32-34; Nehl, 5-14, 78, 80, 81; Isra, 70; Enbiya, 30-32; Hec, 36, 37, 63-65; Şû‘era, 132-134; Neml, 60-64, 86; Qeses, 71-73; ‘Enkebût, 60-63; Rûm, 20-25, 50; Luqman, 20, 29, 31; Secde, 37; Sebe’ 24; Fatir, 12, 13, 27, 28; Yasîn, 33-36; Zumer, 6, 21; Xafir, 61, 64, 79, 80; Zuxruf, 10-13; Casiye, 12, 13; Qaf, 7-11; Rehman, 1-12; Waqî‘e, 58-59, 63-65, 68-73; Mulk, 15; Nazî‘at, 30, Nebe’ 6-16.

**Di însên bi xwe de jî gelek îbret hene,** Fussîlet, 53; Casiye, 4; Zariyat, 21; Tariq, 5-7.

**Mahiyeta însên,** Yûnus, 12; Hûd, 9-11; Yûsuf, 11; Isra, 11, 70, 83, 84; Kehf, 54; Enbiya, 37; Hec, 66; Rûm, 33-36; Zumer, 8, 49; Fussîlet, 49-51; Şûra, 48; Texabun, 2, 3; Me‘arîc, 19-22; Beled, 4; ‘Adiyat, -8.

**Çêtiriya însên,** Beqere, 34; E‘raf, 11, 172, 173; Hicr, 29-30; Isra, 61, 62, 70; Ta-Ha, 55; Texabun, 3; Tîn, 1-5.

**Xulqiyeta însên,** Beqere, 28, 30; Alî Îmran, 6; Nîsa, 1; En‘am, 2, 98; E‘raf, 11, 189; Hicr, 26, 28; Nehl, 4, 72; Isra, 99; Ta-Ha, 55; Hec, 5; Mu’mînmûn, 12-14, 79; Furqan, 54; Rûm, 19, 20, 54; Luqman, 34; Secde, 7-9; Fatir, 11; Yasîn, 36, 77; Saffat, 11; Sad, 71, 74; Zumer, 6; Xafir, 64, 67; Casiye, 4; Qaf, 16; Necm, 45, 46; Waqî‘e, 57-59; Nûh, 14, 19; Qiyamet, 37-39; Însan, 1-2; Murselat, 20-22; ‘Ebese, 8-20; Tariq, 5-7; Tîn, 1-5; ‘Eleq, 2.

**Însan hewceyî Ellah Teala ye,** Fatir, 15.

**Însan hemû yek ummet bûn,** Beqere, 213.

**Armanca afirandina cin û însan,** Zariyat, 16.

**Cihêrengiya însanan,** Fatir, 32.

**Sedema ku derfetên cihê cihê ji însanan re hatine dayîn,** Zuxruf, 32.

**Însan li gorî irinê xwe ji wan re mertebe hene,** En'am, 132; Ehqaf, 19; Însan, 1-2 eyl, 4.

**Sedema ku însan li êl û milletan hatine parvekirin,** Hucûrat, 13.

**Tixumê însaniyetê,** Nîsa, 1.

**Xefleta Însên,** Enbiya, 1-3.

## AYETÊN KEWNÎ (Kozmolojîk)

**'Erş,** E'raf, 46, 48, 49, 54; Tewbe, 129; Yûnus, 3; Hûd, 7; Re'd, 2; Ta-Ha, 5; Enbiya, 22; Mu'mînûn, 86, 116; Furqan, 59; Neml, 26; Secde, 4; Zumer, 75; Xafir, 15; Zuxruf, 82; Hedîd, 4; Me'arîc, 3, 4; Burûc, 15.

**Li ser erş raserbûna Ellah Teala,** Re'd, 2; Ta-Ha, 5; Furqan, 59; Secde, 4; Hedîd, 4.

**Ferîşteyên ku 'Erşê Xwedê hildigrin,** Xafir, 7; Haqqe, 17.

**Xwediyê erş Ellah Teala ye,** Neml, 26; Burûc, 15.

**Heyv heta demeke diyarkirî dê bigere,** Re'd, 2; Luqman, 29, 30; Fatir, 13; Yasîn, 39, 40; Zumer, 5; Rehman, 5.

**Heyv ronahiya xwe ji rojê digre,** Şems, 2.

**Afirînerê heyvê,** E'raf, 54; Yûnus, 5; Enbiya, 33.

**Afirandina heyvê,** Furqan, 61; Nûh, 16.

**Afirandina çiyayan,** Re'd, 3; Hicr, 19; Nehl, 15; Qaf, 7; Nazî'at, 32.

**Livîna çiyayan,** Neml, 88.

**Di serê pêşî de dûman (xaz) bûna asîmanan,** Fussîlet, 11.

**Aferînerê asîmanan,** Beqere, 117; En'am, 14, 73, 101; Îbrahîm, 32; Hec, 65; Fatir, 1; Şûra, 11; Zariyat, 47; Rehman, 17; Texabun, 3; Nazî'at, 27.

**Afirandina asîmanan,** En'am, 101; E'raf, 54; Yûnus, 3; Hûd, 7; Re'd, 2; Hicr, 85; Nehl, 3; Enbiya, 30, 32; Furqan, 59; Luqman, 10; Secde, 4; Fussîlet, 11; Qaf, 38; Zariyat, 47; Hedîd, 4; Telaq, 12; Nazî'at, 28.

**Afirandina asîmanan di halê heft asîman de,** Beqere, 29; Isra, 44; Mu'mînûn, 17, 86; Fussîlet, 12; Telaq, 12; Mulk, 3; Nûh, 15; Nebe' 12.

**Teserufatiya di erd û asîmanan de ya Ellah Teala ye,** Beqere, 107; Alî Îmran, 187; Maîde, 40; Tewbe, 116; Nûr, 42; Furqan, 7; Yasîn, 83; Zumer, 62, 63; Şûra, 49; Zuxruf, 85; Casiye, 27; Fetih, 14; Hedîd, 2, 5; Burûc, 9.

**Liva tavê,** Enbiya, 33; Yasîn, 38.

**Afirandina tavê ji bo dem pê were zanîn,** En'am, 96.

**Aferînerê tavê,** E'raf, 54; Yûnus, 5; Enbiya, 33.

**Afirandina tavê,** Furqan, 61; Nûh, 16; Nebe' 13.

**Afirandina kaînatê,** En'am, 101; E'raf, 54; Yûnus, 3; Hûd, 7; Hicr, 85; Nehl, 3; Enbiya, 30; Furqan, 59; Secde, 4; Fussîlet, 11; Qaf, 38; Hedîd, 4; Telaq, 12.

**Risteya di kaînatê,** Enbiya, 22; Rehman, 2, 7; Mulk, 3, 4.

**Kursî,** Beqere, 255.

**Teqwîm (heyv, sal, mewsim),** Beqere, 189, 194, 217; Maîde, 2, 97; En'am, 96; Yûnus, 5; Tewbe, 5, 36; Nehl, 12; Isra, 12; Hec, 47; Rûm, 4, Secde, 5; Me'arîc, 4.

**Ellah Teala bi baranê erda mirî sax/hêşîn dike,** Nehl, 65; Rûm, 50; Fatir, 9; Fussîlet, 39; Zuxruf, 11; Casiye, 5; Qaf, 11; 'Ebese, 25-32.

**Parzemînên li erdê,** Re'd, 4.

**Aferînerê erdê,** Beqere, 117; En‘am, 14, 73, 101; Fatir, 1; Şûra, 11; Zariyat, 48; Texabun, 3.

**Afirandina erdê,** En‘am, 101; E‘raf, 54; Yûnus, 3; Hûd, 7; Re‘d, 3; Hicr, 19, 85; ehl, 3; Enbiya, 30; Furqan, 59; Secde, 4; Fussîlet, 9-11; Qaf, 38; Zariyat, 20; Hedîd, 4; Telaq, 12; Nebe’ 6.

**Aferînerê stêran,** E‘raf, 54.

**Melevaniya stêran ya ku di fezayê de digerin,** Yasîn, 40.

## QUR’AN

**Qur’an,** Maîde, 101; En‘am, 19; Yûnus, 15, 37, 61; Tewbe, 111; Yûsuf, 2; Re‘d, 31; Hicr, 1, 87, 91; Nehl, 98; Isra, 41, 45, 89; Kehf, 54; Ta-Ha, 2, 114; Furqan, 30; Neml, 1-6, 76, 92; Qeses, 85; Rûm, 58; Sebe’ 31; Yasîn, 2, 69; Sad, 1; Zumer, 27, 28; Zuxruf, 3; Fussîlet, 3; Qaf, 45; Rehman, 2; Waqî‘e, 77; Qelem, 51; Muzzemmil, 20; însan, 23; Burûc, 21; Inşîqaq, 21.

**Qur’an, divê giran giran were xwendin,** Muzzemmil, 4.

**Qur’an, digihîne riya herî rast,** Isra, 9.

**Qur’an, mirovan ji tarîtiyan derdixe ronahiyê,** Hedîd, 9.

**Qur’an, di şeva qedrê de hatiye xwarê,** Dûxan, 22; Qedr, 1.

**Qur’an, çima bi erebî hate xwarê,** Şûra, 7; Fussîlet, 44.

**Qur’an, çima hin bi hin hate xwarê,** Furqan, 31, 32.

**Qur’an, bê reqîb e,** Beqere, 23, 24; Yûnus, 38; Hûd, 13; Isra, 88.

**Qur’an, di heyva Remezanê de hatiye xwarê,** Beqere, 185.

**Qur’an, şîfa û rehmet e,** Isra, 82.

**Fikirîna li ser Qur’anê,** Nîsa, 82; Sad, 29; Muhemmed, 24.

**Di Qur’anê de dara ku la‘net lê hatîanîn,** Isra, 60.

**Di Qur’anê de ayetên muhkem û muteşabih,** Alî Îmran, .

**Di Qur’anê de nesix,** Beqere, 106.

**Di Qur’nê de deh ferman,** En‘am, 101-103; Isra, 22-39.

**Di Qur’anê de ayetên sicûdê,** E‘raf, 206; Re‘d, 15; Nehl, 50; Isra, 107; Meryem, 58; Hec, 18; Furqan, 60; Neml, 25; Secde, 15; Sad, 24; Fussîlet, 37; Necm, 63; Inşîqaq, 21; ‘Eleq, 19.

**Edeba guhdarîkirina Qur’anê,** E‘raf, 26.

**Yên ku nahêlin Qur’an were guhdarîkirin,** Fussîlet, 26.

**Yê ku Qur’anê diparêze Ellah Teala ye,** Hicr, 9.

**Pêxemberî Qur’an lêneaniye nenivîsandiye,** ‘Enkebût, 50.

**Mezinatiya Qur’anê,** Heşr, 21.

**Yên ku hatina Qur’anê ji Muhemmed re qebûl nakin,** Zuxruf, 31.

**Navên Qur’anê (Ehsen,ul-Hedîs),** Zumer, 23; (Furqan:) Beqere, 185; Furqan, 1; Hedîs) Waqî‘e, 81; (Kitêb) Beqere, 2, 159, 177; Alî Îmran, 3, 7; Nîsa, 105, 113, 123, 127, 130, 140; Maîde, 15; En‘am, 114, 155; E‘raf, 2, 196; Yûnus, 1; Hûd, 1; Yûsuf, 1; Re‘d, 1; Îbrahîm, 1; Hicr, 1; Nehl, 64, 89; Kehf, 1; Şû‘era, 2; Neml, 1; Qeses, 2, 86; ‘Enkebût, 47, 51; Luqman, 2; Secde, 2; Sad, 29; Zumer, 1, 2; Fusîllet, 3, 41; Zuxruf, 2; Dûxan, 2; Ehqaf, 2, 12; Tûr, 2; Waqî‘e, 78; (Nûr:) Texabun, 8; (Rûh:) Şûra, 52; (Zikir:) Hicr, 6, 9; Nehl, 44; Enbiya, 50; Yasîn, 69; Sad, 87.

**Awayê xwendina Qur'anê,** Isra, 106; Muzzemmil, 4.

**Ayeta ku xulaseya Qur'anê tê jimartin,** Beqere, 177.

## KITÊBÊN BERIYA QUR'ANÊ

**Incîl,** Alî Îmran, 3, 48, 65; Maîde, 46, 47, 66, 68, 110; E'raf, 157; Tewbe, 111; fetih, 29; Hedîd, 27.

**Tewrat,** Alî Îmran, 3, 48, 50, 5, 93; Maîde, 43, 44, 46, 66, 68, 110; Tewbe, 111; fetih, 29; Seff, 6; Cumû'e, 5.

**Zebûr,** Nîsa, 163; Enbiya, 105.

## MU'MIN-MISLIMAN, KAFIR, MUNAFIQ, MUŞRIK

**Yên deherî (yên ku bawer dikin dem wan dibe helakê),** Casiye, 24.

**Kafir nabin dost,** Nîsa, 144; Tewbe, 23; Mumtehîne, 1.

**Îta'eta kafiran nayê kirin,** Ehzab, 1, 48.

**Qenciyên kafiran feyde nadin wan,** Alî Îmran, 117.

**Hişyarî feyde nade kafiran,** Beqere, 6, 7; Yasîn, 10.

**Pirsên ku kafiran bê çare dihêlin,** Tûr, 28-43.

**Poşmaniya kafiran li axretê,** Xafir, 11; Ehzab, 64-68; Fatir, 37; Mulk, 10, 11.

**Ajotina kafiran ber bi cehennemê ve,** Zumer, 71, 72.

**Karên kafiran dê hewante herin,** Kehf, 104, 105; Nûr, 39; Ehzab, 19.

**Helwesta kafiran li hemberî Qur'anê,** Hec, 72.

**Mecûsî,** Hec, 17.

**Mu'minên ku xwe ji bo Ellah Teala kirine nezir,** Tewbe, 111.

**Bawermendên ku mizgînî ji wan re hatî,** Tewbe, 112.

**Danberheviya mu'min-kafirî,** Beqere, 26, 257; Hûd, 24; Nehl, 75, 76.

**Mu'min û fasiq wekhev nabin,** Secde, 18.

**Mu'min dostên hev û du ne,** Tewbe, 71.

**Bes mu'min birayên hev in,** Hucûrat, 10.

**Mu'min şûngirên li ser erdê ne,** Fatir, 39.

**Yên ku îftîra li mu'minan dikin û wan têşînin,** Ehzab, 58.

**Yên ku şkencê li mu'minan dikin û cezayê wan,** Burûc, 4-10.

**Riya mu'minan li axretê ronahî ye,** Hedîd, 12; Tehrîm, 8.

**Wezîfeya mu'minan îta'et e,** Nûr, 51, 52.

**Wesfên mu'minan yên dînî û exlaqî,** Mu'mînûn, 1-11.

**Helwesta mu'minan li hemberî hev û li hemberî kafiran,** Fetih, 29.

**Nûra mu'minan,** Tehrîm, 8.

**Rûyê mu'minan,** Fetih, 29.

**Teslîmiyeta mu'minan,** Ehzab, 22.

**Helwesta mu'minan,** Tewbe, 71, 75-77, 79.

**Saloxên mu'minan,** Enfal, 2-4; Re'd, 19-24; Şûra, 36-39; Me'arîc, 22-35.

**Qîmetê mu'min û zilamên 'ilmê,** Mucadele, 11.

**Munafiq,** Beqere, 8-20, 204, 206; Alî Îmran, 167; Nîsa, 61, 64, 69, 88, 138, 145; Enfal, 49.

**Munafiq nabin dost,** Nîsa, 89.

**Munafiq dostê kafiran e,** Heşr, 11.

**Nimêj li termê munafiqan nayê kirin,** Tewbe, 84.

**Bêinsafiya munafiqan li hemberî misilmanên qels,** Munafîqûn, 7, 8.

**Tebî'etê munafiqan,** Heşr, 11-14.

**Helwesta munafiqan,** Tewbe, 55-59, 67; Munafîqûn, 1-5.

**Li ser îslamê mirin,** Beqere, 132; Alî Îmran, 102, 193; E'raf, 126; Yûsuf, 101; Neml, 18, 89, 90.

**Ummeta misilman,** Beqere, 128.

**Kesayeta mislimên,** Maîde, 54.

**Ellah Teala navê "misilmanan" daniye,** Hec, 79.

**Misliman û gunehkar wekhev nabin,** Qelem, 35.

**Muşrikan zarok kirin yên Ellah Teala,** En'm, 6; Yûnus, 68-70; Nehl, 57, 62; Isra, 40; Meryem, 88-92; Enbiya, 26; Hec, 3, 4; Sebe' 40-42; Saffat, 149-159, 180; Zuxruf, 15, 16, 18, 79-82; Tûr, 39; Necm, 21, 22.

**Muşrikan ji bilî Ellah Teala hinek din ji xwe re kirin îlah,** Beqere, 165; Alî Îmran, 151; Nîsa, 117; Maîde, 76; En'am, 1, 107, 136, 150; E'raf, 191; Yûnus, 18, 66; Hûd, 109; Îbrahîm, 30; Hicr, 95, 96; Nehl, 73; Meryem, 81; Hec, 1113, 71, 74; Furqan, 3, 55; Yasîn, 74, 75; Saffat, 11; Sad, 5-7; Zumer, 15, 45, 67; Xafir, 10-12; Şûra, 9; Tûr, 43.

**Muşrik pûtan mehdervan qebûl dikin,** Yûnus, 18; Re'd, 14; Nehl, 55; Meryem, 81, 82; Zumer, 3, 43, 44.

**Muşrik qîmet nadin jinan,** En'am, 139; Nehl, 58, 59; Şûra, 17; Zumer,17; Tûr, 39; Necm, 21, 22.

**I'tîrafên muşrikan,** Mu'mînûn, 84-89.

**Kuştina muşrikan ya zarokên xwe yên keçik,** En'am, 137, 140; Nehl, 57-59; ûra, 17; Tekwîr, 8, 9.

**Daxwazên kelevajî yên muşrikan ji Pêxember,** Isra, 90-93.

**Sabiiyan,** Beqere, 62; Maîde, 69; Hec, 17.

## MIRIN Û PIŞTÎ MIRINÊ

**Baweriya bi axretê,** Beqere, 4, 46, 62, 123, 177; Alî Îmran, 9, 25; Nîsa, 38, 39, 59, 162; En'am, 113; E'raf, 147; Tewbe, 18, 19, 44; Yûnus, 45; Nehl, 22; Kehf, 110; Neml, 23; Luqman, 4; Şûra, 7; Me'arîc, 2, 26.

**Haziriya axretê,** Beqere, 110; Hec, 77; Yasîn, 12, 59; Heşr, 18; Qiyamet, 13.

**Dijwariya axretê,** Xafir, 18.

**Di qewimîna axretê de guman nîn e,** Casiye, 32.

**Li axretê hemû sirr kufş dibin,** Tariq, 9.

**Li axretê ferman ya Ellah Teala ye,** Infîtar, 19.

**Li axretê kî çi kiribe, bêkêmasî jê re tê dayîn,** Zumer, 70; Zilzal, 78.

**Li axretê însan nemir e,** Dûxan, 56.

**Li axretê rûyên bextiyar û bedbext,** Alî Îmran, 104; Muddessir, 20-25; 'Ebese, 33-42; Xaşiye, 1, 16.

**Li axretê poşmanî feyde nade,** Îbrahîm, 44.

**Li axretê azayên mirovî li serê şahidiyê dikin,** Fussîlet, 20-22.

**Li axretê uzrê zaliman derbas nabe,** Xafir, 52.

**Li axretê zilm nîn e,** Casiye, 22; Xafir, 17.

**Yên ku deftera 'emelê wan ji pişt wan ve tête dayîn,** Inşîqaq, 10-15.

**Yên ku deftera 'emelê wan bi rexê rastê wan tête dayîn,** Haqqe, 19-24; Isra, 71; Inşîqaq, 7-9.

**Yên ku deftera 'emelê wan bi rexê çepê wan tête dayîn,** Haqqe, 25-37.

**E'raf û xelkê e'rafê,** E'rafê, 46, 48.

**Cehennem dê ji însan û cinan were dagirtin,** Hûd, 119; Secde, 13.

**Vexwarina cehennemê,** Saffat, 57, 58, 67, 68; Waqî'e, 42, 54, 55; Nebe'24, 25; Xaşiye, 5.

**Rewşa kafiran li dojehê,** Îbrahîm, 16, 17; Kehf, 29; Mulk, 6-11.

**Li dojehê mirin nîn e,** Ta-Ha, 74; E'la, 12, 13.

**Dijwariya dojehê,** Mulk, 6-8; Muddessir, 26-31.

**Ferehiya dojehê,** Qaf, 30.

**Heft deriyên dojehê hene,** Hicr, 44.

**Vexwarina cennetê,** Saffat, 45-47; Tûr, 23; Waqî'e, 18, 19; Însan, 5-6, 15-18; Nebe' 34; Muteffîfîn, 25-28; Xaşiye, 14.

**Beşên cennetên (cennetên ednê:)** Tewbe, 72; Re'd, 23; Nehl, 31; Kehf, 31; Meryem, 62; Ta-Ha, 76; Fatir, 33; Sad, 50; Xafir, 8; Seff, 12; Beyyîne, 8; (cennetên firdewsê:) Kehf, 107; Mu'mînûn, 11; (cennetên me'wa:) Secde, 19; Necm, 13-15; (cennetên ne'îmê:) Saffat, 40-44; Waqî'e, 12; Infîtar 13.

**Wesfên cennetê,** Re'd, 35.

**Ecel,** Nîsa, 77; En'am, 2, 60; E'raf, 34; Yûnus, 49; Hûd, 3; Nehl, 61; Nûh, 4.

**Ecel naguhere,** E'raf, 34; Yûnus, 49; Nehl, 61; Mu'mînûn, 43; Munafîqûn, 11.

**Wesfên yên ku dibin warisên firdewsê,** Mu'mînûn, 1-11.

**Poşmaniya gunehkaran li axretê,** Mu'mînûn, 99, 100; Secde, 12; Nebe' 40.

**Heşr (roja qiyametê kombûna mirovan li ber destê Ellah Teala),** En'am, 94, 134; Hicr, 85; Nehl, 84, 89; Isra, 71; Kehf, 48; Ta-Ha, 15; Enbiya, 104; Hec, 7; 'Enkebût, 5; Rûm, 43; Sebe' 3; Xafir, 59; Zumer, 69; Şûra, 7, 19; Ehqaf, 3; Tûr, 1-8; Haqqe, 1-3; Murselat, 1-7; Nebe' 39.

**Gor û jiyana gorê,** En'am, 98; Tewbe, 84; Îbrahîm, 27; Ta-Ha, 124; Xafir, 46; Mumtehîne, 13; 'Ebese, 21; Tekasur,1-2.

**Kewser,** Kewser, 1.

**Elametên qiyametê,** Kehf, 97, 98; Enbiya, 96, 97; Neml, 82; Sebe' 14; Zuxruf, 43; Muhemmed, 18; Qiyamet, 6-10.

**Qiyamet û piştî wê,** Kehf, 47-49; Ta-Ha, 105-112.

**Dijwariya qiyametê,** Luqman, 33; Murselat, 6-9; 'Ebese, 33-42.

**Zanîna qiyametê ya Ellah Teala,** E'raf, 187; Ehzab, 63; Fussîlet, 47.

**Awayê qewimîna qiyametê,** Îbrahîm, 48; Tûr, 9, 10; Waqî'e, 1-7; Haqqe, 13-16; Muzzemmil, 14, 17, 18; Murselat, 8-14; Nebe' 18-20; Tekwîr, 1-6, 11-13; Infîtar, 1-4; Inşîqaq, 1-5; Zilzal, 1-5; Qarî'e, 1-5.

**Rewşa gunehkaran di wextê hatina qiyametê de,** Rûm, 55-57.

**Qewimîna qiyametê hemin e,** Kehf, 21; Hec, 7.

**Di çaxê rabûna qiyametê de însan,** Hec, 1, 2.

**Ferîşteyên kîramen katibîn,** Qaf, 17, 18; Infîtar, 11.

**Yên ku li Mehşerê kor in,** Ta-Ha, 124-128.

**Mirin,** Alî Îmran, 185; Nîsa, 18, 78; En'am, 60-62, 93; Îbrahîm, 18; Enbiya, 34, 35; Ehzab, 16; Zumer, 30, 42; Cumû'e, 6-8.

**Poşmaniya li ber mirinê,** Mu'mînûn, 99 100.

**Serxweşiya mirinê,** Qaf, 19.

**Mirin û jiyan ji bo imtîhanê hatine dayîn,** Mulk, 2.

**Her candar dê mirinê ta‘m bike,** Alî Îmran, 185; Isra, 99; Enbiya, 34, 35; Mu'mînûn, 15; ‘Enkebût, 57; Rehman, 26, 27.

**Piştî mirinê dîsa vejîn,** Hûd, 7; Nehl, 38, 39; Isra, 49-52, 97, 98, 99; Meryem, 66-72; ‘Enkebût, 19, 20; Rûm, 56.

**Sûr,** Ta-Ha, 102; Neml, 87; Yasîn, 51; Zumer, 68; Haqqe, 13; Qaf, 20; Muddessir, 8.

**‘Edaleta axretî,** Alî Îmran, 25; Nîsa, 109, 113, 114; Yûnus,54; Nehl, 111; Enbiya, 47.

**Ceza û ezabê axretî,** Maîde, 36; Kehf, 29; Secde, 20; Saffat, 62-73; Sad, 55-64; Dûxan, 43-49; Me‘arîc, 11-18.

**Berpirsiya axretî,** Beqere, 284; ‘Enkebût, 4, 13; Ehzab, 8; Tekasur, 8.

**Berferehiya mesûliyeta axretî,** Nehl, 15.

**Muhasebeya axretî,** Alî Îmran, 30; Îbrahîm, 51; Isra, 13, 14, 71, 72; Kehf, 47-79.

**Mukafata axretî,** Kehf, 30, 31, 107, 108; Meryem, 60-63; Ta-Ha, 75, 76; Hec, 23; Furqan, 75, 76; Saffat, 41-49; Sad, 49-54; Dûxan, 51-57; Zuxruf, 68-73; Rehman, 46-78; Tûr, 17-28; Însan, 11-22.

**Mukafata axretî di ser her qedrî re ye,** Secde, 17.

**Zebanî,** ‘Eleq, 18.

**Dara zeqqûmê,** Dûxan, 73; Waqî‘e, 52.

## PÊXEMBER (s)

**Muhemmed (s)** Alî Îmran, 144; Ehzab, 40; Muhemmed, 2.

**Muhemmed pêxemberê Ellah Teala ye,** Fetih, 29.

**Muhemmed ji alemê re rehmet e,** Enbiya, 107.

**Muhemmed ji hemû mirovan re hatiye şandin,** Sebe' 28.

**Pêxember (s)** Alî Îmran, 144, 164; Nîsa, 59-61, 80, 83, 115, 170; Maîde, 41, 83, 104; E‘raf, 57; Tewbe, 61, 73, 117; Ehzab, 1, 6, 13, 38, 45, 53; Mumtehîne, 12; Tehrîm, 8, 9.

**Pêxember mirov e,** Isra, 93; Kehf, 110; Fussîlet, 6.

**Pêxember ne kotekyar e,** Qaf, 45; Xaşiye, 21, 22.

**Pêxember li ser exlaqekî mezin e,** Qelem, 4.

**Pêxember islahker e,** Hûd, 88.

**Jina ku bi pêxemberî re têdikoşe,** Mucadele, 1.

**Pêxember ji ber xwe ve napeyive,** Necm, 3.

**Pêxember ji bo bawermendan re ji canê wan jî hê li pêştir e,** Ehzab, 6.

**Pêxember, bi edaletî wezîfeya xwe ya teblîxê aniye cih,** Enbiya, 109.

**Pêxember, heqzimanê xwe naxwaze,** Yûsuf, 104; Furqan, 57; Sebe, 47; Şûra, 23.

**Pêxember û yê nebîn,** ‘Ebese, 1-11.

**Pêxember û hevserên xwe,** Tehrîm, 1, 3-5.

**Bi Pêxemberî re bî‘etkirin,** Fetih, 10.

**Jinên ku ji Pêxemberî re hatine helalkirin,** Ehzab, 50.

**Li ber pêxemberî rabûn,** Nîsa, 115.

**Selat û silav li Pêxemberî bin,** Ehzab, 56.

**Ji Pêxemberî re rêzgirtin,** Nûr, 62, 63; Hucûrat, 1-5.

**Bi hekemtî qebûlkirina Pêxemberî,** Nîsa, 65.

**Mûcîzeya Pêxember a duşeqkirina heyvê,** Qemer, 1.

**Sînorê wezîfeya Pêxember,** ‘Enkebût, 18; Fatir, 23, 24; Sad, 65, 70.

**Hevserên Pêxember,** Ehzab, 28-34, 51-53; Tehrîm, 1.

**Hevserên Pêxember dayîkên bawermendan e,** Ehzab, 6.

**Sebata Pêxember ya di îmanê de,** En‘am, 56-58.

**Mûcîzeya pêxemberî ya Mi‘racê,** Isra, 1; Necm, 1-18.

**Sedema rîsaleta Pêxember,** Ehzab, 45-48.

**Gotina Pêxember wehî ye,** Necm, 3-5.

**Şefa‘eta Pêxember,** Hicr, 88.

**Wezîfeya Pêxember a teblîxê,** Maîde, 67.

**Wezîfeya Pêxember a nefspiçûkiyê,** En‘amê, 52.

**Dilnermiya Pêxember li hemberî ummeta wî,** Tewbe, 128; Kehf, 6; Şû‘era, 3.

**Sînorê selahiyeta Pêxember,** En‘am, 50, 66, 104, 106, 107; Yûnus, 49, 108; Hûd, 12; Nehl, 35, 82; Furqan, 56; ‘Enkebût, 50; Şûra, 48; Ehqaf, 9.

**Pêwîstiya îta‘etê ji bo hukmên Pêxember,** Heşr, 7.

**Pêxember ne xwediyê xezîneyên Ellah Teala ne,** Hûd, 31.

**Di navbera pêxemberan de ferq nîn e,** Beqere, 136.

**Pêxember jî berpirs in,** E‘raf, 6.

**Pêxember xeybê nizanin,** Hûd, 31.

**Pêxember ne ferîşte ne,** Hûd, 31.

**Pêxember sade beşer in,** Îbrahîm, 11.

**Di bara hin pêxemberan de di Qur’anê de agahî nehatine dayîn,** Xafir, 78.

**Fezîleta pêxemberan,** Beqere, 253.

**Resûl-Resûlûllah,** Beqere, 108, 143, 150; E‘raf, 158; Tewbe, 29, 32; Ehzab, 29, 31, 33, 40, 57; Muhemmed, 32, 33; Fetih, 9, 12, 17, 27, 28, 29; Hucûrat, 1, 4, 7; Mucadele, 5, 9, 12, 21, 22, 23; Heşr, 4, 7, 8; Mumtehîne, 1; Seff, 9; Cumû‘e, 2; Texabun, 8; Telaq, 8.

**Resûlekî kerîm,** Haqqe, 40.

**Resûlûllah nimûneya herî sipehî ya exlaqî ye,** Ehzab, 21.

**Helwesta muşrikan ya li hemberî Resûlûllah,** Mucadele, 8.

**Wezîfeya Resûlûllah teblîx e,** Maîde, 99.

**Gazinda Resûlûllah ji yên ku berê xwe ji Qur’anê vegerandine,** Furqan, 30.

**Şefqeta Resûlûllah li mu’minan,** Şû‘era, 215.

**Gazîkirina Resûlûllah ya lêzimên xwe yên nêzîk ji bo dîn,** Şû‘era, 214.

## PÊXEMBER Û QEWMÊN WAN

**Adem (s)** Beqere, 31, 33, 37; Nîsa, 116, 120; En‘am, 2; Hicr, 26, 28, 43; Rûm, 21; Secde, 7.

**Adem û şetan,** Beqere, 34-36; E‘raf, 19-24; Isra, 61-62; Kehf, 50; Ta-Ha, 116-119.

**Her du kurên Adem,** Maîde, 27-31.

**Afirandina Adem,** Beqere, 30; Alî Îmran, 59; Nîsa, 1; E‘raf, 189; Mu’mînûn, 12; Furqan, 54; Secde, 7; Fatir, 11; Saffat, 11; Sad, 71-74; Xafir, 67; Necm, 32; Rehman, 15; Nûh, 19.

**Zanîna Adem,** Beqere, 27.

**Tobeya Adem,** Beqere, 37.

**Azer,** En‘am, 74.

**Calût,** Beqere, 249-251.

**Dawud (s)** Beqere, 251; Nîsa, 163; Maîde, 78; En‘am, 84; Neml, 15, 16; Enbiya, 78-82; Ehzab, 10-11; Sad, 17-26, 30.

**Bi karanîna Dawud ya hesinî,** Ehzab, 10, 11.

**Xwedî-kitêb,** Beqere, 105; Alî Îmran, 64, 65, 69- 72, 75, 98, 110, 113; Nîsa, 153, 159, 171; Maîde, 15, 19, 59, 65, 68, 77; Hedîd, 29; Heşr, 2, 11; Beyyîne, 1, 2, 6.

**Ji xwedî-kitêban yên qenc û neqenc,** Alî Îmran, 75, 113-115.

**El-Yes'e -'eleyhîsselam-** En'am, 86; Sad, 48.

**Xelkê Eykeyê,** Hicr, 78, 79; Sad, 13; Qaf, 14.

**Eyyûb (s)** Nîsa, 163; En'am, 84; Enbiya, 83-84; Sad, 41-44.

**Firewn,** Beqere, 49; Alî Îmran, 11; Enfal, 52, 54; Yûnus, 75; Hûd, 97; Îbrahîm, 6; Isra, 101, 102; 'Enkebût, 39; Qaf, 13; Haqqe, 9; Muzzemmil, 105, 106; Burûc, 18; Fecr, 10.

**Binavbûna Firewn û alîgirên wî,** Beqere, 50.

**Jina Firewnî,** Tehrîm, 11.

**Îdîaya Firewn ya îlahtiyê,** Nazî'at, 24.

**Haxam,** Tewbe, 31, 34.

**Haman,** 6, 8; Qeses, 38; 'Enkebût, 39.

**Harûn -'eleyhîsselam-** Beqere, 248; Nîsa, 163; En'am, 84; Yûnus, 75; Meryem, 53; Ta-Ha, 29; Enbiya, 47; Furqan, 35.

**Hewarî,** Alî Îmran, 52; Maîde, 111, 112; Seff, 14.

**Ji her welatî, ji her milletî re pêxemberek hatiye şandin,** Nehl, 36; Qeses, 59.

**Gelê Hicrê,** Hicr, 80-84.

**Xrîstiyan,** Beqere, 62, 111, 113, 120, 135, 140; Alî Îmran, 67; Maîde, 14, 18, 51, 69, 82; Hec, 17.

**Filehan, heqê ruhbantiya ku ji ber xwe ve deanîn li ber çav negirtin,** Hedîd, 27.

**Hûd -'eleyhîsselam- û qewmê 'Ad,** E'raf, 65-72; Tewbe, 70; Hûd, 50-60; Îbrahîm, 9; Hec, 42; Furqan, 21-26; Qaf, 13; Necm, 50; Qemer, 18-21; Haqqe, 4, 6; Fecr, 6.

**Îbrahîm (e)** Beqere, 124-127, 130, 132, 133, 135, 136, 140, 258, 260; Alî Îmran, 33, 65-68, 84, 95, 97; En'am, 74, 75, 83; Hûd, 74-76; Yûsuf, 6, 38; Hicr, 51; Nehl, 119, 123; Hec, 36; Ehzab, 7; Sad, 45; Şûra, 13; Hedîd, 26; Mumtehîne, 4.

**Îbrahîm û bavê wî,** En'am, 74; Meryem, 41-50.

**Îbrahîm û qewmê wî,** Tewbe, 70; Enbiya, 51-73; Hec, 43; Şû'era, 69-104; 'Enkebût, 16-35; Saffat, 83-99; Zuxruf, 26-28.

**Îbrahîm û mêvanên wî,** Zariyat, 24-37.

**Lêborîn-xwestina Îbrahîm ji bo bavê xwe,** Tewbe, 114.

**Dînê henîf ê Îbrahîm,** En'am, 161; Hec, 78.

**Dûayê Îbrahîm,** Beqere, 127-129; Îbrahîm, 35-41.

**Di Îmanê de gihîştina Îbrahîm a yeqînê,** En'am, 75-81.

**Jina Îbrahîm,** Hûd, 72.

**Milletê (dînê) Îbrahîm,** Beqere, 130, 135.

**Xewna Îbrahîmî,** Saffat, 101, 113.

**Sihûfên (rûpelên) Îbrahîm,** Necm, 36, 37; E'la, 19.

**Zurriyeta Îbrahîm,** Meryem, 58.

**Îdrîs (e)** Meryem, 56, 57; Enbiya, 85.

**Ilyas (e) û qewmê wî,** En'am, 85; Saffat, 123-132.

**Silav li Ilyas be,** Saffat, 130.

**Îmran,** Alî Îmran, 33, 34.

**Keça Îmran Meryem,** Tehrîm, 12.

**Îsa, (e)** Beqere, 87; Alî Îmran, 45, 52, 55, 59, 84; Nîsa, 163; Maîde, 116; En'am,

85; Şûra, 13; Zuxruf, 57; Heşr, 6; (esîh:) Maîde, 72, 75; Tewbe, 30, 31.

**Îsa mizgîniya hatina Muhemmed da,** Seff, 6.

**Îsa Mesîh berhema gotina Ellah Teala ya; "bibe, ew jî bû" ye,** Nîsa, 171.

**Îsa bendeyê Ellah Teala ye,** Meryem, 130.

**Îsa kurê Meryem e,** Beqere, 253; Mu'mînûn, 50; Ehzab, 7; Hedîd, 27.

**Yên ku dibêjin: " Îsa Mesîh kurê Ellah e",** Maîde, 17.

**Îsa Mesîh li çarmixê nehatiye xistin,** Nîsa, 157, 158.

**Dûaya Îsayî,** Maîde, 114, 118.

**Mûcîzeyên Îsayî,** Alî Îmran, 49; Maîde, 46, 78, 110.

**Mijara wefata Îsayî,** Alî Îmran, 55.

**Îshaq (e)** Beqere, 133, 136, 140; Alî Îmran, 84; Nîsa, 163; En'am, 84; Hûd, 71; Yûsuf, 6, 38; Meryem, 49; 'Enkebût, 27; Saffat, 112, 113; Sad, 45.

**Îsmaîl (e)** Beqere, 125, 127, 133, 136, 140; Alî Îmran, 84; Nîsa, 163; En'am, 86; Îbrahîm, 39; Meryem, 54, 55, 58; Enbiya, 85; Sad, 48.

**Zaroyên Îsraîl,** Beqere, 40, 83-102, 122, 211, 246; Alî Îmran, 93; Maîde, 12, 32, 70, 72, 110; Isra, 4, 101, 104; Şû'era, 197; Neml, 76; Secde, 23; Casiye, 16, 17; Ehqaf, 10.

**Fermanên ku li zaroyên Îsraîl hatibûn kirin,** Beqere, 83, 84.

**Tevdankariya zaroyên Îsraîl,** Isra, 4-7.

**Gunehên zaroyên Îsraîl,** Beqere, 61.

**La'net li zaroyên Îsraîl,** Beqere, 88; Maîde, 13.

**Qarûn,** Qeses, 76; 'Enkebût, 39.

**Keşîş,** Maîde, 82.

**Hikmet ji Luqman re hatiye dayîn,** Luqman 13.

**Şîretên Luqman li kurê wî,** Luqman, 13, 16-19.

**Lût** En'am, 86; 'Enkebût, 36.

**Lût û qewmê wî,** E'raf, 80-84; Hûd, 70, 74, 77-83, 89; Hicr, 59-77; Enbiya, 71-74; Hec, 43; Şû'era, 160-175; Neml, 54-66; Saffat, 133-138; Sad, 13; Qaf, 13; Qemer, 32-39.

**Jina Lût,** Tehrîm, 10.

**Mecûsî,** Hec, 17.

**Gelê Medyenê,** Tewbe, 70; Hec, 49.

**Meryem -Xwedê jê razî be-** Alî Îmran, 36, 37, 42-45; Nîsa, 171; Maîde, 17, 110, 116; Tewbe, 31; Enbiya, 91.

**Bêbextî li Meryemê,** Nîsa, 156, 157.

**Anîna Meryemê ya Îsa bo dinyayê,** Meryem, 16-36.

**Mûsa (e)** Beqere, 51, 53; Alî Îmran, 84; En'am, 84, 91, 154; Yûnus, 75; Hûd, 96, 110; Isra, 2, 101; Meryem, 51-53; Enbiya, 47; Hec, 47; Furqan, 35; 'Enkebût, 39; Secde, 23; Ehzab, 7, 69; Fussîlet, 45; Şûra, 13.

**Mûsa û Harûn, Firewn û zaroyên Îsraîl,** Beqere, 54-93, 246, 248; Nîsa, 153, 164; Maîde, 20-26; E'raf, 103-157, 159-172; Yûnus, 75-93; Îbrahîm, 5-8; Ta-Ha, 25-35, 90, 91; Mu'mînûn, 44-49; Şû'era, 10-61; Neml, 7-14; Qeses, 3-42; 76; Saffat, 114-122; Xafir, 23-45, 53; Dûxan, 17-37; Zuxruf, 46-56; Zariyat, 38-42; Seff, 5; Nazî'at, 15-26.

**Silav li Mûsa û Harûn be,** Saffat, 120.

**Mûsa û evdê salih,** Kehf, 60-82.

**Duayê Mûsa,** E'raf, 155, 156.

**Kitêba Mûsa,** Hûd, 17; Ehqaf, 12.

**Mu'cîzeyên Mûsa,** E'raf, 107, 108, 117.

**Sihûf (rûpel) ên Mûsa,** Necm, 36; E'la, 19.

**Nûh (e)** Alî Îmran, 33; Nîsa, 163; En'am, 84; Isra, 3, 17; Meryem, 58; Enbiya, 76; Ehzab, 7; Şûra, 13; Hedîd, 26.

**Nûh û gelê wî,** E'raf, 59-64; Tewbe, 70; Yûnus, 71-73; Hûd, 25-49, 89;

Îbrahîm, 9; Hec, 42; Mu'mînûn, 23-30; Furqan, 37; Şû'era, 105-122; 'Enkebût, 14, 15; Sad, 12; Xafir, 5, 31; Qaf, 12; Zariyat, 46; Necm, 52; Qemer, 9-16; Nûh, 1-28.

**Silav li Nûh be,** Saffat, 79.

**Duayê Nûh,** Nûh, 28.

**Keştiya Nûh,** Hûd, 37-44.

**Jina Nûh,** Tehrîm, 10.

**Dûaya Nûh ya ku ji bo kurê xwe kirî û nehatî qebûlkirin,** Hûd, 45-47.

**'Emrê Nûh,** 'Enkebût, 14.

**Rahib,** Maîde, 82; Tewbe, 31, 34.

**Xelkê Ressê,** Furqan, 38; Qaf, 12.

**Sabiîn,** Maide, 69; Hec, 17.

**Salih -'eleyhîsselam- û qewmê Semûd,** E'raf, 73-79; Tewbe, 70; Hûd, 61-68, 89; Îbrahîm, 9; Hec, 42; Furqan, 38; Şû'era, 141-159; Neml, 45-53; 'Enkebût, 38; Sad, 13; Xafir, 31; Fussîlet, 13, 17; Qaf, 12; Zariyat, 43-45; Necm, 51; Qemer, 23-31; Haqqe, 4, 5; Burûc, 18; Şems, 11-15.

**Samirî,** Ta-Ha, 85, 87, 95.

**(Gelê) Sebe'yê,** Sebe' 15.

**Suleyman -'eleyhîsselam-** Beqere, 102; Nîsa, 163; En'am, 84; Enbiya, 78, 79, 81; Sebe' 12; Sad, 30, 34.

**Suleyman û şaha Sebe'yê,** Neml, 15-44.

**Hukmdariya Suleyman,** Ehzab, 12, 13.

**Şu'eyb û xelkê Medyenê,** E'raf, 85-93; Hûd, 84-95; Şû'era, 176-191; 'Enkebût, 36, 37.

**Talût,** Beqere, 247, 249.

**Qewmê Tubbê,** Qaf, 14.

**Uzeyr Tewbe,** 30.

**Cihû,** Beqere, 62, 111, 113, 120, 135, 140; Alî Îmran, 67; Nîsa, 46, 160; Maîde, 18, 41, 44, 51, 64, 69, 82; Tewbe, 30; Nehl, 118; Hec, 17.

**Lanet li cihûyan hatiye barîn,** Maîde, 64, 78.

**Cihû tevdankar in,** Maîde, 64.

**Tiştên ku li cihûyan hatin heramkirin,** En'am, 146.

**Yehya** Alî Îmran, 39; En'am, 85; Meryem, 7, 12-15.

**Yaqûb** Beqere, 122, 136, 140; Alî Îmran, 84; Nîsa, 163; En'am, 84; Hûd, 71; Yûsuf, 38; Meryem, 49; 'Enkebût, 27; Sad, 45.

**Zaroyên Yaqûb,** Meryem, 6.

**Sebra Yaqûb,** Yûsuf, 18, 84, 86.

**Yacûc macûc,** Kehf, 91; Enbiya, 96.

**Yûnus -'eleyhîsselam-** Nîsa, 163; En'am, 86; Yûnus, 98; Saffat, 139-148.

**Yûsuf** En'am, 84; Xafir, 34.

**Yûsuf,** bavê wî û birayên wî, Yûsuf, 4-20, 58-101.

**Namûsparêziya/iffeta Yûsuf,** Yûsuf, 23-29, 32-34, 51.

**Şîrovekirina Yûsuf a xewnan,** Yûsuf, 36, 37, 41, 43-49.

**Zekeriya** Alî Îmran, 37, 38; En'am, 85; Enbiya, 89, 90; Meryem, 1-11.

**Zu'l-Qerneyn** Kehf, 83-101.

**Zu'l-Kifl** Enbiya, 85; Sad, 48.

**Zu'n-Nûn** Enbiya, 87-88.

## ŞER-CÎHAD

**Xeranekirina peymanê,** Enfal, 56, 58, 72; Tewbe, 12, 13.

**Yekîtî-pevrebûn,** Beqere, 178; Alî Îmran, 103-105; Enfal, 46, 61-63;

**Aştî,** Nîsa, 128; Enfal, 61-63; Hucûrat, 9.

**Aştî û şer,** Mumtehîne, 8, 9.

**Tevdankar,** Beqere, 11, 12, 204-206.

**Îta'eta tevdankaran nayê kirin,** Şû'era, 151, 152.

**Li hemberî casûs/nokeran hişyar bûn,** Hucûrat, 6; Mumtehîne, 10.

**Cîhad,** Nîsa, 95, 96; Enfal, 72; Tewbe, 19, 20, 41, 44; Furqan, 52; Hec, 78; Hucûrat, 15.

**Fermana cîhadê,** Tewbe, 73.

**Yên ku cîhadê revîne,** Tewbe, 81, 86, 87, 90, 93-96.

**Helwest li hemberî milletên dijmin,** Alî Îmran, 28, 73.

**Li hemberî dijminan amadekirina hêzê,** Nîsa, 71; Enfal, 60; Tewbe, 46; Enbiya, 80.

**Ji dijminî tirsîn,** Tewbe, 13.

**Li hemberî xwedî-kitêban banga yekîtiyê,** Alî Îmran, 64.

**Li hemberî xwedî-kitêban helwest,** Alî Îmran, 149; 'Enkebût, 46.

**Li peyçûna xwedî-kitêban,** Alî Îmran, 100, 105.

**Bi qencî dan û standina digel yexsîran,** Beqere, 177; Enfal, 69-71; Muhemmed, 4; Însan, 8-12.

**Fitne ji kuştinê dijwartir/xirabtir e,** Beqere, 217.

**Parvekirina fey'û xenîmeyê,** Heşr, 6-9.

**Xenîme,** Enfal, 1, 41, 69.

**Di heyvên bi hurmet de şer,** Beqere, 194, 217; Maîde, 2; Tewbe, 5, 36, 37.

**Kafir nabin dost,** Alî Îmran, 118-120.

**Lehengî,** Beqere, 249-251.

**Cezakirina cihûyên Medînê,** Heşr, 2-4.

**Parastina rewa,** Şûra, 39, 41.

**Peymana navneteweyî,** Nîsa, 90, 92.

**Nobet-girtin,** Alî Îmran, 200.

**Şer,** Beqere, 190-194, 216, 217, 244, 246; Alî Îmran, 195; Nîsa, 71-78, 84; Enfal, 39, 40; Tewbe, 5, 12, 29; Ehzab, 20, 25, 26.

**Amadekarî ji bo şer,** Enfal, 60.

**Rêzekarî/disîplîna şer,** Seff, 4.

**Fermana şer,** Tewbe, 11, 123.

**Di navbera şer de pêşniyara aştiyê,** Muhemmed, 35.

**Yên ku di bara şer de sistahiyê dikin,** Muhemmed, 20.

**Di bara şer de hin hukim,** Muhemmed, 4.

**Ayetên ku destûra şer didin,** Hec, 39, 40.

**Li hemberî şer şer,** Tewbe, 36.

**Teşwîqa şer,** Enfal, 65-67.

**Hikmetên şer,** Enfal, 5-8, 42-44; Tewbe, 13-15; Muhemmed, 4, 31.

**Di şer de pişta xwe sipartina Ellah Teala,** Alî Îmran, 173-175; Enfal, 49; Tewbe, 25, 26.

**Di şer de helwesta munafiqan,** Alî Îmran, 154-156, 166-158; Nîsa, 72, 73, 77, 78, 91, 141; Enfal, 49; Tewbe, 42-53, 65, 66, 81-83, 86, 87, 90, 93-95; Nûr, 54; Ehzab, 9-20, 24; Muhemmed, 20, 21; fetih, 11, 12, 15, 16.

**Di şer de zêdegavî nekirin,** Beqere, 190, 192, 193; Enfal, 39.

**Di şer de sebr û sebat,** Nîsa, 104; Enfal, 15, 16, 45.

**Di şer de destlênedana bêterefan,** Nîsa, 90, 91.

**Yên ku di şer de destûr ji wan re hatî dayîn li paş bimînin,** Tewbe, 91, 92, 122.

**Bêyî uzr ji şer mayîn,** Nîsa, 95; Tewbe, 38-40.

**Seferberî,** Nîsa, 71; Tewbe, 41.

**Parastina welêt,** Beqere, 246.

**Serkeftin ji Ellah Teala ye,** Alî Îmran, 125, 126, 165.

**Serkeftin ji wan re ye ku Ellah Teala arî wan bike,** Alî Îmran, 160; Maîde, 56; Tewbe, 15; Rûm, 2-5.

**Serkeftin ji bawermendan re ye,** Alî Îmran, 123, 139, 148; Re'd, 41; Enbiya, 105; Nûr, 55; Rûm, 60; Fetih, 23; Munafîqûn, 8.

**Serkeftina ji îslamê re ye,** Enbiya, 44; Nûr, 55; Fetih, 28.

## RISTEYA CIVATÊ

**Edalet (li exlaq binêre),**

**Dadgerên adil,** Nîsa, 135; Maîde, 8; Şû'era, 105-27; Sad, 2.

**Bi ya ku Ellah Teala anî xwarê hukm kirin,** Maîde, 44, 45, 47-49.

**Bey'et (peymana îta'etê ji bo serokê dewletê),** Maîde, 12; Fetih, 10, 18; Mumtehîne, 12.

**Cezayê fesadiyê,** Maîde, 33.

**Di cezayî de bi eynî awayî bersivdayîn,** Nehl, 126; Hec, 60; Şûra, 40-43; Mumtehîne, 11.

**Di cezakirinê de edalet,** Nehl, 126.

**Diyet,** Nîsa, 92; Isra, 33.

**Riba,** Beqere, 275, 278; Alî Îmran, 130.

**Fitne,** Beqere, 217; Nîsa, 91; Maîde, 71; Enfal, 25, 28, 39; Tewbe, 47, 49; Ehzab, 14.

**Helal û heram,** Beqere, 168, 172, 173; Maîde, 3, 77, 88, 90; En'am, 119-121, 145; E'raf, 13; Nehl, 115.

**Heq, nabe ku li pey arzûyên mirovan biçe,** Mu'mînûn, 71.

**Li ser pêyan-girtina heqiyê,** Maîde, 5.

**Isyana bêheqî,** E'raf, 33.

**Cezayê hebsê,** Nîsa, 15.

**Cezayê bi şaşî kuştina mêran,** Nîsa, 92.

**Fileh û cihû nabin dost,** Maîde, 51.

**Teqlîdkirina fileh û cihûyan,** Beqere, 120.

**Cezayê diziyê,** Maîde, 38.

**Berpirsiya civakî,** Nîsa, 85.

**Xwekujî,** Nîsa, 29-31.

**Islahkirin,** Beqere, 160, 182.

**Istîşare-şêwr,** Beqere, 233; Alî Îmran, 159; E'raf, 107-114; Neml, 29-34; Şûra, 38.

**Şîreta qenciyê, men'a neqenciyê,** Alî Îmran, 104, 110, 114; E'raf, 157; Tewbe, 67, 71, 112; Hec, 41; Luqman, 17.

**Hakimiya jinan,** Zuxruf, 18.

**Îta'eta kafiran nayê kirin,** Alî Îmran, 149; Kehf, 28; Furqan, 52; Qeses, 86; Ehzab, 1-3, 48; Şûra, 15; Însan, 24; 'Eleq, 19.

**Cezayê qatilan,** Nîsa, 92, 93; Maîde, 32; Furqan, 68, 69.

**Qisas/tolhildan,** Beqere, 178-179; Maîde, 45.

**Bi kole û cariyeyan re qenc bihurandin û pêkanîna azadiyê,** Beqere, 177; Alî Îmran, 35; Nîsa, 36, 92; Maîde, 89; Nehl, 71; Nûr, 33; Mucadele, 3; Beled, 12, 13.

**Cezayê neqenciyê hemberiyeke munasibî wê ye,** Şûra, 40.

**Teşhîrkirina neqenciyê,** Nîsa, 148.

**Xirabûna serokan,** Isra, 16.

**Cih û meqam,** En'am, 123; Yûsuf, 54-56; Şû'era, 83; Neml, 15-16; Sad, 35.

**Kesîniya berpirsiyê,** Nîsa, 112; En'am, 164; Yûnus, 41; Isra, 15; 'Enkebût, 12; Fatir, 18; Zumer, 7; Şûra, 15; Necm, 38.

**Peymana navneteweyî,** Nîsa, 90, 92.

**Mîras,** Nîsa, 7, 8, 11, 13, 19, 33, 127, 176; Fecr, 19.

**Rêz û rêçên muaşeretê (dan û standina jin û mêr bi hev re),** Ehzab, 53.

**Kesîniya binbariyê,** Nîsa, 84.

**Civaka mutedil (navîngir/pîvandar),** Maîde, 66.

**Rêzgirtin ji mafê milkiyetê re,** Beqere, 188.

**Destdirêjîkirina li milkiyetê,** Nîsa, 161.

**Ellah Teala mu'min li ser erdê kirine şûngir,** En'am, 165.

**Îta'eta munafiqan nayê kirin,** Ehzab, 1-3, 48.

**Berferehkirina destferehiyê,** Heşr, 7.

**Ji yên ku silav didin re nebêjin; "tu ne misilman î",** Nîsa, 94.

**Silavkirin û destûrxwestina çûna hundiru,** Nûr, 27, 29, 54, 59, 61.

**Bi ya sipehîr pêşwazîkirina yê ku silav dike,** Nîsa, 86.

**Şahidîkirin,** Beqere, 142, 282; Nîsa, 135; Hedîd, 19.

**Veşartina şahidiyê,** Beqere, 140, 146, 283.

**Di şahidîtiyê de durustî û edalet,** Maîde, 8, 106, 108; Yûsuf, 81; Telaq, 2; Me'arîc, 33.

**Di şahidiyê de derew,** Beqere, 42, 188; Furqan, 72.

**Şerî'et,** Maîde, 48; Hec, 67; Şûra, 13, 21; Casiye, 18.

**Teqlîda bêhişî,** Beqere, 170, 171.

**Bi qesd kuştina mirovan,** Nîsa, 93; Maîde, 32.

**Di teklîfê de hêsanîkirin,** Beqere, 286; E'raf, 42; Mu'mînûn, 62; Telaq, 7.

**Îta'eta karbidestan,** Nîsa, 59, 83; En'am, 105.

**Wesiyet,** Beqere, 180-182, 240; Nîsa, 12; Maîde, 106, 108.

**Durustiya wezîfe-xwestinê,** Yûsuf, 55.

**Sond,** Beqere, 224, 225; Maîde, 89; Nehl, 91.

**Mafê sêwî û arîkariya yê sêwî, (li exlaqî binêre),**

**Zerûret û ruxset-ezîmet,** Maîde, 3; En'am, 115, 119; Nehl, 115.

**Cezayê bêbextiya zinayê,** Nûr, 4, 5.

**Zilm û zalim, (li exlaqî binêre),**

## NAVÊ CIHAN

**Bedr,** Alî Îmran, 123.

**Beytul-Heram,** Maîde, 2; Kureyş, 3.

**Beytul-Ma'mûr (Ka'be),** Tûr, 4.

**(Çiyayê) Cûdî,** Hûd, 44.

**Îrem,** Fecr, 7.

**Huneyn,** Tewbe, 25.

**Ka'be,** Maîde, 97.

**Medîne,** Tewbe, 120.

**Medyen,** Ta-Ha, 40; Qeses, 22, 23.

**Mekke,** Alî Îmran, 96; fetih, 24.

**Merwe,** Beqere, 158.

**Mescîdud-Dîrar,** Tewbe, 107.

**Mescîdul-Heram,** Beqere, 144, 149, 150, 217; Enfal, 34; Tewbe, 7, 28; Hec, 26; fetih, 27.

**Misr,** Yûnus, 87; Yûsuf, 21, 99; Zuxruf, 51.

**Erda Muqeddes,** Maîde, 21.

**(Girê) Sefa'yê,** Beqere, 158.

**Sidretul-Munteha,** Necm, 14, 16.

**(Çiyayê) Tûr,** Beqere, 63; Nîsa, 154; Qeses, 46; Meryem, 52; Tûr, 1.

**Tûrî-Sîna,** Tîn, 2.

**Newala Tuwayê,** Ta-Ha, 12; Nazî'at, 16.

## MIJARÊN CURBECUR

**Sihabiyên kîram,** Tewbe, 100, 117; Hicr, 110; Hec, 57; Heşr, 9; Mumtehîne, 10.

**Mirovên bedbext,** Hûd, 105-107.

**Gunehên mezin,** Nîsa, 31; Necm, 32; Şûra, 37.

**Cahiliye,** Ehzab, 22.

**Hukmê cahiliyetê,** Maîde, 50.

**Cin ji êgir hatine afirandin,** Rehman, 15.

**Cinan bawerî bi Qur'anê anîne,** Ehqaf, 29, 32; Cin, 1-15.

**Dûa-bergerîn,** E'raf, 55, 56, 205, 206; Re'd, 14; Kehf, 28; Secde, 16; Xafir, 60.

**Di dûakirinê de xwe ji zêdegaviyê parastin,** E'raf, 55, 100, 205; Ta-Ha, 8.

**Qebûlbûna dûayan,** Beqere, 186; Şûra, 26.

**Ebû Leheb û jina wî,** Tebbet, 1-5.

**Ehlê Beytê,** Ehzab, 33.

**Sohbeta "Elestu",** E'raf, 172.

**Helal heram nayên jimartin,** Maîde, 87, 88.

**Kî ya ku dike ji xwe re dike,** Qeses, 55.

**Lehevhatina Hudeybiyeyê,** Fetih, 10-26.

**Mirovên ku ji xisarê xilasbûyîn,** 'Esr, 1-3.

**Hukm yê Ellah Teala ye**, Yûsuf, 40, 67; Re'd, 41; Xafir, 12.

**Heyvên bi hurmet,** Beqere, 194, 217; Tewbe, , 36.

**Xêr,** Beqere, 216; Nîsa, 170, 171; En'am, 17, 158; E'raf, 188; Nehl, 30.

**Xêr û şer,** Alî Îmran, 180; Yûnus, 11; Isra, 10.

**Xêr û şer ji Ellah Teala ne,** Fetih, 11; Yûnus, 107; ehl, 53, 54.

**Hicret,** Alî Îmran, 195; Nîsa, 98, 100; Enfal, 72, 74, 75; Tewbe, 19, 20; Nehl, 41.

**Isyana Îblîs,** Beqere, 34; E'raf, 11-13; Hicr, 28-33; Isra, 61-62; Kehf, 50; Ta-Ha, 116; Sad, 71-76.

**Ifk (bêbextiya dilxelên ya ku xistibûn sitûyê 'Aîşeyê),** Nûr, 11-19.

**Rêbaza Irşadê,** Beqere, 82, 263; Alî Îmran, 159; En'am, 52; Nehl, 125; Isra, 53; Ta-Ha, 42, 44; Enbiya, 108, 109; Şû'era, 15, 29; 'Ebese, 1-12.

**Istixfar (daxwaza lêborînê),** Alî Îmran, 135; Nîsa, 106; Muhemmed, 19; fetih, 3; Zariyat, 18; Munafîqûn, 5, 6; Muzzemmil, 20.

**Qeder,** En'am, 59; Tewbe, 51; Hedîd, 22, 23; Qemer, 49.

**Şeva qedrê,** Qedr, 1-5.

**Ayetên Qibleyê,** Beqere, 142-150.

**Mala xelasiyê,** Yûnus, 25.

**Pûtên Lat, Uzza û Menat,** Necm, 19, 20.

**Lewh,ul-Mehfûz,** Neml, 75; Burûc, 22.

**Yên ku bûne meymûn û beraz,** Maîde, 60.

**Medîneyiyan,** Ehzab, 13.

**Yên ku şehnazî bi kêikên goran kirin,** Tekasur, 1, 2.

**Karesat îmtihan in,** Beqere, 155-157.

**Nûr ji Ellah Teala ye,** Nûr, 40.

**Ayeta Nûrê,** Nûr, 35.

**Yên ku pût mehdervan hesab kirine,** Yûnus, 18.

**Yên ku dibêjin; "Rebbê me Ellah e" û xwe durust kirin,** Ehqaf, 13.

**Heyva Remezanê,** Beqere, 185.

**Rûh çi ye,** Isra, 85.

**Rûh,ul-Emîn (Cibraîl),** Şû'era, 193.

**Rûh,ul-Qudûs,** Beqere, 87, 253; Maîde, 110; Nehl, 102.

**Rûmiyan,** Rûm, 2.

**Bi tengasiyan imtîhan,** Beqere, 214.

**Teqwa,** Beqere, 197; E'raf, 26; Hec, 37.

**Ehlê teqwayê,** Beqere, 2-5, 177; Alî Îmran, 133-136; Zariyat, 15-19.

**Nirxê teqwayê,** Hucûrat, 13.

**Paqijî,** 6, 100; Enfal, 37; Tewbe, 108; Waqî'e, 79; Muddessir, 4.

**Tobe,** Beqere, 160; Alî Îmran, 89; Nîsa, 16-18; Maîde, 39; En'am, 54; Hûd, 61, 92, 112; Meryem, 60; Ta-Ha, 82; Nûr, 31; Furqan, 70, 71; Qeses, 67; Tehrîm, 8.

**Tewekkul,** Furqan, 58; Neml, 79; Şû'era, 217; Ehzab, 3, 48; Texabun, 13.

**Xelkê rexê rastê,** Waqî'e, 8, 10-40, 90, 91; Muddessir, 39; Beled, 18.

**Xelkê rexê çepê,** Waqî'e, 9, 41-57; Beled, 19.

**Rêyên Wehyê,** Şû'era, 51.

**Welayet (mulk û arîkar) ya Xwedê ye,** Kehf, 44.

**Yên ku dibêjin; "jiyana dinyayê tenê heq e",** En'am, 29.

**Ayeta ku di bara Zeyd û Zeynebê de hatî,** Ehzab, 37.

**Zikr,** Alî Îmran, 191; Hec, 35; Ehzab, 9.

**Zikr û tesbîh,** Ehzab, 41, 42.

**Edeba zikr,** E 'raf, 205.

**Zulmet-nûr,** Beqere, 257; Maîde, 16; En'am, 1; Re'd, 16; Îbrahîm, 1; Ehzab, 43; Fatir, 20; Hedîd, 9; Telaq, 11.